



K.T.

Zaningeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtûya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**RENGVEDANA DÎROKA KURDÎ  
DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE**

Ibrahim IBRAHIM

14711009

Mardîn 2016

K.T.  
Zaningeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtûya Zimanê Zindî yê li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**RENGVEDANA DÎROKA KURDÎ  
DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE**

Ibrahim IBRAHIM

14711009

Şêwirmend  
Prof. Dr. Farouk ISMAIL

Mardîn 2016

## TEAHUDNAME

### JI RÊVEBERÎYA ENSTITÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ RE

Ez li xwe digrim ku min ev teza xwe ya bi navê "Rengvedana Dîroka Kurdî Di Helbestên Cegerxwîn De" li gor Rêvebernameya Perwerde-Hîndekarî û Azmûnan ya Lîsansa Bilind ya Zanîngeha Mardin Artukluyê amade kiriye û ev tez bi giştî xebata min e û min ji bo her jêgirekê çavkanî nîşan daye û min ew li gor rêbernameya rênûsa tezan nivîsîye û her weha ez pesend dikim ku kopîyayên kaxezi û elektronik yê teza min di arşivên Enstîtuya Zanistên Civakî yê Zanîngeha Mardin Artukluyê de, wekî di şerd û mercên li jêr min daye xuyakirin de were hilanîn.

Ez daxwaz dikim ku li gor Rêvebernameya Perwerde-Hîndekarî ya Lîsansa Bilind tiştê pêwîst e were kirin.

- Giştîyê teza min dikare ji bo gihîna herkesî vekirî be.

- Teza min dikare tenê li wargehên Zanîngeha Mardin Artukluyê ji gihîne re vekirî be.

- Ez dixwazim teza min ji bo .... salan ji gihîne re girtî be. Di dawîya vê demê de heger ez ji bo dirêjkirinê serî lê nedim, giştîyê teza min ji her derê ve ji bo gihîne dikare were vekirin.

25. 04. 2016

Ibrahim IBRAHIM

JI RÊVEBERÎYA ENSTITÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYÊYÊ RE

Ev xebat ji aliyê jûrîya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de wekî teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok : .....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

Pesendkirin:

Ez pesend dikim ku îmzayên jorîn, yê endamên perwerdeyê yê navborî ne.

(Îmze)

.....

Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav

Rêveberê Enstîtûyê

(Mohr)

## PÊŞGOTIN

Bijartina min ji vê mijarê re ne hema wilo ji ber xwe ve hatiye û qet dudilî bi min re peyda nebû ku wê bikim teza mastirê. Çikû Kurd bêhtirîn milletê ku dîroka wan ketiye bin barê sextekarî, guhertin û tunnekirinê, ew jî ji ber ku ketine bin nîrin siyasî û siyasetên ku rêjîmên serdest di derheqa wan de bi kar anîne, tevî ku wan pişkdariyeke mezin di dîroka rojhilat de kirine û di çarçiwîn cûrecûr de; siyasî, civakî û çandî, ji kevin de û ta roja îro.

Cegerxwîn ji helbestvanên Kurd ên ku ji biçûkanî de em li ser helbestên wî perwerde bûne, demeke dirêj li bajarê ku ez lê dijîm –Qamişlo- jiyana xwe derbas kiriye û gorna wî jî li wir e. Kurd tune ku ji vî helbestvanî hez neke, ji ber hesaniya peyvên wî, kûrbûna wateyan, xurtbûna derbirînê, li gel mijarên wî yên neteweyî, civakî û mirovî ku bi jiyana kurdî ve girêdayî. ya ji van tevan giringtir ew pirrbûna pêzanîn û amajeyên dîrokî ku helbestên wî di nav perrên xwe de vedişêrin.

Ez wî tiştî jî nadim mendelê ku min dixwest wêje û dîrokê di yek lêkolînê de bighînim hev. Lêkolîn ji van pişkan pêkhatiye:

### **Destpêk:**

Tê de min berê xwe daye jînenîgariya helbestvan Cegerxwîn a kesayetî û wêjeyî, nîrên civakî, aborî û siyasî ku jiyaye û pişkdarî di avakirina kesayetiya wî de kirin û bandora xwe li çanda wî hiştin, li gel wê li ser berhemên wî di warê wêje/edebiyat, dîrok, folklor û ziman de –yên çapkirî û ne çapkirî- radiwestim û hin lêkolînên li ser nivîsandinên wî. Min hin ronahî avêtiye ser têkiliya di nav helbest û dîrokê de û nerînên feylesûf, dîroknûs û helbestvanan di vê mijarê de û çawa û çima dîrok û bûyerên wê di helbestê de tên bikaranîn.

### **Beşa Yekem:**

Bi navê "Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Kevin" e. Radihêje dîroka millet û mîrneşînin kevnar ku di Kurdistanê de bûn û rikberî û kêferata wan bi hev re, li gel rola wan a şaristanî, mîna (Lullu, Guti, Hurri/Xurri, Mittani, Kaşşu, Madi/Med, Kerdox).li ser çawa Cegerxwîn ev qûnax di helbestên xwe de bikar aniye, bi rêya bûyer û kesayetiyin ku bandora xwe di rûpelên dîrokê de hiştine û ew milletên ku di warên kurdan de bicih bûbûn û heye ew bi xwe bapîrên kurdan bin.

### **Beşa Duyem:**

Bi navê "Kurd û Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Wan Di Serdema Islamî De" ye. Radihêje destpêka belavbûna islamê di welatê kurdan de û çirûskin ji dîroka kurdan di serdema emewîyan de û rola wan di avakirina dewleta Ebbasiyan de berçav dike û tevgerên wan ên civakî û aborî, li gel serhildanên wan dijî desthilatdariya ebbasî û bi taybetî di dewra ebbasî ya duyem de çiku weke hêzeke siyasî di cugrafiyeke fireh de berz bûn, bêhtir di dema Buweyhiyan de, ku mîrnişîn û dewlet ava kirin û bi berferehî deng dan û rola wan a herî mezin di dema Eyyûbbiyan de bû.

Li gel wê radihêje çawa Cegerxwîn ew qûnaxên dîrokî di helbestên xwe de bikar anîn, di rêya vexwestina bûyer û kesayetiyin dîrokî yê kurdî; ew bûyerên ku ta astekê karîbûn kurdan wek hêzeke siyasî ya kêrdar û bandora xwe di pêvajoya dîroka islamî de bi tevayî hiştin.

### **Beşa Sêyem:**

Bi navê "Kurd û Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Wan a Nûjen û Ya Hevdem de" ye. Radihêje dîroka kurdî di du pêvajoyan de; dîroka nûjen û ya nûdem.

#### **- Dîroka Nûjen (1453 -1789z):**

Xêzên sereke ji dîroka kurdan û herêmên wan di serdema nûjen de berçav dike û li ser bûyerên ku welatê kurdan parçe kirin radiweste û mîrneşînen kurdî ku di pey re di dema osmanî de hatin damezrandin û dûvre nakokî û hevbendên ku kurdan bi îran û dewleta osmanî re kirin.

### **- Dîroka Hevdem (1789- 1984z):**

Xêzên sereke ji dîroka kurdan û herêmên wan di serdema nûdem de berçav dike, ji wan, serhildanên kurdan li dijî desthilatdariya osmanî û hikûmetên îranî û bandora ku herdu cengên cîhanî li kurdan kirin; bi reya hevpeymanên nav dewletên gewre ku di encamê de Kurd û welatê wan kirin parçe û tevî ku yek netewe bû lê li her herêmekê pêvajoyeke taybet stand.

Li gel wê ev pişk dide xuyanî çawa Cegerxwîn ewqasî bûyer û pêvajoyên ku bi ser kurdan de hatin û ew parçe kirin û di bin bandora wan de çawa kir ku helbestênwî bi xwe bibe parçek ji dîroka kurdî; çî bi vexwestina bûyer û kesayetiyên bandora xwe li dîroka kurdî nûjen hiştin û bikaranîna cih û warên dîrokî û çî bi ziman û çanda kurdî û bernasên wan, yan bi têkoşîna kurdan di warên wan de .

#### **Encam:**

Radihêje giringtirîn encamên ku bi serbora Cegerxwîn ve girêdayî û çawa dîroka kurdî di serdemên cuda de di helbestên xwe de bikar anîne û di mijarin cûrbecûr de, medh, şîn, payebilindî, dicûn û evînî, wek daxwazekê ji wî ku ew êş û azarên milletê xwe berçav bike, ku di baweriya wî de ew yek ji giringtirîn armancên helbestêye.

#### **Zehmetiyên Lêkolînê û Jêderên wê:**

Kêşeya /problema pêşî ku li ber lêkolînê derket ew bû ku jêder û makderên bi zimanê kurdî têra wê tune bûn; çî ji aliyê dîroka kurdî û çî ji aliyê lêkolînên rexneyî ku ji lêkolînê re gereke. Li vir çare nema ji bilî ku berê xwe bidim jêderên zimanên din, min armanca xwe di zimanê erebî de dît, tevî ku ked û westanek bêhtir dixwest.

Kêşeya duyem ew bû ku di nîrin aborî û derûnî yên zor de min kar kir, ceng û şerê li welatê min Sûriyê qewimî û nîrên ku hiştin em koçber bibin, kêşe li vir ew bû ku çûnûhatina di navber Sûrî û Tirkîyê de tune û zehmetiya ku em nikarin herin û bên ji cihê em lê rûniştine Tirkîye û dewletên derdorê, ku heye min jêder ji wan deveran bidest xistina.

Di destpêkê de min piştgermî bi dîwanên Cegerxwîn ku ji weşanxana Avesta derçûne kir, piştî xwendineke aram min pîrr şaşî tê de dîtin, çî yên çapê û çî yên bi forma helbestê ve girêdayî, vê yekê zehmetî li ber kar derxist û divabû li çapên pêşî /kevin vegerim, li gel jînenîgariya Cegerxwîn ku wî bixwe nivîsandiye û nivîsandinên wî di warê dîrokê de bi navê "Tarîxa Kurdistan" di sê cildan de û berhemên wî di warê folklor û ziman de.

Ez pêrgî pirtûkekê hatim bi navê "Şîrên Windabûyî" ji weşanxana Avesta Sibataubata sala 1996an li ser navê Cegerxwîn çap bû ye. Piştî şopandinê ez giham xwediyê wê ku ew helbestvan Xelîl Mihemed Elî Sasûnî ye, ji Qamişlo û wî bi xwe ev teqeze kir û got ku wî ji weşanxanê re şandiye lê ta niha tu bersiv jê nehatiye.

Ez Sipasî û rêzgirtinên xwe ji Prof. Dr. Farouk Ismail re pêşkêş dikim ji ber ku ji bo min şewirmedîtî pejirand û arîkariya min kir û ji dil şopand û li ser şaşî û kêmaniyên min rawestiya û her min ji nerîn û şîretên wî sûde wergirt. Wiha jî sipasiya hemû mamosteyên xwe yên di beşê de dikim û heval û nivîskarên ku bi comerdî bersiva pirsên min didan, nemaze mamoste Ehmed Seyarî.

Spasiyeke taybet ji herdu dostên hêja re: helbestvan Xelîl Muhammed Elî Sasûnî û nivîskar Fewaz Ebdê ku ji kêlîka pêşî û ta xala dawî di lêkolînê de piştî min girtin û bi min re alîkar û şewirdar bûn.

Ibrahim IBRAHIM



## KURTE

Di rojhilata navin de kurd di her warî de ne kêmi miletên derdora xwe ne. Hebûna wan di hemî serdemên dîrokî de (kevin, navîn, nûjen û nûdem) berbiçav e. Pêkhateyên wan ên siyasî u çandî di dîrokê de mîna her miletên din geh xurt dibûn, geh lawaz dibûn.

Kurdan di dîrokê de dewlet û mîrneşîn damezrandibûn û bi hêzên sereke yê herêmê re rikberî û nakokî dikirin. Pişkdariyên wanî cûrbecûr di dîrokê de hebûn, nexasim di serdemên islamî de. Lê mixabin dîroknûsan rastiya di derheqê wan de ne gotine û dîroka wan ketiye bin barê guhertin û sextebaziyê.

Cegerxwîn di dîroka wêje û edebiyata kurdî ya modern de gewretirîn helbestvanê kurd e. Bi berhemên xwe yê cûrbecûr çanda kurdî dewlemend kiriye. Bi jîrbûn û zanebûneke serkeftî, di helbestên xwe de êşên miletê xwe û dîroka wî, veguheztine mijarên welatperwerî, civakî û mirovî. Ya ji wan giringtir ev e ku, xiznên pêzanîn û amajeyên dîrokî ku helbestên wî di bin perrên xwe de vedişartin. Lewra jî me ji bo lêkolînê, helbestên cegerxwîn hilbijartin. Da em bibînin bê çawa dîroka kurdan di wan berheman de reng vedaye û peywendiya navbera helbestên wî û dîroka kurdan bi awayekî zelal û tekûz bidin xuyakirin.

Lêkolîn ji van xalan pêktê:

-Dergehek em tê re derbas dibin jînenîgariya helbestvan a kesayetî , wêjeyî, nîrên civakî, aborî û siyasî yê ku pişkdarî û bandora xwe di avakirina keseyet û çanda wî de kirine, li gel xwezaya peywendiya di nav helbest û dîrokê de li gorî nerînen feylesûf, dîroknûs û helbestvanan.

-Sê beş, di her beşekê de çirûskin ji dîroka kurdan di serdemeke dîrokî de; kevin, navîn, nûjen û nûdem. Nakokiyên wan ên siyasî û diyarkirina pişkdariya wan a şaristanî di her demekê de. Dûvre şiroveyek ji hin helbestên Cegerxwîn re û taybetmendiya şêwaza van helbestan û bikaranîna bûyer û kesayetên dîrokî di van helbestan da.

Xweş diyar e ku Cegerxwîn pir caran xwestiye bûyer û kesayetên dîrokî bîne da xwe bi wan bipaye û serbilind bike, serî bi bapîran hilde jor. Xwestiye ku wek dîroknûsekî bûyeran veguhêze, bêyî ku zîyanê bigihîne rastî û pêvajoya wan, bi hostayî ew bikaraniye ta ku helbest û dîrok li ba wî bibin yek gewde, ku mirov nema karibe wan ji hev cuda bike û têkiliyeke xurt û têgihiştî di nav wan de ava bike .

Cegerxwîn bi rewanbêjiya xwe û zimanê xwe yêdewlemend termînolojiyek û ramanek nû afirandiye ku deqên dîrokî nikaribûn bi tena serê xwe wî karî hilgirin.

Bi hêvî me ku lêkolîn serkeftî be û armanca xwe ya zanistî bi cih anî be.

**Peyvên sereke:** Helbestên Cegerxwîn, Dîroka Kurdî.

## ÖZET

Kürtler ortadoğu coğrafyasında yaşayan diğer milletlerden hiçbir eksik yanları olmamasının yanısıra; eski çağ, orta çağ ve yakın çağ gibi bütün tarih dönemlerde varlıklarını sürdürmüşler. Siyasi durumları ve kültürel varlıkları diğer toplumlarda olduğu gibi gelgitler yaşayarak kimi zaman güçlenip kimi zaman zayıflıyordu.

Kürtler devletler ve beylikler kurarak bölgedeki belli başlı güçlerle çelişkiler yaşayıp mücadele etmişler.Tarihte -bilhassa islam tarihinde- önemli rolleri olan kürtlerin bu yönü tarihçiler tarafından gözardı edilmiş ve Kürt tarihi önemli ölçüde sansüre ve sahtekarlığa maruz kalmıştır.

Cegerxwin de yakın dönemde modern Kürt edebiyatının en önemli şairidir. Çeşitli eserleriyle Kürt edebiyatını zenginleştirmiş, halkının acılarını ve tarihini ustaca ve bilgece şiire dökmüştür. Özellikle vatanseverlik, toplumsal ve insani konularda yazdığı şiirler dilden dile dolaşıp besteleniyordu. Çünkü şiirlerinde halk dilini gerçekçi duygularla derin ve güçlü bir tarzda kullanarak milletinin acılarını vurguluyordu. Bunlardan önemlisi de onun şiirlerinin kanatları altında sakladığı hazine değerindeki bilgilerdi. Bunun için biz de araştırma konusu olarak onun şiirlerini seçtik, ta ki tarihi bilgilerin onun şiirlerinde nasıl yoğun olarak yer aldığını, aradaki ilişkiyi ve birbirini tamamlayan unsurları gözler önüne serelim.

Araştırmada şu konular üzerinde durulmuştur:

- Cegerxwin'in hayatı, şair ve edebi yönü, tarih ve şiiri harmanlama bağlamında kişiliğini oluşturan sosyal, ekonomik, siyasi ve kültürel etkenlere giriş. Sonra filozof, tarihçi ve şairlerin görüşleri doğrultusunda şiir ve tarih ilişkisi.

- Eski, orta, yeni ve yakın çağda kurt tarihindeki siyasi çelişkiler, ve her devirdeki medeniyete katkılarını anlatan üç bölüm. Sonra cegerxwin'nin bazı şiirlerinin yorumu ve bu şiirlerin üslup özellikleri, tarihi olay ve şahsiyetlerin şiirlerde kullanılması.

Açıkça görülüyor ki Cegerxwin çoğu zaman tarihi olay ve şahsiyetleri şiirlerde dile getirip bu yöntemle bahtiyar olup atalarıyla övünmek istemiştir. Bir tarihçi olarak tarihi hakikatleri ve süreçleri incitmeden şiirlerinde ustaca kullanmış, zira onda şiir ile tarih birbirinden ayrılmaları mümkün olmayan tekvücut olmuşlar. Aynı zamanda ustalığı ve zengin dili ile tarih ilminin tek başına hakkından gelemeyeceği aralarında güçlü ve bilinçli bir ilişki kurarak yeni bir fikir ve terminoloji üretmeyi başarmıştır.

Ümit ederim ki bu çalışmam başarılıdır ve bilimsel görevini yerine getirmiştir.

**Anahtar Kelimeler:**Cegerxwin'in şiirleri, Kurt tarihi.

## ABSTRACT

Kurds have their own history as all of the other nations in Middle East. They were present through different historical ages (old, middle, modern and contemporary) with various political states, and cultural achievements from age to age.

They established emirates, states and they fought against different forces in Near East. They also have many cultural contributions during the history, especially in the Islamic period, but they didn't get enough care by historians, and therefore was exposed to forgery.

Gegerkhin is considered as one of the most important Kurdish poets in Kurdish temporary literature. He contributed in enriching the Kurdish culture with his various publications in literature, history and language. Also he succeeded in transferring his nation tragedies into poems with national, social and humanitarian issues. Even the uneducated class of people could learn his poems by heart because it were not complicated, and still have true feelings, deep significance and strongly expressed suffering.

And besides, the great quantity of the information and historical significances is also involved in his poems. Therefore, we chose his poetry to study how Kurdish history had been employed in it and how much they are in a close relation.

The research consists of:

An introduction about the poets personal and literary biography and his social, economical and political states that contributed in refinement of his

personality which also affected his education. And also, it has the nature of the relationship between poetry and history according to the visions of philosophers, historians and poets.

Three chapters have been in and all of them dealt with glimpses of the history of Kurds during the specific historical ages (the old, the middle, modern and contemporary), their political conflicts at that time, and their contributions in civilization. Then presenting an analytical study of Gegerkhins poetry and his style in the recruiting of that history and all its characters in poetry.

It seems that Gegerkhin many times tried to mention the historical characters and accidents to pride and glory of the ancestors. As he wanted to be a historian quoting incident, without touching its reality and its issues, and he was mastered in his job, history and poetry. He became as strong as a single block that cannot be separated, and has succeeded in building a parallel and precise relationship between them gracefully, with a strongly rich language. He was able to create ideas that even historical narrative texts cannot do.

I am hopeful that this research will be successful and responsive in its scientific destination.

**Key words:** The Cegerxwin Verses, ThekurdishHistory.

## NAVEROK

PÊŞGOTIN .....	I
KURTE .....	V
ÖZET.....	VII
ABSTRACT .....	IX
NAVEROK .....	XI
LÎSTEYA NEXŞEYAN .....	XV
LÎSTEYA WÊNEYAN .....	XVI
KURTEBÊJ .....	XVII
DESTPÊK .....	1
1. CEGERXWÎN (900/1903-1984z.) .....	1
1.1. JÎNENÎGARÎ: .....	1
1.2. PÊVAJOYA WÊJEYÎ: .....	13
2. PEYWENDIYA DI NAV HELBESTÊ Û DÎROKÊ DE: .....	22
I. BEŞA YEKEM.....	29
RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KEVIN .....	29
1.1. MILET Û ŞANEŞÎNIN KEVIN DI KURDISTANÊ DE: .....	29
1.1.1. LULLU/ LOLLO: .....	30
1.1.2. GUTÎ / GÛTÎ: .....	33
1.1.3. XURRÎ / HURRÎ .....	35
1.1.4. ŞANEŞÎNA MÎTTANÎ YA HÛRÎ / XÛRÎ: .....	39

1.1.5. KAŞŞU (1595 -1157B.Z.): .....	41
1.1.6 MÎDÎ.....	44
1.1.7. KERDUX/KARDOX.....	47
<b>1.2. RENGVEDANA DÎROKA MILET Û ŞANEŞÎNIN KEVIN DI KURDISTANÊ DE, DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE.....</b>	<b>48</b>

**II. BEŞA DUYEM..... 72**

**KURD Û RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA WAN DI SERDEMA ISLAMÎ DE, DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE..... 72**

**2.1. KURD DI DÎROKA ISLAMÎ DE:..... 72**

2.1.1. BELAVBÛNA ISLAMÊ DÎ WELATÊ KURDAN DE: .....	72
2.1.2. KURD DI SERDEMA EMEWÎ DE (41-132k./661-750z.): .....	73
2.1.3. KURD DI SERDEMA EBBASÎ DE (132-656k./750-1258z.): .....	75
2.1.3.1. Kurd Di Dewra Ebbasî Ya Yekem De (132-232k./750-847z.):.....	75
2.1.3.1.1. Tevera Ebû Muslim el-Xurasanî (137k./754z.): .....	76
2.1.3.1.2. Tevera Babik el-Xurremî (137-158k./754-775z.):.....	77
2.1.3.1.3. Serhildana Ce'fer Bin Fehreces el-Kurdî Li Mûsilê (224oç/839z.): .....	78
2.1.3.2. Kurd Di Dewra Ebbasî Ya Duyem De (232-590k./847-1195z.):.....	79
2.1.3.2.1. Kurd Di Serdema Desthilatdariya Tirkan De (232-334k./847-946z.): .....	79
2.1.3.2.1.1. Desthilatdariya Eysanê (300-350k./912-961z.): .....	80
2.1.3.2.1.2. Kurd Di Azerbeycanê De: .....	81
2.1.3.2.1.3. Hevbeşiya Kurdan Di Teverger û Serhildanên Dijî Ebbasiyan De:.....	82
2.1.3.2.2. Kurd Di Serdema Desthilatdariya Biweyhiyan De (334-447k. /946-1055z.) û Ta Dawiya Desthilatdariya Selcûqiyan (447-590k./1055-1195z.):.....	84
2.1.3.2.2.1. Mîrneşîna Rewadî (337-463k./948-1071z.):.....	85
2.1.3.2.2.2. Mîrneşîna Şeddadî (340-595k./951-1198z.): .....	86
2.1.3.2.2.3. Dewleta Dostikî – Merwanî (345-380k./956-990z.), (380-489k./990-1095z.):.....	87
2.1.3.2.2.4. Mîrneşîna Hesnewêh (348-406k./959-1015z.):.....	89
2.1.3.2.2.5. Mîrneşîna Lora Mezin (543-827k./1148-1424z.): .....	90
2.1.3.2.2.6. Mîrneşîna Lora Biçûk (591-1005k./1195-1596z.): .....	92
2.1.3.2.2.7. Dewleta Eyûbî (1174 – 1250 z.): .....	93

**2.2. RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDAN DI SERDEMÊN ISLAMÎ DE, DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE: ..... 94**

2.2.1. RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA BELAVBÛNA ISLAMÎ DÎ WELATÊ KURDAN DE:.....	94
2.2.2. RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDAN DI SERDEMA EBBASÎ DE:.....	96
2.2.2.1. Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Kurdan Di Serdema Ebbasî Ya Yekem De: .....	97
2.2.2.1.1. Bikaranîna Ebû Muslim el-Xurasanî:.....	97



2.2.2.1.2. Bikaranîna Tevgera Babik el-Xurremî:.....	99
2.2.2.1.3. Bikaranîna Serhildana Ce'fer Bin Fehreces el-Kurdî Li Mûsilê (224k./839z.): .....	102
2.2.2.2. Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Kurdan Di Serdema Ebbasî Ya Duyem De: .....	103
2.2.2.2.1. Berbiçavkirina Mîr Xanim Serokê Eyşanê: .....	103
2.2.2.2.2. Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Kurdan Li Azerbeycanê: .....	104
2.2.2.2.3. Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Mîrneşînên Kurdan Di Serdemên Biweyhî û Selcûqî De: .....	116
2. 2. 2. 2. 4. Rengvedana Dîroka Dewleta Eyûbî: .....	125
2. 2. 2. 2. 4. 1. Rengvedana Dîroka Malbata Eyûbî: .....	126
2.2.2.2.4.2. Selaheddîn Di Helbestên Cegerxwîn De:.....	129

### **III. BEŞA SÊYEM ..... 137**

#### **KURD Ê RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA WAN A NÛJEN Ê HEVDEM DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE ..... 137**

<b>3.1. ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDÎ YA NÛJEN: .....</b>	<b>137</b>
3.1.1. ÇILDÊRAN Ê DESTPÊKA DABEŞKIRINÊ: .....	139
3.1.2 MÎRNEŞÎNÊN KURDÎ DÎ SERDEMA OSMANÎYAN DE:.....	140
<b>3.2. ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDÎ YA HEVDEM: .....</b>	<b>147</b>
3.2.1. SERHILDANÊN KURDÎ LI DÎJÎ DESTHILATDARIYA OSMANÎ DE:.....	148
3.2.2. ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDAN DI DEMA SULTAN EBDULHEMÎDÊ DUYEM DE (1876-1907):.....	150
3.2.3. KURD Ê DEWLETA OSMANÎ PIŞTÎ SULTAN EBDULHEMÎD (1908-1914): .....	156
3.2.4. ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDÊN LI ÎRANÊ:.....	158
3.2.5. ŞERÊ CÎHANÎ YÊ YEKEM (1914-1918) Ê BANDORA WÎ LI SER KURDAN: .....	159
3.2.6. KURD Ê QÛNAXA PIŞTÎ ŞERÊ CÎHANÎ YÊ YEKEM (1920-1938):.....	161
3.2.6.1. Kurd Li Tirkîyeyê: .....	162
3.2.6.2. Kurd Li Îraqê:.....	165
3.2.6.3. Kurd Li Îranê:.....	168
3.2.6.4. Kurd Li Sûrîyeyê:.....	170
3.2.7. ŞERÊ CÎHANÎ YÊ DUYEM (1939-1945) Ê BANDORA WÎ LI SER KURDAN:.....	175
3.2.7.1. Kurd Li Tirkîyeyê: .....	175
3.2.7.2. Kurd Li Îraqê:.....	178
3.2.7.3. Kurd Li Îranê:.....	180
3.2.7.4. Kurd Li Sûrîyeyê.....	184
<b>3.3. RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDÎ YA NÛJEN Ê HEVDEM DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE: .....</b>	<b>188</b>
3. 3. 1. BIKARANÎNA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDÎ YA NÛJEN: .....	188

3.3.1.1. Vexwestina Kesayetiye û Bûyerên Ku Bandora Xwe Li Dîroka Kurdistan Ya Nûjen Kirine: .....	189
3.3.1.2 Vexwestina Mîrneşîn û Qebîleyên Kurdî:.....	195
3.3.2. RENGVEDANA ÇIRÛSKÎN JI DÎROKA KURDÎ YA NÛJEN: .....	221
3.3.2.1. Rengvedana Şoreşa Şêx Seîdê Pîran 1925:.....	221
3.3.2.2. Rengvedana Bûyerên Piştî Şoreşa Şêx Seîdê Pîran: .....	234
3.3.2.2.1. Rengvedana Qanûna Qedexkirina Lixwekirina Cilên Kurdî: .....	234
3.3.2.2.2. Rengvedana Komkujiya Aleqemşê:.....	237
3.3.2.2.3. Rengvedana Serhildana Sasûnê: .....	241
3.3.2.3. Rengvedana Şoreşa Ararat/Agrî (1927-1930z) û Komkujiya Gelyê Zîlan: 243	
3.3.2.4. Rengvedana Kesayetiya Qazî Mihemed û Komara Mehabad: .....	246
3.3.2.5. Rengvedana Siyaseta Erebkirîne û Kişandina Nijadnameyê Ji Kurdan: ....	249
3.3.2.6. Rengvedana Kesayetiya Leyla Qasim:.....	259
<b>ENCAM</b> .....	<b>266</b>
<b>ÇAVKANÎ</b> .....	<b>270</b>
<b>PÊVEK</b> .....	<b>290</b>

## LÎSTEYA NEXŞEYAN

1. Hesarê, Beyder Memo, Dêrik, Qamişlo, Amûdê.....	290
2. Rojhilata kevin.....	290
3. Rojhilata kevin di 2300b.z. de.....	291
4. Rojhilata kevin di hezara duyem û yekem de b.z.....	291
5. Şahneşîna Mîdiya di sed sala şeşem de b.z.....	292
6. Dewleta Islamî di serdema Xelîfeyên Raşîdî de.....	292
7. Şahneşîn û Mîrneşînên Islamî di dawîya sedsala dehê z. de.....	293
8. Dewleta Osmanî û Sefewî.....	294
9. Mîrneşînên Kurdî di serdema nûjen de.....	294
10. Peymana Saykis Pîko 1916.....	295
11. Peymana Sîver 1920.....	295
12. Tevger û Serhildanên Kurdî 1880-1939.....	296

.

## LÎSTEYA WÊNEYAN

Wêne 1. Cegerxwîn.....	297
Wêne 2. Hacî Ebdilkerîmê Sadiq, Mîr Celadet Bedrxan, Hesenê Haco, Mecîdê Haco, Cegerxwîn, Cemîlê haco, Hacoyê Haco.....	297
Wêne 3. Mala Cegerxwîn li Qamişlo.....	298
Wêne 4. Gora Cegerxwîn li Qamişlo.....	298

## KURTEBÊJ

<b>amd</b>	Amadekirina		<b>j.</b>	Jimar
<b>b.c.</b>	Bê cihê çapkirinê		<b>k.</b>	Koçkirin / hicrî
<b>b.m.</b>	Bê mêjû		<b>k.m.</b>	Kilo mitir
<b>b.f.</b>	Bo berfirehtir		<b>kov.</b>	Kovar
<b>bnr.</b>	Binêrin		<b>teh.</b>	Tehqîq
<b>b.z.</b>	Berî zayînê		<b>ter.</b>	Tercemet
<b>c.</b>	Cild		<b>m.</b>	Mirin
<b>ç.</b>	Çap		<b>m.j.</b>	Mêjûya jêgirtinê
<b>k.</b>	Sala hicrî (Koçberbî)		<b>m.w.</b>	Mêjûya weşanê
<b>h.b.</b>	Heman berhem		<b>r.</b>	Rûpel
<b>h.g.</b>	Heman gotar		<b>wer.</b>	Werger
<b>h.j.</b>	Heman jêder		<b>weş.</b>	Weşanxane
<b>h.l.</b>	Heman link		<b>z.</b>	Zayîn
<b>h.r.</b>	Heman rûpel			

## DESTPÊK

### 1. CEGERXWÎN (900/1903-1984z.)

#### 1.1. Jînenîgarî:

Cegerxîn yek ji binavûdengtirîn helbestvanên serdema nûjen di nav kurdan de ye. Wî dikarîbû di riya helbesta xwe re derbasî her malê bibe, ji ber ku helbesta wî neynikek bû ji civakê û jiyana wê ya giştî re; mezinan di civatên xwe de, zarokan di ber lîstika xwe re û jinan li ser tenûrê yan jî di ber karên malê re helbestên wî digotin.

Ew tev ne ji valahiyekê hatiye, lê ji gelek şeweyan hatiye, mîna xweş bijartina mijarên xwe yên ku hokarên siyasî ku tê re buhûrî, rewşa civakî û jiyana ku bi hejarî jiyaye. Jînenîgariya wî ji her tiştî bihtir bandora xwe li çanda wî kir û rengê xwe li helbesta wî veda; bi wan wêneyên tije zor, sitem, kedkarî û hejarî û ew dibe nimûneyek ji rewşa piraniya kurdan re di wê çerxê de.

Cegerxîn di sala 1903an de li gundê Hesarê ku dikeve bakurî rojavayî qeza Kercosê ya ku bi Mêrdînê ve girêdayî<sup>1</sup> ji dayik bûye û ew bi xwe di yekemîn dîwana xwe (Pirîsk û Pêtî) de navê xwe yê rastî Şêxmûs tîne ziman:

*Sala hezar û nesed û sê ez hatim dinyayê*

*Bi navê siltan Şêxmûs ez çêbûme ji dayê*

*Heta bûm sêzde salî li gundê mey Hesarê*

*Jîna xwe min diborand paşê ji wê me da rê<sup>2</sup>*

<sup>1</sup> - Ji 16ê Gulanê 1990î ve bi Batmanê ve hatiye girêdan. b.f. bnr. Zülküf Kışnak, **Batman Bajarê ku Dîroka Xwe Hembêz Dike**, Gun Matbaacilik, Stenbol 2013, r. 217.

<sup>2</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, ç. 1, şam 1945, r. 163.

Lê li gorî belgeyên fermî jidayikbûna wî sala 1900î ye û ew bi xwe di hevpeyvîneke TV<sup>3</sup> û di bîranînê xwe de jî vê yekê berçav dike û sedemê vedigerîne dê û bavê xwe ku ne xwenda bûn û ew rewşa piraniya civaka kurdan bû di wê demê de, weha jî -mîna adeta dê û bavan- ew dibêje ku sala Berfa giran; yan jî Berfa sor<sup>4</sup>, bavê wî nêçîra çûkan dikir û çûk ji wî re tavêtin hundirê malê ji ber ku ew biçûk bû ne dikarî di wê sermê de derkeve derve û temenê xwe bi 5 -6 salî texmîn dike.<sup>5</sup>

Çi dibe bila bibe, ew Şêxmûs ê zarok, ewê ku paş re bi navê Cegerxwîn ê ku wî ji xwe re bijartibû hat naskirin, ew lawê Hesên ê lawê Mihemed bû; ew cotkarê reben ê ku bi xwihdana aniya xwe paryê nanê xwe bi dest dixist, bê ku destdirêjiyê li milê kesî bike, yan zordariyê li wan bike.

Bi temenê xwe bavê wî mezinê malbatê û merivan bû û di nav wan de cihê baweriyê bû, lê xityariyê hişt ku nema karibe kar bike û ew bû sebaba hejartiya malê û koçberiya wê ji cihekî ber bi yê din ve, li gel zilm û zora Axê ku ne li wî tenê, lê li gundiyan bi tevayî dibû; ew kedkirên ku bê çare bûn.

Diya Cegerxwîn navê wê Eysanê bû. Bi dilpakî, dilovanî û jîrbûna xwe deng da bû û bi karê xwe yê dirûtin û cilheçîtiyê roleke sereke di xwedîkirina malê de lîst.<sup>6</sup> Xuşk û birayekî wî li jiyane man, piştî mirina heşt zarokan bi nexweşiyên ku li herêmê belav bibûn. Birayê Cegerxwîn ê mezin navê wî Xelîl bû, guhdan bi xwendina olî dikir. Neçar bû çû leşkeriyê û ji ber ku rewşa mal nas dikir, diravên ku zêdî pêdiviyên wî bûn ji bavê xwe re rê dikirin.<sup>7</sup>

Xuşka wî ya bi tenê Asya bi kurmetka xwe mele Xelîl re şû kir (zewicî) û li Amûdê bi cî bûn<sup>8</sup>; ew bajarokê ku bavê Cegerxwîn di dema desttengiya wî de himbêz kir. Piştî mana salekê li Amûdê bav can da, ew di sala 1918an de bû.

<sup>3</sup>- Kendal Nezan, "*hevpeyvînek bi Cegerxwîn re*", Sala 1983an li Inistîtûta Kurdî li Paris û li ser kenala KURD1 weşand, (m.w. 24.10.2012) <https://www.youtube.com/watch?v=GZ4N6e2Socc>, (m.j. 07.11.2015).

<sup>4</sup>- Ew di sala 1910an de bû, tê gotin ku berf bi xurtî û bihtir ji mehekê li ser hev bariya.

<sup>5</sup>-Cegerxwîn, *Jînenîgariya Mîn*, ç. 1, weş. Apcc, Stokholm 1995, r. 24.

<sup>6</sup>- h.b., r. 21, 55.

<sup>7</sup>- h.b., r. 21, 27.

<sup>8</sup>- Amûdê bajarekî kurdiye, li ser sînorê Sûrî û Tirkîyê, 30 k.m Dûrî Qamişlo ye. b.f., bnr. Ebdulbasit Seyda, "*Amûda..Medînetul-unfetî wel-Ma'rîfetî*", el-Hîwaru'l-Mutemeddin, el-Eded: 2906, (m.w. 03.02.2010), <http://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=202122>, (m.j. 02.10.2015).

Berî salek di ser mirina bav re derbas bibe, di sala 1919an de, dê jî li gundê Beyder Memo<sup>9</sup> can da û sê zaro (Xelîl, Şêxmûs û Asya) li pey xwe hiştin.

Cegerxwîn jiyanêke nû dest pê kir, nema zanîbû çawa û li kûde biqedîne<sup>10</sup>, nemaze piştî ku birayê wî Xelîl bi keçxala xwe ya nezan û zirz re şû kir, ya ku gotinên çort, tûj û nexweş ji Cegerxwîn re digotin; ew gotin mîna tîrên jehrê di can û cergê wî re diçûn, rojê hezar carî ji wan gotinan dimir, weke ku ew di helbesteke xwe de dibêje:

*Ji tengasî , neçarî me ew gundê xwe berda*

*Hatin Amûda rengîn bavê min zû emir da*

*Diya min a belengaz pêncî salî dilovan*

*Salek piştî bavê min ew jî li wî bû mêvan*

*Birayê min ê nîv mele ji alema rûhanî*

*Rast û dirist çi bêjî ew tiştêkî nizanî*

*Wî pîreka xwe anî bê wijdan û bê mejî*

*Bi gotinên xwe ên çors , ew min bê derb dikujî*<sup>11</sup>

Ji ber zirzbûna jinbira xwe Cegerxwîn neçar bû ku xwe bavêje xuşka xwe Asya û pêre bijî, lê xuşka wî di danûstendina xwe de ji jinbirê ne çêtirbû; hişkbû, gotinên çirr jêre digotin. Ew ji ber gotinên xuşkê weke agir di hinavan de bû. Wê zarokên xwe dişandin dibistanê ê ew mîna xulamêkî suxra malê, şivantiya pez û paleyî fikir û her pêlavên zarokên wê yên kevin di nigên wî de bûn.

Ew qet bi mirovatiya xwe hest nebû û ne ew dilovanî û mihrebaniya ku dixwest piştî mirna dê û bav dît. Tevî wilo jî ew neçar bû ku vê rengejiyanê bipejirîne û eş û zorê wergire.<sup>12</sup>

Ew di helbesteke xwe de û bi zimanekî rewa dibêje:

<sup>9</sup>- Beyder Memo (Harmanli): Yek ji gundê Omeriya yei, bi Midyadê ve girêda ye.

<sup>10</sup>- Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r. 27, 56.

<sup>11</sup>- Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 163.

<sup>12</sup>- Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r. 64.



*Xweşka min a xwendewar bê insaf û bê wijdan*  
*Ez reviyam hatim cem , wê jî ez kirme şivan*<sup>13</sup>

Bi vî hawî Cegerxwîn zaroktiya xwe bi jarî bûrand, pir êş û azar kêşan, lê li gel wê jî daxwazeke xurt li ba wî hebû ku fêrî xwendinê bibe. Ew li Beyder Memo li ber destê Mele Seîd fêrî xwendina Quranê bibû û dixwest berdewam bike û li Hesarê piştî vegeza ji Beyder Memo li ber destê xoce Zeyneb keça Mele seîd xwendina xwe berdewam kir.<sup>14</sup> Lê daxwazên wî ji wilo mezintir bûn, wî dixwest bibe alimekî olê bi nav û deng û xwedî qedir. Heye ku ev daxwaz ji bo jiyaneke xweş bijî be.

Vegeziya Hesarê cem birayê xwe û li wir du tiştan hiştin ku ew bi xurtî ber bi xwendinê ve biçê, weke ku ew dibêje:

1- Gotinên herdu zarwên Mele Seîd ku xwe bi xwendinê pesin didan û didan xuyanî ku pir tişt bi xwendinê pêk anîne.

2- Xewna ku dît Mele Êbêdillahê Kolatî dihat xewna wî û ew fêrî xwendinê dikir. Vê yekê bandoreke xurt lê kir û hişt ku berê xwe bide birayê xwe Xelîl û mijarê pêre veke. Bira di destpêkê de qebûl nekir, lê li ber germiya daxwaza Cegerxwîn û lihliha wî û piştî levparkirina werseta bavê ya biçûk erê kir.

Piştî Cegerxwîn bi hin gundyên xwe re ji bo xwendinê derket derveyî Hesarê û ew weke deryanekê pêvajoya jiyana wî guhert.<sup>15</sup>

Cegerxwîn bi riya helbesta xwe CIHÊ XWENDINAMIN<sup>16</sup> gelekî barê şopandina tevgera xwe li me hesanî kir, bi berçavkirina navê gund, bajar û welatên ku çûye wan (Tirkîyê, Sûrî, Iraq, Îran), ew van navan dibêje: Hesarê, Sînanê, Elîparê, Dêrikê, Ewêna, Şêxyûsivê, Amûdê, kercosê, yemancixê, Til Şe'îrê, Şaxê, Bîrêjê, Ajgê, Siktanê, Qelesincê, Tutmê, Gelaleyê, Xelanê, Sinceqê.<sup>17</sup>

<sup>13</sup>- Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 163.

<sup>14</sup>- Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r. 50, 58,59.

<sup>15</sup>- h.b., r. 83- 84.

<sup>16</sup>- Cegerxwîn, **kîme Ez**, ç.1, Beyrût 1973, r. 310 – 312.

<sup>17</sup>- Piraniya van gundan li deşta Amedê, Mêrdînê, Cezîra Sûrî (Binxetê) ne û hin jî li Kurdistana Îraq û Îranê ne.

Li gel piraniya cihên ku Cegerxwîn lê xwendiyê ji Sînanê dest pê bike ta di Amûdê re derkeve ew nade mendelê ku sê cihan bandoreke kûr lê kirine û şûna xwe li jiyana wî ya kesayetî û ya wêjeyî de hiştine, ew jî ev hersê cih in: Dêrka çiyayê Mazî, Tel Şeîr û Amûdê.

Dêrik berê qaimqamî bû û navê wê Şebextanê bû, wê cihekî xwe di dilê Cegerxwîn de girtibû ew jî ji ber ciwanî û xweşiya wê ku li gorî pesnê Cegerxwîn dişibe Gûta Şamê û ji alîkî din ve Mele Iskender lê bû, ewê ku li seranserî Kurdistanê bi zanist û hişmendîya xwe nav da bû û wî bi xwe serpereştiya xwendina Cegerxwîn dikir, li gel ku dîsa Cegerxwîn bi xwe dibêje ku ciwanî û spehîbûna keçên Dêrikê dihişt ku xelk û ew jî bibin evîndarên vî bajarî,<sup>18</sup> ew bi xwe jî bi dînîtî bûbû evîndarê vî bajarî û bi can û laş pêve hatibû girêdan; çiku wî ji porzereke Dêrikî hez kiribû û dilê wî dizwest ku pê re bizewice, lê ji hejarî û desttengîya xwe ew evîn jê re diyar nekir.<sup>19</sup>

Tel Şeîrê ew gundê dûr ku dikeve rojhilatî Qamişlo nêzikî 20 km, di wê demê de navendeke çandî û siyasî bû, bandoreke xwe li hinav û jînenîgariya Cegerxwîn hişt, li wir pileyeke zanistî ji mamosteyê xwe Mele Brahîm wergirt û bû mezintirîn ê feqehan di dibistana Tel Şeîrê de û li wir bi du navan hat naskirin; Mele Şêxmûs û navê wî yê nepenî Cegerxwîn ê ku wî ji xwe re bijart.<sup>20</sup> Ew di helbesta xwe EZÛ GUNDÊ HESARÊ de dibêje ku wî ev nav ji çîroka Ehmedê Xanî ya giranbuha Mem û Zîn stendiye:

*Ji bo jîn û felatê*

*Ketim nav kêferatê*

*Ji çîroka Mem û Zîn*

*Navê xwe kir Cegerxwîn*<sup>21</sup>

Cihê sêyem ku bandoreke xwe taybet li Cegerxwîn hişt Amûdê bû. Tevî ku Amûdê bajarokekî biçûke jî lê ew ji zanistê re menarak bû û yek ji navendên giring

<sup>18</sup> - Cegerxwîn, *Jînenîgariya Min*, r. 88, 91.

<sup>19</sup> - h.b., r. 107, 109.

<sup>20</sup> - h.b., r. 130- 131.

<sup>21</sup> - Cegerxwîn, *Şefaq*, ç.1, weş. Roja nû, Stockholm 1982, r.96.

bû ji zanistên olî re û zanyarin olê lê bûn ku li ser asta Kurdistanê deng dabûn hebûn, mîna "Mele Ubeydillahê Seyda", yê ku bi awakî erênî bandora xwe li Cegerxwîn kir û berê wî da wêje û helbestê dema ku li ber destê wî dixwend.

Di rojên hejarî û ne xweşiyên wî de Amûdê Cegerxwîn û malbata wî himbêz kirin û li wir diploma zanistên olî wergirt û nasnavê "Seyda"<sup>22</sup> hilgirt, vê yekê pêvajoya jiyana wî bi tevayî guhert û rê li ber vekir ku bi serbor û serpêhatiyin nûtir bijî û asoyin ferehtir li ber vebin û ew ji jiyaneke nû re amade kir ku bi mejî û şeweyin nû xwe berde nav pêlên wê.<sup>23</sup>

Heger Mele Iskender li Dêrikê û Mele Êbeydullahê Seyda li Amûdê roleke mezin di fêrkirina Cegerxwîn de lîstibin, lê hin din jî hene ku wî xwendina xwe li ber destên wan kiriye û ji wan fêr bûye, mîna: Mele Ebudilhelîm kurê Mele Sma'îlê Îşê li Amûdê<sup>24</sup>, Mele Mihemedê Pîran li Amûdê<sup>25</sup>, Mele Necmeddîn kurê miftiyê Midyadê li Kercosê<sup>26</sup>, Mele Fethellahê Seyda li Sinceqa Emîn nêzîkî Amûdê<sup>27</sup>, Şêx Ehmedê Xeznewî li gundê Xezna nêzîkî Qamişlo<sup>28</sup>, Mele Birahîm ji gundê Sîha nêzîkî Xezna<sup>29</sup> û Şêx Kemal ji malbata Şêx Hamid (Şah Mardîn) ji gundê Ehmediyê.<sup>30</sup>

Sala 1927an Cegerxwîn bi keçxala xwe Kehla Selîm re zewicî<sup>31</sup>, du law jê re bûn (Cemşîd û Xorşîd) û mirin; yek ji wan sala wî ne qediyabû û yê din sê salî, hingê Cegerxwîn melayê gundê Hasda jorîn bû<sup>32</sup>, rewşa wî ya aborî baş bûbû, lewra li wir jiyana xwe domand û ji wir bar nekir, ma ta sala 1936an û bi alîkariya Haco axa du

---

<sup>22</sup>- Ew di sala 1928an de bû, seyda bi wateya mamoste tê, mebest jê temamkirina zanistên olî bi her 12 pileyên xwe, ji wan digotin (melayê dwazde ilmî, yan jî melayê muntehî). Ji heqê kesê ku vê diplomê distîne ku dersan bide (feqehan) û dibistaneke taybet li gundekî yan li bajarekî veke û diploman jî bide wan.

<sup>23</sup>- Cegerxwîn, **JînenîgariyaMin**, r. 177-179.

<sup>24</sup>- h.b., r. 93.

<sup>25</sup>- h.b., r. 183.

<sup>26</sup>- h.b., r. 127.

<sup>27</sup>- h.b., r. 178.

<sup>28</sup>- h.b., r. 137.

<sup>29</sup>- h.b., r. 136.

<sup>30</sup>- h.b., r. 202.

<sup>31</sup>- Keyo Cegerxwîn, "**Cegerxwîn**", kov. Nûbûn, j. 74, sal: 2006, r. 41.

<sup>32</sup>- Cegerxwîn, **JînenîgariyaMin**, r. 183 - 184.

gund ji xwe re ava kirin (Çêlek û Cehenem) herduwên nêzîkî Amûdê û li wan bi cih bû.<sup>33</sup>

Ji çaxê ku li Hasdê bû û ta ku hat herdu gundên xwe jî, Cegerxwîn serî ji Amûdê qut ne dikirin, çiku têgehî nû derbasî hiş û bîra wî dibûn; ew hestê netewî kurdî bû, ew hestê ku di nabêna 1923- 1924an de li ser destê Şewqî Ergenî li çiyayê Qereçdaxê (başûrî rojavayî wîlayeta Amedê) der bû û piştî şoreşa Şêx Seîdê Pîran 1925an gurtir bû û wî xwe berda nav xebata siyasî ta ku di sala 1937an giha jor dema ku yaneyek (kilûpek) kurdî li Amûdê vekir û yekemîn car bû ku dest bi fêkirina xortan kir ew hînî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî dikirin.<sup>34</sup> Ê kesin hebûn roleke baş di piştgiriya yaneyê û pêşxistina wê de lîstin li gel piştgiriya hizr û ramanên Cegerxwîn ê netewî de, mîna Mele Hesenê Kurd (Hişyar), Ebdulqadirê Têlo (Evdê Xerrat) û Şêx Beşîr.<sup>35</sup>

Kesê ku bi xurtî û bandoreke yekser li şêweyê kar û xebata Cegerxwîn hişt Şêx Mihemed Mihdî bû; birayê Şêx Seîdê Pîran; yê ku hişt ku ew bi nerîneke riyalî û dûrî xerafetan li olê binere.<sup>36</sup> Yekemîn car li Mûsilê ew nas kir, dema ku şagirt bû xwendina olê didomand, berî ku careke din li Amûdê hev bibînin û gelek danûstendin di mijarên netewî û olî de kirin û çawa karibin xizmeta gelê Kurd bikin û wî ji nezaniyê derxin ber bi jiyaneke paktir de.<sup>37</sup> Vê yekê bandoreke xuyayî li kesayetiya Cegerxwîn hişt, ta asta ku şaşik û cibbe avêtin û nimêj û rojî berdand û cilên ewropî li xwe kirin û kum/şefqe dan serê xwe da jiyaneke nû bi fikreke nû û şêweyekî nû dest pê bike.<sup>38</sup>

Weha jî Cegerxwîn bi alîkariya Ebdulqadirê Têlo roleke mezin û berçav di avakirina komeleke xêrxwaziyê de lîst, ji bo alîkariyê bi feqîr, nexweş, sêwî, koçber

---

<sup>33</sup> - h.b., r. 211 - 213.

<sup>34</sup> - h.b., r. 68.

<sup>35</sup> - h.b., r. 185- 190 .

<sup>36</sup> - h.b., r. 185.

<sup>37</sup> - h.b., h.r.

<sup>38</sup> - h.b., h.r.

û girtiyên kurd re, ew komeleya ku dûvre bû komeleke fermî mezin û Hesenê Haco û Şewket Zilfi beg ew bi rê ve birin û baregiha wê li Heseke bû.<sup>39</sup>

Sala 1945an bûyerin diramafîkî li gundê Çêlekê bûn, pevçûn li ser erd û milk qewimî, çendek hatin kuştin û hin birîndar bûn, di encam de kesek bi navê Yûnan Hedaya bi alîkariya hin gundiyan dest danîn ser milkê herdu gundan, dawî Cegerxwîn ji herdu gundan barkir û bi alîkariya Silêmanê Hecî Hesen (axayê omeriyan) çû gundê Heremê Şêxo (nabêna Qamişlo û Amûdê) û ji wir jî çû Topiz ba xwarziyê xwe Mele Elî.<sup>40</sup> Li wir jî dom nekir, sala 1946an çû li Qamişlo bi cih bû.<sup>41</sup> Di destpêkê de pir zehmetî dîtin di ber zorbûna rewşa abûrî ku tere derbas dibû. Dûvre Kamîran Bedirxan bi riya Dr. Ehmed nafiz re 300 lîre jê re şandin bo ku alîkariyê ji kovaraku li Lubnanê derdixist bide hev. Cegerxwîn pir bi wê şad bû û bi hezaran lîre dan hev, lê wê rewşê jî dom nekir ji ber kovar hat girtin.<sup>42</sup>

Di vê qûnaxê de piştî Cegerxwîn erdê xwe firot bazirganiya genim kir, lê ew tê de bi ser neket û di encam de tiştê di dest de hebû jî çû û bihtir jar û belengaz bû.<sup>43</sup>

Di riya komele ya Xweybûn re Cegerxwîn bi çend rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd (Qedrî Beg ê Cemîl Paşa, Dr. Ehmed Nafiz Beg, Zilfi Beg, Arif Ebbas, Osman Sebrî, Qedrî Can û Reşîdê Kurd, ...) re xwe berdabû nav cenga siyasi<sup>44</sup>, ev komele ya ku bandoreke wêyî mezin di hişyariya hişmendiya netewî kurdî de hebû.<sup>45</sup> Di sala 1946an de ewê beşdarî di damezrandina "Civata Azadî û Yekîtiya Kurd" de kir, ta ku Dr. Ehmed Nafiz serekê wê bû, Cegerxwîn sikreter û Arif Ebbas xiznedar bû û (Evdirehman Axayê Eliyê Ênis, Mele Elî, Feqe Mele Elî, Hecî Yûsiv,....) ji endamên wê komelê bûn.<sup>46</sup>

---

<sup>39</sup>- h.b., r. 202-203.

<sup>40</sup>-h.b., r. 211-213, 233, 234, 241.

<sup>41</sup>- h.b., r. 242. - Keyo Cegerxwîn, h.g, r. 41. Nezan, h.j, h.l.

<sup>42</sup>- Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r. 269.

<sup>43</sup>- h.b., r. 275-276.

<sup>44</sup>- h.b., r. 177.

<sup>45</sup>-b.f. bnr. Şêrgoh Belecêl-Qedîyetu'l-Kurdîye- Madî'l-Kurdî we Hadirehom-(Cem'îyetu Xoybûn el-Wetenîyetî'l-Kurdîye), Rabîtu Kawa li's-Seqafeti'l-Kurdîye, daru'l-Kîtab, Beyrût 1986.

<sup>46</sup>- Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r. 263-264.

Di sala 1949an de markisîzmê bandoreke xurt di hişê Cegerxwîn, raman û pêvajoya wî de hişt, ew tevî partiya Komonist a Sûrî bû<sup>47</sup>, ew partiya ku bihtir milet xwe di wê demê de li dor dida hev û ji ber endamtiya wî û helwistên wî yê netewî çendê caran hat girtin û binçavkirin; yekemîn car di sala 1949an de bû, dema Şîkrî Qewetî<sup>48</sup> serokê Komara Sûriyê ya yekem (1943-1949) dûvre (1955-1958).<sup>49</sup> Cegerxwîn endamekî çalakvan bû di nav komonistan de, tiştê ew gurr fikir baweriya wî ya xurt bi prensîpên sosyalîstê bû ku wê rojekê li welatê wî pêk bê û di riya wê re Kurd serbest û azad bibin û bighêjin mafên xwe, endamtiya wî hişt ku ew gelek kesayetiyên siyasî markisî li pir bajarên Sûrî nas bike, mîna: Xalid Begdaş; serokê partiya komonist, Brahîm Bekrî, Ehmed Miheffel, Ebdilkerîm Teyyara... ûhd.<sup>50</sup> Sala 1950î de bû endamê komela "Aştîxwazên Sûriyê" u ew bû sedem ku ev kes jî bibin endam: (Mele Şêxmûsê Girzîn "Qerqatî", helbestvan Mele Ehmedê Namî, Mele Hesîb, Mele Ebdilmecîd, Osman Sebrî) ji Cezîrê û (ReşîdHemo, Elî Xoce, Şewket Hennan, Xelîl Mihemed û Misellem Mihemed) ji Kurdaxê.<sup>51</sup>

Ji ber dengvedana navê Cegerxwîn di nav kurdan de, partiya Komonist di sala 1954an de ew û Brahîm Bekrî wek nûnerên parizgeha Cezîrê ew kirin berbajarên xwe bo hilbijartinên perlemanî. Xuyaye ku Cegerxwîn di wê demê de nêzîkî partiya Komonist bû ne endamekî fermî bû, ev yek ji guftûgoyên ku di serokatiya partiyê bûn diyar dibe<sup>52</sup>, tevî ku ew di Cezîrê de bi ser neketin.

Piştî Cegerxwîn bi Mele Şêxmûsê Girzîn (Qerqatî) û Mele Şêxmûsê Şêxî re (Benda Azadî) damezrandin, ew jî weke bersivê li hemberî helwistên partiya Komonist ji doza kurdî re hat. Wan ne xwestin partiyeke komonistî kurdî ava bikin, ji ber baweriyên xwe ku nabe du partî komonist di yek welatî de hebe.

---

<sup>47</sup> - h.b., r. 263-264.

<sup>48</sup> - Serokê komara Sûriyê nabêna (1943 - 1949) û (1955 - 1958).

<sup>49</sup> - Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r. 290-291.

<sup>50</sup> - h.b., r. 290-292.

<sup>51</sup> - h.b., r. 284-285.

<sup>52</sup> - h.b., r. 291.

Ma di "BendaAzadî" de kar û xebata xwe kir ta ku tevî Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyê bû<sup>53</sup>; ya ku sala 1957an hat damezrandin.<sup>54</sup>

Di sala 1959an de ji ber ku ewlekariyê dewletê lê digeriyan, Cegerxwîn neçar bû ku xwe veşêre û ji malekê here malekê (mala Cemîlê Brahmê Mehmûd, mala Haco Axa, mala Mûsa yê fileh keyê -muxtarê- gundê Demxiya), lê ev rewş pê giran bû, lewra Sûrî berda û berê xwe da Iraqê, di 20.04.1959an de sînor derbas kir, di xweşbûna têkiliyên Kurd û ereban de piştî şoreşa 14ê Tîrmeha 1958an.<sup>55</sup> di sala 1959an de bû mamosta di zanîngeha Bexdadê –beşa kurdî-de.<sup>56</sup>

Li wir têkiliyên xweş û fereh bi hin siyasetmedar, rewşenbîr û nivîskara re danîn (Ebdellah Goran, Elauddînê Sicadî, Dr. Seddîq Etrûşî, Dr. Ezîz Şemdîn, Dr. Mihemed Salih Mihemed, Pakîze Refîq Hilmî, Dr. Ebdurrehman Qasimlo, Xalid Neqîşbendî, Ebdilcebbar Ebdellah û Mihemed Mihdî Mexzûmî) û di pêşiya wan de Mele Mustefa Barzanî (1903-1979), yê ku di gelek helwistan de piştgiriya wî kir.<sup>57</sup>

Di sala 1961ê de û ji ber nakokiyên di navbera hikûmeta navendî li Bexdê û serokatîya şoreşa kurdî de derbûn û piştî ku hikûmetê xelek li kurdan û çalakiyên wan teng kir, Cegerxwîn ji mamosteyê hat dûrxistin û jê hat xwestin ku ji Bexdad derkeve, neçar bû ku sala 1962an vegere Sûrî<sup>58</sup> û demeke kurt hat binçavkirin û piştî berdana wî ji girtîgehê hat Qamişlo. Xwest vegere nav partiya xwe (Partiya Demokrat a Kurd li Sûrî) ya ku endamtiya xwe dema li Bexdad bû, rawestandî bû, dît ku Partî biryara rawestandina wî derxistine ji ber ku zû rapora xwe bo xwesteka vegeerê pêşkêşî wan ne kiribû û ew weke dostê partiyê hesêb kirin.<sup>59</sup> Di wê demê de

---

<sup>53</sup>-h.b., r. 326-327.

<sup>54</sup>- b.f. li ser damezrandina Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyê, bnr.Muhemmed Mela Ehmed, **Sefehaton Min Tarîxi'l-Hereketi'l-Kurdîye**, menşûrat Rabîtetu Kawa, Erbil, 2001. - Ebdulhemîd Derwîş Edwa-on 'Eele'l-Hereketi'l-Kurdîyefî fî Sûriya (1956-1970), 2003. - Elî Salih Mîranî, **el-Hereketu'l- Qewmîyefî'l- Kurdîye fî Kurdistan Sûriya (1946-1970)**, Metbe'etu Wezaratu't-Terbîye, Erbil 2004.

<sup>55</sup>- Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r. 330-331.

<sup>56</sup>- Keyo Cegerxwîn, h.g, r. 41.

<sup>57</sup>- Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r. 342, 343, 346.

<sup>58</sup>- h.b., r. 328.

<sup>59</sup>-h.b., h.r.

Cegerxwîn careke din hat girtin –ta nema tê bîra wî bê çend caran hatiye girtin- û xistin hebsa Mezzê û di paş re ew surgûnê Swêda ya başûrê Sûriyê kirin.<sup>60</sup>

Sala 1967an Partiya Demokrat a Kurdî civîna xwe ya fereh li Helebê li dar xist û wê çaxê şand dû wî da amade bibe, berbijartiya wî bo komîta navendî hat pêşkêşkirin û bi dengî pir bilind ew endamî wergirt.<sup>61</sup>

Sala 1969an biryar da ku biçe Kurdîstana Iraqê, şoreşa kurdî li wir li darbû. Pirtûkek li ser vê şoreşê nivîsand, lê winda bû. Sala 1970yê dîsa vegeriya Sûrî<sup>62</sup> û him ji neçarî û him ji bo çapkirina hin pirtûkên xwe sala 1973an çû Beyrûtê, da ji wir vegere Şam û bi cih bibe û karê xwe wek endamê polîtîbîro di Partiya Demokrat a pêşverû ya Kurdî de karê xwe bike, ta ku di 03.08.1979an de ji wir koçberî dewleta Swêd bû, ew çûn bi alîkariya Nûvîn Hersan bû, ya ku bi hemû kar û barê çûna wî rabû û li Stokholm a paytext bi cih bû. Li wir wek nûnerê partiya xwe çalakiyên xwe yê siyasî berdewam kir, li gel çalakiyên çandeyî. Li gelek dewletên europî geriya mîna Frensa, Elmanya, Nerwîj, Rûsya (Yekîtiya Sovyet a berê) ûhd.. pir kongirên bo kurdan û doza wan hazir dibû û gelek nivîskar, rewşenbîr siyasetmedar û hunermendên Kurd dîtin, mîna Qenatê Kurdo, Yilmaz Gonê, Casimê Celîl, Ordîxanê Celîl, Şivan Perwer, Mehmûd Baksî, Lutfî Baksî ûhd...

Ma li Swêd ta ku dilê wî di roja 22.10.1984an de rawestiya û xatirê dawî ji jina xwe Kehla û zarokên xwe (Keyo, Sînemxan, Gulperî, Rojîn, Sûad, Azad û Selam xwest. Roja 05.11.1984an laşê Cegerxwîn giha Qamişlo da ku bi xwepêşandaneke ku berî wî wextî li wir ne bûbû bê oxirkirin û li gorî wesiyeta wî di hewşa mala wî de bê binaxkirin<sup>63</sup>.

Li gel ku helbestvan bû, Cegerxwîn –weke zarokên wî dibêjin- mînak bû weke bavekî dilovan, diltenik, nefsbîçûk, nerîna kesê himberî xwe dipejirand û

<sup>60</sup>- Keyo Cegerxwin, h.g, r. 41. - Nezan, h.j, h.l.

<sup>61</sup>- Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r. 328.

<sup>62</sup>- Keyo Cegerxwin, h.g, r. 41-42.

<sup>63</sup>- Salih Kobanî, "**Ji Hesarê ta Siwêdê**", Belgefilmek li ser jiyana Cegerxwîn, Kurdistan TV, (m.w. 05.12.2014) <https://www.youtube.com/watch?v=d-l2MyxjxW0> (m.j. 07.11.2015).



rêzgirtina wî ji wan re hebû, zarokên xwe li ser hezkirina welat rakirin, welatekî azad û bi rûmet.<sup>64</sup>

Helbesta wî EZÛ YARÊ bihtirîn helbeste ku kurtejiyana wî bi hemû qûnaxan berçav dike; helbesteke dagirtiye bi rewanbêjiya xwe, bi wêneyên hunerî, sembolên xwe, nîşan û delaletên xwe, di vê helbestê de vînbaziya xwe ji Yarê re diyar dike û dixwaze bighê, lê ew qebûl nake, tevî ku helestvan daxwazên wê pêktîne jî lê ew li ser ya xwe dimîne, ew şert û mercên wê pêk tîne; ji hejarî û feqîrtiya zaroktiya xwe xelas dibe, diçe dixwîne, şaşik û cibbê werdigre, ji gundekî diçe gundekî û ji bajarekî diçe yekî, şaşik û cibê tavêje, dibe bajarî, tê girtin û surgûnkirin... û hê jî yar qebûl nake. Di dawî diyar dibe ku yara wî welateke azadbûyî dixwaze:

*Berî çil sal me yar xwest û bi xeyd go sêwiya nakim*

*Me go başe û bûm xwenda, me go vê car*

*Go qurban, ma nizanî ko tu carî birçiya nakim*

*Gelek başe û bûm seyda, me rî û cibe wergirtin*

*Go seyda ma nizanî ez mela û sofiya nakim*

*Me go başe û çûm bajêr ketim zindan û sêlûlan*

*Bi ken go ma nizanî ez tu carî girtiya nakim*

*Me rih û cibe avêtin û me go îcar tu nabê çi?*

*Go seyda ez misilmanim tu caran êzdîya nakim*

*Me go başe û çûm Bexda me ders gotin, me go îcar?*

*Kenî û go nizanî ez tu caran feqîr û xwîniya nakim*

*Me go carek tu guh nadî li ah û qîr û nalînan*

*Go heta kurd nebî serbest bi ahû zariya nakim*<sup>65</sup>

<sup>64</sup> - Ibrahîm el-Yûsif, "Hîwar me'e Keyo Cegerxwîn re", Malpera welatême, (m.w. 02.11.2014), <http://www.welateme.co/cand/modules.php?name=News&file=article&sid=5188#.Vpd0PvkrLIU> (m.j. 14.10.2015).

<sup>65</sup> - Cegerxwîn, *kîme EZ*, r. 106.

## 1. 2. Pêvajoya Wêjeyî:

Ji destpêka hînbûna xwe ya xwendinê de, Cegerxwîn guhdan bi xwendina helbestê dikir û bi taybetî Melayê Cezîrî û Ehmedê Xanî. Ew bi xwe dibêje ku herduwan bandoreke mezin li helbest û şêwenivîsa wî kirine, nemaze li herdû dîwanên wî yên pêşî. Derketina ji bin baskên wan pir zor bû ji ber ku Cegerxwîn zêde bi wan ve hatibû girêdan; di helbesta xwe ya bi navê "Ji Wanî re" ku ji helbestvanê kurd ê hevdemê xwe Wanî re nivîsandibû, berê xwe dide xelkê û ji wan re dibêje ku herdu Ehmedan (Cezîrî û Xanî) ew ji wan re kirne rêber û rênas:

*Du Ehmed, min ji bo we kirne rêber*

*Cizîrî yek ewê dî Xaniyê min*<sup>66</sup>

Cegerxwîn destpêka xwe di nivîsandina helbestê de bi bîr tîne, ku Dêrik ji wî re maka peyxamê bû û helbestên pêşî li wir nivîsandin, ji wan ew helbesta ku li xwe û feqehên hevalên xwe nivîsand, dema ku Mele Yûnis para wan û şivanên gund bi hev re danîn û ew ji xwarinê pê par kirin. Ew helbest şanî mamostayê xwe Mele Iskender da, kêfa mamoste pir jê re hat û daxwaza berdewamiyê lê kir û got ku wê di pêşerojê de xwedî kedeke giranbuha be. Ji wê helbestê ji van herdû malikan pêve nema tên bîra Cegerxwîn:

*Ehmedê Qêsim şehê bê kevçî ye*

*Li bin siya darê tenê rûniştiye*

*Mele Elî zû gazî Haris, Hemo kir*

*Gotî: "Em çûn win werin teşbîhê gur"*<sup>67</sup>

Weha jî mamostayê wî Ubêdillah Seyda şanaziya xwe bi helbestên wî yên pêşî nişan kir, ta ku di nabêna helbesta wî û yeke Cizîrî de şaş maye, nav tê da ku di nivîsandina helbestê de berdewam bike, çikû pêşerojeke geş di meydana helbestê de li bende ye.

Ev tiştên ku hevdemên wî li ser dibêjin, lê Cegerxwîn bi xwe dibêje ku helbesta yekem wî li gorî terza Ehmedê Xanî hûnabû û Şêx Elî Rîza lawê Şêx Seîdê

<sup>66</sup> - Cegerxwîn, *Pirîsk û Pêtî*, r. 95.

<sup>67</sup> - Cegerxwîn, *Jînenîgariya Mîn*, r. 91-92.

Pîran di hevdîtina li Kurdistana Iraqê de 1926 – 1927an ji dest wî girt bi hêviya ku karibe li Bexdadê çap bike, lê ew hêvî bi cih nebû û ew berhem windabû.<sup>68</sup>

Bi berdeamiya wî di nivîsandina helbestê de hêdî hêdî navê Cegerxwîn belav bû, stêra wî şewq dida, ta ku mîr Celadet serdanekê hat bajarê Amûdê. Hingî mele Ubêdillah Seyda nexweş bû, Mîr çû serdana wî û xwest ku Cegerxwîn bibîne. Di hevdîtîna de Mîr ji Cegerxwîn xwest ku hin helbestên xwe jê re bixwîne, piştî guhdar kir, kêfa wî pir hat û jê xwest ku ji kovara Hawar re bişîne Şamê, piştî ku di şîreta xwe de jê xwest ku terza Xanî ya destaneyî berde. Cegerxwîn bawerî bi nerîna Mîr anî û bi ya wî kir<sup>69</sup>. Weha helbestên Cegerxwîn riya xwe di pîrr hejmarên Hawarê de dîtin.<sup>70</sup>

Mîr Celadet Bedirxan bi xwe serpereştiya çapa dîwana wî ya pêşî "Pirîsk û pêtî" kir û pêşgotinek jê re danî, danasîneke xweşik ji helbestvan û helbesta wî re da û diyar kir ku Cegerxwîn bi helbestê du dijminên mezin û destdirêj di civakê de ji xwe re çêkirin; ew jî rêberên olî (şêx û mele) û xwedî pere (beg û axa) bûn, dema di helbesta xwe de şerê adet û baweriyên hene dikir, ew ên ku şêx û mela piştgiriya wan dikirin, weha jî karên beg û axa di xwarina keda jar û cotkaran de rût û riswa dikir û eşkere di ruwê wan karan de disekinî. Helbestvan Qedrî Can jî di pêşgotina vê dîwanê de vê yekê tekez dike û diyar dike ku nirxa helbesta wî ya rast di şêwenivîsa nû di êrîşa raman, têgeh û adetên kevin de bi zimanekî gelêrî, rewşa û hesan ku her kes jê fêhm dike û dît ku ew çêtirîn nûnere ku giranbuhaya canê Xanî û helbestvaniya Cezîrî hilgirtiye û ew valabûna paş wan wê Cegerxwîn karibe dagire, Q. Can dibêje:

"Ji mêj de, dîwana Cizerî û Mem û Zîna seydayê Xanî, ji meydanê kêmbû bûn. Heweskarên şeir û edebiyata kurmancî li wan digeriyan û bi dest ne diketin.

Vê carê me dî, ji nişkave, dîwana Cegerxwîn, bi çapeke pir qenc, kete meydanê. Ez bawer dikem ku dîwana Cegerxwîn dewsa ku Mem û Zîn û dîwana

<sup>68</sup> - Cegerxwîn, **Jînenîgariya min**, r.170.

<sup>69</sup> - h.b., r.178.

<sup>70</sup> - kov. Hawar, Çapxana Tereqî, Şam, sal: 1932 (j. 4, r. 6), (j. 5, r. 7), (j. 6, r. 4), (j. 9, r. 6), (j.10, r. 3, 5-6), (j. 11, r. 8), (j. 13, r. 3, 5), (j. 14, r. 2), sal: 1933 (j. 16, r. 3-4), (j. 18, r. 5), (j. 19, r. 4-5), (j. 20, r. 12), (j. 21, r. 8), (j. 22, r. 1-3, 8), (j.23, r. 6), sal: 1934 (j.24, r.7), (j. 25, r. 4), sal: 1941 (j. 27, r. 6), (j. 28, r. 7-8), (j. 29, r. 9), (j. 30, r. 6), (j. 31, r. 6), sal: 1942 (j. 39, r. 9), (j. 51, r.4), sal: 1943 (j. 52, r. 4, 8, 11), (j. 54, r. 2), (j. 57, r. 4, 6).

Cizîrî vala hiştine ewê tije bike. Xwendevanê delal, ewê tê de ziman û rûhê cenabê Xanî ê xurt û nezma dîwana Cizîrî a ahengdar bibîn".<sup>71</sup>

Ev dîwan di nav piraniya kurdan de xweş belav bû û bi awakî taybet di nav kurdên Sûriyê de, navê wî di nav gel de cih girt û bû naskirîtirîn helbestvan di nav kurdan de. Li gel dijatiya wî ya xurt ji şêx û mele û axan re, hin şêx û axeyên welatperwer piştgiriya wî dikirin û alîkarî bi dest û bi dev pêre dikirin, mîna Şêx Ehmedê Xeznewî û Haco Axa yê ku bi guhdarkirina li helbestên wî pir dilxweş dibû û nav tê dida ku helbestê binivîse tevî ku dijî kirinên wane. Di bîranînên xwe de Heznî Haco dibêje ku dema ew 5 – 6 salî bû birayên wî yên mezin helbestên Cegerxwîn ên welatperwerî yên dîwana yekê tev ezber kiribûn û wan helbestan bandora xwe ya xurt li hezarên keç û xortên kurd kir û roleke baş di geşkirina hoşyariya netewî de leyist.<sup>72</sup>

Bi derçûna yekemîn dîwana wî re bihtirî ji helbestbêjekî ji helbestên Cegerxwîn re berz bûn, helbest bi awazek xweş ezber dikirin da di rûniştin û şevbuhêrkên xwe de bêjin, ji wana Xemo yê dengbêj ê ku di piraniya serdan û şevbuhêrkên wî de xwe jê bernedida<sup>73</sup> ûsivê Evdê ji Tel Şeîrê û ji Amûdê Şêx Sedrî yê Huseynî, Mele Evdê Kurumî û Mîr Hac û ji Qamişlo Helîmê Hûçik û Salihê Silo ku hê li jiyanê ye (2016).<sup>74</sup>

Di vê demê de Cegerxwîn guhdan binivîsandina çîrokê kir û sala 1948an de yekemîn çîroka wî bi navê Cîm û Gulperî li Şamê derket.<sup>75</sup>

Di salên pêncî yên sedsala bîstan de, bayê ramanên komonîstî li Rojhilata navîn rabû û herêma ket bin bandora wan, ev yek bi zelalî rengê xwe di ramana Cegerxwîn de veda; di helbestên dîwana wî ya duwemîn a ku sala 1954an li Şamê bi navê "Sewra Azadî" derket, berevajî dîwana pêşî ku tije hest û canê netewî bû. Di pêşgotina dîwanê de siyasetmedar û torevanê Kurd Osman Sebrî pesnê Cegerxwîn

<sup>71</sup>- Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. VIII.

<sup>72</sup>-Heznî Haco, **Tê Bîra Min**, weş. Avesta, Stenbol 2007, r. 63-65.

<sup>73</sup>- Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r. 211.

<sup>74</sup>- Min ev pêzanî ji hevdiştinê kesayetî bi hin nivîskar û helbestvanên hevdemên Cegerxwîn girtine; mîna nivîskar Dehan Edilfettah û helbestvab Xelîl Saûnî.

<sup>75</sup>- Cegerxwîn, **Cîm û Gulperî**, ç. 1, Şam, 1948.

dide ku wî nexweşiyên civaka xwe xweşik naskirine û berçav dike û armancên wî xuya û zelal in û helbestên wî xweştir û têgihîştîtirin ji helbestên dîwana pêşî.<sup>76</sup>

Hêdî hêdî helbestên Cegerxwîn bûn beşekî giring ji jiyana siyasî ya kurdî û kêfa siyasetmedarên kurd hingê gelekî ji helbestan re dihat, ji ber ku bandoreke xwe li hoşyariya xelkê dikirin. Siyasetmedarê kurd Selah Bedreddîn danpêdanê bi vê yekê dike û kêfxweşiya xwe bi Cegerxwîn û helbestên wî tîne "weke helbestvanekî bi zimanê xortên tiyên pêşketn, nûjenî û zanîne helbestan dibêje û dihûne".<sup>77</sup>

Cegerxwîn nas kir çawa derbasî hinavên xelkê bibe û bandora xwe li hest û ta li şeweyê ramana wan jî bihêle, ewî "helbestên xwe ezber dikirin û mîna Homîros bi stiranî digotin", weke ku siyasetmedarê kurd Nûreddîn Zaza dibêje.<sup>78</sup>

Cotkarên kurd li terz û awayê ku pê helbest digot ecêbmayî diman, nemaze ku di gasîneke giştî de ba; ewî kursiyek li orta gasîne datanî, hildikişiya ser û dest bi gotina helbesta xwe dikir. Ewan goman dikirin ku dînbûn gihaye Cegerxwîn, Nûreddîn Zaza dibêje ku çendê carn ewî bihîstiye ku xelk bi serhejandin dibêjin: "Cihê mixabiniyê ye ku xortekî mîna vî spehî û ciwan weha dîn bibe!".<sup>79</sup>

Li gel helbestê Cegerxwîn nivîsandina çîrokê jî dewam kir û di sala 1956an de duwemîn çîroka xwe "Reşoyê darî" derxist<sup>80</sup> û ji ber ku giringiya folklor û kelepûr di jiyana kurdan de naskiribû di sala 1957an de pirtûkek bi navê "Gotinên Pêşyan" çap kir.<sup>81</sup>

Cegerxwîn fêde ji mana xwe li Bexdayê kir wek mamosteyê zimanê kurdî, vî karî ew xist bin barê tecrîbeke nû de, pirtûkek rêziman bi navê "Awa û destûra zimanê Kurdî" sala 1961ê derxist.<sup>82</sup> Weha jî ferhengeke yek ziman (Kurdî-Kurdî) ji du cildan, sala 1962an li Bexdayê çap kir. Wî di pêşgotina cildê 2an de sedema

<sup>76</sup>- Cegerxwîn, **Sewra Azadî**, ç. 1, Şam 1954, r. II-III.

<sup>77</sup>- Selah Bedreddîn, **el-Hereketu'l Qewmîyete'l-Kurdîye fi Sûriya -Ru'yeton Neqdiyeton mîne'd-Daxilî**, Rabîtetu Kawa li's-Seqafetî'l-Kurdiyeyî, Beyrût/Erbîl 2003., r. 60.

<sup>78</sup>- Nûreddîn Zaza, **Heyatî'l-Kurdîye ew Serxetu's-Şe'bi'l-Kurdîyî**, ter. Ronî Muhammed Dumillî, daru Arass li't-Tîba'etî we'n-Neşrî, Metbetu Erbil, Erbil 2001, r. 67.

<sup>79</sup>- h.b., h.r.

<sup>80</sup>- Cegerxwîn, **Reşoyê Darê**, ç. 1, Şam, 1956.

<sup>81</sup>- Cegerxwîn, **Gotinên Pêşyan**, ç. 1, Şam, 1957.

<sup>82</sup>- Cegerxwîn, **Awa û destûrazimanê Kurdî**, Bexdad, ç. 1, 1961.

çapkirina ferhengê bi vê lez û bezê zelal kiriye; ew ji ber pêdiviya xwendekarên wî pê bû<sup>83</sup>, xuyaye cildê sêyemîn ku gerek bû derkeve, ji ber rawestana piştgiriya diravî derneket û weke di jînenîgariya wî de me berçav kir ewî zanîngeha Bexdad berda. Ev armanca karmendî ji çêkirina vê ferhengê bihtir ji daxwaza karekî di vî warî de diyar dike. Tevî kêmasiyên vê ferhengê ji aliyê rêbazî û hunerî ve û tevî ku hin rexnevan û nivîskaran rexneyên xwe li ser diyar kirine jî, lê dîsa giringiya wê dimîne, nemaze ew di demekê de derket ku pirtûkxana kurdî di vî warî de pir lawaz û qels bû û ew bû bingeheke xurt ji karê ferhengê re.<sup>84</sup>

Cegerxwîn nivîsandina helbestê berdewam kir û sûd ji endamiya xwe ya di Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê kir ku di sala 1973an de dîwana xwe ya siyemîn "Kîme ez" li Beyrûtê çap kir. Sekretêrê partiyê Ebdulhemîd Derwêş pêşgotina wê nivîsand, tê de pesnê Cegerxwîn daye; helbestvaniya wî, welatperweriya wî û nemaze hestên wî yên tenik di helbestên evînî de, çiku Cegerxwîn ne tenê helbestvanê dozê û konevaniyê bû, lê belê helbestvanê evîn û dildariyê jî bû. Cegerxwînê ramanmarkisî hê ew Cegerxwîn e yê ku xwe di herdû dîwanên pêşî de berçav kiribû.<sup>85</sup> Û di heman salê de çîroka xwe ya helbestî "Salar û Mîdiya" derxist.<sup>86</sup>

Nivîsandina Cegerxwîn pir bû, tevî rewşa aborî ya zor ku dest li qirika wî tanîn hev jî ew her bê hêvî ne dibû û ta kêlîkên dawî ji jiyana xwe wî dinivîsand; nikarîbû jiyana xwe bê nivîsandin biqedanda. Ewî helbest hûna û pirtûkek li ser terazûyên wê danî, çîrok, şano, ferhengeke yekziman, rêzimanê zimanê kurdî, dîrok nivîsand û weha jî çend berhem wergerandin zimanê kurdî. Hin ji wan di jiyana wî de li Şam, Begdad û Beyrûtê weke me nîşan kir û li Stokholmê piştî ku çû wir, hatin çapkirin, ku di nabêna salên 1980 – 1984an de çar dîwan çap kirin (Ronak 1980, Zend Avista 1981, Şefeq 1982, Hêvî 1983) û hin jî piştî wefata wî hatin çapkirin, da ku hejmara pirtûkên çapkirî jê re bighê 22 pirtûkan, ew li gorî tarîxa derçûna wan ev in:

<sup>83</sup> - Cegerxwîn, **Ferhenga Kurdî**, c. 2, Bexdad, 1962.

<sup>84</sup> - b.f. li ser vê ferhengê, bnr. Xalid Cemîl Muhammed, **Min Qedaye'l'Mu'cemîyetî'l-Kurdîyetî**, daru Rewafid, Dimeşq 2008, r. 77-112.

<sup>85</sup> - Cegerxwîn, **kîme Ez**, r. 5.

<sup>86</sup> - Cegerxwîn, **Salar û Mîdiya**, ç. 1, Beyrût 1973.

- 1- Dîwana Yekem, Prîsk û Pêtî, ç. 1, Şam, 1945. (helbest)
- 2- Cîm û Gulperî, ç. 1, Şam, 1948. (çîrok)
- 3- Dîwana Duyem, ç. 1, Sewra Azadî, Şam, 1954. (helbest)
- 4- Reşoyê Darî, ç. 1, Şam, 1956. (çîrok)
- 5- Gotinên Pêşyan, ç. 1, Şam, 1957. (lêkolîn)
- 6- Awa û destûra Zimanê Kurdî, ç. 1, Bexda, 1961. (rêziman)
- 7- Ferheng, Beşa Yekem, ç. 1, Bexda, 1962.
- 8- Ferheng, Beşa Duyem, ç. 1, Bexda, 1962.
- 9- Dîwana Siyem, Kîme Ez, ç. 1, Beyrûd, 1973. (helbest)
- 10- Salar û Mîdya, ç. 1, Beyrût, 1973. (çîrokek helbestî)
- 11- Dîwana Çara, Ronak, ç. 1, weş. Roja Nû, Stockholm, 1980. (helbest)
- 12- Dîwana Pênca, Zend-Avista, ç. 1, weş. Roja Nû, Stockholm, 1981. (helbest)
- 13- Dîwana Şeşa, Şefaq, ç. 1, weş. Roja Nû, Stockholm, 1982. (helbest)
- 14- Dîwana Hefta, Hêvî, ç. 1, weş. Roja Nû, Stockholm, 1983. (helbest)
- 15- Dîwana Heştâ, Aşitî, ç. 1, weş. Roja Nû, Stockholm, 1985. (helbest)
- 16- Tarîxa Kurdistan, c. 1, ç. 1, weş. Roja Nû, Stockholm, 1985.
- 17- Tarîxa Kurdistan, c. 2, ç. 1, weş. Roja Nû, Stockholm, 1987.
- 18- Folklorê Kurdî, ç. 1, weş. Roja Nû, Stockholm, 1987.
- 19- Jînenîgariya Min, ç. 1, weş. Apec, Stockholm, 1995.
- 20- Nivîsarek li serdîbaca Ehmedê Xanî, ç. 1, weş. Apec, 1995, Stockholm.
- 21- Şerefnameya Menzûm, ç. 1, weş. Amîral, Bêrûd, 1997. (helbest)

22- Tarîxa Kurdistan , "Împeratoriya/Dewleta kurdî Eyûbî", c. 3, ç. 1, weş. Roja Nû, Stockholm, 1999.

Hê 30 destnivîsên wî ne çapkirî hene, danîn û werger, ew jî li ba lawê wî Keyo ne li Siwêd.

**Pirtûkên Cegerxwî yên ne çapkirî:**<sup>87</sup>

- 1- Dîwana Seyday, Cizerî (şerih).
- 2- Dîwana Seydayê Ehmedê Xanî (şerih).
- 3- çend şorişên Kurdên kevnar.
- 4- Destûra Kurdistan ( helbest).
- 5- Awa û destûra zimanê Kurdî (Grmatik) bi latînî.
- 6- Hozan û torevanên Kurdistanê perçê 1 (tercume).
- 7- Hozan û torevanên Kurdistanê perçê 2 (tercume).
- 8- Ferheng (Latînî).
- 9- Kurd, Basîl Nîkîtîn (tercume).
- 10- Mînoriskî (tercume).
- 11- Lêkolîna li ser rojhilata navîn.
- 12- Hespên ristevanên Kurdistan.
- 13- Leyla û Mecnûn (tercume).
- 14- Li ser instîtîta Kurdî Li Lênîngrad.
- 15- ûsiv û Zelîxe (tercume).

---

<sup>87</sup> - Keyo Cegerxwin, h.g, r. 42-43.



- 16- Ristê hin ristevanan.
- 17- Gotinên Pêşiyân.
- 18- Hesenê • Mûsa (çîrok).
- 19- Nivîsar (Hin nivîsar).
- 20- çîroka xortê Îranî (tercume).
- 21- Dewleta Mahabadê (tercume).
- 22- Dewleta Eyûbî li Yemenê.
- 23- Çîrokên Kurdî.
- 24- Kêferat li ser Kurdistanê, Xalifîn (tercume).
- 25- Tarîxa benî Eyûb, perçê 1.
- 26- Tarîxa benî Eyûb, perçê 2.
- 27- Tarîxa benî Eyûb, perçê 3.
- 28- Baqîsmatê reş, çîrok (tercume).
- 29- Şûforê kemyona sor.
- 30- Dîwana Cegerxwîn 1927.

Mijarên helbesta wî cûrecûr in (neteweyî, milletperwerî, navneteweyî, jin, dildarî, evînî, felsefî, şîn, pesndan "medîh", dejûn, pesnê xweristê, civakî, dîrokî,.....) Cegerxwîn hewl da ku li ser her tiştî binivîse, da weke neynika civak û milletê xwe, xwe berçav bike, ta ji hemû cografîya welatê xwe re jî, wî xwe weke dostekî ji her insanekî xêrxwaz re li ser zemînê didît û helbestên wî rastiya sincên wî yên bilind diyar dikir, ta dawîtirîn nivîsandinên xwe wî berevanî di ber jar û mezlûman de dikir û êrişî dijminên welatê xwe dikir û bi zanebûn û bi mêrxasîke xurt. Pir helbestên wî

hene ku zilm û zordariya serdestên welatê xwe ku li milletê Kurd dihat kirin wî diyar dikir.<sup>88</sup>

Hin berhemên wî hatine wergerandin zimanin din, mîna erebî û gotar li ser karên wî yên pir di kovar û rojnamene cûrecûr de hatine weşandin, mîna:

Abdurrahman Mezûrî, "Firîneke serneşîv di Hozaneke Cegerxwîn de".<sup>89</sup> Arjen Arî, "Seydayê Cegerxwîn: Xanî".<sup>90</sup> Zülküf Ergün, "Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiya Romantîzman Hacî û Cegerxwîn".<sup>91</sup> Heyveron Omerî, "Di helbestên Cegerxwîn de Vebêj û Hêmanên De-kolonyal".<sup>92</sup> Abdurrahman Adak, "Di edebiyata kurdî ya klasik de biyografiyên menzûm ên helbestvanan- Hacî û Cegerxwîn".<sup>93</sup>

Kovara Berbang ya Federasyona komeleyên li Siwêd, jimarek bi taybetî li ser Cegerxwîn weşandibû<sup>94</sup> û hin kovaran dosyayin sax li ser berhemên wî weşandibûn, mîna kovara (W) bi hevpariya beşek ji nivîskaran (Arjen Arî, Mem Bawer, Derwêşê Xalib, Îkram Balekanî, Remezhan Alan, Rezoyê Osê, Feratê Dengizî, Tosinê Reşîd, Xalis Misewer).<sup>95</sup> Kovara Vesta bi hevpariya beşek ji nivîskaran (Memed Uzun, Necîb Balayi, Berken Bereh).<sup>96</sup> û kovara Pênûsa nû bi Kurdî û Erebi.<sup>97</sup>

Lê lêkolînên akadîemî yên xwegirtî li ser berhemên wî, mixabin pir kêmtir in û ne li gorî bejna Cegerxwîn û karên wî ne, ew jî li sedemin taybet vedigerin, heye jî ber rewşa siyasî ya giştî ku Kurd tê de dijîn be, Ji wan lêkolînan: Yusuf Kaynak,

<sup>88</sup> - Qenatê Kuro mijarên helbestên Cegerxwîn şirovekirne û jimartine bi deh mijaran, b.f. bnr. Qenatê Kurdo, **Tarîxa Edebyeta Kurdî**, ç. 2., Seçkin Ofset Matbaacılık, Ankara 1992, r. 141.

<sup>89</sup> - Abdurrahman Mezûrî, "*Firîneke serneşîv di Hozaneke Cegerxwîn de*", -, kov. Dengê Me, j. 3, sal: 1987, r. 8-14.

<sup>90</sup> - Arjen Arî, "*Seydayê Cegerxwîn: Xanî*", Kov. W, weş. Enstîtuya Kurdî ya Amedê, j. 15, sal: 2007, r. 3-4.

<sup>91</sup> - Zülküf Ergün, "*Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiya Romantîzman Hacî û Cegerxwîn*", kov. Nûbihar Akademî, j. 1/1, sal: 2014, r. 17-33.

<sup>92</sup> - Heyveron Omerî, "*Di helbestên Cegerxwîn de Vebêj û Hêmanên De-kolonyal*", Kov. Nûbihar, j. 129, sal: 2014, r. 46-49.

<sup>93</sup> - Abdurrahman Adak, "*Di edebiyata kurdî ya klasik de biyografiyên menzûm ên helbestvanan- Hacî û Cegerxwîn*", kov. Nûbihar, j. 130, sal: 2015, r. 72-77.

<sup>94</sup> - kov. Berbang, j. 5, sal: 1984,

<sup>95</sup> - kov. W, sal. 6, j. 28, sal: 2009, r. 36-66.

<sup>96</sup> - kov. Vesta, weş. Berdan Matbaacılık, Istanbul (b.m), r. 28-40.

<sup>97</sup> - kov. Pênûsa nû, j. 30, sal 2014. Beşê kurdî: R. 1-10., Beşê Erebi: r. 1-20.

Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî<sup>98</sup> û Mîkaîl Bilbil, Helbesta Cegerxwîn û Îqtîdar.<sup>99</sup>

Wiha jî, hin pirojeyên nivîsandî hene, mîna: Feyzullah Arslan, Di Dîwanên Cegerxwîn de Çînên Serdest û Bindest, Projeya Îsansa bilind a bêtez, Zaningeha Mardîn Artukluyê, 2015.<sup>100</sup>

## 2. PEYWENDIYA DI NAV HELBESTÊ Û DÎROKÊ DE:

Rexnevan, helbestvan, feylesûf û dîroknivîs li ser têgeha helbestê di nerînên xwe de li hev ne kirine, cudabûnek di nav wan de heye, li gorî rêbazên her yekî ji wan û koşeya ku tê re dimeyzînin; hin ji wan ji makderê wê didin nasîn, hin hin karê ku pê radibe (karmendî) û hin jî ji xwezaya wê derdibin. Heye dudo ji heman destpêkê derbibin lê cudabûn di danasînê de di nav wan de hebe. Ev yeka ha ne tiştêkî şaş e, çikû helbest afirandin e û guhertin tê de berdewame û yek ji taybetmendiyên wê ne. Ev bi xwendina tarîxa helbestê teqez dibe û bi pêvajoya wê li nik miletin cûrecûr û di serdemin cûrecûr de. Jîngeh û erdnîgariya, li gel taybetmendiya zimanê her miletêkî rola xwe di şêwe û canê helbestê de lîstiyê û dilîze, her weha her helbestvanek bi şêweyekê û awake taybet helbestê dinivîse.<sup>101</sup>

Her qûnaxek û helbesta wê ya taybet heye, weke mînak; helbesta Cegerxwîn kirasekî wê taybet heye, caneke wê ji ya erebî mîna helbesta Mûtenebî (915-965z.)<sup>102</sup>, yan helbestvanên serdema abbasî û helbestvanên berî wan cudaye, weha ji helbesta Melayê Cizerî û Ehmedê Xanî jî, ev herduwên ku kevirê bingeha helbesta wî bûn. Lew helbest hoşyariya helbestvan û têgihiştina wî ji hemû kêşeyên jiyane re nîşan dike. Pir nêzîkî rastiye ye ku em bêjin em helbestê wek wêneyê warjîna dîrokî

<sup>98</sup>- Yusuf Kaynak, *Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî*, Weş. Do, İstanbul, 2010.

<sup>99</sup>- Mîkaîl Bilbil, *Helbesta Cegerxwîn û Îqtîdar*, ç. 1, weş. Lîs, Diyarbakir 2016.

<sup>100</sup>- b.f. li ser xebatên di derbarê Cegerxwîn de, bnr. Kaynak, h.b., r. 83-100. Bilbil, h.b., r. 21-22.

<sup>101</sup>-Fatih 'Ellaq, *Mefhûm'ş-Şi'rî 'inde Ruwad'ş-Şi'r'l-Erebî'l-Hur*, Menşûratu Îttîhadu'l-Kuttabi'l-Ereb, Dimeşq 2005, r. 9.

<sup>102</sup>- Ebû Teyyibi'l-Mutenebbî (915-965z.), yek ji helbestvanên Ereba yê bi nav û deng e, li Helebê jiyana xwe derbaskirbû. b.f. bnr. Ebû Teyyibi'l-Mutenebbî, *Dîwanu'l-Mutenebbî*, daru Beyrût, Beyrût 1983.

bi hemû aliyên xwe ve nas dikin, ji çî miletî re be, ji ber ku hokarên dîrokî û civakî roleke giring û bingehî di dîtina helbestvan de dilîzin û pêvajoya wê nîşan dikin.<sup>103</sup>

Feylesûfan pir guh dan lêkolîna di helbestê de û ew çîye û nerînin cuda diyar kirin, hin neyînî û hin erênî (hin pozîtîv û hin nêgatîv), çî feylesûfên destpêkê mîna Suqrat (469 -399 b. z.) û Eflaton (427 -347b. z.) û çî yên di pey wan re. Ew nerîn di riya diyalogên di nabêna Suqrat û hin din de bûne tê zanîn ku helbestvan lirastiyê na gerin û helbest têgihîştina guhdaran xira dike, ta gihan guftûgoya qewrandina helbestvanan ji "Bajarê pak –bajarê fezîletê-", ji ber ku xwezaya helbestê xelkê ji rastiyê dûr dike û li gorî Eflaton ew ne ji sincên kesên Bajarê pak in.<sup>104</sup>

Lê nerînen Eristo (384 -322b. z.) li ser helbest û helbestvanan ji yên wan cuda ne. Wî guhdaneke taybet bi helbestê kir, pirtûkek bi navê "Hunera helbestê" danî, helbest tê de dabeşî çend hawa kiriye û dibîne ku karê helbestî nerîneke afrender e, bi riya wê helbestvan karekî nû ji metiriyala jîyanê û jînwarê çêdike.<sup>105</sup>

Feylesûfên misilmanan jî nerîneke wanî taybet di vir de hebû, weke Qudama bin Ca'fer (872 -948) yê ku helbest weha da nasîn: Ew gotinin terazûkirî bi qafiye ne watekê berçav dikin.<sup>106</sup> Farabî (874 -950), Ibin Sîna (980 -1037) û Ibin Ruşd (1126 -1198) dibênin ku bandora helbestê ya yekser li sinc û mirovatiya mirov heye. Heger nerînin wan cuda hebûn jî lê wan li ser yekgirtina nirxa ciwanî û ya sincî di helbestê de, nerînin wek hev didan, çîku her yek ji wan bi awakî erênî xebata insan ber bi pêkanîna baştirîn hebûna xwe de cêbicê dike.<sup>107</sup>

Di serdema nûjen de hin cûreyên dibistanên rexne çêbûn û her yekê ji wan rêke xwe ya taybet girt. Destpêka wan ji Europa bû û ji wir belav bû ta ku meydana wêjeyî li cîhanê tevî girt; ji wan (Klasîk, romantîk, symbolism, realism, ..... ) ûhd.<sup>108</sup>

<sup>103</sup>- Ellaq, h.b., r.45.

<sup>104</sup>-Eflaton, **el-Muhaweratu'l-kamîle**, ter. Şewqî Dawûd Temraz, el-Ehliyyetu 'l-in-Neşîfî we et-Tewzîfî, Beyrût (b.m), r. 444, 464.

<sup>105</sup>- Arîsto, **Fenu's-Şi'rî**, ter. Ibrahîm Hemade, Mektebetu'l-Anclo'l-Misriyye, Misir (b.m), r. 24-,25.

<sup>106</sup>- Ebu'l-Ferec Quddame bin Ce'fer, **Neqdu's-Şi'r**, Teh we Te'lîq: Muhammed Ebdil Mun'im Xeface, daru'l-Kutubil'-Îlmîyye, Beyrût, (b.m), r. 64.

<sup>107</sup>- Ulfet Muhammed Kemel Ebdulezîz, Muhammed Kemel, **Nezerîyetu's-Şi'rî 'inde'l-Felasîfeti'l-Muslimîn**, el-Hey'etu'l-Misrîyetu'l-'ametu li'l-Kîtab, el-Qahîre 1984, r. 145,153.

<sup>108</sup>- b.f. bnr. Muhammed Ebdil Mun'im, **Medarisu'n-Neqdi'l-Edebîyi'l-Hedîsî**, ed-Darû'l-Misrîyeti'l-Lubnanîyetî, el-Qahîre 1995., r. 153-203.

Wê rexnê şêweyê nerîna li deqên wêjeyî û yên helbestî di nav de, guhert, cudabûn ket nav rexnevanan di nerîn û lêkolînên wan de li helbestê, çi kevin û çi nûjen, lê tifaqek di nav tevan de hebû ku têgeha helbestê bi xwe ne her dem yek e, ew bi demê re tê guhertin û helbestvanî diyar dibe ku peyv wek peyv tê têgihiştin, ne ji dêla tiştêkî binavkirî û ne wek derbirîna coşê jî.<sup>109</sup> Helbest huner e ne zanist e û hunerberî her tiştê form e û heger xweşxewewan zimanê xweristî be –weke tê gotin- helbest zimanê hunerê ye.<sup>110</sup>

Dîrok ji aliyê xwezaya xwe, rêbaz û nasîna xwe ve ji helbestê cuda ye, ew kelepuîra miletan û gencîneya wa ye, bîrdanka gelan e û bi wê granbuhaya milet ji aliyê şaristanî û çandî de tê pîvan; ew rabirdûwê ku gel balpiştê pê dikin di avakirina jiyana îro û pêşerojêke baştir de, ew lêkolîneke di rewşa kesên çûne, jînenîgariya navdaran de û zelalkirina wan e, dîrok jî mîna her zanistekî qûnaxên pêşketina wê hene, di wan re derbas bûye ta gihaye vê qûnaxa han, rêbaz, awa û şêwene cûrecûr di lêkolînên xwe de bi kar anîn.

Dîroknivîsê Yûnanî Hîrodot (484 -425 b. z.) xwedî qenciyeke û roleke mezine di veguhstina dîrokê ji cîhana (Xwedanên gelek) ber bi zanistekî guhdanê bi çalakîyên mirov li ser zemînê bike û gelekî temmînî kir ku ew bê nivîsandin da dana mirovatiyê pê bê parastin, ew jî bi riya sirinc, lêkolîn, encamkirin û şirovekirina bûyeran.<sup>111</sup>

Dûvre dîroknivîsin din li pey hatin û bi şêwe û rêbazin cuda, hevpişkî di danîn û nivîsandina bûyerin giring de kirin û ev ma ta dema Romaniyan berdewam kir lê bi giringîyeke kêmtir, da di serdemên navîn de bibe nerîneke olî ji ber kenîştê wê demê dest danî ser jiyana siyasî û giştî.<sup>112</sup>

<sup>109</sup>- Roman Yakibson, *Qedaye's-Şi'riye*, ter. Muhammed el-Welî we Mûbarek Henuz, daru Topqal li'n- Neşrî, ed-Daru'l-Beyda'- el-Mexrib 1988, r. 19.

<sup>110</sup>- Can Kohin, *Bunyetu'l-Luxetiş-Şi'riyetî*, ter. Muhammed el-Welî we Muhemmd el-'Umerî, daru Topqal li'n- Neşrî, ed-Daru'l-Beyda'-el-Mexreb 1986, r. 46.

<sup>111</sup>- b.f. li ser dîroka Hîrodot, bnr. Hîrodot, *Tarîxu Hîrodot*, ter. Ebdul Îlahî'l-Mellah, el-Mecme's-Seqafî, Ebu Dabî/el-Îmaratu'l-Erebîyetu'l Muttehîde 2001.

<sup>112</sup>-Mewlayî'l-el-Mustafa el-Bercawî, *"Tetewuru'l-Kîtabetî't-Tarîxîyetî Beyne Menzûreyu es-Seqafetu'l-Îslamiyyetû fî Muqabil's-Sefaqetî'l-Erbîyyetî"*, Mewqî'l-Elûketî's-Seqafîyetî, (m.w. 31/12/2012), <http://www.alukah.net/culture/0/48498%20/>, (m.j. 10-01-2016).

Pir dîroknivîs û ramyar di serdema islamî de li ser giringiya dîrokê rawestiyan û çawa tê de bixebitin û ji kevin de. Roleke dîroknivîsan di berzkirin û pêşveçûna vê zanistê de hebû û di lêkolîna di rêbazên wê de, mîna Ibin Xeldûn (1332 -1406) yê ku di Pêşgotina xwe de qenciya zanista dîrokê berçav kir û nirdariya dîrokê û hewcedariya bi nivîsandina wê zelal kir û tekeze kir ku dîrok hunereke pir sûde ye, dibêje: "zanibe ku hunera dîrokê hunereke pir birûmet e, pir sûde ye, armanc paqij e".<sup>113</sup>

Hin din jî hatin li ser giringiya dîrokê û danasîna wê ya zimanî û ya têgehî rawestiyan, mîna Essexawî (1427 – 1497) yê ku got mijara dîrokê mirov û dem in û pirtûkên dîrokî li gor rêbaz û mijarên wan nijandin, wek 40 cûreyî berçav kirin, ji sîreta pêxember dest pê bike ta di tarîxa keşeyan re derkeve.<sup>114</sup>

Europa di sedsalên 14 – 17an de bi hişyariyekê di hemû çarçiwên jiyane de rabû, navê "Serdema hişyariyê" lê kirin<sup>115</sup> û pareke dîrokê di vê geşbûnê û azadbûna ji kenîştê hebû. Roleke xurt a pirtûka Mikyafillî (Mîr) hebû di jidayikbûna rêbazeke nû di nivîsandina dîrokê de, çiku pirtûk weke şirovekirineke riyalîzmî ji têkiliyên dîrokê bi siyasetmedariyê û diplomasiyê re, da di serdema Ronakbîriyê de wêneyê wê tamam bibe<sup>116</sup>, ku dîroknivîsan berê xwe dan guhdana bi jiyana civakî û çandeyî, da ku ji nû dibistan û nerînin nû berz bibin ku şiroveyin nû ji dîrokê re bibînin û belge weke bingeheke xurt ji nivîsandina dîrokê re dîtin û giringiya balpiştiya pê.<sup>117</sup>

<sup>113</sup>- Ebdurehman Ibin Xeldûn, **Kîtabu'l-Îberî we Dîwanu'l-Mubteda we'l-Xweber fî Eyyami'l-'Erebî we'l-'Ecemî we'l-Berberî - Muqedîmetu Ibnî Xeldûn** -,c. 1, Daru'l-Kîtab'l-Mesrî/ Daru'l-Kîtab'l-Libnanî, el- Qahira/Beyrût 1999. r. 12.

<sup>114</sup>- Muhammed Ibnû Ebdurehman Ibnû Şemsedîn es-Sexawî, **el-Îlanu bi't-Tewbîxî Limen Zemme't-Tarîx**, Teh: frans Ronsal, Tercemetu: Salih Ahmed el-Elî, Muessetu'r-Rîsale, Beyrût 1986, r. 19, 139-143.

<sup>115</sup>-Serdema hişyariyê tevgererek e çandî bû, li Îtaliya destpêkir bû, di destpêka dawiya serdemên ortê de û paşê li tevahiya Ewropayê belav bû û bû têgeha dema di navbera herdû serdemên navîn û nûjen de, b.f. bnr. Cêrî Proton, **'Asrû'n-Nehdetî-Muqedîmeton Qesîretan Cidden**, ter. Ibrahîm el-Bîlî Mehrûs, Muessetu' Hendawî, el-Qahîre 2014. Eyyûb Ebû Diyeye, **Ulemaûn- Nehdetî'l-Ewrûpiyeyî**, Darû'l-Farabî 2011.

<sup>116</sup>- Serdema Ronakbîriyê, tevgereke siyasî, civakî, çandî û felsefiyek firehe, dûvre bû tegehek ku hemî rengên ramanên ku mejiyên mirovan ji tarîfî û cehalet û evsaneyî yê azadke, b.f. bnr. Haşim Salih, **Medxeonî le't-Tenwîr'il-Ewrûpî**, darû't-Telî'etî, Beyrût 2005.

<sup>117</sup>- el-Bercewî, h.b. û b.f. li ser pêşketina dîrokê û dibistanê wê, bnr. Ferîd Ibin Suleyman, **Medxelonî le Dîrasetî't-Tarîxî**, Merkezû'n-Neşri'l-Cami'î, Tunus 2000.

Çarçiwa lêkolîna di têgehîna nû ji dîrokê re di sedsala bîstan de pir fereh bû, hina ji wan bi awake pir fereh meyze kirin ta ku gerdûn tev, li gel stêrên asîman xistin nav, lê piraniya wan gotin ku ew lêkolîn û şopandina bûyerên bûrî ne ku bi kes û miletan re derbas bûne û gewdekirin û tomarkirina wan e. Hina jî dîtîna ku dîrok cihoka hemû bûyerên rasteqînî ku leheng û milet xwediyê wan e; ewên ku di kevintirîn serdem de qewimîne û bi demê re berdewam kirine û pêşve çûne û cihê ku lê qewimîne ta roja îro.<sup>118</sup>

Danîna bingeheka ji zanista dîroka nû re bi saya dîroknivîsê Frensî Ferdenand Brodwell (1902 -1985) bû, ewê ku rahişt sînoran ji nabêna dîrokê û sosyolojya û interpolojya û doza bûrandina di ser dîroka çîrokî/nûçeyî re kir; ewa ku li ser bûyerin biçûk di demin kurt de bûne û berê xwe bidin lêkolîna dîroka bingeheka aborî, civakî û çandeyî di serdemên dirêj de.<sup>119</sup>

Li gel van tevan jî ya balpiştî di pirtûkên zanistî de pê dibe ew e ku dîrok dabeşî du qûnaxên sereke kirine, ya pêşî Serdemên berî dîrokê û ya duwem Serdemên dîrokê ne û hat lihevkerin ku sînorê di nav wan de afirandina nivîsandinê be (3200b.z.). Herdû qûnax jî dabeşî çend serdemên şaxikî kirin; serdemên dîrokê dabeşî sê qûnaxan kirin:

1- Dîroka kevin: 3200b.z. -476z sala roxandina Impiratoriya Romanî bi destê êlên Germanî.

2- Dîroka Navîn: 476z. – 1453z. sala herifandina Kusanîna paytexta Bîzanta bi destê dewleta Osmanî, yan 1492an sala vedîtina America, yan roxandina Gernata dawîtirîn wargehên misilmanan li Ispanya.

3- Dîroka nûjen: Ji piraniya bûyerên wê ew kirin du qûnax:

a) Dîrokeke nûjen: 1453/1492z.- 1789z., sala şoreşa Frensî.

b) Dîrokeke hevdem: 1789 – û ta niha.<sup>120</sup>

<sup>118</sup> - Hesên Osman, **Menhecû'l-Behsi't-Tarîxî**, darû'l-Mearifî, el-Qahîre (b.m), r. 12.

<sup>119</sup> - el-Bercawî, h.j. h.l.

<sup>120</sup> - Muhammed Xerîb Cûde, **Mûcezu tarîxî'l-'alemî bi's-senewatî wel-Ehdasî**, Mektebetul-Quran, el-Qahîra, (b.m), r. 67, 155, 172, 174, 175.

Heger dîrok bi xwezayî, rêbaz, armanc û alavên di vedîtina rastiyan de bi kar tên ji helbestê cuda ye, lê peywendiyêke diyalîktîkî di navbera wan de heye ku dikevin bin bandora hev û bandora xwe li hev dihêlin, ew bûyerên dîrokî ku helbestvan di helbestên xwe de dinivîse ew nîşaneke zelal e li ser vê peywendiyê. Heger dîrok zanistêke lêkolînê di karê insan de di zeman û cih de dike, helbest jî derbirîneke ser vî insanî.<sup>121</sup> Heger em bêjin ku şêwe û alavên helbestvan tiştêkin û yê dîroknivîs tiştêkî din in, lê em nikarin bidin mandelê ku helbest nirxeke xwe weke cobarekê ji cobarên zanîna dîrokî bi bûyerên rabirdû de heye, ji ber ku ew gelek caran qorziyî giring ku dîroknivîs jibîr kiribe yan piştguh kiribe, ew berçav dike. Feylesûfê yûnanî Aristo bi vê gotina xwe peywendiya di nav helbest û dîrokê de diyar dike:

"Ne bi dahênana hûnayî yan xweşxewanî helbestvan ji dîroknivîs cudaye; nivîsandinên Hîrodot heye ku bihatina hûnan, lê tev wê jî wê bimana regek ji rengên dîrokê, lê ferqa rastî di nav wan de ku yek ji wan tiştên qewimîne dibêje, yê din tiştên ku heye bibin dibêje. Ji ber vêya felsefeya helbestê ji ya dîrokê pirtir e û cihê wê bilindtîre, ji ber ku helbest meyldariya derbirîna rastiyeke tevayî, giştîye, lê dîrok meyldariya derbirîna rastîta tayber yan kesane dike."<sup>122</sup>

Heq bi Hirinşo re bû dema têkiliya di nav herduwan de li ser zimanê wêjevanan dibêje: "Zanist bigihêje çî astê ji zanîne ew nikare ji bilî hestiyên rehîrtî zuwa ji dîrokê bide me û ku me xwest jiyane bi wan hestiyên ve bînin ji bilî xeyalê helbestvan li ber me tune û dema xeyal ew jîn kir em hewceyî jêhatîbûna nivîskarekî pêkhatîne, da karibe di kirasê spehî de berçav bike û weke hêzeke kêrdar di cîhana me de were pêşkêşkirin".<sup>123</sup>

Çiqasî dîroknivîs rê li ber vekiriye ku bi hesanî û dirêjayî bûyeran bibêje, lê carna ew neçar dibe ku tiştêna veşêre, nemaze ku dîrok ya jiyana Paşa, mîrek û navdaran be. Lê helbest dikare wan bûyerên ku dîroknivîs negotîne berçav bike. Dema jêderên dîrokê di bûyereke de nebin, wî çaxî balpiştî bi helbestê dibe û gelekî ji rewşa kurdî re munasib e, çiku kurdan weke tê xwestin dîroka xwe tomar nekirine

<sup>121</sup> - Hirinşo, **Îlmu't-Tarîx**, ter. Ebdulhemîd el-Ebadî, Sîlsîletû'l-Me'arîff'l-'Ametî, 1944, r. 5.

<sup>122</sup> - Arîsto, h.b., r. 114.

<sup>123</sup> - Hirinşo, h.b., r. 2-3.



û ne nivîsandine û pir ji wan bûyeran man weke çîrokan nifşekî ew ji nifşê din re digotin û hin ji wan bûn stiranin kelepûrî.<sup>124</sup>

Helbestvanên Kurd jî mîna xeynê xwe helbest ji bo danîna dîrokaxwe bi kar anîn, bûyerên dîrokî anîn zimên, li ser lehengiya bav û bapîran gotin, ew berçav kirin. Cegerxwîn yek ji wan helbestvanan bû ku dîrok bi hawakî pir fereh di helbestên xwe bi cih kiriye.



---

<sup>124</sup>-b.f. bnr. Elî el-cezîrî, **el-Edebû's-Şifahiyyû'l-Kurdî**, c. 1, Rabîtetu Kawa li's-Seqafeti'l-Kurdiyyetî we'l-fen, Beyrût 2000. c. 2, Merkezû Zeytûne li'd- Dirasat, Erbil 2008. - Cegerxwîn, **Folkloru Kurdî**, weş. Roja nû, Stockholm 1988, r. 173-202.

## I. BEŞA YEKEM

### RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KEVIN

#### 1.1. MILET Û ŞANEŞÎNIN KEVIN DI KURDISTANÊ DE:

Çîrokbêj û dîroknivîsan li ser esl û binyada Kurdan û sînore welatê wan li hev nekirine, sedem pir in, tevî ku siyaseta derve roleke giring tê de lîstiyê, li gel ku kurdan bi xwe jî dîroka xwe nenivîsandine weke tê xwestin.<sup>125</sup>

Hêjî lêkolîna di dîroka kurdî de, weke mirov di nav stiryar re bimeşe, nexasim ya kevin. Dibe ku dîroknivîs Kemal Ehmed Mezher dema dibêje: "Dîroka kurdî ne tenê ne hatiye lêkolînkirin, lê belê beşeke mezin ji wan tiştên hatine nivîsandin jî ji bo xirakirinê ne lêkolînin, ji lewra dema dîroknivîsê bêalî xwe bê hemdê xwe dibîne ku berevaniya kurdan dike, bê ku ha ji xwe hebe û dest pê dike da ku rastiyê derxîne der wek xizmetekê ji dîrokê re"<sup>126</sup> ew vê yekê hinekî zelal dike.

Ji lewra piraniya caran ev tiştên ku tene gotin di pir cihan de nayên bawerkirin û di pir pirtûkan de jî ta ku mirov xwe pê re ne westîne û bi hûrbînî lê venegere.

Vedîtinên şûnmayî (metiryalî û nivîsandî) jêderên bingehî ne ji nivîsandina

---

<sup>125</sup> - b.f. bnr. Muhammed Emîn Zekî, **Xulasetû Tarîxû'l-Kurdî we Kurdistan Min Eqdemi'l-Usûr Hette'l-An**, ter. Muhammed Elî Ewnî, c.1, daru's-Şuûni's-Seqafîyetî, Bexdad 2005, r. 99-124. - Cemal Reşîd Ehmed, **Zuhûr'l-Kurdî fi't-tarîxî**, c. 2, Metbe'etu wezaretu't-terbîyetî, menşûratû darû Aras, Erbil 2003, r. 3-70.

<sup>126</sup> - Kemal Ehmed Mezher, **Kurdistan fi Senewati'l-Herbi'l-Alemîyeti'l-Ûla**, ter. Muhammed el-Melle Ebdulkerîm Kerîm, daru'l-Farabî/daru Aras, Beyrût/Erbil 2013, r. 21.

dîrokê re û delîlên xurt li ser rastî û pêzanînên jê tîncamkirin. Mixabin ew jî di warê dîroka kurdî de pîrr kêr in, ji ber rewşa siyasî û guhnedana bi vekolînan di herêmê de.

Kurd ji malbata gelên Îranî Arî ne<sup>127</sup>, li nav van dewletan de belav in: Turkiye, Îran, Iraq û Sûriyê, hejmara wan bi 30 – 35 milyonan e<sup>128</sup>, çarçîwa cugraffî ya cihniyîna wan bi hêlên van her çar dewletan ve girêdaye, ew di nabêna çemê Ferat, Erzerûm, çemê Aras, gola Ormiyê, Loristan, Xaniqîn, Kerkûk, Mûsil û Cezîra Sûrî ya jorîn.

Li van welatan hokarên xwezayî; çemên mezin û cobarên wan (Dicle, Ferat, Xabûr, Belîx, Zap, Diyala...), keşûhewa xweş, barana pîrr, xaka rewa û ji bilî wan jî bîngêhên jiyana xwezayî û mirovanî, alîkarî di jînbûn û avakirina şaristanin cûrecûr de kirin û di qûnaxin li pey hev ji dîroka Rojhilata navîn, cihê ku berê bav û bapîrên kurdan ji mîletên çiyayî lê dijîn; ewên ku bi pîrr navan hatin naskirin: Lullu, Guti, Xurri/Hurrî, Mittanî, Turukku, Kaşşu, Madi, Mannea, Kardux... û navê cugraffî Subartu di deqên/tekstên mîxî kevin de piraniya warên wan nîşan dike.<sup>129</sup>

Niha em ê bi kurtî li ser van mîletan û şaneşînên wan binivîsin, berî ku em bibînin çawa Cegerxwîn ew bikar anîne.

### 1.1.1. Lullu/ Lollo:

Dîroka Lullu yan Lullubîyan bi dîroka Mezopotamya ve tîncirêdan û hinekî jî bi dîroka Rojavayî Îranê ve. Pêzanînên ku di deqên mîxî ku hatine vedîtin de ew li parçeyin mezin ji zencîra çiyayên Zagros, li herêma Silêmaniyê li Kurdîstana Iraqê bi

<sup>127</sup>- Arî (Aryans); navlêkirineke li mîletên ku zîmanê wan Hindo Ewropî bû, hate lêkirin di sedsala nozdem de, lê di îro de tîncirêdan ji bo danasîna beşa Rojhilatî, ango (Hindo-Îranî), ji malbata zîmanên Hindo Ewropî re, ango tîncirêdan zîmanzanî ye berî tîncirêdan wateyên din. b.f. bnr. Muhammed ez-Zên, "*el-Arîyyîn*", *el-Mewsû'eti'l'-Erebîyetî*, c.1., darû'l-Fîkr, Dîmeşq, r. 991.

<sup>128</sup>- Tîncirêdan fermî yêncirêdan rasteqîn di derbarî jîmara kurdan de çenebûne, bi sedema nîrên siyasî ku kurd tîncirêdan de dijîn, bnr. wilyam Îgilton, *el-Qeba'îlu'l'-Kurdîye*, ter. Ehmed Xelîl, r. 8-9, [https://ahmedalkhalil.files.wordpress.com/2012/08/d8a7d984d982d8a8d8a7d8a6d984\\_d8a7d984d983d988d8b1d8afd98ad8a9-d984d988d984d98ad985-d8a7d98ad983d984d8aad988d9861.pdf](https://ahmedalkhalil.files.wordpress.com/2012/08/d8a7d984d982d8a8d8a7d8a6d984_d8a7d984d983d988d8b1d8afd98ad8a9-d984d988d984d98ad985-d8a7d98ad983d984d8aad988d9861.pdf), (m.j. 20.01.2016).

<sup>129</sup>- Farûq Îsmâîl, "*el-Kurd*", Berhemek ji *el-Mewsû'eti'l'-Erebîyetî*, c.16, darû'l-fîkr, Dîmeşq, r. 151, <http://www.arab-ency.com/details.php?full=1&nid=1289>, (m.j. 10.10.2015).

cih bûne.

Nayê naskirin teqezze bê kengî li wir bi cih bûne, lê kevintirîn nîşana dîrokî li welatên wan di dastana Logal Benda ya Sumerî (sedsala 27b.z.) de ye. Dûvre di du neqşên şahê Ekkadî Naram Sîn de li ser wan û warên wan hatiye; yê pêşî ew (peykerê serkeftinê) û tê nasîn bi navê peykerê Naram Sîn<sup>130</sup>, Şah ew li bajarê Sippar, bajarê Xwedayê rokê ava kir, (Ebû Hebbeh, başûrî Bexda), dûvre îlamiyan ew birin paytexta xwe Susa (Şûş, li herêma Îlam li Îranê) dema di sedsala 12b.z. de êrîşî welatê Babil kirin. Neqşê din ew (Peykerê Derbendî Gawir) e, ku serkeftina wî nîşan dike; ew di ser laşê dijminê xwe ji Lulluyan dimeşe.<sup>131</sup>

Di van cengên xwe dijî Lullu, Naram Sîn hin diyarî û xelat ji şahê Îlam re şandibûn û keça wî bi jinitî ji xwe re anîbû, lawekî wî jê çêbibû, ew piştî nemzekirina hevpeymaneke dostanî pêre, armanc jê ew bû ku wî di şerê xwe yê dijî Lulluan de bîne rex xwe.<sup>132</sup> Xuyaye sînoren Luluyan piştî herifandina Impiratoriya Ekkadî bi destê Gutiyan 2159b.z. pirr fereh bûn, ta hin ji Mezopotamya Navîn jî ket bin destên wan û vêya hişt ku ew bi tuxmê Êr ê siyem re têkevin hevrikiyê de ya ku desthilatdarî di nabêna 2113 – 2003b.z. de li wê deverê dikirin.

Desthilatdarên Êr hin helba (êrîşên leşkerî) birin ser welatê wan lê nedikarîbûn bi temamî dest deynin ser.<sup>133</sup> Şah Şulgî (2093- 2046b.z.) dibêje ku ew bi çend helban rabû, ji wan ewa ku li dijî Lulubiyên û serkeftinên hêja kirin û sala 42an ji desthilatdariya xwe bi navê "sala roxandina Sîmûrum û Lullubî" bi nav dike.<sup>134</sup>

<sup>130</sup>- Peykerê serkeftinê (Peykerê Naram Sîn): hate dîtin li bajarê Sûza paytextê Îlamiya, ji aliyê şandeker arkiyolojî ya firensî û niha ew peyker di mûzîxana Lover de ye li Parîsê. bnr. Îd Merî, **Tarîxû Bîladi'r-Refîdeyn Munzû Eqdemi'l-Usûrî Hetta Am 539 q.m.**, el-Ebcedîye lin-Neşîr, Dîmeşiq 1990, r. 49. - Anton Mortget, **el-Fen fi'l-Îraq'l-Qedîm**, ter. Îsa Selman we Selîm Taha et-Tekrîtî, c.1, metbe'etû Edîbû'l-Bexdadîyetî, Bexdad. (b.m), r. 178, 181.

<sup>131</sup>- Taha Baqir, **Mûqeddîmeton fi Tarîxi'l-Hedarati'l-Qedîmetî**, c.1, darû'l-Weraq, Beyrût/Bexdad 2012, r. 403.

<sup>132</sup>- Muhemmed Ebdulletîf Muhemmed Elî, **Tarîxû'l-Îraq'l-Qedîm Hetta Nihayetî'l-Elfi Salisî q.m.**, Camî'etu'k-Îskenderîyye, 1977, r. 290.

<sup>133</sup>- Zubeyir Bîlal Îsmail, **"Tarîxu'l-Kurd we Kurdistan'l-Qedîm"**, kov. Gulanu'l-Erebî, el-eded:13, Erbil 1997, r. 59-60.

<sup>134</sup>- Muhemmed Elî, h.b., r. 423. Lê Taha Baqir dibêje di sala 24an de ye ji desthilatdariya wî, bnr. Baqir, h.b., r. 423. Ê Farouk Îsmail dibêje di sala 44an de ye ji desthilatdariya wî, bnr. Farûq Îsmail, **"el-Hûriyûn fi Bîlad Apûn Xîlale'l-Esre'l-Babiliyî'l-Qedîm"**, Meceretû'n-Nuqûşî we'r-Risûmî's-Sexriyyetî, Hey'etû'l-Asari'l-'Amme, el-Ededu'l-ewwel ûman 2007, r. 83.

Di wê hingê de navê şahê lullubiyîyan Anu Banînî berze bû û di dema wî de desthilatdariya wan fereh bû, herêmên Zuhab, Qesra Şêrîn, ta bighe Kermensah tevî herêmên Şehrezûr, Helebce, Pencewîn û Çemçemal û gihan çiyayên Hemrîn, Qorto û Binkûra û piştî serkeftinên xwe û roxandina dijminan şahê wan peykerekî hunerî dîrokî li Sar i Pol, li herêma Zuhab hiştiye; navê xwe, pesnên xwe nivîsandine û peyker ew bi lawirin (heywanin) bi tirs û saw re ye. Di sedsala 18an de Lullu bi Turukku yê Hurrî re ketin rikberiyê, ev pêzanîn di deqên ku li Şuşerra û Marî hatine vedîtin diyar bûne.<sup>135</sup> Û li gorî deqên ku li Nûzî<sup>136</sup> hatine vetîtin berçav dibe ku wan di orta sedsala 12b.z. giringiya xwe ya siyasî ji ber qeyranin aborî ji dest berdan û ketin bin desthilatdariya şaneşîna mîttanî ya Hurrî.

Bi roxandina şaneşîna Hurrî re sedsala 14b.z. û hîlbûna şaneşîna Aşûrî ya navîn (1363 -912b.z.) nakokî di navbera Aşûrî û Lullubiyîyan de derbûn, deqên Aşûrî serkeftinên xwe li ser Lullubiyîyan di çend cengan de diyar dikin.

Di serdema şaneşîna Aşûrî ya nûjen de (911 -612b.z.) jî van nakokiyîyan berdewam kirin û aşûriyan welatê lullubiyîyan xira kirin û wêran kirin û şahê aşûrî Aşşur Nasirpal II dest danî ser gelek parçe yê rojava ji welatê wan û rola wan a siyasî bi dawî kir, dibêje ku ewî dest daniye ser 25 bajarên Lullu û hemû pişesaz û senetkar ji welatên wan veguhestin bajarên welatê Aşûr.<sup>137</sup>

Di sedsala 8b.z. de herêmên lullubiyîyan yê rojhilat ketin bin destê Mîdiyan, lê yê derdora Silêmaniyê ketin bin destên aşûriyan ên ku lullubî belawela kirin û ew ji welatê wan koçber kirin, lullubiyên mabûn çûn tevî Mîdiyan bûn<sup>138</sup>.

<sup>135</sup>- Şemşara: Dikeve rojhilatê Raniya bi nêzikaiya (7 k.m)an, li Kurdistana Îraqê.

Marî (Till el-Herîrî): li ser çemê feratê, bi (10 k.m)an, dikeve bakurî bajarê Ebûkemaal li Sûrî yê.

<sup>136</sup>- Nûzî (Yurgan tepe), 20 k.m başûrî rojavayê Kerkûk e.

<sup>137</sup>-Muhammed Emîn Zekî, **Xulasetû Tarîxû'l-Kurdî we Kurdistan Min Eqdemi'l-Usûr Hette'l-An**, r. 125. - Cegerxwîn, Tarîxa Kurdistan, c.1, ç. 1, weş. Roja nû, Stockholm,1985, r. 84-86. - b.f. li ser helbên Aşûriya, bnr. Rêber Cafer Ehmed el-Berwarî, **el-Hemelatû'l-Eskeriyetî el-Aşûriyetî ela Kurdistan (911-612 q.m)**, metbe'etû'l-Xanî/darû Mukriyanî, Dihok 2012.

<sup>138</sup>- . b.f. li ser (Zamwa), bnr. Muhammed Emîn Zekî, **Tarîxu's-Suleymanîye**, ter. el-Mela Ehmed er-Rozibiyânî, şerîketu'n-Neşirî wet-Tîba'eti'l-Îraqiyeti'l-Mehdûde, Bexdad 1951, r. 20-21.

### 1.1.2. Guti / Gûtf:

Guti li parçê ortê ji çiyayên Zagros nişteci bûn, kevintirîn car ku navê wan hatiye gotin (gu-ti-um) di serdema şahê Ekkadî Şarkalli Şarri (2223 -2198b.z.) de bû. Lê berzbûna wan wek hêzeke siyasî di dawiya sedsala 3b.z. de bû, dema delîva dîtin ku Ekkadî zeîf bûne û parçe bûne û karîbûn di sala 2159b.z. de dewleta wan têk bibin û li şûna wan desthilatdariyê li Mezopotamya bikin.<sup>139</sup>

Deqek ji destpêka sedsala 2b.z. bi navê (Xezeba Ekkad) tê naskirin de çîroka xezeba xwedawend Enlil bi ser şahê Ekkad Naram Sîn de hatiye, û çawa ew ceza kiriye ku Guti (gu-ti-um) bi ser wan de şandine û bajarên wan wêran kirine û welatê wan erdeke rût hiştine, birçîbûn bi ser wan de hatiye û birne nemanê. Bi awane din jî hatiye ser xezeba Marduk bi ser Naram Sîn de û Guti du caran li wan sor kirine û welatê wan talan kirine.

Hin deqên ku vedigerin dema Şarkalli Şarri dibêjin ku wî helbayek bire ser (gu-ti-um) û Şarlag şahê Gotium dîl kir, tê encamê ku ceng di navbera Guti û Ekkadiyan her li dar bûn ji dema Naram Sîn ve û di pey re di dema lawê wî Şarkalli Şarri de, ta ku dûvre Gutiyan ew têk birin û paytexta wan roxandin û lîsta şahên sumerî diyar dike ku desthilatdarî kete destê Gutiyan.<sup>140</sup>

Piştî ku Guti ji Ekkadiyan û hêza wan xelas bûn xuyaye ku sînoren wan fereh bûn û tê texmînê ku wan panaveke cugrafî fereh girtin, lê xuyaye ku ew sînor ne cihirtî bûn, teng û fereh li gorî serkeftin û têkçûna bûn didan û distandin, lê ya tekez û bê goman ewe ku herdem dest danîbûn ser bakurî welatê Babil û bi Başûr ve carna dikişiya ta giha Nippur<sup>141</sup> û neqşek şahê wan Erridupizir li wir heye.<sup>142</sup>

Deq /têkist diyar dikin ku guti hişk bûn û bi hovîtî bi bajarên dagîrkirî re danûstendin dikirin û ew bi berberiyên pesin didan û bi marû dûpişkên çiyê, heywan didizîn û peykerên xwedawendan dişkandin. Di'ayeke sumerî heye rewşa welat di dema wan de berçav dike: "welat di dest dijminin zirz de ye, Xwedawend ajotine

<sup>139</sup> - Mer'î, h.b., r. 55.

<sup>140</sup> - Muhammed Elî, h.b., r. 288-289,294-295.

<sup>141</sup> - Nîppur/ Nîpûr (Nîfir), li başûrî Îraqê ye, dûrî bajarê 'Efik bi 7k.m bi aliyê pakurî rojihilat ve.

<sup>142</sup> - Mer'î, h.b., r. 56.

êşîrtiyê, barê millet bi bacan giran kirine, cihok û jêderên avdanê zuha bûne, gemî nema karin di Dicle re bibûrin, zevî nema tên avdan û dexl nema ber didin".<sup>143</sup>

Tevî ku gerek em ha ji van pesnan hebin ji ber ku ji dijminê Gutiyan derketine, ji ber tişteki normale ku ew bi van pesnan diyar bikin ji ber ku serdestê wan e û ziyan ji Gutiyan dîtine, di şer de ev tişt dibin, lê di vedîtinin cûrecûr de ji Mezopotamya tekez dikin ku gelek xirakirin û wêranî di wê demê de bûne, mîna ku li Nînewa, Nîppur û Tel berek bûne<sup>144</sup>, lê cudahî di nerînên lêkolîneran de heye li ser bê kî bi van xirabiyên rabûne; Lullu yan Guti.<sup>145</sup>

Ji bilî navê şahên xwe gutiyan tişt bi zimanê xwe ne hiştine, tişteki hunerî yan avakirinê ku taybetmendiyên wan di serdema desthilatdariya wan de berz bikin tunene, ew her di bin bandora yê berî xwe bûn; Sumeri û Ekkadî û gelek tişt ji wan girtin, çî nivîsandin û çî ol/dîn, ta hin ji şahên wan navên Ekkadî wergirtin û ew nasnavên ku şahên Ekkadî xwe pê pesin didan li xwe kirin, mîna "Şahê her çar aliyan" ûhd.<sup>146</sup>

Di dema Gutiyan de şaneşînên Sumeriyan ji nû ve geş bûn û serbixwe bûn, ta ciyawaziyek hinan ji wan hebû, mîna şaneşîna Lagaş di dema Ûr Baba de (2164 - 2144b.z.), weha jî di dema Gudea de (2143 -2124b.z.), çiku vê şaneşînê di herdu deman de geşbûneke di avahiyê de dît û pêşketinek di warê wêje û peykersaziyê de<sup>147</sup>. Tiştê ku serxwebûna vê şaneşînê diyar dike ewe ku şahê wê Gudea hevpeymanek bi gutiyan re nemze kiribû ku kerwanên bazirganî yê şaneşînaLagaş di herêmên bindestî gutiyan re derbas bin himberî xûgitiyê.<sup>148</sup>

Deqên ku ji şahên Uruk mane diyar dikin ku wan guti têk birin û ew bi Bakur ve vegerandin ta ew di herêmin çarçokirî de hiştin. Deqek jî heye serkeftina Utuxengal (2116 -2110b.z.) şahê Uruk di şerê wan bi Tirigan şahê gutiyan re diyar

---

<sup>143</sup>- Mer'î, h.b., h.r.

<sup>144</sup>- Nînewa: nêzîkî bajarê Mûsilê ye, li ser çemê Dicle ye, demekê paytextê Dewleta Aşûrî ya nih bû. Till Birak (Girê Birak): Dikeve bakurî rojhilatê bajarê Heseke û bi 40 k.m dikeve başûrî bajarê Qamişlo.

<sup>145</sup>- Muhammed Elî, h.b., r. 296.

<sup>146</sup>- Mer'î, h.b., r. 55.

<sup>147</sup>- Muhammed Elî, h.b., r. 299.

<sup>148</sup>- Mer'î, h.b., r. 58.

dike û dîlkirina wî bi hin serkirdeyên wî yên leşkerî re û serdestiya wan li wan herêman bi dawî kirine. Lîsta şahên sûmerî navê 21 şah ji şahên gutiyan diyar dike, heye ku şah Şarlagab ê ku şahê Ekkadî Şarkalli Şarri li ser dîlkirina wî axifiye yekemîn şahê wan be û şah Tirêgan yê dawî be.

Di deqên aşurî de yên serdema şah Eded Nirari yê yekem de (1310 -1281b.z.) didin xuyanî ku hevbendiyek di navbera gelên Zagrosê dijî aşuriyan li darket, şahê aşurî Şelimanser I (1270- 1251b.z.) dibêje ku wî ew têkbirine û guti jî di nav wan de bûn û li gor ew dibêje ku xwîna wan wek ava çeman li ser çiyayên rijandiye.

Cemal reşîd li ser zimanê Spaiser dibêje ku tiştê ji deqên aşuri derencamkiriye xurtbûna hêza gutiyan û pîrbûna hejmara wan di dema serdestiya aşuriyan de, li gel warên ku lê dijiyan ji zencîra çiyayên Torabdîn<sup>149</sup> ta derya Wanê li Bakur û Bakurî rojavayî Aşur.Ji wan deqan yê ku Şelimanser I tê de dibêje: "Ew gutiyên ku wek stêrên asîman bi hejmara xwe û di şer de jêhatî, cuda bûn û serî li ber min rakirin û dijminatîya min kirin".<sup>150</sup> Ev nîşaneke ku ew ji herêmên dayik hatin veguhestin û li herêman nû bi cih bûn.

### 1.1.3. Xurrî / Hurri

Piraniya lêkolîneran bi wê nerînê re ne ya dibêje ku Hurri ji herêmên derdora derya Wanê–nexasim ji yên Başûr- koçber bûne, bi sedê salan dirêj kiriye û bi awakî aştiyane li cihin cuda ji Mezopotamya û Sûriyê bi cih bûne û roleke berçav û ciyawaz tê de lîstine<sup>151</sup>. Bihtir tê ditin ku navê wan Xurri bi peyva Xuradi (leşker, dergevan, serbazê hişyar) re têkildar be<sup>152</sup>.

Di nivê duyem ji hezarsaliya 3b.z. de desthilatdariya siyasî di pîr herêmên bakurê Mezopotamya ket dest Hurriyan de û piştî têkçûna Impiratoriya Ekkadî bi

<sup>149</sup>- Torabdîn: Çiyayên di navbera Mêrdî û Cizre de ne.

<sup>150</sup>- Ehmed, h.b., r. 16-17.

<sup>151</sup>- Cîrnôt Vilhilm, **el-Hûrîyûn Tarîxehum we Hedaretehum**, ter. Farûq Îsmâil, daru'l-Cedel, Beyrût 2000, r. 16. - Anton Mortget, **Tarîxû'ş-Şerqî'l-Edna'l-Qedîm**, terc: Tewfik Silêman we Elî Ebû Esaf we Qasim Tuwêr, Dîmeşiq 1967, r. 203.

<sup>152</sup>- Îd Mer'î we Muhemmed Herb Ferezat, **Diwelon we Hedaraton fi'ş-Şerqî'l-Erebîyî'l-Qedîm**, daruTelas, Dîmeşiq 1994, r. 161.



destê Gutiyan, wan şaneşînin cûrecûr damezrandin. Welatê wan bi navê Subartu hat naskirin, ev binavkirina ku di deqê sumeri de ji dema E-ana-tuma (2454 -2425b.z.) şahê Lagaş a sumerî de naskirî bû.

Ji giringtirîn şaneşînen wan Hamazî (Xemazî) ya tê jimartin ji kevintirîn û berztirîn keyanê siyasî Hurrî ku di demeke zû de li welatê Subartu xuyanî bûye, di sedsala 24b.z. de təkiliyin wê yên xurt bi şaneşîna Ebla (Başûrî Helebê) re hebûn. Navê Xemazî di lîsta şahên sumeri de hatiye di pileya şeşan de ji nav bajarên ku şaneşîni tê de bi biryareke Xwedayî piştî Tofanê cih girtiye û yek şahî bi navê Hadaniş (Xedanîş) desthilatdarî lê kiriyr dûvre hatiye veguheztin bo Uruk.

Û ji dîdevanên (şahidên) nivîsandî zelal dibe ku ev şaneşîni li herêma Rojhilatî Dicle bû, nabêna çemên Zapa jorîn û Diyala de, lê Claus Wilcke baştir wê nîşan dike; di nabêna Erbîl û navça Kerkûk û belkî Zapa jêr jî. Navê Hamazi di deqekî bi tenê de ji yên Ebla de hatiye ew di lihevkirinekê di navbera herdû şaneşînan de ye. Tê gomanê ku armanc ji wê ew bû ku di ruwê çalakiyên şaneşîna Marî di herêmên Ferat de bisekinin.<sup>153</sup>

Û ji şaneşînen hurri yên giring şaneşîna Urkeş û şaneşîna Nagar in. Şaneşîna Urkeş kevintirîn şaneşînen Hurrî yên deştî ye, ew barigeha Pantheona Hurrî bû (Korê olî) û navendek bû ji Kumarbî şahê xwedawendên Hurrî re bû.<sup>154</sup> Deqin cûrecûr navê wê anîne ziman, çiku Urkeş –di dema ku Mezopotamya û Bakurî Sûriyê di bindestê Ekkadiyan de bû (2200b.z.)- desthilatdar û serbixwe bû û şahek bi navê Tubkiş desthilatdarî lê dikir, xelîfê wî bi qîza Naram Sin ê Ekkadî re zewicî.<sup>155</sup>

Qalibek (lewhek) ji sifir li şah Atal Şen vedigere û bi zimanê Ekkadiye dibêje ku ew melekê Urkeş û Newar bû. Dibe ku vî şahî hukum di dema Gutiyan de kiribe, yan dema di pey re di dehsalên pêşî ji desthilatdariya tuxmê Ur III (2015 – 1998b.z.) de. Piştî ku desthilatdariya şahên tuxmê Ur III li bakurî Dicle di serdema Ibbi Sin di

<sup>153</sup> - Îsmâîl, "*el-Hûrîyûn fî Bîlad Apûn Xîlale'l-Esre'l-Babiliyî'l-Qedîm*", r. 110.

<sup>154</sup> - Van lîr, "*Ûrkîş el-Merkezû'd-Dînîyyî'l-Hûrî el-lezî 'Ûsîre 'eleyhî fî 'l-Cezîretî's-Sûriyetî'l-Ûlya*", ter. Ednan el-Bûnnî, el-Hewlîyatû'l-Eserîyetû's-Sûriye, mucelled 27, c.1-2., 1957, r. 237.

<sup>155</sup> - Giorgio Buccellati, *Vexwendinek ji bo Serdan ya Girê Mozan Orkêş ya Kevin*, wer. Ahmed Slivi, Ghiath Rammo, weş. Uekesh Press, 2014, r. 17.

dawiya hezarsaliya III b.z. de bi dawî hat şaneşîna Urkeş fereh bû.<sup>156</sup>

Di hin deqan de navê Urkeş û Nagâr bi hev re tèn, ev nîşaneke ku herdu şaneşîn di bin yek desthilatdarîyê de bûn û Urkeş navend bû, peykerê şêrekî ji sifir heye û qalibek ji kevir bi zimanê hurrî li ser neqîşandine li ser ku şahê Urkeş Teş Atal perestgehek ji xwedawend Nergal re ava kiriye û navê şaneşîna Nagâr jî pê re. Weha jî qalibek ji sifir li mozexana Lover heye, ji bajarê Samerra yê Iraqî hatiye, dibêje ku Atal Şin şahê Urkeş û Nagâr lawê Şatarmat perestgehek ji Nergal re ava kiriye.<sup>157</sup>

Şanda şûnmayanî Emerîkî ya ku li Girê Moza (8 km Başûrî rojhilatê Amûdê li Cezîra Sûrî) bi serperiştiya Giorgio Buccellatti kar dikir karîbû nasnameya Gir zelal bike ku ew Urkeş a kevin bi xwe ye, li gel wê navê kevintirîn şah û şahjin ên Urkeş jî nas bikin; Tupkiş û Uqnitum bûn, ew jî bi riya lêkolîna li nivîsên muhran ku bi zimanê mîxî li ser hatibûn, ji bo muhrkirina cêr û denên ku di enbarên qesra şahane de bûn da zanibin çî di wan de ye. Wekî din hin avayî jî vedîtînin, hin ji wan olî bûn mîna perçeyin ji perestgehê û koncala Abî, hin jî şaristanî bûn wek parçeyin ji qesra şahane, cerên ji axê çêkirî û vedîtînin din (peyker, qalibin nivîsandin li ser, nivîsandina muhran,...) yên ku weke nîşanekê ne li ser ciyawaziya huner û şaristaniya Hurri<sup>158</sup>.

Û li Tilberek jî şanda Brîtanî nasnameya gir da naskirin ku ew Nagâr e<sup>159</sup> û lêkolîner bawer dikin ku Tilberek ew Nawar e û Nagâr ew şêweyê Hurri ye di zimanên Samî de ji Nawar re û bingeha herduwan Nagwar e.

Deqên Ebla jî Nagâr bi nav dikin û li ser têkiliyên bazirganî pêre diaxivin, çiku ew li ser riya bazirganî bû, aku herêma çiyê (Kurdistan) û başûrî Mezopotamya

---

<sup>156</sup>- Mer'î, Ferezat, h.b., r. 161-162.

<sup>157</sup>- Domînik Bonatiz, , Hartmot Koneyh, Es'ed el-Mehmûd, **el-Enharu we'l-Bewadî - et-Tûrasu'l-Hedarîyû li'l-Cezîreti's-Sûriyetî we ma Hewleha**, (Delîlû Methefî Dêre'z-Zor), metabî'û Elîf Ba el-Edîb, Isdarat Wezareti's-Seqafeti el-Mûdiriyetû el-'Ametû lil Asarî we'l Metahîf, Dîmeşiq 1999, r. 78-79.

<sup>158</sup>- Buccellati, h.b., r. 15, 35, 39.

<sup>159</sup>- Li Girê Birak devikekî cerra hate tîtin, nivîsandinek li ser hebû ku tede navê (Nagâr) hebû û ev nav bi xwe, navê Hûrî ye (Nawar) bû di zimanên "Samî" de, b.f. bnr. Bonatiz, h.b., r. 77-79.

dighandin hev. Weha jî di deqên Nabada (Til beyder)<sup>160</sup> de hatiye û diyar dibe ku şahê Nagâr serdana Nabada kiriye, lew Nabada navenda aborî sereke di şaneşîna Nagâr de bû û dibe ku ew yek ji şaneşînên giring be di Rojhilata kevin de, lew wê bi kargêriya xwe ya pêkhatî û şaristaniya xwe pêşbirkî bi bajarên afsaneyî re dikir; li gorî ku lêkolîner Joachim Bretzschneider dibêje.<sup>161</sup>

Û deqên Girê Lêlên; Leylan (Şubat Enlil – Şehna)<sup>162</sup> navê Nagâr di hevpeymaneke di navbera şahê wan û şahê Kaxet (Til berrî, nêzîkî Til berek) de tînin ziman. Dibêjin ku herêmên şaneşîna Kexit ji Nawar ta Nawar in. J. Eidem karîbû danberhevekê di navbera Nawar û Tilberek de bike û weha jî yekê di navbera Nawar a din û Gir Nawas a nêzîkî Nusêbînê de ewa ku vekolanin Tirekî anha lê dibin û şandê naskir ku ew cih berî hezarsaliya duwem b.z. bi navê Nawali dihat binavkirin û dibe ku navê Nawar hatibe veguhestin Nawali.<sup>163</sup> Li gel van şaneşînan çend bajarin Hurrî mîna şaneşînin biçûk berz bûn û di herêmin cuda de, mîna:

- Urşu: li Bakurî Sûrî rojavayî Ferêt, ya ku ta niha cihê wê ne hatiye naskirin.
- Simirru: li ser averêjka jorî ya çemê Zapa jêrî û dibe ku di keleha Sîrwan de li ser çemê Diyala be.
- Azuhinnu: lêkolîner goman dikin ku heye ew Telilhewa be rojavayî Mûsil û çemê Dicle, yan jî Hemoker a li Sûrî be başûrî rojavayî Tel koçek û heye ku gihabe herêmên derdorî averêjka jorî ya newala Seffan ta kinarên Torabdînê.
- Eluxut: di herêmên çiyayê Torabdînê rojhilatî Mêrdînê.
- Tukriş: Başûrî deryayoka Urmîyê, tê wê baweriyê ku ew li herêma Loristan, yan Kurdistan li Îran be.
- Kimaş: Bakurî çiyayê Hemrîn ta çemê Zapa jêrî.
- Hurti: herêmên derdora Kerkûk.
- Karaxar: herêmên Diyala yan robarên wî, yan jî dibe ku ew Qesir Şêrîn be.

<sup>160</sup> Till Beyder (Girê Beyder) dikeve bakurî Rojavayê bajarê Heskê bi 30 k.m.

<sup>161</sup> - Cewaşim Britz Şinayder, "*Nabada Medîneton Defîneton fî Şemalî Sûriya*", ter. Xesan Helbûnî we Ednan el-Hemwî, Mecelletu'l-'Ulûm (el-Kiwefîye), mucelled 17, c. 1-2, 2001, r. 5,12.

<sup>162</sup> - dikeve başûrî Rojhilatê bajarê Qamişlo bi 30 k.m. demekê nvê wê Şexna bû paytextê Şaneşîna Apûm ya Hûrî bû û demekê paytextê Dewleta Aşûriyan bû di serdema Şemşî Edd de û navê wê (Şebet Enlil) bû, b.f. bnr. Texrîd Ce'fer'l-Haşimî we Hasen Husên 'ugla, **el-Îsanû Tecelliyatu'l-Ezmîne (Tarîxu we Hedaretu Bîlad'er-Rafîdeyn-el-cezîretu's-Sûriya)**, daru't-Telî'etu'l-Cedîde, Dîmeşiq 2001, r. 221-226.

<sup>163</sup> - Vilhilm, h.b., r. 33-34.

- Aşalka: di wan herêmê ku bi navê sêkoşa Xabûr de.
- Xaşşu: dibe ku ew Mer'îş a niha li Turkeyê be.<sup>164</sup>

#### 1.1.4. Şaneşîna Mîttanî Ya Hûrî / Xûrî:

Li derdorê nivê hezarsaliya duyem b.z. de Hûriyan karîbûn şaneşîneke hêzdar bi navê Xurri-Mittanî ava bikin. Paytexta wan Waşşukanî bû, ya ku ta niha cihê wê ne hatiye naskirin, tevî ku tê baweriyê ku ew girê Fixêriyê be li rex Serê kaniyê.<sup>165</sup> Navê Mittanî cara yekê di deqekê serdema Thutmis I (1528- 1510b.z.) Fir'ewnê Misrê bi şeweyê Mayttani hatiye dûvre peyv hatiye meylkirin bûye Mittanî û hê wata nav ne nas e.<sup>166</sup>

Zore resimkirina sînoren Mittanî, lê merov dikare herêmên desthilatdariya wan nas bike; ew ji aliyê Rojava ve gihne Derya Sipî. Vekolanên şunmayî li Alalx (wîlayeta Hatay li ser çemê Asî ber bi deryayê ve) vê hebûnê teqez dikin, çiku Idrîmî şahê Alalax bi desthilatdarî ya wan ve girêdayî bû, nivîsandina li ser peykerê wî vê diyar dike.<sup>167</sup>

Mittanî bi himbizî li herêmên Ugarit (nêzîkî Ladiqiyê)<sup>168</sup> belav bûn, sedem jî bihtir tên dîtin ku ji armancin bazirganî bû, çiku hejmara wan pir bû û pir şunmayên wan hatin dîtin.<sup>169</sup> Mittanî Heleb jî xiste bin desthilatdariya xwe<sup>170</sup> û Karkamîş<sup>171</sup> yek ji navendên giring bû ji desthilatdarên Mittanî re li Bakurê Sûrî ûyekser bi şahê Mittanî ve girêdayî bû<sup>172</sup>, ji Başûr ve gihan Qatna bakurî rojhilatî Himsê<sup>173</sup> û ji

<sup>164</sup> - b.f. li ser belavbûna Hûriyan, bnr. Îsmâil, "*el-Hûrîyûn fî Bîlad Apûn Xîlale'l-Esre'l-Babiliyî'l-Qedîm*", r. 85-89.

<sup>165</sup> - Dûrî bajarê Serê kaniyê (Rasu'l-Eyn) bi 2 k.m ra ye, hate naskirin ku navê gir di hezar sala ykem b.z. de (Sêkanî) bû, ne dûre ku Waşşukanî bi demê re bû ye Sêkanî.

<sup>166</sup> - vilhilm, h.b., r. 48.- Mer'î, h.b., r. 102.

<sup>167</sup> - Liyonard Willî, **Alalax Memleketon Mensîyeton**, ter. Fehmî ed-Dalatî, menşûratu wezartu's-Seqafe, Dîmeşiq 1992, r. 119.

<sup>168</sup> - Ogarît (Ras Şemra): Bi 11 k.m bakurî bajarê Ladiqiyê li Sûriyê, lê hate dîtin elêfbaya ya herî kevin.

<sup>169</sup> - Seffîya Se'ade ûgarît, mûessesetu Fikir li'l-Ebhas we'n-Neşir, Beyrût 1982, r. 14.

<sup>170</sup> - Sibhî Sewwaf, **Tarîxu Heleb-Heleb Qeble'l-Islam**, Heleb 1972, r. 29.

<sup>171</sup> - Kerkemîş (Cerablus) li ser çemê Ferat, li ser sînorê Tirkî û Sûriyê ye.

<sup>172</sup> - Horst Kilîngil, **Tarîx Sûriya's-Siyasî (3000-300q.m)**, ter. Seyfu'd-Dîn Diyab, daru'l-Mûtenebbî, Dîmeşiq 1998, r. 136.

<sup>173</sup> - (Qetna) Till'l-Mişîrfê: dûrî bajarê Himsê li Sûriyê ye bi Alî bkurî rojhilat de bi 18 k.m.

rojhilat ve gihan çiyayên Zagros piştî têkçûna aşûriyan bi destê şahê mîttanî Sauštatar nêzîkî 1450b.z.<sup>174</sup> û Nuzî (Yorgan tepe) ji giringtirîn navendên Mîttanî yên siyâsî tê jimartin bi şaneşîna Arrabxa (Kerkûk) re.<sup>175</sup> Vekolanên ku li Tilberek teqez dikin ku ew cih yek ji bajarên sereke yên Impiratoriya Mittanî bû, vekolanên ku li herêmin cûrecûr ji Cezîra Sûrî bûne teqez dikin ku herêm bi tamamî di bin desthilatdarîya Mîttanî de bû. Ev encam ji herêm û cihin cuda hatin.<sup>176</sup>

Mittanî gelek şer û ceng bi misrî, aşûrî û hittiyên re kirin, dûvre têtikiliyên diplomasî û mervantî (jindan û jinanîn) bi fir'ewnên Misrê re danîn. Bihtir di dema Aminhotp III (1405 -1367b.z.) de xurt bûn. Ji navdartirîn xatûnên (dotmîr) mîttanî ku bi Fir'ewnên Misrê re şû kirine (zewicîne) Tadu Xipa ya bi navê xwe yê misrî Nefertîtî hat naskirin, ew keça şah Tušratta bû ku derdorî 1350b.z. de desthilatdarî kir û di wê serdemê de misriyan welatê Subartu bi navê Naharina nas kirin û Sûrî û herêmên di bin destên mîttaniyan de bi navê welatê Xurru nas kirin, çiku Hurriyan desthilatdarî li wan dikirin. Ev navlêkirin di nameya Mittanî de hatiye, ewa ku Tušratta şahê mîttanî ji Aminhotp III Fir'ewnê Misrê re şandiye û bi zimanê Hurrî.<sup>177</sup> Zimanê hurrî bi navê Xorox hat naskirin, weha jî di deqên Hittî de bi navê Xurlili hatiye, ew ji Xurla ango Hurrî derbûye<sup>178</sup>.

Ji destpêka serdema Aminhotp IV (Axnatun) (1364-1347b.z.) ve têtikiliyên Misrê û Mittanî qels û lawaz bûn, ew jî ji ber ku Axnatûn bi çaksaziyên olî mijûl bûbû û ji ber hevrikîyên navxwe Mittanî himberî bilindbûna hêza Hittî zeîf bûbû û di encam de Misrê xwest hêza nû ya Hittî bîne rex xwe li şûna mîttaniya lawaz. Ew hêz bi pêş de hat û herêmin fereh ji Mittanî dan ber xwe û desthilatdarî li wan kir. Nakokî di nava Mittanî de zêde bûn ta parçe bû û bû du şaneşîn; ya Rojhilat navenda wê Teidu bû<sup>179</sup>, pêşewayê wê Artitma II bû, aşûriyan piştgiriya wî dikirin. Ya din Rojava navenda wê Waşşukani bû, vê dawiyê hêzên hittî derbas bûn û ew talan kirin,

<sup>174</sup>- Ebdulezîz Osman, **Me'alîmu Tarîxi's-Şerqi'l-Qedîm**, daru'l-Fîkî'l-Hedîs, Libnan 1966, r. 469.

<sup>175</sup>- Nûzî (Yorgan Tepe), dûrî bajarê Kerkûkê ye bi 20 k.m.

<sup>176</sup>- Dêvid Ots we Con Ots, **Till Birak, et-Te'awin es-Sûrî'l-Birîtanî fî Mecali'l-Asar**, mektebetu'l-Esed, Dîmeşiq 1998, r. 5.

<sup>177</sup>- Bi firehî li ser têtikiliyên Mîttanyan û Misiryan, bnr. Farûq Isma'îl, **Resailû'l-Emarîneti'd-Diwelîyetî**, Dîmeşiq 2010, r. 133-221.

<sup>178</sup>- vilhilm, h.b., r. 19.

<sup>179</sup>- Te'îdo (Till Himêdî): Başûrî bajarê Qamişlo bi 20 k.m.

mîna ku dest danîn ser gelek ji herêmên mîttaniyan li Sûrî, piştî ku çemê Ferat derbas kirin (1342 -1339b.z.), da rewşa mîttaniyan xirabtir bibe û desthilatdarî ji rojavayî Ferêt ji dest wan derkeve, sînorên wan pir teng bûn. Piştî kuştina Tuşratta bi destê lawekî wî, serokên li pey hatin nikarîbûn xwe li ber hêza hittî bigrin û sûpa şahê aşûrî Adad Nirari I (1307 -1275b.z.) ew dan ber xwe ta dawîtirîn şahê wan têk birin û di dawiya sedsala 13b.z. de dawî li şaneşîna Mittanî anîn<sup>180</sup>.

### 1.1.5. Kaşşu (1595 -1157b.z.):

Ji mîletên Zagros ên Hindoarî ne, li çiyayên Loristanê bi cih bûn. Kevintirîn car hatine ziman di deqekî serdema şahê babilî Samsu-îlîna (1749- 1684b.z.) dema ku sala 9an ji desthilatdarîya xwe bi (sala sûpaya kaşî) bi nav kir, mîna wî şahê babilî Abbi îux (1711-1684b.z.) xwe serbilind dibîne ku kaşî têk birine û ew jî salek ji salên desthilatdarîya xwe bi (sala têkbirina sûpaya ekkadî) bi nav kiriye. Ev nîşana xurtbûna kaşîyan e di wê demê de, tevî ku babilîyan karîbûn êrîşên wan bisekinînin. Xuyaye di pey re kaşî bi awake aşitiyane koçber bûne ber bi Babil de û li wir dest bi çandiniyê kirin<sup>181</sup>. Hêdî hêdî hejmara wan pir bû. Hina ji wan jî bi koçberî berê xwe dan Terqa navenda şaneşîna Xana li ser Ferata navîn, çiku navin kaşî ji şahin Terqa re berz dibin; ji wan Kaştilyaşu yên ku bi Babil re şer kirin.<sup>182</sup>

Ji xwendina pêvajoya bûyerên ku hiştin Babil bikeve dest Hittiyan û vekişandina wan di pey re ji Bercewendiya kaşîyan re me diğhîne encamekê ku alîkariyeke xurt di nabêna Hittî û Kaşşu de û dibe ku kaşî bi xwe dagîrkirina Babil hêsan kiribin, fêde ji hebûna xwe wek hêzeke bi kêr di Ana de kirin û dibe ku hevbendiyek jî di nav Kaşî û Hittiyan de hebe di şerê Baibil de, çiku deq dibêjin ku piştî ku Hitti ji babil vekîşîyan hin ji malê talanê ku ji Babil qezenc kiribûn, li Xana li pey xwe hiştin, mîna pûtê xwedawend Merduk û jina wî.<sup>183</sup>

Kaşîyên ku navê xwe ji meznê xwedawendên xwe (Kaşşu) birine dor çar qern

<sup>180</sup> - Isma'îl, **Resaîlû'l-Emarînetî'd-Diwelîyetî**, r. 40-43.

<sup>181</sup> -Mer'î, h.b., r. 93.

<sup>182</sup> - Terqa (Till el-Eşşara): Li ser çemê Ferate, nezîkî bajarê Dêrezzor ye li Sûriyê, b.f. bnr. el-Haşimî-h.b., 227-229.

<sup>183</sup> -Baqir, h.b., r. 494.

û nîvan desthilatdarî li Mezopotamya kirin (1595 -1157b.z.), 27 şah î hukum di vê demê de kirine û Babil bi navê welatê Kardunyaş hat naskirin û şahên wan naznavê (şahê Kardunyaş) wergirtin.<sup>184</sup>

Piştî ketina Babil yekemîn şahê wan Agum II bû, yê ku xwe serbilind dibîne ku ew ji tuxmê Şuqamuna ye; xwedawendê çiyar û cengê li ba Kaşşu û dibêje ku Xwedan ew ji desthilatdarîya welat re hilbijartine. Wî sînoren dewleta xwe ji aliyê bakur û rojhilat ve fereh kir ta gihand Ormiyê li Îran û hewl da ku bi başûr ve jî here lê şahê (welatê derya) di ruwê wî de sekinî, ew hêza ku piştî ketina Babil û vekişandina Hittiyar li başûrî Mezopotamya hat avakirin.<sup>185</sup>

Piştî wî neh şahan desthilatdarî kirin, lê nijandina wan lipey hev ne nas e, lê xuyaye ku hukum di dest Burnaburyaş de bû û karîbû têkiliyî xweş bi aşûriyan re deyne û peymanan ji bo sînor bi şahên wan re nemze bike. Dora 1500b.z. Kaşşu karîbûn herêmên xwe bi başûr ve fereh bikin ta welatê derya roxandin û di bin desthilatdarîya wan yekîtiya Mezopotamya pêkhat.<sup>186</sup>

Kaşşu têkiliyî xweş bi aşûriyan re li dar xistin û di dema şah Karaindaş de li dor 1450b.z. de hevpeymanan sînor nû kirin, li pey wî lawê wî Kadaşman Xerbe (1410 -1386b.z.) hukum girt û şerê Suti yan kir.<sup>187</sup>

Kaşşu têkiliyî xweş bi misriyan re jî lidar xistin, tê xuyanî ku Kaşşu bûn ji giringtirîn hêzên cihanê di wê demê de, nexasim piştî lawazbûna Impratoriya Mittanî û herifandina wê di paş re. Nameyî şahên Kaşşu û Fir'ewnên Misrê ku ji hev re şandibûn hene van têkiliyan zelal dikin; Kadaşman Enlil I (li dor 1364 -1350b.z.) têkiliyî diplomasi baş bi Fir'ewnên Misrê re ava kirin û xuşka xwe bi fir'ewn re zewicand, lê ew têkilî bi wê germbûnê ne gihan dawî. Mezopotamya di serdema wî de ji pir aliyar ve geşbûnek xweş dît. Şahê kaşî yê din ku xwe nêzîkî misriyan kir û

<sup>184</sup> - b.f. li ser Kardoniyaş, bnr. Samî Se'îd'l-Ehmed, "*Fetretu'l-'Esri'l-Kaşî*", Meceretû Somer, r. 135, Mewqî'u Abualsoof, (m.w. 17.02.2013)

<http://www.abualsoof.com/INP/Upload/Books/Alkashi.pdf>, (m.j. 10.08.2015).

<sup>185</sup> - Mer'î, h.b., r. 94.

<sup>186</sup> - Baqir, h.b., r. 497.

<sup>187</sup> - Sûtî, 'eşîrenin bedewî bûn li beriya Şamê diyan, êrîşî bajara dikirin, bnr. Mer'î, h.b., r. 95.

têkilî bi wan re xweş kirin Burna Buryaş II bû (li dor 1349-1323b.z.).<sup>188</sup>

Qûnaxa kaşî ku mirov bide ber qûnaxên din ji dîroka Mezopotamya, qûnaxa kêr û ceng e, ji lewra di dema wan de pêşketineke aborî çêbû û guhdan bi awakirinê bi awakî mezin bû nemaze ya perestgehê, di destpêkê de Babil ji xwe re kirin paytext, lê dûvre şarekî nû ava kirin û ew kirin navenda desthilatdariya xwe; ew şar Dur Kaligalzu bû, li herêma ku niha bi navê Aqerqofê naskiriye, nêzîkî Bexdê, da dûrî dîndarên (kahinên) Merduk kevin û gotina wan hinekî daxînin.

Tevî ku bandora miletên Mezopotamya li wan bûbû, lê Kaşşu bi xwe jî bandoreke xwe kirin, bi saya wan hesp bi berferehî derbasî Mezopotamya bûn û di şer û cengan de, weha jî di veguhstinê hatin bikaranîn û di dema wan de kevrê sînoran (Kudurru) hatin naskirin, bo nîşankirina xak, milk û sînoran, weha jî edebiyat di dema kaşî de geş bû.<sup>189</sup> Kaşşu ti neqşên bi zimanê wan nivîsandî li pey xwe nehiştin, çiku wan zimanê babilî û carna yê sumerî baş bi kar tanîn, lê dîsa jî zanyar û lêkolîneran karîbûn hin peyv û navên kaşî derencam bikin.<sup>190</sup>

Kaşşu hêzdar bûn ta ku wa ewqasî salan hukum li Mezopotamya bikin, lê bi derketina hêza aşûrî û şaneşîna Îlam re ew hêz hêdî hêdî lawaz bû, îlam êrîşî Kaşşu kir û bi ser ket lê aşûriyan destê Kaşşu girtin û ne hiştin ku biroxe û Babil heft salan di bin destê aşur de ma. Tevî ku Kaşşu desthilatdariya xwe vegerandin, lê îlamiyan şaneşîna wan roxandin û desthilatdarî ma ji wan re di dawiya sedsala 12an de (1168 - 1162b.z.) ûhemû gencîne û şûnmayên wan birin paytexta xwe Susa.<sup>191</sup>

Tevî ku hin ji wan li Îranê man, lê xuyaye ku Kaşşu bi Babiliyanre têkel bûn û jiyana xwe bi wan re domandin, çiku deqîn aşûrî yê sedsala 7b.z. wan tînin ziman.<sup>192</sup>

---

<sup>188</sup>- b.f. li ser têtikiliyên Kaşşu û Misriyan û Peyamên di navbera wan de, bnr. Isma'îl, **Resailû'l-Emarîneti'd-Diweliyefî**, r. 72-127.

<sup>189</sup>- Baqir, h.b., r. 499-505.

<sup>190</sup>- F. Fon Zodin, **Medxelon île Hedaratî's-Şerqî'l-Qedîm**, ter. Farûq Isma'îl, daru'l-Meda, Dîmeşiq 2003, r. 34.

<sup>191</sup>- Ebdulezîz Salih, **eş-Şerqu'l-Edna'l-Qedîm (Misir we'l-Îraq)**, mektebetu'l-Angilo'l-Misriya, el-Qahîra 2012, r. 743. - Baqir, h.b., r. 508-509.

<sup>192</sup>- Zodin, h.b., r. 34.



### 1.1.6 Mîdî

M. Emîn Zekî hin ji nerînên lêkolîner û rojhilatnasan li ser têkiliyên Mîdiyan bi kurdan re radixîne, dûvre dighe encamekê ku mîdî bi eslê xwe pir nêzîkî kurdan in.<sup>193</sup>

Lê çawa be jî lêkolîner li ser eslê Mîdiyan ê Hindoarî pir ji hev ne cudane û li ser koçberiya wan di dawiya hezarsaliya 2b.z. de ber bi Îranê ve û li herêmên Kurdistan, Hemedan û Azerbeycan bi cih bûn. Xuyaye ku mîdî di destpêkê de wek cemaet û êlin belawela jiyana xwe diqedandin, vê yekê yên derdora wan li wan sor kirin û hişt ku bibin yek li dijî wan êrîşan.<sup>194</sup>

Cara pêşî ku navê Mîdiyan hatiye ew di neqşên şahê aşûrî Şalamanssar III dorî 840b.z. de. Neqş dibêjin ku warê wan Bakurî rojavayî Îranê, lê warê fursan Rojavayî Îranê bû.<sup>195</sup>

Şah Şaamşi Aded V (823 -811b.z.) dibêje ku ew bi hêza xwe ya leşkerî ve ber bi welatê Mîdiyan ve çûne û piştî şerekî giran karîbû zora wan bibe û pir leşkerên wan kuştin û êsîr kirin, welatê wan wêran kir û gund û bajarên wan şewitandin û li gorî deq dibêje gihane 1200 cihî.<sup>196</sup>

Metirsiya Urartu li ser Aşşur pir bû di dema şahê wan Aded Nirrari III de (810 -783b.z.) û dest danî ser herêmin Aşûriyan, Aded Nirrari III êrîşin birin ser wan û ew vegerandin, lê piştî mirina wî Aşşur lawaz bû, ew lawazî nêzîkî 37 salan dewam kir, vêya hişt ku Urrartu kara êrîşin leşkerî bikin û dest danî ser gelek herêman û hin herêmên derdora deryayoka Ormiyê di nav de.<sup>197</sup>

Di dema şah Teglet Flîsser III de (744 -727b.z.) Aşşur hêdî hêdî bi ser xwe ve hat û bi cengên xwe di Îranê de xaka xwe fereh kirin, di neqşên li ser serkeftinên xwe

<sup>193</sup>- b.f. bnr. Zekî, **Xulasetû Tarîxû'l-Kurdî we Kurdistan Min Eqdemi'l-Usûr Hette'l-An**, r. 135-136.

<sup>194</sup>- Bedî' Muhemed Cum'a, **Medxelon Île Hedaretî Îran Qeble'l-Islam**, (b.m, b.c), r. 25.

<sup>195</sup>- Zodin, h.b., r. 35. Di hewliyâtên sala 844 b.z. hatiyê behsa Fîrsa (Parswa) û behsa Mîdiyan 836 b.z., bnr. Ehmed Emî Selîm, **Dirasaton fî Tarîxi'ş-Şerqi'l-Edna'l-Qedîm (Misir-el-Îraq-Îran)**, daru'n-Nehdeti'l-'Erebiye, Beyrût 1989, r. 490.

<sup>196</sup>- el-Berwarî, h.b., r. 119-120.

<sup>197</sup>- h.b., r. 123-124.

hiştine dibêje ku wî dijminê xwe roxandine û malê talanê pir qezenc kiriye û wî berê xwe daye Midya jî<sup>198</sup> û li ser Midya dibêje: "Ez ketim wîlayetên Mîdiyên xurtî bi hêz, min gelek ji wan serjêkirin ta hejmara wan giha 65000 kesî û min pir talanin cûrecûr bi dest xistin; hesp, hêştir (qantir), deve û keriyên pez bi hejmareke gelek min ew bi xwe re hilgirtin û anîn welatê Aşşur".<sup>199</sup> Heger tiştê ew dibêje rast be naxwe welatê Mîdiyan pirr bi xêrûbêr bû û heye ku vê xêrê hiştibe ku aşûrî êrîşî wan bikin. Piştî serkeftinê xwe dibêje ku: "Min karmendên Aşşur şandin xaka Mîdiyên xurt li Rojhilat".<sup>200</sup>

Lê Sargon II (722 -707b.z.) siyaseteke taybet bi Mîdiyan re meşand; pirr cihû koçberî bajarên wan kirin û dema Barasua serî li ber rakir wî ew vemirand û di encam de 28 mîrekên mîdî danpêdan bi desthilatdariya Aşûr kirin û di sala 713b.z. de êrîşek bir ser Mîdiyan û xwe serbilind dibîne ku wî serokên wan êsîr kirin, ji nav wan Diyakku yê ku ew surgûn jî kir.<sup>201</sup> Di paş re serokê mîdî Keşterittî berz bû û bi saya wî êl û eşîrên mîdî bûn yek û li dor malbata wî xwe dan hev. Hin dibêjin ew lawê Diyakku ye û hin dibêjin neviyê wî ye.<sup>202</sup>

Yekîtiya êlên mîdî ji çiyayên Hemawendê ta bajarê Hemedanê weke bersivêkê bû ji rewşa xerab ku dewleta aşûrî tê re derbas dibû, wan qezencê ji nakokiyên ku Aşşur bi Urarttu, aram, Babil û Îlam re vekiribûn re bikin.<sup>203</sup>

Bi hatina Eserheddon re (680 -669b.z.) ser erşê welatê Aşşur têkiliyên xwe bi serokên Mîdiyan re xweş kirin û siyaseteke aştiyane bi wan re meşand û dema wan alîkarî jê xwestin bo vemirandina serhildanên dijî wan, wî alîkarî kir û ewlehî li herêmên wan vegerand, weha jî serperîşt û desthilatdarin aşûrî jî ji wan re şandin.<sup>204</sup>

<sup>198</sup>- Selîm, h.b., r. 494.

<sup>199</sup>- el-Berwarî, h.b., r. 133-134.

<sup>200</sup>- h.b., r. 134.

<sup>201</sup>- Diyakku û Keşterittî navê wan bi renekî din tê bi karanî (Dayukka, Xeşatrîta, Xeşterit) û ji bo Keşterittî û nêzîkiya wî ji Diyakku re, bnr. Ehmed Mehmûd Xelîl, **Memleketu Mîdiya**, Metbe'etu Rojhilat-Müessesetu Mûkiriyanî, Erbil 2011, r. 49 .

<sup>202</sup>- Ūsama Ednan Yehya, **Tarîxu's-Şerqi'l-Edna'l-Qedîm**- Dirasat we Ebhas, teb'etu Aşûr Banîbal li'l-Kîtab, Bexdad 2015, r. 62-63. Selîm, h.b., r. 495-496.

<sup>203</sup>- Ehmed Fexrî, **Dirasaton fî Tarîxi's-Şerqi'l-Edna'l-Qedîm (Misir we'l-Îraq- Sûriya, el-Yemen-Îran) Muxtarat mine'l-wesaiqi't-Tarîxiye**, mektebetu'l-Angilo'l-Misriya, el-Qahîra 1963, r. 213.

<sup>204</sup>- el-Berwarî, h.b., r. 151.

Di pey re Kuştaritti karîbû xwe bi ser hev de bîne û bi şoreşekê li dijî aşûriyan rabe, ew di Avdara 673b.z. de bû. Ehmed Xelîl ser zimanê Dşakonoff vediguhêze bê çawa bûyer qewimîn û di orta Nîsanê û destpêka Gulanê 673b.z. hemû herêmên Mîdî ji aşûriyan azad bibûn.<sup>205</sup>

Di çaxê Aşşur Banipal de (669 -627b.z.) Manî yên cîranê Mîdiyan bûn li ber Aşûriyan serî hildan û Mîdiyan jî alîkarî dane wan, bo vî karê wan wî jî êrîşek bir ser Mîdiyan û dest danî ser çend gundên wan û hin serkirdeyên wan êsîr kirin, mîdî jî bi serokatiya Kuştaritti li wan vegeyriyan û êrîş birin ser nînewa sala 653b.z., lê êrîşa wan bi ser ne ket û Kuştaritti di wê cingê de hat kuştin.<sup>206</sup>

Hîrodot dibêje ku Frauretss (Kuştaritti ye) berî ku di cenga dijî aşûriyan de têk here dest danîbû ser fursan û herêmin fereh ji yên wan xistibû bin destê xwe. Wî 22 salan hukum kir.<sup>207</sup> Sikissiyên êrîşî Asia navîn, Sûrî û Îranê kirin û şaneşîna Urartu roxandin, Midya jî di nav wan welatên ku dagîr kirin de bû, nêzîkî 28 salan hukum lê kirin (653 – 626b.z.), pir tundûtûjî li dijî Mîdiyan bikar anîn, ta ku pêşewayê mîdî Kî Exsar lawê Kuştaritti hat û ji bin hukmê sikîssiyên rizgar kirin û welat bi rêkûpêk kir, hêza wî lê vegeyrand û Ekbatana kir paytext. Bi babiliyan re hevpeyman danîn û hevbendî bi wan kir û sala 612b.z. dawî li Impiratoriya aşûrî anîn piştî ku paytexta wan Nînewa wêran kirin.<sup>208</sup> Lê piştî demeke kurt aşûriyan li Herranê dijî Mîdiyan serî hildan, lê bê mifa bû û sala 609b.z. bi temamî ew têk birin û mîdî û babiliyan şûnmayên Impiratoriya aşûrî li hev par kirin.<sup>209</sup>

Hîrodot tê li ser bûyerên bûne diaxive û çawa şaneşîna aşûriyan herifî, tundûtûjiya ku sikissiyên dikirin û zilm û zora ku li milletên bin hukmê xwe dikirin û dibêje çawa şahê mîdî xwe ji wan xelas kir, serokên wan vexwendin mal û ew kuştin da di pey re şaneşîna aşûrî têk bibe û çil salî hukum kir.<sup>210</sup>

Di dema Kî Exsar de welatên Aşşur, Faris, Midya û dorûpiştên Asia biçûk tev

---

<sup>205</sup> - Xelîl, h.b., r. 54-55.

<sup>206</sup> - Yehya, h.b., r. 64.

<sup>207</sup> - Hîrodot, h.b., r. 80.

<sup>208</sup> - Fexrî, h.b., r. 211-214.

<sup>209</sup> - Zodin, h.b., r. 70.

<sup>210</sup> - Hîrodot, h.b., r. 81-82.

ketin bin hukmê Mîdiyan û şahê wan Kî Exsar û Impiratoriya Mîdya dijraberî bi şaneşîna Lîdya re kir, da di dawî de bi wan re bighê danîna hevpeymaneke aştiyê û lihevhatinê di 28 Gulana 585an b.z de piştî derbasbûna Babil bi xêrxwazî di nav wan de. Piştî mirina Kî Exsar lawê wî Istiyags (584 -550b.z.) şûna wî girt, li ser erş rûnişt da dema wî bi destêwerdana Koreş bi dawî bibe û desthilatdarî were veguhestin û bikeve destê Ixmîniyan.<sup>211</sup>

Çawa desthilatdarî ket destê Koreş de Hîrodot dibêje çî di nav Mîdiyan de qewimî û nakokiyên wan li gel xayintiya hina ji wan, vê yekê rîya derbasbûna Koreş hesanî kir ku erş bi dest xwe bigre (550 -529b.z.), da ku malbateke nû hukmê Îranê bi dest xwe xînin bi navê Ixmîniyan ya ku dewam kir ta hatina Iskenderê Mekdonî 331b.z.<sup>212</sup>

Mîdiyan hindik şahidên nivîsandî û hunerî li paş xwe hiştin, ji ber wê lêkolîner nikarin weke tê xwestin vekolînan li ser çanda wan bikin, lê dibînin ku roleke Mîdiyanî mezin di derbûna ola Zeradeştî de hebû û li hemû Îranê belav bû ta di paş re giha derveyî wê, ev ola ku bû ola fermî ya dewleta Mîdî ta ketina wê. Di paş re wek ola dewletên îranî ku li pey hatin bidomîne, ji dewleta Ixmînî û bi şûn de.<sup>213</sup>

### 1.1.7. Kerdux/Kardox

Miletê din ê ku giringiya wî ji kurdan re heye ew Kardux e, yê ku pir dîroknivîs wî bavikê kurdan dibînin, mîna lêkolîner Basîlî Nîkkîtin yê ku wan bi çiyayiyên mêrxas pesin dide û dibêje ku hebe nebe ew bapîrên kurdan in.<sup>214</sup>

Kevintirîn car ku qala Karduxiyên bûye di pirtûka Anabasis a dîroknivîs ê

---

<sup>211</sup>- Yehya, h.b., r. 65.

<sup>212</sup>- b.f. bnr. Hîrodot, h.b., r. 82-93.

<sup>213</sup>- b.f. li ser Zeradeşt û Zeradeştî, bnr. Cemşîd Yusufî, **ez-Zeradeştîye-ed-Diyanetu we't-Tiqûsu we't-Tehewilatu'l-Lahîqetî Bina'en 'ela Nisûsî Avêsta**, Mektebetu Zeyn el-Hîqûqiyetî'l-Edebiyetî, Beyrût 2012. - Faris Osman, **Zeradeşt we'd-Diyanetu'z-Zeradeştîye**, daru'l-Mehebbe Dîmeşq/daru'r-Raye Beyrût 2003. - Xelîl Ebdurrehman, **Avêsta- el-Kîtabu'l-Muqeddesî lid-Diyaneti'z-Zeradeştîye**, Rewafid lis-Seqafetî we'l-fînûn, Dîmeşiq 2008. .

<sup>214</sup>- b.f. ji bo nêrînin li ser Kerdox û Kurda, bnr. Basîlî Nîkkîtin, el-Kurd- Diraseton sosyolojîyeton we Tarîxiyeton, ter. Nûrî Talbanî, Mûessestu Hemdî l't-Tiba'etu we'n-Neşir, es-Suleymaniye 2007, r. 42-48.

yûnanî Xenophon de ye (430 -354b.z.) dema li ser helba leşkerî ya Grece (Yunani) diaxive, a ku bi navê helba deh hezar şerker hat naskirin, ya ku bi hawara Koreşê biçûk desthilatdarê Lîdya Exmînî ve hat di şerê wî dijî birayê şahê Exmînî Erdeşêr nêzîkî 401b.z., şerê ji bo ka erş ji heqê kê ye. Xenophon serwerê helbê bû dema vekişandina ji Mezopotamya ber bi Derya Reş ve û di herême Kurdistanê çiyayî de ket ruwê Karduxiyân.<sup>215</sup>

Ikzinîfon (Xenophon) li ser herêmen Karduxiyân dibêje ku herêmin şên bûn, hawîrdor rez bûn, şertên jiyânê baş di xaniyên wan de hebûn, li malên wan sêniyên sifir hebûn û baştirîn vexwarin di qebwê xaniyan de hiltanîn.<sup>216</sup>

## 1.2. RENGVEDANA DÎROKA MILET Ê ŞANEŞÎNIN KEVIN DI KURDISTANÊ DE, DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE

Dîroka kevin beşekî giring bû ji çavkaniyên peyxama Cegerxwîn bû, dema mirov li dîrokê di helbesta wî de meyze dike, em xweş hest dibin ku wî dîroka millet û şaneşînên ku li Kurdistanê dijberî dikirin xweş û kûr xwendiyê, navê wan milletên taybetiyên wan bi kurdan re hene berçav kirine û tiştê vê teqez dike wî pitûkek sax ji çend cildan bi navê "Tarîxa Kurdistan" nivîsandiye û cildê pêşî li ser dîroka Kurdistan a kevin sekiniye.<sup>217</sup>

Cegerxwîn hewldana xwe dikir ku carna helbesta xwe bike belgedîrokî û nasnamek ji milletê xwe re. Di binavûdengtirîn helbestê wî; helbesta KÎME EZ de Cegerxwîn mîna helbestvanekî nûjen xwe diyar dike û mîrxasiya xwe ku xwe bide xuyanîkirin wek kurdekî teqez dike, xwe bi dîroka xwe û jiyana îroyîn serbilind dibîne, weha jî bi pêşeroja xwe, tevî ku carna şeweyê klasîk derbasî nav şeweyê nûjen dibe, çiku ew li ser çandeke klasîk rabûye û bandoreke kûr li helbesta wî

<sup>215</sup>- Samî Se'îd'l-Ehmed, "*el-Îraq fi Kîtabat'l-Yonan we'r-Roman*", Meceretû Somer, r. 122, Mewqî'u Abualsoof, (m.w. 09.12.2012)

<http://www.abualsoof.com/INP/Upload/pdf/al%20iraq%20fi%20kitab%20al%20yanon%20wal%20roman.pdf>, (m.j. 10.08.2015). Ê b.f. li ser helbê bnr. Fûad Cemîl, "*Zinîfon fi'l-Îraq we Hemletu'l-'Eşretî Alafi Ixriqî*", Meceretû Somer, Mûceled 20, c. 1-2, Îsdatat Mudîriyetu'l-Asari'l-'ametî fi'l-Îraq, Bexdad 1964, r. 227-285.

<sup>216</sup>- Ehmed, h.b., r. 32-33.

<sup>217</sup>- Cegerxwîn, *Tarîxa Kurdistan*, c1.

hiştiye.

Helbesta "Kîme ez" peyv sivik û hesane, hevok asan û rewane, xîtaba serû di pir cihan de bi ser doxa helbestî dikeve, deq bû mîna xîtabekê di helkeftê de. Forma helbestê ya derve bi şêweke nûjen hatiye, belavkirina peyv û hevokan li ser pel bi awakî nûye, ne mîna helbestvanên kurd ên berî wî, ev şêwe ciwaniyekê dide deq; helbest ji çend birgeyên dirêj pêkhatiye, lê di hin birge jî hevok kurt pêk tê, bilêvkirina peyvvan hesanî dike, li gel ezberkirin û têgihiştina helbestê, helbestvan her awayên rewanbêjîyê bi kar tîne, canekî nû ji helbestê re diafirîne, kesayetiyin dîrokî hazir dike, bûyerên dema berê qewimîne, da bike hevîrtirşek ji hevîrê îro roj re, heye ku bi vê yekê wî dixwest îro bi berê (dîrokê) ve girêde û wan bi hevîrekî bistirê.

Di vê helbestê de helbestvan dixwaze xelkê cîhanê kurdan nas bikin, ew dibê zimanê milletê xwe, bi zimanê kesê yekem (axavder) yekane (ez) diaxive û dike pirs kî me ez?. Ew berê xîtaba xwe nade nefsa xwe, lê pêşî ji milletê wî re ye, dûvre ji cîhanê re.

Dema berê xwe dide milletê xwe ew jê dixwaze ku serbilind be, ji kevnê xwe fedî neke, xwe bi kiryarên bi rûmet, dîroka kevin, mêrxasî û canfîdaya bapîrên xwe payebilind bibîne, ev xîtab ji bo navtêdanek be ji vî milletê wî re ku riya xebatê bernede ta biğhêje serbestî û azadiyê û ji zilm û zorê xelas be; ew ji bo baweriya yê Kurd bi nefsa wî bê û têkçûn wî bê hêvî nekin, jê dixwaze ku bi şoreşek berferêh rabe da ku welatek serbest û azad bi dest xwe xîne, xewna mezin pêk bîne.

Ji aliyê din ve ew berê xwe dide cîhanê ku rastiya kurdan nas bikin, dîroka wî nas bikin, ev milletê ku hatiye jibîrkirin, ew tîne bîra wan bê vî milletî çi kiriye, çi serkeftinên ku fêda wan li milletên derdorê jî bûne û di dawî ew bûne ardû ji tenûra ciranên xwe re; Ereb, Tirk û Faris.

Helbestvan yekser bi şêweyê xîtabî dibêje Kî me ez? û bi cînavê kesê axavder bersivê jî dide, pirs û bersiv herdu ji wî ne, li bende kesî namîne ku bersivê bidin, weke ku di hin malikan de berê xîtaba xwe dide xwe vê carê, yan ji me re weha dide xuyakirin da ku êş û azarên ku kurdan dîtine û kêşane bîne ber çavên me û şirove bike, rewşa welatê xwe ku di bin şer û ceng, êş û azar û şoreşan de westiyaye.

Ew ti gomanê nahêle û ne rê dide şirovene ew naxwaze, ji destpêkê de ew nasnameya xwe ya kurdî berçav dike û ew ji Kurdistan e, ew kurê şoreşker û çekdar, ewê bûye mîna bombekê di kîjan kêlikê de ewê di ruwê dijminê xwe de biteqe, ew mîna volkanê amadeye bi agirê xwe dijmin bişewitîne, ew agireke venamire. Dibêje:

*Kîme ez ?*

*Kurdê Kurdistan*

*Tev şoreş û volqan*

*Tev dînamêtîm*

*Agir û pêtîm*

*Sorim wek etûn*

*Agir giha qepsûn*

*Gava bîteqîm*

*Dinya dihejî*

*Ev pêt û agir*

*Dijmin dikujî*

*Kîme ez?*<sup>218</sup>

Helbestvan diyar dike ku Kurd ne ji Kurd tenê re ye, lê ew e yê ku Rojhilat û mîletên wê di rojên teng de ji şerxwazan parastîye, da ku ew bi xwe bibe rojhilat bi hemû payebilindiyên xwe ve. Ew bi vêya dixwaze ku ew tarîx di hinavê wî de bimîne, ji hişê wî dernekeve, da karibe pêşerojê xweş li ser ava bike, lewra di avakirina helbestê de balpiştî bi hevoka (kî me ez) kir, ev lêpirsa ku di destpêkê weke gerekê yan vekolînekê li zata kurdî ya windayî tê xuyanî û mîna dergehê be bo vedîtina nasnameya netewî, ev hevoka ku bû stûna sereke ji avakirina helbestê re, ne tenê ji aliyê form û şiklê wê re, lê ji naverok û canê wê re jî, eva ku helbestvan pê dest pê kir û her birgeyê jî pê bi dawî dike.

Li vir diyar e ku armanc ji vê bidawîkirinê ne dawîye bi qasî ku ew amadebûneke ji birgeke din re, tevî kurtayî û hasaniya wê ew di heman wextî de kûrbûna pirsê diyar dike, da derbasî hinavê xelkê bibe di riya gotinê di bîrdanka wan de mane (dijmin, gund, bajar) û giraniya êşê ji wan re şirove bike; çî di berxwedana di ber xwe de û çî di ber parastina Rojhilat de.

<sup>218</sup> - Cegerxwîn, *kîme Ez*, r. 9.

Li vir nîşanin xurtin ji girêdana bi cih ve re û pîrr wateyan ji vê girêdanê kurt dikin û canfîdayê di ber de dikin, ji ber qîmeta cih li ba helbestvan di wan têkiliyên di nav mirov û xwezayê de tîr xuyanîkirin, kevin û nû, (keleh, birc, ceng, zinar û lat) ev şûnmayên ku ji bo parastina wan gelek cangorî hatine dan. Ji bo berdewamiya vê parastinê gereke helbestvan bi awake nû, bi şêweke nû wan li hev siwar ke da di hiş û bîra xelkê wî de bimînin.

Bi mebest Cegerxwîn ew peyvên dîrokî di helbesta xwe de bikar anîne, da derbirînek be li ser daxwaziyeke tîgihîştî be bo gihandina wan payebilindiyên berê û di rîya vê helbestê re serdema xwe mehkeme bike, ev rewşa ku em ketinê û ew dijberî û nakokiyên kurdî di navbera berê û îro de.

Hestbûna bi azarkêşiyê dihêle ku ew li kevirna bigere da rewşa îro ya xirabe ava bike û li gor ew dibîne ew kevir di wê demê de ne; ew dema ku Kurd desthilatdar û rêberê welatê xwe bûn. Dibêje:

*Ez im rojhilat*

*Tev birc û ketat*

*Tev bajar û gund*

*Tev zmar û lat*

*Ji destê dijmin:*

*Dijminê xwînaxwar*

*Xurt û koledar*

*Ji rom, ji fireng*

*Di rojên pir teng*

*Bi kuştin û ceng*

*Parast, parast*

*Parast min ev rojhilat*

*Kîme ez?*<sup>219</sup>

Û heger qederê û nîrên ku kurd tîre bûrîne hiştibin ew ta niha di bin rehma rêjîmên desthilatdar de bin, lê dîroka wî ya kevin dide xuyanî ku ew serdest û xwedî biryar bû di welatê xwe de û li ser parçeke cugrafî mezin de, ew şah û hakimê

---

<sup>219</sup> - h.b., r. 9.



rojhilata jêrîn û ya navîn bû<sup>220</sup>. Wî pir şer û ceng bi mêrxasî derbas kirin û dijmin têk birin.

Ne tenê ji bo berçavkirinê ew dîrokê berçav dike, lê belê da ew navtêdanek û handanek be, da hêzgirti û ibretek be, ku Kurd serê xwe danexin û bi vê rewşa jar û perîşaniyê razî nebin, ew layiqî wê jiyana serbest in, ewa ku bapîrên wî dijyan. Dixwest ji yê ne kurd re bide xuyanî ku kurd bi tişteki xwe ne kêmi wan e û piraniya caran ew parastine li dijî sûpayên ku dixwestin welatê wan dagîr bikin.

Daxwaza wî ji vê berçavkirinê ew bû ku rewşa miletê wî ya îro ne li gorî resenê û esaleta tarîxa wî ye, ji ber wilo carna coşên wî zelal û ser rû ne, da bibe parçek ji kar û kiryarên ku gereke kurd pê rabin re, da bighin wê payebilindiya bav û bapîran.

Ez bi nerîna nivîskar Hesên Cengo re me ku ev helbest imbarek ji hizrûbîrê ye, mîna pêlin ji coşê li pey hev, nizm û bilind derdikevin weke derbirînekê li ser ewqas hevdişî û perîşaniya di qûnaxin cûrbecûr de ketine ser hev tene der.<sup>221</sup>

Helbestvan va ku vedenga dengê gel be, neynikek ji daxwaz û derbirînen wî re be, ew li serbilindiyin nû digere. Dibêje:

*Rojhilatê nêzîk*

*Rojhilatê navî*

*Ev bajar û gund*

*Ev bej û avî*

*Ket bin destê min*

*Pî da ser dijmin*

*Min bi ceng û şer*

*Zanîn û hiner*

*Piştî wî şikand*

*Serî lê gerand*

<sup>220</sup>- (Misir, Mezopotamiya, Filestîn, Sûriyê) di sedsala 19an de û destpêka sedsala 20an de dihatin naskirin bi Rojhilata kevin, lê dûvre weke tegeh ber firehtir bû û dewletin din jî tevayî wan bûn (Enadol, Qefqas, Cezîra Erebi, Hid, Çîn), b.f. bnr. Bongard Lîvn, **el-Cedîdu Hewle'ş-Şerqi'l-Qedîm**, ter. Cabir Ebî Cabir we Xeyrî ed-Damin, daru't-Teqddumî, Mosko 1988, r. 6.

<sup>221</sup>- Hesên Cengo, **Cegerxwîn min Imqî'l-Masatî Île Fedai'l-Insaniye**, (b.c.) 2013, r. 107.

*Ez bûm padîşah*

*Xurt û serbilind*

*Ketin destê min ta sînorê Hind*

*Kîme ez ?*<sup>222</sup>

Ew rêbaza ku di avakirina helbestê de Cegerxwîn daye ser, ew piştgiriyeke ji ramanên wî re di vexwestina bûyerin ji dîrokê de ku bi awake hesan û bê şiroveyin şaş xwendevan tê bigihê û bandora xwe weke tê xwestin li rewşa kurdî bike.

Ew carna kesayetiyin ku di dîrokê bûne nîşan û simbol tîne da giranbuhaya dîroka Kurd û encamdanên wan teqeze bike, ne tenê wan xwedî rola mezin di dîroka Îranê de bi bîr tîne (Guhderz, Restem, Ferhad,...) ew ên ku Firdewsî di Şahname de qala wan kiriye<sup>223</sup>, lê belê ew xwe bi wan serbilind dibîne ku ew bapîrên kurdan û lehengên wan e, xwe bi Kawa yê Newroz ji kurdan re kiriye simboleke netewî payebilind dibîne.

Dûrtir ji wilo jî diçe, di dîroka kevintir de diçe nav wan miletên ku li çiyayên Zagros û Mezopotamya roleke xurt li ser qada siyasî di sê hezar salên berî zayîne lîstin, diçe nav wan êl û herêmên ku Kurd û welatê wan ji wan pêkhatine; ewên ku bi kurtî me qala wan kir (Kardux, Mittanî , Nairi, Subar, Lolo, Gudi, Mad, Goş, Hurrî,...ûhd).

Li ser nijandina dîrokî, kîjan millet ji yê din kevintire ranewstiyaye, ew ne deqekî dîrokî lê helbestekê dinivîse û ciwaniya hunerî di helbestê de li ba wî di ser vanê din re ye, tiştê balkêş ku wî ev millet tev di birgekê de ji helbesta xwe anîne. Gelo ew dixwaze bêje ku ev tev yek gel in?! Yan ji yek tuxmî ne?! Yan nerîneke wî din heye, lê xuyaye ku encama ew dixwaze jê re girînge, lewra di nîv malikê de navê du miletan ji wan yan bihtir bi nav dike û li gorî nerîna wî ew Kurd in û ew in xwediyê vê cugrafya ku niha li ser dijîn û bi zimanekî helbestî hesan, da wê têtîliya di navbera Cegerxwînê helbestvan û Cegerxwînê dixwaze bibe dîroknivîs de ji xwendevan re teqeze bike. Ev helbest tije peyvên dîrokiye, da alaveke bikêr be di ruwê astengên li ber millet dertên de.

<sup>222</sup>- Cegerxwîn, *kîme Ez*, r.10.

<sup>223</sup>- Ebû'l-Qasimî'l-Ferdosî, *eş-Şahname*, ter. Semîr Maltî, daru'l-Ilmî li'l-Melayîn, Beyrût 1979.

Dixwaze hêviyê di hinavan de biçîne û kurdan ji bêhêvîtiya ji tekçûn û şikestinên ku ta îro bi xwe re hilanîne dûr bike û wan bibe wê serdema leheng û lihengiyê, dema tije serkeftin, da wan dehf bide ber bi guhertinê ve, ber bi rizgarbûna ji zor û zrodestiyê:

*Ez im ew Kardox Xaldêwê kevnar*

*Ez im ew Mîtan, Nayrî û Sobar*

*Ez im ew Lolo*

*Kardox û Kudî*

*Ez im Mad û Goş*

*Horî û Gudî*

*Ez im Kurmanc û Kelhor, Lor û Gor*

*Ez im, ez Kurd im li jêr û jor*

*Çend hezar salin*

*Kurdistana min*

*Perçe perçe ma*

*Bindestê dijmin!*

*Kîme ez?*<sup>224</sup>

Wî ew saxleta ku bi yê kurd ve hatiye girêdan ji bîr nekiriye; ew serhişkiya ku tê gotin kurdan ew ji çiyayên xwe yên pozbilind girtine, ne tenê weha, lê helbestvanê me xwe bi vê saxletê paye dike û xwe pê dibîne ku ew hîna ew kurdê serhişk e û li gel vê rewşa lawazî ku dijî hê dijmin jê ditirse û jê dipelikîne, ev jî nîşaneke ku ew xwedî heq e di vê xakê de û doza wî dozeke rewa ye, bi hemû hestên xwe ew bûye komek barûd û agir û her tişt li dorê wî dehf dide ku careke din derkeve ser çiyê mîna bapîrên xwe serî li ber mirinê hilde, dixwaze li Kurdistanê bijî, ew xewna ku xwe jê bernade, weke siya wî pêre ye, dixwaze wê xewnê vegerîne, ew xewna ku di xaka Mîdiya de destpêka wê dibîne. Dixwaze wê toza li ser birînên welat kom bûye bide alî û wî laşê kurd ê westyayî ji hev ketiye ji nû ve vejîne.

Di vir de jî helbest rêbaza xwe ya siyasî û ramanî dirisimîne û nasnameya helbestvan a netewî kurdî zelal dike, ew dest ji cewwê kurdî bernade û tu wateyin

---

<sup>224</sup> - Cegerxwîn, **kîme Ez**, r.14.

veşartî di helbesta wî de tunene, wate zelale û armanc xuyaye; serhildana himberî mirinê û xwestina jiyânê, li gel vegera li pozbilindiya bapîran. Dibêje:

*Ez im ew Kurdê serhişk û hesin,*

*Îro jî dijmin ji min ditirsin*

*Bîna barûdê*

*Kete pozê min*

*Dixwazim hawîr*

*Biteqim ji bin*

*Dîsa wek mêra*

*Bikevin çîya*

*Naxwazim birrim,*

*Dixwazim bigrim.*

*Kurdistana xwe*

*Axa Mîdîya,*

*Kîme ez?*<sup>225</sup>

Helbestvan dixwaze xîtabeke helbestî bi bandor ava bike, çend erkên wê hebin; şiyarkirina millet ji xewa ku tê de, diyarkirina sedemên têkçûna Kurd û çûna erş ji dest wan, ji şerê birakujî dest pê dike ta di serdanîna ji ramanin perpitî re ku ji derve hatine û cihê xwe di nav kurdan de girtine ta ku ji ber wan çand û hebûna xwe ji dest berdane û bi şêweke ne şêweya wan e hatine xuyanî, nema karin himberî vê yekê tişteki bikin, bûne mirîd ji aqilekî din re ta ku welat winda kirin:

*Me dan bin lîngan dewlet û hebûn*

*Bûn dijminê hev perçe, perçe bûn*

*Ta ko Kurdistan*

*Ta ku Kurdistan*

*Jar û perîşan*

*Kete bin destan!*

*Kîme ez?*<sup>226</sup>

---

<sup>225</sup> - h.b., r.12-13.

<sup>226</sup> - h.b., r. 15.

Helbestvan vê xîtaba helbestî tevî bi rewanî dibêje, xwendina vê helbestê dişibe meşa di deştê de, erdeke rast û bê kelem, weha ti zehmetî di xwendina wê de tune, tu asteng di têgihîştina helbestê de tunene, ne peyv û ne hevok û ne avakirina hevokê û ta ne forma ku helbest li ser ava bûye; wî tûrikê xwe ji peyvên ser zimanê xelkê dagirtiye, peyvê li pey peyvê bi rewanî tîne, li gorî birgeya helbestê ji alîkê û li gorî xeyalê wî ji aliyekî din ve.

Lê her ew peyva dîrokî bi xurtî cihê xwe digre, da bibe desthilatdara ser deq, çiku ew dixwaze giraniyê berde ser van peyvan, ji ber ev helbest bi xwe nasnameya helbestvan e, nasnameya miletê wî ye, lewra gera di dîrokê de û anîna bêjeyin hîlbijartî pir normal e, lê ya ne normal ewe ku karibe wê bike maddeyeke xam û wek rasteqîniyekê bide qebûlkirin û eve ya ku helbestvan di vê helbestê û hin din de jî dixwaze, lew ya eşkere û ya veşartî her ew e ku wêneyeke spehî li ser miletê xwe pêşkêş bike û wî wêneyê ku dijmin bi hovîfî jê re resimandiye bide alî, ji ber çavan dûr bixîne û tiştê ku di pirtûkên tarîxa xwe de bi derewan ser wan gotine, yan di neqşên şahên wan ên ku li himber wan têkçûne zelal bike.

Xuyaye ku ew tiştê ku helbestvan gotin ne bes bûn bo avakirina rastiya kurd û zelalkirina nasnameya wî, lewra hevoka (Kî me ez?) di her birgekê de dûbare kir, da destnîşanên ku dixwaze û wateya ku pêwîste bêje kurt bike, helbestvan wek nûnerê miletê xwe ne zordar e, ne zordest e û ne şer dixwaze, ew wekhevî û aştiyê dixwaze. Bi vê yekê ew dixwaze wê dîroka kevin ku xwe pê serbilind didît bikişkişîne roja îro, tarîxa nû, da nama xwe ji mirovatîyê re berçav bike, ewa ku hemû dost û xêrxwaz lê digerin.

Di vir de ew wateya ku helbestvan ji helbestê dixwest pêk hat. Wî hemû daxwazên di naveroka helbestê de der kir da jiyana welatê xwe bixwaze:

*Ne xwînxwar im ez haştî xwaz im ez*

*Serdarê me ye gernas û nebez*

*Em şer naxvazin*

*Divên wekhevî*

*Em paşve naçin*

*Dijmin direvî*

*Ji bo mirovan em tev dost û yar*

***Bijî Kurdistan, bimrî koledar***

***Kîme ez?*** <sup>227</sup>

Helbestvan dîroka kevin ne di vê helbestê tenê de bi kar aniye, lê di helbestin din de jî mîna Di QEYD Û BENDA RANAZIN. Cegerxwîn ji rewşa kurdî ne razî ye, xwe şermende dibîne ku kurd ketine vî halî, çawa bi vê riswabûnê qayil in!! Çawa qebûl dikin ku destên wan di qeydan de bin û dîroka wan huqasî ronîdar! Kalkên wî xwedî ewqas serkeftin! Lewra vê xewa giran ku millet tê de ye qebûl nake; ev xewa ku ew lawaz û bê çare kiriye, ew bûye mîna wî kesê dest girêdayî tu bavêjî newaleke kûr û kes dengê wî neke û bi êşa wî hest nebe. Çawa ev millet bi xulamtiya ji dijmin re raziye?!

***Em kurdin , kurdên navdar ser bilind û efrazin***

***Xewa me nayê li newalê kûr diqeyd û bendan ranazin***

***Pir şerme ko reşqîrak me bixun û em nêçîrvan***

***Kê diye ko nêçîra qirakê qertel û qerbazin ?*** <sup>228</sup>

Dema helbestvan li milletên cîhanê dinere, li ser rewşa ku Kurd dijîn bi hesret dimîne; dibîne çawa wan gavên xurt bi pêş de avêtine û kurd hê bindest û jar in. Ev hest wî didehîne ku gazinan bike çawa Kurd ji şaristaniyê bi paş ve mane, weha jî nav di wan dide ku xebatê bikin û ji bîr nekin ku ew neviyên Mîdî û Subariyan in; ew ên ku rojekê xwedan Impiratorî û şaneşîn bûn. Di vê helbesta bi form û naveroka xwe klasîk de dide xuyanî ku hîna ew lehengê mêrxas e, ew ê ku bi bindestiyê qayil nabe û tevî ku nîr ne ew nîrin jî her ew azadiyê dixwaze:

***Şêrin bi zencîr girêdayî, bin destê dijmin mane bes***

***Serbestî bi zor dixwazin, bindestî tu car naxwazin***

***Gernasê Dêrsim û Agirî û Barzan û Sordaşin em***

***Bermayê:- Mad û Sobar û hemxakê Qewqazin*** <sup>229</sup>

Di helbesta BÊ TE HÊÇIM WELAT de helbestvan dixwaze têkiliyeke

<sup>227</sup> - h.b., r. 16.

<sup>228</sup> - h.b., r. 26.

<sup>229</sup> - h.b., r. 26.

diyalîktîkî di navbera xwe û welatê xwe Kurdistan de ava bike, kûrbûna wê peywendiyê ji navê helbestê diyar dibe; ew bang welatê xwe dike ku bêyî wî ew bê qedr û qîmete û çiqasî welat bilind bibe helbestvan pê re bilind dibe; ew helbestvanê ku berdevkê gelê xwe be, ev welatê ku ji helbestvan û ji her kurdekî re bûye xewn wê li her derî jê al li ba bibin, wê çiya derd û şîne bavêjin û bi rengê kesk bixemilin. Wê her kes bi govend û dîlanan derbirînê xwe eşkere bikin, wê tev di işqê de bibn "Mem û Zîn".

Lê tevî vê çakbîniyê bi vê xewna xweş, helbestvan her jarî û rewşa ne xweş bi bîra çî kesê kurd tîne û dide xuyanî ku ew îro roj bê war û cih in, lê careke din navtêdanê di xwe û wan dide ku ew lawê mîtanîyane û ev çiya cihê wan e, divê ev millet ji vê xewê şiyar bibe û şoreşa xwe lidarxin da mîna bapîrên xwe mêrxas û çeleng bin:

*Welat , çiqas bilind bibî*

*Ew qas ejî bilind dibim*

*Her çend pak û rind dibî*

*Ew çend pak ûrind dibim*

*Şêrim kurê mîtanîya*

*Cihê minin şax û çîya*

*Doza me axa mîdîya*

*Nêzîke wek axund dibim*<sup>230</sup>

Ev daxwaza hişyarbûn û hişyarbûnê xweş di helbesta wî ya bi navê XORTNO RABIN HERIN CENG de diyar dibe. Vê carê ew heşkere ji xortan dixwaze ku serî li himberî dagîrkerên welatê xwe rakin û fersendan ji ddestê xwe bernedin da azadiya xwe bidest xînin. Ev helbest bi peyvên tund û hişk dagirtiye, weke ku di nava cengê de ye, xortên Kurd mîna şêr û pilingan in, tirs li ser wan tune çîku ewana mêrxasiya bav û bapîran hilgirtne û dibêje ku ew karin biserkevin, mîna ku berî niha biser ketine; ew neviyên Mîdiyan e û wê xaka xwe ji dagîrkeran azad bikin:

---

<sup>230</sup> - h.b., r. 17-18.

*Em gernas û ser bilind kurê kurd û mîdîya*  
*Hînî cengê bûne rind, em şervanê ser çiya*  
*Em dê bigrin şar û gund birc û lat û gelîya*  
*Weke şêr û wek piling*  
*Xortno rabin herin ceng*<sup>231</sup>

Cegerxwîn penda kurdî ku dibêje; RÎ DIBÎ BOST DIJMIN NABÎ DOST girtiye û kiriye sernav ji helbesteke xwe re, tê de xap û rîpên dijmin berçav dike û dide xuyanî ku bawerî qet bi dijmin nayê û dîrokê berçav kiriye ku ew tu caran nabe dost; ew mîna mar e jehra xwe her berdide laşê kê be ku ber pêve tê, ew her tiştê ciwan xira dike, spehîbûna welêt dikuje, ji hovîtiyê pê ve nas nake.

Zelaltirîn tişt di vê helbestê de ah û keserên helbestvan li ser welatê wî ku ketiye vê rewşa xirab, ew welatê ciwan û spehî bi gund û çemên xwe ve (Dicle, Ferat û Zap) û bi xêrûbêrên xwe ve, ku berê bapîrên kurdan Mîdî û Lor şah û desthilatdar bûn, îro kurd bûne mîna parsekin nenas di welatê xwe de.

*Kurdê kurê lor û meda*  
*Bigrî ji vir ta serheda*  
*Tev mane bindest û geda*  
*Wek parsekê bênavê ew*<sup>232</sup>

Piraniya helbestên ku helbestvan di wan de pala xwe dide dîrokê bi daxwaza wî ve girêdayîne, daxwaza ku dîroka bapîran ku tev serkeftin bûn deyne ber çavê cîlên nû û mûqayese bi îro re bike, da bibe navtêdanek bo xebata di ber azadiyê de, bo pêkanîna jiyaneke serbest .

Û helbesta bi navê LEŞKER IM dikeve vî biwarî de, ew pesnê kurdan dide, mêrxasiya wan, lehengî û canfîdaya wan. Di destpêkê de heye ku yê xwendevan di destnîşaşên vê gotinê de şaş bibe, çiku peyva "leşker" peyveke kirêt e li nik kurdan; ji ber ku Kurd ji vê peyvê kiz dibin, pir nas û mirovên wan bi destê leşkeran çûne û hatine kuştin, pir gund û bajarên wan bi destê leşkeran hatine wêrankirin û talankirin,

---

<sup>231</sup> - h.b., r. 40.

<sup>232</sup> - h.b., r. 44.



lewra çî karê xirab û nebaş bi leşker ve hatiye girêdan.

Ji ber vê heye ku yê xwendevan matmayî bimîne ku Cegerxwîn dibêje: Leşker im! Lê bi xwendina helbestê re nerîna wî tê guhertin, çiku ew peyv destnîşanin din didin; delaletin berevajî yên di bîrdanka kurdo de; helbestvan li vir leşkerekî Kurd e, di ber nasname û zimanê xwe de berxwedanê dike, berevaniyê di ber mirovatiya xwe de dike, ew zordariyê li kesî nake, leşkerekî azadiyê dixwaze, lewra her birge bi "Leşkerim wek baz im Azadî xwazim" tamam dibe û ev hevok her dûbare dibe, ew mîna baz e û azadî daxwaza wî ye, ew ne ji deverin biyanî hatiye, ew xwediyê vê qadê ye, ew pêmayê mîdîyan e, neviyê Mîttan û kardoxiyan e, ew bapîrên ku şah û serkirdeyên vê xakê bûn. Ev Kurdistan a wî ye, ew lawê Zagros e, ev çiyayê ku di dirêjaya dîrokê de ew himbêz kiriye, kesê Kurd naxwaze kole û xulam be, lê belê ew her li azadiyê digere û ji bo wê xebatê dike:

*Bermayê madim kurê ferhadim*

*Ne kolê tirk û fîrs û bexdadim*

*Kurê mîtanîm xwedî binyadim*

*Kurdistana xwe carek bernadim*

*Kardoxim kurdim ekradim*

*Leşkerim bazim azadî xwazim*<sup>233</sup>

Ev helbest dagirtiye, hemû awayên rewanbêjîyê himbêz dike, bi ciwaniyeke taybet hatiye; ew lawê çiyê ye, ew birûsk û ewr e û ew teyrê baz e. Her yek ji van delalet û destnîşanin wan hene; çiya pozbilind e xurt e cîgirtiye û war e, di rojên teng de himêz e. Çiya insan ji tofanê xelas kiriye; efsane weha dibêje. Wî gelek caran Kurd ji kuştin û qetlîaman parastine, ta ku "Ji bilî çiya dost ji kurdan re tunene" bûye semboleke kurdi û vê paşiyê bûye sernavek ji pirtûkekê re<sup>234</sup>, lewra ji heqê helbestvan e ku xwe bibîne lawê çiya û lawê çiyayê Zagros bi taybet, ev çiyayê ku bapîrên kurdan lê jiyane û şaneşîn û dewlet tê de ava kirine û destpêka êrîş û cengên

<sup>233</sup> - h.b., r. 46-47.

<sup>234</sup> - Con Biluc, Harvî Morîs, *La Esdîqa'e Sîwa'l-Cîbal*, ter. Rajal Muhemed, Beyrût 1996.

wan bi ser dijmin de bûn weke ku berê me gotiye<sup>235</sup>.

Birûsk jî ew ronahiya xurt e, ku di rojên reş û ne xweş de ji nişkê ve di dilê asîman de derdikeve û ku dikeve erdê yekser cihê lê dikeve dike pîşo û Kurd jî wehaye, lê tevî wilo jî ew azadîxwaz e, azadiya ku yek ji mafê wî ye û ew zîyanê nagihîne kesî. Dibêje:

*Kurê zegrosim mêr û şervanim*

*Xwedî serdar û part û rêzanim*

*Birûsk û hewr û qîr û tavanim*

*Şewat û kuştin ceng û talanim*

*Ez şer naxwazim doza xwe dixwazim*

*Leşkerim bazim azadî xwazim*<sup>236</sup>

Û di helbesteke wî din de "Partîzan im" dîsa peyvin û wateyên wan dûbare dibin, ev helbesta ku bi naveroka xwe ne pir ji ya din cuda ye, lê vê carê helbestvan endamê partiyekî ye û bi partiya xwe serbilind e, ew wê riya xebatê dibêne. Li vir dîsa azadiyê dixwaze, mîna helbesta din xwe teyrê baz dibîne û çiya cih û warê wî ne, xwe bi mêrxasiya xwe û sekna di ruwê dijmin û têkbirina wî de dibîne, nemaze ew çiyayên ku Mîdî himbêz kirine û hewandine. Her li ser a xwe ye di daxwaza xwe de; ew xaka Mîdiya dixwaze, xaka bapîrên wî. Li vir careke din kesayetiyên ji dîroka Îrana kevin – warê kurdan- berçav dike, mîna Restem û Hirmiz:

*Gava xwe berdim ser çiya*

*Bigrin li ber dijmin riya*

*Bi kevme axa Mîdiya*

*Keyxesrew û Bazanim ez*

*Doza me qada Mîdiya*

<sup>235</sup> - b.f. li ser çiya û semboliya wê bnr. Deham Ebdulfettah, "Redden Ela Muhemed Efîf Huseynî Lil-Cebeli Delalaton Xeyru'r-Rifîye we Stokholm Leyset Hewde Te'mid", Mecelletu'n-Nezwa, el-Edd 18, (Mesqet-Ûman) Nisan 1999, (m.w. 01.04.1999)

<http://www.nizwa.com/%D8%B1%D8%AF%D8%A7-%D8%B9%D9%84%D9%89-%D9%85%D8%AD%D9%85%D8%AF-%D8%B9%D9%81%D9%8A%D9%81-%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%B3%D9%8A%D9%86%D9%8A-%D9%84%D9%84%D8%AC%D8%A8%D9%84-%D8%AF%D9%84%D8%A7%D9%84%D8%A7%D8%AA/> (m.j. 05.09.2015).

<sup>236</sup> - Cegerxwîn, *kîme Ez*, r. 47.

*Daxwaz me her azadîya*

*Ev setema ha kê diya*

*Rustem û Hirmezanim ez*<sup>237</sup>

Xuyaye ku helbestvan di dîwana siyem de pir guh dide Mîdiyan û bihtir ji wan miletên kevin ên dîtir qala wan dike. Di her helbestekê de dixwaze bi xwendevan bide qebûlkirin ku ew bapîrên kurdan e, axa wan warê kurdan e, cejnên wan cejnên kurdan e, dibêje:

*Zanim bihar azadî ye*

*Serbestî û dilşadî ye*

*Doza me cejna Madî ye*

*Kengî bi xêr bêtin bihar*<sup>238</sup>

Ew her dixwaze dewleta Mîdî bi giraniya desthilatdariya xwe ve vegere, nemaze Kurd mane bindest û hukum ji dest berdane, dixwaze wan rojan vejîne, lewra ew her wan rojên Mîdiyan bi bîr xwe tîne û her daxwaza azadiyê bi mêrxasiya kurdan ve girêdide, bi peywendiya wan bi çiyê re, ew di helbesta bi navê Şoreş de dibêje:

*Dixwazîn welat bidin diyarî*

*Bin destê dijmin rûnin bi jarî*

*Lê Kurdên gernas ketin ser çiya*

*Dixwazîn bigrin axa Mîdiya*

*Êrîştî dijmin dikin weke şêr*

*Hawîr dişkênin, li jor û li jêr*<sup>239</sup>

Çi boneya helbestê be her helbestvan dixwaze êş û azarên kurdan berçav bike, mîna ku di destpêkê de plankirî be, lê ew zane çî dike, dema ew dîrokê dikole dixwaze wan rojên kurdî xweş bi bîr bîne, da bibe hêz ji nifşên nû re û dersan jê bigrin.

---

<sup>237</sup> - h.b., r. 59-60.

<sup>238</sup> - h.b., r. 74.

<sup>239</sup> - h.b., r. 76.

Weha jî bi êşa kurdî ya îro têşe, li ber wan dikeve ku ketine vê rewşê; mîna ku bêjin ma çi bi dest me tê, ne xerîb e ku dost ji wan re –Kurdan- nebin, çiku ti keyan ji wan re tune, wan tu hêz ava nekirine, ji ber bêhêvî û nefsskestinê ew bûne tirole û bêkêr. Tevî hemû hewldanan nikarîbûn wan rojên Mîdiyan bi cih bînin.

Helbestvan li ber miletê xwe dikeve çawa çiya, milk û darên xwe ji dest xwe berdane. Welatê xwe bi yareke ciwan dişibîne, ji spehîbûna wê her kes çavê xwe berdidê, li ber wan gernasên kurd dikeve ku nikarîbûn xweşiyê bibînin û bi wê yarê şad bibin û her û her jarî, perîşanî, şîn, hebs û lêdan para wan bû, jê pêve tişt ne dîtin. Dîsa bapîrên wan di bîra wan tîne ew gernasên Nayrî û pehlewî, da dîsa wan ber bi xebatê de bajo:

*Bê kêrî lewra bê dost û hevdem*

*Hezar salin ko dibazî her dem*

*Zor û lêdan û kuştin û setem*

*Ey kurê nayrî , bermayê pehlew*<sup>240</sup>

Bi dilekî bi şîn û keser Cegerxwîn pirsar xwe ji kurdan dike, çima ev hejariya ku tê de dijîn? Çima gihane vê rewşê? Lê xuyaye ku bersiv jî li ba wî ye, nexasim dema halê miletê xwe yê ku li welat û azadiyê digere, bi halê wî bilbilê dilşkestî ku li guleke geş digere dişibîne, ew jî di helbesteke bi navê BI SEYDAYÊ XANÎ REde, ya ku tê de teqeze dike ku şer û ceng ne giring in, ya giring ew e kî biser bikeve, bê çawa pevçûna ser bûkê ne giring e lê ya giring ew e kî dighe wê bûkê. Di vê helbestê de xewna helbestvan dîsa vegera dewleta mîdî ye, ev xewna ku di geyanê wî de cih girtiye û her ku wan bi bîr tîne dilê wî tê guvaştin, li ser wan rojan dişewite, dikizkize, lewra tê bi têkçûnên kurdan de di dîroka nûjen de muqayese dike:

*Ala te li ser milê xwe rakin,*

*Dijmin ji hev û dinê bela kin*

*Ew rûnî li nêv serayê Amed*

*Dîsa vegerî keyaniya Med*<sup>241</sup>

---

<sup>240</sup> - h.b., r. 30.

<sup>241</sup> - Cegerxwîn, *Pirîsk û Pêtî*, r. 12.

Di destpêkê de mirov texmîn dike ku ti têkiliya sernavê helbestê bi naveroka wê re tune, lê dema em bi hûrbînî malika pazdehan dixwîn:

*Ey Kurd tu bizane ew cihan e,  
Wek bûk e, şepal e pir ciwan e*

*Ev renga cihan e gerçî kewn e  
Tenha ji me re xeyal û xewn e*<sup>242</sup>

Em dibînin ku Cegerxwîn dibêje ku gereke yê Kurd zanibe ku jiyan mîna bûkê nazik, ciwan û spehiye û divê zanibe çawa danûstendinê pê re bike.

Li vir em wê peywendiyê (Tenass) di nabêna wan de dibînin, nemaze dema em Ehmedê Xanî dixwîn:

*Herçî bire şîri destê hîmmet  
Zept kir ji xwe ra bi mêrî dewlet  
Lewra ku cihan wekî erûs e  
Wê hukim di destê şîrê rûs e*<sup>243</sup>

Û em nas dikin bê çiqasî Cegerxwîn ketiye bin bandora Xanî ta ku ev sernav ji helbesta xwe re daniye. Ne tenê weha, lê Cegerxwîn di malika dawî de berê dide xwe û ji xwe re dibêje ku çiqasî rewanbêj bî tu nagihê meqama rewanbêjiya Mem û Zîn a Xanî:

*Kengê ji dibaceya Memozîn,  
Xweştir tu dibêjî, bes Cegerxwîn*<sup>244</sup>

Ev peyv, ev keser û ev daxwaz û hêvî di pir cihan de li nik Cegerxwîn dûbare dibin, ev dûbarekirin bi mebest tê, helbestvan jê qesd dike da ku giringiya wan li nik xwe berçav bike, ew nîşanderiyê derûni ye, nirxdare û deriyê hoşyariyê li ber xwendevan vedike û bi nermî rêberiya wî dike. Ev dûbarekirin ne dûrî rêbazbêjiya deqê, lê ew di avakirin û pêkanîna deq de beşekî girînge.

---

<sup>242</sup> - h.b., h.r.

<sup>243</sup> - Ehmedê Xanî, **Mem û Zîn**, amd. Kadri Yeldırım, ç. 2, weş. Avesta, Istanbul 2013, r. 154.

<sup>244</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 13.

Di helbestên ku Cegerxwîn dîroka kevin tîne hazir dike de ta asteke mezin dûbarekirin heye, çî keser û nalîna ser wan encamdanên giranbuha ku wan miletên ku ew dibîne bapîrên kurdan e û çî ji aliyê pozbilindî û payebilindiya ku dibîne da ku ji miletê kurd re navtêdanek be bo xebatê ta ku bighin wê azadiya dixwazin. Ji wan nimûnan helbesta NEZAN BÊ ÇO NABE HIŞYAR di dîwana pêşî de, ku axînan li ser encamdanên Mîdya dikişîne û nav di wan dide da serî li ber zordariyê hildin da careke din bighên wê astê:

*Hinek rûnin li ser textê Med û Goş  
Hinek rengê me rakin deng û hawar*

*Bi şîret ez ji kurdan re dibêjim;  
Nezan bê ço tu carî nabe hişyar.*<sup>245</sup>

Di helbesta wî OLA ME XORTAN de, ya ku pesnê hezkirina xortan ji welat re dide û bi serbilindî dîroka kevin di bîra wan de tîne ku ew zarwên Mîdiyan in:

*Pismamê Ristem kurd û Madî ne  
Hemdemê Roman, xortên kurdî ne  
Bê xwendin mane Cegerbixwîne*<sup>246</sup>

Ev doz di helbesta ÇAXA ME NÛ DEST PÊ DIKE<sup>247</sup> û helbesta SERMIYAN<sup>248</sup> de jî tê dûbarekirin.

Cegerxwîn ne tenê di helbestên netewî û marşan de dîroka kevin vedixwest û bikar tanî, lê belê ta di helbesta evînî de jî, ew evîna ku taybetmendiyeke Cegerxwîn tê de heye û ji helbestvanên kilasîk cuda ye; evîna jinê li ba wî awayekî riyalist stend, nema ew evîna sofî ku xwe bi ser wêjeya kilasîk de berdabû, evîna wî bû evîna vê dinyayê, peyv û rahatinên (mûmarese) wî ti gomanê di vir de nahêlin.

Rewanbêjiya di helbesta GULA BÊ XAR de karîna Cegerxwîn teqeze dike ku ew dikare peyva dixwaze di dema dixwaze de bibijêre, ew xwedî zimanekî ciwan

---

<sup>245</sup> - h.b., r. 56.

<sup>246</sup> - h.b., r. 69.

<sup>247</sup> - h.b., r. 73.

<sup>248</sup> - h.b., r. 74

û rewan û helbestvaniyeke bi rivîneke gurr e, çi ji aliyê hunerî û çi ji aliyê teknîk de. Heger ev helbest bi naverok û qaşilkê xwe kilasîk be, lê rewanbêjî û destnîşanên himêz dike canê nûjenî û serdemiyê didinê; ew zane pesnê yara çavbelek bide û coş û evîndariya xwe derbike, bê çawa cotkarî mûsimê xwe diçine, weha yara wî can û cesedê wî diçine.

Di vê helbestê de helbestvan dixwaze zelal bike ku ew dikare tiştên buha û nirxdar û kêmhajmar, na welle ew buhatirîn û spehîtirîn tişt di cîhanê de bibijêre. Ew yara xwe bi Laleşa li nik Êzîdiyan pîroz dişibîne û ew serçimandî û bi newazişî ber pêve diçe, dixwaze xwe bavêje himbêza wê û xwe di nav memikên wê de biparêze. Halê xwe dema xwe davêje yarê û germbûn û coşa xwe bi leşkerê nestoriyan<sup>249</sup> dişibîne dema êriş berdan Torabdînê û ew dagîr kirin. Dîrok tundiya aşûriyan di cengên wan de û dema li Mezopotamya hukum dikirin berçav dike. Ew kela di hinavê helbestvan de wî didehfîne ku bi vî awî bike; evîneke bi mezinbûna xwe nayê pîvan, lewra heye helbestvan her tiştî bike tenê ji bo bighê yara ku ketiye davên wê de û nema kare xwe jê rizgar bike. Dibêje:

*Me j' bexçeya gulsor û zer,*

*Me j' nazikên zêrîn kemer,*

*Min ser tewandî Laleş e,*

*Emrê me hê sî û şeş e,*

*Çûm La leşê wek toriyan,*

*Wek leşkerê Nestoriyan,*

*Tenha gula bê xare girt*

*Ew nazika nûbare girt*

*Doza me her zilfa reşe*

*Pala li ser tibare girt*

*Gok û guhar û moriyan*

*Textê şehê Şobare girt*<sup>250</sup>

Di helbesteke din de KA DOSTA ZANA helbestvan li dostekê, na li yareke jîr û kêrhatî digere da ku dilê xwe bidê. Bi kul û keserên xwe ve li gund û bajaran digere, lê ew wê nabîne, melûl û bê hêvî û çare dibe, jiyana xwe di gerê de dibûrîne, wî cihê ne hişt û lê ne geriya, çû warê ku bihna dîrokê jê tê, xaka bapîrên wî; Kerkûk, Waşûkanî paytexta mîtaniyan, welatê mîdî û hûriyan, lê mîna Mem û Zîn û

<sup>249</sup> - li vir dixwazî beje Aşûrî, b.f. li ser Nestûriyan û çima bi navê Aşûriyan tên naskirin bnr.Behnam Ebu's-Sûf, "*el-Asûriyûn el-Haliyûn- el-Aramîyun'n-Nesatîra we 'Elaqetihim bi'l-Aşûriyûn sukane'l-Îraq'el-Qedîm*", (m.w. 27.04.2012) <http://www.abualsoof.com/inp/view.asp?ID=105> (m.j. 08.11.2016).

<sup>250</sup> - Cegerxwîn, *Pirîsk û Pêtî*, r. 152.

evîndarên din helbestvan jî wê kulê di dil xwe de hildigre:

*Li kerkûk û li Waşoxan û Amed*

*Li bermayên: Metîn û Horî û Med*

*Me go : belkî bibênim ez şirîn – qed*

*Belê çibkim nedî min ew, nedî min...*<sup>251</sup>

Dîmenê evînê û bikaranîna dîrokê di helbesteke din de bi navê DIL DI NÊV CENGÊ DE YE dúbare dibe, helbestvan bandora çav û lêvên yarê li canê xwe diyar dike û çawa ew bê hiş hiştine. Ew ketiye davên wê û pêlên evînê mîna leşkerê Kaşu êrişî welatê Mezopotamya dikin, weha bi ser de tî. Kaşî dema desthilatdarî bi dest xistin tundî bi kar nanîn û helbestvan vê yekê zane û zane çî di derheqa yarê de dibêje, ewa ku bi nermî xwe berda geyanê wî da di dawî de can û laşê wî di bin destê xwe ke û rehê evîna xwe di her damarek dilê wî de biçîne.

*Dil kete nav bend û dava*

*Kevte ber pêlên perava*

*Leşkerê Kaşo ji nava*

*Herdu avan têne dil*<sup>252</sup>

Di helbesteke evînî din de, dîsa ev dîmen, peyv, hevok û nêşandek bi vexwestina dîroka kevin re dúbare dibin, ew helbesta bi navê ŞÊRÎNLEBA MIN e. Berê xwe dide yara xwe û jê dixwaze ber bi wî ve bê, çiku bi tenê dil bi kul û derd maye, helbestvan bi baweriya xortan li xwe dinere û ji bilî wê jî qebûl nake, di evîna xwe de ew mîna Mem û Ferhad e, ji bo evîna wê qezenc bike ew têra xwe mêrxas e. Lê her helbestvan rewşa millet ji bîr nake, nakokî û jihevketina wî rexne dike, gazinan jê dike çawa ev hirç aniye nav rezê xwe.

Divê yar zanibe ku ew lawê hûrî, mîtanî û Mîdiyan e, hewl dide ku girêdanekê di nav Kurd û someriyên de bibîne; dibîne ku ew jî bapîrên kurdan e, dibêje:

<sup>251</sup>- Cegerxwîn, Şefeq, r. 175.

<sup>252</sup>- Cegerxwîn, Aşitî, ç. 3, weş. Şam. Avesta, Istanbul2003. r. 152.



*Ez gernas û egût im*  
*Bermayê mad û sût im*  
*Ez lawê hor û mût im*  
*Min dil tijî ji kînê*

*Her yek ji me dibê ez*  
*Me hirç berdaye nav rez*  
*Guran êrîş kirin pez*  
*Raste em somerî ne*<sup>253</sup>

Helbesteke din bi taybetmendiyeke din, di bin bandora ramanên sosyalist de Cegerxwîn dibe rêber û we'izbêj, em dibînin li vir rêyeke din girtiye, çawabûna pêşketinê fêm kiriye û dighe wê encamê ku ya vî karî dike pîşesazi ye, ew e ya ku pêşketinê tîne civakê, ev e tiştê ji kurdan re gerek, gereke Kurd bibin xwedî pîşesazî û pere û lihevkirinek da encamin pak bi dest xwe xînin, fêde li wan û cîranên wan bibe.

Li vir dîsa dîroka kevin vedixwaze, peyvên wî di nav ewqase peyvên serdemî de diçirisînin. Ew teqeze dike ku wê somerî û sobarî bi vê pêkhatê dilxweş bibin; ku welat bibe welatekî pîşesazî. Dixwaze nasnameya wan bi me bide nasîn ku ew bapîrên kurdan in, ewên ku di gorên xwe de li hêviya mizgîniyekê ne da ku bi encamdanên neviyên xwe dilşad bibin. Heye ku coşên germ û bandora pirtûkên ku xwendin ew dehfindin ku somerîyan bi dîroka kurdan ve girêde û heye ku mebesta wî ji sobarî bapîrên kurdan û somerî cîranên wan in û ev nêzîktirî rastiyê ye. Dibêje:

*Belam ger hemî kurd bi destûr û bend*  
*Bi hevre civatên xwe çêkin lewend*

*Dilê Somer û Sobera xweş dikin*  
*Bi hasin dikarin me rûgeş bikin*

*Ne tim hasinên xurt ji bona şerin*  
*Bi hasin dikarin bi pêşve herin*<sup>254</sup>

---

<sup>253</sup> - h.b., r. 128-129.

<sup>254</sup> - Cegerxwîn, *Zend -Avista*, r. 100.

Di cihekî din de û di helbesteke din de dîsa helbestvan qîmeta pîşesaziyê di pêşxitina civakan de nas dike û ji milletê xwe dixwaze ku fabrîqe û kargehan ava bikin û guh bidin bazirganiyê da ji nû ve encamdanên welatê Mîdya bêne vejandin.

*Bi malê xwe karî bibî serbilind*

*Li herder bi pêşve bibî şar û gund*

*Li darxî tu karxan û fabrîkeyan*

*Vejtne welatê Medan û Keyan*<sup>255</sup>

Di vê berhema helbestê ya pêncan (Dîwana 5an) de, ya ku ji serî ta dawî li ser yek kêşê hatiye hûnan û gelek wez û şîret tê de hene, helbestvan di binavkirina wê bi (Zend -Avista) bi ser ket, ew navê pirtûka zeredestiyên a pîroz e, ya ku hemû fêrkinên Zeradeşt û pendên wî himêz dike, yê ku olek bi navê wî hat û di dema Mîdiyan de belav bû. Di vê berhemê de, di bihtirî helbestekê de Cegerxwîn dîroka kevin vedixwaze, ew jî mîna ku me berî niha qala wan kiriye ji bo serhildan û berxwedan himberî dijmin ta bighin azadiyê û gilî û gazin ji millet in ku gihaye vê rewşa xerab, vê hişt ku helbestvan ji millet bixwaze ku bibe leşker û berê xwe bide çiyê, şerê azadîxwaziyê bikin. Helbesta bi navê LEŞKERÎ yekser vê daxwazê berçav dike, ji gel dixwaze ku berê xwe bide qadên şer ji bo pêşerojê çaktir. Armanç ji sernav ew e ku agahdariyekê bo çî di naverokê de ye, ew kilîta deq e.

Hişkbûna jiyanê dihêle ku mirov xwe hişk be de karibe beramberî vê hişkiyê bisekine; helbestvan weha dibîne û wê hişt ku helbestvan vê riyê bigre; riya navtêdanê da bighin rizgarî û azadiya xwe. Ji gotina (Leşker) hişktir tune bo rawestana himberî vê rewşê, dîsa wan millet û şaneşînan bi bîr tîne; Hurrî, Mittanî, Nayrî, Mîdî û Kardux, ew ên zarwên Zagros û gazina ji millet dike çawa zarwên van gernasanan bibin mîna keriyên pez û berxikan, serî danîne, her kes li dor wan fêdê dibînin ji bilî wan:

*Ji qada xwe derxe bibe Erdeşêr*

*Li Zagrosê kardo bibe xurtemêr*

---

<sup>255</sup> - h.b., r. 176.

*Ne şerme kurê Nayrî û Mîdiya  
Li ber destê dijmin bibin wek miya*

*Kurê Hor û Mîtan û Kardox û Kurd  
Di bin destê dijmin bimênin zigurd*

*Şiyarbe bibe leşkerek canfida  
Vejêne tu paya Mîtan û Meda*<sup>256</sup>

Heman peyv û hevok di vê berhemê de têne dûbarekirin; gazin, hesret, navtêdan ûhd, mîna helbesta OLPERESTÎ ku helbestvan her li ser a xwe ye ku Kurd neviyên hûrrî û Mîdiyane û ne bi zorê be, ne bi qewetê be ew azadiyê nabînin. Weke ku bi gotina (ya bi zorê çû, ne bi zorê be venagere) û ji millet dixwaze serê xwe li dijî van siyasetên di heqê wî de dibe hilde. Dibêje:

*Tu gernas û dêwî, kurê Mad û Hor*

*Welatê xwe bistîn ji dijmin bi zor*

*Bibin dewlet û tim bi ferman û dar*

*Bese rovîyê reş penîre me xwar*<sup>257</sup>

Heman hal e di helbesta HEY QEHREMAN MILLETÊ KURD de<sup>258</sup> û di helbesta EV ÇI MISILMANÎ YE<sup>259</sup> de jî heman dûbarekirine, her ew li ser a xwe ye Kurd neviyên Sobarî, Hûrrî, Nayrî, Mîdî û Sîtiyan in, lê taybetmendiyeke vê helbestê heye ku ewên bi navê îslamê bang dikin û ew bi xwe kar dikin ku Kurdan bihelînin û nasnameya wan a çandeyî û netewî hilkin. Weha jî helbesta KEKO ZIMAN DIRÊJIM<sup>260</sup> û helbesta WELAT WELAT<sup>261</sup> û helbesta KURDO NAMÛS E RABE.<sup>262</sup>

---

<sup>256</sup> - h.b., r. 68-70.

<sup>257</sup> - h.b., r. 131-132.

<sup>258</sup> - Cegerxwîn, *Sewra azadî*, h.b., r. 13.

<sup>259</sup> - h.b., r. 164.

<sup>260</sup> - Cegerxwîn, *Şefaq*, h.b., r. 49.

<sup>261</sup> - Cegerxwîn, *Aşitî*, h.b., r. 14.

<sup>262</sup> - h.b., r. 50.

Di helbesteke dirêj de bi navê DILBER GELEK CIWAN E helbestvan dixwaze pesneke tevayî bide welatê xwe yê bindest, wî dişibîne bi keçeke ciwan, spehî, lihevhatî, xwînşêrîn, serbilind û kezî hûnayî, ji rengê Buharê, lê piştî ket destê xerîban ew ciwanî û spehîbûn tev çû. Helbestvan navtêdana gel berdewm dike da Vêtnam weke mînak ji xwe re bigrin, ew dewleta ku yekîtiya xwe pêkanî û himberî dijminê xwe bi ser ket. Weha helbestvan daxwaza xebatê diçîne, hêviyekê dixê dilê millet, dixwaze ew ji xerafetan xelas be, şer bike, dema lavlav û dua derbas bûye, divê millet bibe yek, xwe bi qewet bike, nakokiyan ji nav xwe bavêjin, rahijin çek û rextan. Dibêje em zarwên sobarî, hûrrî, mîttanî, kaşî, mîdî û karduxiyane, ewên ku bi qeweta xwe dewlet û şaneşîn ava kirin û bi xwîna xwe ew parastin, divê hûn wan dijminên mîna ejdeha bikujin, ne tirsin wê çiya we biparêze:

*Bav û kalên me: Hewrî û Mîtan*

*Bi zor danîne sînoren kurdan*

*Kardox û Kaşo, Madî û Sobar*

*Wan bi xwîna xwe parsatin ev war*<sup>263</sup>

Cegerxwîn ê helbestvan giringiya dîroka kevin nas kir, a ku encamdan û payebilindiyê bi xwe re hildigire û rola wê di çandina rihê serhildan û canfidayê di nîrê ku Kurd derbas dikin de. Wî bi zanebûn ew anî û bandora ku li helbestê dihişt zanîbû, di hazirkirina wan milletan de zana bû, ewin milletên bi nav û deng ku nûneriya bapîrên kurdan dikin.

---

<sup>263</sup> - Cegerxwîn, *Şefaq*, h.b., r. 58.

## II. BEŞA DUYEM

### KURD Û RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA WAN DI SERDEMA ISLAMÎ DE, DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE

#### 2.1. KURD DI DÎROKA ISLAMÎ DE:

Vekolîna dîroka kurdî di serdema islamî de dirêj e û lêkolînîni baş dixwaze û ji ber ku armanca lêkolîna me ne gera di kêrîhiya dîrokê de ye û daneheva hûrûmûrê wê ye bi qasî ku ronîkirina qurçîkin ji wê dîrokê ye bo armanca lêkolînê bê çawa rengê xwe di helbestên Cegerxwîn de vedane, lewra hin bûyer hatine piştguhkirin û hina giringiyeke taybet stendiye, her yek li gorî bikaranîna wan di helbestê de.

##### 2.1.1. Belavbûna Islamê Di Welatê Kurdan De:

Misilmanan karîbûn stûnên dewleta xwe di Cezîra erebî de deynin û dest bi firehkirina wê kirin, ji aliyê bakur û bakurê rojhilat ve ketin ruwê dewletên Sasanî û Bîzentî; herdu dewletên ku desthilatdarî li Îran, Iraq, Şam, Anadol û welatê Kurdan dikirin. Cenga pêşî ku di nav wan û Sasaniyan de qewimî (Qadisiyê 16k., 637z.) û zora sasaniyan çû, hêzek razber ji misilmanan re bû û handanek bû ku leşkerên wan bi pêş de herin, berê xwe bidin Medain paytexta dewleta sasanî û bi dû de cenga Celewlayê (16k., 637z.) û rûxandina dewleta sasanî bû û mîrnişîn tev welatê kurdan ket bin desthilatdariya misilmanan.<sup>264</sup>

<sup>264</sup>-b.f. li ser el-Qadisiyê û derbasbûna Meda'in, bnr. Ebû'l-Ebbas Ehmed binYehya bin Cabir el-Belazerî, **Fitûhu'l-Buldan**, teh. Ebdullah Enîs et-Tebba', mûessesetu'l- Me'arif, Beyrût 1987, r. 358-368. - Ebû Ce'fer bin Muhemmed bin Cerîr et-Teberî, **Tarîxu'l-Umemî we'l-Milûk**, c. 5, Daru'l-Kutubu'l-Îlmîye, Beyrût (b.m.), r. 460-506.

Û leşkerê misilmanan ber bi Cezîra feratî ve bi pêş de çûn û hin bajar bi zorê û hin bi lihevhatin xistin bin desthilatdariya xwe û piştî şerekî giran zora bîzentiyan birin û ew bi Bakur ve veğerandin<sup>265</sup> bi vî hawî desthilatdariya welatê kurdan ji dest bîzentî û sasaniyan derket û ket destê misilmanan. Ew di dema Umer ibn al-Xettab de bû (16k./637z.). Ji yên ku serweriya leşker di wan şeran de kirin; Seid ibn el-Weqqas, Xalid ibn el-Welîd, Eyyad bin Xenem û hd.<sup>266</sup>

Belazerî (279k./892z. de miriye) navê herêmên kurdî ku leşkerê misilmanan bi serkirdeya Utba bin Ferqed ketinê; çî bi zor û çî bi lihevhatin dibêje û wan bi navê cihê egîdên Kurd bi nav dike.<sup>267</sup>

Ola misilmantiyê di nav kurdan de belav bû û kurd bûn bihtirîn milletên ku berevanî di ber dewleta islamî de kirin û bi erênî beşdarî di şaristaniya islamî de kirin, ji demên pêşî de taybetmendiyin wan hebûn û kesayetiyin ji wan berz bûn çanda islamî dewlemend kirin û pişkdarî di pêşxistina wê ya zanistî û şaristanî de kirin.<sup>268</sup>

### 2.1.2. Kurd Di Serdema Emewî De (41-132k./661-750z.):

Serdema raşidî berî ya emewî hat ji (11-40k./632-661z.) domand, çar xelîfeyan desthilatdarî kirin, ew li pey hev bi vî hawî hatin; Ebû Bekir Esseddîq (11-13k./632-634z.), Umer ibn al Xettab (13-23k./634-644z.), Osman bin Effan (23-

<sup>265</sup> - b.f. li ser derbasbûna Cizîr û Ferat, bnr. el-Belazerî, h.b., r. 236-248. - Izzeddîn Muhemmed bin Elî bin Ibrahîm bin Şeddad, **el-E'laqu'l-Xetîra fî Zikrî Umera'i's-Şamî we'l-Cezîre**, c. 3, teh. Yehya 'Ebbara Menşûrat wezaretu's-Seqafe, Dîmeşiq 1978.

<sup>266</sup> - b.f. li ser belavbûna Islamê di warên kurda de, bnr. Ferset Merî, **el-Fetihu'l- Islamî li Kurdistan**, Daru'z-Zeman, Dîmeşiq 2011. - Ferset Merî, **Kurdistan fî'l-Qerni's-Sabi'î li'l-Mîlad**, menşûrat merkez Kurdistan l'd-Dîrasat el-Istiratîciye, es-Suleymanîye 2006. - Ehmed Mîrza Mîrza, **"Eşher Qadeteî Fethî Kurdistan fî'l-'Esri'l-Islamiyî'l-Ewwel"**, Meceretu Kulliytu'l-Îlûmî'l-Islamiye, c. 8, el-Eded (2/15), 2014, r. 725-755.

<sup>267</sup> -el-Belazerî, h.b., r. 464.

<sup>268</sup> - b.f. li serkesayetiyên kurdî û rola wan di şaristaniya islamî de, bnr. Muhemmed Elî es-Siwêrkî, **Mu'cemu E'lami'l-Kurdî fi't-Tarîxi'l-Islamî we'l-'Esiri'l-Hedîs fî Kurdistan we Xariceha**, Muessesetu Jîn, es-Suleymanîye 2006. - Muhemmed Emîn Zekî, **Meşahîru'l-Kurdî we Kurdistan fî'l-'Ehdi'l-Islamî**, c. 1-2, ter. Sanha Zekî Bêk, daru'z-Zeman, Dîmeşiq 2006. - Salih Şêxo Resûl el-Hesinyanî, **Ulemaû'l-Kurdî we Kurdistan mine'l-Qerni'l-Ewwel el-Hicrî Île Wefiyat Senetî 1400k./1980z.**, Metbe'etu Hawar, Dihok 2012.

35k./644-656z.), Elî bin Ebî Talib (35-40k./656-661z.).<sup>269</sup>Û di jêderên wê serdemê de em ti amajeyan bi kurdan û warê wan nabînin.

Di sala 41k./661z. xîlafet hat veguhestin malbata emewî û Mû'awiye bin Ebî Sufyan (41-60k./661-680z.) wek damezrênerê dewleta emewî û yekemîn xelîfê emewî tê naskirin, ew jî piştî şer û cenginên dûr û dirêj di nav misilmanan xwe bi xwe de li ser bê xîlafet heqê kê ye, di vê serdemê de 14 xelîfeyan hukum kirin.<sup>270</sup>

Pêzanînên ser kurdan di vê serdemê de pir hindikin. Arşak Poladyan li ser zimanê Teberî (310k./922z. de mir), Ibn el-Esîr (630k./1233z. mir) û dîroknûsin din dibêjin ku Kurd jî mîna Mewaliyên din (misilmanên ne ereb) tevî tevgera Muxtar Esseqefî ya şî'î waliyê Kûfa li Iraq bûn, ew di riba dawî ji sedsala heftan a zayînê de, durîşmê tevgerê (tolhildana Kербela) bû, lew karîbû dest daye ser Kûfa û herêmin din, ta di sala 686an z. de hat kuştin.

Wiha jî Kurd di nav leşkerên ku Heccac ji Iraqê ew şandin şerê Xewarica bi serkêşiya Mutref bin Mûxîra bin Şu'iba de bûn. Pişkdarî di serhildana Abdurrehman bin Eş'es de dijî emewiyan kirin ya ku ta sala 705z. domand. Wiha jî pişkdarî di tevgera Şehrezûr de sala 744z. de kirin, ya ku çarhezar kes bi serkêşiya ed-Dehak bin Qeys dest danîn ser Kûfa, dûv re tevger giha herêmên çiyê û Mûsil û hin herêmin din.

Kurdan pişkdarî di sûpaya xelîfê emewî yê dawî de Merwan bin Muhemmed (127-132k./744-750z.) kirin, diya wî kurd bû. Lê mezintirîn pişkdariya wan di tevgera Ebû Muslimê Xurasanî de bû, ya ku deverin fireh ji herêmên rojavayê Îran û herêmên kurdî xistin bin destê xwe û hêdî hêdî fireh bû ta ku berdane emewiyan û sala 132k./750z. dewleta wan xistin.<sup>271</sup>

<sup>269</sup>- b.f. li ser serdema Raşidî, bnr. Muhemmed Suhêl Teqqûş, **Tarîxu'l-Xulefa'r-Raşidîn- el-Fitûhat we'l-Incazati's-Siyasîye**, daru'n-Nefa's, Beyrût 2011.

<sup>270</sup>- b.f. li ser serdema Emewî, bnr. Muhemmed Ebdulhey Muhemmed Şe'ban, **Sediru'l-Islam we'd-Dewleti'l-Emewîye (600-750m/132H)**, el-Ehlîye li'n-Neşir we'tüTewzî', Beyrût 1987.

<sup>271</sup>- Erşak Poladiyan, **el-Ekrad fî Hiqbeti'l-Xilafeti'l-'Ebbasîye fî'l-Qerneyn 10-11**, ter. Elixsender Kîşîşyan, daru'l-Farabî /dar Aras, Beyrût/Erbîl 2013, r. 47-58.

### 2.1.3. Kurd Di Serdema Ebbasî De (132-656k./750-1258z.):

Serdema Ebbasî naveke li qûnaxa di navbera (132-656k./750-1258z.) de ji dîroka islamî hatiye kirin, ew li ser navê Ebbas bin Ebdulmutilib çûye, yê ku damezrênerên vê dewletê ji tuxmê wî ne. Desthilatdarî li herêmeke fireh ji şûnmayên emewiya kirin, giha Asia, Efrîka û Europa. Dîroknûsan serdema ebbasî dabeşî çend dewran kirine, dabeşkirina naskirî ev e:

1- Dewra ebbasî yekem (132-232k./750-847z.).

2- Dewra ebbasî duyem (232-590k./847-1195z.).

3- Dewra sêyem tê dabeşkirin sê serdeman:

a) Serdema desthilatdariya Tirkan (232-334k./847-946z.).

b) Serdema desthilatdariya Buweyhiyan (334-447k./946-1055z.).

c) Serdema desthilatdariya Selcûqiyan (447-590k./1055-1195z.).

4- Lê qonaxa di navbera (590-656k./1195-1258z.) dîroknûsan li ser navê wê li hev ne kirine, lê hat jimartin qonaxa ku xelîfên ebbasî desthilatdariya xwe vegerandine.<sup>272</sup>

Tevî cudabûna asta hebûna wan û bandora wan ji dewrekê ta ya din hazirbûna kurdan di serdema ebbasî de xurt bû û ew tê de bikêrin sereke bûn.

#### 2.1.3.1. Kurd Di Dewra Ebbasî Ya Yekem De (132-232k./750-847z.):

Dîroknûs vê serdemê weke serdemeke zêrîn ne ji ebbasiyan bi tenê re, lê ji dewleta islamî bi tevayî re dibînin û ji hemû dewrên wê, çiku xelîfeyan karîbûn ewlekariyê bi cih bikin, nigên dewletê berdin erdê, tevgerên li dijî wan serî hildan ew şikandin û erdnîgariya xwe fireh kirin. Di vê dewrê de û ji pêşî ve hebûneke kurdan ciyawaz hebû; bi riya kesayetiyên, êl û desthilatdariyan rû da. Wan pişkdarî di

<sup>272</sup>-b.f. li ser rewşa xîlafta Islamî û Alema Hawîrdorê wê di destpêka Avabûna xîlafeta Ebbasî de, bnr. Emîne Beytar, **Tarîxu'l-'Esri'l-'Ebbasî**, menşûratu Camî'tî Dîmeşiq, Dîmeşiq 1996/1997, r. 56-57.



damezrandina vê xîlafetê de kirin û dûvre piştî ku xelîfeyan siyasetin cuda bi wan re pêk anîn, nemaze di warê aborî de, serî li ber hildan.

Vekolîna dîroka Kurdî di vê dewrê de westaneke mezin dixwaze da nûçeyên Kurdan ji pirtûk û jêderên kevin bi dest bixin, nemaze yên islamî. Dîroknûs danpêdanê dikin ku dîroka kurdî di serdemên navîn de heqê xwe ji lêkolînê di kurdolojiyê de ne standiye, sedem li gorî Arşak Poladyan dibîne, nekarîbûna xwendineke zanistî ji jêderên dîroka kurdî ya giring re û ne xwendina wê bi hûrbîniyeke zanistî û rêbazî. Ev jî rastiyeke dema lêkolînê di dîroka kurdî de di vê qûnaxê de dikin em pê hest dibin.<sup>273</sup> Em ê li ser girîngtirîn bûyerên ku di vê dewrê de bi Kurdan re têkildar in rawestin.

#### **2.1.3.1.1. Tevgera Ebû Muslim el-Xurasanî (137k./754z.):**

Heye ku girîngtirîn bûyerên di vê dewrê de bi hebûna kurdî ve girêdayî be, tevgera Ebû Muslimê Xurasanî yê ku tevî de'wa ebbasî bû û bû stûnek ji stûnên wê di Xurasanê de, dûv re bû waliyê wê. Bi saya serê wî de'wa ebbasî di Xurasan û nav kurdan de belav bû. Di dawiya serdema emewî de wî berda emewiyan ji herêmin fireh ew derxistin û dest danî ser û roleke wî xurt di bidawîkirina dewleta emewî de hebû, da bibe yek ji girîngtirîn mêrên de'wa ebbasî û bi karê xwe navekî mezin di nav xelkê de stend, nemaze di nav misilmanan de li herêmên rojhilat ji dewletê.<sup>274</sup>

Ebbasiyan dest danîn ser xîlafetê û karûbarê welat sererast kirin, nû dilniya bûn dest pê kirin ji kesê metirsî jê hebû xelas bûn, ji nav wan Ebû Muslimê Xurasanî, yê ku di nav xelkê de pir bi nav û deng bû.

Dem a Ebû Ce'fer el Mensûr hest bû ku navê wî belav dibe û xelk xwe lê digrin, ew vexwend ba xwe û emrê kuştina wî da (137k./754z.), bi kuştina wî re şoreşek bi serokatiya Sinbad li herêmên rojhilat ên dewleta islamî dijî ebbasiyan rabû

<sup>273</sup>-Erşak Poladiyan, **el-Ekrad mine'l-Qerni's-Sabi'î île'l-Qerni'l-'Aşiri'l-Mîladî**, ter. Mecmû'etun mine'l-Mutercimîn, daru'l-Farabî /dar Aras, Beyrût/Erbîl 2013, r. 7.

<sup>274</sup>- b.f. li ser Ebû Muslim el-Xuresanî û Nijadê wî û rola ku di xîlafeta Ebbasî de lîst, bnr. Salih Suleyman el-Weşmî, **Ebû Muslim el-Xeresanî**, menşûrat nadî el-Qesîm el-Edebî, Burîde 1400h. - Mer'î, **el-Fetihu'l- Islamî li Kurdistan**, r. 185. - Ebdulezîz ed-Dûrî, **el-'Esiru'l-Ebbasîyi'l-Ewwel-(Diraseton fi't-Tarîxi's-Siyasîyi we'l-Idarîyi we'l-Malîyi)**, daru'l-Telî'e, Beyrût 1997, r. 25-31, 50-51, 58-61.

xelîfe hêzeke xurt bi ser wan de şand û şoreşa wan vemirand.<sup>275</sup>

### 2.1.3.1.2. Tevgera Babik el-Xurremî (137-158k./754-775z.):

Tevî ku dewleta ebbasî xurt û bi hêz bû jî, lê hin serhildan û tevger li dijî wan rabûn, dijî gendelîya (fesada) tê de, daxwaza wekhevî û xweşkirina rewşa aborî di dewletê de dikirin. Hebûneke kurdî baş di wan de hebû; çî hevband û çî pişkdarin bi kêr. Xelîfeyan ew tevger bi fitne, îlhad û derketina ji rêya xwedê tometbar dikirin û li himber wan rabû û ew têkbirin.

Ji van tevgeran tevgera mezdekî (li ser navê xwediyê de'wê Mezdek) e ku berya islamê rabû û erdeke xweş ji belavbûna xwe re di dewleta ebbasî de dît.<sup>276</sup>

Tevgereke din, tevgera Babik ê Xurremî(223k./838z. mir) ya ku di dema xelîfe Ebû Ce'fer el-Mensûr de rabû, nemaze piştî kuştina Ebû Muslimê Xurasanî. Di nivê yekem de ji sedsala nehê, di dema xelîfe Me'mûn de (198-218k./814-833z.) hat veguhestin û bû bîrûbaweriyek piraniya paşmêrên wê ji jar û cotkaran bûn, da şoreşa wan di destpêka sedsala sêyem a k./nehê z. de li dar keve û bîst salan bidomîne.

Bajarê Bezz li Azerbeycan navenda wê bû û dirêjî herêmên Ran, Kereman, çiya, Teberistan û hd bû. Bîzentiyan piştgiriya wê kirin. Dîroknûs çaxê li ser herêmên çiya yên kurdî diaxivin, li ser hebûna kurdî xurt di tevgerê de diaxivin û derbasbûna kurdan bi piranî hundirê wê de, da bibe wargehek asê ji xuremîyan re, li gel herêmên derdorê. Wiha jî têkiliyên eşkere û zelal di navbera serokên êlên kurdî û Beramika de hebûn, ji wan kesayetîyan yek bi navê Ismet ê Kurd bû, xuyaye roleke wî xurt ji destpêkê de di tevgera Babik de hebû û piştî têkçûna şoreşê hat bidarvekirin.<sup>277</sup>

Dema tevgera Babik gurr bû û metirsiya xîlafetê jê çêbû, xelîfe Mu'tesim

<sup>275</sup> - b.f. li ser kuştina Ebû Muslim el-Xuresanî, bnr. Nebîla Hesên Muhammed, **Tarîxu'd-Dewletî'l-'Ebbasîye**, daru'l-Me'rifetî'l-Cami'îye, el-Iskenderîye 1993, r. 108-110.

<sup>276</sup> - b.f. li ser Mezdekîyê, bnr. Salim Ehmed Mihel, **el-'Elaqatu's-Sasanîyeyî'l-'Erebîyî Xilale el-Qerneyn el-Xamisî we's-Sadisî li'l-Mîlad**, daru Xeyda, Emman/el-Urdî 2012, r. 82-91.

<sup>277</sup> - Poladiyan, **el-Ekrad mine'l-Qernî's-Sabî'î île'l-Qernî'l-'Aşîrî'l-Mîladî**, r. 216-235.

ferman da serleşkerê xwe (Avşîn) ku li pey here û bidawî bîne. Wiha Avşîn sûpaya Babik û hêzên wî şikandin û ew bi dîlîtî li ber xelîfe danî, yê ku sala 223k./837z. fermana kuştina wan derxist. Ji awayê pîs û kirêt ku Babik û birayê wî pê hatin kuştin, ew kîn û zikreşîya bêhempa ku di dilê xelîfe de ji aliyê wan de diyar dike, Wiha jî bê çiqas dewleta ebbasî û hebûna wê xistibûn qelaqê.<sup>278</sup>

### 2.1.3.1.3. Serhildana Ce'fer Bin Fehreces el-Kurdî Li Mûsilê

(224oç/839z.):

Xuyaye ku kurd bi rewşa ku li ser wan hat ferzkirin razî nebûn û di bihtirî boneyekê de li dijî xîlafa ebbasî rabûn. Dîroknûsên misilmanan li ser serhildanekê li Mûsilê diaxivin ku şax berdan herêmên derdorê jî, ew di dema xelîfe Muhammed bin Harûn, yê bi navê el-Mu'tesim de bû (218-227k./833-842z.) û bi nîşan di sala 224k./839z. de. Bi serkêşîya Ce'fer bin Fihreces el-Kurdî. Lê Ibn el-Esîr hewldanê dike ku vê serhildanê kêmbike û rengê ji gendelîyê tê de dît û got ku yên pê rabûne gendelîyê dixwazin.<sup>279</sup>

Li gel hemû piştgiriya ku xelîfe Mu'tesim jê re pêşkêş kir, waliyê Mûsilê ne dikarî vê serhildanê vemirîne, çûku Ce'fer û hevalên xwe ketibûn çiyayê asê û gelek ji leşkerên Mu'tesim kuştin, hin merivên wî di nav wan de. Lewra serwerê leşkerî Îtax ji hêla Mu'tesim ve hat teklîfkirin bi serkêşîya leşker di şerê Ce'fer de. Piştî çend şer û cengan karîbû zora Ce'fer bibe û wî bikuje û serhildanê vemirîne<sup>280</sup>.

Lê Ibn el-Esîr çîrokeke din li ser kuştina Ce'fer bihîstiye; dibêje ku wî jehr vexwariye û miriye. Dibêje jî ku piştî serkeftina Îtax gelek ji kurdan kuşt<sup>281</sup>. Teberî jî wiha dibêje bê ku guhdaneke mezin bide vê serhildanê û navê wî bi vî hawî dibêje

<sup>278</sup> - b.f. li ser herikîna Bûyeran û kuştina Babik, bnr. Ebû'l-Hesen Elî bin el-Huseyn bin Elî el-Mes'ûdî, **Mîrîcu'z-Zehab we Me'adinu'l-Cewher**, c. 2, eş-Şerîke'l-'Alemîye li'l-Kitab ŞML, Beyrût 1990, r. 441-445. - et-Teberî, h.b., r. 216-235.

<sup>279</sup> - Ebu'l-Hesen Elî bin Muhemmed el-Cezerî - Ibni'l-Esîr, **el-Kamil Fi't-Tarîx**, Murace'e û Teshîh: Muhemmed Yûsif ed'-Deqaq, c.6, daru'l-Kutûbu'l-'Ilmîye, Beyrût 2003, r. 57.

<sup>280</sup> - Ebdurrehman bin Muhemmed Ibni Xeldûn, **Kîtabu'l-'Îberî we Dîwanu'l-Mubteda we'l-Xweber fî Eyyami'l-'Erebî we'l-'Ecemî we'l-Berberî**, c. 3, muessesetu Cemal, Beyrût, (b.m.), r. 267.

<sup>281</sup> - Ibni'l-Esîr, h.b., c. 6, r. 58.

(Ce'fer bin Fihreceş)<sup>282</sup>.

Tevî kêmbûna pêzanînên ser vê serhildanê, ew dikarin bigihîjin encamekê ku ew li dijî rewşa civakî û aborî bû ku wê çaxê di dewleta islamî de hebû, lewra serêşiyêke mezin ji xelîfe re çêkir û bi tundûtûjîyêke mezin li hember sekinî. Ji giringiya wê dîroknûs têkbirina wî ji gewretirîn pêkanînên xelîfe Mu'tesim dibînin<sup>283</sup>.

### **2.1.3.2. Kurd Di Dewra Ebbasî Ya Duyem De (232-590k./847-1195z.):**

Di serdema ebbasî ya duwem de guhertineke ji kok de di mêzêna hêzan de çê bû, binekoka dewleta islamî li hev ket, kesayetiya xelîfeyan lawaz bûn û hêzin nû û bikêr diyar bûn ku serkêşiya rastî di dest wan de bû û xelîfe hema bi nav mane xelîfe, ne karîbûn ti biryaran derxin û ne tiştêkî bikin. Buweyhiyan dest danîn ser karûbarên dewletê. Ev yek li gorî berjewendiyên kurdan hatin; hêzin bikêr ji wan derketin meydanê û di vê serdemê de karîbûn mîrneşîn û dewletinên biçûk di herêmên xwe yî cuda de û ta derveyî sînorên xwe jî ava bikin.<sup>284</sup>

#### **2.1.3.2.1. Kurd Di Serdema Desthilatdariya Tirkan De (232-334k./847-946z.):**

Wiha hat bi navkirin ji ber ku tirkan dest danîn kargêrî û dezgehên giring di dewletê de, serkêşên leşkerî bûn ji tirkan û bêyî ku li xelîfe vegezin kar dikirin, piştî kuştina xelîfe el-Mûtewekkil û danîna el-Muntahir xelîfe (247k./861z.) destdirêjiya tirkan zêdetir bû û ew bi xwe ma di dest tirkan de li gorî daxwazên wan ferman derdixistin.<sup>285</sup> Hevûna kurdan di vê serdemê tevî de berz bû ew ji meydanê neçûn, di nav wan de tevger û serhildan diyar bûn, giringtirînên wan ev bûn:

<sup>282</sup> - et-Teberî, h.b., r. 270.

<sup>283</sup> - Poladiyan, *el-Ekrad mine'l-Qerni's-Sabi'î île'l-Qerni'l-'Aşiri'l-Mîladî*, r. 72-73.

<sup>284</sup> - b.f. li ser nîrên yên ku berî damezrandina van dewleta û mîrneşînan de û sedemên ku bûne xuyakirina wan, bnr. Qadir Muhemmed Hesên, *el-Îmaratu'l-Kurdîyetî fi'l-'Esiri'l-Biweyhî - Dirasetun fi 'Elaqatîhe's-Siyasîyetî we'l-Iqtîsadiye (334-447h /945-1055m)*, metbe'etu Rojhilat, Erbil 2011, r. 57-72.

<sup>285</sup> - b.f. li ser vê serdemê û taybetmendiyên wê, bnr. Beytar, h.b., r. 223-242.

### 2.1.3.2.1.1. Desthilatdariya Eyšanê (300-350k./912-961z.)<sup>286</sup>:

Hêvî û daxwazên kurdan di sedsalên (4-5k./9-10z.)de mezin bûn û serokên wan di bin siya yek desthilatdariyê de kom bûn û vê carê hukmê zatî dixwestin ne li dijî xerabûna rewşa civakî û aborî rabûn.<sup>287</sup>

Di wê qûnaxê de û eynî di destpêka sedsala çarê k./dehê z. de desthilatdariyek bi navê Eyšanê diyar bû û dor 50 salî domand. Dest danî ser rojavayê herêma çiyayan li derdora Deynûr, Hemedan, Nehawend, Samghan (nêzîkî Şehrezûr), ta sînorên Azerbeycan û ta sînorên Şehrezûr. Tê zikirkirin ku ew ji êla Bizirkanî ya kurdî ne. Navê serokê wan Ehmed bû, du lawên wî hebûn (Windad û Xanim) û her yek ji wan hêz û desthilatdariya wî hebûn. Jêder dibêjin ku Windad sala 349k./960z. de mir û lawê wî Ebû el-xenaim Ebdulwehab şûna wî girt ta ku şazincan ew dîl kirin û radeştî Hesnewêh kirin (emê li ser bi axivin) û dest danî ser hemû desthilatdariya wî. Xanim mirina wî sala 350k./961z. de bû, lawê wî Ebû Salim Deysem bin Xanim şûna wî girt, keleha Qesinan baregeha wî bû, ta bi destê Ebû elfetih bin el-Emîd bi dawî hat û dest danî ser hemû desthilatdariya wî.<sup>288</sup>

Xuyaye bi vî hawî dawiya desthilatdariya Eyšanê bû û nema qala wan hat kirin ta ku yek ji lawên Xanim bi serhildanekê rabû; Ibn el-Esîr di nav bûyerên sala 373k./983z. de qal dike, ew di serdema Biweyhî de bû û wek tê xuyanî ew ji mîrneşîna Hesnewêh bû. Mîr Fexruddewle yê biweyhî sûpayek şand ser û çend hewldan kirin, lê nikarîbû zora wî bibe, ta asta ku mîrê biweyhî Hesnewêh lom jê kirin çawa ta niha wek vê tevger û serhildanê heye û ferman da ku bi wî re lihevhatinekê li dar xe. Ew di sala 374k./984z. pêk hat û ta sala 375k./985z. domand, ku mîr Fexruddewle careke din êrîş wî kir û vê carê zora wî bir û ew têk bir.<sup>289</sup> Ji bûyeran tê xuyanî ku ew têkelî mîrneşîna Hesnewêh bûbûn.

<sup>286</sup> - Ibin Xeldûn wê bi navê el-'Ebbabiye bi karanîye û belkî ku şaş ji Ibni'l-Esîr kirtîye, bnr. Ibin Xeldûn, h.b., c. 8, r. 1093.

<sup>287</sup> - Poladiyan, *el-Ekkrad fî Hiqbeti'l-Xilafeti'l-'Ebbasiye fi'l-Qerneyn 10-11*, r. 114.

<sup>288</sup> - Ibni'l-Esîr, h.b., c. 7, r. 388. Ibin Xeldûn, h.b., c. 8, h. r.

<sup>289</sup> - Ibni'l-Esîr, h.b., c. 7, r. 412.

### 2.1.3.2.1.2. Kurd Di Azerbeycanê De:

Ciheke giring ji Azerbeycan û dîroka kurdî re di helbestê Cegerxwîn de heye, nemaze ew bûyerên bi Deysem ve girêdayî, ew kesayetîya dîrokî ciyawaz ku karîbû panaveke erdnîgarî fireh ji Azerbeycan û derdora wê di bin destê xwe bixe. Li gel wê, ew nakokîya di nav nişteciyên herêmên îranî ji alîkî û ereb û feodal ji aliyê din ve roleke baş hebû ku tevger û çalakîyên kurdî li Azerbeycan zêde bibin.<sup>290</sup>

Ibn el-Esîr di nav bûyerên sala 330k./942z. de li ser Deysem lawê Ibrahîmê Kurdî radiweste û dibêje ku bavê wî dostê Harûn Eşşarî bû; yek ji serokên Xewarican. Piştî kuştina Harûn Eşşarî û bidawîkirina tevgera Xewarican, bavê Deysem reviya çû Azerbeycanê û bi keça serokekî ji kurdên wir re zewicî, Deysem ji wan re çê bû; yê ku bi hakimê Azerbeycan Ebû Essac re kar kir û cihekî bilind di dewletê de girt û piştî mirina Ebû Essac wî Azerbeycan tev bi dest xist, piraniya leşkerên wî ji kurdan bûn.<sup>291</sup>

Dîroknûs dibêjin ku Deysem xwe nêzîkî Deyleman kir<sup>292</sup>, da wan dijî hevrikên xwe ji kurdan bikar bîne, tê de biser ket û hevrikên xwe dûr xistin û bi hêz û bê ku ti serî di ber re bilind bibin desthilatdarî zeft kir.<sup>293</sup>

Dûvre nava Deysem û wezîrê wî Ebû el-Qasim Elî bin Ce'fer ne xweş bû, di hevrikiyê de Elî reviya û xwe li Muhemmed bin Musafir girt û xwe nêzîkî herdu lawên wî (Wehsezan û Mirzeban (Salar)) kir, herduwên ku ji Deysem dildagirtî bûn, nemzê Mirzeban (Salar) ji ber ku Deysem bavê wî girtibû û dest danî ser mal û milkê wî, li gel dozin mezheba olî; Deysem ji Xewarican dihat jimartin û ew ji şîayên batinî bûn û Elî jî ji wan bû. Herduwan bi hev re alîkarî kirin da ji Deysem û desthilatdariya wî rizgar bibin, lê alîkariya wan ne domand û Elî neçar bû ku bireve. Deysem jî fersende ji dest xwe berneda, bawerî li paşmêrê xwe yên kurd vegezan û êrîş bir ser Mirzeban (Salar) ê ku xwe di Tebrîzê de asê kiribû. Kurdên ku Mirzeban

<sup>290</sup> - Poladiyan, *el-Ekrad mine'l-Qerni's-Sabi'î ile'l-Qerni'l-'Aşiri'l-Mîladî*, r. 67-70.

<sup>291</sup> - Ibnî'l-Esîr, h.b., c. 6, r. 164.

<sup>292</sup> - b.f. li ser Deylemiyan, bnr. Hesên Minêmenê, *Tarîxu'd-Dewleti'l-Biweyhîye es-Siyasî we'l-Iqtisadî we'l-Ictîma'î we's-Seqafî – Muqate'etu Faris 334-447h /945-1055m*, ed-Daru'l-Cami'îye, Beyrût 1987.

<sup>293</sup> - Ebû Elî Ehmed, bin Muhemmed Meskewêh, *Kîtabu Tecaribu'l-Umemî*, c. 2, daru'l-Kîtabi'l-Islamî, el-Qahîra (b.m.), r. 31. - Ibnî'l-Esîr, h.b., c. 6, r. 164-165.

(Salar) tade li wan kiribû ew jî gihan Deysem, lê Mirzeban karîbû hevpeymanekê bi Elî bin Ce'fer re deyne û herduwan bi hev re Deysem dorpêç kirin ta xwe radestî wan kir û bi vî hawî dawîya hukmê wî hat sal 344k./956z.<sup>294</sup>

Ibn Hewqel dibêje yê Deysem radestî waliyê Azerbeycan kir, ew waliyê Armînya Ibn Deyranî bû û waliyê Azerbeycan xelata wî bi çar salan efûkirina ji bacê dayê.<sup>295</sup>

Jiyana Deysem piştî wê, tê gotin ku bi destê Justan lawê Mirzeban sala 346k./958z. hat kuştin.<sup>296</sup>

Piştî şerê ku tê de Deysem şikest, Mirzeban (Salar) dest danî ser desthilatdariyê û sînoren mîrneşîna xwe fireh kirin û bi rûsan re ket şer û cengê û ew bi paş ve vegerandin û di cengekê de pir xisar li wan kir. Bi buweyhiyan re jî ket şer, tevî ku hêza wî ne bi qasî sûpayên buweyhiyan û hevbendên wan jî ew ne rawestiya ta ku ew sala 342k./954z. dîl kirin û avêtin zindanê. Paş re bi alîkariya diya xwe ji zindanê reviya û çû Azerbeycan. Li wir leşkerên xwe yê belavbûyî dan ser hev û careke din desthilatdariya xwe vegerand û ta sala mirina xwe 345k./957z. hikum kir.<sup>297</sup> Û dibêjin ku ji ber nexweşiyekê mir û di wesiya xwe hukum da birayê xwe (Wehsezan) û piştî mirina wî mîrîfî bighê lawê wî (Jistan), lê ew tev neçû serî, çiku nakokî û şer li ser erş û desthilatdariyê ket nav wan.<sup>298</sup>

### 2.1.3.2.1.3. Hevbeşîya Kurdan Di Tevger û Serhildanên Dijî Ebbasiyan

#### De:

Kurdan hevbeşî di gelek tevger û serhildanên dijî siyasetên dewleta ebbasî di pir çarçivan û di cugrafîyeke fireh de kirin, em ê bi kurtî wan berçav bikin:

- **Şoreşa Zinc** (255-270k./869-883z.): Li dor çardeh salan dom kir, hebûna

<sup>294</sup>- Meskewêh, h.b., r. 31-37. - Ibni'l-Esîr, h.b., c. 6, r. 166.

<sup>295</sup>-Ebu'l-Qasim Ibni Hewqel en-Nuseybîni, **Kîtabu Sûretu'l-Erd**, dar Mektebetu'l-Heyat, Beyrût 1992, r. 303.

<sup>296</sup>- Muhammed EmînZekî, **Tarîxu'd-Diwelî we'l-Îmarati'l-Kurdîyetî fi'l-'Ehdi'l-Islamî**, ter. Muhammed Elî Ewnî, Metbe'etu's-Se'ade, Misir 1948, r. 41.

<sup>297</sup>- h.b., r. 29-39. - Zekî, **Meşahîru'l-Kurdî we Kurdistan fi'l-'Ehdi'l-Islamî**, c.1, r. 49.

<sup>298</sup>- Zekî, **Tarîxu'd-Diwelî we'l-Îmarati'l-Kurdîyetî fi'l-'Ehdi'l-Islamî**, r. 39.

kurdan bi peywendiyên wanî bi serokên şoreşê bû, nemaze hakimê Xozistan, Muhammed Ubeydillah bin Azadmerd, yê ku peywendiyên wî veşartî bi serokên şoreşa Zinc re hebûn sala 875z., piştî li hev ketin û şer di navbera Zinc û êlên Derban ên kurd de çê bû, di ber re hin bûyer jî qewimîn.<sup>299</sup>

- **Tevgera Qeramîta** yên Smaîlî (890-891z.) li Kûfa û dirêjahiya herêmin cûrecûr ji warên xîlafeta ebbasî bû, dûv re di sala 900z. de bi tevgera xwe ya giran ji Sûriya dest pê kirin.<sup>300</sup> Nameyek ji Hesên bin Zikrewêh (Xwediyê şa'nê) heye ji hevbendê xwe yê kurd ê bi navê Ce'fer lawê Hemîdê Kurdî re şandiye. Ev name hevbeşiya kurdan di vê tevgerê de diyar dike û hebûna kesin kurd di rojavayê Sûriyê de di dawiya sedsala nehê zayînê de nîşan dike.<sup>301</sup>

- **Tevgerin Xewaricanî nû** sala 272k./886z. li Mûsil rû dan, roleke kurdan giring tê de hebû û Muhammed lawê Xurzadê Kurdî wek kesayet diyar bû.

- **Serhildana Şehrezûr** di dema xelîfe Muktefî de (289-295k. /902-908z.).

- **Nakokiyin di navbera Kurdan û hemdaniyan de rû dan**, ji bo desthilatdarî û firehkirina sînoran di sedsala çarê k./dehê z. de.

- **Serhildanên kurdan li Mûsilê** di salên (294k. /907z.), (300k./913z.), (308k./921z.) de.

- **Serhildana kurdan li Esfehan** bi serokatiya Ebdullah bin Ibrahîm (295k./908z.). ûhd.<sup>302</sup>

---

<sup>299</sup> - b.f. li ser Şoreşa Zinc, bnr. Fêsel es-Samir, **Sewretu'z-Zinc**, daru'l-Meda, Beyrût 2004. Ehmed el-'Eelî, **Sewretu'z-Zinc we Qaidehe 'Elî bin Muhammed**, daru'l-Farabî, Beyrût 2007.

<sup>300</sup> - b.f. li ser Qeramîta, bnr. Suhêl Zekkar, **el-Camî'u fi Exbaru'l-Qeramîta**, daru Hesana, Dîmeşiq 1987.

<sup>301</sup> - Ji bo xwendina Peyamê, bnr. et-Teberî, h.b., r. 648-649.

<sup>302</sup> - b.f. li ser wan bûyeran, bnr. Poladiyan, **el-Ekrad mine'l-Qerni's-Sabi'î île'l-Qerni'l-'Aşiri'l-Mîladî**, r. 90-115.



**2.1.3.2.2. Kurd Di Serdema Desthilatdariya Biwehyian De (334-447k./946-1055z.) û Ta Dawiya Desthilatdariya Selcûqiyân (447-590k./1055-1195z.):**

Dawiya xelîfeyê ebbasî Mustekfî (333-334k./944-946z.) dawiya serdema desthilatdariya tirkî bû, da serdemeke nû dest pê bike bi serdema biweyhî hat naskirin (334-447k./946-1055z.), çaxa Ehmedê Biweyhî ket bexdayê paytexta xilafeta ebbasî û dest danî ser hukum û nema ji bilî tiştin biçûk bi destê xelîfê dihat. Bû mîna karmendekî li ba mîrekên buwehyian, wiha jî destê wezîrên wî jî ji kar kişand.<sup>303</sup>

Di derbarê buwehyian de dîroknûs dibêjin ew ji Deylem in û çaxê Deylem ketin ola islamê ew jî bi wan re ketinê. Ji ber xwezaya welatê wan ê çiyayî û tunebûna çandiniyê û dahatên din neçar diman ku bibin leşkerên bi pere kar dikin, tevî sûpaya Makan lawê Kakî yek ji serokên deylemiyan bûn û bi şarezaya xwe ya leşkerî û lawaziya serokên deylemî ew di demeke kin de bi serokatîyê ve hilkişiyân, ta ku xîlafet û dewleta ebbasî xistin bin perrê xwe.<sup>304</sup>

Sala (334-335k./946-947z.) herêma çiyayan tev bû ya buwehyian û desthilatdarî li parçê rojava û başûr ji Îran û parçê mezin ji Iraq li gel bajarên Hemedan, Esfehan, Rey û deverên Xozistan, Kerman, Faris, Bexda û Besra, di paş re kurdan şerekî giran li dijî wan kirin.<sup>305</sup> Lê xuya ye ku herêma Şehrezûr di nivê pêşî ji sedsala çarê k./dehê z., di destê kurdan de ma, wiha jî herêma Selmas li Azerbeycan ku di destê Ce'fer lawê Şekewêh Kurdî de bûn û êlên Hedebanî jî hukum li hin bajaran dikirin.<sup>306</sup>

Kurdan di serdema desthilatdariya biweyhî de mîrneşîn û dewletinên biçûk ava kirin û domandin ta serdema desthilatdariya Selcûqî (447-590k./1055-1195z.) û dûvre ta dawiya xîlafeta ebbasî da bibin dewlet û hikûmet, hejmara wan giha çardeha (Rewadî, Salarî li Azerbeycan, Hesnewî li Hemedan, Şedadî li Eran, Dostikiya Merwanî li Diyarbekir, Ennazî li Helwan, Şebenkarî li Faris, Lurî ya mezin û Luriya

<sup>303</sup> - Minêmenê, h.b., r. 52-53.

<sup>304</sup> - h.b., r. 97-98.

<sup>305</sup> - Poladiyan, *el-Ekrad mine'l-Qerni's-Sabi'î ile'l-Qerni'l-'Aşiri'l-Mîladî*, r. 113-115.

<sup>306</sup> - Hesên, h.b., r. 32-33.

biçûk li Loristan, Eyûbî li Misr û Şam, Erdelanî li Îran, Şaneşîna kurdî li Xurasan, Zendî ya îranî, Biraxûê li Bilucistan). Em nikarin bi firehî li ser tevan rawestin, tenê yê bi mijara me ve girêdayî.<sup>307</sup>

#### **2.1.3.2.2.1. Mîrneşîna Rewadî (337-463k./948-1071z.):**

Ji kevintirîn mîrneşînen kurdî tê jimartin, desthilatdariya wê li piraniya mezin ji Azerbeycan bû. Damezrênerê wê Mihemmed lawê Hisên ê Rewadî bû, yê hukum li hin herêmên Ermînya dikir û piştî Mirzeba Salar sala 337k./948z. dîl bû, desthilatdariya xwe fireh kir gihand Azerbeycan. Piştî mirina wî lawê wî Hisên şûna wî girt; yê bi navê Ebulheycai Errewadî hat naskirin. Herêmên desthilatdariya xwe fireh kir û dest danî ser Tebrîz û kir navenda hukmê xwe. Wek damezrênerê duwem ji mîrneşîna Rewadî re tê jimartin.

Piştî wî desthilatdarî ket dest lawê wî Mihemmed. Wî jî xwe bi navê Ebulheycai hilda û di jêderên ermenî de bi navê Memlan tê naskirin. Piştî mirina mîrê salarî Ibrahîm lawê mirzeban 373k./983z. wî fersende ji dest xwe berneda û cugrafya mîrneşîna xwe fireh kir ta piraniya mezin ji Azerbeycan bidest xist, dûv re Mirzeban lawê Smaîl şikand û Azerbeycan tev zeft kir û du helbe birin ser Ermînya jî da wê têxe bin hukmê xwe.

Piştî mirina Memlan sala 391k./1001z. lawê wî Ebû Nesr Mihemmed şûna wî girt, dûv re birayê wî Ebû Mensûr Wehzan lawê Mihemmed ê Rewadî sala 416k./1025z., desthilatdariya wî qûnaxeke dirêj domand ta sala mirina wî 451k./1065z. lawê wî Mihemmed lawê Wehzanê Rewadî şûna wî girt, ew jî bi navê Memlan hat naskirin, hukmê wî ta hatina selcûqîyan domand. Destpêkê selcûqîyan ew li ser mîrneşîna wî hiştin, lê dûvre ew girtin û mîrneşîna xistin bin destên xwe 463k./1071z.<sup>308</sup>

<sup>307</sup> - Zekî- Tarîxu'd-Diwelî we'l-Îmarati'l-Kurdîyetî fi'l-'Ehdi'l-Islamî, r. 28.

<sup>308</sup> b.f. bnr. h.b., r. 29-56. - Hesên, h.b., r. 35-39.

#### 2.1.3.2.2.2. Mîrneşîna Şeddadî (340-595k./951-1198z.):

Li herêma Aran navbera Azerbeycan û Ermînya hat lidarxistin. Ji giringtirîn (Berzega, Derbîl, Gince, Bîlqan, Elbab, Derbend, Teflîs, Wersan, Berdîj, Şemkûr, Şaberan, Bako, Şerwan). Li ser navê bapîrê wan Şeddad lawê Qurtuq mîrneşîn hat bi navkirin. Mîrneşîn bi saya Mihemmed lawê Şeddad hat damezrandin, wî fersenda girtina Salarê Mirzeban bi dest xist û mîrneşîna xwe fireh kir. Lê dema Salar ji girtîgeha xwe reviya û xwest mîrneşîna xwe vegeîne di nav wî û Mihemmed lawê Şeddad de bû şer û ceng û serkeftin ji wî re bû.<sup>309</sup>

Mihemmed lawê Şeddad sala 344k./955z. mir, lawê wî Leşkerî li şûna wî seroktiya êlê (eşîrê) girt û birayê wî Bulfedil/Fedlon<sup>310</sup> û piştî peywendî bi binemala Salar re xurt kirin karîbû bajarê Gince bi dest xwe xîne, ew yek ji bajarên mezin e li nabêna Şêrwan û Azerbeycan e û radestî birayê xwe Leşkerî kir, yê ku heşt salan li ser hukum ma ta mir. Birayê wî Bulfedil şûna wî girt û nêzîkî 45 salan hukum kir û bi awakî berbiçav mîrneşîna xwe fireh kir.<sup>311</sup>

Piştî mirna Bulfedil sala 422k./1030z.<sup>312</sup> lawê wî Mûsa mîrneşîn bi dest xwe girt. Hat kuştin. Di pey re Enoşerwan, dûvre Şawir lawê Fedlon ku bi berztirîn mîrekên şedadiyan tê naskirin, li ser hat gotin ku şahekî gewre, dadwer û mêrxas bû. 18 salan hukum kir, sala 459k./1067z. mir û lawê wî Elfedil essanî şûna wî girt dûvre Fedlon ê ku hevrikî bi selcûqîyan re kir ta ku karîbûn sala 468k./1075z. dest deynin ser mîrneşîne û sînorên wê teng kirin ta ma bajarê Anî tenê, ta dawiya sedsala şeşê k. duwazdehê z. domand.<sup>313</sup> Tabluwek li Anî<sup>314</sup> hat vedîtin navê mîrên şedadî diyar dike. Hejmara wan 14 mîr in, yê dawî sala 495k./1102z. bû.<sup>315</sup>

<sup>309</sup> - Hesên, h.b., r. 39-40.

<sup>310</sup> - Muhemmed Emîn Zekî dibejî ku Fedlûn birayê Muhemmed bin Şeddad e, bnr. Zekî- **Tarîxu'd-Diwelî we'l-Îmaratî'l-Kurdîyetî fi'l-'Ehdi'l-Islamî**, r. 91. Lê a rast ku Fedlûn lawê Muhemmed bin Şeddad e û Ew birayê Şukrî ê biçûkî, bnr. Hesên, h.b., r. 40.

<sup>311</sup> - Hesên, h.b., r. 39-42.

<sup>312</sup> - Muhemmed Emîn Zekî bi şaşî dibeje ku sala mirna wî 442 lê li cihkî din rast dike 422, bnr. Zekî- **Tarîxu'd-Diwelî we'l-Îmaratî'l-Kurdîyetî fi'l-'Ehdi'l-Islamî**, r. 91.

<sup>313</sup> - Hesên, h.b., r. 42-43.

<sup>314</sup> - Anî: Bajarekî çiyayî ye, li bilind ciyekî asêgeh, li ser çemê Axuriyan e ku ew jî beşeke ji çemê Aras e, aniha şûnmayên û kavlên wê dikeve dûrî parêzgeha Qers bi aliyê Rojhilat de bi 40 k. m., nezîkî gundê Ocaklı nezî sînorê Eemînya.

<sup>315</sup> - Zekî- **Tarîxu'd-Diwelî we'l-Îmaratî'l-Kurdîyetî fi'l-'Ehdi'l-Islamî**, r. 94.

### 2.1.3.2.2.3. Dewleta Dostikî – Merwanî (345-380k./956-990z.), (380-489k./990-1095z.):

Desthilatdarî û sînorên vê dewletê herêmin fireh ji welatê kurdan himêz kir, nemaze ewên ku di cugrafya de bi navê herêma Cezîrê (Amed, Meyafarqîn, Mêrdîn, Cezîra Botan, Nisêbîn, Yeldo li bakurî Mûsilê), li gel Ercîş, Erzen û Bedlîs li Iqlîmê (herêma) Ermînya.<sup>316</sup>

Dewlet bi saya serê Dostik<sup>317</sup> (yek ji mîrên êla Hmêdî/Hemûdî)<sup>318</sup> sala 321k./931z. hat damezrandin. Dûvre lawê wî Ebdella Hisên şûna wî girt yê ku navê (Baz Ebû Şûcai)<sup>319</sup> hilgirt, navûdengê wî hişt ku karibe sala (345-346k./956z. desthilatdariyekê lidarxîne û piştî mirina bavê wî (348k./959z.) dest bi firehbûna desthilatdariya xwe kir, Melazgird û Mako dagîr kirin, bajarê Şabaz ava kir (ê ku paşre Elmelik eladil (615-635k./1218-1238z.) navê guhert Adilcewaz), salên (355-356k./966-967z.) dest danî ser Ercîş û derdora wê, Diyarbekir (Amed û Farqîn), Reha (Orfa), Exlat, Wan, Bedlîs û bajarin din û mîrên Heskîf, el-Cezîr, Botan, Sirûc û Nisêbînê jî serî jê re danîn.

Amed ji xwe re kir paytext, navê wî bilind bû û hêza wî zêde bû, xelîfê ebbasî Elqadir Billah (381-422k./991-1031z.) ew bi navê (Baz Ebû Şûcai) xelat kir. Sala 360k./970z. Baz pere bi navê xwe derxistin û di xutbê Înê de navê wî bi yê xelîfe re li ser minbera mizgeftê dihat gotin.<sup>320</sup>

Peywendiyên Baz bi buweyhiyan re di dema Eded eddewle de xweş bûn, di şerê wî bi hemdaniyan re li aliyê wî sekinî û dema Eded eddewle mir, Baz xwest sînorên desthilatdariya xwe fireh bike û biserket ta giha Mûsilê, vê yekê hişt ku Semmam eddewle bin Eded eddewle bi tengije, peywendî di nav wan de nexweştir bûn, şer bi hev re kirin. Di destpêkê de Baz bi ser ket û zerarin baş gihand

<sup>316</sup>- (Iqlîmê el- Cezîra, Iqlîm Ermîniya, ...) wiha û bi van nawan dihatin naskirin di pirtûkên cîhangerên Musilman, b.f. bnr. Şemsu Ed-din Ebu Ebdullah el-Bişarî El-MeKdîsî: **Ehsenu't-Tekasîm fî me'rîfet el-EKalîm**, Laydîn 1906, r. 136. Ibin Hewqel, h.b., r. 187.

<sup>317</sup>- Li ba Ibin Xeldûn (Doştik) e, bnr. Ibin Xeldûn, , h.b., c. 6 , r. 902.

<sup>318</sup>- Ibni'l-Esîr dibêje ku ew ji qebîleyên el-Himêdiyê yî, bnr. Ibni'l-Esîr, h.b., c. 7, r. 415.

<sup>319</sup>- (Baz el-kurdî) wiha hatiye li ba Ibni'l-Esîr, bnr. Ibni'l-Esîr, h.b., c. 7, r. 415 û li ba el-Fariqî hatiye bi navê (Bad bin Dostik el-Harbextî), bnr. Ehmed bin Elî bin el-Ezreq el-Fariqî, **Tarîxu'l-Fariqî**, teh. Bedewî Ebdulletîf 'Ewed, el-Heyetu'l-'Ame lişîûn el-Metabi' el-Emîrîye, el-Qahîra 1959, r. 49.

<sup>320</sup>- Şerefhanê Bedlîsî, **Şerefname**, ter. we teh.: Muhemmed Cemîl el-Melle Ehmed er-Rojibiyânî, muessesetu el-Mokiryânî li't-Tîba'etî we'n-Neşir, Erbîl 2001, r. 105 (haşiya 1).

buweyhiyan nemaze li Bajelaya.<sup>321</sup>

Semmam eddewle sûpayek şand şerê Baz, li nêzîkî Tekrît raserî hev hatin, Baz têkçû, vegeriya Amedê û bi buweyhiyan re li hev hat, lê lihevhatina wan dom ne kir. Baz sûpayek amade kir û serkêşiya wê xist destê birayê xwe Ebulfewaris (Telîetuddewle) û êrîşî Mûsilê kir. Hakimê wê hawara xwe gihand eşîrên Eqîl û Benî Numêr û bi hev re êrîş vegerandin û birayê Baz hat kuştin, vê hişt ku Baz bi xwe berê xwe bide Mûsilê, lê bextê wî yê reş hespa wî terpilî, xwe çemkir ser piştta hespeke din lê ket nav kuştiyan û hat gotin ku hê sax bû leşkerek hat û ew kuşt. Ew di sala (380k./990z.) bû.<sup>322</sup>

Piştî kuştina Baz xwarziyê wî Ebû Elî Hesên lawê Merwan desthilatdarî bi dest xwe xist û karîbû baweriyê li sûpayê vegevine û piştî erêkirina jinxala xwe ku li Heskîfê rûniştî bû, dest danî ser herêmên ku berê di bin destê xalê wî de bûn û di ruwê hemdaniyan de sekinî, desthilatdariya xwe fireh kir, her tişt saz kir û Amed kir navenda desthilatdariya xwe. Ew destpêka damezrandina dewleta Merwanî bû, lê ew bi pîlanekê (mûamere) sala 387k./997z. bi destê kesekî jê re dibêjin Ibin Dimne hat kuştin, desthilatdarî ket destê birayê wî Mûmehiddewle Ebû Mensûr Seîd lawê Merwan.<sup>323</sup>

Mûmehiddewle asûdeya dewleta merwanî parast û karîbû peywendiyin xurt bi cîranan re û bi bîzentiyan re deyne, 14 salan hikum kir, ew jî bi destê dudwên nêzîkî xwe (Şêrwîn û Ibin Fîlos) sala (401k./1010z.) hat kuştin. Bi kuştina wî dewlet li bin guhê hev ket û Şêrwîn desthilatdarî girt.<sup>324</sup>

Birayê Mûmehiddewle; Ehmed lawê Merwan (Nesruddewle) sala 402k./1011z. û piştî çend şer û cengan desthilatdarî vegerand û her tişt xist bin destê xwe. Di dema wî de dewleta Merwanî giha geşbûneke siyasî û şaristaniyeka bilind, ta hatina selcûqiyan ew serbixwe bû û ta mirina xwe sala (453k./1061z.) ma di taeta selcûqiyan de.<sup>325</sup>

<sup>321</sup> - Ibni'l-Esîr, h.b., c. 7, r. 415.

<sup>322</sup> - h.b., r. 433. - el-Fariqî, h.b., r. 57-58. - Bedlîsî, h.b., r. 105-106 (haşiya 1).

<sup>323</sup> - Ibni'l-Esîr, h.b., c. 7, r. 444 - 445. - Bedlîsî, h.b., r. 105-106 (haşiya 1).

<sup>324</sup> - Hesên, h.b., 48-49.

<sup>325</sup> - Bedlîsî, h.b., r. 106-108.

Di pey wî re hukum ket destê lawê wî Nesr lawê Nesruddewle Ehmed, nakokî ket nav wî û birayê wî Seîd ê ku hikum li Amedê dikir û Nesr li Miyafarqîn. Seîd sala (465k./1073z.) mir, lê Nesr sala (472k./1080). Lawê wî Mensûr lawê Nesr lawê Nesruddewle Ehmed şûna wî girt. Wezîrê wî Fexruddewle bin Cuhêr di nakokiya wan de ew şikand û sala (489k./1096z.) dawiya dewleta Merwanî anî.<sup>326</sup>

Siyasetên ku desthilatdarên dewleta Merwanî pêk anîn ku bihtir nêzîkî bêalî û aştîyê bûn ku em wan bi xeynî wan re bidin ber hev, bandoreke erênî li pêşketina welat kir, avahî, bazirganî, riyên hatûçûyê ûhd geş bûn.<sup>327</sup>

#### 2.1.3.2.2.4. Mîrneşîna Hesnewêh (348-406k./959-1015z.):

Vê mîrneşîne bala dîroknûsan kişand, yê ku li ser nivîsandin Ibn el-Esîr, Ibn Miskewêh, Ibn Xeldûn ûhd. Şerefxanê Bedlîsî beşê duwem ji Şerefname ya xwe ji binemala Hesnewêh re terxan kir; navê mîrên wan, desthilatdarên wan û bûyerên ku di serdema wan de qewimîn.<sup>328</sup>

Ku em bingeha vê mîrneşîne bişopînin emê bibînin ku ji kêlîka mirna Xanim mîrê Eyşanê dest pê dike, çiku Hesnewêh lawê Hisên ê Kurdî Birzikanî; damezrênerê mîrneşîna Hesnewêh û bi alîkariya eşîra Şazincan, dest danî ser mal û milkê wê mîrneşîne û bi wê binemala Hesnewêh weke hêzeke nû di herêmê de berz bû.<sup>329</sup>

Cara yekem ku qala vî mîrî tê kirin di bûyerên sala (359k./969z.) de bû, dema ku Hesnewêh bi xurtî dest danî ser herêma çiyayan, di destpêkê de peywendiyên wî bi buweyhiyan re xweş bûn, ta ku nava wî û Ebû Musafir ê biweyhî xira bû, şer di nav wan de qewmî û di cengê de Hesnewêh bi ser ket. Biweyhî jê tirsîyan û hesab jê kirin.<sup>330</sup>

Ji deqekî Ibn el-Esîr tê xuyakirin ku hakimê buweyhiyan pileyeke taybet

<sup>326</sup>- h.b., r. 108.

<sup>327</sup>-b.f. li ser Dostikiya û şaristaniya wan, bnr. Ebdurreqîb Yusuf, **ed-Dewletu'd-Dostikiye fi Kurdistanî'l-Wista**, c.1, metbe'etu'l-Liwa', Bexdad 1972 /c. 2, daru Aras, Erbil 2001.

<sup>328</sup>- Bedlîsî, h.b., r. 111-123.

<sup>329</sup>- Ibni'l-Esîr, h.b., c. 7, r. 388.

<sup>330</sup>- Meskewêh, h.b., r. 270.

didayê, ji ber ku her di şerê wî dijî Xurasan li kêleka wî bû û çavê xwe li nedana bacê digirt û di şer de ew ne şikand û pê re li hev hat.<sup>331</sup>

Ibn el-Esîr dibêje ku Hesnewêh di sala (369k./979z.) de mir. Piştî mirina wî zarokên wî bûn du bend, bendekî piştgiriya Fexruddewle yê biweyhî dikir û yekî ya Ededuddewle. Dawî Ededuddewle derbasî nav wan bû û Ebunnecim Bedir danî hakim, yê ku karûbarê mîrneşînê sererast kir.<sup>332</sup>

Şerefxanê Bedlîsî bûyer û xîlafa di nav kesê binemala Hesnewêh de dibêje, binavtîrîn kes di nav wan de Bedir lawê Hesnewêh e, yê ku ji Bexdayê navê (leqeba) Nasiruddewle stendiye û sînoren dewleta wî ji Deynûr gihaye Ehwas, Xozistan, Mirûcerd, Esedabad û Nehawend û dest danî ser van waran tevî û deşt, çiya û beyabanên di nav wan de.<sup>333</sup>

Bedir ket gelek şer û cengan, Ibn Xeldûn li ser wan disekine û ji ber serkeftinên wî navûdengê Bedir belav dibe û desthilatdariya wî fireh dibe ta ku di cengekê bi Hesên lawê Mes'ûdê Kurdî re tê kuştin.<sup>334</sup>

#### **2.1.3.2.2.5. Mîrneşîna Lora Mezin (543-827k./1148-1424z.):**

Herêma Loristan dikeve orta berzatî/hêrik (hedebe) ya Zagros, nabêna herêmên Xozistan ji başûr ve û Kurdistan ji bakur ve. Dîroknûs dibêjin ew ji navçeyên Xozistan e, ew warin bi xêr û bêr in, piraniya wê çiyane.<sup>335</sup>

Ibn Hewqel dibêje ku Lor ji herêma Xozistan bû, dûvre bi herêma çiyane ve (el-Cîbal) hate girêdan û Lor welatek bi xêrûbêr e, piraniya wê Kurd in.<sup>336</sup> Hebûna

<sup>331</sup>- Ibni'l-Esîr, h.b., c. 7, r. 319.

<sup>332</sup>- h.b., r. 388. Ibin Xeldûn, h.b., c. 8, r. 1095.

<sup>333</sup>- Bedlîsî, h.b., 115-116.

<sup>334</sup>- b.f. li ser cengên Bedir bin Hesnewêh, bnr. Ibin Xeldûn, h.b., c. 8, r. 1095-1100.

<sup>335</sup>- Îmadeddîn Isma'îl bin Muhammed bin 'Umer Ebû'l-Fîda', **Teqwîmu'l-Buldan**, dar Sadir, Beyrût/daru't-Tiba'etu's-Sultanîye- Barîs 1850, r. 312-313.

<sup>336</sup>- Ibin Hewqel, h.b., r. 232.

kurdî li wir kevin e, pir dîroknûs û cugrafinasan ev gotine.<sup>337</sup>

Di dema desthilatdariya Selcûqiyân de Kurdan hin desthilatdarî û Etabik<sup>338</sup> damezrandin, mîr û serok ji wan diyar bûn, geştirîn mîrneşînê Lora mezin û Lora biçûk bûn. Lora mezin bi navê Fedlewîye jî tê naskirin, di destpêkê de Bedir hukumdariya wê dikir, dûvre lawê wî Nesîruddîn Mihemed şûna wî girt, Mihemed Xorşîd ji xwe re kir wezîr û li dor sala (500k./1106z.) de nêzîkî 400 malbatên kurd ji çiyayê Summaq koçber bûn<sup>339</sup> û li Loristan bi cih bûn û ketin bin serperîştîya êl û eşîrên Mihemed Xorşîd de. Rêzgirtinek baş ji wan re girt, serkirdeyê wan bi navê Ebû Nesr el-Fedlewî bû.<sup>340</sup>

Herdu lawên wî Elî û Mihemed deng dan û cihekî taybet ji Mihemed re li ba malbata Sulgurî selcûqî hebû, lawê wî Ebû Tahir cihê wî girt û vê paşyê bi piştgiriya etabik Senqer Loristan bindestî xwe kir (543-556k./1148-1161z.) û serxwebûna xwe ragihand, desthilatdarî ta sala mirina xwe kir (555k./1115z.) lawê wî Hezarhesp şûna wî girt mîrneşînê di dema wî de geşbûneke hêja dît, êlin din ji kurdan ji çiyayê Summaq berê xwe danê, vêya hêzeke mezin da Hezarhesp û birayên wî ku sînorên mîrnişînê fireh bikin û bihtir geş bû, ta dawiya jiyana xwe hukum kir û hin zaro û merivên wî li pey hukum kirin ta kuştina serleşkerê wan ê dawî Şah Hisên sala (827k./1423z.) bi destê Xeyasuddîn lawê Kawîs. Çûn û gelek serkeftin û karê bi şeref li pey xwe hiştin.<sup>341</sup> Lê hukmê Xeyasuddîn pir ne domand çiku lawê Tîmorling Sultan Ibrahim êrîşî wî kir û desthilatdariya wî û ya fedlewîyan tevan bi dawî anî, da desthilatdarî bê guhestin êla Bextiyariyan.<sup>342</sup>

<sup>337</sup> - b.f. li ser Lor di çavkaniyên dîroknas û Erdnîgarîzan, bnr. Remedan Şerîf ed-Dawî, **Loristan el-Kubra (550-827h/1115-1424m) dîrasetun fî Ehwalîha es-Siyasîye we'l-Hedariye**, metbe'etu'l-Xanî, Dihok 2010. Û li ser qebîlên Loriya, bnr. Zerar Seddîq Tewfîq, **el-Qebail we'z-Ze'amatu'l-Qebeliyati'l-Kurdîye fi'l-'Esir'l-Wesît**, metbe'etu muessesetu Aras, menşûrat muessesetu Mokiryânî li'l-Bihûs we'n-Neşîr, Erbîl 2007, r. 134-136.

<sup>338</sup> - Etabîke: wata wê xwedîkerê mîr, dûvre bû tegehê paşnavê ji şah û ser wezîr û mîrekên xizmên Selcûqyan re, lê di serdema Memlûkiyân de bû tegehê bi kar dihat ji serkêşên leşker.

<sup>339</sup> - Çiyayê Simaqê, aniha beşê bkûrî rojavayê çiyayê Harim e li parêzgeha Idlib ya Sûrî ye û bi navê Simaq hate naskirin, ji piraniya darên simaqê ku têde şîn dihatin.

<sup>340</sup> - Bedlîsî, h.b., r. 125-126. - ed-Dawî, h.b., r. 61-62.

<sup>341</sup> - Bedlîsî, h.b., r. 125-140. - ed-Dawî, h.b., r. 64-78.

<sup>342</sup> - Zekî- **Tarîxû'd-Diwelî we'l-Îmarati'l-Kurdîyetî fi'l-'Ehdi'l-Islamî**, r. 148.



#### 2.1.3.2.2.6. Mîrneşîna Lora Biçûk (591-1005k./1195-1596z.):

Êl û eşîrên Lora biçûk pir bûn û yekser bi xelîfe ve girêdayî bûn, bi vî rengî domkir ta sala 550k./1155z. û Selcûqîyan Husamiddîn Şohilî li ser wan kir hakim.

Mihemed û Keramî herdu zarwên Xorşîd xwe nêzîkî wî kirin û ketin bin siya wî û cihê wan bilind bû. Dûvre lawekî din ê Xorşîd bi navê Şûcauddîn cih girt û di demeke kurt de karûbar bi dest xwe xistin û hukum li mîrneşîna Lora biçûk kir.

Şûcauddîn bi silcûqîyan re rikberî kir, dûvre bi wan re li hev hat. Bi dadwerî û rastiye hat naskirin.

Lawê xwe Bedir û lawê birayê xwe Seyfuddîn piştî ku êrîşên tirkan vegerandin û dest danîn ser herêmên desthilatdariya wan, ew herdu destnîşan kirin ku li pey wî hukum ji wan re be, lê Bedir hat kuştin, berî ku nexweşî bi Şûcauddîn re çêbibe û piştî sih salî hukumdariyê, di sala 621k./1224z. Şûcauddîn mir.

Birazyê wî Seyfuddîn lawê Nûriddîn lawê Xorşîd şûna wî girt. Welat di dema wî de geşbûneke aborî dît, piştî ku rê li ber çete û rêbirran girt. Lê dijminên wî pîlan bi birayê wî (Şerefiddîn Ebûbekir) re danîn ji bo hukum û desthilatdariyê birayê xwe kuşt.<sup>343</sup>

Şerefhanê Bedlîsî van bûyerên diramî yên vê malbatê û desthilatdarên wan dibêje û têkiliyên wan bi Selcûqî, Mexol û Osmanîyan re diyar dike. Xuyaye ku mîrneşîna ta dema Şerefhanê Bedlîsî hê li dar bû, ta sala 1005k./1597z.

Axaftina li ser vê mîrneşîna ku 400 salî domkir dûdirêj e, em nikarin li vir bi firehî li ser biaxivin, Şerefhanê Bedlîsî xweşik ji hev derxistiye.<sup>344</sup>

Dawiya wê bi destê şah Ebbasê Sefewî bû, sala 1006k./1598z. helbek şand ser û dest danî ser. Di peyre Nadîrşah<sup>345</sup> herêmên wê dan dest eşîra Eynanlo.<sup>346</sup>

<sup>343</sup> - Bedlîsî, h.b., r. 141-146.

<sup>344</sup> - h.b., r. 147-172.

<sup>345</sup> - Şahê Îranê (1736-1747) yê ku malbata Afşariya damezrand û bû hukumdarê Îranê.

<sup>346</sup> - Zekî- Tarîxu'd-Diwelî we'l-Îmarati'l-Kurdîyetî fi'l-'Ehdi'l-Islamî, r. 165.

### 2.1.3.2.2.7. Dewleta Eyûbî (1174 – 1250 z.):

Bê guman e ku dîroka dewleta Eyûbî, ji qonaxên herî giring ji dîroka islamî tête jimartin, nislê malbata Eyûbî ya kurdî vedgere Eyûb kurê Şadî yê ku parêzger ê (waliyê) Tekrîtê bû, piştîre ji wir da rê û li bajarê Mûsilê bi cî bû, ev malbat pir nêzîk û têkildarê desthilatên Zengiya bû, bi taybetî mêrê herî bi nav û deng Esededdîn Şêrgoh yê hate şandin Misrê û biraziyê wî Selaheddîn di bin femandariya wî de pêre şandin. Li Misrê Şêrgoh bû wezîrê (El-Adid), xelîfeyê fatimiya yê dawî, ta çû ser dilovaniya xwe, piştî wî Selaheddîn ciyê wî girt.<sup>347</sup>

Gelek nivîskar, dîroknas û lêkolîneran li ser sultan Selaheddîn (Yûsif lawê Necmiddîn lawê Eyûb "532-589 k. /1137-1193 z.") nivîsandine; yê ku dewleteke islamî berfireh damezrand; ji Bakur ve ji Cezîra feratî, ta Eden li Başûr û ji Rojhilat ve ji Iraqê ta Tûnis li Rojava. Serkeftinî mezî di warê leşkerî û siyasî de ji misilmanan re pêk anîn û navê wî bi cenga xaçperestan (selîbiyan) ve hat girêdan, ew cenga ku bandoreke mezî li hest û derbirînên misilman û Ewropîyan yeksane kir û di mejiyê wan de tomarkir, tevî cudahiya di nerînan de li ser kesayetiya wî û tevî ku hinan ji kîn û dexseya hinav û dilên xwe, xwestin ku navê wî xirab bikin û qenciyan wî veşêrin û wîndan bikin.

Selaheddîn ligel zimanê erebî pir zimanî din jî zanîbû û ew yek ji yên pêşî bû ku dibistanên cûrbecûr vekirin û serdema wî serdema hişyariyeke perwerdehî, zanistî û çandeyî bû.<sup>348</sup>

Piştî koçkirna Selaheddîn hevrikî û nakokiya di navbera kesên malbata wî de dest pêkirin ku bûn sedemeke sereke di lawazkirina malbata Eyûbî de, di vê serdemê de çend nav jî vê malbatê berz bûn û karîbûn cihê xwe di dîrokê de bihêlin, mîna kurên wî (el-Ezîz, el-Efdel, el-Kamil) û hin birayên wî weke (el-Adil).

<sup>347</sup> - Cegerxwîn, **Tarîxa Kurdistan, Împeratoriya/Dewleta kurdî – Eyûbî**, c3, weşanên Roja Nû, Stockholm 1999, r15.

<sup>348</sup> - b.f. li ser dîroka Selaheddîn û Eyûbiya, bnr. Behaeddîn Ibin Şeddad, **Sîretû Selaheddîn el-Eyûbî, (en-Newadiru's-Sultanîye we'l-Mehasinu'l-Yûsifiye)**, Metbe'etu'l-Adab we'l-Mûeyyed, Misir 1317h. - Cemaluddîn Muhammed Bin Salim Ibin Wasil, **Muferrîcu'l-Kurûb Fî Exbar Benî Eyûb**, teh. Cemaluddîn eş-Şiyal, el-Qahîre 1953. - Şehabuddîn 'Ebdurrehman bin Îsma'îl el-Meqdisî Ebû Şame, **Kîtabu'l-Rewdeteyn Fî Exbaru'd-Dewleteyn en-Nûrîye we's-Selahiye**, Neşr we te'lîq: Muhemmed Hilmî Muhemmed Ehmed, Metbe'etu Daru'l-Kutûb el-Misrîye, el-Qahîre 1988. Ebu'l-'Ebbas Şemsiddîn Ehmed bin Muhemmed bin ebî Bekir Ibin Xellikan, **Wefiyatu'l-E'eyan we Enbau Ebnau'z-Zeman**, teh. Îhsan 'Ebbas, c.7, Daru's-Sadir, Beyrût 1978, r139-218.

Nakokiyan hêdî hêdî dest bi hilweşandina dewleta Eyûbî kirin û bi taybetî dema ku (Şeceretuddurr) piştî mirina mêrê xwe (el-Melik salih) têkiliyên xwe bi Memlûkiyan re danî û pîlana kuştina (Toran Şah) bi hev re pêk anîn û bi vê yekê jî, dawiya dewleta Eyûbî di encam de hat û damezrandina dewleta Memlûkî dest pê kir.<sup>349</sup>

## **2.2. RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDAN DI SERDEMÊN ISLAMÎ DE, DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE:**

### **2.2.1. Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Belavbûna Islamî Di Welatê Kurdistan De:**

Ev qûnaxa dîrokî ya giring ji dîroka kurdan, Cegerxwîn karîbû xweşik di helbestên xwe de bikar bîne, ji destpêka ku sûpayên misilmanan gihan ser sînorê welatê kurdan û ta dest danîn ser. Di vê derbarê de helbesteke dirêj bi navê OLPERESTÎ nivîsandiye, tê de diçe dîroka islamê ji dema pêxemberê wan û rewşa kurdan û welatê wan dema islam derbas bûyê û piştî wê jî.

Bi tundî rexna islamê dike û ji pir aliyan ve, li gorî bûyerên ku bi dîroka islamî re qewimîne û hebûna wan di welatê kurdan de. Bi şîretan dest pê dike û xwe weke şîretkarekî êşên civaka xwe zane dibîne û nezaniya di civakê de. Xwendevan weke dostekî xwe dibîne, besî wî ye ku di danûstendina xwe de bi xelkê re rast be, li kêleka başan, jaran û mezlûman bisekine. Dûvre nerîna xwe di avakirina civakeke dadwer ku tê de biratî hezkirin, dad û wekhevî cî bigre diyar dike û li gorî pîvanên wî ew civak di ser bajarê pak ê ku xewna feylesûfên yûnanî bû di ser re ye; bi dadweriya xwe û bi dewlemendî û pêşketina xwe.

Helbestvan rexna civaka xwe dike, dibîne ku tariyê girtiye ser her tiştî û dizî xap û sextebazî tê de şax vedane. Sedem jî ew ramanên perpitî kevin ku serdestî

<sup>349</sup>- Qasim 'Ebde Qasim we 'Elî es-Seyid 'Elî, **el-Eyûbîyîn We'l-Memalîk - et-Tarixu's-Siyasî We'l-'Eskerî**), Neşere 'Eyn li'd-Dîrasat we'l-Bihûs el-Îctîma'îye, el-Qahîre, (b.m.), r 83-111.

civakê bûne, ew ramanên ku şêx û melan li gor armanc û berjewendiyên xwe belav dikirin û gereke kar bibe yek da ji reştariyê rizgar bibin, ronahî şûnê bigre û xêr bi ser welat de birje û bibe welatê her kesî.

Di helbestê de diçe çawa de'wa islamê dest pê kir, dûvre diçe xelîfeyên (cihnişînên) raşîdî û çawa desthilatdarî ket dest wan û Rûm û Sasanî şikandin, rewşa kurdan di dema Umer bin Xettab de û tê nerîna xwe derbarê islamê û kurdan de dibêje, dibîne ku sûpayên islamî welatê wî dagîr kirin û bi şûr piştî şer û cengin giran zora dewletên Rom û Sasaniyan birin, ew riswa kirin û dest bi talanê kirin û namûsa jinan bînpê kirin bi navê sebyê û çawa milletên herêmê tevî kurdan wek dîl kirin, bê hêz û neçar, dibêje:

*Wî êrîş li ser hev birin rom û kurd*

*Ko Qeyser û Kesra wî xistin, zigurd*

*Di dest wande şûr û bi dev wekhevî*

*Ko şahê ecem zû şikest û revî<sup>350</sup>*

Cegerxwîn ev hizr û raman ne ji xeyalê xwe anîne, lê tev bûyerin pir dîroknûsan li ser nivîsandine. Sûpayên misilmanan piştî şer û cengin giran û bi hezaran qurbanî derbasbî welatê kurdan bûn.<sup>351</sup> Di nav re Kurd gelek mal û milk û can xesirîn:

*Li Ehwarz û Helwan û hem Şhrezûr*

*Li me şer giran bû bi gurz û bi şûr*

*Bi zor em şikandin û talan kirin*

*Jin û zar û zêçên me kurdan birin<sup>352</sup>*

Armanca Cegerxwîn ne tenê raxistina pêzanînên dîrokî ye, lê belê dana amaje û destnîşanin zelal li ser kurdan û hebûna wan di dîroka islamî de û ji wir here rexna

<sup>350</sup> - Cegerxwîn, *Zend -Avista*, r. 124.

<sup>351</sup> - Mer'î, *el-Fetihu'l- Islamî li Kurdistan*, r. 126-146. Mer'î, *Kurdistan fi'l-Qerni's-Sabi'î li'l-Mîlad*, r. 181-190.

<sup>352</sup> - Cegerxwîn, *Zend -Avista*, r. 124.

civaka xwe bike, çima paşmayî maye nizane çî li derdorê dibe, pey xerafetan dikeve, doza xwe ya netewî, ziman û çandeya xwe jibîr dike. Helbestvan bawerî bi başiyên dîn tîne, lê di heman demê de wan tiştên dibin kelem di riya hizr û ramanê de qebûl nake. Dîn di nerîna wî de ne di diyarde û qaşil de ye, biqasî ku ew bi kar û kirinê ye.

Helbestvan dibîne ku şêx û melan roleke xirab di hoşyariya millet de lîstin û ew di xewa bindestiyê ve birin. Ew bi hişkî rexna wan çîrokên di qur'anê de dike mîna îsra û mi'racê û dibîne ku islam jî mîna her tevgera siyasî ji bo avakirina dewletekê hatiye, tevî cudabûna di awayê raman û bawermendiyê de, ne bes wilo, lê ew navê Xweda wek fersendekê bi dest xwe dixin bo mal û milkê xelkê li xwe helal bikin.

Wiha jî di helbesta xwe de şerê di nav misilmanan de xwe bi xwe li ser erş/hukum qewimîne diyar dike, ew bûyerên tund û têkçûna mirovan di şerê bira û bira de û çawa her mezhebek benik ber bi xwe ve dikşîne.

### **2.2.2. Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Kurdan Di Serdema Ebbasî De:**

Pêzanînên dîrokî li ser Kurdan di serdema emewî (41-132k./661-750z.) de pir hindikin dema em bi serdemên pey re bidin ber hev. Vêya di helbesta Cegerxwîn de jî rûda; ji bilî hin amajeyê sivik û bi qasî ku bi Emewîyan û şerê wan bi Elî Bin Ebî Talib re û bûyerên ku di ber re rûdan têkildarin bi kurdan ve ne.<sup>353</sup>

Lê hebûna kurdî di serdema ebbasî de xurt bû, vêya rengê xwe di helbesta Cegerxwîn de veda, yê ku pir ji bûyerên serdemê di helbestên xwe de bikar anîn.

---

<sup>353</sup> - h.b., r. 125.

### **2.2.2.1. Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Kurdan Di Serdema Ebbasî Ya Yekem De:**

Cegerxwîn rola kurdan di avakirina dewleta nû de naskir, ji ber wê kesayetî û tevgerin cihgirtî ku bandora xwe li jiyana siyasî kirin û pirtûkên dîroknûsan li ser wan axivîn, bikar anîn. Em ê li ser giringtirîn û binavtirînên wan rawestin.

#### **2.2.2.1.1. Bikaranîna Ebû Muslim el-Xurasanî:**

Ji helbesta Cegerxwîn em karin çirûskin ji dîroka vê qûnaxê bigrin û bidin ber gotinên dîroknûsan. Di helbesta OLPERESTÎ de em hest dikin ku helbestvan belgekê yan deqekî dîrokî berçav dike bihtir ji helbesteke hunerî. Wî dîrok bi bûyer û kesayetiyên wê ve bi kar aniyê, lewra wutara helbestî di vegêriyê de (serd) geh bilind dibe û geh dadikeve li gorî bûyeran û pêvajoya wan. Helbestvan di berbiçavkirina bûyeran de ji rêbaza demê jî dernakeve ta ku Ebbasî digihin xîlafetê û rola kurdan di serkeftinên Ebbasiyan de diyar dike, nemaze kesayetiya Ebû Muslimê Xurasanî ku bi tuxmê xwe kurde û bi saya wî de'wa ebbasî bi ser ket, zora Emewiyan birin û dest danîn ser cîhana islamî weke me got.

Ji deq tê têgihîştin ku helbestvan serkeftina ebbasiyan û bidestxistina hukum dibîne ku ew serkeftineke ji Kurdan re; çiku Kurdan şer kirin, qurbanî danîn da ji hukmê Emewiyan xelas bin, ew hukmê ku helbestvan dibîne ew hukmekî Erebi bû bihtir ji islamî û pesnê mîrxasiya Ebû Muslim û hêza wî dide, li gel pişkdariya wî di serkeftina ebbasî de, bêyî ku nêta bidestxistina desthilatdariyê di dilê wî keve yan dewletek Kurdî ava bike. Dûvre diçe bêbextiya xelîfê Ebbasî Ebû Ce'fer Elmensûr (136-158 k./754-775z.) ku bi Ebû Muslim re kir û ew kuşt, ew kuştina ku helbestvan kuştina rûmeta Kurdî tê de dibîne. Dibêje:

*Ebûmislimê kurdê pir navîdar*

*Ji dest dijminê kurd wî derxistî dar*

*Li Kûfa wî danî û tac daye ser*

*Pelaxtin serê şahê Merwanê ker*

***Bi bêbextî carek li Eywanê kuşt***

***Ji bona me kurdan wî rûmet nehîşt***<sup>354</sup>

Di helbesteke din de bi navê HEY FELEK bi gotinin têkdar û amajeyin kûr lomê ji felekê (qederê) dike û keseran li ser rewşa kurdan dikşîne û çawa ev êş û azar bi ser de tên. Bi wê lom û gaziye dixwaze wan lehengên Kurd bîne ber çavê xwendevanê xwe, ew ên ku rojekê karîbûn serkeftinan bidestxînin û yek ji wan Ebû Muslim û hê cihê serbilindahiyê ne, da bibe navtêdanek ji milletê wî re ku serî rakin û vê rewşa tê de qebûl nekin. Dema ew navê wî bi yê Selahidîn û Şêrgo re di yek malika helbestê de tîne dixwaze bêje ku ew ne kêmtî wan e, dixwaze vê hizrê bighîne millet, lewra dibêje:

***Ka Ebû-Mislim, Şêrgûh û Merwan***

***Ka Selahedîn, kanî Kerîm-xan***<sup>355</sup>

Wêrekiya Cegerxwîn di rexnekirina bûyerên dîrokî de û tundiya pê re hat û ta rexnekirina ramanan, xweş diyar û zelal e û heye ku ti kesî ne wêrîbû di civakeke mîna civaka ku Cegerxwîn tê de dijî. Lê xuya ye ku ew bi zîrebûna xwe karîbû wan ramanan derbas bike û heye ku Kurd bi xwe jî bi hesreta ku zimanê xwe guhdarî bikin bihtir ku ji ramanên helbestê bixwînin, di demek ku axaftina bi zimanê Kurdî yan nivîsandin cerîmek (tewanbariyek) bû, rêjîmên serdestên welatê kurdan ew didan cezakirin.

Heye jî ku rastiyên dîrokî li ber çavan zelal bûbûn, çiku bi derbasbûna ola islamê re kurdan ne tenê çand û zimanê xwe ji dest dan, lê belê pir tiştin din jî xesirîn, ew bûn qurbanên pir şer û cengan û dawî kesên din berhem û encam dixwarin, mîna ku Ebbasiyan kirin, nû cih girtin dest bi bêbextiyên xwe kirin û çî kesê alîkariya wan kir û metirsî jê hesab kirin, xwe bi awakî jê xelas kirin, ta yê herî dilsoz bi wan re û xelatkirina wan yan kuştin, yan surgûnkirin û yan piştguhkirin bû. Li vir Cegerxwîn wan kesên bi gotinên xweş hatin xapandin rexne dike. Çawa ewqas qurban danîn û niha buhayê kefenê wan di dest wan tune ye !!

<sup>354</sup>-h.b., r. 126-127.

<sup>355</sup>- Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r.121.

*Bi navê Ebas û bi navê Elî*

*Ji me tev sitandin kela t û gelî*

*Bi ola xwe em kirne jar û reben*

*Bi dest me nehiştin bihayê kefen*<sup>356</sup>

Cegerxwîn kesayetiya Ebû Muslimê ku roleke xurt di avakirina Dewleta Ebbasî de lîst bikartîne, da teqeze bike ku Kurd di bûyerên dîrokî ku di herêmê de dibin her hene û ew ne kêmtî ti mîletî ne ji wan mîletên ku desthilatdarî bi dest xwe girtine, lê belê her bêbextî, ne wefadarî û bînpêkirina sozan ji hêla wanê din de ewin yê ku bihtir kurdan dikujin.

#### **2.2.2.1.2. Bikaranîna Tevgera Babik el-Xurremî:**

Di helbestên xwe de Cegerxwîn Mezdekî û tevgera Babikê Xurremî vedixwaze, lê ew Mezdekiyê ne wek tevgera siyasî, lê belê wek olekê pir ji xelkê bawerî pê kirin bikar tîne û di çend helbestan de ew dibêje<sup>357</sup>.

Lê Beramîka wek tevgera siyasî di du helbestên xwe de bikar tîne; yek ji wan bi navê CEGERXWÎN BES, helbesteke xwîngermî navtêdanê ye, helbestvan ji mîletê xwe dixwaze ku bi hemî qatên xwe yê civakî bibin yek, da bigrin ser dijmin û hemberî wan li ber xwe bidin û ji vê rewşa xerab û perçebûnê xelasbin; ew dijminê ku her awayên zilm û zorê ji kuştin, lêdan û talanê derbarî wî de bikar tîne. Rewanbêjîyeke xweşik di vê helbestê de heye, dema milletê xwe bi nêçîrê dişibîne û dijmin li pey mîna tajî û segan:

*Hemî çûne, belê em mane nêçîr*

*Ji xwe dijmin li pey me herwekî seg*<sup>358</sup>

Wiha jî rewşa kurdî û perîşaniya wan bi leglegê dişibîne, çawa li çolê windaye û hêlîn winda kiriye û dijmin serê serkêşên Kurdan ji xwe re kirne gok û di

<sup>356</sup> - Cegerxwîn, *Zend –Avista*, r. 127-128.

<sup>357</sup> - Cegerxwîn, *Pirîsk û Pêtî*, r.31, 98, 126, 146 . Cegerxwîn, *Sewra Azadî*, r. 42.

<sup>358</sup> - Cegerxwîn, *Pirîsk û Pêtî*, r.11.



meşdanê ew dane ber kaşoyên xwe. Ew dixwaze wêneyeke zindî bigre ser rewşa kurdî û ta ser dîroka wî jî:

***Bi lêdan geh, bi kuştin geh bi talan;***

***Li çolan em dibazin hacî legleg***

***Serê mîrê mela û şêxên kurdan***

***Bi çoganê demê ew dane ber şek*<sup>359</sup>**

Ciwantirîn rewnbêjiya wî û firehaya dîtina wî ya afirandinî dema rewşa millet û hejariya wî berbiçav dike ku tiştêk ji wan re nemaye, tenê erd (zemîn) ji wan re doşek e, asîman mitêl e û kevir balgeh e:

***Dijîn em her li ser şax û zinaran***

***Kevir balîfe bo me, qade doşek*<sup>360</sup>**

Li dawî berê xwe dide şêx û mele, mîr û began da yekîtiya xwe pêk bînin ku ji vê rewşa xerab derkevin û bigihin hêviya ku millet li bendê ye:

***Cegerxwîn bû bese rabin bibin yek***

***Eger mîr û eger pîr û eger beg.*<sup>361</sup>**

Di vê helbestê de helbestvan ji kaniya dema bûrî vedixwe da derbirînê xwe derbarî dozîna welatperwerî û netewî der bike, ew nêzîkiya di navbera kurd û beramika de diyar dike û jêderên dîrokî peywendîya xurt di nav wan de nade mendelê û pişkdariya Kurdan di vê şoreşê de. Ew helbesta xwe bi navê Eyûbî, Merwanî û Bermekiyan dest pê dike û li gor dîtina wî ew in yê ku nûneriya serfiraziya Kurdan dikin, keseran li ser çûna wan û pêkhatên wan dikşîne:

***Eger pîr û eger mîr û eger beg***

***Çi Eyûbî, çi Merwanî, çi Bermek*<sup>362</sup>**

<sup>359</sup> - wiha hatiye nivîsîn, lê ez dibînim ku şaştiyek çapê têde heye, bi dîtina min gerek yan: (Mîrê Mila), yan jî (Mîr û mela). Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r.11.

<sup>360</sup> - h.b., h. r.

<sup>361</sup> - h.b., h. r.

<sup>362</sup> - h.b., h. r.

Helbesta din a ku Cegerxwîn tê de Bermekî bi nav kirine ya bi navê WEXTÊ SEHER e, ew yek ji helbestên wî yên evînî bi hêvî û arezûyan dagirti ye, dixwaze yara wî bi wê wêneya ku ew dixwaze de be, lewra şîreta lê dike û rê dide ber çawa derbasî dilê wî bibe.

Helbestvan dixwaze nû yara wî ji xew şiyar be xwe xweşik bike, porê xwe şeh bike, kincên ciwan li bejna xwe ke, ew wilo xwe pê bextewar dibîne, wê li bende be da bi hev re xewna xwe bi cih bikin; herin nav baxan, destên hev bigrin, kenê wê yê şêrîn bilind bibe, meşa wê jî ji bîr ne kiriye, dixwaze weke meşa ordeke be çep û rast here û ji lêvên wê maçeke ku hêjaye mal û milkê Xurasanê bibe.

Helbestvan wê wêneya ku dixwaze yara wî wiha be dirisimîne, ya xweş di helbestê de ew e ku yara xwe û meşa wê bi xaqan û şahê Bermek dişibîne û ew mîna peyakî, yan kolekî bêvîn li pey diçe. Dema ew Şahê Bermek tîne ew hêz û giraniya vê kesayetiyê nas dike, ewê ku Xelîfên Ebbasî jê saw digirtin û hesab jê dikirin û di nav xelkê xwe de xwedî rêzgirtineke berçav bû. Ew bi riya yara xwe wêneyê wî serekî dirisimîne û wêneyê yara xwe bi riya giranî û sawgirtina vî serekî re berçav dike. Heger Bermekî di serdemeke ku bi navê serdema desthilatdariya tirkan hatibû naskirin de bi xurtî bi şoreşa xwe rabûn, heye ku Cegerxwîn tê gihîştibû lewra gotina "xaqan" ew naznavê ku şahê tirk hildigirtin bi kar anî û yara di meşa xwe de mîna xaqan, yan şahê Bermekiyan bû. Wî ev nav ne ji bo çîrokbêjiya dîrokê anîne, lê belê da giranbuhayekê bide wê yara ku di hiş û xeyalê wî de dijî, ewa ku bi dînîtî jê hezdike. Dibêje:

*Maçek ji lêvên tey şêrîn milkê Xerasanê biha*

*Seyda dil û can daye pê xaqan û şahê Bermek e<sup>363</sup>*

Helbestvan giringiya regezên dîrokî naskiribû û erk û karên wan, nexasim bo balkişandina xwendevan. Dema wan bûyer û kesayetiyên ji dîrokê derdixe û di helbesteke welatperwerî, netewî, yan yeke evînî de bikar tîne ew ji bo piştgiriya bicihkirina wê navdariya bûrî di hiş û hestan de biçîne, çiku ew bihtirîn regezin ku çakbînî, bawerî û hêviyan peyde dikin.

---

<sup>363</sup> - Cegerxwîn, *Sewra Azadî*, r. 190.

### 2.2.2.1.3. Bikaranîna Serhildana Ce'fer Bin Fehreces el-Kurdî Li Mûsilê (224k./839z.):

Cegerxwîn di malikek ji helbesta xwe ya bi navê OLPERESTÎ de qala Mûsil û Erbîl dike û Kurd di wan de li himberî dijmin serî hildan. Dibe ku mebesta wî jê ew serhildana kurdî mezin ku di dawiya salên sihî ji sedsala nehê de li Mûsil rabû, ewa ku Ce'fer serkêşiya wê dikir.

Ev ji rêbaza deq û bûyerên dîrokî û lidûhevhatina wan tê de wiha tê têgihîştin, çiku helbest ji nijandina dîroknûsan derneketiye û dema li ser vê serhildanê dipeyive mebest jê serhildana Ce'fer lawê Fihreces ê Kurdî li Mûsilê ye. Dibêje:

*Li Mûsil, li Erbîl, li her cî û der*

*Di nav kurd û dijminde bû ceng û şer*<sup>364</sup>

Û di helbesta xwe ya bi navê Seydayê Xanî de Cegerxwîn pesnê helbestvanê kurdî Ehmedê Xanî û wêje ya (edebiyata) wî dide, bi zimanekî spehî û rewanbêjî, teşbîhin ciwan bikartîne; peyvên helbestê bi naveroka wê ya giştî re lihevhatiye. Helbestvan di vir de Ehmedê Xanî bi Ce'fer lawê Fihreces ê Kurdî dişibîne; ew Ce'fer ê ku Xelîfê Ebbasî di bilindaya hêza wî de xistibû qelaqê (qaqa reş), hişt ku xelîfe leşkerên giran ji şerê wî re amade bike û di destpêkê ew leşkerê giran şikand û gelek jê kuşt, piştî ku vegehiya û di çiyayê Dasin<sup>365</sup> de asê bû. Li wir sûpaya el-Mu'tesim têk bir û pir ji wan kuşt. Helbestvan dixwaze bêje ku hêza bandora helbestên Xanî li me, ne kêrî hêza Ce'fer e dema li himberê Xelîfê Ebbasî disekinê.

*Cefer î ber pozê dijminê dasin*

*Kunkerê gotinê ji dir û elmasin*<sup>366</sup>

Helbestvan di bihtirî cihekî û bûyerekê de di bikaranîna dîrokê de biserket, ew jî zanîna helbestvan û jiyana wî bi dîrokê re nîşan dike û bi awakî ku coş û can gurr bike de bikar anî. Bi zanebûn bûyera dîrokî digre û amaje û destnîşanin nû didê.

<sup>364</sup>- Cegerxwîn, *Zend –Avista*, r. 127.

<sup>365</sup>-Çiyayê Dasin, dikeve rojhilatê çemê Diclê û bakûrî bajarê Mûsilê, beşek ji kurdan li wir dijîn ji wanre dibêjin Dasinî, b.f. bnr. Şehab ed-Dîn Ebdullah Yaqût el-Hemwî, *Mi'cemu'l-Buldan*, c. 2, dar Sadir, Beyrût (b. m.), r. 432.

<sup>366</sup>- Cegerxwîn, *Aşitî*, r. 25.

Bûyerin din di vê serdemê hene, lê Cegerxwîn di helbesta xwe de ew bikar ne anîne. Ev nabe kêmanî yan valabûneke dîrokî; çiku ew ne dîrokê, lê helbestê dinivîsîne, heye bûyereke bandora xwe lê bike û yan din na.

#### **2.2.2.2. Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Kurdan Di Serdema Ebbasî Ya**

##### **Duyem De:**

Di vê serdemê de Cegerxwîn bi awakî firehtir û di pirtir ji helbestkê de bûyerê wê bikar anîne. Mijar û awayên bikaranînê cûrecûr pêkanîne, çî bi berçavkirina kesayetiyan nûneriya civaka xwe dikirin û çî bûyerin bandoreke xuyayî di dîrokê de hiştin.

##### **2.2.2.2.1. Berbiçavkirina Mîr Xanim Serokê Eysanê:**

Em nikarin wêneyeke rast ji vê desthilatdariyê re berbiçav bikin, ji ber jêderên dîrokî xweşik damezradina desthilatdariya Eysanê berbiçav nakin û ne pêvajoya wê, ev kêmbûna di pêzanînan de rengê xwe di helbesta Cegerxwîn de da, ji bilî helbesteke wî tê de gazinan ji felekê dike çawa Kurd ketine vê rewşa xirab di dîroka serdemî de û dixwaze hin kesayetiyan ji dîrokê vexwaze da xortên Kurd hoşyar bikin, ew xortên ku civak hêviya guhertinan di wan de dibînin û ji nav wan kesayetiya Xanim –yek ji serekên Eysanê- vedixwaze, Xanimê ku karîbû bi hêz û sawa xwe cihê xwe bigre. Ne tenê ew vexwendiyê, lê belê ew bi navin dîrokî giranbuha re aniye, mîna Ebû Muslim, Deysemê Kurdî, Şêrgo, Merwan û Bedîrxan. Anîna wan û xanim bi wan re, ne zîlana helbestê bû, lê regezek û kevirekî bingehî di avakirina helbestê de ye.

Helbestvan pirsê xwe bi awakî pirjimar dike; xwe wek nûner ji milletê xwe bi tevayî re dibîne; ma ne ji mafê me ye ku bi xwendina wê dîroka giranbuha re em bikin qarîn û hawara xwe bi gilî û gazin bikin? Ma ne ji mafê me ye ku em xweliyê li serê xwe kin û di nav de bigevêzin? Helbestvan li wî mafî digere; ew mafê ku wînda

kiriye û bûye daxwaza wî, mafê wî ku van kul, derd û têkçûnan ji ser milê welat bide alî.

Pirsa di helbestê de ne pirse bi qasî ku bicihkirina mafe, da ku helbestvan ji wir dest pê bike û bi germî nerîna xwe berçav bike; divê yê Kurd têkoşînê bike ta dewleta xwe ava bike, ya na jiyana wî pûç û vala ye, hebûna wî bê wateye; yan bi dilşadî bimrin, yan jar û riswa bijîn:

***Ka Ebû Muslim, Şêrgoh û Merwan***

***Ka Selahedîn, kanî Kerîm -xan***

***Ka ew begler û ew mîr û paşan***

***Ka Bedir-Xan û Xanim û Dêsem***

***Ma ne hêja ye, em herdem bakin***

***Ax û xweliyê bi ser xwe dakin***

***Yan bibne dewlet ; yan bêne kuştin***

***Yan dilxweş bimrin, yan dil bi matem<sup>367</sup>***

Cegerxwîn teqeze dike ku nerîna wî ya helbestî fireh e û ew kare bi kelpîçeke biçûk ji dîrokê bingeheke mezin di roja îro de deyne, Wiha jî helbestên wî ku dîrok di wan de bikar aniye teqeze dikin ku helbestvan çawa bike nikare ji bin siya welêt, dozê û millet bireve.

#### **2.2.2.2.2. Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Kurdan Li Azerbeycanê:**

Cegerxwîn giringiyeke baş dabû dîroka Kurdan li Azerbeycan û her bi lehengên wanî xwedî serkeftin serbilind bû, pirtûkên dîrokî nikarîbûn wan veşêrin, lê belê li ser wan û bûyerên bi wan ve girêdayî û serdestiya wan li wê erdnîgariya fireh dagirtî bûn.

Cegerxwîn di helbestin xwe yê cûrecûr de Deysem aniye, yek ji wan KÎME EZ, a ku mîna nasnameyekê ye ji Kurdan re, ew ne ji valabûnekê aniye, em têdigihin ku ew dixwaze wêneyê Deysem wek lehengekî di dema xwe de di hişê xwendevan

---

<sup>367</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r.70.

de bi cih bike, nemaze ew Kurd e, wî mîna parçek ji nasnameya kurdî pêşkêş dike, nasnameya ku carna pê serbilind dibîne û carna keseran li ser windabûna wê dikêşîne. Dixwaze di riya vê helbestê re bêje ku Kurdan karîbûn di gerdûneke ji gerdûna xwe firehtir de avjeniyê bikin, wan bandoreke mezin li bûyerên dema xwe hiştin, pirtir bi gelekî ji ewên ku rêjîmên serdestê welatê wan di rêbaz û pirtûkên xwe de dibêjin. Kurd di dîroka islamî de ne rêwî bûn weke ku hin dibêjin, lê belê ew bûn yên ku ew dîrok çêkirin, bi kêmanî di welatê xwe û derdora wî de. Helbestvan teqeze dike ku ew lawê wan lehengên ku ew dîrok çêkirine û Deysem yek ji wan e, ewê xwedî himmeteke mezin ku tirs ne diket hinavên wî, ewê ku her bi pêş de diçû û daxwaza wî her azadî bû.

Dema ku helbestvan tê qala Deysem dike û dûvre dikeve pesnê xwe ew derbirîneke ser hêz û sawgirtina wê kesayetiyê ye û dema dibêje ez di karim her tiştî bikim, ew bi awakî mecazî dibêje, ku kesayetiyên mîna Deysem di hiş û hizrê xelkê de nêzîkayî li efsaneyan kirine ku tiştêkî zor û zehmet li ba wan tune. Dixwaze wan pêkhatyên buha bi nasnameya Kurdî ve girêde, ewa ku her berevanî di ber de dikir. Ev jî yek ji amûrên bandorkirinê li derûna xwendevan e:

***Kurê Guhderz û Ferhad û Rustem***

***Kurê Salar û Şêrgoh û Deysem***

***Bejin bilind im***

***Wek Dêw bilind im***

***Ez dest dirêj im***

***Serbest dibêjim***

***Dixwazim bi lez***

***Gavan bavêjim***

***Kîme ez?*<sup>368</sup>**

Dema di helbestin din de li ser mêrxasiya kurdan diaxive wîlara xwe ya helbestî dúbare dike, mîna EM KURDÊ ÇIYANE, berî niha em li ser giringiya çiya û asta cihê wî li ba yê Kurd axivîne, li vir ew helbesta xwe pê bi nav dike û teqeze dike ku ew lawê çiya ye, da ji xwendevan re hêzdarî û mêrxasya wî diyar bike, dîrok

---

<sup>368</sup> - Cegerxwîn, **Kîme Ez**, r. 15.

şehdebûnê ji wê mêrxasî û lehengiyê re dide û tenê ew kesê bê wijdan in yên ku vê yekê didin mendelê.

Em dikarin ji helbesta wî bigihên encamekê ku wî doza yekîtiya kurdî dikir, wek rêkê ji rizgariyê re, dema em dîrokê vedigerînin, em dibînin ku dema Kurd bi Deysem re hevbend bûn û yek bûn bi ser ketin û çaxê xwe dane paş têk çûn.

Helbestvan zane çî bêjeyan hilibijêre, ew bêjeyên ku pêdarî, mêrxasî û lehengiyê nîşan dîkin û pêwistiya cengîdaran bi wan heye (xencer, mîx, çek, zencîr, sîx, lat, rim,...) û ji berjewendiya helbesta xwe re bi kar bîne.

***Em çêliyê rustem û kurê Deysem û Şêrko  
Nayêne veşartin, wekî rim em di selixîn<sup>369</sup>***

Û di helbesta XORTNO RABIN HERIN CENG de ya ku berî niha em li ser sekinîne, helbestvan daxwaza xwe dúbare dike, nav di xortan dide da hoşyar bibin û bav û bapîrên wan di bîra wan tîne. Xuyaye ku ev serhişkî ('îsyar) nesîbê kurdan e, ne tenê niha lê ji berê ve; ji wan demên dîrokî ve, lewra em wêneyê kesê şervanê serhişk û nerazî di dîrokê de dibînin. Tiştêk Heyder Leşkerî di vê derbarê de nivîsandiye bala min kişand, dibêje ku ew tişt daxwaza azadiyê ye û dîrketina ji navenda dewletê ye, çiku navend ango tê baca xwe bidî, tê serî deynî û Kurd vêna qebûl nakin, ji ber ew dibînin ku qebûlkirina vê yekê windabûna kesayetiya xwe ya êlî ye<sup>370</sup>.

Û di vê helbesta xwe de Cegerxwîn kesayetiya kurdî pesin dide, ewa divê mîna şêr û pilingan xurt be. Ev pesin her dúbare dibê ta ku her birgeyek ji helbestê pê digre; her piştî sê malikan ew vê dúbare dike da bandora xwe li xwendevan bihêle û xort wê ezber bikin û di girtina ser dijmin de dúbare bikin ta wan têk bibin û bigihin azadiya xwe. Dibêje:

***Roja cengê em şêrin lawên Guhderz û Rustem  
Kurdên navdar û mêrin kurên Salar û Deysem***

---

<sup>369</sup> - h.b., r. 32.

<sup>370</sup> - Heyder Leşkerî, el-Kurd fi'l-Me'rifeti'l-Islamîye, metbe'etu wezaretu't-Terbiye, daru Spêrêz, Erbil 2004, r. 154-155.

*Serê dijmin bihêrin emê çêkin çax û dem*

*Weke şêr û wek piling*

*Xortno rabin herin ceng*<sup>371</sup>

Ev dîmen di helbesteke din (RENGÊ ŞÊRKO HERNE ŞER)<sup>372</sup> de dûbare dibe, eynî wan pesnan, eynî wî şêweyî ji wan dixwaze ku bê tirs, lê bi mêrxasiya wan lehengên mîna Deysem xwe berdin cengê.

Careke din û di helbesta BÊRIYA WELAT<sup>373</sup> de Cegerxwîn keseran dikşîne û bi bûyerên li welat diqewimin dêşe, li derman digere da êşên xwe û yên welat rehet bike û her pîrsa (Ka li kûye) ji destpêka helbestê ta dawiya wê dûbare dibe; ev dûbarekirin bi xwe weke gerekê ye li wê xewna windayî, ew warê ku ji dest xwe berdan, mîna ku di zeman û di war de wînda bûye û li xwe digere, lê ew dizane ku ew lawê wê serbilindaya ha ye, ew pîrs bi xwe jî jîrbûneke ji helbestvan û afirandineke di ziman de û ziman stûna helbestê ye û ew bersiva xwe di nava xwe de hildigre, mîna ku bêje ev rewşa em tê de dijîn rewşeke demkî ye wê here û pêşerojê geş li pêşiya me ye.

Wiha jî helbestvan lomê ji felekê (zeman) dike ku Kurd di vê rewşê re derxistine û pîrsa ka dûbare dike, ew dîsa gerreke li windabûnê, li heman kesên di helbestin din de, ji wan Deysem, lê vê carê di helbesteke bi navê HEY FELEK<sup>374</sup>.

Di helbesta SEYDAYÊ XANÎ de ew helbesta ku Cegerxwîn tê de bi ciwantirîn derbirin, şibihandin û rewanbêjî pesnê helbestvanê Kurd Ehmedê Xanî dide û wî û Deysem berhev dike û di girêdana di nav wan de bi ser dikeve; Deysem di meydana şer û cengê de leheng bû û Xanî di meydana helbestê de, çiku helbest bi bandora xwe li nefsê nê kêmi bandora şer û cengê ye. Li ser Xanî dibêje:

*Bi tîrên tore diran dihingêvî*

*Bi mijgûlên ristan gulan dipişkivî*

<sup>371</sup> - Cegerxwîn, **Kîme Ez**, r. 40.

<sup>372</sup> - Cegerxwîn, **Hêvî**, , weş. Roja nû, Stockholm 1983, r. 28.

<sup>373</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r.16.

<sup>374</sup> - h.b., r. 70.



***Deysemê meydana milletperwer î***  
***Salarê bajarê ristên gewher î.***<sup>375</sup>

Di berhema xwe ya bi navê (Şerefnameya Menzûm) de, ya ku navê wê ji Şerefname ya Şerefxanê Bedlîsî hilda ye, dixwaze ku bûyerên dîrokî û navê serok û serkêşan bi awakî helbestî binijîne, armanca wî jê dîrokî ye, çiku wan kesayetiyên tîne da derbirînên xwe li ser wan bêje û derbirînan bi wan der bike, cudabûn nakeve nav herduwan, ji ber dema qala wan dibe û nav tîne gotin ew dibin mînak ku li ser riya wan herin da dîrokeke nû payebilind ava bikin. Li vir wutara dîrokî bi ser ya helbestî dikeve û helbestvan neçar dibe peyvina bîne ku deq wan dixwaze û Deysem wek kesayetî helbestvan jê dixwaze ku bê û binere tirk û fursan çî anîne serê Azerbeycanê, ew xaka ku Deysem qûnaxin dirêj desthilatdarî lê kiriye, dixwaze jê re bêje ku Azerbeycan bûye Tirkî û Farisî û ti hebûna Kurdan lê nemaye, wê çî bobelat be ku Deysem vegere û wê xakê wiha bibîne!! Di ber re hewl dide ku wî razî bike ku Kurd li ser riya wî ne, hê xebat û berxwedanê ji bo azadiya xwe dikin:

***Were Deysem binêre Tirk û Eyran***  
***Ezîrbêcan bi carek kirne wêran***

***Binêre em bi carek tev dibazîn***  
***Welatê xwe bi azadî dixwazîn***<sup>376</sup>

Li gel Deysem helbestvan karîbû rikberê wî jî vexwaze, ji dîrokê derxîne, mîr Salar ê ku bi navê Mirzeban di pirtûkin dîrokî de hatiye, ew di nerîna Cegerxwîn de ne kêmtî Deysem e, na û wî ew şikand, ew li gor M.Emîn Zekî yê ku li gor Insiklopedia Îslamî dibêje, dibîne ku Salar ji serokê malbatin kurdî dijimêre<sup>377</sup>.

Salar di helbestên Cegerxwîn xweş cihî digre û ew piraniya caran bi Deysem re tê. Helbestvan zane ku ew dijminin, lê yekî di ser yê din re nagire, herdu nûneriya dîroka kurdî di wî war û zemanî de dikin. Ji wan helbestan helbesta KÎME EZ, dema pesnê xwe dide ku ew lawê Salar û Deysem e, mîna ku bixwaze di riya helbestê re wan li hev bîne, çiku helbest kare gelek tiştan bike:

<sup>375</sup> - Cegerxwîn, **Aşitî**, r. 25.

<sup>376</sup> - Cegerxwîn, **Şerefnameya menzûm**, ç. 2, weş. Avesta, Istanbul 2003.r. 14.

<sup>377</sup> - Zekî, **Tarîxû'd-Diwelî we'l-Îmaratî'l-Kurdîyetî fi'l-'Ehdi'l-Islamî**, r. 29.

*Kurê Guhderz û Ferhad û Rustem*

*Kurê Salar û Şêrgoh û Deysem*

*Bejin bilind im*

*Wek Dêw bilind im*

*Ez dest dirêj im*

*Serbest dibêjim*

*Dixwazim bi lez*

*Gavan bavêjim*

*Kîme ez<sup>378</sup>*

Û di helbesta XORTNO RABIN HERIN CENG<sup>379</sup> de, wiha jî di yên RENGÊ ŞÊRKO HERNE ŞER<sup>380</sup> û SEYDAYÊ XANÎ de her ew Deysem lehengek di meydana şer û cengê de dibîne û Xanî di ya helbestê de, nemaze helbesta neteweyî û çawa Salar di meydana cengê de serwerekî bê hempa bû wiha Xanî di ya helbestê de serwerekî bê mînak e, helbestên wî mîna durr û cewheran belavbûyî ne, ewên ku bi nirxa xwe nayên pîvanê, helbestvan Salar ji bo xatirê Xanî aniye, kesayetiyeke ji dîrokê derxistiye da pesnê kesayetiyeke din û ji dîrokê bide û kûrbûn û nirxeke giran bidê, ew roniyekê dide dîrokê û aliyê ciwan û spehî siya xwe davêje ser hemû aliyên din:

*Deysemê meydana milletperwer î*

*Salarê bajarê ristên gewher î.<sup>381</sup>*

Di riya vexwestina Salar re di helbesta EVÎNA WELÊT de xwest ku evîna xwe veşêre, ew evîna ku çîroka evîna wî û welat dibêje, evîna ku dilê wî kiriye pizotek agir di nav parsuwan de, lê nikarîbû veşêre, ji ber ku nema dihat qewarkirin ta ku bê veşartin:

*Pêtiya arê evîna te ye dil kirye pereng*

*Me çiqas xwest ku veşêrim lê bi zor dayiye deng<sup>382</sup>*

<sup>378</sup> - Cegerxwîn, *Kîme Ez*, r. 15.

<sup>379</sup> - h.b., r. 40.

<sup>380</sup> - Cegerxwîn, *Hêvî*, r. 28.

<sup>381</sup> - Cegerxwîn, *Aşitî*, r. 25.

<sup>382</sup> - Cegerxwîn, *Sewra Azadî*, r. 27.

Wêne li vir hinekî cuda ye, mîna ku evîna welêt lê bûye bele û hema xwînê dixwaze û diya re ku helbestvan neçar maye ku vê evînê bibe serî û welat neçar e ku xwînê bixwaze, ango ew xwendevanê xwe kesek hoşyar û zana dibîne kul û êşên welatê xwe zane, ku ew bê xwîna şehîdan azad nabe. Welatê xwe bi yareke ciwan dişibîne û gazinan dike ku di dil wî de wê bi dostanî evîna xwe bikin, bi peyvên nazik bi hev re bidin û bistînin, çiku helbestvan têra xwe li bajaran, li rojhilat gerya ye, mîna welatê xwe ne diye ji ber wilo evîna wî tevî hemû kul û birînan, evîneke bê hempa ye:

*Wek te mêrkuj me nedî kes we bi xwînêrêjî bijî*

*Ku evîndarê xwe carek dikujî wer bi xedeng*

*Me go qey dost û hevalî, bi te re bûne heval*

*Ji me dil bir te bi tayê serê zulfa xwe ye şeng*

*Me nedî çend geriyam ez ne di Şam û ne di şerq*

*Kes di rengê te şepalê nazik û şox û çeleng<sup>383</sup>*

Ji ber ku helbestvan çîroka Salar û sawgirtina wî nas di ke, jiyana zor ku di cengan de bûrandiye, di zindanan de, di çiyayan de, ji ber wê ew ji welatê xwe re eşkere dike ku wî ev sawgirtin ji Salar girtiye, ji wî lehengê req û hişk ku li hemberî xurttirîn dijmin xwe girt û rojên tarî û zor bûrandine, wiha jiyana welat jî bi zor û zehmetî dibûre, dijminan qet rehm lê nekirin lê wî serî dananî û helbestvan daxwaza xwe ku can di ber welat de bide venaşêre, çiku ew bixêrtire ku wiha bê wate dawiya jiyana wî bê:

*Te ji Salarê çeleng girtiye ev zor û sitem*

*Herdû ebrû te şikandin li me bûn şêr û pileng*

*Ger dixwazî di evîna te de dilkul nemirin*

*Tu bi destê xwe bikuj lê ne bi top û ne tiveng<sup>384</sup>*

---

<sup>383</sup> - h.b., h. r.

<sup>384</sup> - h.b., h. r.

Helbestvan dixwaze welat lê binere, gazî dikê û jê re dide xuyanî ku ew êşa wî tev ji ber evîna wî ye û ev spîbûna serê wî encama wê êşa kûr a salên dûdirêj e, dijwariya êşê rengê rast daye alî, ev kalbûn e, ne pîrbûn e, lê belê xemilandineke bi rengê sipî ye, dibe ku ew nîşana zelalî û paqijîya evîna wî ji welêt re ye û nîşan û amajeyên pora sipî nas in, ew di çanda gelêrî de nîşana westandinê, kulên giran û bobelatên mezin e û vaye helbestvan ew mîna xwestin bi kar aniye; çiku hemû pêvajoya evîna wî û welêt bi êş û birînan raxistiye, ta ku sînga wî bûye gencîneya şînê êş û derdan, şîna salên dûdirêj ketine ser hev û êşa her buhustekê ji axa welêt e:

***Ser sipî bûye, ji zor û sîtema bûye li min***

***Can û dil tev de revandin te bi talan û bi ceng***<sup>385</sup>

Helbestvan pesnê êş û evîna xwe na rawestîne û hewl dide ku sedemekê ji van bûyeran re bibîne, mîna ku berê xwe dide felekê û jê dipirse gelo ew sedeme? Yan tiştêk jê bihêztir heye? Mîna ku bibêje: Çima kurd ewqasî êşê dibînin? Wî di welatên serdestî miletê xwe de tiştêkî wiha ne dîtiye û ta ne di nav firengan de jî. Gelo çi gunehê vî miletî ye ta ku ev tişt bi serê wî tînin!!

Helbestvan di wutara xwe ya helbestê de dewam dike û hewl dide bersivan ji pirsên xwe re bibîne; wî ti ziyarî ne gihandine kesî, tiştê ku kiriye ew e ku xwestiye wê perda tarî ji ser welatê xwe bavêje da rastiya wî xuyanî bibe, ew mîna gulekê spehiye û çaxê ku helbestvan welatê xwe bi gulê dişibîne ew xurtbûna wê amajeyê zane, gul di vir de ne ji bo xemilandinê, yan diyariyeke wê evîndar bide yara xwe, lê ew nîşana dawpakiya welatê wî ye, ew welatê ku pir caran wek gulekê dîtiye.

Ew daxwaza helbestvan bi hîlanîna perde û serpoşê û diyarkirina ciwaniya welêt, dijmin li ber radibe û wî tiştî qedexe dike; ew dijminê ku destê wî di xwînê de çûye û her tîran di avêje sîngê da nehêle helbestvan bi ti karê erênî rabe.

Helbestvan dixwaze xwendevan bighîne baweriyekê ku ew kesê ku welatê wî ber bi xerabî û wêrankirinê de ajotiye, ew kesê ku ji kulê bi kerb û kîn e, ji dawpakiyê bi kîn e, ji evînî û ciwaniyê bi kerb û kîn e û ji kuştin û xwînrijandinê

---

<sup>385</sup> - h.b., h. r.

pêve naxwaze. Ji lewra ti rê nemane vêca kul, êş, jan û azar tev li ser hev kom dibin û barê helbestvan giran dikin, pişta wî xûz dikin û bihnê lê diçikînin:

*Qe kesê wek sîtema ku te li min kir nedîye  
Ne di Îran û Îraq û ne di Tirk û ne Fireng*

*Me dixwest perde hilê, da ku bibênim te gulê  
Lê ji wan destê bi xûn çûne di sînga me de seng*

*Bêjimar derd û sitem pêkve li sînga me civîn  
Lew me sîne di evîna te de carek biwe beng<sup>386</sup>*

Di helbesteke dastanî dirêj de bi navê PÎRA MÎROVXWER de, malikê wê teybetmendiyekê distînin ku kurt in, gotinin bijarte bi wateyin kûr.. Heye ku mebesta helbestvan ku barê xwendevan giran neke û wî ji wezin nexîne, wî di hundirê deq de bihêle bê ku winda bibe, ew çîrokekê bi riya helbestê dibêje, hin malikên wê hene bandora helbesta destanên Yûnanî li helbestvan diyar dikin, ewa bi afsane û lehengiyan dagirtî ye.

Dixwaze kevin û nû di nav hev ke, ew diyalogeke di navbera doh û îro de, di xeyalê xwe de xewna xwe ya salan dirisimîne, berê xwe dide Zagros, wan çiya û bihna bapîran, ew warê kevnar. Helbestvan ji tariyê saw nag re û ji serme û zehmetiya rê natirse, ew ê here rêkê ber bi rizgarî, azadî û pêşketinê ji nifşên nû re veke. Ew bi rê ve, pîreke/cadobaz dikeve pêşiya wî û rê li ber digre, nahêle ku ber bi xewna xwe ve here û jê re şirove dike ku ev cih û war tije dêwên mirovaxwer in, ba û bahoz in, bê goman mirin li pêşiya te ye.

Di riya diyalogê re helbestvan xwest ji xwendevan re ku ew pîra han dîrok bi xwe ye, ew dîroka şer, ceng û xwîne. Dîrok jî hemû xwezaya çiyê û hişkbûna wî nas dike, lewra şîretan li helbestvan dike ku nerîna xwe biguhere û di vê riyê de berdewam neke. Ew naxwaze ku helbestvan, lawê serdema xwe li hovîtiya berê vegere, çiku pir reng ji xebatê re hene. Lê xuyaye ku helbestvan di gelek caran de û di pîr boneyan de dijmin ezmûn kiriye û hovîtiya wî ev welat kirine kaviil û xuya ye

---

<sup>386</sup> - h.b., h. r.

bê qurbanî azadiyê nade Kurdan. Ji berê ve dîrok bi vî hawî ye, ta Xweda qurbaniyan dixwaze, lewra ji pîrê dixwaze ku bihêle ew derbas be û here ba Xwedê û pê re rûne. Ew ji xwe bawer e ku wê karibe Xwedê qani'i bike da ku wê azadiya daxwaz bide wî, wê xweşiya ku wan deman li bende bûn û wê welatekî spehî û ciwan bê çek û tundî, welatekî aşî û hezkirin tê de hebe.

Ji ber ku helbestvan bela xwe venake, pîrê neçar dibe ku jê re diyar bike ku ta bighêje xewna xwe; ew çiyayê beramber, jê tê xwestin ku di ser pireke tev metirsî û kareset re bibûre. Li gel wan tiştên bi saw û tirs helbestvan sûnd dixwe ku venegere, sûnda wî jî bi wan lehengan e, ew ê ku rojekê desthilatdarên wî çiyayî bûn û yek ji wan Salar bû ê ku nav û dengê wî li wan deveran û bêhtir jî belav bûbû.

Pir li vir ne ew pira ku li ser çemekî tê avakirin, ew amajeke kûrtir e, wateke derûnê dide, ew girêdaneke di navbera ketwar û xewnê de, dema ew derbaskirina pîrê zor, yan jî lîl dibîne, mebest jê ku li gor vê rewşa ku kurd dijîn ew xewna wî qet pêk nayê. Dema helbestvan ji ya xwe danakeve û her daxwaza wî derbasbûn e, sûnda wî nîşan dike ku yê Kurd ji doza xwe venagere û riya azadiya xwe bernade û qurbanî çî bin ber bibin.

Ew azadiyê di wî çiyayî de dibîne, ew çiyayê ku xewnî mezintir jî himêz dike û sûnda wî bi wan lehengan û Salar ji wan, ew şikenandineke ji yase û zagonên olî re, çiku civaka wî ya islamî sûnda bi xeynî bi Xwedê nabe û heram e.

Helbestvan vê yekê xweş zane, ew berî bibe helbestvan mele bû, lê dîsa jî pê li vê yekê dike û dibîne ku ev leheng bi pîroziya xwe ne kêmî wan ên di baweriya wî ya olî de ne. Dibe ku ev bandora çanda gelêrî kurdî be ya ku piraniya caran dikeve asteke ser a olî re. Taybetmendiyan kurdan ji aliyê olê ve hene ji yê mîletên derdora wa; ereb, tirk û fursan cuda ne.

Ji wan taybetmendiyan ku hê bi şûnmayîn çandî sûnd dixwin, mîna (serê bav, serê dê, bira, yan çî kesê li ber dil şêrîn), sûnda bi agir, rokê, heyvê, tirb(gorên) bapîran..û hd. lewra ew zehmetiyê di sûndeke wiha de nabîne:

***Min sûnd xwarî bi Şêrko***

***Bi Salar û bi Xesro***

*Ez xwe ji rê nadim paş*  
*Heta herim serê kaş*<sup>387</sup>

Helbestvan berdewam dike û pêve diçe, teqeze dike ku ne bi yekîtiya kurd û çekan (ne çekên şer tenê) lê bi zanist û ramanê jî be ew nagihin armanca xwe û kengî em rizgar bûn wê dad, wekhevî û aştî bibe Buhar li seranserî welêt reng vede.

Ne tenê di helbestên marş û netewî de, lê belê di yên evînî de jî helbestvan karîbû Salar bîne û hazir bike, ew helbesta bi gotinên naz û ciwan dagirtî. Lê çawa karîbû lihevhatinekê di nav Salar ew lehengê zirz, şervan, çiyayî û peyvên evînî nazik de peyda bike?

Di helbesta BÊ MALÊ de, ya ku helbestvan bi pesnê yara xwe dest pê dike, nazik, delal û mîna gulên nêrgiz, nîsrîn, şilêr û yasmîn ciwan û bihxweş e. Helbestvan dixwaze ciwaniya xweristê bide yara û ciwantirîn tişt di xweristê de gul û çiçekên wê ne; têgihîştina pêşî ewe ku çiqas ew pesnê yara xwe bide nagihe rastiya ciwaniya wê, lê ku em xweş meyzekin emê bibînin ku her gulek amaje û teybetiyin wê hene; yasmîn ew gula ji pencere û sêncên bexçeyan hez dike û êvaran bihna wê xweş belav dibe, nîşana evîna germ e.

Şilêr ew gula ku hinek guhdan pê bibe zû û bi pirr reng û şikil belav dibe, ew nîşana çiya û payebûnê ye. Nêrgiz ew gula sipî û zer nîşana navdarî û jixwehezkirinê ye. Nîsrîn ew gula navê xwe diyarî me dike, sibehê zû vedibe bihxweş e, gulistan dixwazin xemla xwe bi wê tamam bikin. Ew gul hemû bi amaje û nîşanên xwe, bi ciwanî û bihna xwe di kesayetiya yara helbestvan de civiyan e, yê ku ji hemû pesnên wê hez kiriye, ew ji dil re dermane, dost û heval e, hevpişk e û xwedawenda ku jê re diçe sicûdê.

Heger helbestvan di şerê xwe bi dijmin re lehengekî mêr û ji mirin û astengan natirse mîna Salar, di heman demê de teqeze dike ku di rojên teng û dijwar de yara wî piştigira wî ye, ew e ya wî diparêze û ku bê xwestin ew çek e pê şer dike;

---

<sup>387</sup> - Cegerxwîn, **Kîme Ez**, r. 65.

*Ez di cejna<sup>388</sup> dijminan wek Rustem û Salarê kurd  
Kengî meydan teng dibî tim pişt û mertala min î<sup>389</sup>*

Xuyaye Salar di helbestên Cegerxwîn ên evînê de bextewer e, vaye di helbesteke din bi navê DİL XERAC de hazir e. Ketiye davên evîna wê, ew evîna ku gewde û can disoje û nikare bê wê bijî, yara wî ku bi meşa xwe, bi kinc û daxwazên xwe mîna şah û dotmîra ye, mîna ku dilê helbestvan wek baca evîna xwe bixwaze, arezû, xewn û daxwazên helbestvan bo maçkirina wê pirr dibin û dema Salar vedixwaze ew xwedîtin, viyana wê ya xurt û hişkbûna wê bi wî û Kisra û Qeyser dişibîne. Li vir Salar ne kêmi Qeyserê Roman, yan Kisra şahê Îran e:

*Kesra û şah û Qeyserê     serdar û Salar û serê  
Kuştim bi tîr û xencerê     min can û dil danîn di bac<sup>390</sup>*

Di helbesteke din bi navê LI DIL ÎRO BÎHAR E de helbestvan bi hevdîtina yara xwe şad e û taca zêrîn per zîv li serê wê ye, mîna şajinekê li ber wî ye, nazik û delal. Ne tenê pesnê wê û ciwaniya wê dide, lê pesnê xwe jî dide; çawa Salar serkêşiya leşkerê xwe dikir wiha helbestvan di ristê de serkêşê helbestvanan e. Ji meyger dixwaze peyala wî dagre û li porê wî yê sipî nenêre, hê dilê wî ciwane û kare li ber xwe bide:

*Li ser danî te zêrtaca sîmênper,  
Di ritstê de çi Salarim bi leşker,  
Werîn cama evînê zêde meyger!  
Meger pîrim, dilê min berxwedare<sup>391</sup>*

Kesayetiya Salar cihekî giring di helbesta Cegerxwîn de digre, ta ku berhemeke xwe bi navê SALAR Ê MÎDYA nivîsiye, ew bi naveroka xwe dastaneke helbesti ye, qehremanên wê Salar û Mîdya ne. Sembolîzmeke helbestî baş tê de peyde dibe. Dixwaze teqeze bike ku Salar berdewamiya dîroka Mîdya ye û Mîdya

<sup>388</sup> - Wiha hatiye nivîsandin lê Ez dibêjim ya rast (Cenga).

<sup>389</sup> - Cegerxwîn, **Kîme Ez**, r. 202.

<sup>390</sup> - h.b., r.219.

<sup>391</sup> - Cegerxwîn, **Hêvî**, r. 164.



ew çiya ne, çiyayên ku Salar evîndarê wan bû<sup>392</sup>. Ji hezkirina zêde neviyekê xwe bi navê Salar hilda ye û neviyeka xwe bi navê Mîdya<sup>393</sup>.

Bi vexwendina kesayetî û bûyerên dîrokê bo helbestên xwe Cegerxwîn karîbû bi rengê erênî bikêrbûneke zindî bi wan re bike û weke ku dixwest bandora xwe li hiş û bîra xwendevan hişt.

### 2.2.2.2.3. Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Mîrneşînên Kurdan Di Serdemên Biweyhî û Selcûqî De:

Bûyer û kesayetiyin ku di serdema biweyhî de rû dan, bala Cegerxwîn kişandin û cih di helbestên wî de girtin, di helbesta bi navê OLPERESTÎ de, bi awakî helbestî nazik mîna çîrokeke dîrokê Cegerxwîn wan li dû hev rêz dike, çîrok e lê qehremanên wê rastî ne, dem û war zelal û xuyane. Piştî pirtûkên dîrokê xwendine hatiye bi awakî helbestî ew nivîsandine û bi nijandineke dîrokê ew li pey hev anîne. Bûyerên ku Dewleta Ebbasî têk birin û bû dewlet û dewletok û mîrneşînin serbixwe, çawa şer û ceng seraserî wê dewletê belav bû. Kurd derbasî nav wan bûn û nesîbê wan jî tê de hebû, lê yê ku dawî li bûyeran anîn û Xîlafeta Ebbasî têk birin Deylem bûn. Dibêje:

*Şerên pîr giran zû ketin nav welêt*

*Bi carek şewat û hemî ar û pêt*

*Bi vî rengî mane heta Deylemî*

*Ji destê neyaran deranîn gemî<sup>394</sup>*

Kurdan pişkdarî di serkirdayetiye kirin û weke hêzeke şervan diyar bûn; serokên hebûn ku serî li ber rewşa civakî û aborî hildan di sedsalê neh û dehê zayîne de, dûvre desthilatdarî û mîrneşînin serbixwe ava kirin.

<sup>392</sup> - Cegerxwîn, **Salar û Mîdya**.

<sup>393</sup> - Salar û Mîdiya, navê kur û keça kurê Cegerxwîn Keyo ne.

<sup>394</sup> - Cegerxwîn, **Zend -Avista**, r. 127.

Rengvedana wan di helbesta Cegerxwîn de ji mîrneşînekê ta ya din cudabûnek hebû. Em dibînin mîrên binemala Hesnewêh ne bi wê xurtbûnê cih digrin, tevî ku di dîrokê de roleke xurt û hebûnek hêja hebûn. Tenê ew di ŞEREFNAMEYA MENZÛM de hatine, ew jî weke ku Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî bi awayê helbestê nivîsandiye, mîna belgekekê hatiye, ew nêzîktirî çêkirina helbestê ye ji peyxamê û vêya hiştiye ku peyvin taybet bikar bîne; her bi rengê fermanî diaxive (rabe, rûne, were, bigre,...), çiku helbestvan her dixwaze; çî ji wan kesayetiyên û çî ji xwendevan.. dixwaze wan lehengan vejîne da bibînin çî wêranî bi serê neviyên wan de hatiye, çî talan û malxerabî û ji xwendevan dixwaze ku mîna wan lehengan be li ber xwe bide. Bijartina wî ku Bedlîsî bijartiye ne ji valahiyê ye, çî ji aliyê razberî û çî wek daxuyaniya qenciya wî ku yekemîn pirtûke bi tevayî li ser Kurdan e.

Destana xwe –ku ev derbirîn rast be- bi aliyê destanî dest pê dike, bi wan qehremanên afsaneyî ku dîrok çêkirin, Restemê Zal yê ku hêza wî ya bê hempa di her zemanî de bûye mînak, dûvre bi wan lehengên ku dîroka Îranê ya kevin çêkirine, Ebû Muslim û Deysem jî dixê nav wan, paş re diçe desthilatdarên Diyarbekir û Cizîrê û wiha berdewam dike. Dixwaze diyar bike ku rêbazekê wî ya taybet di vebêjiya bûyera dîrokî de heye, Şerefname bi gera li bingeha (eslê) Kurdan dest pê dike, gotin û bîrdozên (tiyorên) di eslê Kurdan axivîne nîqaş dike, çiqase raste û çiqana, dûvre tê çîroka Kawa, Newroz û Dehhak û ji nû ve tê dîroka ketwarî rastî<sup>395</sup>. Lê helbestvan ne wek Şerefxan dike, ew li eslê Kurdan nagere, dest pê dike û zane ku nasnameya wan kurdi ye û nîqaş jê re navê, ew dibîne ku ew leheng tev nûneriya Kurdan dîkin, dibe ku wî ji qesd bi Restemê Zal dest pê kiribe, ewê ku vedengeke wî berfireh di şûnmayê Îrana kevin de heye û heye ku wek amajekê bi karê Şerefxan be û vekolîna wî di eslê Kurdan de.

Lê ji aliyê hesnewiyên ew eynî mîna Şerefname pê de çûye, çî ji navan û çî ji nijandinê (Hesnewêh, Bedir lawê Hesnewêh, Hilal lawê Bedir, Tahir lawê Bilal, Bedir lawê ahir, Mihemed lawê Eyar, Hûsam Ebuşşok, Ebulmacid Muhelhil, Sexwab lawê Mihemed, Brahîm lawê Neyyal, Seîd lawê Hûsam Ebuşşok, Sexwab lawê Bedir lawê Muhelhil, Ebulmensûr), helbestvan Şerefname daniye ber xwe û helbesta xwe li gorî wê çêkiriye û li ber her navekî daxwaza wî daniye; ji Hesnewêh dixwaze ku rabe

---

<sup>395</sup> - Bedlîsî, h.b., r. 47-61.

û bi çavê serê xwe bibîne çawa zarwên wî jar û perîşan di bendan de mane, li ber wan rojên ku Hesnewêh ew hêz ava kiribû dikeve, çawa xurtirîn û zordartirîn hêz hesab jê dikirin û niha zarwên wî bê çare ne:

***Bes e rabe Hesên Weyhî ji Deynûr***

***Bi carek em dinalin nêz û hem dûr***

***Kurên te tev bi carek bûn belengaz***

***Di nav wan de nema ye yek serifiraz***<sup>396</sup>

Dema navê Bedir dibêje, wan serkeftinên wî di bîra xwendevan de tîne û wan rûbarên fireh ku dest danî ser û kurdan desthilatdariya xwe li wir dikirin, mîna navtêdanekê û daxwaza vegera wan serkeftinan. Heye jî ku rewşa xizanî û perîşaniya ku îro roj Kurd dijîn ew dehf dabe ku vî awayê helbestan binivîsîne, da ji hin aliyên de Kurdan berçav bike; ji alîkî ve wan dîrokeke kevnar çêkirine, yê Kurd dikare xwe pê serbilind bibîne, ji aliyekî din ve ew Kurdê jar û belengaze bindest e, ji aliyê sêyem ve ew Kurdê bêkêr û sertewandî û ji aliyê çarem ve ew Kurdê doza azadiya xwe dike û bi hemû awayî tekoşînê kar û xebatê di ber de dike. Ew mîna hevîrekî helbestvan zanîbû xweşik bistire û hevgirtî bihêle, mebest helbesteke hevgirtî ava bike, da bi wan lehengiyan re bimeşe, hûr li wan binere û weke mînak ji xwendevanê xwe re pêşkêş bike:

***Bedir rabe ji Deynûr ta Nehawend***

***Birûcerd û Esedabad û Elwend***

***Çi Şehrezor û Ehwez û Xozistan***

***Li wan vegre durefş û alê kurdan***<sup>397</sup>

Cegerxwîn hewl dide ku çî di Şerefnamê de hatiye ew li gor wê pesnê wan kesayetiyên bide û reng di helbestê de bide wan dixwaze riyalîzm (aktuel) be û wî nirxê helbestê wek deq di belgekirina wan dîrokbêjiyan de fêhm kiriye û dizane jî ku helbest di binyad, ziman û avakirina xwe de ji deqê dîrokî xweşxewan cuda ye, lê xweş tê dîgê jî ku deqê dîrokî balpişteke xurt e ji avakirina helbestê re. Li ser Hilal

<sup>396</sup>-Cegerxwîn, *Şerfnameya Menzûm*, r. 16.

<sup>397</sup>- h.b., h.r.

lawê Bedir pesnê wî dide û medhê wî û mêrxasiya wî dike û di deqê dîrokê de jî Wiha ye, li vir em dibînin ku helbestvan dixwaze dîrokê bike helbest û helbestê bike dîrok. Dibêje:

*Hilal lawê Bedir rabe tu xweş mêr*

*Digel dijmin bike cengê wekî şêr*

*Bi serbestî bixwaze doza kurdan*

*Tu bistîne ji bo me nav û nîşan*<sup>398</sup>

Bi vî hawî berdewam dike û hemû mîrên wan li pey hev rêz dike, bi dîrokê re dilsoz e, ew rastiya dîrokê ji huneriya helbestê re nake qurban, li vir ew dîrokê giringtir dibîne, lê tev wê jî huneriya helbestê parastiyê, tevî ku di cîna de weke çêkirina helbestî hatiye.

Û di vê helbesta dirêj de ji bîr nekiriye ku Merwaniyan û mîrên wan jî bîne zimên, çiku wan bi xurtî cih di Şerefnamê de girtine û helbestvan pabendiyê bi navên li ba Şerefxan dike û zêdeyî wan naçe. Bang li Ehmed lawê Merwan dike û jê dixwaze ku li wan war û welatên ku rojekê desthilatdariya wan dikir binere, li paytexta xwe Amed û li Cizîrê binere, da wêraniyê bi çavê serê xwe bibîne û ji Nesir lawê Ehmed dixwaze li Farqînê binere bê toraniyan çî bi serê wê kirine, ji Seîd lawê Ehmed dixwaze ku careke din rabe û hilkişê ser erş da tola neviyên xwe hilîne û ji Mensûr lawê Nesr dixwaze li çemê Amedê /Dicle binere bê çiqasî xwîn jê re bûye cobar û bi ser de herikiye ta rengê wê sor bûye û di bîra her çaran tîne ew salên ku bi xurtî û serbilindî hikum kirin.

Di helbestinên din de jî Cegerxwîn mîrê Dostikiyan- merwaniyan anîne zimên, ji damezrênerê dewleta wan Baz dest pê dike, yê ku kedêke wî bebirçav di avakirina dewletê de hebû. Di helbesta PARTÎZAN IM de helbestvên xwe bi partîzaniya xwe serbilind dibîne ku daye ser riya azadiyê ta bighêje daxwaza xwe û dibîne ku millet hişyar bibe, nexweşiyên xwe nas bike û ji dil destan bidin hev, wî

---

<sup>398</sup> - h.b., h. r.

çaxî wê karibin serî hildin û bibin borîzan<sup>399</sup> û agahiya cengê bidin, da bigrin ser dijmin.

Ji alîkî de jî helbestvan xwe bi Teyrê Baz dişibîne, ewê ku hêlîna xwe li serê çiyê çêdike û mîna birûskê êrîşî nêçîra xwe dike, amaje û nişaneke taybet a vî teyrî li ba helbestvanên kurd heye, her pesnê mîr û kesayetiyên resen û lehengan didin wan bi baz dişibînin, ew nîşana resenî û mêrxasiyê ye. Li vir helbestvan dixwaze bide xuyanî ku ew lawê wan lehengan e, ewên ku pêkhateyên welêt bi destên wan bûn û ji nav wan Mîr Baz yê ku bi saye serê wî dewleta dostikî hat damezrandin. Di vê helbestê de navê Baz bi navê mîrin din re tîne mîna Hirmiz, Keyxisro û Restem, da giranbuhaya wan berçav bike û pê re jî daxwaza azadkirina xaka bav û kalên xwe yê mîdî bike. Helbestvan her dixwaze ku peywendî û têkilî ji nav nîşan neyên birrîn, lê belê her bimînin.

Daxwaza helbestvan zelal û xuya ye û kesayetiyên kirine mînak da li ser riya wan herin xuyayî ne. Ew dixwaze tekoşîneke zor bi dijmin re bike mîna ya ku wan qehremanan kir:

***Gava xwe berdîm ser çiya***

***Bigrim li ber dijmin riya***

***Bi kevme axa Mîdiya***

***Keyxesrew û Bazan im ez***<sup>400</sup>

Ne tenê serokê wan Baz binav kiriye, lê di hin helbestan de li ser Merwaniyan sekiniye, mîna helbesta DE BGRÎ LI SER TAC Û SERA, ya ku tê de li ser şoreşa Şêx Seîdê Kurd diaxive (emê di cihê wê de li ser bisekinin), Merwaniyan berçav dike. Ji Amedê dixwaze ku li ser wan pakrewanan (Şêx Se'îd û hevalên wî) bigrî, na û dixwaze ku li ser wan pêkhatên merwaniyan bigrî. Dixwaze bajar bike jîndarek bi hest û coş, çiku ew tenê dikare tiştê bi wan bapîran de rû dane berçav bike û razên wan cihan bi dîrok û serkeftinên wan ve eşkere bike.

<sup>399</sup> - Borîzan, Amûreke mûzîkî ê pifdanê ye ji sifre tê çêkirin, tê bi karanîn bi piranî di meşen leşkerî û Keşafî û pêşwaziya serokan de.

<sup>400</sup> - Cegerxwîn, **kîme ez**, r. 59.

Dema ew bobelat tèn ber çavên helbestvan, bajar li ber dibe bajarê mirinê, bajarê zor, zulm û koletiyê, çawa di dîrokê de ew bajarê paye û serbilindiyê ye. Lewra ji mafê wî ye ku jê bixwaze bigrî:

*De bigrî û binale ey şarê Amed ey xwîn xwar*

*De bigrî li ser tac û sera û textê Merwan<sup>401</sup>*

Kezeba Cegerxwîn li ser wan destkeftin û serbilindiyên bapîran dişewite, ji nav wan ên Merwaniyan û mîrên wan. Di hin helbestên wî de peyv, rêbaz, şêwaz û bikaranîna wan dûbare dibin, ji wan (CEGERXWÎN BES<sup>402</sup>, BÊRIYA WELÊT<sup>403</sup>, HEY FELEK<sup>404</sup>), di wan de Cegerxwîn li ser rewşa ku Kurd ketinê dikale û li sedemên windabûna wan dipirse.

Hebûneke Loriyî xurt di helbestên Cegerxwîn de heye, ta giha ku di bihtirî bîst helbestan de ev peyv bi kar aniye. Heger em bikaranîna wê ji "Şerefnameya Menzûm" dîr bikin, em dibînin ku di helbestên din de ew bi rengin cûrecûr hatiye û cudabûnê naxîne nav Lora mezin û Lora biçûk. Carekê weke Êleke Kurdî, carekê mîna zaravekî ji zaravên Zimanê Kurdî û carekê weke herêmeke erdnîgariya kurdî bi kar aniye.

Di "Şerefnameya Menzûm" de helbestvan pabendiyê bi Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî dike, di hejmara mîrên wan û navên wan de, ku carinan rêbaza helbestê bixwaze ew bi nav dilîze lê bê ku ziyane bigihîne nasnameya wan. Dîsa ji her mîrekî daxwazekê dike; bi teyayî ew keservedana ser dema bûrî, gilî û gazinên ji rewşa ku Kurd gihanê, dixwaze diyaliktîkekê di nav doh û îro de bi hev girêbide.

Helbestvan ji mîrekan dixwaze ku ji nû ve bijîn da bi çavê xwe bibînin xirabî û wêraniya bi ser şunwarên wan de hatiye tiştê nema dişibe berê, nasname li ber windabûnê ye, lê tevî wilo jî ew ji vê cugrafiyê dernakeve, ev jî nîşaneke ku helbestvan bi xaka xwe ve girêdayî ye, tevî têkçûna di geyanê wî de.

---

<sup>401</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 33.

<sup>402</sup> - h.b., r. 11.

<sup>403</sup> - h.b., r. 16.

<sup>404</sup> - h.b., r. 70.

Helbestvan ew mîrên ku herdu mîrneşîn hikum kirin, her mîrneşînek di helbestekê de, yek bi navê Şahanê Lorê Mezin<sup>405</sup>, yê din bi navê Şahanê Lorê biçûk<sup>406</sup>.

Giringiya Lor li ba Cegerxwîn di helbesta KÎME EZ de derkir, ew helbesta ku helbestvan xwest weke nasnameyekê ji Miletê Kurd û dîroka wî re be û ji ber ku Lor parçekî giring in ji dîroka Kurdî, navê wan bi yê hemû miletên bapîrên kurdan re tê, da nasnameya wê ya kurdî teqeze bike:

*Ez im kurmanc û kelhor, lor û gor*

*Ezîm, ez Kurdim, li jêr û jor*

*Çend hezar salin*

*Kurdistana min*

*Perçe perçe ma*

*Bindestê dijmin*

*Kîme ez<sup>407</sup>*

Di helbestên ku Cegerxwîn di wan de peyva Lor bi kar tîne, piraniya peyvên wî dişibin hev, carna cudabûneke sivik di nav wan de heye. Di helbesta DEZGÏRTÎYA XORTAN de êş û birînên welat dirisimîne, wê bi desgirtî û yarekê dişibîne ku her xortek wê dixwaze ku ya wî be. Di birgeya ku "Lor" tê de tê, dibêje ku Kurd nebin yek û li hev neyên ew qet nagihên armanca xwe. Helbestvan li vir kesî di ser ê din re nagre; tev li ba wî wek hev in çî ji aliyê gazind û loman û çî ji aliyê paye û serbilindiyê, tev berî her tiştî kurd in û ti ferq tune ji êla Lor yan xeynî wan bin:

*Baba û Bextî û Ler, Beraz û Torî û Zaz*

*Nebîn tev yek seranser, tev dê bibin belengaz<sup>408</sup>*

Careke din û di helbesteke din de bi navê XWEDIYÊ MIRIYAN KOR E helbestvan bi xurtî doza yekîtiya kurdan dike, tevî ku rewşa derdorê bê xêr xuyaye jî, lê herî ew vê riyê dixwaze, çiku xelasiyê tê de dibîne. Ji destpêka helbestê de ew

<sup>405</sup> - Cegerxwîn, *Şerfnameya Menzûm*, r. 19-21.

<sup>406</sup> - h.b., r. 22-24.

<sup>407</sup> - Cegerxwîn, *kîme ez*, r. 14.

<sup>408</sup> - Cegerxwîn, *Pirîsk û Pêtî*, r. 5.

tariya rewşa kurdî dibîne, Kurd bê şens in û ne ber xwe dibînin, ew tarîbûn dema rewşa kurd bi ya dijmin re dide ber hev, diwartir xuyaye çiku dijmin bi mal û milk ji kurdan dewlemendtir e, ew xwedî qesr û xwedî text in û ji bilî kavilan tiştêkî Kurdan tune û ta wan kavilan jî mîna goreke bêkes e.

Helbestvan penda kurdî "Geyayê hewşê tal e" digre, ne ji bo ku lukumandin û nebiserketina xwe berçav bike, ew bi teknîkeke bilind wê bikar tîne da pendeke ji pendê pêkhatîtir bîne dema wê di yek malikê de bi "Şekirê dijimin şor e" re tîne, da rewşa Kurdî bi tirs û saw diyar bike, ew ji derve û ji hundir herifîne. Bikaranîna herdû hevokan di yek malikê de afirandina helbestvan di asteke bilind de diyar dike.

Helbestvan teqeze dike ku jar û hejarî ti zanîne nadin û rizgariyê di riya dewlemendiya aborî û hêza leşkerî de dibîne û berî wan tevan yekîti gereke, bê ku li nakokiyên êlîti binerin û bê ku kes xwe di ser kesî re bibîne. Ku Kurd nebin yek di bin yek alê de, di bin yek serokatiyê de ew ti caran nagihin armanc û daxwazên xwe:

*Yekîti divê berî her tiştî bo kurd*

*Çi Zaz û Kurmanc, çi Kelhor û Lor e*

*Ta al û welat û serek nebin yek*

*Kurd li aşê felekê her timî bê dore<sup>409</sup>*

Li vir helbestvan rewanbêjiyeke ciwan bikar tîne, dema dora Kurdê ne bikêrhatî ku nagihêje armanca xwe bi wî kesê ku diçe aş û dor nagihê. Bi vê yekê êş û aloziya welêt di bin destên dijminan de, zilm û zoriya wan de diyar dike.

Lor tê bi kar anîn di helbesteke din de jî bi navê KA WELAT Û AL Û OL, helbest hesret û derd in, bangewaziya ji xwe dike û di pirse û matmabûneke bo sedemên windabûna wan pêkhatiyên bapîran, biserketina zordariyê, pirsê helbestvan her (Ka) û (Kanî)ye, ew li warin windayî digere, ta dem /zeman jî ji ber winda bûye, ta ku ew bi xwe di lêgerînê de sergêjek lê geriya ye. Tevî ku ew cih û war xweş nas dike, demê bi hûrbînî şirove dike, serkêşiya bêje û hevokên xwe dike û xwendevan bi hesanî dighîne xewnê/daxwazê, lê ji ber qewara êş û hejariyê ew armancê gelekî zor dibîne. Dibêje:

---

<sup>409</sup> - h.b., r. 14.



*Kanî gor û kanî lor û kanî bext û kanî zaz  
Ka şikak û kanî aşît, kanî Mil û Zil û Zol<sup>410</sup>*

Di helbesta WELAT HÊJ KEÇ E de ya bi rewanbêjiya xwe ciwan û nazike, bi zimanê xwe şêrîne, helbestvan pesnê welatê xwe dide, piştî wî bi keçeke spehî û lihevhatî dişibîne, bê kêmasiye, ne bi gewde û ne bi can, rola temen lê xuya ye.

Helbestvan bi wê re diyalogê dike, jê dipirse li ku ye? Ji ku ye? Bi ken lê vedigerîne ku ew ji Loran ta Bexte. Wê cihek nîşan ne kir, lê amaje bi rûbareke cugraffî fireh kir, da diyar bike ku ewa pê re diaxive ew welatê pan û fireh e. Helbestvan navê Loran tîne da sînore welatê xwe yê rojhilat birisimîne û ji me re bibêje ku Loran kurdiye.

Diyalog di nav helbestvan û keçê de berdewam e, bersivên keçê dergeh bûn ji mijar û dozin din re. Helbestvan jê re dibêje: "Tu Kurdistanî û ez Kurd im". Dîsa bersiva wê di nav ken re bû, dema jê re got: tu ne Kurd î! Yan na kanî xencer, rext û tivinga te?

Helbestvan dixwaze ji me re bibêje ku şer û ceng û alavên wê bi Kurdan ve hatine girêdan, ne tenê wilo, lê bûne parçek ji nasnameya wî. Heger veşartî be ne eşkere be jî ew kesê çek hildigre li heyf û tolhildana xwe digere, yan jî mafê wî ji dest çûye û li ser a xwe maye ku çek daneyîne, da xwe biparêze û mafê xwe vegeirîne. Xencer li vir nîşana mêrxasî, pozbilindî û lehengiyê ye. Dema keç ji helbestvan re dibêje: Tu ne Kurd î. Mîna ku bibêje: Wekî tu kurd î, çima welatê te di bin nîrê dijmin de ye û ne deng ji te tê û ne kar û xebat!!

Piştî keç pesnê wî bi newêrekiyê dide ku nizane rahêje çek û rextan, helbestvan li ber xwe dikeve û şerm dike û pê re dike qarîn; Ka çima tac ne li serê te ye? Ka al? Ev qarîna hestiyar dihêle ku keç li ser wan tac û alên ji erşê pêşiyar hatine xwar bigrî.

Û ji ber ku ciwanî û spehîbûna keçê bê hempa ye, helbestvan dikeve davê evîna wê û dixwaze wê ji xwe re bixwaze, jê dipirse ku keç e yan jin e? Bersiv tê ku keç e û qelenê wê gelek zêr û mêrxasi ye. Li vir goman nema ku ew keç Kurdistan e,

---

<sup>410</sup> - h.b., r. 29.

ew welatê parçekirî, êş û azaran dikşîne, ew welatê bi xweristiya xwe û bi bayê xwe welat mîna wî tune ne û yê ku doza wî bike divê amade be canê xwe bide:

*Keçek min dî ciwan û xame ber bext,*

*Li wê çûne gelek çax û dem û wext*

*Me jê pirsî ji kû ye, ey keça rind*

*Kenî û go ji Loran ta biçî Bext<sup>411</sup>*

Ku em çend haletên ku Lor tê de hatiye bikaranîn bidin alî, em ê bibînin ku ew her girêdana bi war, ziman, êl û hesretan ve ye. Heger em hûr li wan helbestan binerin em ê bibînin ku ew dûbarekirineke di wan helbestan de, em dikarin bi kurtî bêjin ku helbestvan doza yekîtiya Kurdan dike, dûrî mejiyê teng û ezeziyê, mîna di helbesta GOTINA WELAT<sup>412</sup> de, yan ŞAM ŞEKÎR E WELAT ŞÊRÎNTÎR E, lew şerê birakujiya kurdî ku helbestvan jê nefret dibe<sup>413</sup> û di helbestin din de jî girêdanekê di navbera Lor û wê dîroka kevin de peyde dike, dema navê Lor bi Mîtan re tîne<sup>414</sup>.

Û helbestvan bi vî hawî berdewam dike û di van gerdûnan de Lor di bihtir ji cihekê û helbestekê de amade dike, da bi wê amadekirinê nasnameya wê ya kurdî; wek cih û wek millet teqeze bike.

#### **2. 2. 2. 2. 4. Rengvedana Dîroka Dewleta Eyûbî:**

Cegerxwîn baş guhdan bi Dîroka Dewleta Eyûbî kiribû û di pir helbestên wî de Dîroka malbata Eyûbî cihê xwe girtibû û bi taybet Sultatan Selaheddîn û Şêrgoh û ew malbat bibû jêderê ji peyxama wî ya heelbestî re.

---

<sup>411</sup> - h.b., r. 60.

<sup>412</sup> - Cegerxwîn, **Sewra Azadî**, r. 8.

<sup>413</sup> - h.b., r. 43.

<sup>414</sup> - Cegerxwîn, **Ronak**, r. 13.

## 2. 2. 2. 2. 4. 1. Rengvedana Dîroka Malbata Eyûbî:

Cegerxwîn yek ji helbestvanên ku bi piranî dîrok û kesayetiyên dîrokî di helbestên xwe de bikar anîne, ta mirov helbestên wî mîna deqîn dîrokî bihtir ji deqîn wêjeyê dibîne. Dîroka kurdî di her qûnaxekê de, kesayetiyên olî, siyasî, civakî û çandeyî cihên xwe tê de dibînin, wiha jî şah, qehreman û sultanên Kurd.

Cegerxwîn gelkî guh da malbata Eyûbî bi tevayî û di gelek cihan de xwe bi wan paye û serbilind didît. Di dîwana pêşî (Pirîsk û Pêtî) de, di helbesta bi navê BÊRIYA WELAT de weke ku li ser kaviên welatekî wêran rawestiyaye; ji kavl û wêraniyê pê ve tişteki nabîne, gazî rabirdû dike û kesayetiyên dîrokî yên xwedî bandor ku li Kurdan kirine tîne bîr û bangî wan dike (Restem, Guhderz, Ferîdon,...); ew lehengên ku navê wan di destana ŞAHNAMA ŞEHÎDAN de bi xurtî hatine<sup>415</sup>, wiha jî cih û bajarên kurdî li seraserê Kurdistanê (Deynûr, Şehrezûr, Amed, Heskîf, Sasûn û.....) pesnê deşt, çem, çiya û suruşta wan dide mîna ku li hespekî çê siwar e û lê digere û li ser Eyûbiyan dibêje:

*Ka Ferîdûn, ka Direfs, taca Keyan li kû ye,  
Ka Guhderz û ka Ristem, ka ew meydan li kû ye?*

*Ka padîşahê Elwend, ka siltanê li Deynûr  
Ka Eyûbî, ka Deysem, kanî Merwan li kû ye?*<sup>416</sup>

Wiha jî di Pirtûka xwe (Şerefnameya Menzûm) de hin ji xêzên helbesta xwe - ya hatiye nivisandin bi rengê dastaneyek helbestî - ji Eyûbiyan re terxan kirye bi navê Padîşahên Eyûbî; tê de bangî qehremanên Eyûbî dike ewên ku rojekê ji rojan rûmetek giranbuha ji Kurdan re ava kiribûn, ji Selaheddîn dest pê dike dema gazî dikê û jê dixwaze ku dakeve meydanê, çiku Rîçard di qada şer de ye û dûvre dibêje ku xaçperest û misilman li ser Kurdan ittîfaq kirine û Kurd lawaz û bê çek mane û gazî El-Ezîz lawê Selaheddîn dike da birînen di laşê Kurdan de bibîne û bang El-Fadil û El-Adil; zarwên wî dike, ew kesên piştî Selaheddîn hatine, tîne ber çav da ji wan re şirove bike tiştê bi serê Kurdan hatiye û perîşaniya ku tê de dijîn û rola wan a

<sup>415</sup>-Ebu'l Qasim el-Ferdosî, *eş-Şahname melhemetu'l-Furs el-Kubra*, ter. Semîr Maltî, daru'l-Ilmî'l- Melayîn, t2, Beyrût, 1979, r. 41- r 54.

<sup>416</sup>- Cegerxwîn, *Pirîsk û Pêtî*, r. 16.

mezin wek serwerên Rojhilat û Misilmanan berçav dike û wiha ta dawiya helbestê didomîne:

*Selaheddîn were, rabe tu serdar*

*Li meydanê siwar e Misyu Rîşar*

*Selîbî û misilman tev de bûn yek*

*Belê kurdên te mane jar û bê çek*

*Were rabe Ezîzê Misrê kurdan*

*Birîndar bûne îro em ji derdan*<sup>417</sup>

Şêrgoh cihekî bilind li tenişt Selaheddîn di helbestên Cegerxwîn de digre, ta di cîna de dike ku bi ser navê Selaheddîn keve, çiku Kurd zarwên Şêrgoh ne weku di heman demê de zarwên Selaheddîn in, ne bi tenê ji ber ku ew apê Selaheddîn e, lê belê ji ber ku ewî biraziyê xwe gihande ser hikum û biserketinan, na ne tenê wilo jî, lê wî Selaheddîn di warê şer û cengan de perwerde kir, cudahiyeke di navbera Şêrgoh û bira û biraziyê wî de hebû, bi mêrxasî û qehremaniya xwe pir bi nav û deng bû û qet ne di bû guman ji kesî re ku Şêrgoh bibîne bêyî ku şûrê wî di destê wî de be.

Ji helbestên ku rahiştine vê mijarê helbesta bi nav û deng KÎME EZ e, ya ku weke destanek a dîrokî ye, qehremanî û têkçûnên kurdan şirove dike, bi vî rengî Cegerxwîn xwe tê de serbilind û payedar dibîne ku ew lawê Şêrgoh e, yê ku bi qedr û qîmeta xwe ne kêmî hemî serwerên kurdan e:

*Kurê Guhderz û Ferhad û Rustem*

*Kurê Salar û Şêrgoh û Deysem*

*Bejin bilind im*

*Wek Dêw bilind im*

*Ez dest dirêj im*

*Serbest dibêjim*

*Dixwazim bi lez*

---

417- Cegerxwîn, Şerefnameya Menzûm, r. 25.

*Gavan bavêjim*

*Kîme ez?*<sup>418</sup>

Û carinan herdû nav –Şêrgoh û Selaheddîn bi hev re di yek helbestê de tîn, ev jî ne dûrî bûyerên dîroki ye, çiku herdû nav bi hev re li Misr û Şam û Iraqê bi derketina Eyûbiyan re hilatin; di helbesta HEY FELEK de bangî Felekê (qederê) dike, gilî û gazinên xwe pê dike, li ser rewşa xirab ku Kurdistan gihayê û hezkirina xwe ji welat re diyar dike tevî belengaziya ku dijî û xweziya xwe bi karê bav û kalan tîne, wek Ebû Muslimê Xurasanî yê ku bi saya wî dewleta Ebbasî hat damezrandin<sup>419</sup> û Merwan ê ku Dewleta Merwanî (Dostikî) bi navê wî hate tomarkirin û navên Şêrgoh û Selaheddîn bi hev re di yek firdikê de tîne:

*Hey felek felek, hey zalim felek*

*Ka ew Kurdistan, ka bircên belek.*

*Min navê cenet, ji te bi minet*

*Serbest û aza, va çûm cehenem*

*Ka Ebû-Mislim, Şêrgûh û Merwan*

*Ka Selaheddîn, kanî Kerîm-xan.*

*Ka ew begler û ew mîr û paşan*

*ka Badir-Xan û Xanim û Dêsem.*<sup>420</sup>

ev malikên ku di helbesta AGÎRÊ SOR de hatine rola hêz û qewetê di pêkanîna armancan de teqeze dike û hay dibe ser mijareke giring, ku dê xort û ciwanên îro, sibe gazinan ji me û têkçûnên me bikin, ji ber me ti armancên wan pêk neanîne û bi van gazinan jî ew mafdar in û ji ber vê sedemê jî, divê em şûrê Şêrgoh û Guhrêş û Ristem hilgirin. Heger armanc avakirina dewletê be, yekîtiya gel û viyanê xurt pêwîst in, divê em wan kesan ji xwe re di xebatê de bikin mînak û li ser rêbaza wan pêş de herin û gavan bavêjin:

418- Cegerxwîn, **Kîme ez**, r. 15.

419- Muhemmed bin Ehmed bin Usman ez-Zehabî, **Siyeru E'elamu'-Nubela**, c. 6, Muessesetu'r-Rîsale, 2001, r. 48-53. Ibin Xellikan, h.b., c. 3, r. 145-155.

420- Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 70.

*Ta dest nedin hasin û xurtî jê ne xwazin  
Û nebin xwedî tang û top û Firok û Papor*

*Naçin rêza milletan û nabin xwedan dewlet  
Bibin yek ey millet çine kurmanç û lor û gor.*

*Dest bidin şûrê Rustem û Guhreş û Şêrgoh  
Ji cîhan xweşiyê bi zor bixwazin wek leşkerê sor<sup>421</sup>*

Di dîwana heftem de, Cegerxwîn helbesteke xwe bi navê Şêrgoh navnîşan dike RENGÊ ŞÊRGOH HERNE ŞER, tê de pesnê welat û xêrûbêrên wî dide ûtemîniya xwe li zarwên welêt dike ku welatê xwe bernedîn û weke bira hev bigrin, xwe bi esl û binyadê xwe serbilind û payedar bibînin, wiha jî diyar dike ku Kurd Kurdin çî li Dêrsim, çî li Şingal û Şehrezûr û çî li Amêdiyê, ew tev zarwên qehremanê bi nav û deng Selaheddîn in, tev gernas û mêrxas in.

Dawiya helbestê weke rengvedanekê ji sernav re hatiye, ew ji Kurdan dixwaze ku di cengan de weke Şêrgoh Mêrxas û qehreman bin:

*Kurd hemî kurd e, çî bêjim Dêrsim û Şengal û Tor  
Lor û gor û zaz û bext û Şehrezûr û Amedî*

*Ey kurên Salar û Deysem! wek Silahiddîn çeleng  
Wek pilingan herne cengê, hafî dewra Ehmedî<sup>422</sup>*

#### **2.2.2.2.4.2. Selaheddîn Di Helbestên Cegerxwîn De:**

Ji dîwana pêşî de Cegerxwîn berê xwe daye dîrokê û Selaheddîn kiriye kesayetiyeke giring di helbestên xwe de, pirê caran pesnê wî daye û xwe pê payebilind dîtiye û carna jî gilî û gazinan jê kiriye. Di helbesteke xwe de ku bi navê BERSIVA EBDILXALIQ ESÎRÎ ye ew helbestvanê ku li Silêmaniyê dijiya, pesnê wî dide û bandora nivîsandinên wî ku lê bûne pir giranbuha dinirxîne, ta dighê asta

<sup>421</sup> - Cegerxwîn, *Sewra Azadî*, r. 130.

<sup>422</sup> - Cegerxwîn, *Hêvî*, r. 28.

ku 100 kes mîna Selaheddîn bi giranbuhaya xwe û 500 kesên weke Ebû Muslim ê Xurasanî nagihin wê hêza xweşxewanê Esîrî. Ne ku Cegerxwîn dixwaze ji nirxê van herdû qehremanan kêmbike, lê feqet wî dixwest Ebdulxaliq û nivîsandinên wî bilind binirxîne, wiha di helbest a xwe de dibêje:

***Sed Selaheddîn û pêsed wek Ebû-mislîm hebin,  
Faîde hîç bo me nadin setwet û şahanî tû.***<sup>423</sup>

Cegerxwîn mêrxasî, payedarî, şanazî, serbilindî, şarezayî û sinç û hişmendiya Selaheddîn û yên millet û welatê xwe, ne tenê nêzîkî hev didîtin, lê belê didîta ku herdû du rewanên yek laşîne. Ji bona teqezkirin û çespondina vê yekê jî, ez ê vê mînakê ji helbesta wî ŞAM ŞEKIR E WELAT ŞÊRÎNTIR E berdestî we bikim.

Tê zanîn ku buhatirîn tişt di dinyayê de welat e, wiha jî tê zanîn ku buhatirîn kes di jîndaran de mirov e û tiştê herî bilind di laşê mirov de serî ye û tiştê herî buha ku li ser serî têtê danîn tac e. De ka em bibînin bê Cegerxwîn ê ku welatê xwe kiriye bûka cîhanê seranser, bi çi awayî ew welat û Selaheddîn bi hev ve girêdaye dema ku dibêje:

***Welatê min tiwî bûka cîhanî  
Hemî bax û bihişt û mêrg û kanî  
Şepal û şeng û şox û naz û gewrî  
Gelek şêrîn û rind û pir ciwanî  
Serî taca Selaheddînê kurdî  
Enî roj e di birca asîman î***<sup>424</sup>

Di helbesteke din de jî di dîwana xwe ya duwem de, di bin navê HEY QEHREMAN MILETÊ KURD ya bi naveroka xwe dilgermiyekê diyar dike, nav di xelkê xwe dide ku bi şoreşekê rabin, gazinan ji xemsariya wan dike û wan agahdar dike ku dijmin şûnawarê wan girtiye, gereke rawestan di kar û xebata wan de nebe.

<sup>423</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 97.

<sup>424</sup> - Cegerxwîn, **Sewra Azadî**, r.42.

Çiku maf tèn stendin nayên dan, gazin dike û diqîre: çawa hûn zarwên Selaheddîn in û ketine vê rewşê?

***Heyf e tu kurê Rustem û Guhderz û Silahî***

***Îro di gundê beg û axa de felahî<sup>425</sup>***

ev dîsgotin ta dawiya helbestê dúbare dibe, ev jî teqezekirineke ji helbestvan bo guhdarê wî, ku giring e ew herdem bimîne lawê serwerên hêja, ên mînayî Selahiddîn; yê ku wan kire girekên rojhilat û niha bûne karker û cotkar bi nan û zikê li cem beg û axan kar dikin. Çawa ew qehreman û leheng îro qebûl dikin ku bi zimanekî biyanî dûrî zimanê xwe biaxifîn, pir şerm e ku îro di bin vê riswabûnê de bêdeng rawestiyane, welatê wan dinale!! Bi vê dúbarekirinê dixwaze nav di wan bide ku bi rûmet rabin kar û xebatê di ber bidestxistina mafên xwe de bikin.. Wiha jî wan qehremanan û cengên serkeftinên wan bi nav dike mîna Cenga Hettîn ya ku hişt navê Selaheddîn li çarhawîr ê cîhanê belav bibe û bibe lehengekî bêhempa ku nayê şikandin:

***Roja şerê Hettîn û kerek xoş me tu difî***

***Tarîx ji me re dayiye zanîn tu egîtî***

***Bermayê Med û Sobar û kurê Nayrî û Sîfî***

***Îro tu metirs hemdem û hemxakê Sovîtî***

***Şerm e tu kurê Rustem û Guhderz û Silahî***

***Îro tu di gundê beg û axa de felahî<sup>426</sup>***

Ti zor di têngiştina vê helbestê de tune, ew weke çîrokekê ji halê Kurdan re ye, peyvin asan û têngiştî bikar anîne da karibe bandora xwe li xelkê bike ku wan gurr bike ji bo karibin li ber dijmin rabin û jiyanêke xweş û azad layiqî neviyên wan qehremanan bi destxînin.

Ew bîroke (fikre) di helbesta DI QEYD Û BENDAN RANAZIM tê dúbarekirin, ev helbesta ku bi serbilindiya welat û netewa xwe ya kurdî dagirtî, bi

---

<sup>425</sup> - h.b., r.13.

<sup>426</sup> - h.b., r. 14.



xemgîniya li ser rewşa ku millet gihayê, dîsa helbestvanê me xwe payebilind dibîne ku ew kurê Selahiddîn û wan lehengan e, ewên ku dîrokeke ronîdar çêkirine. Ew bi zimanê pirjimar "em" dipeyive; û bi navê milletê xwe, xwe payedar û şanaz dibîne û geh jî gazin û lomanan dike, çawa ew hemî ji dijmin re bûne dergevan, tevî diyarkirina ku Kurd aştîxwaz in û dostên azadîxwazan e:

*Em kurd in, kurdên navdar serbilind û efrazin*

*Xewa me nayê li newalê kûr di qeyd û bendan ranazin*

*Em kurên Selahidîn, Erdeşîr, keykawis, û Xesro*

*Çiman ji dijmin re tev dergevan û cilwezî<sup>427</sup>*

Piraniya helbestên ku Selaheddîn di wan de hatiye, helbestên payebilindiyê ne li gel gazin û lomanan û hin carinan bo kar û xebatê di ber maf û azadiyê de ne. Di helbesta KURDO SERÊ XWE RAKE ji Kurdo dixwaze ku serî rake, ji ber milletê xwe fedî neke, bi hemû hêza xwe bike qarîn, azadî û serxwebûna xwe bixwaze. Wiha jî tê de rexneyê li rewşa civakî ya paşketî dike û dibîne ku beg û axa û çûyîna li pey şêx û melan sedemên van nexweşî û paşketinê ne. Ji bo avakirina welatekî, guhdana bi zanîn û zanistê pêdivî ye, gereke em bi zimanê xwe biaxivin, dîroka xwe bixwînin, guhdanê bi çand û wêje bikin ta ku karibin bi gavin xurt bi pêş ve herin çiku em neviyên Selaheddîn in, lehengên Hettîn in û niha em çilmisîne, tiştê ji destê me nayê:

*Ez dixwazim serxwebûn*

*Heta kengî perçebûn*

*Nevyê Silahiddîn im*

*Ez gernasê Hettîn im*

*Ola min e azadî*

*Ez dixwazim dilşadî<sup>428</sup>*

Taybetmendiyeke helbesta TARÎXA SULTAN SELAHEDDÎNÊ KURDÎ heye ji aliyê girêdana wê bi Selaheddîn û malbata wî ve. Ew weke çîrokekê ji dîroka

<sup>427</sup>- Cegerxwîn, *Kîme ez*, r. 26.

<sup>428</sup>- Cegerxwîn, *Aştî*, r. 29.

wan a dirêj re ye, ya bi serkeftinan dagirtî. Helbest bi zimanekî hêsan hatiye nivîsandin, ta di cîna de dûrî zimanê helbestê dikeve û dibe deqeke dîrokî bi xwe. Helbest bi peyva "çiya" dest pê dike, ev peyva ku bi dîroka kurdan ve girêdayî ye û cih û war û erdnîgariya wan bihtir nîşan dike, dema dibêje "çiyayê kurd", naxwe çiya kurd e, ev çiyayê ku rojê nû jê hilat û Yemen û Xelat ronî kirin. Rewanbêjiyeke xweş û şebihandîneke spehî bi karaniye, wî Selaheddîn bi rojê şebihandîye û xebat û serkeftinên wî bi ronîya ku li wê firehiya xakê belav bûye, li vir weke ew dixwaze bêje ku desthilatiya wî ji Xelatê dest pê dike ji alî bakur ve ta bigihîje Yemenê li başûrî Cezîra Erebî:

*Ji çiya yê Kurd rojek nû hilat*

*Şewqa xwe da bû Yemen û Xelat*

*Selaheddîn ê Eyyûb ê Şadî*

*Bav û bapîr tev xelkê Rewadî<sup>429</sup>*

Li vir Cegerxwîn neseba Eyûbiyan destnîşan dike, dibêje ku ew Rewadî ne û dide zanîn ku ewî zanyariyên xwe ji pirtûka " Ibn'l-Esîr el-Cezerî, el-Kamil Fi't-Tarîx " standine.<sup>430</sup> Gava ku em herdû deqên Ibn el-Esîr û helbesta Cegerxwîn bidin ber hev, em dê bibînin ku eger ne ji hin pêdiviyên pêkanîna wêneyên wêjeyî û avakirina hîmên helbestê buwana, me dê bidîta ku herdû deq bigir yekin, ji aliyekî din ve ew peywendîya di navbera Şêrgoh û Selaheddîn de teqeze dike û bandora Şêrgoh li kesayetiya Selaheddîn destnîşan dike.

Cegerxwîn çîrokekê dibêje ku bi Şêrgoh re derbas bûye; dema Şêrgoh diçe nêçîrê qêrîna pîrekekê seh dike, xwe li deng digre dibîne ku zilamek dixwaze namûsa wê jinê bînpê bike, ew bi şûr wî zilamî di cih de dikuje. Bi vê mêrxasiya Şêrgoh, Cegerxwîn dixwaze bêje ku ev kar ji nîşanên sinc û şeref û xîreta kurdî ye, lê tiştê balkêş ku dengê pîrekê bi xurtbûna xwe çiya dişkandin û diherifandin.

Cegerxwîn li ser şûrê Şêrgoh dibêje ku ew kermanî bû; yanî ji Kermensaha Îranê ye, ew şûrên ku pir bi nav û deng bûn:

<sup>429</sup> - Cegerxwîn, *Sewra Azadî*, r. 126.

<sup>430</sup> - Ibni'l-Esîr, c.10, r. 16.

*Çiya dişkandin wî dengê pir jar  
jinek girtibû mêrekî bedkar*

*Ji kalên derxist şûrê kermanî  
Canê ê bedkar ji ten deranî<sup>431</sup>*

Tiştên Cegerxwîn gotiye li ser şer û ceng û serketinên Şêrgoh û Selaheddîn bi xaçperest û hêzên misriyan re ku di bin femandariya Dirxam de bûn û gotinên Ibn El Esîr wekî hev hatine : "Eseduddîn bi leşkerên xwe ve tevî misilmanên ku bi şûnde mabûn girtin ser leşkerê firengên siwar û peya û bi hêza şûrên xwe wan berbat kirin, yên kuştin û yên birîndar kirin. Dema Fireng vejeriyan, dîtin ku leşkerên wan tev têkçûne û ti kes ji wan li wê erdê nemaye, ew bi xwe jî ji desthilanînê ketin û beropaş rengsikestî reviyar. Encama vî şerî giran bû yek ji ecêbtirîn bûyerên ku di dîrokê de hatine nivîsandin; çawa ku 2000 siwar karîbûn leşkerê Misirî û firengên beravê têk bibin"!!<sup>432</sup>De ka em helbesta Cegerxwîn bixwînin bê çî gotiye:

*Leşkerê Derxam, leşkerê Fireng  
Hatî ber bi wan bi qêrîn û deng*

*Leşkerê Şêrgoh li wan deger bû  
Rengê Firingan ji nû ve zer bû*

*Di ser laşan re diristin tilûr  
Tivîn ji Tîran şingênî ji şûr*

*Toza ber lîngan li jor bû hewrav  
Kurd û Turkeman li wan kirin rav*

*Mêrê çê ew bû çû welatê xwe  
Kete nav dar û ber û tatê xwe*

---

431- Cegerxwîn, **Sewra Azadî**, r. 126.

432- Ibni'l-Esîr, h.b., c.10, r. 4.

*Jinên gelean mane jinebî*

*Zar û zêçên wan pîr mane sêwî<sup>433</sup>*

Ev helbest cengeke di navbera leşkerên ku bi serkêşiya Şêrgoh bû û leşkerên Misrî û Firengan de berçav dike, têkçûna Firengan tevî hêlehêla wan ya giran di destpêka şer de, li ber me radixe çawa ku Şêrgoh tirs xiste nava wan û ew şikandin, ji kuştîyên pîr teyr û tilûr li asîmanan li ser termên wan diristin. Di vê cengê de gelek ji zarokên dijmin sêwî man û pîrekên wan mane jinbî. Dema dijmin şikest û belawela bû, Şawir hukmê Misrê bi dest xwe xist û hişt ku hin xaçperest li Misrê bimînin. Lê ji ber zilm û zora ku wî û leşker û derdorên wî li millet dikirin, hişt ku Şêrgoh careke din hêzekê bi xwe re bibe û berê xwe bide Misrê, Şawir ji ser hikum bavêje û Selaheddîn li şûnê deyne, weke ku Ibn'l-Esîr dibêje:

"Şawir fermana şewitandina bajarê Misrê da û biryar stand ku xelk herin bajarê Qahîre û wiha jî welat bê şelûkirin, xelk li ser rîyan man, bajar hat şelûkirin û xelkên wî feqîr bûn, mal û milkê wan çûn û xweşiya wan jî pê re, ev hemî berî ku fireng bighên wir bi rojekê, ji tîrsa ku fireng dest deynin ser, agir 54 rojan ma bajar dişewitand û Xelîfeyê el-'Adîd hewara xwe gihand Nûreddîn û lawaziya misilmanan jêre şirove kir û bi nameya xwe re porê pîrekan şand û got: Ev porê pîrekên min in, ji qesra min in, hewarî te dikin da tu wan ji firengan xelasbikî. Nûreddîn rabû dest bi şandina leşkeran kir..."<sup>434</sup> û Ibn'l-Esîr bûyeran didomîne ta Selaheddîn dighê hukum û serkeftin bi dû serkeftinan de bi dest xwe dixîne. Li vir Cegerxwîn dibêje:

*Şêrgoh siwar bû bi şûr û bi rim*

*Pesnê xwe veda dîsa bi himhim*

*Simmê hespên me tozê bidêrin*

*Serê firengan dîsa bihêrin*

*Ji min re bankin şêr Silaheddîn*

*Çalak û mêrkuj, xort û sefdirrîn*

---

433- Cegerxwîn, *Sewra Azadî*, r. 127-128.

434 -Ibni'l-Esîr, h.b., c.10, r. 12-13.

*Yûsif hate cem bi dilgiranî*

*Destê xwe li ber li ser hev danî*

*Fermanke Paşa, mêrê roja reş*

*Wî lê vegerand bi zimanê xweş*

*Keçan porê xwe kirne diyarî*

*Kaxez reş kirne bi ah û zarî*

*Divêm siwar bî wek pehlewana*

*Ap û birazî herin ser wana<sup>435</sup>*

Em dûrî rastiye nakevin gava ku em bêjin Cegerxwîn bi hostayî, pisporî û hem jî bi rêk û pêk mafê malbata Eyûbî bi tevayî û mafê herdû lehengên wê Selaheddîn û Şêrgoh bi taybetî daye wan di helbest û nivîsên xwe de.

Cegerxwîn di helbestên xwe yê li ser Selaheddîn ku hûna bû, dixwest qehremanî, mêrxasî û nesla wî ya kurdî teqeze bike û bike navtêdanek ji neviyên wî re, ku berdewamiya xebat û kêferatê di ber mafên xwe de bikin û li dijî zordestiyê, bindestiyê û sitemkariyê rawestin, ji ber Selaheddîn di çavên wî de simbola mêrxasî, wefadarî û yekîtiya millet e. Ji ber ku Cegerxwîn ji gel re dinivîsand, gotinên wî di helbestan de hêsan bûn da ku piraniya gel xweş di wan de bigihên û ji ber wiha jî, Hevokên wî bi hêsanî û rewanbêjî diherikin.

Naverok û bîrok gelek caran zora pêdiviyên rewanbêjiya helbestê dibirin, ji ber wî dixwest ku ramanên xwe bi sivikayî bigihîne xwendevanan û bi peyvînen hêsan jî bûyeran şirove bike.

---

435- Cegerxwîn, *Sewra Azadî*, r. 128-129.

### III. BEŞA SÊYEM

## KURD Û RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA WAN A NÛJEN Û HEVDEM DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE

Di nivê duyem de ji sedsala 15an ya z., pir pêşketin û bûyerên mezin çêbûn, wek têkçûna Qostentîniyê (Istanbul) paytextê Bîzentayê bi destê siltanê Osmanî Muhemmed Fatih 1453 z. û keşafa Parzemîna Emerîkayê di heman dema têkçûna Xirnata, sengerawî ya misilmana li Ispaniya (Endelus) de sala 1492 z., ev bûyerên ku dîroknas dehfdan ku ew hesêb bikin xala destpêka dîroka nû.

Ji pirbûna bûyerên vê serdemê û ji bo hesankirina xwendin û lêkolînên li ser wana, dîroknûsan ev serdem dabeşî du deman kirin, navê dema yekem kirin dîroka nûjen û navê dema duyem kirin dîroka hevdem û şoreşa firensî ya sala 1789 z., hesêb kirin sînore di navbera herdû deman de.<sup>436</sup>

### 3.1. ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDÎ YA NÛJEN:

Çi lêkolînerê ku bivê hinekî di dîroka Kurd ya nûjen de mijûl bibe, wê xwe bibîne ku bêgave ew gelek rûpelên dîroka osmanî bixwîne ta karibe bighê tiştên girêdayî bi dîrok û welatê kurdan ve, ew dîroka ku di piranîya xwe de bi pênuşa dîrokvanên sultanên osmanî, yan jî bi ên pir nêzîkî kesayetîyên wan, yan jî bi yê hevalbendên rêbaza wan hatiye nivîsîn, lewra jî ew nivîsîn hewceyî xwendineke pir bihûrbînî û lêveger û werbêj kirine.

<sup>436</sup>- Muhemmed Xerîb Cûde, Mûcezu Tarîx'l-'Alemlî bi's-Senewatî we'l-Ehdas, mektebetu'l-Quran, el-Qahîra, (b.m.), r. 172, 174, 195.

Ji dema ketina Qostentînîyê bi destê Muhemmed Fatih û vir ve, dewleta osmanî dest bi ketina şer û pevçûnan kir bi armanca zêdebûn û firehkirina cîwarên desthilatdariya xwe û nemaze bialîyê Ewropa ve û di encama wan şeran de gelek serkeftin bi dest xwe xist ta gihşte astekê ku berfirehiya Impiratorîya Osmanî di sala 1481z. de, di dema koçkirina Sultan Muhemmed Fatih de gihişte 2214000k.m<sup>2</sup>. Berî ku nakokî di nav zarwên wî de dest pê bike dema ku kurê wî yê biçûk (Cem) îcre (i'tîraf) bi sultaniya birayê xwe Bayezîd ê duyem ne kir û bazda û çû nav Memlûkiyên Misrê û dest bi gerr û çûn û hatina di navbera Misir û Şam û dewleta Osmanî û Bunduqîye bê rawestan kir ta ku li Napolî ya Îtalî koçkirina dawî kir di sala 1945an de.

Lê Bayezîd û ji roja pêşî ku kete ser textê sultanîyetê, ewî di şer û pevçûna de berdewam kir, ta ku di dawîyê de bêgav bû ku peymaneke lihevhatinê di sala 1503z. bi dewletên Ewropayî re imza bike, ew peyman 20 salan dirêj kir û bû sedema ku dewleta Osmanî ji rojava berê xwe bide rojhilat.<sup>437</sup>

Li dor sedema rasteqîne ji berguhêzîya Osmaniyan ji alî rojava ve bi alî rojhilat ve, çend nêrînên ciyawaz derketin holê, nêrînek ew bû ku Osmanî li meydanên nû ji xwe re digerîyan, nêrînek dî jî ew bû ku Osmanîyan diviyan ew pêlên bayê şî'î ku ji aliyê sefewiyan ve dihat bi aliyê wan ve rawestînin, nêrînek dîtir jî hebû ku digot Osmaniyan berê xwe dane rojhilat, ji bo parastina cîwarên xwe ji êrîşên Ewropiyan bikin û nemaze ji êrîşên portugali ku hêdî hêdî astengiyê dikin û metirsiyekê çêdikin li ser rêyên bazirganiyê...h.d.<sup>438</sup>

Li aliyê din, dewleta Sefewî dest bi tekûzkirin û xurtkirina hîmên damezrandina xwe dikir bi taybetî ji destpêka ku Şah Isma'îlê Sefewî bû serkêşê dewletê (1501-1524). Karê yekemîn ku şah Isma'îl pê rebû, ew bû ku xwe ji malbata Aliq Qoyinlo ya turkmanî di hundurê Îranê de xilaskir. Karê duyemîn ew bû ku mezhebê şî'î di Îranê de ferz kir, karê sêyemîn, berê xwe da aliyê Kurdistanê û di sala 1506an de kete şerekî bi malbata Mukiryani ya kurdî re, lê ew di wî şerî de şikest li hemberî leşkerê Mukiryani yê ku biserdariya Sarim ê Kurê Seyfiddîn ê Mukiryani

<sup>437</sup> - Yelmaç Oztûna, **Tarîxu'd-Dewleti'l-Osmanîye**, ter. Ednan Mehmûd Sulêman, c. 1, mûessesetu Feysel li't-Temwîl/tebi' şerîketu'l-Hîlal el-Musahîme, Istanbul 1990, r. 178, 185-188, 197-200.

<sup>438</sup> - Isma'îl Yaxî, **ed-Dewletu' l-Osmanîyetî fi't-Tarîxi'l-Islamîyi'l-Hedîs**, mektebetu'l-Ikîban, er-Riyad 1996, r. 26-28.

bû, piştî hingê leşkerê Sefewî êrîş bire ser Mer'eş û parêzgeha (wilayeta) Bistan ya di bin desthilatdariya Memlûkiyan de û dîvre kete Diyarbekir û cîgîrê xwe lê dest nîşan kir û berê xwe da dagirkirina Bexdayê û di hingê de şert û mercên dagirkirinê jê re hesan bûn û di sala 1508an de kete Bexdayê û heçî desthilatdarê ku ji malbata Aliq Qoyinlo re hebû bi dawî anî û bin pê kir û sîwana hukumdariya xwe li seranserî Îraq û Îranê veda û bi vî rengî dewleta Sefewî bû sînordaşê mezintirîn hêzên wê serdemê; dewleta Osmanî û dewleta Memlûkiyan.<sup>439</sup>

### 3.1.1. Çildêran û Destpêka Dabeşkirinê:

Mîrov kare şerê Çaldîranê yê sala 1514an de ku rûdaw dabû, ji bûyerên dîrokiyê herî girîng hesêb bike, di dîroka kurdî ya nuh de, ji ber encama vî şerî ew bû ku Osmanî û Sefewiyên ku şerê hev dikirin, herdu bûne yek û welatê Kurdistan li xwe par vekirin û wan hiştin dagirkirî di bin destên xwe de lawaz bû bêhêz û sitambar.

Sultan Bayezîdê duyem, dev ji sultanîyê berda û xiste destê kurê xwe Yawûz Selîm di 24 Nîsana 1512an de bi sedema nexweşiya xwe ya zor ku piştî mehek û du rojan ew kuşt di 26 gulana 1512an de. Piştî ku Yawûz kete ser textê sultanîyê, ji nû ve nakokiyê bi rengê xurtir ji berê dest pê kir di nav Osmanî û Sefewiyên de û pêxistina şerekî nû di navbera wan de hate ber çavan.

Her yek ji wana dest bi karûbarê amadebûna xwe ji şer re kir, Sultan Yawûz destpêka haziriya xwe ji cengê re, bi dîrxistina bira û biraziyên xwe û xelasbûniya xwe ji wana bi temamî kir ji tîrsa ku ew de'wa textê wî bikin. Li aliyê din jî Şah Isma'îlê Sefewî, ewî jî mîna Sultan Yawûz kir û dest bi firehkirina sînorê dewleta Îranê kir ta ku di destpêka sedsala 16an de sînorê dewleta xwe gihande rojhilatê Efganistanê û hin beşin ji Qefqas û Îraq û Îhsa'ê (li Cezîra Erebi) û welatê Kurdistan li rojhilatê Enadolê.<sup>440</sup>

<sup>439</sup> - Muhammed Suhêl Teqqûş, *Tarîxu'd-Dewleti's-Sefewîyetî fî Îran (907-1148h./1501-1736m.)*, daru'n-Nefa'is, Beyrût 2009, r. 58-60.

<sup>440</sup> - Oztûna, h.b., r. 202.



Herdû dewlet dijî hev ketin cengan, leşkerê dewleta Osmanî karibû zora Sefewiyan bibe di şerê Çaldîran de di sala 1514an de ku dikeve nivê rêya Tebrîz û Gola Ormiya û kete paytexta wan (Tebrîz) û Azerbeycan û hin herêmin din jî kontrol bike û di nêv wan herêman de welatê kurdan jî.

Lê belê ew şer di encamê de ne bû sedema têkçûna dewleta Sefwî ta bi dawiyê ji ber ku şahê Sefewî karibû careke din Tebrîz û Azerbeycanê vegerîne û ji dest Osmaniyan Azad ke, nemaze ku di wê çaxê de (keş û bayên xuiristê) qet ne alîkarbûn ku şerê di navbera wan de berdewam bike. Lewra Sultan Selîm vegehiya Enedolê û rabû di Kurdistanê de wilayetek damezirand û serkêşiya wê xiste destê Beg Muhemmed Paşa ji bo pêkanîna du armancan bi hev re, armanca yekem ji bo desthilatdariya Osmanî tê de xurtir û bi hêztir bike û armanca duyem ji bo rê bigre li ber pêşketina desthilatdariya Sefewî di herêmê de. Ev ji aliyê Sultan Selîm ve, lê ji aliyê şah Isma'îl ve, wî qet hewl neda ku bikeve tu şerên nû bi Osmaniyan re di wê demê de û ji ber wihan jî desthilatdariya Sefewiyan li Kurdistanê kêmtir û lawaz bû.<sup>441</sup>

Piştî hingê, Sultan Selîm bi hemî qewet û hêza xwe berê xwe da memlûkiyan û karibû serkeftinên girîng biserkeve û destxistiyên mezin bi dest xwe xîne, nemaze serkeftina wî di cenga Merc Dabîq nêzî Helebê sala 1516an de ku di encam de, şam kete destê wî û paşê serkeftina wî di cenga Rêdanîyê de di sala 1517an de, ku di encam de Misir jî kete bin destê wî tevî bermayên desthilatdariya Memlûkiyan ku di Hicaz û Yemenê de jî mabûn. bi vî rengî, Sultan Selîm û dewleta wî bûne desthilatdarê cîhana islamê tevî û helbet ev tişt bû ciyê nerazîbûn û diltengiya Sefewiyan û dîtin ku ev serkeftinên Osmanî metirsiyan tînin ser dewleta wan.<sup>442</sup>

### 3.1.2 Mîrneşînên Kurdî Di Serdema Osmaniyan De:

Piştî şerê Çaldîranê, Kurdan hukmê otonomî wergirtin û eşîr û qebîleyên kurd bûne wek eniya berevaniyek girîng û pêbawer li ser sînorê dewleta Osmanî û sultanê

<sup>441</sup>- Mehmûd Muhemmed el-Hiwêrî, **Tarîxu'd-Dewleti'l-Osmanîyetî fi'l-'Isûri'l-Wista**, el-Mektebu'l-Mesrî, el-Qahîra 2002, r. 205-207.

<sup>442</sup>- Muhemmed 'Ebdulletîf Hirêdî, **el-Hirûb el-Osmanîyetî'l-Farisîyetî we Eseruha fî Inhîsari'l-Meddi'l-Islamiyî 'En Ewropa**, daru's-Sehwe, el-Qahîra 1987, r. 54. Yaxî, h.b., r. 59-61.

Osmanî xwe piştrast kir ku ew eniya kurdî, dê wî û dewleta wî bi parêze ji hemî xeter û metirsîyên ku ji alî Sefewîyan ve bêne wan.

Birastî jî kurd û kurdistan di wê çaxê de di aramî û seqamgêriyê de, demeke dûr û dirêj dijiyan, nemaze piştî ku Îdrîsê Bedlîsî Sultan Selîm razî kir ku ew hukmê otonomî bide kurdan û pêşberî vê danê, kurd jî serdarî û serpirîştîya dewleta Osmanî –tev bi nav tenê be jî- li ser xwe îcre bikin û hin alîkariyên darayî û leşkerî ji dewletê re pêşkêşbikin.

Ev lihevkerin, razîbûna serok û giregirên kurda jî wergirt û wan hesêbkirin ku ew gotûbêjê di navbera Bedlîsî û Selîm pêkhatibûn wek peymaneke fermî û bi hin bendên nîşankirî.<sup>443</sup> Lê vê paşiyê xuyakir ku çî tiştê li ser rêz û bendên wê lihevhatinê hatibû gotin, hemî têgihîştinên kesayetîbûn, ji ber ku ti tiştêkî fermî nehatibû nivîsîn û hemî tiştên ku hatibûn gotûbêjkerin, ne bêhtir ji hin sozên devkikî û ji alîyêkî bi tenêbûn.<sup>444</sup>

Li aliyê din, Şah Isma'îlê Sefewî berûvajiyê Sultan Selîm kardikir, ewî her û her hewl didan ku rêveberiya herêmên kurdî bêxe destê Turkuman û Farisan, tevî ku geleg asteng û kelem diketin rêya wî ji bo cîbicîkirina vê pirojeyê ji bilî herêma ku di bin hukmê malbata Erdelan de bû, ewî destûr da wan ku ew xwebixwe rêveberiya herêma xwe bikin.<sup>445</sup>

Şerê Çaldîran, bandoreke kûr û dûr di guherîna halê kurdan de kir, ji wan guherîna 25 qebîleyên kurd bûn hevalbendên dewleta Osmanî li gorî peymaneke ku di nav wan û Sultan Selîm de hate girêdan û bi vê yekê du par ji sisiyan ji herêmên kurdî ketin bin desthilatdariya (hukmê) Osmanîyan û li aliyê din, qebîleyên ku li bakûrî rojhilata çiyayên Zagros dijîyan-ku ew eynî herêmên kurdîyên îrohinin li Îrana îro- ketin bin desthilatdariya Sefewîyan.

---

<sup>443</sup>- Ji bo bendên vê peymanê, bnr. Zekî, **Xulasetû Tarîxûl-Kurdî we Kurdistan**, c. 1, r. 149 (dehmen1).

<sup>444</sup>- Se'dî Osman Herutî, **Kurdistan we'l-Imbîratoriyeti'l-Osmanîye – Dîrasetun fî Tetewwirî Siyaseti'l-Heymeneti'l-Osmanîyetî fî Kurdistan (1514-1851m.)**, metbe'etu Xanî/mûessesetu Mukiryani, Dihok 2008, r. 63.

<sup>445</sup>- Dêvîd Mekdul, **Tarîxu'l-Ekradi'l-Hedîs**, ter. Rajal Muhammed, Daru'l-Farabî, Beyrût 2004, r. 67-69

Peywendiyên di navbera Kurdan û Osmaniyan û Sefewiyan de, di navbera sistkirin û şidandinê de derbas dibûn li gorî berjewendiyên kurdî ji alîkî ve û li gorî siyaseta ku her hukûmeteka Osmanî yan jî Sefewî li gorî berjewendiyên xwe bi Kurdan re dimeşandin ji alîkî din ve, nemaze di meseleyên bacstandin û leşkeriya neçarî û karên suxre de, digel hin karin din jî.

Hin dem û delîve pêk hatin ji kurdan re ku ew bibin hêza sereke û tund di navbera sînorê herdû dewletên osmanî û sefewî de û li gorî texmîna hinan, 16 mîrneşîn û hukûmetên wan çêbûn<sup>446</sup>, lê di rastiyê de jimara wan bêhtir bû ji wiha, ew mîrneşîn jî ev in:

**- Mîrneşînên bakûrê kurdistanê:**

Mîrneşîna Bezûkî li bakûrê gola wanê, mîrneşîna Cemşegezk li bakûrî Melatya ku Dêrsim û dormedarê wî jî di nav de bûn, mîrneşîna Sêvdiya (Siwêdiyê) li rojavayê Mûşê, mîrneşîna Silêvanî di navbera Mûşê û Diyarbekir de, Mîrneşîna Egîl li bakûrê Diyarbekir, mîrneşîna Palo li bajarê Palo ya bakûrê Diyarbekir, mîrneşîna Çermok li navbera Diyarbekir û Melatya, mîrneşîna Mehmûdî li rojhilatê gola Wanê, mîrneşîna Bedlîsê li başûrê rojavayê gola Wanê, mîrneşîna Sasûn li rojavayê Bedlîsê, mîrneşîna Xîzan li başûrê rojavayê Wanê, mîrneşîna Muks li başûrê gola Wanê, mîrneşîna Ispayird (Sparot) li başûrê Bedlîsê, mîrneşîna Şêrwan li bakûrî bajarê Si'irt/Sêrtê û navenda wê Kefra, mîrneşîna Hekarî li başûrê rojhilatê mîrneşîna Şêrwan, ku pêk dihat ji Hekarî û Şemdînan û Colemêrg navenda mîrneşînê bû, mîrneşîna Hesenkêf li rojhilatê Diyarbekir, mîrneşîna Botan li Cizîrê (Cizre), mîrneşîna Zerkî/Zerqî di navbera Diyarbekir û Mêrdînê de, ku parve dibû: (Derzînî, Hetax/Etaq, Tercîl), mîrneşîna Kilîs li bakûrî Helebê.

**- Mîrneşînên rojhilatî Kurdistanê:**

mîrneşîna Dimbilî li bakûrê rojavayê gola Ormiya, mîrneşîna Biradost li rojavayê gola Ormiya, mîrneşîna Mukiryana, mîrneşîna Bane li başûrê mîrneşîna Mukiryana, mîrneşîna Gelhor li bakûrê Loristanê, mîrneşîna Loristan a biçûk.

---

<sup>446</sup> - Mekdul, h.b., r. 69.

### - Mîrneşîna başûrê Kurdistanê:

mîrneşîna Badînan li başûrê mîrneşîna Hekarî û navenda wê Amêdîye, mîrneşîna Soran li başûrê mîrneşîna Badînan di navbera çemê Zab a jor û Zab a jêr, mîrneşîna Baban li rojhilatê mîrneşîna Soran, mîrneşîna Erdelan ku hukum li Şarezorê dikir, mîrneşîna Dasînî û ew bi xwe biçûk bû û dihok jî di nav de bû, ev mîrneşîn bi dawî hat bi Encama nakokiyên wê bi mîrneşîna Badînan re.<sup>447</sup>

Astên akamkirina her mîrneşîneka kurdî di herikandîna bûyerên dîrokî de û bandora wê li wan bûyeran ne yeksane bû, belê cûrbecûr bû, hin ji wana xwedî bandoreke bi hêz bûn û hin jî, ji wa lawaz û xwecihî bû, wek mînak; mîrneşîna Erdelan ya ku hukum li cîwar û herêmên fireh û pan û dûr dikir di nivê silsila Zagros û rojavayê wê de û paytextê wê senendec, Qebîleyên wê bi bûn du par, parek bûbû hevalbendê osmaniyan û parek bûbû hevalbendê sefewiyan û di encama vê yekê de, mîrneşîna wan bû meydana şer û nakokiyên ku di navbera sefewî û Osmaniyan de diqewimîn, ta ku waliyê wê Hiloxan bêgav bû, ku serê xwe ji Sultan Mûradxanê osmanî re deyne (1574-1595). Piştî hingê mîrneşîn ma di tenahî û seqamgêriyê de ta sala 1005k./1596z.<sup>448</sup>

Wiha jî, mîrneşîna Soran ya ku di dawiya sedsala 15an z. li ser destê Kalos hatibû damezrandin<sup>449</sup> û wê hukum li piraniya cîwar û herêmên di navbera Zab a jor û Zab a jêr de dikir ku Şeqlawa navenda mîrneşînê bû û hemî navçeyên Herîr û Balikyan û Rewandûz û hin cihên dî jî li bakûrî rojhilatî Erbilê pêve girêdayî bûn.<sup>450</sup> Ev mîrneşîn kete nakokiyên bi mîrneşînên kurdî yên sînordaşên xwe re ji alîkî ve û bi dewleta Osmanî re ji alîkî din ve.

---

<sup>447</sup>- b.f. li ser van mîrneşînan û sînoren wan û nakokiyên wan û têkiliyên wan bi Osmaniyan û Sefewyan re, bnr. Bedlîsî, h.b., r. 117-389. Herutî, h.b., r. 17-30. Kamîran 'Ebdssemed Doskî, **Kurdistan'il-Osmanîye fi'n-Nisfi'l-Ewwelî Mine'l-Qerni't-Tasi'î 'Eşer**, metbe'etu wezareti't-Terbîye, Hewlêr 2002, 91-117.

<sup>448</sup>- Mekdul, h.b., r. 67-68.

<sup>449</sup>- Bedlîsî, h.b., r. 263.

<sup>450</sup>-Herutî, h.b., r. 28-29.

Ji giringtirî mîrekên soran ku bandoreke wanî mezin li seqamgêrî û firehkirina mîrneşînê de hebû: şah Elî beg û mîr Seyfeddîn û mîr Hisên bûn.<sup>451</sup>

Tiştê balkêş ew e, ku tu belgeyên Osmnî behsa vê mîrneşînê bi navê wê yê rasteqînî navnîşan nakin, weke mîrneşînên dîtir, lê belê tenê wê bi navê mîrekên wê yê hukumdar bi nav dikan.

Lê mîrneşîna Baban ya ku pêkhat di dawiya sedsala 15an yan di destpêka sedsala 16an de, desthilatdariya wê bi başûr ve çû ta gihişte Kerkûkê, evê mîrneşînê tu helwîstên eşkere û zelal di sedsala 16an de ji alî dewleta Osmanî ve ne wergirt, ji ber wiha jî osmaniyan mîrneşîn têk birin û hemî Erd û milkên wê kirne milkên siltanî ta roja ku kesayetî ya berze: Feqe Ehmedê darişmanî ji malbata Baban ya 5an hate meydana û ji nûv re mîrneşîna Babanî li ser destê wî hate vejandin.<sup>452</sup>

Her çendî mîrneşînên kurdî bi gelemperî pêşde diçûn û geştir dibûn jî, lê carinan jî, di hin deman de û li hin ciyan bi paş de diçûn û lawaztir dibûn, weke mînak; gava ku Silêmanê yekem Qanûnî (1520-1566) kete ser textê sultaniyê, hin tevhevî li navça Bedlîsê di sala 1930î de rûdan, piştî ku Sultan Silêmanê Qanûnî ji mîrekên kurdan xwest ku xizmet û alîkariyan pêşkêş bikin ji (Olama Alteqelo)re ku wî navnîşan kiriye wek walîyê ser herdû mîrneşînên (Bedlîs, Hesenkêfa), piştî bazdana wî ji ber sefewiyan û pêgirtiya wî ji dewleta Osmanî re.

Kurdan ev tiştê han dîtî ku bînpêkirineke ji bendên girêbesta wan bi sultaniyê re, ji ber wiha jî, dijî vê biryarê rawestan û bi taybetî mîrekên Bedlîsê ku ketin şerekî berevaniyê dijî osmaniyan. Di encama vî şerî de kurd têk çûn û gelek ziyar dîtî, serdarê wan hate kuştin, leşkerê wan ji hev belawela bû. Lê osmaniyan berdewam nekirin di êriş û pêşveçûna bi alî Bedlîsê ve, lê berê xwe dane Wanê û di

---

<sup>451</sup> - b.f. li ser vê mîrneşînê. bnr. Bedlîsî, h.b., r. 263-270. Hisên Hisnî Mukiryani, **Mûcezu Tarîxî Ûmera'î Soran**, ter. Mihemed el-Melle 'Ebdulkerî, Bexdad (b.m.). 'Îmad 'Ebdusselam Re'ûf, **Dîrasatun Wesa'iqiyetun fî Tarîxî'l-Kurdî'l-Hedîsi we Hedarefîhihim**, daru'z-Zeman/et-Tefsîr, Dîmeşiq/Erbîl 2012, r. 243-265. Doskî, h.b., r. 97-103.

<sup>452</sup> - Se'dî Osman, **Îmartu Baban fi'n-Nisfî'l-Ewwelî mine'l-Qern 18- Dîrasatun fî 'Elaqatihe's-Siyasîye me'es-Sultati'l-Osmanîye**, (b. m., b. c.), r. 11-12. Û b.f. bnr. Hisên Nazim Bêk, **Tarîxu'l-Îmareti'l-Babanîye**, ter. Şikro Mustefa we Muhemmed el-Melle 'Ebdul'-Kerîm el-Muderris, metbe'etu wezaretî't-Terbîye/ mûessesetu Mukiryani, Erbîl 2001. -Herutî, h.b., r. 92-135. Re'ûf, h.b., r. 103-160.

sala 1534an de, gelek ji mîrekên ku nêzîkî Wanê bûn, hevalkariya xwe ji osmaniyan re eşkere kirin.

Wiha jî mîrê Bedlîsê yê nû (Şemsuddîn) weka wan kir dema ku Sultan Silêman berê xwe da sefewiyan û bê şer kete Tebrîzê û pişt re berê xwe da Bexdayê û ew kontrol kir û di rêya vegeerê de, dema gihişte Erbilê, Fermana bidarvekirina Ezdînşêr ê mîrê Soran kir û paşê ji mîr Şemsuddîn ê mîrê Bedlîsê xwest ku xwe ji mîrîtiyê bêxe û mîrneşîna xwe radestî (teslîmê) Olama Alteqelo bike, lê mîr Şemsuddîn daxwaza wî ne pejirand û xwe kire heval bendê sefewiyan.<sup>453</sup>

Sultan Silêman Qanûnî berê xwe da mîrneşîna Erdelan bi êrişên xurt û helmetên li dûhev ji destpêka sala 1537an û ta sala 1552, ji ber ku ew zêde ji firehbûna desthilatdariya vê mîrneşînê ditirsiya û hesabên mezin jê dikirin, lê wî nikarîbû wê radest bike, ta di sala 1554an de, dema ku mîrê wê hevalkariya xwe – bê şer û pevçûn- ji osmaniyan re eşkere ragihand.

Ji wê demê û vir de, welatê kurdan hate guhertin û bû gorepanek berdewam ji şer û nakokiyên giran di navbera sefewiyan û osmaniyan de û di encama wan şer û nakokiyên de, pir ji bajarên kurdan hatin hilweşandin û zad û dextlên wan hatin sotandin û pir ji nişteciyên wan hatin kuştin û gelek ji gundên wan hatin wêrankirin ta ku welatê kurdan ma bi tenê 5 wilayet /parêzgeh; (Erzerûm, Wan, Diyarbekir, Mûsil, Şehrezûr) û çend hukûmat û mîrneşînên ku xweseriya xwe parast bûn.<sup>454</sup>

Di sala 1683an de osmaniyan karîbûn peymaneke hevaltîyê di navbera xwe û 23 sê mîrekên kurd de girêdin û wan mîrekên kurd pabendî bi wê peymanê kirin û pişkdarî û hevka riyê kirin di hemî şerên ku dewleta Osmanî pê radibûn û di encamê de bi dehan ji lawên xwe bi gorî dan.<sup>455</sup>

---

<sup>453</sup> - Herutî, h.b., r. 81-85.

<sup>454</sup> - h.b., r. 86-90.

<sup>455</sup> - Ehmed Tacuddîn, **Tarîxu Şe'bin we Qediyyetin we Weten**, ed-Daru's-Seqafîyetî li'n-Neşir, el-Qahîra 2001, r. 85-86.

Lê Osmaniyan qet sozên xwe ne birin ser û paşê bi êrîşên xurt çûne ser wan mîrekan ûmîrneşînên wan yek bi yek li dû hev rûxandin û bi vî awayî berdewam kirin ta nivê sedsala 19an.<sup>456</sup>

Şer û nakokiyê di navbera osmaniyan û sefewiyan de berdewam kir û ne rawesta û herduwan bêhtir ji şerekî pevne kirin di navbera sedsalên 16-19an de û paşê her yek ji wana dest bi berêxwedana dewletên Ewropî ve kir bi hêvîbûna ku Ewropî belkî xizmeta berjewendiya wî bikin û li pêşberî vê yekê jî, dewletên Ewropî jî çavnêrî li rojhilata navîn dikirin ku ji xwe re cihê desthilatdariyê lê bibînin û dewletên têde ji xwe re parvekin û li hêviya derfetek xwe yê mûnasib bûn.<sup>457</sup>

Kurd wiha bi hesanî zûbizû radest nebûn, berevajî vê yekê, doz û daxwaz û viyanên azadbûnê ji desthilatdariya Osmaniyan û hem sefewiyan jî, di dilê wan de hêdî hêdî gurrbû û rabûn dest bi raperînan kirin. Sedemên sereke ji wan raperînan re, ew binpêkirina osmaniyan ji wan peymanan re bû ku bi kurdan re imze kiribûn û ew destwerdanên wan ên rasterast di karûbarên mîrneşînên kurdî de bûn û hin caran jî daxwaza hin mîrekên kurd di firehbûna sînorê mîrneşîna wan de bû û carnan jî daxwaza xweseriya mîrneşînê bi xwe bû, wek tevgera Bekir Begê Babanî di sala 1714an de.<sup>458</sup>

Rê û rêbaz û mîtodên vemirandina van raperînan cûrbecûrbûn, lê piraniya caran, desthilatdarên osmaniyan ew nelihevkirin û nakokiyên ku di navbera hin mîrekên kurda de hebûn, geş dikirin û ew berdidane hev û alîkariya mîrekî li dijî mîrekî din dikirin ji bo pêkanîna armanca xwe ya dawî ku ew jî; têkçûna mîrneşînê bi xwe bû. Weke mînak; osmaniyan çek û sîlah dane qebîla Zerzera ya ku li Mukiryar dijîyan li rojhilatî kurdistanê ji bona bikevne şerekî giran bi mîrneşîna Soran re û bi vî rengî şer di navbera wan de vêxistin, lê Zerzera di şer de bi serneketin û Soran gelek ji serbazên wan dîlkirin û zîyanên pir gihandin leşkerên wan.

---

<sup>456</sup>- Welîd, Hemîd **el-Kurd we Kurdistan fi'l-Wesa'qi'l-Birîtanîye**, Metabi'u Sicil'l-'Ereb, (b.c.), 1992, 16-18.

<sup>457</sup>-Mûsenna Emîr Qadir, **Qedaye'l-Qewmîyat we Eseruhe 'ele'l-'Elaqati'd-Diwelîye (el-Qedîyetu'l-Kurdîye Nemûzecen)**, merkez Kurdistan li'd-Dîrasati'l-Istiratîcîyetî, es-Sulêman îye 2003, r. 91.

<sup>458</sup>- Herutî, h.b., r. 183.

Di nav serbazên dîlkirî de, mîr lîwyekî Osmanî jî hebû û ev yeka han xweş tîne ber çav ku çawa destê osmaniyan di pêxistina vî şerî de hebû.

Wiha jî, osmaniyan bi mîrê Baban Selîm paşa re kir dema ku wî – û bi piştgiriya Nadir şah- (1736 – 1747) serê xwe ji desthilatdariya osmanî re ne danî, osmanî rabûn Ehmed Xan ê kurê Subhan û yerdî –ku mîrekî Erdelaniyê xwegirtiyê wî bû- şorkirin û serê wan germ kirin ku şerê Selîm paşa bikin, lê Selîm karîbû zora wan bibe û desthilatdariya wan bişkîne û hate jimartin ji xurtirîn serhildanê kurdî ku Baban serkêşiya wê di kir di orta sedsala 18an de.<sup>459</sup>

### **3.2. ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDÎ YA HEVDEM:**

Tu guherînên sereke neketin siyaseta sultanên osmanî bi alî Kurdan ve piştî sala 1789an de, her û her divan ku sûdê ji kurdan bigrin û wan berdî hev û di navbera wan de xirabiyê bikin û bi kurtebirî, her siyaseta "wan ji hev dûr bixin, winê bibin desthilatdarê wan" dijî wan bi rêve dibirin û heger di hin deman yan li hin cihan ew siyaset nerm yan hişk dibû jî, teqez ew ji bo pêkanîna hin tektîkên demkî yê demkî yan xwecihê bûn bi armanca ku parastinê li ser terazû ya di navbera hêz û qewetan de bikin û bi taybetî di navbera herdu qewetê sefawî û osmanî û nakokiyên wan yê dijî hev.

Lê li Îranê hukmê malbata Zendî ya kurdî ya şîî (1751-1794) di dawî ya xwe de bû û di halekî lawaz de bû. Qecerî (1794-1925) rabûn wê lawaziya wan ji xwe re dîtî delîveyeke giring ku xwe bikin desthilatdarên welêt û cihê zendiyan bigrin. Lê belê eger Qeceriyan karîbûn di destpêka hukmê xwe de bi tundî hukm bikin, lê di dawiyê de ew jî lawaz bûn û ew lawazî bû sedemê destpêkirina tevgerên çaksaziyê di welêt de. Giringtirîn çaksazî ew bû tiştên ku mîr (Mîrza Teqyeddîn) pê rabû, di destpêka sedsala 19an de.<sup>460</sup>

---

<sup>459</sup> - h.b., r. 95-96.

<sup>460</sup> - Elî Teter Tewfîq, **el-Heyatu's-Siyasiye fi Kurdistan (1908-1927)**, ter. Tehsîn Ibrahim ed-Doskî, metbe'etu Xanî, Dihok 2007, r. 56-57.



### 3.2.1. Serhildanên Kurdî Li Dijî Desthilatdariya Osmanî De:

Serhildanên Kurdî dest bi zêdebûnê kirin ji despêka Dîroka hevdem û vir de. Bi sedema gelek egerên ku hatine ferzkirin ser kurdan ji ber encamên wan siyasetên ku dijî wan dihatine bi cî kirin, ji wan serhildanan; tevgera Teymûr Paşayê Millî 1791 û serhildana Erbîliya sala 1801an de dijî hakimê wayê ku ji alî waliyê Bexdyê yê Osmanî ve hatibû binavkirin û bi sedema zor û sitema wî ya ku li wan dikir.<sup>461</sup>

Û di dema şerê Rûsiya û Osmaniyan (1806-1812) de, mîrê Baban Ebdurrehman Paşa bi serhildana xwe rabû û di sala 1826an de, kurd bi serhildana rewandozê rabûn, lê serhildana herî giring, serhildana mîr Muhemmed bû yê ku mîrîtî ji bavê xwe Mustefa Beg wergirtibû di sala 1813an de û karîbû di navçeyên dûr û dirêj û berfireh bêxî bin destê xwe ku sînorê wan ji mûsilê dest pê dikir ta digihişte sînorê Farisan û ji bilî vê yekê, dest bi organîzkirina leşkerekî xurt kir û guhdaneke zor da avakirina dezgehên aborî û pêkanîna şebekên avê û çêkirina piran û ferman da bi damezrandina encumeneke zanistî ku karmendên wê ji hozan û pêzan û zanyar û şarezayan pêk bê ji bo danîna yasan û nivîsandina dîrokê û bêhtir ji wiha jî wî diravan (pere) bi navê xwe sikkekîr (parejenîn), lê mixabin li hemberî van karên giring û giranbuha, dewleta Osmanî karîbû di sala 1836an de zora wî bibe û wî têk bibe.<sup>462</sup>

Di sala 1839an de Osmanî di şerê di navbera wan û Muhemmed Elî Paşa de ku rû dabû li Nisêbînê şikestin û bi paş ve vegeriyan, ev bûyera han Bedirxan mîrê Botan ji xwe re dît derfetek ji bo dest bi serhildana xwe li dijî Osmaniya bike û xweseriya xwe eşkere bike û hewl da ku yekîtiya Kurdan pêk bîne û di dewleteke azad û xweser de ku sînorê wê ji Wan ta Mûsil be.

Cizîrê kire paytexta xwe û ala kurdî lê hilda jor û dest bi organîzêkirinaa kar û barê mîrneşîna xwe kir di warê civandina bacan û rawestana karên rê girî û şelandinê û belavkirina Erdan li ser cotyara da ku kar tê de bikin û bi zêdebûn guhdaneke taybet da xwendin û zanîn û fêrkirinê û gelek ji xortên kurd şandine Ewropa ji bo xwendinê û bi awayê xelîfeyan xutba roja îne kir bi navê xwe yê kesayetî û dirav bi

<sup>461</sup> - Herutî, h.b., r. 181-182.

<sup>462</sup> - Ebdurre'ûf Sino, **en-Nîza'atu'l-Keyaniyeti'l-Islamiyeti fi'd-Dewleti'l-Osmaniye (1877-1881)- Bilad's-Şam- el-Hicaz- Kurdistan, Elbaniya, Bîsan - Beyrût** 1998, r. 115. Doskî, h.b., r. 99-102.

navê xwe sikke kirin û bi vê yekê dewleta Osmanî nikarîbû zora wî bibî ta destwerdana Şêr Elî (Yezdan Şêrê) hakimê Hekarî yê ku ji alî sultanê Osmanî Ebdilmecîdê yekem ve di sala 1847an de hatibû destnîşankirin. Piştî vê yekê, dewleta Osmanî karîbû mîrneşînên kurdî yîn xweser bi dawî bîne û wan bêxe bin destê xwe û paşê hukmekî yekser û seranser û rasterast li Kurdistanê bike û Îran jî weke Osmaniyan kir, dema herdû mîrneşînên kurdî Muxre û Erdelan xiste bin desthilatdariya xwe ya rasterast.<sup>463</sup> Di vê demê de û ji destpêka sala 1848an de, çend tevgerên çaksaziyê li Îranê çêbûn, lê ew tevger hemî rastî rûxandin û têkçûnê hatin bi sedema hevaltî û hevkarîya dezgehên Olî yên şîrî bi sermayedar û xwedî milkên mezin re, ku herdûkan bi hev re dijî wan tevgerên çaksaziyê rawestiyan.<sup>464</sup>

Çend carên dî jî kurd bi serhildanan rabûn di dema sultanê Osmanî Ebdilmecîd de (1839-1861), ji wana serhildana Yezdan Şêr (1854-1855) ku karîbû perçeyê erdnîgariyê berfireh bi destê xwe bêxe, sînorê wê ji başûrî gola Wanê dest pêdikir û dighişte ta Mûsilê û serhildana Diyarbekrê di sala 1856an de û serhildana Dêrsimê û Mûşê û Erzerûmê.<sup>465</sup>

Di vê demê de, dewleta Osmanî dest bi ketina nêv Qeyranên tûj kir di gel astengiyên aboriyên mezin ku metirsiyê li hebûna wê bi xwe dikirin û lawaziyê dest bi êrîşên peyapey li ser dewletê kirin û ji her alî ve û hêdî hêdî dest bi xisara gelek herêm û cîwarên ku di bin desthilatiya wê de bû kir, weke:

- Xesara wê ji Ceza'ir re ku Ferensa ji xwe re dagirkir di sala 1830 de.<sup>466</sup>
- Xesara wê di şerên ku bi Muhemmed Elî Paşa re kir (1769-1849) li Misi û Sûdan û piraniya Bîladi'ş-Şam û hin perçe ji başûrî rojhilatî Anadolê (kurdistan).<sup>467</sup>

<sup>463</sup>- Sino, **en-Nîza'atu'l-Keyanîyetî'l-Islamîyetî fi'd-Dewletî'l-Osmanîye (1877-1881)- Bilad'ş-Şam- el-Hicaz- Kurdistan, Elbaniya**, r. 115. b.f. li ser mîrneşîna Botan, bnr. Doskî, h.b., r. 108-112.

<sup>464</sup>-Tewfîq, **el-Heyatu's-Siyasîye fi Kurdistan (1908-1927)**, r. 57.

<sup>465</sup>-Celîlê Celîlî, M. S. Lazarêf, M. A. Hesreyan, Şakir Mehoyan, Olga Cîgalanî, **el-Herêketu'l-Kurdîyetî fi'l-'Esri'l-Hedîs**, ter. Ebdê Hacî, metbetu Xanî, Dihok 2012, r. 29-30.

<sup>466</sup>-Ferensa dest bi dagirkirina Ceza'er kir ji bo bi destxistina bercewendiyên leşkerî, Olî, Aborî û di pêkanîna van bercewendiyên de serkeftî bû. b.f., bnr.

Arciment Koran, **es-Siyasetu'l-Osmanîyetî Ticaie'l-Ihtîlal'l-Firensî li'l-Ceza'r**, ter: 'Ebdi'l-Celîlî et-Temîmî, menşûratu'l-Cami'eti'Tûnisîye, 1970.

<sup>467</sup>- b.f. li ser van cengan, bnr. Ebdurrehman er-Rafî'î, **'Esiru Muhemmed 'Elî, daru'l-Me'arif**, el-Qahîra 1989, r. 217-282.

- Xesara wê ji Yonan re ya ku karîbû piştî şerên dûr û dirêj xwe jê rizgar bike di sala 1832an de.<sup>468</sup>

- Zirarên di şerê wê yê bi rûsa re ku navê Cenga Qerm lê hate kirin (1853-1856).<sup>469</sup>

- Zirarên mezin ku ghiştine berjewendiyên wê di encama bûyerên ku li libnanê rûdan di sala 1860î de.<sup>470</sup>

### 3.2.2. Çirûskin Ji Dîroka Kurdan Di Dema Sultan Ebdulhemîdê Duyem De (1876-1907):

Sultan Ebdulhemîdê duyem tê naskirin weke Sultanê dawî ku xwedî desthilatdariyek rasteqîne bû ji sultanên Osmanîyan, di roja 31ê tebaxa sala 1876an de li ser textê sultaniyê rûnişt piştî birayê xwe Sultan Mûradê pêncem<sup>471</sup> û hêj salek li ser sultaniyeta wî de derbas nebûbû, dîsa şer careke din di navbera dewleta Osmanî û rûsan de dest pêkir (1877-1878) û di encamê de, peymanana Sansitîvano di sisê yê adara 1878an de li ser dewleta Osmanî hate ferzkirin, ev peymanana ku bi sedema wê, gelek erd û milkên Osmanîyan di Ewropa de ji dest wan derketin û çûn.

Û pişt re û di heman salê de di navbera (13 hezîranê-13 temûzê) kongerê London hate li darxistin, lê vê carê tu xizmet ji berjewendiyên Rûsî re nekirin, berovajî vê yekê, biryarên kongeryê hinek can ji nûva vegerandin laşê dewleta Osmanî û hinekî temenê wê dirêjtirkirin, di dema ku dewletên Ewropî çavênî

<sup>468</sup>-b.f. li ser li ser têkiliyên Yonanî û Osmanî, bnr. Nînil Eliksenderofna Dolîna, **el-İmbiratorîyetu'l-Osmanîye we 'Elaqatihe'd-Diwelfiyetî fi Selasînat we Erbe'înat'l-Qern't-Tasi' 'Eşer**, ter: Enwer Muhammed İbrahîm, el-Meclisu'l-E'la li's-Seqafe, el-Qahîra 1999.

<sup>469</sup>- ev şer pêket bi sedema temahiya Rûsya di firehkirina desthilatdariya xwe de û ev şer bi girêdana peymanana parîsê hate bi dawî kirin, b.f. bnr. Ebdîrre'ûf Sîno, **"el'Elaqati'r-Rûsîyeyi'l-Osmanîye (1687-1878) – Herbu'l-Qerem Mumehîdatehe we Tetewiratehe we neteaiche (1853-1856)"**, meceletu Tarîxul-'Erebî we'l-'Alem, el'Eded 77-78, Beyrût 1985, r. 25-44.

<sup>470</sup>-Mehmûd Sab't eş-Şazilî, **el-Mes'eletu's-Şerqîye, Dîrasetun Wesa'iqîyetun 'eni'l-Xilafeti'l-Osmanîye (1299-1923m.)**, mektebetu Wehbe, el-Qahîra 1989, r. 135-136.

<sup>471</sup>-İbrahîm Bêk Helîm, **Tarîxu'd-Dewleti'l-Osmanîye'l-Uliye (et-Tuhfetu'l-helîmîyetî fi Tarîxi'd-Dewleti'l-Uliye)**, mûessesetu'l-Kutubi's-Seqafîyetî, Beyrût 1988, r. 221.

hilweşandin û rûxandina wê bûn rojek berî rojekê da ku erd û milkên wê li xwe parvekin, lê ev tişt çênebû.<sup>472</sup>

Dewletên Belqan ew bûyer kirin derfet ji armanc û berjewendiyên xwe re, Karadağ (Montengro) rabû xweseriya xwe ragihand, wiha jî Sirbya û Romanya û Nemsia Rabû Bosna û Hersik dagirkir û Bulgarya hukmê otonomî bi dest xwe xistin, dûvre Romîlya ya rojhilatî gihan de xwe û inglîza Qubrus xistin bin destê xwe û rûsiya herdû wilayetên Qers û Erdehan yê ku diketin rojhilatî Enadolê xistin bin hukmê xwe û Yonan Îsalya û perçeyek ji Îbîros xiste bin desthilatdariya xwe. Bi vê yeka han, berfirehiya temamiya Erdê ku ji dewleta Osmanî têk çû û hate standin bû nêzîkî 210,000km<sup>2</sup>, xelkê ku tê de dijiyan 5,5 melyon kes bûn, wiha em karin bêjin ku dibe 1/5 temamiya berfirehiya imparatoriya Osmanî ya wê demê.<sup>473</sup>

Tevahiya wan bûyerên ku di hingê de rûdan û dihatin nasîn bi navê (pirsa rojhilatî)<sup>474</sup>, dewleta Osmanî lawaz û bêhêz kirin ta ku navê (zilamê nexweş) lê hate danîn.<sup>475</sup> Wê lawaziyê bandora xwe li hemî karûbarên dewleta Osmanî kir û bi rengekî taybet li aboriya wê, ji lewra jî ew bêgavbû ku pereyên pirr ji dewletên derve bixwaze (deyn bike) û paşê di bin kom û giraniya deynan de ma piştixûz, ji ber wiha jî Sultan Ebdulhemîd bêgav ma ku bi tena xwe pêşberî wan qeyranan raweste û rû bi rû hewlên mezin bide xwe ku çareyên bilez ji wan astengiyên re bibîne, ew astengiyên ku sultanên berî wî jê re bi şûn xwe ve hiştibûn û bûne barê wî yê bi tenê, nemaze piştî ku ew sultanên berî wî hemî di tevgerên xwe yê çaksazîyê de bi ser neketin, ew tevgerên çaksazîyê ku di wê demê de nav lê dikirin (Tenzîmat), ku di encama dawî ji wan tenzîmatan re, pêkanîn û derketina destûra Osmanî ya yekem bû di sala 1876an de.<sup>476</sup>

---

<sup>472</sup>- Ebdirre'ûf Sino, *"el'Elaqati'r-Rûsiyeti'l-Osmanîye (1687-1878)- Mes'eletu'l-Behri'l-Eswedî we'l-Ezmetu'l-Belqanîye"*, meceletu Tarîxul-'Erebî we'l-'Alem, el'Eded 79-80, Beyrût 1985, r. 17-18.

<sup>473</sup>- Franswa Corciyo, **en-Nîza'u'l-Exîr (1878-1908)**, dimin kîtab: Robêr Mantiran (Işraf), **Tarîxu'd-Dewleti'l-Osmanîye**, ter: Beşîr es-Sibaî, c. 2, daru'l-Fikî, el-Qahîra 1993, r. 161-162.

<sup>474</sup>- pîrsa rojhilatî: nakokiyên di navbera dewletên Ewropî de li ser dagirkirina milkên dewleta Osmanî di dema lawaz bûna wê de. b.f. eş-Şazilî- h.b.

<sup>475</sup>- Zilamê nexweş yan jî Zilamê Ewropay yê nexweş: ev nav qeyserê Rûsî Nikoloy yê yekem di sala 1853an de li dewleta Osmanî kir ji ber lawaziya ku têde bû di wê demê de û daxwaz ji Berîtanya kir ku milkên dewleta Osmanî li xwe parvekin, dûvre ev nav li seranserê Ewropa yê belav bû û hate bi lêv kirin. bnr. Pol Domon, **Fetretu't-Tenzîmat**, dimin kîtab: Robêr Mantiran (Işraf), **Tarîxu'd-Dewleti'l-Osmanîye**, r. 125.

<sup>476</sup>- Pol Domon, h.b., r. 63.

Sultan Ebdulhemîd di bîranînên xwe de qala wan halên nexweş ku impiratoriya Osmanî tê de dijiya dike, U teqez dike ku sedema wan halên nexweş apê wî Sultan Ebdulezîz bû (1861-1876) ku hişt welat bikeve wî halê xerab û sedema sereke jî dibîne ku apê wî tu helwîstê ronîdar û zelal di siyaseta wî ya derve de tunebû.<sup>477</sup>

Sultan Ebdulhemîd xwe hêdfî hêdfî nêzîkî dewleta Elmanî kir ku ew jî çavê xwe li bi destxistina hin Imtiyazatan di rojhilat de digrand weke bersivdanek di rûyê siyaseta Birîtanya û Ferensa de ku di derheqê dewleta Osmanî de bikaranîn û pir ji Erdê wê dagirkirin û bi vî awayî gelek peywendiyên xweş di navbera Sultan Ebdulhemîd û Elmana de çêbûn û ji ber û fêkiyên wan pêwendiyên xweş, ew pêkanîna xeta tirêna (Berlîn-Bexdad) bû û hevkarîya Elmanan di meşqkirina leşkerê Osmanî û hin karên hevparên din jî, lê ev nêzîkbûna di nav bera Sultan Ebdulhemîd û Elmanan de bû cihê nerazîbûn û dilgiraniya Ferensa û Birîtanya û ta Rûsiya jî.<sup>478</sup>

Pêşberî van hevrikiyên ku ji derve ve lê dibûn û ji alîkî din ve jî ew halê hundirê ku welat tê de dijiya ji bê pergali û tevheviyê, Sultan Ebdulhemîd va ku ji xelkê re biçespîne ku ew layiqê textê sultaniyê ye tevli zehmetkêşiyên ku di rû û rêya wî de hene û dît pêdiviyê jê re ew dakevî meydana derew û bêbextî û durûwiye ji bona ku karibe karê xwe berdewam bikî û ev tiştên han em eşkere di bîranînên wî yê nivîsandî de dibînin dema ku dibêje: "Gava ku ez piştî birayê xwe li ser textê sultaniyê rûniştim, min dît ku ez dorpêçkirî me bi komek kesên ku divên min qeydkirî bihêlin di nêv davên pîlan û fitneyan de û ji bo ez jiyan û 'erşê xwe bi parêzim, min biryar da ku ez mukir û deha'a wan bi mukir û deha'eke xurtir ji ên wan li wan vegehinim".<sup>479</sup>

Û bi rastî jî dest bi cihanîna pirojeyên xwe kir, di destpêkê de rabû (Osmaniyên nû)<sup>480</sup> û li serserê wan Midhet Paşa (1822-1884) razî kirin dema ku ewan piştgiriya wî kirin beranberî sozekî jê ku ewê bi çend tevgerên çaksaziyê di dewletê de bi cih bîne, lê belê Sultan piştî salekê, ew sozên ku dabûn binpêkirin û dest bi karanîna siyaseteke nuh kir ku destpêka wê ragirtina zagonê (destûr) bû, ew

<sup>477</sup>-Ebdu'l-Hemîd es-Sanî, *Mûzekeratî es-Siyasiye (1891-1908)*, mûessesetu'r-Risale, Beyrût 1979, r. 114.

<sup>478</sup>- Corciyo, h.b., r. 221-227.

<sup>479</sup>- Ebdu'l-Hemîd es-Sanî, h.b., r. 210.

<sup>480</sup>-b.f. bnr. Wecîh Kewseranî, *"et-Tenzîmatu'l-Osmanîyetî we'd-Destûr- Bewakîru'l-Fikri'd-Destûrî Nessen we Tetbîgen we Mefhûmen"*, meceletu Tebîn, el-'eded 3, el-Merkezu'l-'Erebî li'l-Ebhasî we Dirasetu's-Siyasat, ed-Dewhe-Qeter -Şita' 2003, r. 7-22.

zagon a ku ma ragirtî ta dawiya hukmê wî û wiha jî zîrevaniyê zor şidand li ser rojname û kovar û pirtûkan û ferman da ku tu tişt neyê çapkirin bê derkitina biryarekî ji komîta taybet, ku bi taybetî ji bo vî karî damezirandibû.<sup>481</sup>

Bi derbasbûna demê re, Sultan Ebdukhemîd dest pê kir û guherînên nû xiste sînoren idarî yê wîlayetên dewletê û siyaseteka herî hişk dijî millet meşandin bi renekî ku tu kes jê nefilitî û giringîyeke taybet da hêzên (teşkilat) istixbaratî di bi rêvebirîya walat û millet de û piştrastiya xwe bi temamî danî ser û didîta ku welatê wî neghîştîye asta ketina ezmûna sistemeke perlemanî û berevajî vê yekê didîta ku pêdivîya welatê wî bi damezrandina desthilatdariyeke xurt û pir bi hêz heye ku karibe li dijî daxwaziyên neteweyên di welatê wî de bi tundî bisekine gava ku tu niyetên wan di serxwebûnê de hebe û wiha jî karibe bi tundî dijî destwerdanên Ewropîyan di karûbarê dewlata wî de raweste.<sup>482</sup>

Milletê Kurd, pareke wanî mezin ji dîtina êş û zehmetkêşî û sitemkarî û zordestiyê de hebû û Sultan Ebdulhemîd bi xwe jî di bîranînên xwe de, helwêsta xwe ya dijî Kurdan eşkere nivîsandiye û dayi xuyakirin ku çawa ewî diva ku milletê kurd tev bihelîne ji bo kar û berjewendiyên tirkên di herêmên Rûm û Enadolê de.<sup>483</sup>

Serhildanên kurdî, berî wextê selteneta Ebdulhemîd dest pê kiribûn û di dema wî de jî berdewam kirin, nemaze piştî serkeftinên ku Rûsan li dijî Osmaniyan bi dest xwe xistibûn li Qars û Bayezîd û Saxanlog û kelha Xinês di dawiya sala 1877 û destpêka 1878an de. Ev serkeftinên Rûsan, Kurdan bêhtir dehfdan ku bi serhildan û raperînan li dijî Osmaniyan rabin li dormadorê Mêrdîn û Hekarî û Behdînan û Dêrsimê, lê ev serhildan bi xurtî hatin rûxandin ji alî leşkerên Osmanî ve.

Şoreşek jî li Cizîrê (Cizre) vêket bi serdariya Osman Paşa Bedirxan û birayê wî Hisên Paşa Bedirxan, yê ku xweseriya Kurdîstana Osmanî ragihand û xwe mîrê Kurdistanê bi nav kir û çî xutbeyên ku di mezgeftan de dihatin xwendin bi navê wî bûn. Tevlî berxwedana wan a xurt dijî leşkerên Osmaniyan û tevî ku gelek caran serkeftin bi destxwe dixistin jî, lê Osmaniyan karîbûn di encamê de şoreşa wan vemrînin û herdû biran bigrin di sala 1879an de.<sup>484</sup>

<sup>481</sup> - Oztûna, h.b., r. 116-144.

<sup>482</sup> - Corciyo, h.b., r. 167.

<sup>483</sup> - Ebdu'l-Hemîd es-Sanî, h.b., r. 29.

<sup>484</sup> - Sino, *en-Nîza'atu'l-Keyaniyêti'l-Islamiyêti fi'd-Dewleti'l-Osmaniye (1877-1881)- Bilad's-Şam-el-Hicaz- Kurdistan, Elbaniya*, r. 117.

Wiha jî Şêx Êbeydullahê Nehrî serkêşiya şoreşa sala 1880ê kir, ew şoreşa ku bandoreke mezin li hiş û raman û hişyariya milletê Kurd kir û di heman demê de tirseke mezin xiste dilê Osmaniyan û tevî ku karîbûn şoreşê vemrînin jî, lê wê şoreşê kir ku Sultan Ebdulhemîd siyaseta xwe ya ku bi Kurdan re dimeşand, bi temamî biguherîne.<sup>485</sup>

Ev şoreş xwedî rêbaz û ramanên nuh bû û ji hemî şoreşên berî xwe ciyawaz bû, weke mînak şoreşên berî wê ku vêdiketin, xwecihî û li ser erdnîgariyekî teng bûn, lê belê Êbeydullahê Nehrî ev sîstemê şand gava ku têgehê netewa kurdî xiste meydana xebat û tevgera kurdan û bi wan da nasîn ku ew yek milletin gerçî ew li bêhtir ji welatekî dijîn û weke hemî milletên cîhanê mafê wan û xweseriyê heye û bi vî rengî jî xwe didît ku ew nûnerê kurdên li dewleta Osmanî û Îranî herdiwane, ji ber milletê Kurd yek millete lê dagirkeran wî kirine du perçe û ji hev qetandine û di nêv xwe de parvekirine.

Ji encamên van ramanên wî yê netewî, ewî karî bû –û ev cara yekem bû- li dor 220 kes ji serokên qebîleyan û eşîran û malbatan û dîndaran û sermayedaran û giregirên û şandeyan, ji çarkeşên kurdistanê bicivîne û kom bike ser hev ji bo ku alîkarî û piştgiriya şoreşa wî bikin û ne tenê ev, belê bêhtir ji wiha jî, wî alîkarî ji şoreşa xwe re ji Ingilîzan xwest û di nama daxwaziya xwe de Ingilîzî piştrast kirin ku ew dê mafê xiristyanên di kurdistanê de biparêze û wê mafê wanê olî û kultûrî bi temamî bi de wan. Lê belê gelek sedem derketin holê û qet ne bûn alîkar di serketina vê şoreşê de.<sup>486</sup>

Ew hemî nîrên ku li derve û li hindirê welatê Osmanî de pêk dihatin, hiştin ku Osmanî xwe hêdî hêdî nezî kurdan bikin, guhdanê li wan bikin, hin wezîfeyên bilind di dewletê de bi dest wanxînin û xwestin hin yekîneyên leşkerî ji wan pêk bînin ji bona ku ew jî berevaniyê di ber parastina sînorên dewleta Osmanî de bikin û bi taybetî li ser sînorê Rûsî, nemaze piştî kirîzeyaya ku kete peywendiyên di navbera Ermen û Osmaniyan de û bûyerên ku rûdan di encama wê kirîzê de.<sup>487</sup>

<sup>485</sup>- Celîlê Celîl, *Nehdetu'l-Ekradi's-Seqaffiyetî we'l-Qewmîyetî fi Nihayeti'l-Qerni't-Tasi' 'Eşer we bidayeti'l-Qeni'l-'İşrîn*, menşûrat rabîtetu Kawa li's-Seqafeti'l-Kurdîyetî, daru'l-Katib, Beyrût 1986, r. 14.

<sup>486</sup>- Sino, *en-Nîza'atu'l-Keyanîyetî'l-Islamîyetî fi'd-Dewleti'l-Osmanîye (1877-1881)- Bilad's-Şam- el-Hicaz- Kurdistan, Elbaniya*, r. 123-124 .

<sup>487</sup>- Ebdul-Hemîd es-Sanî, h.b., r. 32-33.

Bi rastî jî yekîneyên siwarî yên nefermî (ne nîzamî) ji kurdan bi fermaneke ji Sultan Ebdulhemîd hatin damezrandin di sala 1891ê de "ji bo parastina gundiyeên Enadola rojhilatî" û hatin naskirin bi navê Siwarên Hemîdî û ev jî ciyê diltengî û nexweşiyê bû li ba dewletên Ewropî, nemaze ferensa û Ingiltera û Rûsiya, ji lewra jî ji Osmaniyan xwestin ku wan yekîneyên kurd betal bikin û li şûn wan yekîneyên leşkerîyên Ermrnî damezrînin.<sup>488</sup>

Armancên Sultan Ebdulhemîd ji pêkanîna wan yekîneyên kurdî xuya û berçav bûn, ku ew ne ji kula kurdan ketibû, lê belê armanca wî ya rasteqîn ew bû ku bi kurdan sînore dewleta xwe ji Rûsan biparêze ji alî derve ve û ji hevalbendê Rûsan di hundirê welatê xwe de û wiha jî Sultan xweş zanîbû ku ewê bi vî karê han dê bandora tevgerên kurdî lawaz bike û hew dihêle ku ceger bê tu kesî dî da bi şoreşek yan serhildanek nû rabe û ji bo ku behweriya kurdan bêhtir bi xwe bîne, rabû dest bi avakirina çend dibistanan di herêmên kurdî de kir, lê bi mercê ku zarwên şêx û serokên eşîran tê de perwerde bibin û hate gotin ku di wê demê de li avakirina wan dibistanan 8 melyon lîreyên osmanî ji xezîna dewletê hate xerckirin.

Ew dibistanên ku hatine avakirin, bandoreke xurt li şiyarbûna ramanên netewî li ba milletê kurd kirin û ew şiyarî xweş hate xuyakirin bi zelalî di dawiya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an de, dema ku guherînek berz hêdî hêdî kete barûdoxê (halê) çand û rewşenbîriya kurdî bi demê re, weke mînak li ser wê guherîn û pêşveçûnê; yekemîn rojnameya kurdî di 22 nîsana sala 1898an de li Qahîra bi navê kurdistan hate çapkirin ku ser nivîskar û derhênanê wê Miqdad Midhet Bedirxan Paşa bû, wiha jî Istanbul bû navendek ramiyarî û rewşenbîrî ji geşkirina hişyarî û bîreweriya netewî ji kurdan re û malbata Bedirxaniyan xwedî roleke berz û giring di vî warî de lîstin û karîbûn bi saya wê pêşveçûnê, kurdan dehf bidin bi alî rabûna bi serhildan û xwe pêşandanan li dijî siyasetên ku osmaniyan di der heqê wan de dimeşandin û ew serhildan û xwe pêşandanan dest pê kirin di nav bera salên (1905-1907) de û li gelek bajaran, weke serhildana kurdên Dêrsimê di sala 1905an de û xwe pêşandananê mezin ku kurdên Istanbulê pê rabûn di sala 1906an de û xwe pêşandananê Bedlîsê di sala 1907an de ku paşê wergeriya hefsingiyên çekdarî.<sup>489</sup>

---

<sup>488</sup> - Oztûna, h.b., r. 131-132.

<sup>489</sup> - Celîl, **Nehdetu'l-Ekradi's-Seqafiyetî we'l-Qewmîyetî fî Nihayeti'l-Qerni't-Tasi' 'Eşer we bidayeti'l-Qeni'l-'İşrîn**, r. 19,21,29,57,58.



Pêdiviye ku bête xuyakirin ew giringiya ku zanyarên olî bi xwe ve digirtin di wê demê de û çiqasî peywendiyên wan bi sultanê Osmanî re pir xweş bûn, ji wan zanyarên olî Se'îdê Kurdî (yê Nûrisî) bû, yê ku karîbû gelek ji doz û daxwazên kurdan ên girêdayî bi herêmên wan ve bighîne sultanê Osmanî û daxwaza guhdarîbûn û guhdaniyê ji kurdan re jê kiribû û wiha jî daxwaza vekirina dibistan û zanîngehan li kurdistanê û şandîna mamosteyên fêrbûyî zimanê kurdî.<sup>490</sup>

Wiha jî Şêx Ebdusselamê Berzanî û Nûr Muhemmed ê ji Dihokê, daxwaznamakê pêşkêşî Sultan kiribûn û têde xwestibûn ku zimanê kurdî di herêma wan de were hesêbkirin wek zimanekî fermî, pê bê xwendin û nivîsandin û karbidestên ku bêne nîşankirin li herêma wan, ji yên ku di zimanê kurdî de fêrbûyî bin û ji bilî van herdû daxwazên sereke, hin daxwazên dî jî.<sup>491</sup>

Siyaseta Sultan Ebdulhemîd bi ser neket, ne di warê hewldanên wî ku ji fişarên Ewropîyan xelas be û ne jî di beramberiya opozosiyona di hundirê welatê xwede, ew opozosiyona ku bêhtir tund û bi pêşve çû bi rîya komela (Ittîhad û terqqî) ya ku kongera xwe ya yekem li Parîsê di sala 1902an de li darxist û gelek ji endamên millet û neteweyên cûrbecûr di nav xwe de hewandî, ew ên ku yek armanc tenê wan dighande hev, ew jî xelasbûna ji hukmê Sultan Ebdulhemîd bû û bi rastî jî karîbûn fişarê li Sultan bikin ku wîzaretê xwe di sala 1908an de bi dawî bîne û ragihandina destûrê eşkere bike û girtiyên zindanan berde û ev kar hemî, navê (Şoreşa Meşrûtiyê) lê hate kirin. Piştî hingê Sultan girtin û di sala 1909an de wî xistin zindanê û bi vê yekê dawiya qûnaxeke herî giring di mêjûya dewleta Osmanî de hat.<sup>492</sup>

### 3.2.3. Kurd û Dewleta Osmanî Piştî Sultan Ebdulhemîd (1908-1914):

Milletê Kurd texmîn dikir ku ew guhertinên di dewleta Osmanî de çêbûn wê ew jî ji wan guhertinan sude bibîne, lê pir têde neçû, ta ku komela Ittîhad û terqqî ew perde ji ser riwê xwe hilanî û zû ramanên wî yê rasteqîn xuyakirin, ew ramanên ku ji

<sup>490</sup> - Ehmed Muhemmed Ehmed, **Ekradu'd-Dewleti'l-Osmanîyetî we Tarîxehum el-Ictima'î we'l-Iqtisadî we's-Siyasî (1880-1923)**, metbe'etu HecîHaşim, Erbil 2009, r. 308. Mekdul, h.b., r. 162.

<sup>491</sup> - Mekdul, h.b., r. 170.

<sup>492</sup> - Corciyo, h.b., r. 227-228. Cemal Ebdilhadî Muhemmed Mes'ûd, Wefa Mûhemmed Rif'et Cum'a, Elî Ehmed Leben, **Exta'un Yecib En Tusehheh fi't-Tarîx- ed-Dewletu'l-Osmanîye**, c. 2, el-Wefa', li't-Tiba'etî we'n-Neşir, el-Mensûra- Misir 1995, r. 36-39..

bilî kultûr û zimanê tirkî, tu kultûr û zimanên din qebûl nake û siyaseta xwe ya rasterast jî eşkere kir, ew siyaseta ku armanca wê ya sereke ew e, hemî kesên ku netirk bin, bikin tirk, çi kesayetî bin û çi millet û netew bin.

Beranberî van ramanan, Kurd rabûn xwe ji vê komelê kişandin û komelên taybet bi xwe re damezrandin. Yekem komele ew komela (Te'awin û Terqqî) ku di 19 îlûna 1908an de damezrandin berî ku Ittîhad û terqqî di 23ê tebaxa 1909an de biryara qedexebûna damezrandina komele û partiyên xwedî armanc û ramanên neteweyî û siyasî derxe û dest bi lawazkirina tevgerên komeleyên rewşenbîrî jî bike. Ji alîkî din ve jî kurdan berê xwe dane damezrandina saziyên xwendevanan weke Komela Hêvî ya Qutabiyên (Şagirtên) Kurd di sala 1911an de.

Zordarî û sitemkariya Ittîhadiyan çiqas diçû û dest bi zêdebûnê dikir, ta roja ku hukûmetê istifa xwe kir di meha tîrmeha sala 1912an de piştî şikestina dewleta wê li ber dewleta Îtalya û windakirina wê ji Lîbya re, da di encamê de hukûmeta iitflafa mu'tedilan were damezrandin li şûna hukûmeta kevin.

Hukûmeta nû dest bi hin çaksaziyan kir û destûra damezrandina çend komele û saziyên siyasî û rewşenbîrî yên ne ji neteweya Tirkî jî da, lê vê yekê demeke dirêj dom nekir, nemaze piştî şikestina dewleta wan di Belqan de û bû sedema ku Ittîhad û Tereqqî careke din desthilatî bêxin destê xwe di destpêka sala 1913an de û ji nû ve dîsan dest bi qedexekirina her tevgerê siyasî, neteweyî, ne Tirkî kirin.<sup>493</sup>

Kurd ji wan biryarên Ittîhadiyan ên nû bêhêvî û radest nebûn, berûvajî vê yekê, wan dest bi gurkirina xebata xwe li dijî wan biryaran kirin û daxwaz û armancên xwe ji pêkanîna hukmê otonomî di herêmên xwe de eşkere kirin, li gel daxwaza damezrandina leşkerekî kurdî yê taybet û avakirina dibistanên kurdî û daxwaza ku hemî karbidestên li kurdistanê kurd bin û hin daxwazên din...h. d.

Bi vê yekê Kurd hêdî hêdî pêk dihatin ji bo destpêkirina serhildaneke gelêrî ya fireh di seranserî welêt de, ji Bedlîsê dest pêkir û gihişte gelek herêmên din, wiha jî Şêx Ebdusselamê Berzanî serhildana xwe yê li kurdistana Îraqê vexist, lê Tirkên Osmanî li dijî van bûyerên nuh, bi karên pir tund û hovane rabûn ta karîbûn agirê

---

<sup>493</sup> - Tewfîq, **el-Heyatû's-Siyasîye fî Kurdistan (1908-1927)**, r. 80-83, 95.

wan serhildanan vemrînin û dest bi derxistina fermanên herî dijwar û hişk li dijî çî tevger û xebatên ku Kurd bivên pê rabin dan. Di wan deman de, daholên şerê cîhanî yê yekem dest bi lêdanê dikirin.<sup>494</sup>

### 3.2.4. Çirûskin Ji Dîroka Kurdên Li Îranê:

Di destpêka sedsala 20an de, Îran di bin deynan de mabû, ew deynên pir ku ji Rûsiya û paşî ji Berîtanya kiribûn bi behana ku ew ê dest bi avakirina pirojeyên mezin di welatê xwe de pêk bînin, lê belê di rastiye de, ew perayên ku desthilatdarên Îranê deyndikirin, hemî li kêf û şahî û pirojeyên xwe yên kesayetî xerc dikirin, ev tiştê han zirareke pir mezin dighande berjewendiyên bazirganên Îranê û bû sedem ku ew pir dilteng bibin û bitengijîn ji halê aboriyê ku welatê wan ketiyê û di encamê de karîbûn behweriya millet bi xwe bînin dema ku bi şoreşa xwe rabûn, ew şoreş bi (Şoreşa Destûrî) nav lê hatekirin ku di roja pêncê tebaxa sala 1906an de dest pê kir û şah Muzeffereddîn mecbûr kir ku bi hîlbijartina endamên perlemaneka nû rabî.

Ji encamên wê helbijartinê destûrek ji welat re hate ragihandin û encûmenek niştimanî jî hate damezrandin. Lê wî tiştî pir dom ne kir, ji ber şah Muhemmed Elî wergêranek (inqîlabek) li şah Muzeffereddîn kir û li ser textê şahinşahiye rûnişt di sala 1907an de û bû sedemê pexistina şerekî navxweyî (Ehlî) di navbera piştgirên encumena niştimanî û piştgirên şah de di tîrmeha sala 1910an de, ku ji encama wî şerî şah bazda Rûsiyayê û kurê wî Muhemmed – ku hê vêregihiştî (balix) nebibû - danîn şûna wî û apê wî Ebdulmuhsin Ezd destnîşan kirin û wesî li ser textê şahinşahiye. Ev tiştê han, bû sedema xurtbûna desthilatdariya herêman û giregiran ji alîkê ve û lawaz bûna desthilatdariya navendiya welat ji alîkê din ve. Lê dest bixistina herî giring û balkêş di vê demê de ew bû xwestin û anîna pisporên Emerîkî bûn, ku ev bûyer jî di dawiyê de bû destpêka destwerdaneka Emerîkî yê rasterast di jiyana siyasiya Îranê de.<sup>495</sup>

<sup>494</sup> - Celîl, el-Hereketu'l-Kurdîyefî fî'l-'Esri'l-Hedîs, r. 99

<sup>495</sup> - Amal es-Sebkî, **Tarîx Îrani's-Siyasî Beyne Sewreteyn (1906-1979)**, silsiletu 'Alemlî-Me'rîfe, el-'Eded 250, el-Kiweyt 1999, r. 33-35.

Kurdan karîbûn çespandina hebûna xwe di Îranê de bikin û karîbûn mîrneşînên xweser û taybet û bi xwe ve girêdayî ji xwe re damezrînîn ta nîvinga sedsala 19an û di hingê de Îran jî hewl da ku hêzek bi rengê (siwarên hemîdî yê osmanî) ji xwe re damezrînî, lê di pêkanîna vê yekê de bi ser ne ket.

Di çarîkê dawî de ji sed sala nozdehan, serhildana Êbeydullahê Nehrî dest pê kir, ev serhildana ku tête jimartin ji giringtirînê serhildanên kurdî ji alî çandina bizrê rûhê neteweyî di dilê kurdan de û ev serhildan nema di sînorê îranê tenê de, lê belê firehtirbû ta sînorên Osmanî jî dabû berxwe, wekî ku me berê jî amaje bi vê yekê kiribû. Xuyaye kurdan karîbûn ji gendeliya ku belav bibû di nêv hukûmeta Îranî de sûde bibînin, gava ku xwe têr çek û silah kirin û desthilatdariya xwe li herêmên xwe biparêzin, ta ku yek ji serbazên Îranî ev yeka han teqez kiriye dema gotiye: Bi rastî em nikarin li hemberî kurdên çekdar rûbirû bi serkevin û ev tişt hatibû gotin ji alî wî serbazî ve di rojên berî pêxistina şerê cîhanê de.<sup>496</sup>

Ji bilî vê jî kurdan di sala 1913an de komela (Cîhandînî) bi alîkariya Ebdurrezaq Bedirxan (1864- 1918) yê ku ji ber Osmaniyan-hingî didan dû wî- xwe li îranê girtibû, ev komele bibû navendek ji belavkirina ramanên neteweyî re û endamên wê xwestin ku dibistaneke kurdî vekin û çapxaneyekê çêkin û rojnameyek bi kurdî derxin, lê belê rûsî yên ku desthilatdariya xwe li wan herêmên kurdî ferz kiribûn û ew bibûn xwediyê biryaran, ev yek qebûl nekirin.<sup>497</sup>

### 3.2.5. Şerê Cîhanî Yê Yekem (1914-1918) û Bandora Wî Li Ser Kurdan:

Şerê Cîhanî yê yekem di sala 1914an de dest pê kir ta sala 1918an kişand, di vî şerî de dewleta Osmanî hevkarî û piştgiriya Elmanya ji xwe re bijart, lê belê Îran jî xwe re bêlayenî (bê terefdarî) bijart, ji encamên vî şerê giran, gelek karesetên mezin û dijwar hatin serê milletên cîhanê, bi milyonan kes hatin kuştin û bi milyonan jî birîndar û seqet çêbûn, ji bilî xesaretên darayî û aborî û suhtina gundan û bajaran û rûxandina karxaneyan (febrîqe) û xettên (sikkên) tirênan û benderan û telefkirina zad

<sup>496</sup> - Mekdul, h.b., r. 131-132.

<sup>497</sup> - Celîl, el-Hereketu'l-Kurdîyefî fî'l-'Esri'l-Hedîs, r. 95-96. Û b.f. li ser Ebdurrezaq Bedirxan û rola ku lîst, bnr. Celîl, *Nehdetu'l-Ekradi's-Seqafîyefî we'l-Qewmîyefî fî Nihayefî'l-Qernî't-Tasî' 'Eşer we bidayefî'l-Qeni'l-'İşrîn*, r. 137-189.

û şînahiyan û ji bilî encamên siyasî ku hatin meydanê û bûne sedem ku sînorên gelek dewletan bêne guhertin û ji nû ve bêne danîn. Sînorên hin dewletan firehtir bûn wek dewleta Berîtanya û Ferensa û Îtaliya û belcîka û sînorên hin dewletan tengtir bûn, wek dewleta Elmanya û Awustriya (Nemsa) û Bulgarya û dewleta Osmanîyan.<sup>498</sup>

Welatê kurdan, ew jî xwedî pareke mezin bû ji dîtina xerabûn û wêrankirin û rûxandinê re<sup>499</sup> û di ser vî halî de jî, hevbendiyan (hulefa'an) berî ku şer bi dawî bibe, girêbestan û peymanan bi hev re danîbûn ku rojhilata navîn bi temamî - û di nav de dewleta Osmanî jî - li xwe par vekin, ji wan lihevkerin û girêbest û peymanan, peymana Saykis-Pîko bû, ya di sala 1916an de hatibû girêdan û ku di sala 1917an de şoreşa belşevîkan (komonistî) ku li rûsya rabibû li dijî sîstema Qeyserî û bi ser ketibû, naveroka wê peymanê ragihand û ji dewletên neteweyî re eşkere kir.

Naveroka wê peymanê ew bû, ku rojhilata navîn bête parvekirin di navbera Berîtanya û Ferensa de û bi wî awayî sînorê dewleta Osmanî gelekî tengtir bû ta ku ji bilî hin perçeyên ji dewleta tirkîyê ya îrohîn jê re nema bû û di encama cîbicîkirina bendên di vê peymanê de, kurd ji hemî milletên cîhanê bêhtir zîrarên mezin dîtin, ji ber di dawîya dawî de, hatin belavkirin di nav çar dewletan de (Sûriya, Turkiya, Îraq, Îran).<sup>500</sup>

Piştî ku şerê cîhanî yê yekem barê xwe danî û dewleta Osmanî radest bû û li ser peymana Modris di 30. 10. 1918 de imzakir, komeleyên kurdî di riya rojnamegêriya xwe de, dest bi daxwazkirina azadiya xwe û damezrandina Kurdistaneke serbixwe kirin, hêjayê gotinê ye ew sozên hevbendiyan û bi taybetî Ingilîzan ku dabûne kurdan û ragihandina prenîbên serokê Emerîkî Wilson (1856-1924) yên di derheqqê milletan de, dema maf dabû her milletek li cîhanê ku ew bi xwe dikare biryarê ayinda xwe bide û eşkere bike bi rengê ku ew ji xwe re bibjêre û wiha jî destketiyên ku Ereban ji dû vî şerî bi dest xwe xistin, ev tiştên han hemî bi

<sup>498</sup> - b.f. li ser encamên şerê cîhanî yê yekem, bnr. Nîl. M. Hayman, **el-Herbu'l-'Alemîyî'l-'Ûla**, ter: Hesên 'Ewîda, Hey'tu Ebûzebî li's-Siyahetî we's-Seqafe, Ebûzebî 2012, r. 353-394. Cêrmî Solit, **Teffîtu'ş-Şerqu'l-Ewset – Te'sîru'l-Itirabatu'l-Letî Yusîrûha el-Xerb fi'l-'Alemi'l-'Erebî**, ter: Nebîl Sibhî et-Tewîl, daru'n-Nefa'is, Dîmeşiq 2011, r. 75-92.

<sup>499</sup> - b.f. li ser rola şerê cîhanî yê yekem li ser Kurdan, bnr. Wedî' Ciwêda, **el-Hereketu'l-Qewmîyeyî'l-Kurdîye**, Neş'eteha we Tetewireha, ter. Mecmû'e mine'l-Mûtercimîn, daru'l-Farabî/daru Aras, Beyrût/ Erbil 2013, r. 307-325.

<sup>500</sup> - Mekdul, h.b., r. 195.

hev re, bûne sedemên arîkarî û piştgirîyeke ma'newî ji kurdan re û ji encamên vê yekê jî, dema dewletên Ewropî de'wa kongera lihevhatinê (Aşitiyê) kirin ku li parîsê di sala 1919an de hatibû girêdan, Kurd di wê kongerê de xwedî pişk bûn têde bi amadebûna şandeyeka kurdî bi serokatiya Şerîf Paşa<sup>501</sup> û di wê kongerê de, doza kurdî hate gengeşe û gotûbêjkirin, tevî protestuya Îran û Turkiyê û hewldanên wan ku nehêlin ew gengeşe çêbin.<sup>502</sup>

Ew kesên ku amedekarên kongerê bûn, gihîştine dana hin biryaran di derheqqê kurdan de, ji wan biryaran; neqebûlkirina rasperdeyê (indîdab) li ser kurdistanê û dîsa neqebûlkirina tu desthilatdariya Tirkî li ser û kurdan azad hiştin ku ew dikarin dewletek bi tena xwe ji xwe re damezrînin, yan jî –eger bivên-damezrandina çend herêmên cûrbecûr ji xwe re bibjêrin, lê belê damezrandina vê dewleta kurdî girêdan bi damezrandina dewlateke Ermenî ve û wihan jî Berîtanya û Ferensa soz û peyman dan ku kurdan biparêzin ji çi êrîşên ku ji alî tirkî ve bêne ser wan û nehêlin tu pirsgerêkên sînorî li herêmên kurdî çêbibin.<sup>503</sup>

### 3.2.6. Kurd û Qûnaxa Piştî Şerê Cîhanî Yê Yekem (1920-1938):

Qûnaxeke nû di jiyana kurdan de dest pê kir û doza kurdî li her dewletekê bi rengêkî taybetî û girêdayî bi wê dewletê ve lê dihate nêrîn, gerçê ku carnî û di hin mijaran de, wan dewletan bi nêrîneke hevbeş û bi karnî hevkarî têkilî bi bûyerên wan mijaran re dikirin û di van rûpelên hindik de em nikarin biberfirehî behsa wan têkilî û hevkarîyan bikin, tenê em ê behsa hin tiştên sereke bikin:

<sup>501</sup>- Şerîf Paşa (Muhammed Şerîf kurê Se'îd Paşa kurê Hisên Paşayê Xendan e), ji malbata Baban a kurd a binavûdeng e, ya ku pîr ji zariwên wê bubûn berpîrsiyarên bilind di dewleta Osmanî de, bavê wî bubû wezîr ê derve û duv re bû serok ê encumena şewirmendiya dewletê. b.f. bnr. Zekî, **Meşahîru'l-Kurdî we Kurdistan fi'l-'Ehdi'l-Islamî**, c. 1-2, r. 229-230, r. 247.

<sup>502</sup> - b.f. bnr. Hogir Tahir Tewfîq, **el-Kurd we'l-Meseletu'l-Ermenîye (1877-1920)**, daru'l-Farabî/daru Aras, Beyrût/ Erbil 2014, r. 656-666. Faris Osman, **el-Kurd we'l-Ermen – el-'Elaqatu't-Tarîxiye**, mûessesetu Margîrêt, Kurdistan el-Îraq 2013, r. 67-83.

<sup>503</sup>- b.f. li ser helwêstên dewletên mezin di derheqqê kurdan de di gongereya aşitiyê li parîsê sala 1919an de, bnr. Tewfîq, **el-Kurd we'l-Meseletu'l-Ermenîye (1877-1920)**, r. 674-682.

### 3.2.6.1. Kurd Li Tirkîyeyê:

Di vê demê de stêrka Mustefa Kemal Atatürk (1881-1938) dest bi geşbûnê kir, nemaze gava ku karîbû, serkêşiya berhevok ji kesan bike û ew berhevok karîbûn Sultan Muhemmedê Şeşem (1918-1922) razî bikin ku fermana pêkanîna helbijartinek nuh ji nûnerên encûmeneke netewî ya rasteqînî re bide û bira jî wiha pêk hat û ewê encumenê hişmendîya xweseriya bi temamî ji tirkiyê re çespanî û daxwaza vegeerîna hemî erdên ne erebî –û di nav de Kurdistan- kir û di heman demê de siyaseta xwenêzîkkirin û bi destxistina hizkirina kurdan ji xwe re meşand û hêdî hêdî bi rê ve bir.<sup>504</sup>

Di 24ê temmûza sala 1920an de, kongera Sanrîmo hate lidarxistin<sup>505</sup> û biryara raspardeya Birîtanî li ser Îraq û Felestînê û raspardeya Ferensî li ser Libnan û Sûriyê tê de hatibû pejirandin û rê vekir li ber imzakirina peymaneke nû bi navê peymana Sîver<sup>506</sup> ku di 10ê tebaxa 1920an de hate imzakirin û di vê peymanê de ji doza kurdî re ciyekî berz û taybet hatibû girtin, ta ku beşa sêyem ji deriyê sêyem ji wê peymanê bi temamî ji doza kurdî re hatibû terxandin û ew beş bi navnîşana (Kurdistan) hatibû nivîsandin ku ji bendên (62,63,64) pêk dihat û bi armanca damezrandina dewleteka Kurdî ya serbixwe ew hersê bend hatin naskirin.<sup>507</sup>

Di sala 1921an de û ji (21.02/12.03) kongerê Londonê di navbera hevbendîyan û tirkiyê de hate li darxistin û ev kongre bû destpêkirina pêşkêşkirina ji destberdanan ji dewleta tirkî re, ya ku karîbû daxwaz û helwîstên xwe xurtir bike bi sedema ku karîbû karûbarên xwe yê di hundirê welat de xweştir bike û bêhtir bi pêş de bibe û hevbendîyan bi rûsya komonîst re girê bide û di şerê xwe yê li dijî yonan re biserkeve di salên (1919-1922an) de û ev tiştên han bûne destpêkek ji bo li darxistina peymaneke nuh re, ku ew jî peymana Lozan bû<sup>508</sup>, ew peymana ku encamên wê yê ku hatine eşkerkirin di 24 temmûza 1923an de, hemî xewnên kurdan di damezrandina dewleteke Kurdî ya serbixwe bi temamî têk birin, ji ber ku heta navê Kurd bi tenê jî di biryarên vê kongerê de qet ne hate nivîsandin, tenê di biryarekê de

<sup>504</sup>- Mekdul, h.b., r. 216.

<sup>505</sup>- Li ser navê bajarê Sanrîmo yê Îtalî

<sup>506</sup>-Li ser navê bajarê Sîver ê nêzî Parîs ê.

<sup>507</sup>-Bele C. Şêgoh, **el-Qedîyetu'l-Kurdîye – Madî el-Kurd we Hadirehum**, menşûrat rabîtetu Kawa li's-Seqafeti'l-Kurdîyetî, Beyrût 1986, r. 83-84.

<sup>508</sup>- Li ser navê bajarê Lozan yê Siwêsirî.

hate nivîsandin ku pêdiviya rêzgirtin ji mafên kultûrî û olî ji millet û netewiyan re bête girtin.<sup>509</sup>

Sultanê Osmanî Muhemmedê Şeşem di meha 10an de ji sala 1922an de ji sultaniyê hate dûrkirin û sorgunkirin û di sala 1924an de xilafet hate bi dawîkirin û serdemeke nû bi damezrandina komara Tirkiyê bi serokatiya Mustefa Kemal Atatürk dest pê kir û ew helwîstên ku li dijî milletê kurd hatibûn standin bi renekî nîgatîv berdewam kirin û bêhtir ji wihan jî, ta navê kurd jî di peymanê (mîsaqa) niştimaniya tirkî de qet nehate binavkirin û di ser de jî, kurdan di bin navê (piraniya Osmaniyên musulman de) dane nasîn.<sup>510</sup>

Turkiya peymanê çakcîrantiyê bi Ferensa re imza kir û karîbû Berîtanya jî razî bike gava ku ji berjewendiyên wan re, destê xwe ji mijara Mûsilê kişand<sup>511</sup> û bi vê yekê Atatürk xwe ji kurdan re vala kir û berê xwe bi tundî da wan û peyva bi zimanê kurdî li hemî dezgehên dewletê qedexa kir û paşê ta peyvandina bi zimanê kurdî di nav kurdan xwe bi xwe de jî û ta li sûk û kolanan jî û di jiyana wan ê rojane de jî qedexa kir û hemî giregir û xuyaniyên rû sipiyên kurda durrî welatê wan kirin û berê wan da cihên herî durr û nexweş û kêmnifûs li Enadolê.<sup>512</sup>

Di sala 1924an de hin hêzên niştimaniyên kurdî kongireyî li bajarê Helebê girêdan ji bo gengeşeya halê siyasî ku Kurdistan têde ye were kirin û hin ji rêbaz û pîlanên pêdivî ji pexistina serhildaneke kurdî ya tevayî deynin li dijî siyaseta ku desthilatdar li hemberî milletê kurd dimeşînin. Di vê kongerê de biryar hate standin ku hemî hêzên kurd yê çekdar bikevin bin serokatiya Xalid Begê Cibrî û di roja Newrozê de 21. 03. 1925an de şoreş li seranserî kurdistanê Tirkiyê pêkeve, lê rûdana hin bûyeran, bû sedemê pexistina Şoreşê di berî wextê xwe yê ku hatibû danîn û nîşankirin.

Şoreş li gelek herêman dest pê kir û bi berfirehî pêde çû û di hingê de rojnama Taymiz a Londunî, hejmara şoreşvanên çekdar bi 20,000î texmîn kir, di dema ku hin jêderên din texmîna 40,000î kirin. Wan şoreşvanan di bin al û serkêşiya

<sup>509</sup>-Hamid Mehmûd Îsa, **el-Muşkiletu'l-Kurdîyetî fi'ş-Şerqi'l-Ewset Minzû bidayetîha we Hetta Senete 1991**, mektebetu Medbûlî, Bor-Se'îd 1992, r. 61-62.

<sup>510</sup>-Hemdî, h.b., r. 323-324.

<sup>511</sup>- Li ser pîrsa Mûsilê, b.f. bnr. Îsa, h.b. r. 64-71.

<sup>512</sup>-Şêrgoh, h.b., r. 92-93.



serokê xwe yê rûhî Şêx Se'îd de, dest bi rêvebirî û pêşdebirna şoreşa xwe kirm û karîbûn di du heftiyên tenê de tevahiya Xerbût, Elezîz, Dêrsim, Xinis, Varto, Erxenî, Çermola û Melatyê kontrol bikin û paşê berê xwe bidne Diyarbekrê û ew jî tevli hin gund û bajarokê din azad bikin û bêxin bin destê xwe. Desthilatdariya tirkî, bi rengekî pir tund û tûj û xurt û hovane şerê şoreş û şoreşvana kir û karîbû di encamê de Şoreş vemrîne û bi dawî bîne û serok û serbazên şoreşê jî bide dadgeheke leşkerî û paşê wan bi darvebike.<sup>513</sup>

Ew sitemkarî û tundûjî gihişte asta xwe ya herî bilind di demên piştî pêxistina Şoreşa Şêx Se'îd de ku di sala 1925an de hatibû destpêkirin û li gelek herêmên kurdî belav bibû û di hingê de bi hezaran Kurd hatin kuştin û bi hezaran hatne sorgunkirinê Enadolê û bi sedan penaberî Sûriya û Îraq û Îranê bûn û hemî mal û milkên wan dest li ser hate danîn û Kurdistan hate dagirtin ji leşkerên dewletê ku hatina wan tenê ji bo dagirkirin û wêrankirina Kurdistanê û pelaxtina milletê kurd bû.<sup>514</sup> û ev jî hate çespendin di komkujiya ku wan leşkeran pêkanîn di gundê Eleqemşê de gava ew xelkên sivîl ku tê de dabûn hev û bi saxî hemiyên şewitandin tevli xaniyên wan.<sup>515</sup>

Tirkiyê bi sîstma xwe ya siyasiya nû, berê xwe da zanistiyê, rabû hemî dibistanên olî girtin û dest bi meşandina sîstema desthilatdariya partiyeke bi tenê kir, beranberî van bûyerên nû, kurdan jî berdewamiya çalakiyên xwe kirin û karîbûn di sala 1927an de kongerekî tevayî li dar bixin û tê de hemî sazî û serok û rûsipî û hemî kesên ku bi doza kurdî ve mijûl bicivînin û ji encama li darxistina vê kongreya, komeleya Xweybûn hate damezrandin, ew komela ku bi rengekî balkêş û hêja dakete gorepana xebata niştimanî û netewiyê û bandoreke berz û xuyayî li hişyarkirina milletê kurd bi tevayî û li hemî perçeyên welat bi hev re kir, nemaze di belavkirina ramanên netewî de di sedsala 20an de.<sup>516</sup>

Belê tiştê herî giring ku komela Xweybûn pê rabû, ew serhildana Ararat/Agirî (1927-1930) ku bi serkêşiya Ihsan Nûrî Paşa (1896-1976) bû, ew serhildana ku

<sup>513</sup>-b.f. li ser serhildana Şêx se'îd, bnr. Kemal Ehmed Mezher, **Intifadetu 1925 fi Kurdistan Turkîya**, menşûrat rabîtetu Kawa li's-Seqafeti'l-Kurdîyêti, Beyrût 2001. Şêrgoh, h.b., r. 91-101. Ciwêda, h.b., r. 481-499. Osman Aydin, **Kürt Ulus Hareketi 1925**, Can Matbaacılık, Doz Yayıncılık, Istanbul 2006.

<sup>514</sup> - Mekdul, h.b., r. 307-311.

<sup>515</sup> - b.f. li ser serpêhatiya Eleqemşê, bîner: Cegerxwîn, *Jînenîgariya min*, r. 154-169.

<sup>516</sup> - Tacuddîn, h.b., r. 116-117. Ciwêda, h.b., r. 502-507. Celîl, *el-Hereketu'l-Kurdîyêti fi'l-'Esri'l-Hedîs*, r. 198.

dewleta Tirkiyê xistibû qelaqek zor û nikarîbû wê serhildanê vemrînê ta piştî ku hemî rêyên kuştin û şewat û wêrankirin û kambaxkirinê li dijî wê pêkbinê.<sup>517</sup>

Hukûmeta tirkî di siyaseta xwe ya şofînê û regezperestî de li dijî milletê Kurd berdewam dikir û dabû ber çavê xwe ku Kurdan hemî bikî Tirk û kultûr û folklor û kelepûrê wan binpê bike, wiha jî va ku ji zimanê erebî jî xilas bibî ji ber ku ew zimanê ola islamî ye, ji ber wiha jî di sala 1932an de biryarek da bi qedexekirina bangdanê (azan) bi zimanê erebî.<sup>518</sup>

Çiqas dem derbas dibû, pêre jî asta tundûjîyê û siyasete regezperestiyê jî pê re zêdetir dibû li dijî kurdan, nemaze piştî derxistina çend biryar û mersûman ku bi wana gotina; Kurd yan jî Kurdistan, dihate hesêbkirin gunehkarîyeke mezin ûxwedyê xwe dixiste tehlûke û astengîyeke giran û bi dana peryên pir jî dihate cizakirin û di ser van tiştan hemîyan de jî, navê Kurdan kirin; Tirkên çiyayî.<sup>519</sup>

Ev karên han, hîn bêhtir dijwar û tundtirbûn di pey şoreşa Seyid Riza de (1937-1939), gava ku leşkerê dewletê bi rengekî hovane şoreşa wî vemirandin û bi hezaran ji nişteciyên herêma Dêrsimê kuştin û birîndar û penaber kirin.<sup>520</sup> Hêjayê gotinêye ku Serokê hukûmeta tirkî Recep Teyyib Erdogan di roja çarşemê de, di 23.11.2011an de, bi navê milletê Tirkî lêborîn xwest ji ber komkujiyên ku li Dêrsimê pêk hatibûn.<sup>521</sup>

### 3.2.6.2. Kurd Li Îraqê:

Ji sala 1918an de Ingilîzan Îraq xistibûn bin hukmê xwe û Kurdistana Îraqê jî di nav de, ji bilî Silêmaniyê ku Şêx Mehmûdê Hefidê Berzencî (1881-1956) ragihandibû Silêmaniyê wek şehneşînek û xwe kiribû Şahê wê di 18. 11. 1922an

<sup>517</sup> - Îsa, h.b., r. 367-368. Tacuddîn, h.b., r. 117-119.

<sup>518</sup> - Mekdul, h.b., r. 329.

<sup>519</sup> - Qadir, h.b., r. 101.

<sup>520</sup> - Celîl, el-Hereketu'l-Kurdîyê fi'l-'Esri'l-Hedîs, r. 217-221. Mekdul, h.b., r. 326-327.

<sup>521</sup> - D. P. News, "Erdogan ye'tezir 'en'l-Mecazir didde'l-Ekrad fî Dêrsim fî selasînatî'l-Qernî'l-Madî, (m. w. 23. 11. 2011) (m.j. 20. 02. 2016) <http://www.dp-news.com/pages/detail.aspx?articleid=104111>

de.<sup>522</sup> Lê gava berjewendiyên şehneşînê û berjewendiyên Ingilîzan li nav guhê hev ketin, yekser Ingilîzan destwerdanî kirin û dewleta Silêmaniyê rûxandin û Şêx Mehmûd sorgunî Hindê kirin. Lê gelekî dom nekir û Ingilîz mecbûrbûn ku Şêx Mehmûd dîsa vegehrînin û dîsa wî li ser textê şahînsahiya Kurdistanê bi cî bikin ji bona ku tenahî û seqamgêrî vegehrînin herêmê piştî vexistina şoreşa 1920an li Îraqê û destpêkirina protesto yê gelêrî û weke bersiveke li ser serhişkiya tirkan di doza Mûsilê de nemaze di dema ku Rêxistina Gelan komîteke şandi bû Îraqê (1925-1926) û wê komîte wesiyeta parastina berjewendiyên kurdan di karûbarên îdarê de kiribû û daxwaza qebûlkirina zimanê kurdî kiribû ku bête hesabkirin wek zimanekî fermî di dadgeh û dibistanên herêmê de, wiha jî Rêxistina Gelan pêşinyara rêdana derfetê ji pîraniya Kurda re di herêmê de dabû ku ew ji xwere hukmekî xwecihî têde damezrînin.<sup>523</sup>

Ingilîz ne rastgo bûn di sozên xwe yê ku bi Şêx Mehmûdê Hefîd re dabûn bi damezrandina dewleta Kurdistanê û ne jî ta bi doza Mûsilê jî, ji lewra çawa ku herêm kete tenahî û seqamgêriyê, rabûn dîsan dest bi êrîşên ser Kurdan kirin ku Şêx Mehmûd mecbûrî vekişandşna bi alî Îranê ve kirin. Gava bi dawîkirina raspardeya Berîtanî li ser Îraqê hate ragihandin û girêbesta di navbera Îraq û Ingilîzan de ku hatibû girêdan, basa tu mafên Kurdan têde qet ne hatibû nivîsandin, Kurdan biryara xwe dan ew hîlbijartinên dewleta Îraqî ku divê pêk bînin baykot bikin û ji nû ve dîsa Şêx Mehmûd dest bi pêxistina Şoreşa xwe ya sêyem kir di sala (1930-1931ê) de û gelek serkeftin jî bi dest xistin û hewldana azadkirina Kerkûkê jî kir, lê şoreşa wî careke din hate rûxandin, piştî ku hate pêşwazîkirin bi karên herî tund û hovaniyên bê sînor.<sup>524</sup>

Şêx Mehmûd di 13. 05. 1931an de hate girtin û ew xistin bin cihwariya neçarî (îqama cebrî) li başûrî Îraqê, lê bi pêxistina şoreşa Reşîd Alî Kêlanî di sala 1941an

---

<sup>522</sup> - Hemdî, h.b., r. 157.

<sup>523</sup> - Mes'ûd el-Berezanî, **el-Berezanî we'l-Heretu't-Teherurîyeti'l-Kurdîyetî**, c. 1, menşûrat rabîtetu Kawa li's-Seqafeti'l-Kurdîyetî, Beyrût 1997, r. 19-21. b.f. li ser pamanên di navbera Berîtanya û Îraqê bnr. Ebdurrezaq el- Hisnî, **Tarîxu'l-Îraqî'l-Hedîs**, c. 2, er-Rafîdeyn li't-Tiba'etî we'n-Neşir, Beyrût 2008.

<sup>524</sup> - Ebdurrehman Qasimlo, **Kurdistan we'l-Kurd – Dîrasetun Siyasîyetun we'Iqtîsadiye**, ter. Sabit Mensûr "Xanim Hemdûn", metbe'etu Şivan, es-Sulêman îye 2008, r. 89.

de, Şêx karîbû careke din xwe bighîne Silêmanîyê û tê de jiya ta roja kû çû ser dilovaniya xwe di sala 1956an de bi sedema nexweşîyeke giran ku pê ketibû.<sup>525</sup>

Eger serhildan û şoreşên Şêx Mehmûdê Hefîd li bajarê Silêmaniyê û dormadorê wê tenê bûn, lê hin navçeyên dijî di Kurdistanê de ji van serhildan û şoreşan ne bêpar bûn û malbata Berzaniyan serkêşîya wan dikirin. Di sala 1931an de Şêx Ehmedê Berzanî bi tevgera xwe rabû li dijî arandinên (belafirotinên) ku hukûmeta Îraqî û bi piştgiriya Ingilîzan dijî Kurdan dikir, lê tevgera wî bi ser neket û neçû ser bi sedema destwerdana Ingilîzan û piştgiriya wan ji hukûmeta Îraqî re û di wê tevgerê de, bandoreke mezin ji aliyê Mela Mustefa Berzanî ve li ser rêveberî û herikandina bûyeran de hebû û ji wê çaxê û vir de, dest bi serkêşîya tevgera kurdî kir.<sup>526</sup>

Di sala 1936an de wergêranekê (inqîlabeke) leşkerî li îraqê çêbû bi serokatiya serbazekî îraqî bi navê Bekir Sidqî yê ku piştewaniya mafên milletê kurd dikir, lê wergêrana wî dom nekir û hate bidawîkirin bi kuştina wî di sala 1937an de.<sup>527</sup>

Hêjayê gotinêye ku Bekir Sidqî di hingê de hate tometbarkirin (itîhamkirin) bi hevaltiya xwe ji Kurdan re û ev tometpêvekî ne ku ji ber rasteqînîyek bû, belê tiştê ku wan şofînî û regezperestên Ereban dehf didan bi alî wê tometbarkirinê ve, ew bû ku eslê Bekir Sidqî Kurd bû.<sup>528</sup>

Di sala 1939an de partiya siyasî ya kurd a yekem bi navê (Hêwa) li îraqê hate damezrandin ku gelek ji xwenda û rewşenbîrên kurd di damezrandina wê de hevpişk û par bûn û bi gihîştina ramanên komonistî ji kurdistanê re di destpêka salên 40î de, partiya (şoreş) hate damezrandin û rojnameyek bi heman navî jî derxist û wiha jî di

---

<sup>525</sup>-Muhemmed 'Ebdul'atî, "*Hereketu eş-Şêx Mehmûd Hefîd el-Berzençî*", el-Cezîra net, (m. w. 24. 05. 2006) <http://www.aljazeera.net/specialfiles/pages/45eb7969-58d3-4a3f-bd7b-29b8300b0a0e>(m.j. 11. 12. 2015)

<sup>526</sup>- Îsa, h.b., r. 157-158.

<sup>527</sup>-b.f. bnr. Hamid el-Hemdanî, "*Min Zakîreti't-Tarîx Seb'ûne 'Amen 'Ela Inqîlab el-Ferîq Bekir Sidqî*", el-Qismi'l-Ewwel, el-Hîwari'l-Mûtemeddin, el-'Eded 1704 – 15. 10. 2006, (m.j. 13. 12. 2015) <http://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=78250>

<sup>528</sup>- Mekdul, h.b., r. 437.

sala 1945an de partiya (rizgarî) hate damezrandin ew partiya ku ramanên çep û markisî bi xwe ve hildigirtin.<sup>529</sup>

Lê Mustefa Berzanî di navbera salên (1943-1945an) de dest bi şoreşa xwe ya duyem kiribû, ji ber ku regezperestên Ereba daxwazên wî yê netewî red kiribûn, lê şoreşa wî bi ser neket bi sedema êrîşên rêjîma îraqî yê tund û berfireh ku bi alîkariya Ingilîzan di birine ser şoreşa wî, rabû Mela Mustefa berê xwe da Îranê û gihişt Qazî Mihemedê ku xweseriya Kurdistana Îranê (Mehabad) ragihandibû di sala 1946an de. Di wê salê bi xwe de jî Berzanî partiya Demokratî Kurdistan li Kurdistana Îraqê damezrand. Piştî hilweşadina komara Kurdistanê, Berzanî berê xwe da yekîtiya Sovyatî (Rûsya) û di encama rêwîtiya xwe ya bi navûdeng ku bêhtir ji 50î rojî berdewam kir, karîbû tevî 500 pêşmergeyên xwe çemê Aras derbas bikin û bighêjin dewleta Sovyetî.<sup>530</sup>

### 3.2.6.3. Kurd Li Îranê:

Bi destpêkirina sedsala 20an re herêmen kurdî li Îranê her û her bi tevger û çalakiyên çekdarî li dijî rêjîmên Îranî yê li dû hev radibûn û nemaaze li herêma Ormiya û derdorên wê ku di hate jimartin ji navendên herî sereke ji tevger û şoreşên kurdê îranê re li dijî rêjîmên Tehranê. Di sala 1908an de Kurdan êrîş birne ser navendên dewletê yê di navbera Ormiya û Salmas de û di hingê de Osmaniyan navtêdan didane Kurdên Îranê ku bi karên wiha rabin û hin caran jî hinek alîkariyê bi wan re dikirin ji ber ku ew herûher bi dewleta Îranî re dij û dijmin bûn.

Wan tevger û tevheviyan berdewam kir ta roja ku şerê cîhanî ya yekem (1914-1918) dest pê kir û leşkerê rûsî berê xwe da wan ciyan û serkeftinên mezin bi dest xist û Qesra Şêrîn di sala 1916an de dagirkir û kete Xaneqînê. Di wê demê de, Kurdan biryara xwe dan ku li tenişt Tirkan bisekinin ji ber gelek sedemên ku girêdayîbûn bi peywendiyên di navbera Ingilîz û Rûsan de ji alîkê ve û ji alîkê din ve

<sup>529</sup> - Hemdî, h.b., r. 236-237.

<sup>530</sup> -b.f. li ser vê serdemê, bnr.el-Berezanî, h.b., r. 85-140.

ji ber wan karên hovane ku leşkerê rûsî pê rabûbûn li dijî kurdan û herêmên Kurdî bi tevayî.<sup>531</sup>

Şoreşa Isma'îl Axa (Simkoyê Şikakî) tê hesêbkirin ji giringtirîn tevgerên kurdî yê di destpêka sedsala 20an de ku dest pê kiribûn, Simko Axa xwedî şaneke mezin bû di nav milletê Kurd di Îranê de û dihate hesêbkirin nûnerê Kurdê Îranê û rêzgirtineke bêhempa jê re hebû ne li ba Kurdên Îranê tenê belê li ba Kurdên Îraq û Tirkîyê jî û wî karîbû ew valahiya vekişandina leşkerê Rûsî di welat de hiştibû piştî serkeftina şoreşa komonistî li Moskow bi tamamî dagire û di sala 1921an de karîbû hukûmeteke kurdî ya ser bi xwe li başûrî gola Ormiyayê damezrîne û hukûmeta Îranê danpêdanê pê bike.<sup>532</sup>

Simko dest bi girêdana pêwendiyên diblomasî bi dewletên biyanî re kir û rojnameyek bi navê Kurdistan derxist û bandoreke mezin ya Tahayê Nevîyê Şêx Ûbeydullahê Nehrî lê hebû, lê ev tiştên ha cîyê diltengiyê bû ji hukûmeta Îranê re ya ku dijî pirojeya pêkanîna çî qewarek (keyanek) Kurdî yê ser bi xwe her û her disekinî.

Di destpêkê de, Simko berê xwe dabû girêdana pêwendiyên bi Ingilîzan re, lê paşê berê xwe ji Ingilîzan guhert û da Tirkîyê, lê ew girêbesta ku di nav Tirkan û Îraniyan de çêbû li ser li hevkirina danîna sînorê di navbera herdu dewletên wan de, bû sedema ku herdu dewlet bi hev re alîkariyê bikin di vemirandina tevgera Simko de.<sup>533</sup> Simko berdewam ma di şerê dijî hukûmeta Îranê de ta ku hate kuştin di sala 1930î de bi destê hukûmeta îraniya ku şandibûne dû wî ji bo ku bi hev re got û bêjan bikin. Piştî şoreşa Simko, serhildaneka nuh li Hemedanê dest pê kir, lê dîsa desthilatdarên Tehranê ev serhildan bi rengekî kirêt û hovanê têk bir û vemirand û bi awakî hîn tundtir û xurtir şerê Kurdan kirin û kultûra wan û ta wergirtina cilên kurdî jî li wan qedexe kirin.<sup>534</sup>

<sup>531</sup> - Hemdî, h.b., r. 387-389.

<sup>532</sup> - Îsa, h.b., r. 388-389.

<sup>533</sup> - Celîl, el-Hereketu'l-Kurdîyefî fi'l-'Esri'l-Hedîs, r. 159-160.

<sup>534</sup> - Qasimlo, h.b., r. 90. Hatî gotin jî ku di sala 1929 hatiye kuştin û herdu lawên wî (Xisro û Umer Axa) şûna wî girtine di serokatîyê de, lê ne wekî bavê xwe bûn bi wê hês û xurtbûnê de, b.f. bnr. Îsa, h.b., r. 387.

Di sala 1934an de, şah Rizayê Behlewî navê welatê xwe guherand û ji Faris kire Îran, ji alî Kurdan ve siyaseta vî şahî pir tund û tûj û regezperest bû, her û her diva ku nasnameya Kurdî ji kok ve winda bi ke û ji bo anîn û bicihkirina van armancên xwe jî, rabû zimanê kurdî qedexe kir û wiha jî wergirtina cil û bergên kurdî yê kelepûrî û navê hemî bajar û gundên kurdî wergerandin navên Farisî û dest bi koçkirina neçarî li kurdan kir û berê wan ji cih û warên wan dane Sultan Abad û Kerman û Şîrazê û di encama wê koçberiya neçariya sala 1935an de, gelek ji kurdan di rê de mirin.<sup>535</sup>

Kurdan gelek nexweşî û zehmetkêşî û azerî ji siyaseta şah Rizayê Behlewî ku li dijî wan dimeşand dîtin û di hemî warên aborî, kultûrî, tenduristî û perwerdeyê de û di ser de jî şah bi helmeteke mezin rabû da ku kurdan hemîyan bê çek bike û bi vî rengî hal dom kir ta dawiya desthilatdariya wî û ta destpêkirina şerê cîhanî yê duyem di sala 1939an de.<sup>536</sup>

#### 3.2.6.4. Kurd Li Sûriyeyê:

Di sala 1918an de Osmanî ji sûriyê derketin û hukûmeta yekem li şamê (Dîmeşq) hate damezrandin bi serokatiya Mîr Feysel û di sala 1920an de sûriye kete bin rasparda Ferensî li gorî biryarên peymana Sanrîmo, ku teqez kiribû hemî tiştên di peymana Saykis-Pîko de di sala 1916an de hatibû û bi wê yekê herêma Cezîrê ya li ser herdu çemê Ferat û Xabûr ku piraniya nişteciyên wê Kurd û koçerên Erebin, tevî xak û çandinî û petrola wê, hemî bête naskirin bi (navça A) û di bin desthilatdariyek Ferensî ya taybet de be).<sup>537</sup>

Ferensa destberdan ji Mûsilê kir ji Berîtanya re beranberî parekê ji petrolê di şerketa Elmanî de û gava Ferensa daxwaza radestkirina desthilatdariya Sûriyê ji hukûmeta xwe re kir û Melek Fêsel û bi hukûmeta xwe ve ev daxwaz red kirin, ferensa rabû dest bi dagirkirina sûriyê kir bi serkêşiya general Xoro û kete şerekî bi

<sup>535</sup> - es-Sebkî, h.b., r. 88.

<sup>536</sup> - Hozan Sulêman, Mîrxan ed-Doskî, **Cemhorîyetu Kurdistan (22 Kanûn es-Sanî 1946-17 Kanûn el-Ewwel 1946)**, metbe'etu wezaretî't-Terbîye, Erbil 2005, r. 22-23.

<sup>537</sup> - Kemal Dîb, *Tarîxu Sûriya el-Mu'asie Mine'l-Intîdabi'l-Ferensî Hette Seyf* 2011, daru'n-Nehar, Beyrût 2012, r. 37-39, 40.

leşkerê Sûriyê re li Meyselûnê ku Yûsif el-'Ezma bi kesayetiya xwe wek wezîrê berevaniyê serokatiya leşkerê sûrî dikir û di encama wî şerî de Yûsif el-Êzma û pir kes ji hevalên wî hatine kuştin û peyre leşkerê Ferensî kete Şamê û sûriya kete bin dagirkirinek Ferensî yê rasterast di sala 1920an de.<sup>538</sup>

Di sala 1920an de Ferensa rabû dest bi dabeşkirin û perçekirina Sûriyê kir û ew kire sê dewlet (dewleta Şamê/Dîmeşq, dewleta Helebê, dewleta Elewîyan) û di sala 1921an de dewleta çiyayê durziyan jî ava kir û Cezîrê hişte di bin desthilatdariya xwe ya dîrekt de.<sup>539</sup>

Di yazdehê Adara 1921an de girêbesta Enqera hate girêdan di navbera desthilatdarên rasperdiya Ferensî bi nûnertiya (Henrî Firanklan) û hukûmeta tirkî de bi nûnertiya Kemal Yusif wezîrê tirkîyê yê karûbarê derve di wê demê de û li gorî tiştên ku di wê girêbestê de hatibû nivîsîn, sînore di navbera Tirkîyê û Sûriyê de bi alî başûr ve were lebitandin, bi rengê ku xeta tirêna Bexdadê ew bi xwe bibe sînore di navbera wan de û li hemberî vê yekê jî Ferensa bajarên Kilis û Bêrdcîk û Urfa û Entab bi dev Tirkîyê de berde beranberî hinek berjewendiyên aborî ji xwe re û ji alîkî din ve jî Ferensa soz da Tirkan ku ew ê sistemeke îdarî ya taybet di iskenderonê de pêk bîne ji bo xatirê wan Tirkên ku tê de dijîn û di heman demê de Ferensa rabû Cizîra Jor û kurdax (Efrîn) û Kobanê dane dewleta Sûriyê û bi vê yekê Kurd jî ketin bin desthilatdariya rapardeya Ferensî.<sup>540</sup>

Di destpêka dagirkirina Sûriyê de, Siyaseta Ferensiyî ew bû ku xwe nêzîkî Kurdan bikin, ji lewra jî Ferensa soza damezrandina herêmeke xwedî hukmekî otonomî bi serokatiya Mehmûd Paşayê Millî bi Kurdan re dabû ku sînoren wê herêmê Orfa û Serêkaniyê û Mêrdîn û Nisêbîn û Cizîra Botan hemiyan bi xwe ve

<sup>538</sup>- Semîr 'Enhûrî, Sûriya we'l-Intîdabi'l-Ferensî 1920-1946, (m.w. 15.03.2003), [http://www.maaber.org/issue\\_august03/lookout2a.htm](http://www.maaber.org/issue_august03/lookout2a.htm) (m.j. 03.02.2016)

<sup>539</sup>- Dîb, h.b., r. 42.

<sup>540</sup>- Ferset Merî, "*Ekradu Sûriya we Sîra'u'l-Muhafezetî 'Ele'l-Hewîye*", mecelletu'l-Beyan, (m.w. 13.04.2014),

<file:///C:/Users/barin/Desktop/%D8%AA%D8%A7%D8%B1%D9%8A%D8%AE%20%D8%AD%D8%AF%D9%8A%D8%AB%20%D9%85%D9%82%D8%A7%D9%84%D8%A7%D8%AA%20%D8%A7%D9%86%D8%AA%D8%B1%D9%86%D9%8A%D8%AA%20%D8%B9%D9%86%20%D8%B3%D9%88%D8%B1%D9%8A%D8%A7/%D8%A3%D9%83%D8%B1%D8%A7%D8%AF%20%D8%B3%D9%88%D8%B1%D9%8A%D8%A9%20%D9%88%D8%B5%D8%B1%D8%A7%D8%B9%20%D8%A7%D9%84%D9%85%D8%AD%D8%A7%D9%81%D8%B8%D8%A9%20%D8%B9%D9%84%D9%89%20%D8%A7%D9%84%D9%87%D9%88%D9%8A%D8%A9.html> (m.j. 03.02.2016.)



bigre, lê xuyaye ku Ferensa paşê ev ramana ha ji serê xwe avêt nemaze piştî Îmzakirina peymana Firanklan-Boyun (girêbesta Enqera ya yekem) ya sala 1921, ya ku di encama wê de Ferensa gelek perçeyên mezin û fireh bi dest tirkîyê ve destberdabû, lê ew li ser parastina xwe ji Eşîra Millan re ma berdewam û çend sozan jî ji Tirkan standin ku wê bihêlin Millî vegerin navendên xwe yên li Wêranşehrê.<sup>541</sup>

Milletê Sûriyê ji destpêka dagirkirina Ferensiyên ve bi gelek şoreşan li dijî wan rabûn (şoreşa Ibrahîm Henano li çiyayê Kurdan di sala 1921an de, şoreşa Salih el-Elî li çiyayên Elewiyan di sala 1921an de, şoreşa Sûrî ya mezin di sala 1925an de) û wiha jî di herêmên kurdî de berxwedanên li dijî Ferensiyên rû dan, wek bûyerên ku li Beyandûr çêbûn di sala 1923an de û rûdanên ku li dû xwe anîn, gava ku hêzên Ferensî bi hêzên Kurdî û Sûrî re ketin şer û di encamê de generalê ferensî Rogan hate kuştin û pir qurbanî çêbûn ji herdû aliyên û Ferensî êdî hew dikarîbûn bikevne herêmê bê razîbûna serokên Eşîrên Kurdî weka Haco Axayê Hevêrkî û Evdiyê Xelo Axayê Mêrsînî.<sup>542</sup>

Di sala 1926an de û li gorî girêbesta Enqera ya duyem, sînor di navbera Sûriyê û Tirkîyê de hate danîn û bi rengê zelal û eşkere tê de hate nivîsandin ku bingehê vê girêbestê, girêbesta Enqera ya yekem ku di sala 1921an de pêkhati bû. Ji alîkî din ve, biryar hate standin ku çî nakokiyên sînorî di navbera herdû dewletan de di paşerojê de çêbin, wê bi rêya dadgerîxwestinê re (tehkîmê re) werin çareserkirin û wiha jî çî tiştên girêdayî bi radestkirina tawanbaran û gunehkaran û sekna li dijî çeteyan ser herdû aliyên sînor û evê girêbestê hişt ku ferensî sînorê xwe yê bakur baş biparêzin û bêxin bin çavê xwe bi temamî di sala 1926an de.<sup>543</sup>

Di hezîrana sala 1928an de Kurdan daxwaznameyek pêşkêşî encumena damezrandina Sûrî re kirin, tê de daxwaz kirin ku zimanê Kurdî jî bête xwendin li teniştê zimanê Erebî di herêmên Kurdî de û mamûrên ku li herêma wan bêne

---

<sup>541</sup>- Muhammed Cemal Barût, **et-Tekewînu't-Tarîxîyî'l-Hedîs li'l-Vezîreti's-Sûriya, Esîletun we Işkalîyatu't-Tehîwwil Mine'l-Bedwenetî Île'l-Umrani'l-Hederî**, el-Merkezi'l-Erebî li'l-Ebhas we Dirasetu's-Siyasat, Beyrût 2013, r 132-133.

<sup>542</sup>- Xalid Îsa, **"el-Ekrad Tehte'l-Infîdabi'l-Ferensî - 1"**, (Kurdîstana binxetê), el-Ciz'il-Ewwel, (m.w. 28.11.2004), [http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix\\_Kurdistan/TarixaSuri\\_Tevlihev/Nerinekji\\_KurTuralidIsa.htm](http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix_Kurdistan/TarixaSuri_Tevlihev/Nerinekji_KurTuralidIsa.htm) (m.j. 05.02.2016).

<sup>543</sup>- Barût, h.b., r. 160-162.

destnîşankirin ji Kurdan bin, lê ev daxwazên wan nehatin erêkirin. Di vê demê de, çalakiyên komela xweybûnê pirtir û firehtirbûn di herêmên kurdî de bi tevahî û li bajarê Şamê bi taybetî, ji ber ku Mîr Celadet li Şamê dijiya û di hingê de dest bi derxistina kovara (Hawar) bi zaravê Kurmancî di meha gulana sala 1932an de kir û bingehê Elfabêya Kurdî ya latîni danî û Ferensiyaniyan bi çavekî erênî li van karan nêrtin û bişgirî danê.<sup>544</sup>

Ferensiya navtêdana didane kurdên xwedî ramanên netewî ku çalakiyên xwe yê siyasî yê herî xurt li herêma Cezîrê bikin û Cezîrê hesêb bikin navenda xwe ya sereke ji ber tu girêdanên îdarî di navbera Cezîrê û herêmên kurdî yê din detunebûn, belê her çarçewek ji halê xwe re bû û cida bû ji çarçewa din, nemaze tunebûna rê û rêbarên qîr û ziftkirî di navbera wan çarçewan de, dihişt ku pêkanîna girêdaneke xurt di navbera wan çarçewên kurdî de bi regekî rêk û pêk, tiştêkî pir zehmet be.<sup>545</sup>

Û herêma çiyayê Kurdaxê berxwedanek tund û xurt dijî Ferensiya kir û nemaze di serhildana xwe ya sala 1930î de bi serokatiya Ibrahîm el-Xelîl. Wiha jî endamên komela Xweybûnê di 3û4ê tebaxa sala 1930î de civiyaniyan û biryara piştgirî û alîkariyê bi şoreşa Agrîdaxê re sitandin û ji bona pêkanîna wê alîkariyê bêxin rojevê, biryar dan ku ji çar aliyên ve êrişê bibin ser leşkerê tirkî, aliyê yekem ji alî Kobaniyê ve bi serkêşiyaya herdû birayan (Bozan Begê Şahîn û Mustefa Begê Şahîn), aliyê duyem ji alî Serê Kaniyê ve bi serkêşiyaya Mehmûd Begê Ibrahîm Paşayê Millî, aliyê sêyem ji alî dirbêsiyê ve bi serkêşiyaya Qedrî Begê Cemîl Paşa û Ekrem Begê Cemîl Paşa, aliyê çarem ji aliyê nisêbînê ve bi serkêşiyaya Haco Axayê Hevêrkî û tevî ku herdû biran Bozan û Mustefa û Haco hin serkeftin bi dest xwe xistin jî, lê leşkerê Tirkî yê têr hêz û çek karîbû wan êrişan rawestînin û Haco mecbûr bikin ku vekişe Başûr.<sup>546</sup>

Di sala 1932an de Ferensa Cezîrê kire senceqeke taybet û piştê rê da tevgera netewiya Erebi ku hukûmeteka xwe damezrîne li seranserê erda Sûriyê û ev tişt bû

<sup>544</sup> - Mekdul, h.b., r. 694.

<sup>545</sup> - Cûdî Tacal, "*Ekradu Sûriya...et-Tarîxu we's-Siyasetî we'l-Mucteme*", ter: Misellem 'Ebid Talas, Medarat Kurd, (m.w. 02.01.2014), <http://www.medaratkurd.com/?p=675> (m.j. 05.02.2016)

<sup>546</sup> - Xalid Îsa, "*el-Ekrad Tehte'l-Intîdabi'l-Ferensî -2'*", Mewqî' (Kurdîstana binxetê), el-Cizî's-Sanî, (m.w. 18.11.2004), [http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix\\_Kurdistan/TarixaSuri\\_Tevlihev/XwendinekDiroki\\_kurdilisu\\_ri.htm](http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix_Kurdistan/TarixaSuri_Tevlihev/XwendinekDiroki_kurdilisu_ri.htm), (m.j. 05-02-2016).

sedema diltengiya kurdan û ta xiristyanên Cezîrê jî û ew gavavêtina Ferensî şermezar kirin. Di vê demê de stêrka Haco Axa zêde geş bibû, nemaze ku ew ji endamên komela Xweybûnê yên herî berz û giring dihate jimartin û bû yek ji çalakvanên pir jêhatî di belavkirina ramanên neteweyê kurdî re di Cezîrê de ta ku ew bû yek ji wan kesên hevkarê Mehmûdê Millî û serokê şaredariya Qamişlo di daxwaziya pêkanîna Hukmê otonomî ji herêma Cezîrê re û redkirina pirojeya hukûmeta Şamê.<sup>547</sup>

Di sala 1937an de hin bûyerên xwîn rêjî li Amûdê rûdan di encama hin dijberiyên ku di nav kurdan û xiristyanên Amûdê de çêbûn û kurdan dest bi raperîne kir, lê Ferensa ji wê raperîne pir dilgiran bû û destwerdanek rasterast di vemirandina wê de kir, ta bi balafirên xwe di bombebarankirina Amûdê de bikaranîn û zîyanên pir mezin gihandine bajêr. Piştî bi dawîbûna van bûyeran û bi veqerîna tenahî û seqamgêriyê bi xêra destwerdana giregir û serokên eşîran û rûsipiyên bajêr, kurdan ji nû ve dest bi çalakî û tevgeran kirin û rabûn yaneya Ciwanên Kurd li Amûdê damezrandin û rola Cegerxwîn di wê damezrandinê de pir giring û berçav bû.<sup>548</sup>

Siyaseta Ferensa bi kurdan re, her li gorî asta peywendiyên wê bi Tirkiyê re bû û li gorê wê astê jî dihate guhertin û weke mînak li ser guherînan gava ku peywendiyên di navbera herdukan de pir xweybûn, Ferensa kir ku hinek ji siyasiyên kurdan ku ji ber sitemkariya tirkan bazdabûn û daketibûn Sûriyê, radestî dewleta tirkî bike wek Nûreddîn Zaza û gelek ji wan siyasiyên kurd jî di sala 1937an de sorgunî Şam û Tedmurê kirin û wiha jî deriyê çapxana kovara Hawarê girt û Ferensa van karan hemîyan kir di bin navê ku Kurd piştgiriya erebên netewiyê Sûrî dikin li dijî Ferensiyên.<sup>549</sup>

Di meha Eylûna sala 1938an de, kongera Cezîrê ya geştî rûnişt bi serokatiya Haco Axa, yê ku ji xwe re hukmekî otonomiyekî tam ji Ferensa xwest û bi vê boneyê nûnerê samî yê ferensî soz da yê bi dana sistemeke taybet ji Cezîrê re. Bi rastî jî di

---

<sup>547</sup> - Mekdul, h.b., r. 698.

<sup>548</sup> - b.f. li ser serpêhatiya Amûdê, bin. Cegerxwîn, Jînenîgariya min, r. 216-231. – Xalid Îsa, "el-Ekrad Tehte'l-Intûdabi'l-Ferensî -3", Mewqî' (Kurdistan binxetê), (m.w. 01.01.2005), [http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix\\_Kurdistan/TarixaSuri\\_Tevlihev/SeidaxaDeqori.htm](http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix_Kurdistan/TarixaSuri_Tevlihev/SeidaxaDeqori.htm), (m.j. 03.03.2016).

<sup>549</sup> - Zaza, h.b., r. 46, 63-64.

sala 1939an de Ferensa Cezîrê –ya ku piraniya nişteciyên wê Kurdin- ji sûriyê cuda kir û di bin desthilatdariya xwe ya rasterast de hişt.<sup>550</sup>

### 3.2.7. Şerê Cîhanî Yê Duyem (1939-1945) û Bandora Wî Li Ser Kurdan:

Şerî cîhaniya duyem vêket û pêre rûçikên rûyê cîhanê hatin guhertin, di encamên vî şerî de gelek ziyanên mirovî û aborî li cîhanê seranser bû, wiha jî li ser asta kurdan gelek ziyanên mezin li wan bûn û gelek ji destpêketinên wan windabûn û ji dest wan derketin û bandora van tiştan li her çar dewletên ku Kurdistan li wana hatiye parvekirin jî hate xuyakirin û berçavkirin.<sup>551</sup>

#### 3.2.7.1. Kurd Li Tirkîyeyê:

Dewleta Tirkî durrî şerê cîhaniya duyem ma bû û ne ketibû nav û di 10. 11. 1938ân de Mustafa Kemal Atatürk mir û Ismet İnönü (1884-1973) bûbû serkomarê Tirkîyê di pey wî re û li ser heman rêbaza wî dimeşîya û weke wî jî hebûna milletê Kurd dida mendelayê (inkarê) û qîma xwe bi wilo tenê jî nanî, rabû dest bi koçkirina neçarî kir û berê hezaran ji Kurdan da bajarên Enadolê mîna koçberiya ku di sala 1946an de pêk hat.<sup>552</sup>

Partiya Demokrat bi serokatiya Ednan Menderes hate damezrandin û karîbû hukmê İnönü bi dawî bîne di sala 1950î de. Di dema Menderes de, hin guhertin di siyaseta hundirî ya Tirkîyê de çêbûn, ji wan guherînan destûra bangdanê bi zimanê erebî hate dan û dersên olî jî ketne nav dersên ku li dibistanan dihatin xwendin<sup>553</sup> û dewleta Tirkî bû endamek di hevpeymanîya Bexdyê de ya ku di sala 1955an de hate damezrandin<sup>554</sup>, lê rewşa Tirkîyê ya aborî di wê demê de di halekî pir xerab de

<sup>550</sup>- Mekdul, h.b., r. 698.

<sup>551</sup>- b.f. li ser şerê cîhanî yê duyem, bnr. Rîmon Kartiyê, el-Herbu'l-Alemiyeti's-Saniye, ter. Suhêl Semahe, Enton Mes'ûd, c. 1-2, mûessesetu Nofel ŞMM, Beyrût 1983

<sup>552</sup>- Mekdul, h.b., r. 591.

<sup>553</sup>- h.b., r. 593..

<sup>554</sup>b.f. li ser peymanîya Bexdadê ya di navbera (Berîtanya, Tirkiya Îraq, Îran, Pakistan)de, bnr. Ebdusselam Ebû's-Si'ûd, **Hilfu Bexdad**, daru'l-Me'r'ifeti'l-Cami'îye li't-Tebi'î we-n-Neşir we't-Tewzî', Misir 1957.

derbas dibû û dibû sedema ku pir rexne werne hukûmeta wî, ji alîkî din ve jî, Menderes xwe hinekî nêzîkî kesên olî û axayên kurdan dikir û ev yeka ha jî di bû sedema ku gelek rexne bêne wî ji aliyê endamên partiya Cimhûrî ve, wiha jî rexneyên tûj û tund hatinê ji aliyê xwendevanên zanîngehan û bêhtir ji wiha jî leşker lê hatin xezebê û li dijî wî bi wergêrana xwe ya leşkerî rabûn di sala 1960an de û hemî dezgeh û karûbarên welat xistine destê xwe û Ednan Menderes îdam kirin û destûrek nuh ji Tirkîyê re di sala 1961an de ragihandin û Ismet İnönü ji nû ve hate helbijartin ji aliye partiya gel ya Cumhûrî ve.<sup>555</sup>

Tevgera Kurdî hêdî hêdî dest bi vejandineke nû kir, nemaze piştî ku destûra nû tu guhertin ne xiste halê jiyana milletê Kurd, ji ber vê yekê komek ji rewşenbîrên kurdan rabûn di sala 1965an de dest bi derxistina hin kovaran kirin wek (kovara Deng û Roja Nû), lê belê hukûmeta Tirkî li dijî van çalakiyan disekinê û dida dûv her kesekî ku ti pêwendiya wî bi çalakiyek kurdî re hebû ya.<sup>556</sup>

Rol û bandora şêx û axan di meydana civakiya kurdî de dest bi zêdebûnê kir û di sala 1965an de partiya demuqrata Kurdistanê hate damezrandin.<sup>557</sup> Di helbijartinên sala 1966an de, desthilatdariya Tirkîyê kete destê Silêman Demirel û partiya wî (partiya Edalet). di wê demê de serberadeyeteke zor û hevsengîyeke bê hempa di nav Tirkên netewperst û Tirkên markisîyên komonîst de dest pê kir, ew dema ku ramanên markisî bi rengê berfireh di welatê tirkîyê de belav bibû û bandoreke xwe ya xurt li ser tevgerên siyasî yên di wê demê de hiştibû.

Hêjayê gotinê ye, ku di sala 1966an de hukûmeta tirkî civîneke bi dizî li dar xistibû û tê de mesela Kurdî xistibû rojevê û tê de çavê xwe gerandin li hemî rê û metodên ku karibin pê tevgera kurdî û cemawerên kurd ji hev cuda û dûrî hev bike di rêya damezrandina hinek pirojeyên kultûrî û aborî ji alî dewletê ve û wiha jî hukûmeta tirkî fermanek derxist ku çî pirtûk yan jî çî kasêten ku tenê hema behsa kurdî tê de hebî yan jî bi zimanê kurdî bî qedexeye ku ew derbasî Tirkîyê bibî. Di vê demê de, pêwendiyê di nav hêzên çepên tirkî û kurdan de dest pê kir û nemaze bi

<sup>555</sup> - Mehmûd Şakir, *et-Tarîxu'l-Islamî-et-Tarîxu'Mû'asir- Turkiya 1924-1989*, c. 17, el-Mektebu'l-Islamî (Beyrût, Dîmeşiq, 'Emman) 1996, r. 102-107

<sup>556</sup> - Celîl, *el-Hereketu'l-Kurdîyefî fi'l-'Esri'l-Hedîs*, r. 308.

<sup>557</sup> - Îsa, *el-Muşkiletu'l-Kurdîyefî fi's-Şerqi'l-Ewset Minzû bidayetîha we Hetta Senete 1991*, r. 376.

rengêkî xurtir di navbera wan û partiya Karkerê Tirkî de ya ku doza milletê Kurd pesend kiribû.<sup>558</sup>

Di sala 1971an de Silêman Demirel istifa kir û di sala 1973an de leşker carek din bû desthilatdarê Tirkîyê û rabû qanûn rawestand û rêveberiya awarte li ser milletê Tirkî ferz kir, piştî Bulend Ecewîd ji aliyê partiya millî ya cumhûrî hate hilbijartin ji serokatiya hukûmeta koalîsyone ku bi partiya Selameta neştîmanî re damezrandibû, lê careke din ji nû ve tevhevî û qelqele vegeyriyan dewleta Tirkîyê û dîsa rewşa awarte li welêt hate ferzkirin û bi rengêkî taybet li herêmên kurdî di sala 1979an de.<sup>559</sup>

Di sala 1980ê de wergêranê leşkeriya nû li Tirkîyê pêk hat û general Kenan Evrenn bû serokê hukûmeta nû. Evren ji roja pêşî de helwêsta xwe ji aliyê milletê Kurd ve zelal û eşkere kir, di gotineka xwe de gava eşkere got: "Kurd hene, lê em qet wan qebûl nakin ku ew welatê me perçe bikin, ew nikarin tu tiştî ji me bistînin û em ê çi tiştê ku ji me bê dê bikin, da ku vê pirsê ji reha ve hilkin û ji kokê ve rakin".<sup>560</sup>

Kurdan bi çavê nerazîbûnê li vê wergêranê û li encamên xerab ku bi xwe re anî li dijî milletê Kurd nêrîn û bi tundî girtina hezaran ji niştîmaniyên Kurd şermizarkirin û li hemberî van helwêstên şofînî û regezperestî, 12 partî û saziyên siyasîyê kurdên Tirkîyê daxuyaniyek hevbeş derxistin û tê de daxwaza rabûna bi çalakîyên tund û xurt li millet kirin ku li dijî hukûmeta wergêranê pêk bînin.<sup>561</sup>

Di sala 1983an de hukûmeteke nû li Tirkîyê hate damezrandin ji aliyê partiya Millet ya cimhûrî ve bi serokatiya Turkot Ozal ku paşî bû serokê komarê û bi vê yekê Ozal bû serkomarê sivilê yekem ku desthilatdariya Tirkîyê bike piştî Kemal Atatürk.<sup>562</sup>

<sup>558</sup> \_ Celîl, *el-Hereketu'l-Kurdîyefî fi'l-'Esri'l-Hedîs*, r. 310-311, 317-318.

<sup>559</sup> - h.b., r. 344.

<sup>560</sup> - h.b., r. 347.

<sup>561</sup> - Îsa, *el-Muşkiletu'l-Kurdîyefî fi's-Şerqi'l-Ewset Minzû Bidayetîha we Hetta Senete 1991*, r. 380.

<sup>562</sup> - Şakir, h.b., r. 149.

### 3.2.7.2. Kurd Li Îraqê:

Şoreşa 1958an li Îraqê dest pê kir bi serokatiya Ebdulkerîm Qasim ê ku hukmê Melek Feyselê duyem bi dawî anî û sistema komarî li Îraqê ragihand, şoreşa wî bû cihê razîbûna milletê Kurd, nemaze piştî ku di destûra Îraqê ya nû de hate nivîsandin, ku milletê Îraqê ji di neteweyên sereke pêk tê ku ew herdû netew Kurd û Ereb in û ji alîkî din ve jî serokê şoreşa Îraqê soz da Kurdan ku ewê mafê milletê Kurd bitemameti bi çespîne û wiha jî rabû lêborîneke (Efû) taybet derxist di derheqê Mela Mustefa Berzanî û her 500 hevalên wî yê ku pê re koçberî yekîtiya Sovyetî bibûn û destûra vegeza wan a welêt da.

Lê dem pir dirêj nekir bi sedema bînpêkirina Ebdulkerîm Qasim ji sozên wî ku bi Kurdan re dabû û hêdî hêdî sistema wî ji sistemeka demoqrati wergeriya sistemeke diktatorî, ta ku Berzanî mecbûrî vexistina şoreşa wî ya sêyem kir di yazdehê meha îlonê sala 1961ê de.<sup>563</sup>

Di sibata sala 1963an de partiya Be's bi wergêranekê rabû û hukûmeta Ebdulkerîm Qasim rûxand û Ebdusselam Arif li şûna wî kire serkomar. Be'siyan helwestên xwe yê nijadperestî li dijî neteweya kurd eşkerekirin û çî çareserên ji pirsgerêka kurdî re ku hebûn hemî red kirin, û bi vê yekê li ser dijminahiya bi kurdan re berdewamkirin û ev dijminahî û regezperestî hîj xurtir bû piştî ku Be'sî bi wergêrana xwe ya duyem rabûn di sala 1968an de.

Şoreşa kurdî çikas çû xurtir û bi hêztir bû û gelek serkeftinên mezin li dijî leşkerê Îraqê bi dest xwe xistin ta ku di sala 1970yê de hukûmeta Îraqê bi serokatiya Ehmed Hesen el-Bekir mecbûrî imzakirna girêbesta yazdehê adarê li Bexdadê bike û di wê agirbestê de dana hukmê otonomî ji milletê Kurdê Îraqê re bi şewekî nivîskî û zelal û eşkere pesend bike.<sup>564</sup>

---

<sup>563</sup>- Semî Fedlen Ebdulhemîd Muhemmed, **Ekradu'l-Îraq Tehte Hukmî Ebdilkerîm Qasim (1958-1963)**, risaletu macistêr, Camî'etu'z-Zeqaziâ, Misir (b.m.), r. 135,141,145.

<sup>564</sup>- Cîrard Caliyand, **Şe'bun Bidûnî Weten el-Kurd we Kurdistan**, ter. Ebdusselam en-Neqîşbendî, daru Aras, Erbil 2012, r. 236-238

Hukûmeta Îraqê wekî hukûmetên berê, dîsa li gotinên xwe qulibî û imza xwe dalast û sozên ku dabûn kurdan bin pê kirn û girêbesta yazdehê adarê hilweşand gava ku biryara hukmê otonomî ji aliyê xwe bi tenê ve ragihand di yazdehê adara 1974an de, ya ku Berzanî pesend nekir ji ber ku hin navçeyên kurdî ne xistibûn nav sînorê îdariyên hukmê otonomî yê ku ragihandibû û di nav wan navçeyan de Bajarê Kerkûkê hebû, ku Berzanî bi israr teqez kir ku Kerkûk perçeyek ji Kurdistanê ye, ya ku bû sedema pêxistina şerekî çekdarî yê nû di navbera Kurdan û hukûmeta îraqî de, encamên wê pir xirab bûn ji Kurdan re û bû sedema lawaziyekê ji şoreşa kurdî re.<sup>565</sup>

Hukûmeta Îraqê bi şahê Îranê Muhemmed Riza Behlewî re agirbesta ceza'ir di şeşê adara 1975an de imza kir û di encamê de qonaxeke giring ji qonaxên şoreşa kurdî a çekdarî bi dawî hat da qonaxeke nû di tevgera kurdî de dest pê bike ku ew jî qonaxa xebata siyasî ye û hin partiyên nû hatine damezrandin bi nêrînên siyasî yê nû weke partiya Niştmaniya Kurdistanî (YNK) bi serokatiya Celal Talbanî û hin partiyên din jî hatine meydanê û ji xwe partiya Demokrata Kurdistanî ma li ser berdewamiya xwe bi serokatiya Mustefa Berzanî.<sup>566</sup>

Di gulana sala 1976an de şoreşa kurdî dîsa ji nû ve dest pê kir li dijî hukûmeta Be'is û di vê qonaxê de Mustefa Berzanî, piştî nexweşiyê giran di adara 1979an de çû ser dilovaniya xwe, lê tevgera kurdî di rêya şoreşa gulanê de berdewamiya xebat û daxwaz û pêkanîna armancên xwe kir û hukûmeta Îraqî jî ji aliyê xwe ve berdewamiya qedexekirina ziman û kultûra kurdî dikir û dest bi koçkirina kurdan ji welatê wan dikir û berê wan dida herêmên erebî û di heman demê de dest bi anîna Ereban dikir û wan di herêmên kurdî de bi cih û war dikir ji bo guherînek dîmografî di Kurdistanê de çêke û bi taybetî ji roja ku Seddam Hisên bû serkomarê Îraqê di sala 1979an de, ku tu karek pîs û qirêj û kirêt û hovane li dinyayê nema û li dijî Kurdan nekir û pêknanî û Kurdan li hemberî van karan gelek ziyânên mezin dîtin û bi deh hezaran kesî canên xwe ji dest dan û bi hezaran gund hatin sotin û bi milyonê dînara xesar û ziyânên mal û milkên millet bû nemaze piştî ku Seddam Hisên kete şerekî bêhewade bi Îranê re ku heşt salan domkir (1980-1988), ew şerê ku

---

<sup>565</sup> - Mekdul, h.b., r. 506-508.

<sup>566</sup> - Qadir, h.b., r. 173-174.



Îraq seranser ji qidûm xist û lawaz kir ji hemî aliyên aborî, siyasî, civakî û kulûrî ve.<sup>567</sup>

### 3.2.7.3. Kurd Li Îranê:

Di çarê meha îlona asala 1939an de Îranê bi şêweyekî fermî ragihand ku ew dewleteke bê layen e di şerê cîhanî yê duyem de (1939-1945) û şah Riza Pehlewî hewl da ku ew rengê ji terazûyê di navbera hêzên ku şerê hev dikin de pêk bîne, lê xuya dike ku mêldariya Îranê bêhtir bi alî Elmanya ve diçû, ew mêldarî jî ji gelek sedeman dihat, sedema sereke jî ew serkeftinên bilez û li ser hev bûn ku Elmanya bi dest xwe dixistin di cengê de û ew serkeftin jî metirsiyên mezin li ba Berîtanya û Yekîtiya Sovyatî çêdikirin, ji ber vê yekê gelek hewldanên siyasî bi Îranê re kirin da wê dûtî Elmanya bêxin, lê hewldanên wan badîhewa çûn, ji lewra jî rabûn êrîşeke leşkerî di 25ê tebaxa sala 1941an de birin ser dewleta Îranê û karîni di 16ê êlûnê de şah Riza ji şahaniyê bavêjin û kurê wî şah Muhemmed Riza (1941-1977) li şûnê deynin.<sup>568</sup>

Muhemmed Riza hewl da ku siyaseteke berovajî ji siyaseta bavê xwe bimeşîne, lê xuyabû ku ji alî danûstandina bi kurdan re ti guherîn nexiste mitoda siyaseta bavê xwe, Kurd ji alî xwe ve ew halê ku Îranê tê de derbas dibû îstismar kirin û xwe hêdî hêdî nêzîkî Berîtanya û Yekîtiya Sovyatî kirin ku herdûka welatê wan li xwe par vekiribûn. Kurdan dest bi rêvebirîya herêmên xwe bi şêweyekî xwe bi xwetî kirin û di ber de jî hino hino cîwarên xwe firehtir dikirin, wiha jî hin qebîleyên Kurdî bi serkêşîya Heme Reşîd Xan ku ji kurdîstana Îraqê hatibûn wir, ew jî roleka wan ya giring bi destxistin û kontrolkirina çend herêmên kurdî de ji dest Îraniya hebû û wan daxwaza damezrandina herêmeka parastî ji alî Berîtanya ve li Kurdîstanê kiribû, lê Berîtanya ev daxwaza wan red kiribû, lê paşê Berîtanya bû navberçî di navbera Kurdan û hukûmeta Îranê de ku di Encamê de girêbestek di nav herduwan de hate imzakirin di nîsana sala 1942an de û li gorî naveroka wê girêbestê Heme Reşîd

<sup>567</sup> - b.f. li ser vê demê û komkujiyên di derheqê kurdan de ku hatine kirin û nakokiyên di nav Kurdan de xwe bi xwe, bnr. Mekdul, h.b., r. 515-550.

<sup>568</sup> - ed-Doskî, **Cemhorîyetu Kurdistan**, r. 26-29.

Xan bû desthilatdarê herêmeke ku ji Bane dest pê dikir û digha ta Serdeştê û ev dom kir ta dawiya sala 1944an ku leşkerên Îranî û bi alîkariyeke Berîtanî karîbûn desthilatdariya wî bi dawî bînin.<sup>569</sup>

Herêma Ormiya li bakurê Îranê bi çend serhildanan rabû li dijî desthilatdariya navendiya Îranî di dema hebûna hêzên Rûsî li wan deran û stêrka Emerxanê Şikakî dest bi geşbûnê kir û nav û rola wî di wê demê de berz bû û karîbû desthilatdariya xwe ferz bike li cîwarên berfireh ku ji Şahabadê dest pê dikir ta bi Mako ji alî bakur ve û dûv re xweserî û raqetandina xwe ji Tehranê ragihand û di wê gavê de gelek ji serok Eşîrên kurdî destê alîkariyê dirêjî wî kir û xwe xistin bin femandariya wî û bi hev re Ormiya xistin bin destê xwe, lê ev tiştê han hukûmeta Îranê xiste qeleqeka mezin û xwest bi hemî rengan ew desthilatdariya kurdî bi dawî bîne û paşê karîbû fişareke pir giran li Yekîtiya Sovyetî bike ku ew jî fişarê û gefan (Tehdîd) li Kurdan bike û fermna kişandina wan ji Ormiya bide û bi rastî jî wiha çêbû û pêk hat.<sup>570</sup>

Di heman demê de serhildanekê Kurdî li kermensah û navçeya Şino ya ku xwe ji Tehranê veqetandibû û desthilatdariya wê bûbû ji navçeya Mukreyanê li başûr û ta Ormiya li bakur û ji peravê başûrî rojhilatê gola Ormiya ji alî rojhilat ve tanî sînore Îraqê ji alî rojava ve, wiha jî Kurd karîbûn gelek navçeyên din jî bêxin bin destê xwe di dema ku hêzên Îranî ji wan cihan vedikişyan. Ji wan cihên nû ku bi dest xwe xistin navçeya Mukreyan û navenda wê Mehabad bû, Kurd rabûn tê de rêveberiyê otonomî ji xwêre tê de damezrandin bi serokatiya Qazî Muhemmed.

Wiha jî Kurdan serhildanek li navçeya Hewramanê bi serokatiya Ezîz Xan Zade Mehmûd Dezlî li darxistin û yeka din jî li navçeya Merîwanê bi serokatiya Mehmûd Xan Kanî Sanan û bi gelemperî hemî herêmên Kurdistanê dest bi serhildan û tevgerên çekdarî kirin li dijî desthilatdariya navendiya Îranî û armanca hemûyan jî bidawîkirina sistema Îranî û bidestxistina Hukmê otonomî ji Kurdistanê re bû.<sup>571</sup>

Ew salên ku şerê cîhanî ya duyem tê de dibihurî, ew sal bi xwe jî, salên nûzayîna saziyên siyasî yên kurdî bûn, ku bandora kurdistana Îraqê li damezrandina wan sazî û partiyên berz û ber çav bû û hajî bandora komela xweybûne di geşkirina

<sup>569</sup> - h.b., r. 36-39.

<sup>570</sup> - h.b., r. 42-46.

<sup>571</sup> - h.b., r. 48-53.

ramanên neteweyî û belavkirina kultûra kurdî di hemî perçeyên kurdistanê de her çiyê serbilindî û şanaziyê bû, ew hişyarî û rewşenbîriya ku bûn bingehê sedema pêşdeçûn û pêşvebirina tevger û xebata milletê Kurd bi temamî û li her alî û seranserê welêt. Ji ew sazî û partî û tevgerên ku pêk hatin (partiya azadîxwazên Kurdistan) ku bi serokatiya Aziz Zend bû û (komeleyî jîyanewî kurd) ku navê wê yê kurtebir (komele) bû, ku paşê wergeriya (partiya dîmoqrati Kurdistan-Îran).<sup>572</sup>

Lê mezintirîn bi dest xistiyên ku kurdan bi dest xwe xistibûn, damezrandin û ragihandina komara Kurdistan (Mehabad) bû ku di 22yê kanûna duyem de ji sala 1946an bi serokatiya Qazî Muhammed pêk hati bû û bi piştgiriya yekîtiya sovyatî jî, ala kurdî ya taybet hate hildan li ser seraya hukûmeta Kurdî û sirûda Kurdî ya taybet jî lê hate xwendin û komara kurdî hemû rûçikên komareke xweser bi xwe ve wergirtibû.

Herêmên ku ketibûn bin siya desthilatdariya komarê ji sedî 30 bû ji tevahîya herêmên Kurdistana îranê û di dmamezrandina vê komarê de desteke tund û dirêj ji Berzaniyan re bi serokatîya Mela Mustefa yê Berzanî di wê demê de hebû û li ber çava bû, ji ber ku wan berevanîyek bi hempa di ber de kirin ji encamên wê piştgirî û bervanîyê Mela Mustefa yê Berzanî ritba generalîyê ji alî Qazî Muhemmed wergirt. Bû çavdêr û serokê leşkerê kurdî yê komarê.<sup>573</sup>

Rewşa navnetewî li dijî berjewendiyên kurdî dihatin guhertin, Wuha jî yên di hundirên Îranê de desthilatdarên Îranê û bi piştewaniyeke Emerîkî û Ingilîzî di 17 ê kanûna pêşîn de ji sala 1946an êrişeke xurt birne ser Mehabadê û serkirdeyên wê hemî bi dar ve kirin, di nav wan de serokê komarê Qazî muhemmed bi xwe jî, ji ber texezula serkirdeya sovyetî ku xwe ji ber piştta kurdan da alî, ji bo hinek berjewendiyên xwe yên bi Berîtanya re beranberî hinek petrol. Ev yeka han roleke pir nêgatif di hilweşandina komarê de leyist.<sup>574</sup>

Serhildan û tevgerên siyasîyên kurdî li dijî desthilatdarîya îranê di piştî ruxandina komarê de qet ne rawestiyên û her berdewam kirin, Ji wana serhildana

<sup>572</sup> - b.f. li ser van tevgeran, bnr. h.b., r. 54-80.

<sup>573</sup> - h.b., r. 91-95, 106. – Qasimlo, h.b., r. 97-100.

<sup>574</sup> - Celil, el-Hereketu'l-Kurdîyê fi'l-'Esri'l-Hedîs, r. 212, 250- 251.

Ciwan ro di sala 1950 î de ku di ru yê sitemkarîya hukûmeta Îranî de rabû, guh neda gefên ku hukûmetê li wan di xwarin. Eger xwe radestî wê nekin.<sup>575</sup>

Partîya Demokrata Kurdistan careke din ji nû ve endam û hêzên xwe yên leşkerî dane ser hev û xwe baş bi rêxistin kirin. Bi xurtî nakokîyê bi desthilatdariya Îranê re kir. Ji sala 1967an ve dest bi şerê pêşmergetîyê (îsabatan) dijî sîstema Şah kirin, li dirêjahîya 18 heyvan seranser û li pêşberî vî şerî jî sîstema Îranî jî şerê kurdan her xurttir û diwartir dikir. Nemaze dijî her kesekî ku tu peywendîyê wî bi partîya demokrat a kurdistanê re hebûya.<sup>576</sup>

Girêbesta 11ê adara 1970yî ya ku di navbera hukûmeta Iraqî û şoreşa Kurdî de hatibû imzekirin, bandoreke xwe ya xurt û bi rengekî objektîf li bilindkirina moralên kurdên îranê kir bu sedema ku ew çalakîyên xwe yên siyasî zêdetir bikin, ji lewra jî rabûn bereke hevpar li dar xistin li dijî şahê Îranê yê ku sitemkarî û hovîtiya xwe hîn diwartir dijî milletê kurd û tevgera wî ya siyasî û leşkerî kir karîbû di navbera salên 1974 -1978 an de hinekî ji wan çalakîyên tevgerê kêmtir û lawaztir bike.

Di sala 1978 an de gelek serhildanên Kurdî dijî hukûmeta şah li kurdistanê dest pê kirin, di encamê de serokwezîrê Îranê di meha gulanê de destûra eşkerebûna partîyên siyasî di Îranê de ragihand, lê belê di vê demê bi xwe de bêhna pêketina şoreşekê di Îranê de dihata behnkirin, ev jî ew bu ku îslamiyan bi serkeşîya Xumeynî karîbûn desthilatdariya Îranê têxin destê xwe piştî ku sîstema şah nurxandin.

Xumeynî berî ku ji ferensa bigihê Îranê, gelek soz dabû ku ew ê hemî mafên demokratîya rewan û di nav de hukmê otonomî bide kurdan, lê piştî gihîştê Îranê û desthilatdarîyê bi temamî zeft kir, hew li sozê xwe bû xwedî û ew jî wekî ên berî xwe dest bi meşandina sîyasetek çewt û tund dijî milletê kurd kir. Tevlî ku gotûbêj û danustandinê berdewam jî çêdibûn ji bo çareserkirina doza kurdî bi rêyêke aşîti jî, lê belê her dem çaresera leşkerî ew bi ser diket. Bi sedema helwesta xirab ya sîstema îslamiya Îranî ku her li dijî kurdan û çareserkirina doza wa bû nemaze piştî wê perçekirina ku di nav Partîya Demokrata Kurdistan de rû dabû.

<sup>575</sup> - Ciwêda, h.b., r. 626.

<sup>576</sup> - Celîl, el-Hereketu'l-Kurdîyê fi'l-'Esri'l-Hedîs, r. 298- 299.

Gava Îran kete şerê li dijî Îraqê (1980-1988) Evdirrehman Qasimlo eşkere ragihand ku ew tu hevpişkî di vî şerî de nakin. Ji ber tu berjewendîya wan tê de tunne ye. Li hemberê wê ragihandina Qasimlo hukûmeta Xumeynî hêzên pir tund şandin Kurdistanê di sala 1981ê de da ku tevgera kurdî bi yek carê bi pelixîne, lê ew helmata giran bi ser neket, tevli wiha jî dîsa hukûmeta Xumeynî ma li ser dijminahîya xwe bi kurdan re, ev helwêsta dijminahîyê ji alî hukûmetê ve berdewam kir di sala 1974an û peyre.<sup>577</sup>

#### 3.2.7.4. Kurd Li Sûrîyeyê

Piştî şerê cîhanîya duyem bi dawî hat, tu rê li pêşîya Ferensa nema piştî nîrên navneteweyên nû ku derketin meydanê ji bilî derketina ji Sûrîyê, ew derketina ku bû sedema ketina Sûrîyê di qonaxeke nuh de ku nav lê hate kirin qonaxa piştî xweseriyê û damezrandina Sûrîyê nûjen.

Gelek hêzên siyasiyên Sûrî di avakirina vê dewleta nû de amadekar û hevpar bun, ji wan hêzan Partiya Komonîst a Sûrî bû ku serkêşê wê Xalid Begdaşê Kurd bû yê ku nav û dengê baş di nav milletê Sûrî de sitandibû, ji ber wan diruşmên ku pê bang dikir. Wek "Dadmendiya Civakî-wekhevi û şerê imperyalîzmê"<sup>578</sup>, Lê ewî tu guhdarî ne da doza neteweyî ya kurdî û lê nebû xwedî, tevli ku piraniya berpirsiyarên partiya wî jî kurd bûn.<sup>579</sup>

Li teniştê vê Partiya Komonîst, hin partiyên din jî xuya kirin û daketin meydanê, ku hûn ji wana xwedî ramanên netewiyên erebî bûn, hin jî xwedî ramanên oliyên islamî bûn, ji aliyê hêz û dewletên derveyî Sûrîyê, yekîtiya sovyetî û Emerîkîkî, her dû bûne hêzên sereke di cîhanê de, her yek ji wana ji xwe re li çarçuwên desthilatdariyê çavên xwe di gerand. Ji aliyekî din ve, Sûrîye di qonaxeke nû de derbas dibû ku tê de çend wergêranên leşkerîyê li dû hev berdewam di bun, hin ji wan wergeranan bi ser neketin lê hin jî bi ser ketin lê demeke dirêj hukim nekirin, berztirê wan wergêranan, wergêrana Hisnî Ze'îm bû ku hukmê Şikrî Qûwetlî bi dawî

<sup>577</sup> - h.b., r. 329-341.

<sup>578</sup> - Dîb, h.b., r. 82-83.

<sup>579</sup> - Nezan, h.j., h.l. – Zaza, h.b, r. 108..

anî di adara 1949an de. Ragihandina Hukmê leşkerî kir, pêre jî dest bi nêzikkirina xwe bi alî Tirkîyê û Emerîka de kir, lê ev nêzîkbûn bû sedema wergêraneke leşkeriya nû li dijî wî rabe bi serkêşiya Samî Hennawî bi alîkariya Edîb Şîşeklî û dawiya hukmê wî bîne.

Hennawî rabû di rêya parlamane de serokek şeklî hîlbijart û kire serok komarê Sûriyê bi navê Haşim el-Êtasî, lê yê ku bi rastî desthiladdarî di destê wî de bû, leşker bûn, lê vê yekê bêhtir ji çar heyvan dom ne kir, ji bo wergêraneke nû dest pê bike û rabe, lê vê carê bi serkêşiya Edîb Şîşeklî bi xwe bû di kanûna duyem de sala 1949an de, piştî jî di sala 1951 ê de hingî Haşim el- Êtasî rabû istîfa kir. Li meydanê ma Şîşeklî bi tenê, ewî jî sistemeke dîktatoriyeke tund û hişk li Sûriyê bi cî kir. Di heman demê de jî ewê sistemê hişt ku hinek tenahiya siyasî li Sûriyê belav bi be.<sup>580</sup>

Sala 1954 Şîşeklî ji hukim hat avêtin û bi avêtina wî re helmeteke xurt li dijî kurdan ra bû, heçî serbazên kurd ên di leşkerên Sûrî de hatin avêtin, hemî kasêtên bi zimanê kurdî , Kovar û belavokên kurdî hatin şewitandin û qedexe kirin, xwediyê wana hatin hebis kirin.<sup>581</sup>

Nîrên siyasî di Sûriyê de hêdî hêdî hatin guhertin, pêre jî ew rêbazên ku bi kurdan re dihatne meşandin ew jî bi wan guhertinan re hatin guhertin. Pêvajoyeke demokrasiyeke nû li Suriyê dest pê kir, hîlbijartinên parlamaniyê azad û temîz dest pê kirin û çêbûn, destûr hate dan ku partiyên siyasî dest bi çalakiyên xwe eşkere û bê tirs bikin. Gelek rojname û kovarên nû dest bi çapkirin û weşandinê kirin. Gerçî ew rojname û kovar ên partiyên siyasî bûn yan jî ên serbixwe bûn, ta ku di navbera salên 1954an ta destpêka 1958an de, Sûriya bi mêrg û çîmena azadî û dimokrasiyê dihate naskirin û binavkirin. Ew rewşa ha jî bû derfetek ji kurdan re ku partiyeke xwe ya siyasî damezrînin, ku ew partî nûneriya milletê kurdên Sûriyê bike doza bicîkirina doz û daxwaz û armancê wî ên niştimanî û neteweyî bike.<sup>582</sup>

---

<sup>580</sup> - Dîb, h.b., r. 123.

<sup>581</sup> - Mekdul, h.b., r. 700.

<sup>582</sup> - Ebdulhemîd Derwîş, *"el-Qediye'tu'l-Kurdiye'ti fi Sûriya"*, Mûhaderetun Ulqiyet fi Merkez ed-Dîrasati'l-Hedariye fi Dîmeşiq, 14.10.2000.

Di sala 1958 an de Sûriye bi Misrê re yekîtiyek li dar xist ku di encamê de navê Sûriye û Misrê hate guhertin û bû Komara Ereb ya Hevgirtî û Cemal Ebdunnasir bû Serokê vê Komara nû. Ev bûyer hin encamên nexweş li dû xwe anîn ku bûne sedema qelskirina wê dîmokrasiya ku di Sûriyê de he bu, berî ragihandina yekîtiya bi Misrê re, wiha jî ramanekî netewiyê erebî yê regezperestî bi tundî di welêt de berz bû, ew ramanê ku hewl dida ku hebûna kurdan li Sûriyê ji kok ve tunne bike. Bi vê armancê hukûmeta dewleta nû rabû çî weşanên ku bi zimanê kurdî bûn qedexe kir, dest bi siyaseteke regezperestî kir û derheqê kurdan de meşand, ji encamên meşandina wê siyasetê milletê kurd gelek nexweşî û azerî dîtîn, mîna wê komkujîya ku hate serê bêtir ji 200 xwendevanên kurd gava di sînema Amudê de hatin şewitandin, tevî ku pereyên ji dîtina filmê sînemayê ketin dest hatibû terxan kirin ji berjewendiya şoreşa Ceza'ir re.<sup>583</sup>

Di heman demê de jî hukûmetê dest bi girtina heçî berpîrsîyarên Partiya Dîmokrata Kurd ya Sûrî tevli kadir û çalakvanên wê bi sedema helwestên wan ê siyasî ku doz û daxwaza mafê milletê kurd ên rewa dikirin, hilanîna sitem û zordariya ku milletê wan di bin nîra wê de di jîyan.<sup>584</sup>

Ji ber ku Misir hemû desthilatdarî û serkêşî û birêveberiya Sûriyê xistibû destê xwe yê bi tenê, ji ber hin sedemên din jî ew yekîtiya di navbera Sûriye û Misrê de hate ji hev xistin di sala 1961ê de. Piştê hingî êdî Sûrî bi navê (Komara Sûrî ya Erb) hate bi nav kirin, ev navkirin jî cara pêşî bû ku lê hatibû bi nav kirin, ev jî îşareteke zelal û ronî bû ji bo bînpêkirina desthilatdarên nû ji hemû neteweyên din ku di Sûriyê de dijîn, bi rengê taybet ji netewa kurd re.<sup>585</sup>

Di 23 yê tebaxa sala 1962an de hukûmeta ji hevqetandinê (infisalê) li Şamê biryarnameya qanûnî (Mersumek teşrîfî) (93) derxist, têde biryarek da ku komjimartinek awarte li herêma Cezîrê bi tenê û di rojek tenê de bi dawî bi be, ev jimartin di 05.10.1962an de hate cîbicîkirin û bi encama vê jimartinê, bi deh hezaran

---

<sup>583</sup> - Mekdul, h.b., r. 701. - b.f. li ser agrê sînema Amudê, biner: M. Ehmedê Namî, **Agirê sînema Amudê**, Ç.1, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1987.

<sup>584</sup> - Zaza, h.b., r. 109.

<sup>585</sup> - Mekdul, h.b.,h.r.

ji Kurdên sûriyê hatine mehrûm kirin ji hemwelatîyê sûriyê (cinsiyeta sûrî) û hemî mafên xwe yê medenî.<sup>586</sup>

Di 8ê adara sala 1963an de partiya Be's a sûrî karîbû desthilatdariya sûriyê bêxe destê xwe û ji destpêka hukmê xwe ve dijminatîya xwe ji milletê Kurd û doza wî ya netewî re zelal kir.

Ev nêyt û helwêstên be'sîyan û dijminahiya wan a li dijî milletê Kurd re bêhtir hate ronîkirin û zelal kirin, gava serbazekî be'sîyê di istixbaratê esayîşê siyasiyê sûrî de (Muhmmmed Teleb Hilal) pirojeyêke bi rêk û pêk nivîsand û pêşkêşî desthilatdariya sûriyê kir bi armanca pişafîn û helandina milletê Kurd di nav milletê Ereb de û ji bona pêkanîna vê yekê çend pêşinyarên xwe yê regezperestî pêşkêşî desthilatdaran kir, ku ewî didîtin pir giring û pêdivîne ji bo cîbicîkirina vê armancê, ji wan pêşinyaran; koçkirina Kurdan ji cî û warên wan yê kurdî û dûrkirin û bi cîkirina wan di herêmên erebî de, belavkirina nezanî û cehl û paşvemayîne di nav Kurdan de di rêya mehrûmkirina wan ji xwendin û ketina dibistanan, hilanîna sifeta olîtiyê ji ser şêxên kurdan, girtina deriyê kar li ber karkerên kurd, standîna erdên çandiniyê ji cotyarên kurdan, pêkanîna kembereke asayîşî yê erebî li dormadorê milletê Kurd li seranserî sînore Sûriyê bi Tirkiyê re û ...ta dawî ji kar û pirojeyên regezperstî ku rûyê partiya be'sî yê rasteqîn dida nîşandan û xuyakirin.<sup>587</sup>

Partiya Be's dest bi cîkirina pêşinyarên Muhemmed Teleb Hilal kir di wextê hukmê Hafîz Esed de, ku ew jî bi wergêraneka leşkerî di 16.11.1970ê de ketibû ser hukmê Sûriyê û di sala 1973an de hukûmeta be'sîya Sûrî û di bin navê pêkanîna kembera erebî de çen 'eşîrên ereban ji parêzgeha Reqqa yê ku paşê bi navê Ereben Xemir hatine bi nav kirin- anîne parêzgeha Cezîrê û ew lê bi cîkirin piştî ku baştirîn erdên çandiniyê di parêzgehê de ji cotyarên Kurd sitandin û li wan Ereban belav kirin.<sup>588</sup>

---

<sup>586</sup>- b.f. li ser komjimartina awarte li herêma Cezîrê sala 1962an de, bnr. M. Osê, **el-Ihsai'l-Istisnaî fi Muhafezeti'l-Heseke 5/10/1962**, menşûratu't-Tehalufi'd-Dîmuqratiyî'l-Kurdî fi Sûriya 2010.

<sup>587</sup>- b.f., bnr. Muhemmed Teleb Hilal, **Dirasetun 'en Muhafezeti'l-Cezîra Mine'n-Newahi'l-Qewmîyetî -el-Ictima'îyetî- es-Siyasîyetî**, menşûratu Merkezu 'Amûda li's-Seqafeti'l-Kurdîye, 2011.

<sup>588</sup>- b.f. li ser Zinara Erebi, bnr. 'Ebdussemed Dawûd, **el-Hîzami'l-'Erebî fi'l-Cezîra – Sûriya (Muqeddîme, Tenfiz, Neta'ic)**, 2015.



Wiha jî hemî karên regezperestî li dijî milletê kurd hatin berdewam kirin, weke bêparkirina zarokên kurdan ji xwendinê. Berdana xwendevanên kurd ji dibistan û peymangeh û ji zaningehên Sûriyê, berdana mamûrên kurd ji karên wan bi tohmata ku ew xeterin li ser silameta welat! yan jî wan mecbûr dikirin ku bi kevin nav refên partîya Be'is yan jî sazîyên hevalbendê wê ,wek ciwanên şoreşê ! Ji aliyekî din ve jî Be'sîyan bi rengekî berdewamî dest bi hewldanên erebkirina (te'rib) kurdan û cîwarên wan dikirin.Lewra jî ne dihiştin ku tu navên kurdî ên zarokên kurdan werin nivîsandin.Navê hemî gund û bajarokên kurdî wergerandin û navên erebî li wan kirin. Ev hemî ji bilî neguhdarîkirineke ji qestî ji herêmên kurdî re ji hemî aliyên aborî, xizmetguzarî û şaristanî be, jimartina parêzgeha Cezîrê bi seranserî ya xwe ve weke navçeyeke sînorî ya ku herdem dibin barê karên awarte de bijî.<sup>589</sup>

### **3.3. RENGVEDANA ÇIRÛSKIN JI DÎROKA KURDÎ YA NÛJEN Û HEVDEM DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE:**

Ji dayikbûna helbestvan Cegerxwîn di destpêka sed salîya 20 andeû koçkirina wî ya di çarîka dawî de ji wê sed salîyê (1900-1984) hişt ku ew hevdemîya gelek bûyeran bike ku di wextê wî de rûdan.Wiha jî li ser heçî bûyerên girîng ên ku berî wî di ser millet û welatê wî de derbas bûne, bixwîne û gûhdarî bike ji kesên ku bi temenê xwe jê mestir bûn, lewra jî wan bûyeran bandoreke xurt li ser helbestên wî kirin.Pencemorên xwe li ser nivîsandinên wî bi tevahî hiştin ta ku bû wek neynikek ji dîroka ku tê re derbas dibû.Heger ku dîroka cîhanî bêhtir rengvedana xwe li ser helbestên wî hiştibin jî, lê dîsa jî dîroka kurdî ya nûjen û hevdem cihekî berz û girîng di helbestên wî de girtine.

#### **3. 3. 1. Bikaranîna Çirûskin Ji Dîroka Kurdî Ya Nûjen:**

Cegerxwîn xwedî bîrdanek dîrokî ya dewlemend bû, rê bi hêsanî jêre vekiri bû ku serwextê pêmayeke dîrokîya berfireh û pir alî be, gerçî ji alî kesayetîyên dîrokî

<sup>589</sup> - Derwîş, "el-Qediyetu'l-Kurdîyetî fî Sûriya", r. 3.

ve, yan keyanên siyasî be, yan jî bûyerên dîrokî be, bi vê yekê dîroka kurdî ya nûjen perçeyek ji wê pêmayê bû ku Cegerxwîn carinan payedariya xwe pê dikir û carnan jî li ser nalîn û keseran dikişand.

### **3.3.1.1. Vexwestina Kesayetiyên û Bûyerên Ku Bandora Xwe Li Dîroka Kurdistan Ya Nûjen Kirine:**

Tiştêkî berçav e ku Cegerxwîn pir guh dida rêveçûna bûyerên dîroka serdema nûjen û kesayetiyên wê, nemazê kesayetiyên ku dijberî Selteneta Osmanî bûn, tevî ku dizanîbû û dijberî tenê ji bo rûniştina ser textê 'erşe û hew, xuyaye ku isyana Mîr Cem kurê Sultan Muhammedê Fatih li ber birayê wî Sultan Beyazîd ciyê şehnazîyê bû li ba Cegerxwîn. Lewma di çend ciyan de pesnê kesayetî û wêrebûna wî di de dema ku bû hemberê herî mezin ji siltan re. welew di rêya alîkariya Memlûkiya û îtaliya di bû wekî me berê amaje pêk kiribû.

Cegerxwîn pesnê mêrxasî û wêrekiya wî di helbesta xwe (HÊJ DEYNAKIN) de dide. Ew helbesta ku tê de daxwaza îsyan û hişyarî û yekîti ji milletê xwe dike, jê re dibêje; biçavên serê xwe meyzeke li xerabûna ku hatiye serê welat û perîşaniya ku tê de dijî, ew halê ku dihêle hêstirên xwînê weke cobaran ji çavan werine herikandin. De rabe ser xwe û bi mêrxasîya Restemê Zal yê efsanî û bi mêraniya Mîr Cem, yê ku serê xwe ji fermana kesî re ne danî, qîma xwe bi kêmi sultaniyê ne anî, şerê zilm û sitemkariyê bike û li serfirazî û azadbûnê bigere, ciyê herî bilind û payedar ji xwere bidestxîne.

Bi vî rengî Cegerxwîn divê milletê wî berê xwe bide raperîn û serxwebûn û pêşketinê, bila ew kuştin û talan û wêran û perîşanî hemî jê re bibin alavên dehfûnê bi ber şoreşê ve. Di vir de li hevhatinek (tewafîqek) temam di navbera Cem yê ku li desthilatdarî û payebilindiyê digeriya û Cegerxwînê ku li desthilatdarî û payebilindiyê ji milletê xwe re digere da bi dest xe, eve rastbaweriyê di helbestên Cegerxwîn de, tu tiştêk ji xeyalê xwe ne aniye, ewê her tiştê ji kesayetiyên rast û rast ji dîrokê û bi navên wan yê rasteqîn wergirtine, rewşa milletê xwe bi rastî risim kiriye bê tu boyax û rêtûş û guhertinan, bi hemû halê perîşanî û azarî û lawaziyê xwe ve, va

ye ku ev hal û tengavî jê re bibe sedema dehfdaneke wî ya xurt û lezgîn bi alî berxwedan û şoreş û azadî û xweseriyê re. Lewra dibêje:

*Ji xew rabin gelî yaran, werin, bigrîn wekî baran.*

*Temaşa kin li nayaran, li Kurdistanê meyza kin.*

*Birayên me di vê dewrê gelo çawa dikin sebrê*

*Li ber vê zilm û vê cewrê hemî bindestê Etrakin*

*Gelek mêrên wekî Rustem gelek mîrên bi rengê Cem*

*Gelek dot û gul û cewcem dikuştin hêj qe deynakin*<sup>590</sup>

Careke din Cegerxwîn kesayetiya Mîr Cem ya ku cihê rêzgirtinê ye li balê di helbesta xwe ya bi navê **JI XWEDIYÊ HAWARÊ RE** derbas dike, ew helbesta ku diyarî Mîr Celadet Bedirxan kiribû, Mîr Celadetê ku xwediyê kesayetiyeke herî xurt û payebilind û xwedî nirxê pir buha, yê ku xwediyê mezintirîn rola pêşketin û pêşveçûna jiyana milletê Kurd ya ramiyarî û çandî hilda bû li ser milê xwe, paşî ku bû bû endazyar ê danîna Elfebeya Kurdiya latînî, ku ji hingê ve hate pejirandin weke elfebeyeke fermî, ji zimanê kurdî re (zaravê kurmancî).<sup>591</sup>

Cegerxwîn di helbesta xwe de pesnê aqildarî û hişmendî ,raman û ronakbîrî, himmet û çalakî, wêje û mêrxasî, comerdî û karîna wî ji serkêşiya milletê wî re di gorepanên siyaseta û çandî de, durdîtina wî ji tiştan re û hûr xwendina wî ji paşerojê re, Cegerxwîn van taybetmendiyên Mîr Celadet hemîyan bi taybetmendiyên Mîr Cem re berhev dike. Mîr Cemê ku heta roja dawî ji temenê xwe xebata xwe nerawestand ji bo ku bigihîje 'erş û sultanîyê, Mîr Celadetê ku heta roja dawî ji temenê xwe xebata xwe nerawestand ji bo ku milletê xwe bigihîne rêza milletên serbest û azad û xwedî şan di cîhanê de, ji bo pêkanîna vê armancê hemû mal û milk û xweşiyên xwe biderdan.

<sup>590</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 22.

<sup>591</sup> - b.f li ser Celadet Bedirxan, bnr. **"hevpeyvînek bi Sînem Bedirxan re"** KURD1, Mîr Celadet Bedirxan 1893 - 1951 , (m.w. 01.12.2012), beşê 1. <https://www.youtube.com/watch?v=xrDaJfTZlpw> , beşê 2. <https://www.youtube.com/watch?v=0F-xDuR4PB4> . (m.j. 05.01.2016)

Gava mirov kesayetiya her du mîran muqayese bike û bide berhev, kesayetiya Mîr Cem ê ku derdê wî desthilatdarî bû. Kesayetiya Mîr Celadet ê ku derdê wî pêşketin û vejîna neteweyaa kurd bû, teqez dê bibîne ku her du ne tenê naşibine hev, belê her du, du kesayetên dijî hev in, lê Cegerxwîn va ye di helbesta xwe de hin tiştê hevpar di navbera her du mîran de berçav dike, ku ew tiştê han jî ev in: Israr, mêrxasî, isyan, pêdarî, lêgerîna lebaleb, berxwedan a ji bo gihîştina armancê, Cegerxwîn di bêje:

*Di kurdan de me dî yek mîr û hakim*

*Ji ber aqlê wî girtin ayîna Cem*

*Edîb û jîrek û zana û hêja*

*Xerîqê rehmeta wî cimle alem*<sup>592</sup>

Cegerxwîn gelek caran hewl daye ku ew halê nexweş ê kurd têde dijî di helbestê xwe de bîne ziman. Pir caran jî hewl daye ku rihê geşbîniyê li balê geş bike, her gelê ji bêdengiya wî li hemberî wan nexweşî û astengiya kiriye, gazin ji wê tamara xewê ku avêtiye ser çav û mayîniya wî di wê xewa giran de kirine û her û her daxwaza vejandineke nû ji rihê serhildanê re li balê kiriyê.

Cegerxwîn zane ku dijminê kurd her yeke, çendî navê wî pir bin, zane ku hemî desthilatdarên ku welatê kurdan perçe kirine û xistine bin destê xwe, wekî hevîn û yek mal in û tu ciyawaziyên mezin di navbera wan de tunene ji alî dan û standina wan bi milletê kurd re û xwarina mafê wan û barandina sitem û zorê li ser wan û zarok û kuflet û mal û milkên wan, ji bo diyarkirina vî halê xirab hewl daye ku di helbesteka xwe ya ku pir bi hostayî hûnaye bîne berçav.

Bi rastî jî heq ji vê yekê derket û karîbû di yek berçeya helbestê de di wextekî de hemî serkêşên û serokên dagirkerên Kurdistanê, di wê helbesta xwe ya delal de bicivîne.

Tevlî ku perîşaniyê ji destpêkê ve reng û diruvê xwe li rihê helbestê vedabû, ev tişt yekser tê ber çav, gava ku mirov navnîşana helbestê dixwîne

---

<sup>592</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 86.

(REBENNAME), hingî mirov tê digihê ku helbestvan naveroka helbesta xwe kiriye tabloyek û bûye ayîkêşek tê de hemî wêneyên nexweşî,azerî,seqetî û zehmetkeşî yên ku milletê wî tê de ye. bi firça xwe ya hunerî rengîn kirîye, gava ku komek ji reben û hejar û seqetên welatê xwe hemîyan tê de civandine, da bide zanîn ku halê welat û milletê wî mîna halê wan rebena ne. Lê tevlî wiha jî divê ku bi xwendevanê helbesta xwe bide zanîn.Ku ew reben gava hemû bi hev re rabin û yek dest bin.Karin tevlî wê hejarî û lawaziya xwe tişteki bikin.

Bi vê yekê helbestvan diçe qonaxeke din, divê van tiştan bi kar bîne ji bo daxwazeke xwe ya siyasî bigihîne xwendevana û ji wan re biçespîne ku ew desthilatdarên sitemkar, zorker û dagirker hemû dê winda bibin û birûxin. Li meydana dê tişteke nemîne ji bilî milletê qehreman.Lewra bi dengekî bilind dipirse û dibêje; kanîn ew serdar, serbaz desthilatdar û serok? Kanî Qeyser, Sultan Ebdulhemîd, Melek Feysel û Riza Şah?

Bi wan dikene,henekê xwe bi halê wan dike. Ne ku li cî û warê wan dipirse, tenê divê bide zanîn ji hemû xelkê dinyayê re ku ew hemû çûn lê millet ma, gava wan serokan bi wan pepukan re di helbesta xwe de bi hev re dicivîne mebesta wî ew e ku ji xwendevanan re bide zanîn ku ew serok ji wan pepûkan pepûktirin, gava ku dibêje:

*Ew tevde çûn ber av û av*

*Heta bi lêvan bûn çirav*

*Maye ji wan yek pîsenav*

*Milet sitûre wek zinar*

*Ka Qeyser û Ebdil Hemîd ?*

*Ka Feysel û Sultan – Wehîd ?*

*Kanî Rizaxan û Mecîd ?*

*Ka Xusriwê Zêrî Guhar ?*

*Ew pêkve çûn, millet heye*

*Wî guh li vî dengê me ye*

*Herçî dibêjin jêre ye*

*Ziyan ji bo me, jêre kar*<sup>593</sup>

Cegerxwîn bi giringiya şerê Çildêran pir serwext bû, zanîbû ku wî şerî çiqas bandoreke neyînî (nîgatîf) li dîrok û erdnîgarîya kurdan kiribû, tevî ku kurd pir aktîv bûn di rêxistin, rêvebirî û encamên şer de û gellek qurbanî dan. Lê ew bi sozên her du aliyên şer jî-Osmanî û Sefewî-hatin xapandin. Di helbesta (EV ÇI MISILMANÎ YE) de Cegerxwîn rexnê tûj li islama siyasî ya di hingê de kir ku wan pîlanên xirab bi kurdan re meşandin, wan hîlêbaziyan mezin li wan kirin. Gava ku li hemû sozên xwe qulibîn dijî wan sozan bi milletê herêmê re meşyan. Di bin nav û ala islamê de wan milletê Kurd ji pêkanîna berjewendiyên xwe yê taybet re bikaranîna (sixurandine) û ew sozên ku dabûnê ku ew ê wekhevî û dadmendiyê ji wan re pêk bînin, hemî derew derketin û hate xuyanîkirin ku daxwaza wan her tenê berjewendiyên wan ên taybetî û teng in û danheva sermiyanên mezin û bidestxistina kursî û erş û qesran e, dem ne xema waye çî tê serê van milletê dil pak û çî zilm û zor û bêbextî li wan tê kirin.

Helbestvan hewl dide ku bide ronîkirin bê çawan dîne islamî ji xwe re bi jîrbûnê kedxwarî kirin ji bo ku ziman û dîrok û kultûra milletê Kurd seranser bînpê bikin di rêya çand û zimanekî din de, gava ku van xelka qani' bikin ku Xwedê dixwaze alem dev ji ziman û kultûrê xweyî neteweyî berdîn û hemî berê xwe bidin ziman û çandiyê islamî ku bi zimanê erebî ye ji bona xweşî û pîroziya axretê bidest xwe bêxin.

Di vir de bi regekî pir zelal tê eşkerekirin bihata kîjan astî xwestin ku bazirganiyê bi raman û bîrewerî û helwêstên olî bikin ji bo bidestxistina hin berjewendiyên siyasî ku tu pêwendiya wan bi xwedê re nîne û çawan xwestin ku herkesî bi wan re ciyawaz bi bêxin behweriyekê ku ew kole ye û yê zimanê Erebi zanibe ew azad û rêzdar e.

Ji dîtin û bi karanîna karên wiha çewt ji aliyê rêvebir û serkêşên islama siyasî ve di der heqê milletê kurd de bi taybetî Cegerxwîn bi dil tengîkî pir zêde di helbesta

---

<sup>593</sup> - Cegerxwîn, *Şefaq*, r. 133.

xwe de bi zimanekî tûj û bi dengekî bilind dibêje: çima ev birayên me yê musulman dev ji me bernadin? Çawan dibêjin em doza mafê jinê û mirovan dikin û di heman demê de derfet nadin ku kurd bi zimanê xwe yê dayikê xeber bidin û bixebitînin?

Wiha jî berê xwe dide encûmena ewlakariyê di koma milletên hevgirtî de û rexnên tûnd û tûj lê dike ji ber hîç ew guh nade zilim û sitemkariya ku tê serê milletê kurd û qet li hawar û gaziyên wa guhdarî nake û xwe nebihîstî û nebînyayî dike ji hemî karên kirît ku dijminê wan di derheqê wan de dikin, dibêje:

*Ev birayên me misilman dev ji me bernadin*

*Qey raste em kolene ew ji me re esyadin !...*

*Heqqê jin û hiqûqê insan dixwazin*

*Lê destûra zimanê me ji me re qet nadin*

*Li meclisa Emin navê her kesî dibêjin*

*Lê em di bîra wan nayên navê me hilnadin*<sup>594</sup>

Ji alîkî din ve helbestvan rexnên tûj li wan desthilatdaran dike ku her yek ji aliyê xwe ve hebûna milletê kurd dide mendelayê û divê wî bêxe bin baskê xwe, hin ji wana kurdan dikin ereb hin jî wan dikin tirk û hin ji wan jî dikin Farîs bi gelemperî hemî jî hewl didin ku kurdan di nav xwe de bihelînin û bi peşefîn û nasnameya wan a fermî û resen tinne bikin û ziman û kultûr û urf û adet û folklorê wan hemî têk bibin û windakin û pêre jî ji bîra xwe dibin ku kurd milletek resen û kevnar e ji berê ve li ser xak û çiya yê xwe dijî û gelek qencyên wî li ser hemî milletê hawîrdora wî hene.

Lê tevlî vê yekê jî ew desthilatdar hemî xwe dibînin ku ew serok û serkarin û kurdan dibînin hemî kole û rênçberê xwe û qet nayînin bîra xwe rojekê ku kurd bûn yê rûyê dîrokê guhertibûn di şerên wek Hetîn û Çildêran de.

Piştî hingê helbestvan dighêje têgehê û dixwaze wê têgehê bighêjîne xwendevanê xwe jî ku daxwazçiyê herb û şeran ew xwediyê wan nêrînen xirab ku li

---

<sup>594</sup> - Cegerxwîn, **Sewra azadî**, r. 164.

kurdan dinêrin û dixwazin her wan lawaz bihêlin û welatê wan wêran bikin û hemî kesên tê de berbad bikin.

Lê helbestvan ji wan şerxwazan re teqez dike ku kurd her dê bimînin aştî xwaz û hezkiriyê azadiyê, lê di heman demê de divê ku kurd rabin bi hemî hêza xwe û berxwedanek berdewam û xebatek bê westan bikin da bighên wê aştîyê û azadiya ku ji xwe re dixwazin, ji lewra dibêje:

*Hin me dikin Ereb û hin me dikin Tirk û Faris*

*Lê ne raste em milletekî xurt û Ekradin*

*Gernasê Hettîn û Ekka û Kerek û Dimyatîn*

*Mêrxasê Çaldêran û Sordaş û Mehabadîn*

*Em şer naxwazin haşfxwaz û azadîperest*

*Divê dest û lingê xwe bi hev re em radin*<sup>595</sup>

Bi vî rengê ha Cegerxwîn rewşa milletê kurd ê ku tê de dijî di helbestên xwe de nîşan dide û dide zanîn bê bi çi rengiyên pêşberî wî dan û standinê bi wê rewşê re dikin.

Bi şêweyekî durist û rasteqîn û zelal wêneyê kesê kurdê dilpak û dilsoz û wefadar dikêşe û di helbestê xwe de nîşanê herkesî dide û kurdê ku her û her li azadiyê û aştîyê ji xwe re digere û her hêvdare ku ew jî weke hemî milletê cîhanê bi dilşadî û ser firazî bijî, ji ber ku ew jî - weke çi milletê ku hene - gereke xwedî maf be bi destxistina xweserî û serxwebûn û pêşveçûn û azadiyê de.

### **3.3.1.2 Vexwestina Mîrneşîn û Qebîleyên Kurdî:**

Bi xemkêşîyeke kûr û şîneke bêsînor di helbesta DERDÊ MIN KÛR E de Cegerxwîn ser hal û pîrgala xwe ya ku weyneyek ji hal û pîrgala welatê wî ye dibonije û hêstran hûr hûr dibarîne, bi weyneyên helbestiyê qeşeng û hesteke nazik û

---

<sup>595</sup> - Cegerxwîn, *Sewra azadî*, r. 164.



bi mîkanîzmeke pir bilind ku hiştiye metna wî ya helbestê tund û xurt û lihevhatî be û xwedî wateyên cûrbecûr.

Birînên helbestvan pir kûr in û serpêhatiyên wî bi kul û xeman pêçayî ne, di ser hev re diherikin û li nav guhê hev dikevin, wek çemê Aras<sup>596</sup> û herkesê ku nîşaderên çem bizane ji alî guherîn û nûkirinên berdewam ve, dê bizane ku çiqasî birînên helbestvan kûr û dijwar bûn û çiqasî berdewam nû dibûn û ji nûv re birînên nû li ser birînên kevin bi cî dibûn û ji nû ve di axivîn, bê dawî ne wek çemê Aras in, Aras ê ku sebr û hedan jê re nîne her û her pêlên wî şiyarin, ev çem ne çemekî nenas e ji helbestvan re, belê xweş di zane bê kaniya wê li kuye û dawiya wê di keve kû û kûrbûna wê çiqase ye ji lewra wî çemî bi xwe ji xwe re bijartiyê ji bona ku bibe derman û rewan ji birînên wî re, birînên ku ew sedema wan nas dike (çavkaniya Aras nas dike) û dermanê wan jî nas dike (dizane ku Aras derbasî kû dibe) û kûratiya wan jî nas dike (di zanê bê kûratiya Aras jî çiqase, kûratiya karîsetê).

Ji nişkave helbestvan pêhesiya ku berhevbûna kûraniya birînên wî bi kûraniya çemê Aras re hindik e û kême ji lewra rabû û ji nuh ve bi wan leşkerên Sefewiyan ku erîşî Kurdistanê kirin û bi tund û tûjyê berhevkir. Bi vê berhevkerinê di vê ku tundî û hişkiya bobelatê bîne ber çavan.

Ji ber ku leşker gava berê xwe dide dagirkirina welatekî ew her kirast û komkijî û wêrankirinê bi xwe re derbasî wî welatî dike û xwiyaye wan karîseta bandoreke xurt li milletê Kurdistanê kirbû û ew xistibû halekî xirab ji bêhêvîbûnê û perdeyeka stûr ji reşbîniyê avêtibû ser çavên wan û asta berxwedan û raperînê li ba wan gelekî anîbû xwar û lawaz kiribûn tevî ku ewan hemî rengên mêrxasî û cangoriyê di ber pêşveçûn û serxwebûn û azadiya welatê xwe de jî pêşkêş kiribûn û hemî nerxên giran buha jê bi comerdî dabûn ji lewra helbestvan dibêje:

*Derdê min kûr e , wek çemê Aras*

*Leşkerê xem her wek şahê Ebas*

---

<sup>596</sup> - Ji çemên Kurdistanê yên mezin e, di herêma Bingolê de diherike û di dikeve deriya Qezwînê, b.f. bnr. Mewqî' el-Me'rîfe;

<http://www.marefa.org/index.php/%D9%83%D8%B1%D8%AF%D8%B3%D8%AA%D8%A7%D9%86#.D8.A7.D9.84.D8.A3.D9.86.D9.87.D8.A7.D8.B1>(m.j. 10.02.2016).

*Di rêça te de me dane kuştin*  
*Gelek çeleng û fêris û mêrxas*<sup>597</sup>

Helbestvan di wê şîna xwe ya ku li ser welatê xwe dikşîne berdewam dike û hêstira li ser wî halê xirab ku ketiyê dibarîne û ji kanga dilê xwe keser û kovanan derdixe li ser wê dawiya reş û bêhavlî ku konê xwe li ser welatê wî daniye û bi dilekî şikestî û xemgîn hûr hûr dinale li ser wê asta hêja û payebilindbûnê ku gihaştibûyê û bûbû xwediyê wan mîrneşînên binavûdeng û xwedî wê hêza kurd ku xelkê sed hesabî jê dikirin, îro ku ew welat maye li paşiya hemi welatên dormadorê xwe û milletê wî maye şikestî û lawaz û sernuxum, piştî ku bi sedan ji fêris û mêrxasên xwe kirin qurbanî ji bo azadiyê û serxwebûnê û piştî wan mîrneşînên bi rûmet ku hemî bi derdan û tev de ketin bin destê Sultan Selîmê Osmanî.

Di vir de divê em herikandina bûyerên dîrokî û tiştê ku di helbestê de hatiye bidin ber hev ji bona ku em nekerin nav tevheviyêke dîrokî de. Heger mebesta helbestvan ji kesayetiya Selîm, Sultan Selîm Yawûz be ev tê wê wateyê ku newekheviyek û nakokiyek di navbera bûyerên dîrokî û di navbera tiştê ku helbestvan divabû bibêje ji lewra ku siyaseta Sultan Selîm Yawûz bi kurdan re siyaseteke nerm û lêborînîbû ne tenê wiha, Sultan Selîmê yekem bû bi kurdan re di rêya Idrîsê Bedlîsî re gihiştibû girêdaneke girêbestekê ku kurdan li gorî encamên wê desthilatdarî li herêmên xwe bikin.<sup>598</sup>

Lê eger mebesta helbestvan ji bilêvkirina navê Selîm tenê wek navek girêdayî bi sultanekî Osmanî be ku ew bûyerên hatine serê kurdan di wextê wî de bûn, ev jî tê wê wateyê ku helbestvan ketiyê şaşiyêke dîrokî de dema wan bûyerên karestî bi Selîm ve girêdaye û eger mebesta helbestvan ji navê Selîm, Selîm dîtibe wek simbolek ji dewleta Osmanî re ev dibe haletêk sembolî mumkin e were pesindkirin, nemaze ji ber ku kurd tevî ku çend desthilatdarên otonomî di dest de hebûn jî lê welatê wî di vê serdemê de hate perçekirin û wêrankirin bi sedema êrîşên ku di navbera Sefewiyan û Osmaniyan de ku li ser xaka wê çêdibûn. Lê eger mebesta helbestvan Selîmê duyem be ku hukmê wî di navbera salên (1566-1574) bû evaya mumkine bêtê pesindkirin ji ber ku ev Sultan Selîm bû yê ku piştî bavê xwe Sultan

<sup>597</sup> - Cegerxwîn, *Pirîsk û Pêtî*, r. 40.

<sup>598</sup> - el-Hiwêrî, h.b., r. 205-207. – Herutî, h.b., r. 63.

Silêmanê Qanûnî (1520-1566) hukum kir û pir te'de û zordarî li milletê Kurd dikir û mîrneşînên wan bidawîanîn û rûxandin ji lewra helbestvan dibêje:

*Jar û gerdenxwar , tev mane bindest*

*Hezar Rustem û Egîd û gernas*

*Dwazde emaret me kirne wêran*

*Ketin bin lingê Selîm û Îlqas<sup>599</sup>*

Helbestvan gelekî bê havil û dil şikestî ye ji ber tiştê ku hatiye serê milletê wî û halê ku têde dijî û keser li ser keseran dikşîne gava ku tê bîra wî bê çawa ew xwedî erş û koçk û qoûnax û malê pir bûn, çawa ew mîrek û şah bûn li ser erdnîgariya xwe û îro mane pêxwas û tazî û birçî û tu tişt di destê wan de nemaye ji bilî welatekî wêran û hilweşiyayî û welatê ku pir qehreman û lehengan anîbûn cîhanê, wek Idrîsê Bedlîsî yê ku vedgere qenciya wî ew hêmin û seqamegêriya Kurd têde diyan di destpêka sedsala 16an de ew welatê ku bi dehan ji hozan û zanyaran anîbûn cîhanê, ew welatê ku kare hemberiya xweştirîn welatê dinyayê bike bi spehîbûna xwe, ew welatê dagirtî ji bax û bistan û gulşenan û ji ber vê yekê jî helbestvan her daxwaze û hêviyan ji zarwên welatê xwe dike ku ew wan samiyanên giranbuha di nav mijankên çavên xwe de biparêzin ji ber ew nayên kirîn bi mal û milkê cîhanê temamî, ji lewra helbestvan dibêje:

*Hemî xudanê zîv û zêr û tac;*

*Îro tev mane tazî û pêxwas*

*Navê û dengê kurd dinya tev de girt*

*Me xwe winda kir, em mane nanas*

*Axa kurdistan gelek wek Idrîs*

*Anîn dinyayê zana û çeknas*

*Zanim pir xweş e , tev bax û bistan*

*Şax û Şeqlawe , Kercos û Bagas*

---

<sup>599</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 40. - Îlqas: kurê Şehbaz Beg Mîrê 'eşîra Mahîdeşt, mêrxas û dewlemnde bû, di dema Şerfxanê Bedlîsî de bû, bnr. Zekî, **Meşahîru'l-Kurdî we Kurdistan**, r. 118

*Elmas û gewher Cegerxwîn mefroş*  
*Şivan çi zanin gewher û elmas.*<sup>600</sup>

Di van herdû xêzên dawî de eger helbestvan nêrxê pêkhatiyên welatê xwe û giranbuhaya wan xweş dizane jî lê di heman demê de ji wan kesên ku wan nerxan nizanin jî dil bi tirs û sawîre ku ew rojekê ji rojan û ji ber nezanî ne têgihîştin û paşdemayîna xwe dev ji wî welatî berdin yan jî bi erzanî bifroşin û ji dest xwe windakin.

Di hin helbestên din de jî helbestvan wan mîrneşînên Kurdî tîne rojevê û her car jî bi dil şewatek germ, şînegirê di de li ser windakirina wan mîrneşînan û her û her dixwaze ku zîyanên li milletê wî bûne bibin handerek (hafizek) nû ji pêşdedana xebat û tevger û têkoşîna re ji bo veğerandina wan mafên ji dest çûyî re. Ji lewra em dibînin ku helbestvan di helbesta BÊRIYA WELÊT de ji destpêka helbesta xwe ta dawîya wê her pirs dike; gelo çi ne sedemên vê windayîya ku Kurd têde dijîn? Û ji alîkî din ve matmayîbûniya xwe nîşan dide bikanî û çawan û çiman û bi çi rengî ewqas mîrneşînên Kurdî hemî ji nexşeya siyasî wînda bûn? Û çiman tevî wan qehremanî û canfîdayiyê û dana ewqas qurbanîyan ji alî xelkên wan mîrneşînan ve jî ew mîrneşîn berdeyam ne kirin li jîyanê? Gelo ew raberdewê paye bilind û mîrxasên leheng, ew mîrekên bi navûdeng û mîrneşînên rengîn hemî li ku man?! Bi van pirsan helbestvan dibêje:

*Ka mîrekên li Baban, ka paşayê Rewandiz*

*Ka Cizîr û kanî mîr, ka Bedir-xan li kû ye?*

*Kanî mîrê Behdînan , kanî mîrê Hekaran*

*Ka mîrekên li Zazan , mîrê Xerza li kû ye?*

*Kanî mîrê Hesenkêf , kanî mîrê di Sasûn*

*Ka mîrekên Mecenkurd , mîrê Şêrwan li kû ye?*

*Ka Melatya , ka Xerpût , ka Çermûk û Sîwerek,*

*Kanî Êrfa ka Sirûç , mîrê Milan li kû ye?*

---

<sup>600</sup> - Cegerxwîn, *Pirîsk û Pêtî*, r. 40.

***Ka Wêranşehr , ka Dêrik , ka Mêrdîn û Nisêbîn  
Kanî Amed ka Hezo mîrê Hîzan li kû ye?***<sup>601</sup>

Piştî van gilî û gazinan Cegerxwîn li bînedanekê digere lewra li hespê xwe yê rewan siwar dibe û hefsar jê re berdide da bi kêfa xwe li kuççê û kolanên mîrneşînên xwe yê kevnar bigere, çavê xwe li rûsipî û di giregirên wan ciyan digêrîne, da kula dilê xwe ji wan re birjîne û dil givşiya xwe li ser têkçûna wan dem û dewrên xweş yê ku bav û bapîrên wan ji wan re bi dest xistibûn eşkere bike û li ser perçekirina dijminan û parvekirina ji welatê wan re di nêv xwe de bê ku tu hesabî ji wan bikin, binale û bikale û ne tenê li ser mîrneşîna Baban, Rewandoziyan û Bedirxaniyan keserên bi şewat ji sînga biderxîne belê wiha jî bi dilekî xemgin pirsra mîrekên Hesenkêf û Behdînan û Hekaiya di ke û li halê wan di pirse.

Cegerxwîn gorepana gera xwe fireh dike, ji ber ew divê li ser hemî xaka Kurdistanê bigere, Amed, Hezo, Dêrik, Siwêrek, Mêrdîn, Nisêbîn, Sirûc, Wêranşah, Sasûn, Colemêrg, Mûsil, Zaxo....., bê tirs li her derê digere ji ber zane ku ew der hemî cih û warên welatê wî ne, ji lewra jî pişt raste di gera xwe de û qet guh nade dûrbûniya di nav bajaran de û bi serbestî berê xwe ji destpêka rojhilat didedawiya rojava, ji destpêka bakûr dide dawîya başûr bê ku tu tirs bikeve dilê wî, ji lewra ew wan deran hemiyar dibîne parçeyek ji erdnîgariya Kurdistana xwe, ji lewra dibêje:

***Kanî Stewr û ka Midyat, ka Erzen û Bişêrî,  
Ka Aşût û ka Hêtem, ka Gurdilan li kû ye?***

***Ka Bedlîs û ka Seirt, kanî Mûş û Erzerom  
Kanî Qers û Bayezîd, ka mîrê wan li kû ye?***

***Kanî Miks û ka Xesxêr, kanî sera Mexînan  
Kanî deşta Colemêrg, kanî Westan li kû ye?***

***Ka Şengal û ka Mûsil, kanî Zaxo, ka Dihok  
Kanî Akire , Amêdî, kanî Barzan li kû ye?***

---

<sup>601</sup> - Cegerxwîn, Pirîsk û Pêtî, r. 16.

***Ka Ormiya û Şino, ka Sablax û ka Nehrî  
Ka Selmas û kanî Xoy, ka Erdelan li kû ye?***<sup>602</sup>

Di vê helbestê de helbestvan di vê ku destegîrê xwendevanê xweyê geştiyariyê be wî li welatê xwe bigerîne di dema mîrneşînan de li bajarên mezin, li bajarokên biçûk li temamiya welêt ew welatê ku di hembêza xwe de dîrokeke mezin xwedî kiriye û ji mafê milletê wî ye ku xwe pê payedar û şanaz bibîne û di îro de jî pir tiştê wî hene ku xwe pê bi rûmet û serbilind nîşan bide.

Helbestvan gera xwe berdewam dike bê ku guhdanê bide tu sînoran, ji ber nasnameya her cihekî li balê kurdî ye û madem kurdî ye wata wê ji mafê her kurdekî ye ku bi serbestî li welatê xwe geşt û seyranan bike çiqas û çawa û kengî bivê û ji ber helbestvan pîroziya wan cihên ku lê digeri zane, ji bo wiha pêdeviye ku careke din wan navdariyên ku winda bûne li wan cihan vegeirîne ji lewra dibêje:

***Ka Hewlêr û kanî koy, ka Herîr û Rewandiz  
Ka Şeqlawe, ka Derteng, mîrê Soran li kû ye?  
Ka Kerkûk û Şehrezor, ka Helwan û ka Deynor  
Ka Kelos û ka Neşkas, ka Mehrewan li kû ye?  
Ka Tenûre , ka Zelem, ka Meşile , kanî Loy  
Ka Sirûçik , ka Alan, ka Dumihran li kû ye?  
Ka Loran û ka Goran, ka Hemrîn û ka Sefîn  
Ka ew bajar û ew gund, ka Kurdistan li kû ye?***<sup>603</sup>

Helbestvan wiha dilbikûl tevî ku matmayî jî maye lê dev ji pirsên xwe bernade , pîrsa şûnwarên wan mîrneşînan dike, pîrsa çiyayên wan, şînahî, çandî, mêwe, sebze, deşt, zozan, mêrg, çêre, lawir, çem, kanî, zîv û zêr, stiran, pîrek, zilam, pîr û kal, cejn û newroz, destanên 'îşq û evînê û qehremanên wan.

Ax...birînan seranserê laşê welatê wî xemilandîye, birîneke nû li ser birîna kevin diaxive ji lewra jî dermanek ku van birînan sax bike û ji êşê xilas bike

<sup>602</sup>- Cegerxwîn, Pîrîsk û Pêtî, r. 16.

<sup>603</sup>- Cegerxwîn, Pîrîsk û Pêtî, r. 16-17.

pêdeviye pêdeviye, Cegerxwîn tu ciyawazî ne xistiye navbera qebîle û eşîrên kurdan, hemî Kurd in û hemî jî rêzdar in wiha jî zaravayekî kurdî di ser yê didi ne girtiye (Zaza, Kurmanc, Sor, Lor) hemî jî kurdîn e û hemî jî xwedî nerxên giran in û gava Cegerxwîn şanaziya xwe bi kurdîtiya xwe dike gotinên xwe bi hostayî dibijêre û ew hostayi bi zelalî nîşan dide ku çiqasî asta rihê berpirsiyariyê li balê bilind e ji aliyê millet û welatê wî ve ku di herdem û çaxa de her û her li rêyêkê digere ku yekîtiya millet bîne cî û doz û daxwazên wan bike yek ji lewra jî em dibînin ku her dem ew payedariya xwe dike ku ew e xwediyê wan zaravan hemiyan û ew bi xwe ye ew eşîrên ku bi wan zaravayên di peyivin.

Helbestvan her va ye ku hemî qebîle û hozên kurdî û erdnîgariya wan herdûkan bike yek perçeyek ku ji hev venabin û tu kes nikare wan herdiwan ji hev cudake (Bext, Goran, Kelhor, Beraz, Xerza, Bûtî, Dasinî, Berwarî, Kîkî, Silî, Şikakî...) (Şehrezor, Şengal, Berzan, Tor, Erdelan, Hekar, Amed, Dêrsim, Nisêbîn, Kaniya Ereba, Amûdê, Qamişlo, Dirbêsiyê, Endîwer.....).

Ewqas cî û warên bela wela û ewqas hoz û qebîleyên tekatek, hemî ji helbestvan re yek tiştê tenê ye di du gotinan tenê naskirin û civandin ku ew jî Kurd û Kurdistan e, bi vî rengê ha û bi vê wateyê jî helbestvan di gelek helbestên xwe de ev tişt teqez kiriye û daye nîşandan. Di helbesta DOZ LI NIK ŞÛR Û PERA de Cegerxwîn daxwaz dike ku bûyerên li cîhanê çêdibin werne nivîsandin û belgekirin û bi taybetî tiştên ku tên serê milletê kurd û dixwaze ku êdî dev ji gilî û gazinan û keser û hesretan were berdan, dest bi pesin û şanaziyan were kirin ji bo vejîna rihê coşî, mêrxasî, xweragirî, raperîn û pêdarî bibe li ba millet bi xurt tvlî hovîtiya dijmin û pêvedanên wî yên ejdehakî û tevlî munafiqî û durûwîna gelek hevalan ku betir ji serûçavnexêfekê (maskface) dane bo rûwên xwe ji ber hinek berjewendiyên xwe yên biçûk, ew hemî dijminên Kurdan e û hemî çek û mal û kar di dest wan de hene, lê ev tişt hemî jî gereke bêhêvîti û çavşikestinê di dilê xortan de neçînin û gereke ew her xebata xwe gurtir bikin û xweş zanibin ku tu cudahî tine di navbera Zaza û Tor û Gor û Bext de ji ber ew hemî jî kurdin û zimanê wan hemiyan jî Kurdî ye, lê ji ber tinebûna dadgehiyê û windabûna wekheviyê û têkçûna wijdanê mirovaniyê, ev hemî bûne sedema perçekirin û paşdemayîna Kurdan û ji destçûyina welatê wan, ji lewra dibêje:

*Xameya çalak tu binvîse bi lez  
Wa li gerdûşê dinê bû gurg û pez*

*Bes tu ax û zar û feryadî bike  
Pesnê kurdan zû bi dilşadî bike*

*Şûr bi destin, tev neyar û dostê me  
Bê bihayê wa li sûkê postê me*

*Ê neyarin, pir bi jehrin rengê mar  
Ê ku dostin, hîlekarin , sehredar*

*Ferqê Lor û Zaz û Gor û Bext çiyê  
Em hemî kurd û ziman kurmancî ye<sup>604</sup>*

Wiha jî Cegerxwîn di helbesta ku arasteyî perlemanterekî kurd kiriye bi navê ŞANDIYÊ MILLET de û hewl dide pê bide fêmkirin ku millet ew nehilbijartiye ji bona ew nîşanek bi sênga xwe veke yan jî ji bona xwe paye bike bi rûniştina ser kursiyê perlemanê, lê belê millet ew şandiye ji bona ku ew êş û kul û derd û nexweşiyên wî ji desthilatdar û berpirsiyaranre şirove bike û çareseriyê wan pisgirêkan ji wan daxwaz bike û dîsan tu cudahiyê naxe navbera hemî hoz û qebîleyan, ji ber hemî jî Kurd in, gerçê Lor bin yan Zaza bin yan Gor bin yan jî Xurs bin ji lewra jî pêdivîye ku kurd hemî yek rêz bin û hemî di yek destekekê de bicivin û bi yek dilî û bi yek rihî bihev re xebat û têkoşînê bikin, ji ber ev tenê rêya xilasbûnê û serxwebûnê ye.

Hêjayê gotinê ye ku helbestvan bi mebest gotina (birsî) ku gotinek bi zaravê soranî ye bi kar aniye ji dêvla gotina (birçî) ku gotinek bi zaravê kurmancî ye lê herdu gotin jî yek wateyê didin ku ew jî wateya (birçî) ye û digel ku avakirina helbestê û kêşê û rêzbendê jî ev tişt dixwest, lê belê helbestvan û bi jîrbûniyekî berçav ji vê yekê xwest ji xwendevanê xwe re bide zanîn ku tu cudahî di navber herdu zaravan de tineye û her yek ji wan jî ên di dewlemend dike û herdu bi hev re jî zimanê kurdî dewlemend dikin.

---

<sup>604</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 32.



Careke din helbestvan berê xwe dide ê perlemanter û jê dixweze ku mêrxas û wêrek be û xwedî rihekî neştimanî û welat parêzî be ji ber ku ew nûnerê milletê Kurd e û dîsa matmayî dimîne li ser hal û pergala ku milletê Kurd ketiyê û hejarî û belengaziya ku têde dijî tevlî ku welatê wî xwedî xesiptirînê erdaye di rojhilata navîn de û xwedî bêhtirîn bîrên petrolêye û gelectirîn xêr û bêraye, ji lewra dibêje:

*Em tev de kurê kurd û divê kurd bibî yekdil*

*Lorî kiye , Gorî kiye , Zazî kiye , Xursî ?!..*

*Pir şerme welatê te hemî kanî û petrol*

*Pismam û birayên te hemî mayîne birsî !...<sup>605</sup>*

Cih li ba Cegerxwîn giringiyeke taybet bi xwe ve digre, ji lewra gava ku em helbestên wî dixwînin tê xuya kirin ku ew cih parçeyek ji hebûna xwe hesab di ke û welat bi esmanê xwe yê bê dawî ve û bi firehbûna xwe yê bê sînor ve parçeyek ji rewşa xwe ya ku têde dijî hesab dike û wiha jî parçeyek ji xeyalê xwe yî ku her dem bi hev re dijîn.

Di helbesa NAÇIN ŞERÊ QORE de ku helbestvan di vê dinavîroka wê de ji me re hinek pesnê spehîtahiya Kurdistanê bide ku hemî mêrg û bexçe û kaniye, lê di heman demê de jî êş û keserên xwe bigihîne me ji ber ku Kurdistan maye dagirkirî ji alî dijmin ve û careke din teqez dike ku tu çiyawazî tineye di navbera Zaza û Bext û Lor û Gor de, ji ber hemî tevde Kurd in û ji yek neteweye ne û ev halê ku kurd tê de dişebihîne bi komek dar û êzingên nêzîkî agir û di her gav û kêlîkê de metirsiya ku agir bigihêje wan heye ger ku dijmin berdewamiyê di birêvebirin û kirinên xwe yên siyasî de bikin.

Û di hingê de helbet yê xwendevan tê digihê ku karîset wê çiqasî mezin be gava ku agir bigihêje wan êzingan ji ber ku agir vêket wê vemirandina wî pir zor û zehmet be û ev hemî nîşanên pir xurt û xwedî nîşaderin ji alî helbestvan ve ku didine ronîkirin bê çiqasî milletê kurd êş û azerî û derd û xeman di xizna sînga xwe de dicivîne û heye ku ew êş û derd bibin sedema dehfandineka xurt jê re ji bo daxwazkirina maf û rizgariya welatê xwe, ji lewra em dibînin ku helbestvan dibêje:

---

<sup>605</sup> - Cegerxwîn, **Sewra azadî**, r. 49.

*Welat tu kurdistan*  
*Hemî bax û bistan*  
*Tu maye ber destan*  
*Belê dinya dore*  
*Ser bi reş û şînî*  
*Jar û dilbirînî*  
*Millet te nabînî*  
*Kurde kerr û kore*

*Hemî weke darin*  
*Rêzin li ber arin*  
*Bindestê neyarin*  
*Zaz û Bext û Lore*<sup>606</sup>

Helbestvan ji Kurdan dixwaze ku hevgirtî û yek rêz bin wek kur û bav û bira bi hev re bijîn ji ber bi vî rengê han wê karibin bighên miradê xwe, lê ji bîr nake ku bîne bîra wan û bi wan bide zanîn ku çi tiştê bi zorê hatiye standin nayê vegerandin ne bi zorê be, lê ji alîkî dî ve jî û bi nêrîneke geşbînî li halê milletê Kurd dinêre, nemaze piştî ku pêlên xwendinê gihîştine erdên wî yê beyar û xwendevan pîrbûne û bi vê yekê herdû stûnên pêşketinê hatine danîn, quwwet û 'ilim (tundî û zanyarî) û wiha jî herdû stûnên serfiraziyê hatine danîn, hevkarîya nêr û mê bihevre di avakirina welat de û ev her çar stûn kezaba dijminan diqetîne û dihêle ku ji tirsan bi lerizin, gava ku dibîne edî kurd doza xwe yê netewî û niştimanî fêmkirine û bişev û roj kar û xebatê dîkin bê rawestan û rêya xilasbûna ji zor û sitem û serdestiyê hêdî hêdî ji xwe re vedikin û doz dîkin.

gava helbestvan van guherînan biçavê xwe dibîne bêhtir moralê milletê xwe bilind dike û bi dengê bilindtir nav di hemî qorên millet de dide ku hemî têkde bihevre rabin ji ber ev doz û pîrsa hemûyan e bê tu cudahî, gir çê Zaz bin yan jî Lor bin yan Gor bin, ji lewra dibêje:

*Top û qelem bûn cot*  
*Bûne yek keç û xort*

---

<sup>606</sup> - Cegerxwîn, *Sewra azadî*, r. 62.

*Bê navtêdan bê fort*

*Tevan qoreqore*

*Şev û ro ranazîn*

*Bê gilî û gazîn*

*Zanin çî dixwazîn*

*Qelen xwîna sore*

*Digel hev tebabin*

*Wek bav û bira bin*

*Li ber dijmin rabin*

*Zaz û Lor û Gore*<sup>607</sup>

Di helbesta AGIRÊ SOR de helbestvan wesfê agir û pîroziya wî nîşan dide bê çiqasî qewet û tundî bi xwe ve hildigre û ta kîja astê bi hêz e ta ku kare xurtirîn hesinê cîhanê bihelîne û dibîne ku her tiştê heye bi agir ve girêdayî ye.

Helbet ev nêrîna han ne ji valahiyê tê, ji ber ku helbestvan xweş dizane ku kûraniya nîşaderê agir di jiyana xelkê de di kîja asteyê de ye wek tiştêkî pîroz û bikaranîna wan nîşaderan di helbestê de weke serûberekê te'bîrî li ser gelek tişt û nîşaderan.<sup>608</sup>

Di vir de xuyaye agirê helbestvan kare her tiştî bike, ji ber ewe ê herî xurtir û pêdartir yê ku her tişt di destê wî de ye, eve mentiqê quwwet û hêzbûnê yê ku helbestvan divê bide xuyakirin û bide zanîn jî ku heçî kesê xwediyê vî agirî be, ew xwedî hêze û dikare zora hemî astengên ku dikevin rêya pêşketina wî bibe û wiha jî biserkeve, helbestvan dibêje:

*Agir, agirê xurt, agirê gurr agirê sor*

*Peresê Kurd û Ecem hasin hilfirande jor*

*Hasin di firîne, hasin di gerîne hasin di peqîne*

*Ev agirê geş, agirê gurr, agirê sor*

<sup>607</sup> - h.b., r. 63.

<sup>608</sup> - b.f. li ser agir û semboliya wî, bnr. Cirêdî el-Mensûrî, **en-Naru fi'ş-Şi'rî we Tiqûsi's-Seqafetî**, el-Merkez es-Seqafîyi'l-Erebî es-Seqafî, Beyrût 2002.

*Berê peresê me bû lê niha bûye ê her kes  
Tu pê bawer nakî ey milletê kurd, milletê kor*

*Hasin û petrol xurtin lê her bi wî ye xurtî  
Helandin û şewat bi wî her bi wî ye zor*

*Li her cî xuya ye lê xaniyê wî ye mekteb  
Ê çiwê dor sitand lê ê ne çiwê ma bê dor<sup>609</sup>*

Di vê helbestê de helbestvan hewl dide ku hevgirtinekê di navbera bi vexwestina agir bi hemî nişaderên xwe ve û bi vexwestina avê/çem ku herdû dijî hev in û tucarî li hev nakin û hebûna yek ji wana wendabûna ya din encam dike, lê xuyaye helbestvan di vir de divê herdiwan li hev bîne û dijminahî di nav wande bi dawî bîne, tevî ku bi karanîna her yek ji wana bi awakî ciyawaz ji ya din dike, ji ber di dema ku agir qewet û hêz û pêdarî ye, çem pîvana asta kûrahî û firehbûna tiştane.

Helbestvan berê xwe dide xwendevanê xwe û wateya jiyane jê dipirse û divê jê zanibe ka gelo wê wateyê naskiriye an na, lê xwe nagire li hêviya bersiva wî, radibe ew bi xwe bersiva pirsê xwe dide û ji xwendevanê xwe re dide zanîn ku jiyane wek çemekî fireh e ku kûraniya wî nayê pîvan, ne destpêk jê re heye û ne jî dawî, wiha jî helbestvan hişyarî dide ku ji erkê her nifşekî ye ew hemî karên ku li ser piştê wî ne û jê tene xwestin bi comerdî û bê dudilî bike ji bona cîlên piştî wî karibin bi rehetî û hêsanî jiyana xwe derbaskin bê ku astengî û zehmetiyên zêde bikşînin û teqez hingî ewê jî ji alî xwe ve wê bixebitin ku jiyana xwe hîn xweştirbikin.

Dîsa jî helbestvan hişyariyê dide ku kurd hemî tev de yek bin û yek destbin û yek dilbin û ji perçebûnê dûrkevin ji bona zû bigên doz û daxwazên xwe û xewna xwe ya pîroz bi damezrandina welatekî serbixwe zû pêk binin ku ev jî bi pêşketina sen'et û wergirtina hêz û çekan di demekî zûtir de tete cî, ji lewra dibêje:

*Tu zanî jîn li cîhan çî ye ey millet  
Çemekî fireh bê ser û bin, kûr û dirêj û bê bor*

<sup>609</sup> - Cegerxwîn, *Sewra azadî*, r. 130.

*Ta dest nedin hasin û xurtî jê nexwazin*

*Û nebin xwedî tang û top û Firok û Papor*

*Naçin rêza miletan û nabin xwedan dewlet*

*Bibin yek ey millet çine Kurmanc û Lor û Gor*

*Ê pêş qadê diçirênî bi xurtî û bê hemd*

*Ji ê tê re fireh dibî wek Xabor*

*Xortên ku bân wê gazina ji me bikin , ciwanên kurd*

*Gazina wan raste beyar mane Tor û Zor<sup>610</sup>*

Di helbesta DEZGIRTIYA XORTAN de helbestvan behremendiyek bêhempa nîşan dide û bikaranîna gelek wêneyên helbestî yên corebecor bi spehîbûnên rengereng û ev yeka ha xweş xuya dike ji destpêka helbestêve, û ji xwendina nav nîşana wê ve belaxet û şibandîne dest bi xuyakirinê dikin.

Welat keçikeke nûhatî ye û madem keç e helbet wê daxwaza xorta be û madem daxwaza hemî xortan e teqez wê yeka narîn û nazik û şeng û yekane be û helbestvan van pesnan hemiyar diherikandina helbestê de berçav dike, ji destpêka helbestê xuyaye ku helbestvan divê êş û azeriya welêt bîne ber çavê xwendevanê xwe/milletê xwe bi wê nalîna ku ji dûr ve dibhîze û bi xwe kes nabîne tenê nalîneke kûr û bi şewat tê guhê wî agir berdide dilê wî lê ne agirekî normal e, dû û dûkêl û dûman bi ser serê wî dixê ew deng û nalîn hemî êş û kederên laşê wî di canê wî de dicivîne.

Heger helbestvan nasnama xwediyê deng nas nake yan jî divê wiha bide nîşandan paşê ji guhdarê xwe re dide nasîn ku xwediyê nalîne welat e. Di hingê de kelejaneke xurt wî digere û dibe wanebêjek û berê xwe dide milletê xwe û nav tê dide ku barê berpirsiyariya xwe di ber welatê xwe de hilgire û berevanî û xebatê di ber rizgariya wî de bike û ji her kurdekî dixwaze, Celalî be, Zazî be, ne xeme, ji lewra di encamê de hemî yekin ji ber hemî jî Kurd in ji lewra jî dibêje:

---

<sup>610</sup> - h.b., h.r.

*Nalînek tê guhê min, lê winda û nihan e  
Agir berda dilê min, tev bû pêt û dixan e  
Barek da ser milê min, lê barekî giran e  
Dane ser hev kulên min, hemî derd û bela ne*

*Dengê kê ye dinalî, nalenala welat e  
Dikî gazî, dikalî, rabin çaxê xebat e  
Kurd û Zaz û Celalî, tev de çêkin civet e  
Kes xwe medin vî alî, îro roja felat e<sup>611</sup>*

Ew welatê xweşik û spehî yê ku dişibe keçeke xame ya nûgihîştî ku agir bi dilê xortan dêxe bi şox û şengiya xwe û wan sermest û gêj dihêle bi nazdariya xwe, xwe bi cilên rengereng xemilandiye û bendewarê şehsiwarê xewnên xew yên gulgulî ye.

Ew xusrewa rindan û şahînsaha keçan e, gerdena wê sêveke ku herdû rengê sor û zer têde tevlihev bûne û sêv bi xwe nîşaderên wê yî taybet hene ji ber ku sêv e ya ku Adem ji buhiştê derxist lê beranberî wê derxistinê jî ew sêv bi xwe jî bû sedeme ku mirov ji banî dakeve xwarê û li ser gerdûnê jiyan a xwe berdewam bike.

Gelo mebesta helbestvan ji vê gotinê ew e ku xort wê sêvê bixwin da ku bighin miradê xwe û li ser xaka welatê xwe di gerdûnê de bijîn ji ber ew navên bi dijminê xwe re bijîn welew di buhiştê wan de be jî, yan gelo helbestavan ewqasî pesnê xweşbûniya welatê daye û nîşan daye ku ji buhiştê xweştir e da ku xort bi comerdî xwe di ber welatê de bidne kuştin ta wî azad bikin nemaze di vî wextê ku xortên kurd ji xewa xwe ya giran şiyar bûne û têgihîştine ku serpêhatiya walatê wan çendî çetîn û dijwar e û bav û bapîrên wan çî gunehkarî û şaşîtiya mezin kirin ku wiha bi rehetî dev ji wan mîrneşînên xwe berdan, ji lewra pêdiviyê ku dest bi xebatê û têkoşîneke bêhempa bikin da wê keçika delal/welat bi dest xwe xînin û bi kêf û şadî pê re bijîn û ji îro pêde derfet ji tiralî û bêxêrî û sistiyê re tineye ji ber nîrên ku welat têde derbas dibe gelek nîrên hestiyarin û ên ku divên destê xwe deynin ser û ji xwe re bibin gelekî lê welatê hez ji yek tenê jî ji wan nake, tenê hez ji yê kurd dîke û divê ew ê kurd tenê pîre bijî û razîbûna xwe pê eşkere dîke ji lewra jî dixwaze bê pîrs û

<sup>611</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 4.

tirs bila were wê bixwaze, lê her divê ku ew ji dana next û qelenê wê re amade be û divê pêşinde jî zanibe ku qelenê wê ne dirav û zîv û gewher û zêrin lê belê xwêdan û xwîn e, ku ewin ên dikarin erd û milkê wê xesip bikin da ku xweştirin sebze û meywe û ber û fêkiyan bide ne tenê wî kurdê mêrxas û dilêr lê belê hemî dost û heval û hogir û xizmên wî jî.

Di vir de xwîn nîşana cangoriyê û fidakariyê ye û nîşana berevanî û berxwedan û xweragiryê ye, ne nîşana şer û ceng û kuştinê ye û belkî jî xwîn ji hemî simbolan bêhtir xwedî nîşadere ji halê ku tê û hatiye serê milletê kurd, ji serpehatiyên dijwar ku hemî kuştin, talan, wêran, şewat û komkujî bûn, ji lewra jî gotina xwîn di vir de bi wateya jiyane ye bêhtir ji wateya mirnê, helbestvan dibêje:

*Xortên kurdan şiyar bûn, guh nadin van nemerdan,  
Bav û kalê me rabûn hemî mirin ji derdan.  
Derdên li wan giran bûn, îro li me çî ser dan  
Ne wek bav û bira bûn , yara xwe j' dest xwe berdan.*

*Xemlandî me seranser dezgirtiya xorta me  
Gerden sêvek sor û zer, li hêviya merda me  
Qelen xwîn e ne gewher, Kurdistana kurda me  
Bê tang û top û leşker, îro we ez berdame.*

*Kurdistana delal im, herkes tê min dixwazî  
Ez pir şox û sepal im, min deng daye bi nazî  
Ev bûn bîst û du sal im, li ser min cengebazî  
Kurdo wer min bixwaze, belê bi serfirazî.<sup>612</sup>*

Helbestvan bi zimanê welêt/keçikê xeber dide, berê xwe dide xortê kurdî ku divê ew xwazgînê wê be, şîretan lê dike û jê re dibêje; eger te divê tu bigêjî miradê xwe û min bi dest xwe bixînin divê tu baş li xwe miqatebî ji ber ji her çar alî teve dijmin û nexêrxwazin û divên xirabiyê bighînin te, ji lewra jî divê gava ku tu raperî û bivêyî welatê xwe rizgar bikî divê tu çeleng bî û bilez karibî ferzendan nêçîr bikî,

---

<sup>612</sup> - h.b., h.r.

divê tu mîna bî teyrê başoke gava êrîş dibe ser çûkan, çawa ew rêya bazdanê li ber digre û nahêle ji nêv pençên wê bifilite û çawa ew çûk ji hêz û qewetê dixê û hew dihêle ew bilive, eger xorto tu ne wiha bî; tê tu sûdeyê bi dest xwe nexî, eger tu ne wek şêr bi hêz û xurt bî, ew şêrê ku bû şahê daristanê û ew e xwediyê biryarê tê de, tê nikaribî welatê xwe rizgar bikî, eger xorto tu ne wek gur bî, çeleng û jêhatî û xwedî saw û hişmend û rênas bî, tê min ji dest xwe bibî û dîsa tê bimînî bindest û lawaz û berder û tu azadiyê bi dest min û xwe naxî û dê hemî hewl danên te biser nekevin û badîhewa herin.

Bi van hevokên dagirtî ji semboliyê helbestvan divê tundî û hêzbûn û xurtiya dijmin ji xwendevanê xwe re eşkere bike û pê bide zanîn ku çiqasî ji xurtiyê jê re pêdiviyê ta ew karibe wî dijminê xwedî ewqas hêz ji welatê xwe der bike û ji cîwarên xwe bi qewirîne û bêhtir ji vê jî çendî divê ku ji xwe bawer û wêrek û jîr be.

Helbestvan teqez dike ji xwazgîniyê xwe re û jê re dibêje; heger tu li van gotinên min guhdar û xwedî derkevî tê min bi dest xwe xîni û em dê bi hev re jiyanê xweş bijîn, lê ji bona em di zûtirîn demê de bigehêjin hev divê tu bi heval û hogir û biraderên xwe re bi lez serkirdayetek serokatîyek hişmend û bîrewer xwedî rêbazek durist û rast û tekûz damezrînî û dest bi xebat û tevgerê bê rawestan bikin, milên xwe bidin hev û yekîtiyêke pîroz di nav xwe de pêk bînin û hemî tev de yekbin çî Baban, çî Bext, çî Beraz, çî Tor û Zaz ...hingê win dê hemî bibin xwedî welatekî serbest û azad û serkeftî û xwedî nav û nîşan di dinyayê de û bi vî awayî helbestvan gotinên xwe berdewam dike û dibêje:

***Xorto! Eger tu rabî, wek başoke herî çûk***

***Ne xurt û şehreza bî, tu nastênî ji min mûk***

***Ne wek şêr û gura bî, bûkê didî bi tûtûk***

***Ku bê tac û sera bî, tê çawan min bikî bûk***

***Bê padişah û leşker kengê dibî serefraz;***

***Kî bê xebat û tevger dixî destê xwe daxwaz***



***Baba û Bexfî û Lor, Beraz û Torî û Zaz***

***Nebîn tev yek seranser, tev dê bibin belengaz*<sup>613</sup>**

Di helbesteke din de bi navê KA WELAT Û AL Û OL helbestvan berê xwe dide felekê û jê hêvî dike ku bibe destgîrê wî û ew cî û warê ku bêxwedî mane nîşanî wî bide û ciyên ku ji xwediyên hatine sitandin ew deşt, ew zozan, ew mêrg, ew çîmen, ew bexçe, ew çiya, ew çemên bi navûdeng (Ferat, Dicle, Xabûr, Zab), ew gol (Wan, Nazûk,...), ew dîroka ku ji nişka ve windabû û ser lê hate gerandin û hew êdî rêya çiyayê xwe nas dikir, ji felekê hêvî û lav dikir wan hemiyên yek bi yek nîşanê wî bide. Ji felekê dîsa rica dike wan qehremanên ku mîna şêr û pilingan bûn, wan qebîleyên bi navûdeng bûn (Gor, Lor, Bext, Zaz, Şîkak, Aştî, Mil, Zîl, Zol), wan bajarên kevna û şaristanî (Kerman, Kerkûk, Wan, Erzerûm, Kilis, Melatya), ên ku hemî dîdevanin ser wan navdariyên ku Kurdan li Kurdistan û li rojhilatê ava kiribûn, ji felekê dîsa hêvî û lavan dike ku wan hemiyên yeka yek nîşanê wî bide ji lewra dibêje:

***Ey felek kanî li kû man ew welat û al û ol;***

***Çavbelek kanî li kû man bûne xanim tog û tol***

***Ka ferat û kanî Xabûr kanî Dicle kanî Zab***

***Kanî gola Wan û Nazûk, kanî ewqas gêr û gol***

***Kanî gor û kanî lor û kanî bext û kanî zaz***

***Ka Şîkak û knî Aştî, kanî Mîl û Zîl û Zol***

***Kanî Kerman, kanî Kerkûk, kanî Wan û Erzerom,***

***Ka Kelîs û ka Melatya, tev de bûne xak û xol*<sup>614</sup>**

Û di helbesta EV JI ME TÊ HEW de heman daxwazên ku hatine dîbarekirin di helbestên din de û helbestvan vaye wan daxwazan bihîne xwendevanên xwe û wan pê agahdar bike û ji wan re şirove bike di her gav û deman de û her wan wêneyan li ber çavên wan bihêle xweşbûn û xweşikiya welat û temaiya dijminên

<sup>613</sup> - h.b., r. 5.

<sup>614</sup> - h.b., r. 29.

hawîrdor di dagirkirina wî de, zulm ûzora ji her çar alî ve li millet dibû, axîn û keserên li ser windakirina navdariyan, bîr anîna wan qewmên ku hukumdarê Kurdistanê bûn û bav û bapîrên Kurdan e û ewên ên ku nûneriya dîroka kurdî dikin û ewin ên ku sînga wan bi agirê dijmin hatiye kewandin, helbestvan dibêje:

*Zana , bîrewer, hozan û gernas*

*Cengawer û xurt, qareman , mêrxas*

*Zaza û bext û lor , aşît û bilbas*

*Li sînga tevan rakişandin kew*<sup>615</sup>

Di helbesta KÎME EZ de helbestvan teqez dike ku tu cudahî tineye di navbera Kurmanc û Kelhor û Lor de û hemî jî nûnerê kurd in, lê helbestvan rexnên tûnd li wan dike, ji ber ku ewan navdariyên bilind û hêja ji dest xwe windakirin û nikarîbûn wan tac û erşên xwe biparêzin. Dijmin ji wan xurtir bû, ji lewra jî ne tenê serdestî li ser erdnîgariya wan tenê kir, lê belê li ser fikr û ramanê wan jî kir, gava ku kir ramanê olî dest da ser li ser mejiyê wan bike ji dêvla ramanê netewî û bi wê yekê, Kurd gêjomejo û belawela man di navbera raman û idyolojîyên cûrbecûr de , ta ku dîrok û kultûra xwe winda kirin û bûne dijminê xwe bi xwe.

Ev rexne, rexnekirna zatê kurdî bi xwe ye û bêhtir ji wê jî daxuyaniyeke ji rewşa Kurdî ya ku bû wek kelepûrek li ba kurdan, ji dijminatî û berberî û rikberî û pevçûnên bê hawe û şerên birakûjî re, ku hemî bûne sedemên yekser di windakirina navdariyên ku hatibûn bidestxistin çendê caran ji lewra dibêje:

**Ez im kurmanc û kelhor, lor û gor**

**Ez im, ez kurd im, li jê û li jor**

**Çend hezar sal in**

**Kurdistana min**

**Perçe perçe ma**

**Bindestê dijmin**

**Kî me ez?**

---

<sup>615</sup> - Cegerxwîn, **Kîme ez**, r. 30.

**Îro ji Lor û Kelhor û Kurmanc**

**Ji dest xwe berdan ew text û tac**

**Bûne olperest**

**Bi tizbî û xişt**

**Ta dijmin şikand**

**Li me ser û pişt<sup>616</sup>**

Helbestvan baş nêrxê fidakarî û canfidayî û cangoriyê dizane û ev tişt xweş hatiye xuyakirin di gelek helbestên wî de, ji wana helbesta wî ya binavê TA NEŞEWITIN RONÎ NADÎ WELÊT, helbestvan divê vê nêrîna xwe bighîne xwendevanê xwe jî û bide zanîn ku cangorîbûn bi hewcê dilêr û mêrxasan e û ji ber kurd bi mêrxasî bi navûdengî di cîhanê de, ev tê wê wateyê ku cangorî û canfida di nêv milletê kurd de pir in, lê mixabin tevîdana wan qurbanên pir jî ta îro jî hê dijmin dagir kirê welatê wî e û xêr û bêra wî tev dixwin, di wexetê ku yê kurd bê hêz û qewet û lawaz maye di bin destê dijminê xwe de .

Helbestvan hewl dide ku rihê hêrbûnê di laşê xortê kurd de vejîne û rihê raperînê li balê nû bike, radibe dest bi pesnê zatê kurdî dide û dibêje ku kurd şêr û pilingên çiyayê e ku tucarî nayêne şikandin û dilêr û lehengên ku tucarî nayên tewandin û mêrxasên ku tucarî nizanin qelsîti û newêrekî û radestî çî ye, tu cudahî di navbera wan de tune, li kû bin yan ji kû bin yan ji kê bin, (Zazî bin, Bextî bin, Lorî bin, Sorî bin, Hekarî bin, Dasînî bin, Torî bin, Berwarî bin.....), hemî Kurd in û hemî jî mêrxas in û hemî jî fidakarê welatê xwe ne, ji lewra helbestvan dibêje:

*Em şêrên çiya, piling û ejder*

*Zaz û Bext û Lor, Sor û Hekarî*

*Derkevin meydan tîp û tang û top*

*Dasînî, Torî, Bextî, Berwarî<sup>617</sup>*

Li hin cihên di helbestvan bi rexneyên tûj êrîşê berdide ser serokeşîrên kurdan, ku çawa bi rolekî xirab û nêgatîv dijjana civakiya millet de rabûne û lîstine û ev tişt bi zelalî tê xuyakirin di helbesta wî ya bi navê (ÊLPERÎSTÎ) gava ku rexne li

<sup>616</sup> - h.b., r. 14-15.

<sup>617</sup> - Cegerxwîn, **Ronak**, r. 66-67.

rihê eşîrtiyê dike, ew rihê ku bandoreke xirab li jiyana kurd ya civakî kirye, ji lewra ew ji xortan di xwaze ku dûrî rihê 'eşîrtiyê bikevin û ji pêl rihê 'eşîrtiyê bila bi rihê kurdayetiyê û bi hestê netewî hemî di bin sîwana welêt de bicivin û xebata xwe berdewam bikin.

Wiha jî rexneyên herî tûj li wan serkêş û axayên kurdan dike, ên ku birakujî ji xwe re kirbûn kar û sen'et, ta hevdû lawaz û bê hêz kirin û paşê dijmin hemiyên bi hev re dibin destê xwe de dîl û reben û bê kêr hiştin û mal û milkên wan talan kirin û welatê wan wêrankirin.

Dîsa helbestvan tu cudahiyê naxe navbera qebîleyekê û ya din, yan zaravekî û yê din, yan çarçoveyekê û ya din, ji ber di dawî de hemî Kurd in û welatê hemyan jî Kurdistan e (Xerzî bin, Botî bin, Zazî bin, Torî bin, Kurmanc bin, Kelhorî bin, Lorî bin, Goranî bin...), hemiyên jî gelek zilm û zor ji destê dijmin dîtine û gelek astengî û tehlîtî ji dest dijmin xwarine, ji bo wiha jî pêdeviyê ku kurdên belawela bûyî hemî xwe bidin ser hev û bibin xwedî yek armanc û yek rêz li hemberî dijmin ê xwe û rêya xilasbûnê ji xwe re resim bikin ji bona ewjî weke her milletên hawîr dora xwe bighên azadî û serxwebûna xwe û welatê xwe.

Cegerxwîn berê xwe dide xortên nû hatî ji ber dibîne ku ew in yên karibin daxwazên wî pêk bînin û karibin welatê xwe ji nuh de ava bikin û bighînin rêza dewletên cîhanê ji bo wihan jî her nav di wan dida û hestên wa gurr dike û rihê raperînê li ba wan bêhtir divejîne gava dîroka bav û bapîrên wan tîne bîra wan û ji wan dixwaze ku careke din wê dîrokê vegeînin û dîsa wekî wan payebilind û serfiraz bijîn, ji lewra dibêje:

*Mebe êlperset ey kurê xwendewar*

*Hemî kurd yekin ey keça namîdar*

*Çi xerza û Bota û Zaza û Tor*

*Çi Kurmanc û Kelhor, çi Goran û Lor*

***Hemî qey ne kurdin çima perçe bûn ?***

***Bi destê neyaranve berdan hebûn***<sup>618</sup>

Cegerxwîn girngiya ilm û kultûr û zanyariyê di serxwebûn û pêşketina milletan de xweş nas dikir û ew nasîbûn jî ji ezmûna xwe ya taybet dinasî ku tê de derbas bûbû, ji lewra ew di wextekê de jiya bû ku cehalet û nezanîbûn û paşdemayîn konê xwe li seranserî welêt veda bû û di hingê de pir zehmet bû tu yekî bibînî ku zanibe bixwîne û binîvîse, ne tenê bi zimanê xwe yê zikmakî belê ta bi zimanê desthilatdarên dagirkirî jî, ji lewra helbestvan di helbesta xwe ya binavê ZIMAN Û HÎNKIRÎNA ZIMAN de navtêdanê di xortan de dide, wan dehif dide bi alî xwendin û zanebûn ve ji ber dibîne ku xwendin ew çekê herî xurte ku mirov werdigere û kesê xwendevan ne muhtacê şûr tiving û tabiyan e ji ber ku mêrxasiya di rihê wî de heye bi hêztir e ji wan şûr û tiving û tabiyan.

Wiha jî Cegerxwîn doz li xortan dike ku ne tenê hînê xwendin û nivîsandina zimanê dewletê bibin, lê belê divê ew giringiyêke taybet bidine xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe yê zikmakî û bi vî rengî jî berê xwe dide nivîskarên kurd û ji wan dixwaze ku ew bi zimanê xwe yê kurdî binivîsin û şagirtan jî hîn bikin xwendin û nivîsandinê ji ber ku ziman nasnameya milletan e û ji wan re teqez dike û dibêje; heger zimanê kurdî nehatiye pêşketin û negihijtiye rêz û asta zimanên beyanî, ne ku ji kêmasiya zimanê kurdî ye lê belê ji sedema siyasetên çewt û regezperestî û ne merovaniya ku di derheqê Kurd û zimanê kurdî de di hate pêkanîn ji alî dewlet û desthilatdarên dagirkirî bû ji lewra helbestvan dibêje:

***Vejenezimanê xwe ey xwendevan,***

***Nebûye millet hîç kesek bê ziman***

***Zimanê me xoş û xeroş û ciwan***

***Eger baş bizanî tu nakî ziyar***

***Sedan sal, hezaran zimanê meye***

***Wekî me di bin destê dijmindeye***

---

<sup>618</sup> - Cegerxwîn, **Zend-Avista**, r. 114-115.

*Çi gernas û mêre di meydanê ceng*

*Ne şûr û ne mertal, ne top û tifeng*<sup>619</sup>

Ew fikir û ramanên ku di Kurdistanê de bi serketibûn û kirasekî pîroz li wan hatibû kirin, roleke pir xirab û nêgativ li ziman û kultûra kurdî kirin û bandoreke pir mezin lê kirin û bûne sedemeke sereke di paşdemayîna wî, ji lewra Cegerxwîn rexnên pir tûj û xurt li wan şêx û melayên kurdan kirin, ew ên ku ola musulmantiyê hilgirtibûn ser milên xwe û zimanê erebî tenê bi kar tanîn di peyv û nivîsandin û hînkirin û bicîkirina hemî pîroziyên olî de ta gihişte astekê ku baweriyek li ba wan çêbû ku ew êdî ne hewceyî zimanê xweyî zikmakîn e û bi zimanê erebî bêhtir nêzîkî xweda di bin. Ev behweriya şaş pir te'de li zimanê kurdî kir û hişt ku hêdî hêdî were piştguhkirin ta di encamê de ma li paşiya zimanên hawîr dorê xwe.

Ev nexweşî ne oldarên kurdên musulman tenê pê ketin, lê belê oldarên xiristiyanan jî pêketin ku ewan jî zimanê Mesîh tenê di dêrên xwe de tanîn ziman û bivê yekê zimanê neteweyî hate windakirin li çend nifşên li dû hev û heger ewan karîbûn xwe ji vê êş û metersiyê azadkin di vê paşiyê de, lê belê musulman ta îro jî hîn di bin bandora zimanê erebî de razayîne û hêjî wê pîroziyê didin wî zimanî û rojane jî bi lêv dikin di li mêj û dû'a û xutbeyên di roja îne de û ta di şûştina miriyên xwe de û di bin axkirina wan de jî dema telqînê li ser wan di xwînin.

Ji vê yekê xweş tê zanîn ku eger zimanê kurdî ne bi wê qewet û hêza xwe ya xurtbiwa, teqez wê anha di nav zimanên mirî de bihata jimartin û ev çîrok û çîvanok û destan û evsane û gotinên pêşiyar hemî nîşanên bilindbûn û rewanbêjî û xurtbûna ziman ê kurdî ne tevlî ku piraniya wan bi devîkî hatine gotin ne bi nivîskî.

Dîsan jî helbestvan teqez dike ku cudahî di navbera wan zaravên ku kurd pê diaxivin de tune, gerçî (Kurmancî be, yan Kelhorî be, yan Lorî be, yan Sorî be, yan Zazî be, yan jî Goranî be), ji ber ew zarav hemî di dayînekê de dicivin û kom dibin, ew dayîn jî zimanê kurdî ye û her zaravek dibe alîkarek ji zaravê din re, ji lewra hwlbestvan dibêje:

---

<sup>619</sup> - h.b., r. 79-80.

*Li alîkî Lor û li alîkî Gor*

*Li alîkî kurmanç û kelhor û Sor*

*Wekî me gelek perçene tev li jêr*

*Kesî guh nedaye li mizgeft û dêr*

*Mirîşo bi tazî me tazî dikin*

*Di rojêde pênc car me gazî dikin*

*Li mizgeftê tazî dibêjin mela*

*Binêrin çî deng tê ji dêrên fila<sup>620</sup>*

Ji bona helbestvan xurtiya zimanê kurdî bi çesbîne û bide nîşandan ku ta kîjan astê xurt û pêdar û rewanbêj e, wan kesayetiyên wêjeyên bilind û xwedî nav û nîşan tîne bîra xwendevanê xwe yên wek Melayê Cezîrî (1517-1640z.) û Ehmedê Xanî (1651-1707z.), Siyapoş, Nalî, Bateyî, Miksî, Hacî û Nûrî<sup>621</sup>, ku hemiyana bi vî zimanî nivîsandine û bi derpêçan afirandine tevî ewqas zulm û zordestî û zorîkariya ku ji alî desthilatdarên dagirkir li wan û li zimanê wan ê kurdî dikirin.

Gava Cegerxwîn gazî wan kesayetiyên di helbestên xwe de dike, bê guman ew kesane nerxekî ramanî û rûhî û neteweyî didine wê helbestê û helbestvan dizane bê çiqasî bandora wan kesayeta li derûna xwendevanan dike, ji ber ew her hazirin di wijdan û fikr û ramanên wan de û bi vê yekê ew kirasekî rûhiyê xwedî nîşaderên halûyî (hest) û li helbestê dike ku dihêle ê xwendevan pê zêde bikeve bin bandoreke kûr û dûr ji lewra helbestvan Melayê Cezîrî û Ehmedê Xanî dişibîne bi herdu çemên Kurdistanê Zab û Diclê û şirove dike bê çawan ew herdu çem li ser axa welat di herikin û xelkên Kurdistanê çawa sêde ji herdu çeman dibînin û xêr û bêrên bê hempa ji herdu çeman bi dest xwe dixin, wiha jî helbestên Cezîrî û Xanî di nêv millet de diherikin û millet ji wan helbestan sêde dike û çandê wêjeyî bilind bi dest xwe dixîne, ew çanda ku bû bingeh ji çandeyên piştî xwe re ku leba leb dihatin û li ser wê bingehê cî digirtin û herdu helbestvanê leheng karîbûn xelkên welêt bi temamî matmayî bihêlin ji bedewbûn û rewanbêjî û bilindbûniya wêjeya helbestên xwe û ji

<sup>620</sup> - h.b., r. 80.

<sup>621</sup> - b.f. liser helbestvanên edebiyata kilasîk, bnr, Abdurrahman Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Kilasîk**, ç. 2, weş. Nûbihar, Istanbul 2014.

wan re dûpat bikin ku zimanê kurdî zimanekî sax û saxlem û bilind e û eger xwedî jê re derkevin û guhdanê lê bikin û derfet jê re were dan, wê karibe bi gavên fireh pêşde here û hemî hewcebûnên zanistiyê pêk bîne û bi afirîne, ji lewra helbestvan dibêje:

*Bi çîrok û helbeste û folkilor*

*Bi paye zimanê me xweş çûye jor*

*Cizîrî û Xanî, çi gernase ew*

*Wekî Dicle û Zab û Arase ew*

*Siyahpoş û Nalî û Batî bibîn*

*Tu Miksî û Nûrî û Hacî bixwîn*<sup>622</sup>

Helbestvan eşkere û bi dengê bilind şanazî û pozbilindiya xwe bi kurdîtiya xwe dike û ew pesnê zatê kurdî di hundirê kesayetiya xwe de dide, di helbesta xwe ya bi navê FORT Û PORT ku tê de dîsa wek carên berê teqez dike ku tu cudahî di navbera zarav û hoz û qebîleyên Kurd de tune ye û hemî jî Kurd in û ji yek nijadî ne û ev e daxwaza herî giring û sereke ku divê hemî jê re bixebitin (Kurmanc, Lor, Gor, Kelhor, Zaz, Bext, Milî, Kîkan, Torî), ku helbestvan van hemiyan di kesayetiya xwe de nîşan dide, ew zatê kurdî yê şoreşgêr ku her li azadiyê digere û xebatkerê ku şev û roj têkoşînê li ser çiyayê dike, wihan jî helbestvan cewherê dijminê xwe baş nas dike, ew dijminê ku di heman demê de dijminê milletê wî ye jî, dijminê ku divê her û her wî û milletê wî dagir bike û wan û çanda wan tevde winda bike û bi peşêfe û bi helîne, helbestvan dibêje:

*Kurdîm: kurmanc, Lor, gor û kelhorim*

*Zazim, bext û mil û kîk û torim*

*Şorişgêrim ez azadîxwazim*

*Pîkolê dikim, hawîr bor – borim*

*Derketim çiyayê, ne razan, ne xew*

*Navên vî sedî weha raborim*

<sup>622</sup>- Cegerxwîn, **Zend-Avista**, r. 80-81.



***Bi çarox û rext gêrbûm ser qadê  
Berjor dibezim, tim ber li jorim***<sup>623</sup>

Dîsa daxwaza helbestvan bi yek rêzîya milletê kurd dúbare dibe, wiha jî ew hest û coşeya ku helbestvan pê dihise gava ku behsa navdariyên kurda dike dúbare dibe û ew axîn û keserên li ser windakirina wan navdariyan dúbare dibe û di heman demê de ew pesin û şanzî û ew rica û hêvîkirina ku kesekî kurd dev ji welatê xwe bernede dúbare dibe, berovajî vê yekê ew dixwaze ku kurd her girêdayî bi welatê xwe ve bimîne bi hemî hêz û vîn û hêza xwe ve, ji ber ew welatê wî yê xweş û delal yê têr mêrg û deşt û teyir û tilûr hêjayî sekinê ye ji ber welatê wî buhişta Xwedê ye li ser xaka zemîn, ji ber vê jî ev welat hêjaye ku mirov di ber de qurbanîyan bide û fidakariyê di ber azadiya wê de bike ji ber dara azadiyê eger bi xwînê neyê avdan mirov tu ber û fêkiyan jê naxwe û bi dilxweşî li bin siha wê pal nade, ji lewra pêdiviyê ku yekîtiyek rast û hevgirtinek ji dil di nêv millet de pêk bê û dev ji her ramanê bê te berdan ji bilî ramanê ku xizmeta kurdayetiyê bike û hîç tu cudahî di navbera kurdan de tune ye ji kû bin yan li kû bin yan çî bin (Bextiyarî, Şehrezorî, Erdelanî, Zazî, Bextî, Serhedî, Lorî, Gorî, Şengalî, Amedî.....) ji ber tiştê ku hemîyan di bin baskê xwe de di civîne kurdayetî ye û îmana wanê hevpar û hevbeş bi welatê wan e, nemaze di vê dema ku êdî kes qîma xwe hew bi bindestiyê û koletiyê tîne lewra jî tiştê tê xwestin ew e ku têkoşîneke seranser û berdewam û bê rawestan bibe ta azadî û serxwebûn û xweserî bi dest were xistin ji lewra helbestvan dibêje:

***Tevde rabin wek bira bin jor û jêr û rast û çep ,  
Bextiyar û Şehrezûr û Erdelan û Zaz û Bext û Serhedî .***

***Ta bi kengî em di bin destê neyaran wer bijîn ,  
Serbilindê milletê kurd, win ji xo nakin fedî ?***

***Kurd hemî kurd e, çî bêjim Dêrsim û Şengal û Tor  
Lor û gor û zaz û bext û Şehrezûr û Amedî...***<sup>624</sup>

<sup>623</sup>- Cegerxwîn, **Şefaq**, r. 30.

<sup>624</sup>-Cegerxwîn, **Hêvî**, r. 28.

Grêdana Cegerxwîn bi dîroka kurdî ve pir tekûz e û heger heman gotin û heman kesayetî û heman daxwazî û heman hêvî û heman pend û şîret di gelek helbestên wî de tene dúbarekirin jî, ev jî tê wê wateyê ku helbestvan gelekî teqezî li ser giringiya wan ramanan û pêdiviya cîbicîkirina wan kiriye û giringiya bîranîna wan kesayetiyên bi navûdeng daye nîşandan û ji van tiştan hemiyar bêtir, helbestvan vaye ji xwendevanên xwe re/milletê xwe re biçespîne ku dibe careke din ji nû ve milletê Kurd dîsa bighêje wê asta ku bav û bapîrên wî di berî sedan salî de gihiştibûnê, ev hêvî û omîdên ku her û her di xewnên Cegerxwîn de ne.

### **3.3.2. Rengvedana Çirûskin Ji Dîroka Kurdî Ya Nûjen:**

Di dîroka nûjen de gelek bûyer qewimîn, nesîbê Kurdistanê ji wan pîr bû. Helbestvan Cegerxwîn karîbû di riya helbesta xwe re roleke mezin di belgekirina wan bûyeran de bilîze, nemaze ewên di serdema wî de qewimîn û tehliya wan di qirrika wî de ma, leheng û qurbanîyên wan dîtin. Bihtir Cegerxwîn guh da wan bûyerên ku rengê xwe di dîroka kurdî de bi xurtî vedan û hê şûna wan xuyaye.

#### **3.3.2.1. Rengvedana Şoreşa Şêx Seîdê Pîran 1925:**

Şêx Seîd bi kesayetî û şoreşa xwe cihekî giring û berçav di helbesta Cegerxwîn de girtiye, ta ku helbestin taybet ji wan re terxandine, da bi helbesta xwe wê bûyera dîrokî belge bike. Helbestvan giringiya helbestê di nav xelkê de nas kiribû û dabû zanîn ku helbestdikare xwe û bûyerê jî bi demêjahîya demê re biparêze. Di bûyerên serdema xwe de helbestvan bîrdanka xwe pîr nawestîne û carna di ser hûrbîniyan re diqevêze û ta jê tê dixwaze wan bi wêneyin hunerî himbiz diyar bike û carna jî behtir ji amaje û destnîşanekê ji wan re heye. Helbestvan dixwaze bûyeran bi zimanekê rewa tev li xeyal bike da hinavên xwendevanê xwe bilivîne.

Di helbesta TARÎXA ŞÊX SEIDÊ REHMETÎ de helbestvan bi tarîxa sala şoreşê dest pê dike û bi dîroka koçî/hicrî. Lê dema sala koçî ku wî dest pê kiriye 1344 bi ya zayî re didin ber hev em dibînin ku Cegerxwîn di hesabê xwe de şaş bûye,

çiku bûyerên şoreşê di Şibat, Avdar û Nîsana 1925an de li dar ketine û ew himberî mehên Receb, Şaban û Remezana 1343an e, ta roja darvekirina wî di 30 Hezîranê 1925an de dikeve 8 Zulhiccê 1343an de. Heger em vê bidin alîkî, em ê bibînin ku Cegerxwîn ne ji valabûnekê tarîxa koçî daniye, tevî ku armanca şoreşê, serokatî, qurbanî, cugrafiya wê û ta tawanbariyê di dadgehê de lê bûn kurdî bûn, lê dimîne yên ku serokatiya wê dikirin oldar bûn.

Ev nîşaneke Cegerxwîn di destpêkê de diyar dike asta bandora ola islamê li civaka kurdî û asta bandora şêx û melan li xelkê civaka kurdî. Dibe jî ku helbestvan dixwaze bibêje ku şoreş ne bi wê serokatiyê ba wê ne bi wê hêzê bana û nekarîba li wê cugrafya fereh ji Kurdistanê belav bibe. Lewra em dibînin ku ew pesnê Şêx Seîd dide û wî bi Xixro şahê Îranê dişibîne da payecihê wî di civaka wî de zelal bike û bi qehremanê efsaneyî Restem dişibîne da xwendevan bighêje wêneyê mêrxasiya wî.

Helbestvan kûrbûna delaletên van herdu kesayetiyên di nav millet de, hêz û sawa wan, rikberî û mêrxasiyan wan xwe nas dike û Şêx Seîd ne kêmi wan e; wî serî li ber dijmin rakir û bê tirs û saw şoreşa xwe li dar xist û karîbû herêmin berfereh di bin destên xwe ke, tev di hersê mehên Buharê de û pîrr leşkerên tirk dîl kirin, weha jî lîderên wan di pîrr herêman de. Hikûmeta tirkî xiste qelaqê ta ku kirin qarîn û hawar da vê şoreşê vemrînin; ev şoreşa ku agrê wê li Kurdistanê bi tevayî belav bû:

*Sala hezar û sêsed, hem çil û çarê hicrî*

*Rabû ji nav me kurda paşayê textê Xusro*

*Ew Rustemê zemanê , Behramê milk û dewlet*

*Sê çar mehên buharê Tirkan digel wî şer bû*

*Çend qaymeqam û walî girtin di wê buharê*

*Tirka dikirne gazî aman ji destê kurdo*<sup>625</sup>

Helbestvan mêrxasî û canfidaya kurdan di vê şoreşê de dide, Zaza mîna pilingan di şer sivik bûn xwe digirtin ser dijmin, bi wan şekên xwe yên hasan; şûr, dar û gopalan, bi qîrîn û halan êrîş dikirin, sûnd xwarin ku ta serkeftinê ew bi şoreşê re bin. Dengê tang û topan ji alîkî û halana şoreşgeran ji alîkî, xwîn ji piraniya qurbaniyan mîna çeman, bi

<sup>625</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 26.

xumxum diherikî:

*Zaza wekî pilngan bi dar û şûr û gopal  
Berê xwe dane Tirkan gazî kirin ero- ro*

*Bi sûnd û soz û peyman , rabûn digel vî şahî  
Bi deng û qîr û halan êrîş dibine Tirko*

*Dengê tifing û topan giha semayê banî  
Xwîn bû rewan ji xortan Zab û Ferat û Co co<sup>626</sup>*

Ew kesên ku xayintî bi şoreşê re kirin û bûn sedema têkçûna wê, helbestvan wan ji bîr nake, wan bi bergîl/qantiran dişibîne. Em dizanin ku qantir bê esl e; diya wî mehîn e, bavê wê ker e. Ew ji bo siwarbûnê û guhestina baran bi kar tên. Lewra ew xayin jî eslê wan ne zelal e û ew alavek in di dest dijmin de, ji bo armancên dijmin kar dikin, mîna Qaso yê ku destê wî di radestkirina Şêx Seîd de hebû ku dijmin ew girtin. Kurd bi çekên xwe yê sivik û arteşa tirk bi tenk û topên xwe, ji aliyê hêzên xwe ve nayên berhevkirin û ew jî yek ji sedemên têkçûna şoreşê bû û binçavkirina serokatiya wê û darvekirina wan bû. Ne tenê wilo, lê li axe û şêxên kurdan jî geriyan, ew girtin û bê rehm û şefeqe yan ew kuştin, yan darvekirin. Ev wesifkirin mîna bûye hatiye nivîsandin, çiku piştî vê şoreşê tundî li dijî kurdan zêde bû. Dibêje:

*Hindek ji kurdê nazan xayin dibûn di dil de  
Bergîl û bed û sersem , meşhûre navê Qaso*

*Rabûn li ber vî şahî wek pilingan diçûn hev  
Tirkê me bûye dewlet , wek dewleta Helako*

*Wan şêx Se'îd efendî girtin di cejne rojî  
Gelek mezin digel wî xistin şerîte , yaro*

---

<sup>626</sup> - h.b., h.r.

***Mela û şêx û begler kuştin serê di wana  
Li ber tîfîng û topan manendî gog û kaşo<sup>627</sup>***

Helbestvan xwest di helbesta xwe de riyalist be, riyalistî di helbestê de ewe ku ketwar weke heye birisimîne, mîna çavê kamera û bi zimanekî nêzîkî xelkê ku zû bê fêmkirin û Cegerxwîn di vê helbestê de weha bû, tevî ku carna bandora xwe li ciwaniya helbestê dikir, lê helbestvan ha ji xwe hebû da helbest huneriya xwe ji dest bernede, rewşa kurdan piştî têkçûna şoreşê bi vî hawî berçav dike: jinan por kur kirin, kezî qusandin li ser ezîzên ber dilê xwe, keçên ciwan gazî xweda dikin ku di sêwîtiya wan de, hejariya wan de alfkariya wan bike, ji ber ku ji xweda pê ve kes nikare wan xelas bike. Weha helbestvan ew bobelat û qurbaniyên mezin ku ji bo welat hatin danîn berçav kir:

***Pîr û ciwan û bûkan biskên di reş qusandin***

***Wan şeng û şoxeqamet, ebrû hilal û rûro***

***Gazî dikirne Yezdan, ya reb xwedo tu zanî***

***Em mane jar û mehrûm , bê mal û mêr û zaro***

***Sed şah û begler û mîr, kuştin ji me neyara***

***Namûs nema bi carek, bo şêxekanê bedgo<sup>628</sup>***

Dijwariya bûyerên ku bi hovîtî û berberî bi serê kurdan kirin, ku hemû tuxm û bendên millet ketin bin, hişt ku baweriya helbestvan bi çi kesê tirk bişke, ta ew bi pîvazê şibandin; çi sor be çi sipî be her ew bihn û ew helese, helbestvan ne di wê baweriyê de ye ku wê rojekê bibîne yekî tirk li kêleka doza wî raweste. Ev rexneke ji wan tirkan re ewên ku bêdeng li hemberî van cerîmeyan rawestiyan, mîna korên tişt nedîtî û kerrên tişt nebihîstî; yan na çawa karîbûn himberî van komkujiyên ku rêjîmên wan pê radibin bêdeng bimînin.

Weha jî gotina Şêx Seîd li ber werîsê sêdarê tîne ber çavê xwe, çawa çavê wî ne kutkutîn û dengê wî bilind ma xayintî pê re nekir: bi dengê bilind got: Çi kurdê di vê şoreşê de û di ber de jiyana xwe ji dest dane ew şehîdin û ew ne poşmane ku bi vî

---

<sup>627</sup> - h.b., h.r.

<sup>628</sup> - h.b.,h.r.

karî rabûye, ji ber xebata wan di ber heqiyê de ye û teqeze kir ku wê ev rê berdewam be ta bighên heqê xwe. Wê canê Şêx Seîd rehet bibe roja ku neviyên wî yên xebatkar herin ser gora wî mizgîniyê bidnê ku dijmin ji welêt derket û xwîna wî û hemû şehîdan vala û berhewa ne çû.

Helbestvan pir li ber wan şehîdan dikeve û li ber wanên zindî man û qurbanî pîr danîn, bi hêsrên xwînê li ser wan digrî, bi xurtbûna ava Zap û Diclê:

*Pîvaz çî sor û gewre, tev tûj û noye herdem*

*Tirko çî dost û dijmin, dijwar û tal û her no*

*Min dî yekî ciwanmêr, ku ev xeber me guhkir*

*Yanî Se'îdê kurdî ev gotina ku tê go*

*Go :Em heçî we kuştin tev bûn şehîd û gazî*

*Herdem ji bonî kurda ta heşrê em di'ago*

*Saxê me dê li şer bin, herdem digel we Tirkan*

*Hetta ku bêne ser min, bê rabe Tirko rabû*

*Wel-lahî bûm Cegerxwîn, derdê min pir giran e*

*Ji herdu çavê min xwîn, wek Zab û Dicle der bû.*<sup>629</sup>

Di helbesteke din de bi navê DE BIGRÎ LI SER TAC Ê SERA helbestvan Şêx Seîd tîne ber çav û roja sêdarkirina wî û hevalên wî di bîra xwe tîne, dilê wî ji kovana tije dibe, şîn xwe berdide hinavan, kul û derd li derdorê kom dibin, ta ku êş digre serê wî û nema tiştêkî ji hev derdixe; tîne ber çavên wî ew sêdarên hê lidarxistî, laşên daleqyayî, tac û kumên kurdî li erdê avêtî, her tişt li derdorê êş û azaran berçav dikin. Helbestvan berê xwe dide dilê xwe û jê dixwaze here li keviya çemê Dicle rûnê û hûr di welatê kurdan de bifikire, here Amedê ku hê ew sêdar li wir in, ew mêrxas bibîr tîne, ew kesên ku serê xwe li ber dijmin danexistin û koletî qebûl nekirin.

Helbestvan dixwaze diyar bike ku helbest bîrdank e û divê ew tiştên tê de bê

---

<sup>629</sup> - h.b., r. 26-27.

tirs û bê hesab derkevin, awayên derketina wan jî hene; çibi gotinê û çî bi wan hest û coşên ku bi ser hev de kom bûne ûhelbest neynika ketwar e/ jîngê ye, bi êş û azarên wê ve, lê bi zimanekî taybet û bi gelek xeyal da balkêşiyekê biafirîne û ciwaniyeke bi can xweş bê. Cegerxwîn ev yek pêk anî dema dilê xwe mîna jîndarekî danî himberî xwe û diyalog pê re kir, jê dixwaze ku destmalkê derxe û hêsirên xwe paqij bike, ew hêsirên ku bi bîranîna Şêx Seîd re weke baranê hatin xwar, weha jî jê dixwaze ku dengê Axtî guhdarî bike dema dibake: Bijî Kurdistan.

***Ey dil li qeraxê çemê Amed rûne sergerdan;  
Rind çavên xwe veke, temaşa ke welatê kurdan***

***Li bajarê Amed çikandine çend sêpî  
Bi wan ve daleqandî ne cindiyê zazan***

***Li alîkî tac û teylesan bê xwedî ne  
Li alîkî kolosên kevej ketine bin ligan***

***Ji bêrika xwe destmalekê derxe û çavên xwe  
Paqij ke , ji wan hêstirên xwe wek tav û baran***

***Destên xwe li ber guhê xwe deyne û guh bidêre  
Li dengê Axtî ku dibêjî her bijî Kurdistan<sup>630</sup>***

Na, lê ew ji dilê xwe dixwaze ku bihtir bigrî ta dengê wî bighêje Amedê tevî, heye ku dawiya kul û derdan zanibe. Ne tenê li ser Amedê bigrî lê belê li ser bajarin din mîna Dêrsim, Sasûn û Agrî; ew bajarên ku bobelat bi serê wan de hat û qurbanî ji bo azadiyê dan, ew bajarên ku navê wan ket dîrokê weke bajarên xebat û berxwedanê, bajarên li dû doza azadiyê diçûn.. weha jî Tor û Bext û Berzan dilgiranin, bi êş û kulan hatine pêçan.. Hemrîn û Şingal hê di bin nîrê koletiyê de ne.. Sefîn û Girdê Seywan reş girêdane, ew war tev mîna Amed in, yan ew bi xwe Amed e û ew sexlet tev tê de civyane, ew wesifkirina wan cih û waran ji Kurdistanê:

***De bigirî bi dengê xwe ê zîz tim bike gazî  
Ey Amed, ta kengê bijî tu bi van kul û derdan***

<sup>630</sup> - h.b, r. 33.

*Wek te xwînxwarin, Agirî û Dêrsim û Sasûn tev*

*Wek te diljarin, Tor û Bext û Berzan*

*Wek te blindest in çiyayên Şingal û Hemrîn*

*Wek te reş girêdaye Sefîn û Girdê Seywan*<sup>631</sup>

Di vê helbestê de ciwaniya wêneya helbestî dighe asteke bilind û bi taybetî di malikên dawî de, wesyeta helbestvan e ku dixwaze wan piştî mirina wî pêk bînin. Li vir bi hostayî dîrokê dixê bin siya berjewendiya helbestê, helbestê dike disteke/niqriyeke mezin û dîrokê û ketwar tê de dighîne hev, wan li nav hev dixîne ta bandoreke wê cadobazî li xwendevan pêyde dibe. Helbestvan rewşa xwe ya xerab ji ber êşa welêt diyar dike û dibêje ku ew binexweşiyêke zor ketiye ku derman jê re tune, ew bê tirs û bê saw kara xwe û mirinê dike, çiku jan ji viyana helbestvan xurttir in, lewra ew dixwaze ku çaxa bimre darbesta wî ji darên wan sêpiyan be, tabûta wî ji textê dergehê zindanan be çikû bihna wan tekoşer û xebatkaran jê tê, lê kefenê/qerqerê wî ji wan paçik û cawên ku şehîd bi nixumandibûn û berî tevî wî bi ava Dicle ya Amedê bişon û li şûna gulavê hêsirên wan bûk û zeryan lê bireşînin. Heger kovar û rojname li ser ne giryan besî wî ye ku ew kesên dilpak û hejar li ser bigrîn û wê her kes bêje: Sed xwezî bi dilê Cegerxwîn ku bûye mêvanê wan şehîdan li Amedê di goristana wan de hatiye veşartin.

Li vir ew peywendiya germ di navbera helbestvan û bûyera dîrokê de bicih dibe, lê belê helbestvan dibe parçek ji bûyera dîrokê û nikare himberî van bûyerên bi ser welat de tîr bêalî raweste, ji ber ew xwe wek zimanê milletê xwe û barhilgirê doza wî dibêbe:

*Ax birano, ez nexweş im , nexweşê welatê xwe*

*Derdê min jana zirav e, serxwebûn derman*

*Ezê bimrim bi vê êşê her eve daxwaza min*

*Teneşoyê min çêkin ji textê ber derê zindan*

---

<sup>631</sup> - h.b., h.r.



*Darbesta min çêkin ji darên sêpiyên Amed hem  
Qerqerê min çêkin ji teylesan û şal û şedan*

*Dixwîm min bişon bi ava Dicleyê Amed hem  
Ji ber gulavê li min bireşînî hêstirên keç û bûkan*

*Eger li min negrîn kovar û rojname û tarîx  
Bila li ser min bigrîn çend Dilşah û Perîşan*

*Ma kê wê nebêjê sed xwezî me bi dilê Cegerxwîn  
Ku ez li goristana Amedê carek bibim mêvan.*<sup>632</sup>

Heger Cegerxwîn zanîbû bûyerên dîrokî bi şeweyekî realismî pêk bîne, wî karîbû isbat bike ku dikare wan bûyerên dîrokî bi şeweyê sembolumî bi teknîk û ciwanîyeke ne kêmkî şeweyê realismî bikar bîne û bi zelalî di helbesta SERXWEBÛNA MİRÎŞKA de diyar bû. Helbest ji serî ta dawî dişibe çîvanokeke qehremanên wê teyrik û tilûr in, lê her teyrikek mînakê wî di jîngehê de heye. Ev şewenivîs şewenivîsa Kelîle û Dimne tîne bîra me, ew şewenivîsa ku di serdema zordarî û terorizmê de rûda û di vî şeweyî de nivîskaran wek pencereyekê ji afirandinên xwe re dîtî, da zilm û zora li ser millet li ser zimanê lawiran bêjin, da karibin ji ceza û dadgekirinê birevin, çikû rasterast bêjî, wê dawîya wan girtin, lêdan û kuştin be, lewra pîraniya helbestvan û nivîskaran berê dan vê şewenivîsê.

Di helbesta SERXWEBÛNA MİRÎŞKA Serxwerabûna mirîşka de yê xwendevan bi hesanî nagihê mebesta Cegerxwîn ji vê çîroka helbestî ya ku li ser bûyerên serhildana tilûrên kedî hatiye ku doza mafên xwe dikin, bi awakî tinazî komîdî, ku di destpêkê de xuyaye ku armanc jê tenê ken e, yan jî hew ji bo ibretgirtinê be, mîna wan çîrokên ku bapîr û dapîrên me digotin, lê dema me rov kûr di xwendina deq de diçe babetin din berçav dibin û her teyrikek çî nîşan dike, nemaze dema cihê serhildanê dibêje (Xerza). Weha jî ew koma bûyerên ku di çîrokê de tîne çîrûskin lehengên rasteqînî, di demeke rastî di erdnîgariyeke rastî de diyar didin. Heger cih herêma Xerza be, naxwe ji şoreşa Şêx Seîd pêve tune, bûyerên

---

<sup>632</sup> - h.b., h.r.

helbestê heman bûyerên şoreşê ne; mirîşk gewreya milletê Kurd e ku di xew de maye, dîk/keleşêr axa û serokên kurdan in, lê dîkê yekem ew Şêx Seîd e, yê ku hat bi wan rûnişt, hestê neteweyî bi wan re hişyar kirin û ji wan xwest rêxistina xwe ava bikin:

*Li welatê me Xerza*

*Dîkek hebû şehreza*

*Rokê ew çû nav dîka*

*Ji wan re go hêdîka:*

*Rabin bêjin mirîşkan*

*Bes xwe bidin enîşkan*

*Dîk û mirîşk bûne kom*

*Berê xwe dane cem bûm*

*Leşker tev de bûne lek*

*Hin çeleng û hin kulek*

*Berê xwe dane çolê*

*Tevlî koç û tev êlê<sup>633</sup>*

Hêdî hêdî ew mamik ji hev vedibin, dema dîkê din tê, ew Xalid begê Cibrî ye, bûm/kund serokê Tîkiyê; Kemal Atatürk e, teyrê baz Ismet Înonu bi xwe ye û hudhud Fewzî Çeqmaq e. Her teyrikek amaje û delaletên wî hene, mirîşk nîşana serdanîn û radestiyê ne, dîk nîşana serkêşî, jêhatbûn û çalakiyê ye, bûm du destnîşanên dijraber hildigre; ji alîkî ve bêqudoşî ye û nîşana wêranî û xerakirinê ye û ji alîkî nîşana zanîn û pendiyariyê ye, dema em bûmê helbestê û Atatürk didin ber hev em dibînin ku herdu nîşanan hildigre; ew ji kurdan re bêqudoşî bû warê wanwêran kir û ji Tirkiyê re pendiyar bû karîbû piştî têkçûna Impiratoriya Osmanî Tirkyê wek dewlet vegeîne meydana.

Teyrê baz ewê ku fersende ji dest xwe bernede û li bayê firê nêçîra xwe digre, Înonu jî weha bû ji serokerkan çû serokwezîr ta giha serokkomar û hudhud/silêmanê

---

<sup>633</sup>-h.b., r. 47.

du nikil, ew berdevkê Silêman pêxember bû û imbaraz û sirên wî bû, dikare zû xwe veşêre, ev F. Çeqmaq bû ku ji sala 1924an ta 1944an ma serokhêzê leşkerê arteşa tirkî. Destê Etaturk ku pê li hundir û derve jî dixist. Weha helbestvan ew kesayetî di van tilûran de gewde kirin. Dibêje:

*Bûm kenî û gote wan;*

*Ba kin bazê pehlewana*

*Hudhud rabû serefraz*

*Wî çû bi lez gote baz:*

*Go rabe ey tu bazî*

*Şeh îro te dixwazî*

*Baz çû cem şeh li banî*

*Destê xwe l'ser hev danî*

*Go ey xwendekarê min*

*Zû li min ke barê min*

*Bûm gote bazê xwînaxwar*

*Bi lez rabe here xwar<sup>634</sup>*

Ev helbesta di nav destê me de li ser diyalogin kurt di nav wan serkêşan de hatiye avakirin û çawa wê pilanan ji bo têkbirina serhildêr û berxwederan deynin, ta dawî wan têk dibin û belawela dikin û pir tundûtûjîyê/ şiddetê piştî şoreşê bikar tînin.

*Ê ku kuştin ê ku man*

*Hatî gundan bê goman*

*Wan jî weke me kurdan*

*Destê xwe j' ber xwe berdan*

*Elok û tûtik û qaz*

*Tev de bûne belengaz*

---

<sup>634</sup> - h.b., r. 47-48.

*Tev de ketin koxê reş*

*Çîroka me ji were xweş.*<sup>635</sup>

Di helbesta "Çûna qunsilxana tirk gunehkariye begem" a ku diyaloge di nav helbestvan û begekî Kurd de, loman ji wan dike, ewên ku çûne qunsilxana tirk û ne tenê dibîne ku kêmasiyeke ji kesayetiya kurdî re, lê belê dibîne ku gunehkariyeke nayê beşandin. Heşkere û yekser berê xwe didê û dibêje: Çawa we destên xwe dan wan destên ku Axtî û Şêx Seîd û bi sedan mêrxas û zanyarên mîna wan kuştin û bidar vekirin?! Ew destên ku di xwîna tekoşer, xebatkar û zanyarên kurd de ye! Û wî bi rêberê kor pesin dide:

<i>We qunsil nedî ?</i>	<i>Ha ! qunsilê Tirk .</i>
<i>Belê li we kir</i>	<i>Wî xelat û kurk</i>
<i>Destê xwe da we</i>	<i>Ew destê gemar</i>
<i>Destê ku Extî</i>	<i>Hildaye ser dar</i>
<i>Ew destê ku kuşt</i>	<i>Sed wek şêx Se'îd</i>
<i>Zana û gernas</i>	<i>Mêrxas û egîd</i>
<i>Destê bi xwîna</i>	<i>Kurdan bûye sor</i>
<i>Çawa te hejand</i>	<i>Hey rêberê kor</i> <sup>636</sup>

Asta payecihê Şêx Seîd di helbesta "Şehnama şehîdan" de xweş diyar dibe, ewa ku tê de navê bihtirî çil û yek şehîdî ji şehîdên Kurdistanê aniye. Gazî wan dike û rewşa welêt ji wan re dibêje. Hêviyeke wî heye ku ew şehîd vejîn da bi çavê xwe rewşa ku welat gihayê bibînin û ji aliyekî ve jî xwe bi wan serbilind dibîne û pesnê mêrxasî û merdbûna wan di danê dide. Li vir dîsa dîrokê û helbestê dike yek hevîr û bi hev re wan distirê, lê erka helbestê jibîr nake ku karê wê ewe ku bûyera dîrokî kurt bike û bi zimanekî zelal ji xwendevan re pêşkêş bike û bi rewanbêjiyeke ciwan.

Di vir de helbestvan piran di navbera wan şehîdan û neviyên wan de ava dike, da derbasbin û riya xebat û tekoşînê berdewam bikin. Helbestvan jibîr nake ku pesnê welatê xwe bide, da ew jî bibe hanedanek ji xebatê re; xebata bo azadkirin û rizgarkirina wî. Taybetmendiya Şêx Seîd di vir de ewe ku helbestvan sê malik jê re

<sup>635</sup> - h.b., r. 49 .

<sup>636</sup> - Cegerxwîn, *Sewra azadî*, r. 38.

terxandine, lê yên din her yek du malik, ev nîşaneke li ser taybetmendiya ku daye Şêx Seîd, jê dixwaze ku rabe ew mêrxase û dikare serkêşiya kurdan di vî nîrî de bike, ji ber niha dem dema xebatê ye û hêviyên helbestvan xurtin ku serkeftin nêzîke. Dibêje:

*Were ey şêx Se'îdê pir minew-wer  
Bes e , rabe tu îro ey dilawer*

*Zemanê te ne ew çax e tu razî  
Bi serbestî tu heqê me bixwazî*

*Belê wextê tîfîng û top û şûr e  
Ezîzê min necata me ne dûr e<sup>637</sup>*

Dema di helbesta CEJNA ŞEHÎDAN de nasnavê Serdarê şehîdan û Şêxê şehîdan didê, qedr û qîmeta Şêx Seîd û cihê wî yê bilind li ba Cegerxwîn zelaltir dibe; ew tê nîşana ciyawaziya Şêx di helbestên Cegerxwîn de, ew dîroka jiyan, xebat û roja şehîdbûna wî berçav dike û di vê helbestê de helbestvan medhê Şêx Seîd dide û wî di pileyeke bilind de ji qedr bi cî dike; ew feyda dilê kurdaye ji der û ji hundir (zahir û batin), ew xetîreke ku pêşiya nîşên nû ronî dike, ewe yê kurdan rizgar bike... lewra helbestvan bi hesrete ku here ser gora wî û amade ye canê xwe di ber wan daxwazên Şêx de bide:

*Ey şêxê ku navdare bi serdarê şehîdan  
Wey feydê dilê milletê kurd batin û zahir*

*Ey pertawê Ilwî û Xiyasî û Silahî  
Wey murşîdê Mihdî û Rehîm, munqizê Tahir*

*Ah, çende bi hesret nezerî merqedî nûrim  
Qurban bi ewî canê bi gernasî fida kir<sup>638</sup>*

Roja şehîdbûna wî rojêke pîroz dihesibîne û dibîne ku gere Kurd wê rojê wek cejn bibînin û bibîr bînin. Helbestvan dibêje ku qeda bi wê jiyane keve ew jiyana ku

<sup>637</sup> - Cegerxwîn, *Pirîsk û Pêtî*, r. 52.

<sup>638</sup> - Cegerxwîn, *Aşitî*, r. 57.

ne bi azadî be û qeda xwedê bi wî kesî keve ewê ku wê qebûl bike. Ji helbestvan re welat ewe jîyan:

*Herkes bi hewadarî welat xwe dikî pîroz  
Ger ser xwe nejn sed tifû ev zêr û cewahir*

*Cejna weye nîsane ser û şêxê şehîdan  
Ev nefheyê rohî me ji feyda we bela kir<sup>639</sup>*

Di helbesteke din de bi navê "Mêrane rabin xortên kurdistan" careke din Cegerxwîn rebenî û hejariya rewşa miletê Kurd berçav dike, pesnê gelê Kurd û lehengiyên wî dide, kar û pêkhatên bapîran bibîr tîne da weke navtêdanekê be ku serî li ber dijmin rakin û nema bi vê koletî û riswayê razî bin, ji bo baweriya xortan bi hêza wan bê. Helbestvan bi navê welat diaxive û bi wan lehengan - Şêx Seîd jî yek ji wan e- û xwîna şehîdan sînd dixwe ku ta ku neyên bi darê zorê wî ji dijmin azad nekin her ewê binale û bi hawar û gazî be. Dema ku helbestvan welat dike jîndarek û diaxive û bi xwîna wan şehîdên xwîna xwe di ber de dane sînd dixwe bi wan lehengên ku jiyana xwe di berxwedana di ber azadkirina wî de terxandine sînd dixwe, wî çaxî em giranbuhaya wê kesayetiya ku welat pê sînd dixwe nasdikin:

*Sonda me xwîna Seî'd û Qazî  
Hetta bi zorê tu min nexwazî  
Ez dê binalim hewar û gazî*

*Namûse rabin xortên Kurdistan  
Dijmin tev girtin ev bax û bustan<sup>640</sup>*

Bi nerîneke hûr tê xuyanî ku Cegerxwîn bi awayekî taybet û bêhempa li şoreşa Şêx Seîd û leheng û bûyerên wê neriye, ta ku hest bi yê xwendevan re peyde dibe ku Şêx Seîd li ba helbestvan gihaye pileya pîroziyê/qedasetê û her dixwaze di kîjan boneya bi welat û qurbanî û şehîdan ve girêdayî be dixwaze wî bîne ziman.

---

<sup>639</sup> - h.b., h.r.

<sup>640</sup> - Cegerxwîn, *Sewra azadî*, r. 11.

### 3.3.2.2. Rengvedana Bûyerên Piştî Şoreşa Şêx Seîdê Pîran:

Qûnaxa piştî şoreşa Şêx Seîd bi bikaranîna tundî/şiddeta zêde dijî kurdan hat naskirin, hin zagon/qanûnên ku çand û zimanê wan qedexe dikin hatin derxistin, ne tenê ew lê belê giha asta ku komkujî li hin cihan der heqa wan de pêk hatin, bersiva kurdî ew bû ku di riya xebata di ber azadiya xwe de berdewam bikin. Pir bûyeran rû dan, lê girintirîn bûyerên ku Cegerxwîn ew bikar anîne evin: Qanûna qedexekirina lixwekirina cilên kurdî, komkujiya Aleqemşê û serhildana Sasûn.

#### 3.3.2.2.1. Rengvedana Qanûna Qedexekirina Lixwekirina Cilên Kurdî:

Ji vê bûyerê re Cegerxwîn helbesteke dirêj terxan kiriye, ew helbesta "Setemkariya dijmin" e ku tê de ew şofnîzam beloq di naveroka qanûnê de berz dike û wêneyê diktatoriya rêjîmê û bidestgirtina biryaran bi destê xwe tenê dide xuyanî, ne ev tenê, lê belê hilanîna taybetmendiyên ilet û gelên din û derbaskirina di kovika "Yek millet, yek dewlet, yek ziman" re derbaskin û wan bihelînin û logik/mentiq û ûjdanê mirov û ol van tiştan qebûl nakin.

Ev helbest desthilata rebeq/bêhempa berçav dike, ewa ku bi agir û hesin hukum dike û dixwaze bibe mîna belgeyekê ji vê qanûnê re û ziyarên ku gihandin milletê kurd. Helbestvan li vir dikeve kêferatekê bi xwe re; ewê dîroknûs yan helbestvan be, yan wê karibe bi herduwan rabe; wê dîroknûs be ku bûyerên belge bike, yan bi karê helbestvan rabe ku her ew li baştir digere.

Helbest bi qanûna ku Ataturk derxistiye ku lixwekirina cilên kurdî qedexene dest pê dike:

*Kemal danîn çend qanûn*

*Kincê kurmancî rabûn*

*Heçî pêre bikî rik*

*Wê singiwan bixin zik.*

*Nema kum dan serê xwe*

*Li xwe nakin kesexe*

*Derpê,kiras,winda bûn*

*Ferman li tevan rabûn*<sup>641</sup>

Helbestvan bi awakî nazik û tinazî û bi çîrokbêjiyeke dilxweşker nêzîkî komîdya reş haleta yê lişker berçav dike dema zixêfan dike gundiyê bi navê Şeref û zirtan lê dike, Şeref ê ku ji tirsî kumê xwe davêje erdê û ne tenê dide mendelê ku yê wî ye, lê belê dixê hevalê xwe û tevî wî jî di tirsî xwe derket û lêxistin ji leşker xwar û perê pê re jî jê stendin. Dema em pêvajoya helbestê dişopînin em jêhatbûna Cegerxwîn di bikaranîna bûyerên û xistina wê bin siya berjewendiya deqê helbestê de, ta ku bû stiraneke gelêrî ta di govend û dawetan de tê gotin:

*Ev çî kume li ser rê ye ?*

*Ka bibêjin ê kê ye ?*

*Şerefo, kum ê te ye.*

*Ceza li ser te heye.*

*Go:na, ne kumê mine*

*Kum ê hevalê mine*

*Kum ji hevdî perçe kir*

*Destê wî kelemçe kir*

*Bi qamçiya danî lê*

*Bêje:ka ev kumê kê?*

*Çend dar pêre kişandin*

*Pênc kaxet jê sitandin*

*Li nav xelkê bû çîrok*

*Di govendê bû dîrok:*

---

<sup>641</sup> - Cegerxwîn, **Ronak**, r. 41.



*Ev kum ne komê mine*  
*Kumê hevalê mine*<sup>642</sup>

Cegerxwîn vê bûyerên wek fersende dibîne ku di riya wê re siyasetên ku hikûmetê di derheqê kurdan û doza wan de pêk anîne berçav bike û çawa navê gundan guhertin û navê tirkî li wan kirin, li gel naznavên tirkî ku ji her malbatekê re bi zorê danîn da siyaseta tirkîkirinê bi nijadperestîyeke eşkere bi kurdan re bikin, ta giha pileyekê ku ne tenê di saziyên fermî de axaftina bi zimanê kurdî qedexe kirin, lê di jiyana rojanê de jî û xwestin navê wan xera bikin, ew bi çete û rêbirran pesin kirin. Cegerxwîn jî xwest vî wêneyî û bandora neyînî li ser kurdan ji derdorê re veguhêze.

Himberî vê rewşê helbestvan destan di ber xwe re bernade û berevajî, ew teqezê dike ku ev tev îradeya wî û millet kêr nakin û her wê li ser riya cenga azadkirinê de bimeşin, wê pîlanên dijmin ku dixwazin kurdan bihelînin têk bibin. Helbestvan ji xwe bawere û şahidên wî her ji dîrokê ne, ew bi bapîran serbilind e, ewên ku pişkdarî di şaristaniyên kevin di rojhilat de kirine, lewra tirs li ser dîroka wan tune.

*Tirkan dixwest me winda*

*Bikî, li şar û gunda*

*Da bicarek bibin tirk*

*Ne qapût û ne jî kurk*

*Winda nabin em bi dar*

*Ey peyrewê koledar !*

*Em bindstin, serbilind*

*Çi li şar û çi li gund.*

*Em nayêne pişavtin*

*Roj nayête veşartin*

---

<sup>642</sup> - h.b.,r. 41-42.

*Xwedî tarîx, bi ziman*

*Bi nivîst û bi dîwan*<sup>643</sup>

Bi wê pesindanê û xwe serbilind dîtinê Cegerxwîn xwe di ser kesî re nedidît ne wek kesayetî û ne wek millet, lê dixwest vê rastiyê bighîne xwendeva da bibin mînak û navtêdanek ku riya azadiyê bernede. Ligel wê ev helbest li ser du regezan ava bûbû; bûyer û balkêşî, ku taybetiyek xwe stend.

### **3.3.2.2.2. Rengvedana Komkujiya Aleqemşê:**

Di bîranînên xwe de Cegerxwîn li ser vê komkujiya ku bi sedan gundiyên reben qurbanîyên wê bûn disekine û ji ber ku piştî wî bi xwe ji devê pîrekeke ji komkujiyê filitî bihistiye pîrê pê êşîya û ew di du helbestan de bikar anî; PÎRA TORÊ û ALEQEMŞÊ.

Helbesta pêşî diyaloge di nav helbestvan û pêrejînê de, ew pîrejina ku dêm û û bejnûbala wê gelek şîn û azerên dilê wê diyar dikin, qermîçonk ketine rû, rengê sipî xwe berdaye nav por, cilên reş ew kel û heyecana nava wê dide der. Vê dîmenê hişt ku Cegerxwîn li hal û rewşa wê bipirse, ji kû ye, ji ku tê û berê wê bi ku ve ye? Pîrê bi tirs û êş bersiva helbestvan dide ku ew ji ber zilm û zora leşkeran revyaye; leşkerên ku herêma wê wêran kirin û bê rehm xelk bi carekê serjê kirin, bêyî ku bêjin ev zarok e yan mezin e yan jin e; tev dan ber singoyan, ta zarokên ser sênga dê. dema helbestvan dixwaze zanibe ku ew Kurd e? Pîrê tilyên xwe gez dîke û jê dixwaze ku dengê xwe raneke, ev peyv bi xwe ew bû sedema vê wêran û komkujiyê, çikû hê wêneyên wan leşkeran bitiving û singoyan li ber çavên wê ne, çawa xelk kom kirin û agir berdan wan ew şewitandin:

*Hilkişî me çûme jorê herdu rex min bend û rez,*

*Min dî pîrek tê ji Torê ker di ber de tê bi lez*

*Hate nêzîk rojbixêrek da û wek min dil bi xem*

*Pîrebî bû por-sipî bû , taqî-reş bû rû gewez*

---

<sup>643</sup> - h.b., r. 43-44.

*Min ji pîrê xweş dipirsî ey metê tu ji kû ve tê  
Go :Ji Sêrtê diçme Bêrtê , xûniya Romê me ez*

*Xan û eywan kirne wêran mêr û jin ser jêkirin  
Min go:Pîrê qey tu kurdî?çûye tilyên xwe bi gez*

*-Belkî benda rez bi guh bit dengê xwe pir hilmeke  
Pir ditirsim ez ji derbê singûyê Roma teres<sup>644</sup>*

Piştî helbestvan çîroka wê dibihîze dixwaze nerîna beg û axa di van bûyerên gund û herêma wê de qewimîne çiy e? Bersivek hişk û dilêş ji devê pîrê dibihîze: guh nede wan lawê min, ew şivan in û pez dane dest gur. Dîsa dipirse: Ka çi hêvî heye? Kes ji kuştinê xelas bûye ku sibe tola we hilîne? Li vir pîrê tirsaxwe davêje û dibêje ku helbestên te wê rê bidin ber wan, ku herin bixwînin, bi xwendinê wê xelas bin, wê çaxê wê Kurdistan ava bibe:

*Min digot, axa û beg, wê go kurê min guh medê  
Ew şivan in sermiyan in dane gur wan col û pez*

*Min kurek tenha heye ew şandî bajêr medresê  
Wî du sê pirs bo me gotin pê helandin cerg û bez*

*Gotî dayê em dixwînin wek Cegerxwîn gotiye  
Zû bixwînin hev bibînin biçne Kurdistan bi lez.<sup>645</sup>*

Rast Cegerxwîn di vê helbestê de Aleqemşê bi nav nake, lê di bîranînê xwe de dibêje ku bûyera di vî gundî de di navbera 1925-1926an rû daye, bandora xwe bi kûrahî li min kiriye û min ev helbest nivîsandiyê.<sup>646</sup>

Di helbesta ALEQEMŞÊ de Cegerxwîn dixwaze ji helbestvan bêhtir dîroknûs be, helbest wek çîrokeke dîrokî bihtir ji helbestê, hûrekarin hene ku piştî helbestê xûz kirine, barê wê giran kirine û di cihna de helbestê ji rê derdixe, çikû helbestvan

<sup>644</sup> - Cegerxwîn, *Pirîsk û Pêtî*, r. 45.

<sup>645</sup> - h.b., h.r.

<sup>646</sup> - Cegerxwîn, *Jînenîgariya min*, r. 161-162.

tê dighê ku realîzma dîrokî ew e ya ku bihtir bandora xwe di hinavan de dihêle û wan germ dike ku hemû hêza xwe di ber azadiya xwe de bikar bînin. Lewra bi hûrekaran dest pê dike, pesnê gund, li ku dikeve, xwezaya wê û qijleya leşkeran ku lê ye, çawa leşkeran bêbextî li gundiyan kirin, sozên xwe bi wan re birrîn, piştî gundî vegeriyan leşker ew girtin û tiştê nedîtî bi serê wan kirin, lêdan, talan, kuştin û şewitandin û çî rengê hovîtiyê hebû di heqê wan de bikar anîn.

Bi teknîkeke kartêker Cegerxwîn wî generalê ku bi derewan ji gundiyan re sûnd xwar wesif dike, sûnd xwar ku bila gundî vegerin û ji wan ewle bin. Lê piştî hatin wî ferman da ku wan girêdin û piştîre bi dilovanî emrê kuştina wan da û di paş re emir da ku wan laşan bişewitînin, ta ku bihna laşan sînoren gund derbas kir.

*Li gundê Aleqemşê*

*Ew kom kirin li hewşê*

*Mêr bi carek girêdan*

*Bi kindir û bi lêdan*

*Xort û pîr û kal û jar*

*Weke êzing, weke dar*

*Girêdan û dane hev*

*Di dest wan de nema rev*

*Hawîr danîn hûravêj*

*Ew tivingên dev dirêj*

*Serdarê wan emir da*

*Tevan bi hev re berda*

*Hemî ketin li ser ax*

*Bi ser hev de bûn kelax*

*Gaz berdane ser laşa*

*Ji nû dan ber manaşa*

*Hetaku tev bûn arî*  
*Ma kê dikî vî karî ?<sup>647</sup>*

Wesifkirina komkujiyê didomîne, dor tê pîrekan, wî dîmenî jî wesif dike, çawa tevan dixin xaniyekî, derî û penceran digrin û serdar fermanê dide ku agir bi xênî ve deynin û qarîna wan bilind dibû ta tev şewitîn, wan leşkerên ku tayê dawî bi mirovatiyê re qetandin li wan temaşê dikirin ta ku tev bûn komir û xwelî.

Ew pîreka ku bi awayekî seyr ji komkujiyê filitîbû û Cegerxwîn ew li herêma Alyan –Rojhilatî Qamişlo- dît, ew sewesî bûbû, her kes di dil wê de bûbûn dijmin, nexasim yên xerîb. Li gor texmînkirina wê 1434 kes bûn qurban di vê komkujiyê de.

*Jin û bî û pîr û bûk*  
*Keç û xame tev biçûk*

*Bi hevre xistin xênî*  
*Da ku kes wan nebênî*

*Rêsî û xernûf û pûş*  
*Xistin xênî, qereqûş*

*Agir berdan wî xanî*  
*Dixan bilind bû banî*

*Heta ku tev şewitîn*  
*Laşê wan tev peritîn*

*Heçî pêjin jê dihat*  
*Bi singiwan kirin mat<sup>648</sup>*

Helbestvan bi hişkî rojnamevan, media û alavên rageyandinê rexne dike û seyr dimîne çawa karin li himberî komkujiyeke weha de bêdeng bimînin! Weha jî rewşenbîr û çî xwedî wijdanekî zindî. Ji nişkêve dengê helbestvan tê guhertin, mîna ji xilmaşiyekê şiyar bibe û nas dike ku kes alîkarya qelsan nake û nabe dostên wan,

<sup>647</sup> - Cegerxwîn, **Ronak**, r. 83.

<sup>648</sup> - h.b., r. 84.

tev li dostên xurt digerin, lewra ew berê xwe dide miletê xwe û rewşa wî jê re şirove dike û riyên rizgariyê şanî dike, di riya biratiya gelên Kurd û Tirk, du dewlet bèn avakirin; dewleteke kurdî û yeke tirkî, li gel hev bi aştî û hezkirin bi hev re bijîn, da karibin li ser kavîlê Aleqemşê Aleqemşeke nû ava bikin, da bibe bajarekî pîroz, şînê ji bîr bike û bi rengên keskesoran asîman bixemilîne:

*Bibin dostê Rojhilat*

*Hew çêdibin ev şewat*

*Aleqemş bibî pîroz*

*Lê çêbikin gewreqos*

*Gorna kuştîyên wînda*

*Ronî bidî wek fînda*

*Koçê barkin kul û şîn*

*Kes namênî Cigerxwîn.*<sup>649</sup>

Ev helbest bihtir ji her tiştî ew belgeyeke, çî helbestvan bihistibû gotiye, ne xwestiye hevokekê û ta peyveke jê berde, tenê bi zimanê helbestê hûnaye, da ku di pey re ev deq bibe maddeke ji bûyereke re ku hîn di pirtûkê dîrokê ne hatine û xuyaye ku ev armanca helbestvan bû bihtir ji çî armancên din.

### **3.3.2.2.3. Rengvedana Serhildana Sasûnê:**

Bûyerên Sasûn bandora xwe bi xurtî li Cegerxwîn kirin û jê re bûn peynamek, nemaze ew tiştên kesnedî ku piştî serhildanê di heqê xelkê de kirin, piştî ku serî hildan û siyaseta tirkkirinê red kirin<sup>650</sup>, helbestvan di derheqa wan de helbestek bi navê "tiştên kesnedî" nivîsand. Di vir de jî dixwaze ku dîroknûs be bihtir ji ku helbestvan be, dixwaze bûyerên di vî çiyayê pozbilind de bûne belge bike, serhildanê wesif dike û çawa miletê wir ne xwest, n serê xwe deynin, ew siyaseta ku dixwaze wan tune bike qebûl ne kirin û karîbûn ziyaneke mezin bighînin dijmin, ta ku rêjîmê

<sup>649</sup> - h.b., r. 88.

<sup>650</sup> - b.f. li ser bûyerên Sasûnê, bnr. Osman Sebrî, Şerên Sasûnê (1925-1937), amd. Dilawerê Zengî, weş. Pêrî, Istanbul 2005.

hêzên xurt bi ser wan de şandin û hemû desthilatdarî xistin dest wan, lewrawan hemû hovîtiya xwe der kirin; gund û milk şewitandin, mêr, jin, pîr û zarok kuştin, ne tenê wilo, lê belê huner di awayê kuştinê de dikirin, afirandin di şeweyên kuştin û êşkencekirinê de kirin, ji wan awayan çawa mezin û gewreyên wan destgirêdayî davêtin nav ava kelandî ta ku can ji dest didan.

Helbestvan wan bi şagirtên Holako dişibîne, yê ku di cîhanê de bûye mînak ji hovîtiyê re. Ew tev ji bo ku tirsê bixne nava xelkê û dest ji doza xwe berdin û serê xwe ji wan re deynin, lê xelkên Sasûnê ev tişt qebûl ne kirin û bûn nimûne bo xebat û wefadariyê ji welat re, canê xwe bo wî dan bi qurbanî, li gel mal û her tiştê li ber dilê wan şêrîn û buha û dan ber çavên xwe: yan serfiraz bijîn, yan bi rûmet bimirin da nasnama xwe biparêzin:

*Dijmin kete nav welêt*

*Kirin çî tiştên kirêt*

*Jin û zarok dikuştin*

*Xanîk ava ne hiştin*

*Talan kirin bê jîmar*

*Kurdên reben man hejar*

*Dibin destê wan de man*

*Hey hawar û hey eman !*

*Heft mirovên malmezî*

*Kuştin wek berx û bizî*

*Qerwanake çar çembil*

*Kuçik li bin sed û çil*

*Li ser êgir, tijî av*

*Ew dijminê bê zirav*

*Yek,yek xistin nav avê*

*Heta çermê xwe bavê*

*Her heft bi wê ava germ*

*Suhtin heta nema çerm*<sup>651</sup>

Lê xuyaye Cegerxwîn bi encamê geşbîne, yan dixwaze çakbîniyekê bi xwendevanê xwe re peyde bike, da nebêje ku ev bûyerên ku çêbûne tu encamin erênî kurdan qezenc nekirin, lê berevajî vê, helbestvan mizgîniya wê rojê dide, ew roja ku Kurd hesab bi wan kesan re bibînin, ew kesên ku cerîme bi hovîti û bê dilovanî di heqê wan de kirine, lê wê kurd ne weke dijminê xwe hov bin, ewê di dadgeheke dadwer de bêne mehkeme kirin, bi wijdan û sincên mirovatî li gorî zagonan û wê navê mehkemê mehkema gel be, dadwer wê qanûnnas bin, di wê demê de encama mehkemeyê çî be wê helbestvan razî be, lew çiqasî hişk be:

*Ewê ji we bipirsin :*

*Ka we çawa kurd kuştin ?*

*Çavnêrê we ye sêdar*

*Dimrin weke gurên har*

*Dema win bikin qêrîn*

*Xemgîn dibî Cigerxwîn.*<sup>652</sup>

Li vir helbestvan ne tenê bûyerê belge dike, lê belê xwe wekî pêşerojnas jî dide xuyakirin, çiku ew sincên milletê xwe nas dike, ew awayê mehkemê ûşeweyên mehkemekirinê jî dirisimîne. Helbestvan bi ciwanî wêeyên hunerî bikar anîn da dîrok zora huneriya helbestê nebe, lê wî xwest bûyera dîrokî di bin siya wêneya helbestî ke û carna jî xwestiye helbest û zimanê helbestê ji bo wesifkirina ku bi xweşxwiwanê di pirtûkên dîrokê nayên bikar anîne.

### **3.3.2.3. Rengvedana Şoreşa Ararat/Agrî (1927-1930z) û Komkujiya Gelyê**

#### **Zîlan:**

Li Ararat/Agrî şoreşek li dijî hêzên tirkî rabû. Bersiva leşkerî pirr tund bû, bi

<sup>651</sup> - Cegerxwîn, **Ronak**, r. 25-26.

<sup>652</sup> - h.b., r. 27.



şiddet ew vemirandin. Cegerxwîn xwest bûyerên piştî wê ji kuştin, şewat, talan û wêrankirinê belge bike. Helbesta wî ya bi navê HOVÎTIYA DIJMIN, ji sernav bobelata ku bi ser Ararat de hatiye tê ber çavê xwendevan, dijmin hov e, rehm di dil de tune, ji destpêkê de dixwaze ji me re bêje, tiştên ez ji we re dibêjim azar û êş in, wê birînên kûr di hinavê we de bimîne.

Helbestvan li ser şoreşê nasekine, lê tê bûyerên piştî wê, çawa afat weke baranê bi ser kurdan de hatin, leşkerê dijmin xelkên sivîl dorpêç kirin, jin û zarok û mêr, hejmara wan giha 47 hezar kesan, tev dan ber xwe ew ajotin Gelyê Zîlan li herêma Erciş a ku bi wîlayeta Wanê ve girêdayî. Li wir bi hovîtiyeke bê hempa gulle li wan barandin bê ku rehmê li kesî bikin. Di nav wan de keçên ciwan û spehî hebûn, leşker xwestin dest bavêjin namûsa wan, lê wan ne xwestin laşên xwe bispêrin gemara wan leşkeran û xwe di gelî werkirin, mirin xweştir ji wî karî dîtin. Evin sinc û exlaqên jina Kurd ku ta kêlîka dawî ji jiyana xwe paqîjiya xwe û namûsa xwe parastin:

*Piştî şerê Erarat*

*Bi ser kurd de bela hat*

*Zar û zêç û mêr û jin*

*Ketin nav lepê dijmin*

*Dibên çil û heft hezar*

*Hemî reben, tev hejar*

*Ajotin Gelyê Zîlan*

*Hemî dane ber gullan*

*Lê serdaran çil keçik*

*Keç û bûkên pir xweşik*

*Pirê wan bûk û qîzin*

*Da ku bi wan bilîzin*

*Lê xwe avêtin avê*  
*Go:ev pîsî me navê*<sup>653</sup>

Ji helbestê xuyaye ku Cegerxwîn dixwaze çi tiştê li Gelyê Zilan bûye berçav bike, lê dîsa li xwe vedigere û teqeze dike ku gotina wan bûyran û yên mîna wan ku li Dêrsim, Sasûn û li Iraq, Îran û her warên kurdan bûne mîna nimêj û rojîyê bêdawî ne. Helbestvan dixwaze ew zulm û zora li kurdan hatiye ji xwendevan re diyar bike, ew zulm û êşa ku bûne paröek ji jiyana yê kurd, nema wî berdidin. Xuyaye ku mejîyê dijmin bi vê şofînzimê bimîne û parçebûna kurdan wilo bimîne wê rewşa kurdî jî wilo bidomîne.

Helbestvan di rexnekirina rewş û civaka kurdî de berdewam dike, ku ew bi xwe di windabûnekê de maye, hina xwe erzan kirine pîsîtiyê himberî piçik pere dîkin û hin li berjewendiyên xwe yên teng dinerin, weha jî helbestvan şêx û melan û serokêlan bi xurtî rexne dike û wan wek şîrîk bi wan kesan re dibîne ku ew sedema paşketina kurdan û mana wan di bin nîrê koletiyê de.

Cegerxwîn dixwaze ku xweda ruwên wan reş bike û hala wan a ramanî bi goleke genî dişibîne ku ji sedên salan ve tê werbûne û tê de mane, ku li benda roja axretê mane ta Xweda wan ceza bike.. dîn /ol bi awakî şaş fêmkirine û xwe ji nasnama xwe, zimanê xwe û netewa xwe dişon da xwe nêzîkî xweda bikin!!! Helbestvan wan bi dehşikan dişibîne, ewên ku her alîkarî bi dijmin re dikirin. Dibêje:

*Misilman tev bira ne*

*Ji hev re wek çira ne*

*Kîjan bibî padîşah*

*Deynin serê wî kulah*

*Gerdenxwar bin ji bo wî*

*Tev li kar bin ji bo wî*

*Millet çîye, ziman çî ?*

*Bere tazî û birçî*

---

<sup>653</sup> - h.b., r. 20.

*Ser deynin ber nigê wî*

*Em têr bikin zikê wî*

*Ji ber van mirovên dîn*

*Seyda bûye Cigerxwîn.*<sup>654</sup>

Di vê helbestê de helbestvan xwestiye roniyê bide ser hinek xalan, giringtirîn xal ev in: hovîtiya dijmin a bê mînak ku di vemirandina şoreşê de bikar anîn, hejmara qurbaniyan a mezin, dawpakiya jina kurd, parçebûna ku kurd dijîn, xweberdana civakî û serketina ramanên paşketî ku di riya pêşketina doza kurdî de bûn kelem.

#### **3.3.2.4. Rengvedana Kesayetiya Qazî Mihemed û Komara Mehabad:**

Cegerxwîn rola kesayetiya dîrokî di dewlemenkirina helbestê de nas kir û nas kiri çawa di riya wê re dîrokê û ketwar/jîngehê bide ber hev. Ew kesayetiyan ku wî ew bi kar anîne mîna Qazî Mihemed bûne sembolin netewî ji milletê Kurd re, da li ser riya wan a xebat û qurbaniyê de bigrin, ew dihêle ku wêneyê hunerî dewlemend bibe, gerdûneke din li ber veke, li gel bandora ku mîna van kesayetiyan li xwendevan heye û di wî kêr dike, nexasim di civakên ku bi hestên xwe bihtir ji hişê xwe difikirin de.

Kesayetiya Qazî Mihemed giringiyeke mezin li ba helbestvan stendiye, ne kêmtir ji ya Şêx Seîd. Vaye bi qudsiyet lê dimeyîne dema wî vedixwaze di helbesta xwe ya bi navê MÊRNE RABIN XORTÊN KURDISTAN<sup>655</sup> de, bi wî sûnd dixwe bi Şêx Seîd re û yê ku guhdanê bi dîroka kurdî dike seyr namîne ji vê sûndê, çiku cih û qedrê Qazî li cem xelkê nas dike; ewî Komara Mehabad ragihand û bi hemû şîyanên xwe li hemberî hêza dijmin û ceberûtê wî sekinî, wî xaka welat berneda û xwe kir qurban da ku ziyan li millet nebe û welat wêran nebe. Wî Mehabad damezrand û ta kêlîka dawî ji jiyana xwe ew parast.

Di helbesta EV ÇI MISILMANÎ YE de<sup>656</sup>, Cegerxwîn berevaniyê di ber

<sup>654</sup> - h.b., r. 23-24.

<sup>655</sup> - Cegerxwîn, *Sewra azadî*, r. 11.

<sup>656</sup> - h.b., r. 164.

taybetmendiya Kurd de dike wek miletê serbixwe; ew ne ereb, tirk û faris in û rexna misilmanan dike li ser helwestên wan ji doza kurdî û wan cengên ku kurdan zora xurttirîn hêz birin û xwe serbilind dibîne ku ew bapîrên wî ne, ji eyyûbiyan ta dîroka nûjen û serdem û bi taybetî pêkhatên kurdan di Mehabad de ew cihê serbilindiyeke taybet li cem helbestvan û li cem miletê kurd bi tevayî.

Di helbesta BERSIVA NAYIFÊ HESO de xuyaye ku ew bersiva helbestvanê kurd Nayifê Heso ye, yê bi navê Seydayê Tîrêj<sup>657</sup> tê naskirin, Cegerxwîn teqezê dike ku xewnên wî û yên Tîrêj di daxwaza xebatê de di yek cokê re diherikin, ji ber ku tenê bi xebatê wê Kurd bighin armancên xwe. Cegerxwîn teqezê dike ku Mehabad kêlîka avakirina xewna kurdî bû, ev komara ku tirk û ereb û faris tirsandin, ewên ku xêra kurdan naxwazin, ji ber ku ew xêrûbêrên wan tevan dixwin û ti rê tune ku kurd ji bin nîrê wan derkevin, ji bilî yekîti û serhildanê:

*Bayê meyê xurt û gur*

*Ji Mehabad destpê kir*

*Va xuya ye wî bayî*

*Asman ji me kir sayî*

*Turk û Iraq û Îran*

*Tirsa me ket dilê wan*<sup>658</sup>

Di helbesta şîna wî de helbestvan Qazî Mihemed bi serbilindî û giranbuhayeke mezintir vedixwaze, ewî regekî taybet da helbesta xwe ya bi navê DI BÎRANÎNA QADÎ MIHEMED û peyvin himkûfî mijarê bin, lewra helbest ji malka pêşî ta dawî bihna xebat û pêdariyê jê difûre û ji malka pêşî ve dixwaze wijdanê xwendevan hişyar bike û di hevoka yekem de –Xakî Kurdistan-. Xak wek em zanin koka insan e weke tê bawerkirin û gewdeyê wî piştî mirinê lê vedigere, lewra pîroziyeke wê di wijdanê gelêrî de peyde dibe.

Vêca ku ew xak xaka welêt be ku ew pîroztirîn xak e li ba mirov û kurd jî

<sup>657</sup> Seydayê Tîrêj helbestvanekî navdar e, xwedî roleke mezin di pêşketina ziman û wêje ya kurdî de. b.f. bnr. Feqî Huseyn Sağniç, **Dîroka wêjeya Kurdî**, weş. Enstîtuyan Kurdî ya Stenbolê, Istanbul 2002, r. 615-620.

<sup>658</sup> - Cegerxwîn, **Kîme ez**, r. 104.

amaje û destnîşanin kûr di xaka welatê xwe de dibînin. Di helbestê de xuyanî dibe weke ku helbestvan loman ji welat dike ji ber ku tevî evqase qurbanî hê jî ew dixwaze, tevî ku bihustek jê nemaye ku bi xwîna şehîdan nehatiye avdan, ew qurbanî hemû û hê welat qurbaniyan bo azadiya xwe dixwaze û ji bo neyê xuyanîkirin ku ev bêhêvîbûn û destdiberxweberdane, helbestvan bi navê zarwên wî –Kurdan- soz dide ku ew qet nemerdiyê di qurbaniyan de nakin, lew çiqas welat bixwaze û ew li ser wê sozê ne ku li ser riya xebatê bimeşin, xwe nedin alî ta nefesa dawî ji jiyana wan:

*Xakî Kurdistan bi qurban pîr ciwan û paqijî*

*Xwîn rijandin pîr kurên te wa li her alî rijî*

*Milletê kurd ta ku saxe ew ji vê rê nagerî*

*Aferî , aferî*

*Qadî Mihemed aferî<sup>659</sup>*

Helbestvan xweş nas dike bê çî bi serê komara Mehabad hat û ne hişt ku bidomîne û çavê xwe ji tiştina girt. Em dibînin ew berê gotna xwe dide Harry S. Truman serokê Amerîka (1945-1953z) yê ku berjewendiyên dewleta wî û berjewendiyên Sovyêt bi serokatiya Josev Stalin (1922-1952z) re gihan hev û piştî xwe dan kurdan û ew weke nêçîrekê ji hêzên leşkerê îranê re hiştin, ji ber idiolojiya xwe ya markisî helbestvan bi hişkî rexneya siyaseta Amerîkî dike û çavê xwe ji Sovyêt digre û ji helwestên Stalin û tiştê di heqê kurdan de kir. Lewra berê xwe dide Truman û ji Stalin diguhere tevî pişkdariya herduwan di têkbirina projeya komara Mehabad de û ji Truman re dibêje ku Kurd di şaristaniyê de gihane asta ku di nav milletên pêşketî de bin.

Ji ber tiştê ku Truman kir ta ku Mehabad tê bîra wî wê helbestvan dijminatîya wî bike û ji ber ku bûyer mezine û xisarên wê pîrrin wê bombeke otonomî nîkaribe wê û bûyer, têkçûn û hêviyên bi soz û hevpeymanan ve girêdayî ji bîrdanka kurdî bide alî û ji alîkî ve jî teqeze dike ku milletê wî li ser riya azadiyê ye û rexnê li demoqratiya Amerîkî dike, li gel ku li sedema tiştên di Kurdistanê de rûdan dipirse:

---

<sup>659</sup> - Cegerxwîn, *Sewra azadî*, r. 181.

*Ev ne şerme têne kuştin em di rêça pêşketin  
Da Tiroman zanibî em xweş nijad û milletin  
Dê bikin em tim bi wî re dijminahî , berberî*

*Aferî , aferî*

*Qadî Mihemed aferî*

*Qembera zerra atomî zereyek nabin ji dil  
Serxwe najî milletê kurd ta ku ev zencîr li mil  
Kes bi lavlav û bi dîlek vî berî nabin serî*

*Aferî , aferî*

*Qadî Mihemed aferî*

*Ey Tiroman kuştina Qadî Mihemed ka çi ye  
Qey edalet tim wisa ye , hukmê dîmuqratî ye  
Lê bi kuştin û bi zindan milltê kurd namirî*

*Aferî , aferî*

*Qadî Mihemed aferî.<sup>660</sup>*

Di dawîya her birgê de helbestvan hevoka "Aferî, aferî Qadî Mihemed aferî" dûbare dike, bi mebesta ku ji xwendevan re bêje ku tiştê ji Qadî Mihemed dihat kir û ew berpirsiyariya têkçûna komarê hilnagre, li gel ku ew dûbarekirin ciwaniyeke hunerî dide helbestê û xwendevan di bin bandora wê de dihêle, li gel ku ritmeke mûzîkê didê ku ciwanî û huneriya wê xweştir bike.

### **3.3.2.5. Rengvedana Siyaseta Erebkirinê û Kişandina Nijadnameyê Ji Kurdan:**

Di helbesta bi navê RÊBERÊ ME SEYDAYÊ XANÎ seydayê Xanî de, Cegerxwîn bi resma nexşa herêmên kurdî li Sûriyê dest pê dike, çarçiwa cugrafiya kurd sînor dike; xweristê wesif dike, navê bajar, bajarok û çeman dibêje, ew weke serjimêreke cugrafiye û belgekirine ji cih û war re û ew di destpêka helbestê de giraniyê dide "Cezîra Sûrî", bajar û bajarokên wê, da di pey re here herêmin din ji

---

<sup>660</sup> - h.b.,h.r.

Kurdistanê. Helbestvan di wan çûn û hatinên xwe de her cih kurdî dibîne û vê carê rexnê li bapîran dike ku wan cugrafya xwe sînor nekirine û dîroka xwe ne nivîsandine weke ku tê xwestin, ji ber wilo ew vê qencyê dide helbestvan Ehmedê Xanî wekî pêşengekî di hoşyariya netewî de. Dibêje:

*Di navbera çemê Ferat û çemê Şet;  
Cizîrek e zirav û dirêj e, yek xet*

*Tev çiya û deşt û dar û kanî  
Kelat û sera û gund û birc û xanî*

*Kaniya ereban Tilebyed û Ras-el-eyn  
Derbasî û Amûd û Qamişlo, Nesîbeyn*

*Tirbe-sipî Dêrûn û Dêrik û Eyndîwer,  
Digel Hesîça bajarên kurd in yekser<sup>661</sup>*

Belavbûna êlan di van herêman de jî jibîr nake, ku navê wan êlan li herêmên cugrafî jî bûne (Beraza, Milla, Kîkan, Deqorî, Pînar Elî, Sinceqî, Aştî, Deşta hesina, Alîyan) û helbestvan van herêman tevan kurdî dibîne, ew Kurdistana pirhejmar e di van êlan de, ew mêrxasin lê bextê wan reş e û li hev nakin û tifaqa wan tune, ji ber wilo ti çarê ji doza xwe re nabînin û dijmin bi xwe jî di van xalên han de wek piştgiriyekê ji xwe re dibîne ku desthilatdarîyê lê bikin:

*Ev tev kurdin û Kurdistan welatê wan  
Lê bê xîret û bindestî tev mane wek bêgan*

*Bêzar û xwendin û tarîx tev bêkes  
Bê ser û ber in , ne wek Çeçan û Çerkes*

*Berg û zar û nav û gonê wan sed reng in  
Li nav xelkê bê nav û nîşan û dengî*

---

<sup>661</sup> - Cegerxwîn, **Pirîsk û Pêtî**, r. 30.

*Her êlek çar hezar mêrin bêgoman*  
*Hemî rênçber û cotar û şivan û gavan*<sup>662</sup>

Cegerxwîn dixwest ku helbestên wî neynikek be ji civaka wî re, her êşên miilet di helbesta xwe de digot û ew mîna pendiyarekî/ hekîmekî pêşeroja welat û civakê zane xwe diyar dikir û şîret li xelkê dikir mîna rêberekî ew dibirin ser riya rast, da Kurd ji vê tarûmariyê xelas bin û diyar dikir û seyr dima çawa evqase êş û azar nikarin wan di riya r, zgariyê de bikin yek!! Gelo kurd li bende çine da bibin xwedî yek armanc, da rewşa xwe nas bikin û karibin bi serbilindî bijîn, ew hewceyî rêberekî ne ku rê şanî wan bike:

*Rojekê bîr nabin ko destên hev bigirin*

*Ji bona welatê xwe serbilind bimirin*

*Çiqasê ew mêr in , hewqasê ew merd in*

*Tev nandar û navdarên nejadê kurd in*

*Ji wan re divê yek hozan û yek pispor*

*Wan bigihînê hev geh bi xwendin û geh zor*<sup>663</sup>

Tevî vê jî helbestvan dizane ku dijminê kurdan ne hindikin û wî bi siyasetên xwe yên cûrbecûr ew gihndine vê rewşê, her siyasetek ji ya din xerabtir û şofînîtir, ji wan siyasetan pirojeya kember/ zinara erebî, ya ku rêjîma ba's xwest ku pê dîmografiya Kurdistan biguhere. Bi dirêjayî Cegerxwîn li ber vî projeyî rawestiya, helbesteke dirêj; 156 malik, li ser singa 14 rûpelan, nivîsandiye, bi navê "Hîzam zinar". Bi van herdu gotinan ku bi yek wateyê ne, helbestvan dixwaze teqeze bike bike ku du alî bi vî projeyî ve girêdayîne; yê kurd ku maf û xak ji dest çû û yê ereb ku bû pişkdar bi rêjîmê re û dest danîn ser erdekî ne erdê wan.

Helbest ne ji yê kurd tenê re ye, lê belê ji wî kesê ereb jî re ye, ewê ku qebûl kir ku bibe destekek di dest rêjîmê de û xêra xaka ku ne xaka wî ye bixwe, ne tenê wilo lê diyare ku ew kêfxweşin ku bûne destek ji ba'siyar re.

---

<sup>662</sup> - h.b.,h.r.

<sup>663</sup> - h.b.,h.r.



Di vê helbestê de helbestvan teqeze dike ku ev tiştê li Cezîrê dibe ne henek in û ne sawêr û xeyal in, ne pîneke yan paçikeke piştgirêdanê ne, lê ew zincîreke ji hesine davên milê erdîngariya kurdan da ku wan ji kok ve rakin. Ev teqezkirineke ji helbestvan ji metirsiya ku ji siyasetê û vî projeyî heye ku wê kurdan sibe pîrr biwestîne.

Bi naskirina kembera erebî ji xwendevan re helbestvan dest pê dike û cugrafiya ku li ser pêk hatiye û armancên vê projeyî çin e, ev şehdebûneke zindî ku helbestvan bi xwe jiyaye û êşa wê kişandiyê, ji nêzîkayî qurbanîyên wê bi çavan dîtine û ziyana razberî û candarî ku li wan bûye, ji bilî aliyê neteweyî. Helbestvan li vir bi karê dîroknûs radibe, pêşî zeman û cih belge dike û wek siyasî vî karî protisto dike û vê siyasetê dihetikîne û wek helbestvan deqê xwe bi peyvin himkûf li gor bûyerê ava kiriye (zinar, zincîr, hesin, hilkirin.....) û helbest bi malikin kurt, terazû û qafiyekirî ava kir, mîna ku bixwaze bibe stranek li ser her devî, da bibe çek bo şerê vê siyasetê û encamên wê pê bibe û bûyer mîna çî bûyera dîrokî bêcan nemîne, her zindî be da xebat di ber hilaîn û bidawîkirina wê berdewam bimîne, lewra helbestvan bi çavekî fereh û nerîneke kûr lê dimeyzîne:

*Ev zinara erebî*

*Ku li cizîrê dibî*

*Ne pişteke çar ta ye*

*Ne benekî bada ye*

*Zincîreke ji hasin*

*Ew tavêjin milê min*

*Da min ji qurm verakin*

*Qada min jî leva kin*

*Kurd nemênin li welêt*

*Hîzam çiqas li me têt*

*Ereb anîn gundê min*

*Min di jmêrin ji dijmin*<sup>664</sup>

Helbestvan xweş di dûrbîniyên ve projeyê digiha û zanîbû ku ew ne di wê kêlîkê de bûye, lê ji zû ve kar jê re bûye û pîlan hatine danîn, ji ber wilo em dibînin ku ne tenê li Cezîrê pêk tê, lê li herêmin din ji Kurdistan dibe, mîna Kerkûk û Şingal û xwediyê proje û yê pêk tîne her ew e; Ba'siyên ku li Şam û Bexda hukum dikin, armanc xuyane ku Kurdistan talan bikin û xêrên wê bixwin çî petrol û çî çandinî û armanca sereke jibîr nake; erebkirina kurdan û bişaftina wan.

Û bi pêxweşkirin helbestvan di avakirina helbesta xwe de didomîne û avakirina wêneyên helbestî ku rewanî û ciwaniyê didinê, lê her aliyê belgekirinê bi ser aliyên din dikeve, helbestvan diçe kêşeke din ku di heqê kurdan de pêk hatiye, ew jî kişandina nijadnameya niştimanî sûrî ji wan ku bi navê biyaniyan/ecanib hatin naskirin û di şev û rojekê de xaka wan ji wan hat stendin û di mala xwe de xerîb man. Helbestvan tabloweke tracîdî, lehengên wê kurd in dirisimîne. Ma gelo ji vê nijadperestiyê û şofîniyê gemartir heye!! Xwendevan wê kula li ser dilê helbestvan nas dike, ku li dadweriya civakî digere, li mafên gelê xwe digere, mîna ku helbestvan kula dilê xwendevanê xwe zane:

*Pêk anîne sal bi sal:*

*Li Kerkûk û li Şengal*

*Basên Bexdad, basên Şam*

*Anîn meydan ev hizam*

*Da petrola min bixwin*

*Bere dijmin biruxwin*

*Em sed hezar bê mikûs*

*Li Cizîrê bê nifûs*<sup>665</sup>

---

<sup>664</sup> - Cegerxwîn, **Ronak**, r. 70.

<sup>665</sup> -h.b., h.r.

Helbestvan bandora xwe bi xurtî li xwendevan dike ta ji nişkê ve xwe dibîne ku bûye parçek ji helbestê, mîna ku ev tiştên helbestvan dibêje tev bi serê wî hatine û ev qûnaxa di nav helbestvan û xwendevan de kurt dike û wan nêzîkî hev dike. Giringiya helbestê li vir diyar dibe ku bi bûyerên dîrokê re ye û belgekirina wan bûyeran, wê tirsê di çavan ku bi pêkanîna proje re peyde bû dirisimîne, çawa kes nema kare serê xwe rake û neçar dibin ku ji gund û bajarên xwe derkevin li karekî digerin ku eborê zarokên xwe bikin, berê xwe dan bajarên mezin û bi taybetî Bêrûtê û ya herî xerab ew e ku nizanin her karî bikin, dimînin heyirî, eva ku êşa wan deh qat dike.

Ji alîkî din ve ew rêjîmên ku bi wekhevîyên bang dikin û karê wan berevajî gotinên wan e, dide xuyanî ku ew derewan dikin, ew dibêjin ku ew dijî koledariyê ne û ew bi xwe koledar in, dixwazin kurdan û çî nîşanên kurdî nehêlin, wan tune bikin û rengê erebî û bayaxa xwe li her tiştî xînin, ta ku encam hilkirina miletekî ji kokê be jî; çandî, siyasî, aborî û şaristanî ji wan re ne xem e. Lê tevî ku ew xwe desthilatdar dibînin helbestvan wan kole dibîne û ev karên wan nîşana nemirovatiya wan e. Dibêje:

*Yek jî dengê xwe nakî*

*Heta newêrî bakî*

*Ji birçîna tîna Bêrût*

*Hemî birçî û pêrût*

*Dixwazin bibne karker*

*Lê heq jî kar nayên der*

*Nakin qêrîn û hawar:*

*Dijmin qada me tev xwar !*

*Ev Erebên şovînî*

*Kurdan millet nabênî*

*Dibêjin em hevparin*

*Dijminê koledarin (!)*

*Lê ew bixwe koledar*

*Li me pêçan ev zinar*

*Divên me bikin Ereb*

*Bimrin bê sûc û sebeb*<sup>666</sup>

Hingî vê karesetê bandora xwe li helbestvan hiştiye, ew bi tinazî û laqerdî ji wan dipirse gelo ev e wekheviya ku hûn pê bang dikin? Û ev çi edalet e? Û ji ber ku helbestvan xwezayê van rêjîmên derewîn nas dike; evên ku gotin bi awakî û karê wan bi awakî din û berevajî ye wan hemû têgehên xweş ku rêjîmên dadwer bi wan bandikin xira kirine (dadwerî, demokratî, wekhevî, mirovatî...) ew bazirganiyê bi wan dikin, ew bi naveroka xwe şofînî û nijadperestî, ji bilî tunekirina xeynî xwe fêhmakin, lewra helbestvan dest di ber xwe bernade û naxwaze xwendevan bêhêvî bibe, ew zirtê xwe dike ku wê roja zordar bê û ew bi gotinê xwe bawer e, çikû jiyane terxan kiriye ku zordestî nadomîne û çiqasî dirêj bike her wê here û Kurd pêdarin û wê bimînin Kurd û siyaseta bişaftina wan ber nagre, wê ew nebin ereb, tirk û faris, taybetmendiya wan heye her wê kar bikin ta roja wan bê:

*Gelo eve wekhevî (!)*

*Wey sed qeda pêkevî !*

*Ne hevparîye, zore*

*Tenê dinya bi dore*

*Roja me jî demek tê*

*Em guh nadin vê xetê*

*Em ne gelek nezanin*

*Em sînorên xwe zanin*<sup>667</sup>

Hevrikiyeke helbestvan wê li dijî rêjîman eşkere dike, teqeze dike ku wê bi ser kievî û ew siyaseta tev wê nikaribin yê kurd ji doza wî vegehrîn, wê şerê xwe di ber rizgarî û azadkirina xwe de bike, wê Kurdistan bimîne welatê kurdan û wê wan

---

<sup>666</sup> - h.b., r. 70-71.

<sup>667</sup> - h.b., r. 71.

rêjîman mehkeme bikin û wê rehmê li wan nekin, wê tola xwe hilînin (dest bi dest û çav bi çav), ew sînorên xwe ji bîr nakin:

*Welatê me Kurdistan*

*Wer namênê kolistan*

*Çav bi çav û dest bi dest*

*Çendan me ev ne dixwest*

*Lê dijminê me pir hov*

*Me nabênin wek mirov*<sup>668</sup>

Ji ber ku helbestvan hovîtiya wan rêjîman nas dike dibîne ku ji bilî di ruwê wan de rawestin ti çare tune, welat welatê helbestvan e û yê bapîrê wî ye û yên ku berevaniyê bikin qehremanên mêrxas in yên ku serê çiyê ji xwe re kirne war, çavdêriya welat dikin û roja bê xwestin wek baz amade ne ku canê xwe di ber de bidin û ya giringtir ku bêgoman wê serkeftinê bi xwe re bîne yekîtiya kurdan e:

*Ev gernasên ser çiyar*

*Eger rabin ser piyan:*

*Zû dest bavêjin tiving*

*Bi gernasî bikin ceng*

*Roja em dest bidin hev*

*Bi dest wa nakevî rev*

*Tenê ew gunehkar in*

*Li ser me koledarin*<sup>669</sup>

Helbestvan di belgekirina bûyerên bi projeyê zinara erebî re rû dan û encamên ku bi awakî neyînî li kurdan dibûn didomîne, ne tenê wilo lê belê bandora xwe li hizr û mejiyê kurdî kirin, dûrbûna kurdî kurdî rû da, ligel nakokiyên birafî, ev tiştên ku helbestvan qet ne dixwestin lê bûn û dijmin vê lîstikê bi kurdan re dilîze û

---

<sup>668</sup> - h.b., h.r.

<sup>669</sup> - h.b., r. 72.

bi zanebûn pê ktîne:

*Çiqas pîs û nezan bûn*

*Li ser me xanedan bûn*

*Em kiribûn gurên har*

*Tev ji hev re bûn neyar*

*Bi xenceran diçûn hev*

*Kuştin hebû, nebû rev*

*Talan û çîr û hawar*

*Dizan malê me tev xwar*<sup>670</sup>

Li gorî nerîna helbestvan wê dijminê kurdan rojekê li ser guneh û tawanbariyên ku kirine hesab bi wan re bê dîtin, ew miletan dijmin nabîne, lê belê dijmin ew rêjîmên desthilatdar in û da bide xuyanî ku ew şer û cengê naxwaze ew ji milletê ereb re dişîne û jê re dibêje ku kurd û ereb bira ne, ne dijminin, lê rêjîm lîstika xwe dikin da miletan ji hev dûr bikin, da karibin bi hesanî desthilatdarî û kargêriya xwe bibin serî. Tevî nakokiyên dinavbera rêjîmên Ba's li Sûriyê û Iraqê, lê tiştên wan dighînin hev hene, mîna desthilatdarî, zordarî, diktatorî û inkarkirina xeynî xwe û her yekî ji wan dixwest ku kurdan bibin aliyê xwe, dixwazin ku di bin destê wan de leşkerekî dilsoz be, tiştê bixwaze û dema bixwaze ji wan re pêk bînin. Lewra dibêje ku ev xapên siyasî ta bi keran jî ew nas kirine û bi ser wan vebûne û her ku dijmin xwe nêzîkî kurdan dike ew nîşana berjewendiyin hemdem in, lewra hişyarî û fêmkirina rûdanan tê xwestin û divê Kurd li pey rewrewkê neçin:

*Emê alî we bikin*

*Bi tirkan re hevrikin*

*Win ji me pir nêzî kin*

*Em karin we xwedî kin*

---

<sup>670</sup> - h.b., r. 73.

***Bibin weke saziman  
Emê çêkin Kurdistan !***

***Lê ev xapên eşkera  
Nakevin serên kera***<sup>671</sup>

Di vê helbestê de Cegerxwîn wesifdaneke xweşik li kurdan, rewşa ku têd dijîn, rêjîmên desthilatdar û danûstendima wan bi kurdan re kiriye û karîbû derbasî ketwara û dîroka kurdî bibe û herduwan bighîne hev da ibretan jê bigrin û pêşerojê çaktir û paktir bê avakirin. Karîbû wêneyê dijmin ji me re veguhêze bê çawa roxsarên kurdan diguherin, siyasetek rêbazkirî bo guhertina demografya Kurdistan bikar tînin, navê der û mirovan diguherin û kar dikin ku rengê erebî bavêjin ser welatê kurdan; ango erebkirina mirov û cih û zeman dixwazin. Ev siyasetên ku Ba'siyên Bexda û Şamê li ser diçûn, lê rewş weke xwe namîne, demsal li pey hev tên, geya di bin keviran de namîne, şîn dibe û rengê kesk erdê dinixwimîne û berê xwe bi rokê vedike, wê kurd jî wilo biserkevin, şad bibin, bi dengê bilind wê bangkin: Em koletiyê naxwazin, bijî kurd û Kurdistan:

***Navên me tev guhertin;  
Da bibêjin, ne kurdin***

***Lê bizane, ey neyar:  
Zivistan çû, tê bihar***

***Ew giyayê bin kevir  
Şîn tê rojek diçî der***

***Bijîn kurd û Kurdisan!  
Nema dibî kolistan !***<sup>672</sup>

Heger mijara vê helbesta han zinara erebî bû, lê helbestvan ji xwe re fersendek dît ku rewşa kurdî li hemû herêman berçav bike, ne ya civakî tenê, lê ya siyasî, ramanî û aborî jî û siyasetên ku rêjîmên serdestî Kurdistan bikar tînin, lîstikên

---

<sup>671</sup> - h.b., r. 80.

<sup>672</sup> - h.b., r. 81.

wan, hevpeymanên wan û daxwazên wan bi hilanîna Kurd û Kurdistan ji nexşe û mejîyan.

Di her birgekê de jî helbestvan dixwest nav di kurdan bide wan germ bike û namekê bighîne dijmin ku Kurd li ser xaka xwe pêdar in, li ser rêya xebatê ne ji ser naçin. Bi wêneyekê hunerî rewşa hêza kurdan diyar dike ku ew lat û kevirên ku dijmin bi ser wan de berdide wê wan bikin pûş û ji wilo kûrtir ew şêrên seraserî Rojhilatî:

*Lata we ew kirî pûşt*

*Baran lê hat hemî şûşt*

*Kurd şiyar dibê bi lez*

*Gavan tavêjê bi bez*

*Hawîr civat û xebat*

*Dibin şêrên Rojhilat*<sup>673</sup>

Belgekirina bûyereke weha û bi peyxameke helbestî dihêle ku em nêzîkbûnekê di navbera deqê helbestî û bûyeran bikin, çikû helbestvan qet ji rewşa dîrokî dûr neketiye û deq li gorî bûyerê lihevhatî û bi bûyer re hatiye, ta asta ku deqê helbestî bûye deqê dîrokî û dîroknûs dikare balpiştê di nivîsandina xwe de pê bike û heger carna hest û coşên helbestvan bi ser diketin ev di helbestê de pir normal e.

### **3.3.2.6. Rengvedana Kesayetiya Leyla Qasim:**

Di dîroka kurdî serdem de taybetmeniyeye kesayetiya Leyla Qasim heye, ew yekemîn jina kurd e ku ji ber nerînên xwe yê siyasî tê darvekirin û bû semlerek ji tekoşîna jina kurd re û hestê helbestvan, hunermend, dengbêj û nivîskaran bi xurtî livandin û gur kirin ta ku bû stêrek di asîmanê Kurdistan de.

Sala 1974an piştî têkbirina hevpeymanê 11ê Avdarê hemû siyasîmedarên kurd û Leyla yek ji wan, man di bin çavan de û hikûmeta Bexdayê ma li pey wan, lê Leyla ji Bexdayê derneket û xwest xebata xwe li wir bidomîne, ta hat binçavkirin,

---

<sup>673</sup> - h.b., h.r.



hat girtin û di 12ê Gulana 1974an de hat bidarvekirin<sup>674</sup>.

Bidarvekirina wê bandoreke xwe kûr li Cegerxwîn hişt û peyxama helbestê bi germî ew girt û him şîn û him pesnên wê dihelbesta xwe ya bi navê "Leyla Şehîd" de dida. Ev helbest bi wêneyên hunerî dagirtiye, ji malka pêşî de dest bi pesnê wê dike, bi penda kurdî "Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e" dest pê dike. Şêr her di çanda gelêrî de nîşana hêz û xurtiyê ye, ne tenê weha lê ala Kurdistanê jî di dest wê de ye. Weke tê naskirin ku di cengê de her yê ku bihtir metirsî lê ye, al nîşana serkirdetiyê ye, naxwe ji pêşî de dijmin nîşana xwe ji Leyla girtibûn û ew yekemîn qurbanî bû piştî têkçûna hevpeymanan di navbera kurdan û hikûmeta iraqî de. Helbestvan pesnê jixwebawerî û cesareta wê dide, ew mîna pola xurt e, ta ku bû dirgek ji mêrxasî û pêşdedanê û her helbestvan dibêje ku Leyla kurd e, Leyla ya wî ye:

*Şêr, şêre, mêre yan jine*

*Nîşan bi dest, Leyla mine*

*Polaye dil wek asine*

*Leyla kêye ?*

*Leyla jine*

*Leyla mine*

*Leya mine ....*<sup>675</sup>

Leyla dilê helbestvan kir pizotek ji agir û bi çûna xwe wê mizgîniyek da kurdan ku roja wan nêzîk bûye û paşeroj ya wan e, tiştê ku dijmin kir ew ji tirsî kiriye; tirsî ji xebata wê û xurtbûna hêza helwesta wê bû. Di dawiya her birgêkê de jî her "Leyla mine" dûbare dike da bibe mîna stiranekê di hinav û can de cih digre berî ku li ser ziman bê gotin:

*Leyla mine, Leyla welêt*

*Wê dil li min kir ar û pêt*

*Mizgîn li kurd roja me têt*

*Dijmin ji tirsan maye şêt*

<sup>674</sup>- Mehmûd el-Wendî "*Leyletu'l-Qebqî Ele Leyla Qasim*" el-Hiwaru'l-Mutemedin, el-Edd 2277, 05.10.2008. <http://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=134118>, (m.j. 03.01.2016).

<sup>675</sup>- Cegerxwîn, *Şefaq*, r. 59.

*Leyla kîye ?*

*Leyla jine*

*Leyla mine*

*Leya mine ....*<sup>676</sup>

Helbestvan wek fersendekê dibîne ku sûtê ji şûnma û kelepûrê kurdî bike ya ku dibêje her mirovek dimre stêra wî dirje û bi roneke xurt tê xwar. Helbestvan dibîne ku ew stêra Leyla rijiya, lewra şîniyê girt ruwê xweristê, pel li daran zer bûn, bax û bistan hişk bûn, lê dîsa divê Leyla bibe navtêdanek ji xort û keçan re, ji xwendekaran re da riya xebata wê bişopînin.

*Sitêr ji ezman hate xwar*

*Zer bûn li min bax û bihar*

*Rabin ji xew ey xwendewar !*

*Tev mêr û jin bibne şiyar*

*Leyla kîye ?*

*Leyla jine*

*Leyla mine*

*Leya mine ....*<sup>677</sup>

Helbestvan fersendê dibîne ku bûyerên dîroka serdem bi dîroka kevin ve girêde, dema ku kurd di erdnîgariya xwe de serdest bûn. Rast e wî helbest ji bo Leyla nivîsiye, bo şehîdbûna wê û di wê şehîdbûnê de Leyla mîna şahekê dibîne, ku gerekê ew taca Erdeşêr li ser serê wê be, ew himkûfî tacê ye, weke ku himkûfe ku helbestvan navê wê bi ava zêr di dîroka kurdî de binivîse, çikû jina kurd di mêranî û mêrxasiyê de ne kêmi mêrê kurd e, ew keça mîtan û mîdiyan e, canê xwe di ber welatê xwe de da, bijî Leyla û bijî hemû leheng û cangoriyên welêt, wê kurdên wefadar her wan bibîr bînin:

*Daser te taca Erdeşêr*

*Navê te dinvîsim bi zêr*

*Jin nû dibin wek şêr û mêr*

---

<sup>676</sup> - h.b., h.r.

<sup>677</sup> - h.b., h.r.

*Leyla çiye ?*

*Leyla jine*

*Leyla mine*

*Leya mine ....*

*Leyla keça Mît û Meda*

*Canê xwe da di ber me da*

*Bijîn heçê ko canfida*

*Xweş bin ji te jar û geda*

*Leyla kêye ?*

*Leyla jine*

*Leyla mine*

*Leya mine ....*<sup>678</sup>

Çi peyveke spehî û watedar helbestvan dixwaze wê bikar bîne da layiqî Leyla û şehîbûna wê bin, ta ku helbestvan dibe parçek ji deqê xwe, ew dest ji Leyla xwe bernade, Leyla nazik, çalakvan, jêhatî, spehî û ciwan... lê ligel van ciwaniyan Leyla mîna şêr û piling e, xurt e, bi hêze û vîna wê mîna pola ye, lewra navê wê, pêdarî û berxwedana wê di nav kurdan de belav bû. Dibêje:

*Leyla delal û pir çeleng*

*Leyla ciwan û şox û şeng*

*Xwe daye kuştin wek pileng*

*Şêre li nav kurd daye deng*

*Leyla kêye ?*

*Leyla jine*

*Leyla mine*

*Leya mine ....*<sup>679</sup>

Wê bi çira dişibîne ku rê ronî kir û tarî ji derdorê da alî, wê hişt ku Kurd baweriyê bi berdewamiya tekoşînê bînin û rîya berxwedanê bernedin, çiku pêşeroj ji we re ye, lewra li şûna girî gîrnijîn li ser dêman bû, ji ber ku Leyla ronî ye û tariyê

---

<sup>678</sup> - h.b., r. 60.

<sup>679</sup> - h.b., h.r.

dide alî, mîna ku helbestvan bêje ku berî ku Leyla bê tariyê girtibû vî warî, yan mîna nîşanekê ji rewşa civakî paşketî ku jin tê de dijiya, rewşa xerab ji ber adetên kevin û Leyla hat ew nerîn guhert û hişt kubaweriya jina Kurd pê bê û xebat û tekoşîna xwe li kêleka mîrê kurd bike, ne tenê wilo lê belê mirina bo dozê bi wan xweş û şêrîn kir, mirina bo rizgariya welêt û çandina têgehî nû di hinavên nişê li pey wan tê, şêhîdbûna wê bo van sinc û exlaqan bê, lewra her jinek bûye Leyla, mebest jê wek Leyla di pêdariya xwe de, di berxwedanê de, di hezkirina dozê û welat de û di dana can bi qurbanî di ber de. Wê tariya paşketinê ji civakê rakir û ronahî li şûnê belav kir, nameyek da ku tu sîde ji revê tune, berxwedan gerek e, xebat gerek e, kar divê ta ku azadiya xwe bidest xwe bixin û ji bo pêk anînan van armancan yekîtî, alîkarî gerek e, destan di destên hev kin bo avakirina pêşerojê ronîdar.

*Leyla çiraxa şevreşe*

*Wê rû li kurdan kir geşe*

*Kuştin bi me kurdan xweşe*

*Zordarî îdî nameşe*

*Leyla kîye ?*

*Leyla jine*

*Leyla mine*

*Leyla mine ....*

*Bi wê li kurd ron bûye şev*

*Jin bûne wek Leyla me tev*

*Îdî nema hêjaye rev*

*Ey kurd de destan bidne hev !*

*Leyla kîye ?*

*Leyla jine*

*Leyla mine*

*Leyla mine ....<sup>680</sup>*

Ji germbûna zêde helbestvan xwe ji bîr dike ku ew helbestêdînivîse û xwe wek xwendevan dibîne, bi vîneke xurt dixwaze ku ew bi xwe li pey Leyla here bide

---

<sup>680</sup> - h.b., r. 61.

ser riya wê, jiyan bê tekoşîn çiyê? Û em bighin armancan helbestvan dibêje ku bê ku em amade bin xwîna xwe bidin, bê ku em can bidin qet em naghin daxwazên xwe, lewra dibêje (xwezî bi dilê Leyla, Bijî Leyla..)

*Divêm li pey te bêm ejî*

*Çibkim bi vê jîna rijî ?*

*Xwînê nerêjî napijî*

*Leyla bijî, Leyla bijî !...*

*Leyla kêye ?*

*Leyla jine*

*Leyla mine*

*Leya mine ....*<sup>681</sup>

Bi vî hawî helbestvan ta dawiya helbestê pesn û medhê Leyla dide, da ku navtêdanekê li keç û xortan bike, ewên ku hêviya azadiyê di hinavên wan de miriye, ew di şehîdbûna wê de fersendeke ciwan dibîne ku xortan bîne ser rê; riya xebatê ta azadî û rizgarkirinê. Leyla dighê asta dîn û îmanê di pîroziyê de, Leyla bi şehîdketina xwe bandoreke pîrr mezin li helbestvan kir, birînên wî vekirin. Helbestvan li vir hewl dide ku du mijaran, du ramananbi hev re diyar bike; şîna li ser jidestçûna Leyla û serbilindî bi vê şehîdketinê.

*Leya bijî, sed aferîn*

*Ji bo me bûye ol û dîn*

*Dîsa li min derbûn birîn*

*Hetta ciger min bûye xwîn*

*Leyla kêye ?*

*Leyla jine*

*Leyla mine*

*Leya mine ....*<sup>682</sup>

Helbestvan formeke cuda ji vê helbestê re hilibijartiyê, bi awayekî din peyv li ser rûpel belav kirine, mîna ku ciyawaziyeke mîna ciyawaziya Leyla bide wan, da

---

<sup>681</sup> - h.b., h.r.

<sup>682</sup> - h.b., r. 62.

helbesteke layiqî dana wê bê, layiqî giranbuhaya wê û dawpakiya wê be. Mûzîkek ciwan daye deq bi ritma hindir re dimeşe, ligel wêneyên hunerî ku di helbestê de bi piranî hatine; hin li gorî mêrxasiya wê û hin li gorî nazik û delaliya wê û hin jî li gorî dan û qurbaniya wê.



## ENCAM

Serbora Cegerxwîn di bikaranîna dîrokê û bûyerên wê de ne serboreke nûye di qada wêjeya kurdî de, di vî biwarî de hinek serborînên din jî hene, lê her serborek taybetmendiyên wê hene, çî di qaçilk de û çî di naverokê de, lê di serbora Cegerxwîn de ji destpêka ku helbest nivîsandiye ev taybetî bikar aniye, serborên destpêkê û danûstendina wî bi civakê re makderê peyxama helbestê bû ji wî re, ta gurbûna şoreşa Şêx Seîd a ku bi xurtî bandora xwe lê kir û asoyin nû li ber vekirin û wateke nû da welat û da mirovê Kurd, wê bandorê di helbestên wî re da der. Yê ku helbestên wî bişopîne wê guhertina ku di hizr û ramana Cegerxwîn de ji dîwanekê ta ya din bûne bibîne.

Piştî ku Cegerxwîn ket bin siya ideolojiya markisî, wê bandora xwe li helbesta wî jî kir û bêhtir berê xwe da bûyerên dîrokî ku têkiliyên wan bi komonist û komonismê ve heye, ser hesabê kêmbûna guhdana bi bûyerên kurdî û netewî, ew jî di bikaranîna dîroka kurdî serdem de diyar dibe, ku ne zêdî çendekan bû ku em wan bi piraniya yên bi rikberiya idelojî û herêmên desthilatdariya kapitalist û komonist re berhev bikin.

Mijarên helbesta Cegerxwîn ku dîrok tê de bikar aniye cûrecûr û rengereng in, pesindan, şîn, payebilindî, dicûn û evînî. Carna fersende di bûyerekê de didît ku bihêle navtêdan û germbûn siya xwe bi hêz li ser helbesta wî ya netewî vegrin, li ser kar û pêkhatên bapîran, mêrxasiya wan, qehremaniya wan di cengan de nivîsand, li ser serok û tekoşeran nivîsand, li ser mêrxasiya wan, pesn û karê wan û tiştên ku pêk anîne. Di nîsandina ser serokan de jî dûrî ketwarê dîrokî nediket, ta di cihna de zêde riyalîzm bû, nemaze di wan helbestan de ku dixwest di heman demê de him dîroknûs û him helbestvan be.

Cegerxwîn, dema dixwest helbest wek çek di ruwê dijmin de bikar tanî û carna wek rokê ew qurçikên tarî ji dîroka kurdî pê ronî dikir û carna helbest çenteyek dagirtî gotinên evînî bû li milê wî bi wan jiyana geş dikir, evîn li dilê evîndaran vedigerand û di her helbestekê de bihna welat difûre, di her dîwanek wî de bihna dîrokê li hawîrdor belav dibe. Di rêya vê lêkolînê de em dikarin bighin van encaman:

1- Wek taybetmendiyeke Cegerxwîn ku karîbû bi awakî ecêb wêneyên hunerî ava bike û têxe bin xizmeta dîrokê û pirr kesayetî û bûyerên dîrokê bîne û têxe bin xizmeta helbesta xwe û di piraniya wan de bi ser ket, wî karîbû bûyerê biguhêze bê ku ziyane bighîne rastî yan pêvajoya wê û weha neditirsiya ku ziyane bighîne helbesta xwe, çikû ew di bikaranîna wan de jêhatî û pêkhatî bû.

2- Heger carna bûyerin bi ser hinek din dikevin, yan kesayetiyek cihekî ji yan din di helbestê de bihtir digre, ev nabe kêmanî ji helbestvan re, ji ber ku helbest berî her tiştî peyxame û pirr hokar hene rola xwe di nivîsandina helbestê de dilîzin. Lê di cihna de em karin bighin hin encam, dema ku em bûyereke dîrokî bixwînin ku cihekî bilind li ba kurdan dirtiye û vedenga wê bûyer û kesayetiyê di helbesta wî de tune ev doxin derûnî bandora xwe lê hiştine, hiştine ku xwe ji wê bûyerê dûr bixîne. Ev tişt li ba Cegerxwîn eşkere bû, dema ku guh da pir bûyerên ku bi dax bûn û bandora xwe li cugrafiya Kurdistan hişt, na û li cîhanê jî û Cegerxwîn ew bûyera ku Kurd li nexşaya siyasî li cîhanê di dîroka serdem de amade kir piştguh kiriye, ew nîşana ku Cegerxwîn ketiye bin siya ramanên xwe yê markîsî û nerîna partîfî ku hiştiye ew ji bûyereke weha dûrkeve, mebesta min şoreşa Barzanî ye û encamên ku jê derçûn û dîroka serdem a Kurdistan –Iraq tev mijûl kir, tenê Cegerxwîn kesayetiya Leyla Qasim di yek helbestê de bikar aniye (Leyla Şehîd).

3- Cegerxwîn karîbû di riya helbesta xwe re eş û kul û derdên milletê xwe bighîne kesên din da ew jî bi wan hest bibin û dostan ji doza xwe re zêde bike.

4- Karîbû hin bûyer ku dîrokê ew ne nivîsandine belge bike û hin li ber jibîrkinê bûn wî ew vejînin, weha jî kesayetiyan siyasî tekoşer, şehîd û zanyar.

5- Heger ji kevin de têkiliya dîrokê bi helbestê re mukume, Cegerxwîn bi kûrahî di vê biwarê de têgihîştî bû, ne tenê bûyerên siyasî helbestvan mijûl dikirin, lê



belê doza kurdî û dîroka wan a civakî jî dadiketî holê û helbestvan baş guh dida wan, wî di helbestên xwe de ew bûyer bi ferehî tomar kirin, da wek şahidekî ser hina be û veguhêz be ji hina re, lewra peywendiya di nav helbestên wî û dîrokê de peywendiyê bikêr bû, yek ji wan ne li ser hesabê yê din bû. Heger dîrok bi bûyerên xwe bi kurdan re hişk û êşdar bû û hê jî kurd wan dijîn, helbest bihtir karîbû bi roleke erênî rabe û karîbû wan êşan sivik bike û çakbînî û geşbîmîyê bide yê kurd û nav tê bide ku rabe xebata xwe bidomîne û daxwazên wî yên razber xurt bike, ew bûyer kirin helbest bi ciwanîyê bilind û peyvin spehî ew bûyer nêzîkî can kirin.

6- Heger ji her yekê ji dîrokê û helbestê re qanûnin wan cuda hebûn, Cegerxwîn hemû şîyanê xwe kir ku radestî vê babetê nebe, weke ku hewl da ku di ser re xwe ne qevêze jî, wî taybetmendiya her yekê ji wan naskir û tê giha û karîbû di riya gerdûna helbestê ya fereh re amaje û destnîşanin pîrr vejine û ramanin nû ku deqê dîrokê devbêjî nika re bike, carna jî helbesta Cegerxwîn ew a serdest bû û bi xurtî hazir bû tevî ku armanc dîrok bû û têkiliyêke terazûkirî di nav wan de ava kir.

7- Helbestên Cegerxwîn bi zimanê xwe, rewanbêjî û wêneyên xwe yên hunerî pîrr dewlemend e û avakirina helbestê bi nazîkî, pîrr amaje û xurtbûna vexwestina bûyerê taybetiyêke xwe distîne.

8- Cegerxwîn hewl da ku helbestê bi her awayê wê binivîse, ya serbest û ya bi pîvana arûzê.

9- Hestiyariya Cegerxwîn a bilind bi doza wî ya neteweyî –tevî ku ew di ramana xwe de markîsî bû- hişt ku ew hizr û ramanê xwe di bin xizmeta wê dozê ke, weha jî partîtî û îdiologiya wî, tevî ku yek caran serê xwe di derna de radikir.

10- Cegerxwîn bi mêranî rexne li dîroka îslamî kir û bandora misilmantiyê li welatê kurdan, çande û taybetiyên wan ên neteweyî. Wî eşkere şerê wan dikir û her li ser şêx û melan digot ku ew berjewendiyên xwe yên teng diparêzin, ew bi desthilatdaran re ne, hevalê beg û axa ne, ji bilî çend kesên ku rola xwe di dîroka kurdî de lîstin.

11- Cegerxwîn bi awayekî cûrbecûr dîrok di helbesta xwe de bikar anî, tevî ku giranî da kesekî ji yê din bihtir, qûnaxekê ji ya din bihtir.

12- Armancên wêneya hunerî li ba Cegerxwîn pirr reng bûn, lê ya bandorkirinê bihtir bi ser ket, di riya navtêdana xortan û anîna kesayetiyan bi bandor ji dîrokê, ku nirxeke bilindtir da helbesta wî.



## ÇAVKANÎ

### PIRTÛK

ARÎSTO, **Fenu'ş-Şi'ri**, ter. Ibrahîm Hemade, Mektebetu'l-Anclo'l-Misriyye, Misir (b.m).

AYDIN, Osman, **Kürt Ulus Hareketi 1925**, Can Matbaacılık, Doz Yayıncılık, Istanbul 2006.

BAQIR, Taha, **Mûqeddîmeton fi Tarîxi'l-Hedarati'l-Qedîmetî**, c.1, darû'l-Weraq, Beyrût/Bexdad 2012.

BARÛT, Muhammed Cemal, **et-Tekewinu't-Tarîxi'l-Hedîs li'l-Vezîreti's-Sûriya, Esîletun we Işkalîyatu't-Tehiwwil Mine'l-Bedwenetî Île'l-Umrani'l-Hederî**, el-Merkezi'l-'Erebî li'l-Ebhas we Dirasetu's-Siyasat, Beyrût 2013.

BEDLÎSÎ, Şerefhanê, **Şerefname**, ter. we teh.: Muhammed Cemîl el-Melle Ehmed er-Rojibiyânî, muessesetu el-Mokiryânî li't-Tîba'etî we'n-Neşir, Erbîl 2001.

BEDRUDDÎN, Selah, **el-Hereketu'l Qewmîyeti'l-Kurdîye fi Sûriya -Ru'yeton Neqdiyeton mîne'd-Daxilî**, Rabîtetu Kawa li's-Seqafetî'l-Kurdiyyetî, Beyrût/Erbîl 2003.

BÊK, Hisên Nazim, **Tarîxu'l-Îmareti'l-Babanîye**, ter. Şikro Mustefa we Muhammed el-Melle 'Ebdul'-Kerîm el-Muderris, metbe'etu wezaretî't-Terbîye/ mûessesetu Mukiryânî, Erbîl 2001.

el-BELAZERÎ, Ebû'l-Ebbas Ehmed bin Yehya bin Cabir, **Fitûhu'l-Buldan**, teh. Ebdullah Enîs et-Tebba', mûessesetu'l- Me'arif, Beyrût 1987.

BELEC, Şêrgoh, **el-Qedîyetu'l-Kurdîye- Madî'l-Kurdî we Hadirehom-(Cem'iyetu Xoybûn el-Wetenîyeti'l-Kurdîye)**, Rabîtu Kawa li's-Seqafetî'l-Kurdîye, daru'l-Kîtab, Beyrût 1986.

el-Berwarî, Rêber Cafer Ehmed, **el-Hemelatû'l-Eskeriyeî el-Aşûrîyeî ela Kurdistan (911-612 q.m)**, metbe'etû'l-Xanî/darû Mukriyanî, Dihok 2012.

el-BERZANÎ, Mes'ûd, **el-Berezanî we'l-Hereketu't-Teherurîyeî'l-Kurdîyeî**, c. 1, menşûrat rabîtetu Kawa li's-Seqafeti'l-Kurdîyeî, Beyrût 1997.

BEYTAR, Emîne, **Tarîxu'l-'Esri'l-'Ebbasî**, menşûratu Camî'tî Dîmeşiq, Dîmeşiq 1996/1997, r. 56-57.

BILBIL, Mîkaîl, **Helbesta Cegerxwîn û Îqtîdar**, ç. 1, weş. Lîs, Diyarbakir 2016.

BILUC, Con, Harvî Morîs, **La Esdîqa'e Sîwa'l-Cîbal**, ter. Rajal Muhemed, Beyrût 1996.

BONATIZ, Domînik, Hartmot KONEYH, Es'ed el-MEHMÛD, **el-Enharu we'l-Bewadî - et-Tûrasu'l-Hedarîyû li'l-Cezîreti's-Sûriyeî we ma Hewleha**, (Delîlû Methefî Dêre'z-Zor), metabi'û Elîf Ba el-Edîb, Isdarat Wezaretî's-Seqafetî el-Mûdirîyeî el-'Ametû lil Asarî we'l Metahif, Dîmeşiq 1999.

BUCCELLATI, Giorgio, **Vexwendinek ji bo Serdan ya Girê Mozan Orkêş ya Kevin**, wer. Ahmed Slivi, Ghiath Rammo, weş. Uekesh Press, 2014.

CALIYAND, Cîrard, **Şe'bun Bidûnî Weten el-Kurd we Kurdistan**, ter. Ebdusselam en-Neqîşbendî, daru Aras, Erbil 2012.

CE'FER, Ebu'l-Ferec Quddame bin, **Neqdu's-Şi'r**, Teh we Te'lîq: Muhammed Ebdil Mun'im Xeface, daru'l-Kutubî'l-'Îlmîyye, Beyrût, (b.m).

CEGERXWÎN, **Aşîfî**, ç. 3, weş. Avesta, Istanbul 2003.

CEGERXWÎN, **Awa û destûrazimanê Kurdî**, Bexdad, ç. 1, 1961.

CEGERXWÎN, **Cîm û Gulperî**, ç. 1, Şam, 1948.

CEGERXWÎN, **Ferhenga Kurdî**, c. 2, Bexdad, 1962.

CEGERXWÎN, **Folklorê Kurdî**, weş. Roja nû, Stockholm 1988.

CEGERXWÎN, **Gotinên Pêşyan**, ç. 1, Şam, 1957.

CEGERXWÎN, **Hêvî**, weş. Roja nû, Stockholm 1983.

CEGERXWÎN, **Jînenîgariya Min**, ç. 1, weş. Apcc, Stokholm 1995.

CEGERXWÎN, **Kîme Ez**, ç.1, Beyrût 1973.

CEGERXWÎN, **Pirîsk û Pêtî**, ç. 1, şam 1945.

CEGERXWÎN, **Reşoyê Darê**, ç. 1, Şam, 1956.

CEGERXWÎN, **Salar û Mîdiya**, ç. 1, Beyrût 1973.

CEGERXWÎN, **Sewra Azadî**, ç. 1, Şam 1954.

CEGERXWÎN, **Şefaq**, ç.1, weş. Roja nû, Stokholm 1982.

CEGERXWÎN, **Şerfnameya menzûm**, ç. 2, weş. Avesta, Istanbul2003.

CEGERXWÎN, **Tarîxa Kurdistan**, c.1, ç. 1, weş. Roja nû, Stockholm,1985.

CEGERXWÎN, **Tarîxa Kurdistan**, c.1, ç. 2, weş. Roja nû, Stockholm,1987.

CEGERXWÎN, **Tarîxa Kurdistan, Împeratoriya/Dewleta kurdî – Eyûbî**, c. 3, weşanên Roja Nû, Stockholm 1999.

CELÎL, Celîlê, M. S. LAZARÊF, M. A. HESRETYAN, Şakir MEHOYAN, Olga CÎGALANÎ, **el-Hereketu'l-Kurdîyetî fi'l-'Esri'l-Hedîs**, ter. Ebdê Hacî, metbe'etu Xanî, Dihok 2012.

CELÎL, Celîlê, **Nehdetu'l-Ekradi's-Seqafîyetî we'l-Qewmîyetî fi Nihayeti'l-Qerni't-Tasi' 'Eşer we bidayeti'l-Qeni'l-'Işrîn**, menşûrat rabîtetu Kawa li's-Seqafeti'l-Kurdîyetî, daru'l-Katib, Beyrût 1986.

CENGO, Hesên, **Cegerxwîn min Imqî'l-Masatî Île Fedai'l-Insanîye**, (b.c.) 2013.

el-CEZÎRÎ, Elî, **el-Edebû's-Şîfahiyû'l-Kurdî**, c. 1, Rabîtetu Kawa li's-Seqafeti'l-Kurdiyeyî we'l-fen, Beyrût 2000. c. 2, Merkezû Zeytûne li'd- Dirasat, Erbil 2008.

CIWÊDA, Wedî', **el-Hereketu'l-Qewmîyeti'l-Kurdîye**, Neş'eteha we Tetewireha, ter. Mecmû'e mine'l-Mûtercimîn, daru'l-Farabî/daru Aras, Beyrût/ Erbil 2013.

CORCIYO, Franswa, **en-Nîza'u'l-Exîr (1878-1908)**, dimin kîtab: Robêr Mantiran (Işraf), **Tarîxu'd-Dewleti'l-Osmanîye**, ter: Beşîr es-Siba'î, c. 2, daru'l-Fiki, el-Qahîra 1993.

CÛDE, Muhammed Xerîb, **Mûcezu tarîxi'l-'alemî bi's-senewatî wel-Ehdasî**, Mektebetul-Quran, el-Qahîra, (b.m).

CÛDE, Muhemmed Xerîb, **Mûcezu Tarîx'l-'Alemî bi's-Senewatî we'l-Ehdas**, mektebetu'l-Quran, el-Qahîra, (b.m.).

CUM'A, Bedî' Muhemed, **Medxelon Île Hedaretî Îran Qeble'l-Islam**, (b.m, b.c).

ed-DAWÎ, Remedan Şerîf, **Loristan el-Kubra (550-827h/1115-1424m) dîrasetun fî Ehwalîha es-Siyasîye we'l-Hedariye**, metbe'etu'l-Xanî, Dihok 2010.

DAWÛD, Ebdussemed, **el-Hîzami'l-'Erebî fi'l-Cezîra – Sûriya (Muqeddîme, Tenfiz, Neta'ic)**, 2015.

DERWÎŞ, Ebdulhemîd, **Edwa-on 'Eele'l-Hereketi'l-Kurdîyetî fi Sûriya (1956-1970)**, 2003.

DÎB, Kemal, **Tarîxu Sûriya el-Mu'asie Mine'l-Intîdabi'l-Ferensî Hette Seyf** 2011, daru'n-Nehar, Beyrût 2012.

DOLÎNA, Nînil Eliksenderofna, **el-Imbîratorîyetu'l-Osmanîye we 'Elaqatihe'd-Diwelîyetî fî Selasînat we Erbe'înat'l-Qern't-Tasi' 'Eşer**, ter. Enwer Muhemmed Ibrahim, el-Meclisu'l-E'la li's-Seqafe, el-Qahîra 1999.

DOMON, Pol, **Fetretu't-Tenzîmat**, kîtab: Robêr Mantiran (Işraf), **Tarîxu'd-Dewleti'l-Osmanîye**.

ed-DOSKÎ, Hozan Sulêman, Mîrxan, **Cemhorîyetu Kurdistan (22 Kanûn es-Sanî 1946-17 Kanûn el-Ewwel 1946)**, metbe'etu wezaretî't-Terbîye, Erbîl 2005.

DOSKÎ, Kamîran 'Ebdssemed, **Kurdistani'l-Osmanîye fi'n-Nisfi'l-Ewwelî Mine'l-Qerni't-Tasi'î 'Eşer**, metbe'etu wezaretî't-Terbîye, Hewlêr 2002.

ed-DÛRÎ, Ebdulezîz, **el-'Esîru'l-Ebbasîyi'l-Ewwel- (Diraseton fi't-Tarîxi's-Siyasîyi we'l-Idariyi we'l-Maliyi)**, daru'l-Telî'e, Beyrût 1997.

EBDULEZÎZ, Ulfet Muhammed Kemel, **Nezerîyetu'ş-Şi'rî 'inde'l-Felasîfeti'l-Muslimîn**, el-Hey'etu'l-Misrîyetu'l-'ametu li'l-Kîtab, el-Qahîre 1984.

EBDULHEMÎD es-SANÎ, **Mûzekeratî es-Siyasîye (1891-1908)**, mûessesetu'r-Risale, Beyrût 1979.

Ebdurrehman, Xelîl, **Avêsta- el-Kîtabu'l-Muqeddesî lid-Diyaneti'z-Zeradeştiye**, Rewafid lis-Seqafetî we'l-finûn, Dîmeşiq 2008.

EBÛ DIYYE, Eyyûb, **Ulemaûn- Nehdetî'l-Ewrûpiyyetî**, Darû'l-Farabî 2011.

EBÛ ŞAME, Şhabuddîn 'Ebdurrehman bin Isma'îl el-Meqdisî, **Kîtabu'l-Rewdeteyn Fî Exbaru'd-Dewleteyn en-Nûriye we's-Selahiye**, Neşr we te'lîq: Muhemmed Hilmî Muhemmed Ehmed, Metbe'etu Daru'l-Kutûb el-Misriye, el-Qahîre 1988.

EBÛ'l-FÎDA, Îmadeddîn Isma'îl bin Muhemmed bin 'Umer, **Teqwîmu'l-Buldan**, dar Sadir, Beyrût/daru't-Tiba'etu's-Sultanîye- Barîs 1850.

EBÛSSI'ÛD, Ebdusselam, **Hilfu Bexdad**, daru'l-Me'rîfeti'l-Cami'îye li't-Tebi'î we-n-Neşir we't-Tewzî', Misir 1957.

EFLATUN, **el-Muhaweratu'l-kamîle**, ter. Şewqî Dawûd Temraz, el-Ehliyyetu 'l-in-Neşrî we et-Tewzî'î, Beyrût (b.m).

EHMED, Cemal Reşîd, **Zuhûr'l-Kurdî fi't-tarîxî**, c. 2, Metbe'etu wezaretu't-terbîyetî, menşûratû darû Aras, Erbîl 2003, r. 3-70.

EHMED, Ehmed Muhemmed, **Ekradu'd-Dewleti'l-Osmanîyetî we Tarîxehum el-Ictima'î we'l-Iqtisadî we's-Siyasî (1880-1923)**, metbe'etu HecîHaşim, Erbîl 2009.

EHMED, Muhemmed Mela, **Sefehaton Min Tarîxi'l-Hereketi'l-Kurdîye**, menşûrat Rabîtetu Kawa, Erbîl, 2001.

ELÎ, Muhemmed Ebdulletîf Muhemmed, **Tarîxû'l-Îraq'l-Qedîm Hetta Nihayetî'l-Elfi Salisî q.m**, Camî'etu'k-Îskenderîyye, 1977.

ELLAQ, Fatih, **Mefhûm's-Şi'rî 'inde Ruwad's-Şi'r'l-Erebî'l-Hur**, Menşûratu İttîhadu'l-Kuttabi'l-Ereb, Dimeşq 2005.

es-SEXAWÎ, Muhammed Ibnû Ebdurrehman Ibnû Şemseddîn, **el-Îlanu bi't-Tewbîxî Limen Zemme't-Tarîx**, Teh. Frans Ronsal, Ter. Salih Ahmed el-Elî, Muessetu'r-Rîsale, Beyrût 1986.

es-SIWÊRKÎ, Muhemmed Elî, **Mu'cemu E'lami'l-Kurdî fi't-Tarîxi'l-Islamî we'l-'Esiri'l-Hedis fi Kurdistan we Xariceha**, Muessesetu Jîn, es-Suleymanîye 2006.

el-FARIQÎ, Ehmed bin Elî bin el-Ezreq, **Tarîxu'l-Fariqî**, teh. Bedewî Ebdulletîf 'Ewed, el-Heyetu'l-'Ame lişûn el-Metabi' el-Emîrîye, el-Qahîra 1959.

el-FERDOSÎ, Ebu'l Qasim, **eş-Şahname melhemetu'l-Furs el-Kubra**, ter. Semîr Maltî, daru'l-Ilm li'l- Melayîn, Beyrût, 1979.

el-FERDOSÎ, Ebû'l-Qasim, **eş-Şahnama**, ter. Semîr Maltî, daru'l-Ilm li'l-Melayîn, Beyrût 1979.

FEXRÎ, Ehmed, **Dirasaton fi Tarîxi's-Şerqi'l-Edna'l-Qedîm (Misir we'l-Îraq- Sûriya, el-Yemen -Îran) Muxtarat mine'l-wesaiqi't-Tarîxiye**, mektebetu'l-Angilo'l-Misriya, el-Qahîra 1963.

HACO, Heznî, **Tê Bîra Min**, weş. Avesta, Stenbol 2007.

el-HAŞIMÎ, Texrîd Ce'fer, Hasen Husên 'UGLA, **el-Îsanû Tecelliyatu'l-Ezmîne (Tarîxu we Hedaretu Bîlad'er-Rafîdeyn-el-cezîretu's-Sûriya)**, daru't-Telî'etu'l-Cedîde, Dîmeşiq 2001.

HAYMAN, Nîl. M., **el-Herbu'l-'Alemîyti'l-Ûla**, ter: Hesên 'Ewîda, Hey'tu Ebûzebî li's-Siyahetî we's-Seqafe, Ebûzebî 2012.

HELÎM, Ibrahim Bêk, **Tarîxu'd-Dewleti'l-Osmanîye'l-Uliye (et-Tuhfetu'l-helîmîyefî fi Tarîxi'd-Dewleti'l-Uliye)**, mûessesetu'l-Kutubi's-Seqafîyefî, Beyrût 1988.

HEMDÎ, Welîd, **el-Kurd we Kurdistan fi'l-Wesa'qi'l-Birîtanîye**, Metabi'u Sicil'l-'Ereb, (b.c.), 1992.

el-HEMEWÎ, Şehab ed-Dîn Ebdullah Yaqût, Mi'cemu'l-Buldan, c. 2, dar Sadir, Beyrût (b.m.). r. 432.

HERUTÎ, Se'dî Osman, **Kurdistan we'l-Imbîratoriyeti'l-Osmanîye – Dîrasetun fi Tetewwirî Siyaseti'l-Heymeneti'l-Osmanîyefî fi Kurdistan (1514-1851m.)**, metbe'etu Xanî/mûessesetu Mukiryani, Dihok 2008.



HESEN, Qadir Muhemmed, **el-Îmaratu'l-Kurdîyê fi'l-'Esiri'l-Biweyhî - Dirasetun fi 'Elaqatîhe's-Siyasîyê we'l-Iqtisadîye (334-447h /945-1055m)**, metbe'etu Rojhilat, Erbil 2011.

el-HESINYANÎ, Salih Şêxo Resûl, **Ulemaû'l-Kurdî we Kurdistan mine'l-Qerni'l-Ewwel el-Hicrî Île Wefiyat Seneti 1400k./1980z.**, Metbe'etu Hawar, Dihok 2012.

HILAL, Muhemmed Teleb, **Dirasetun 'en Muhafezeti'l-Cezîra Mine'n-Newahi'l-Qewmîyê -el-Ictima'îyê- es-Siyasîyê**, menşûratu Merkezu 'Amûda li's-Seqafeti'l-Kurdîye, 2011.

HIRÊDÎ, Muhemmed 'Ebdulletîf, **el-Hirûb el-Osmanîyê'l-Farisîyê we Eseruha fi Inhîsari'l-Meddi'l-Islamiyî 'En Ewropa**, daru's-Sehwe, el-Qahîra 1987.

HIRINŞO, **Îlmu't-Tarîx**, ter. Ebdulhemîd el-Ebadî, Sîlsîletû'l-Me'arîfî'l-'Ametî, 1944.

el-HISNÎ, Ebdurrezaq, **Tarîxu'l-Îraqi'l-Hedîs**, c. 2, er-Rafîdeyn li't-Tiba'etî we'n-Neşir, Beyrût 2008.

el-HIWÊRÎ, Mehmûd Muhemmed, **Tarîxu'd-Dewleti'l-Osmanîyê fi'l-'Isûri'l-Wista**, el-Mektebu'l-Mesrî, el-Qahîra 2002.

Hîrodot, **Tarîxu Hîrodot**, ter. Ebdul Îlahi'l-Mellah, el-Mecme's-Seqafî, Ebu Dabî/el-Îmaratu'l-Erebîyetu'l Muttehîde 2001.

IBIN HEWQEL, Ebu'l-Qasim en-Nuseybînî, **Kîtabu Sûretu'l-Erd**, dar Mektebetu'l-Hayat, Beyrût 1992, r. 303.

IBIN SULEYMAN, Ferîd, **Medxelon île Dîraseti't-Tarîxî**, Merkezû'n-Neşri'l-Cami'î, Tunus 2000.

IBIN ŞEDDAD, Behauddîn, **Sîretû Selaheddîn el-Eyûbî, (en-Newadiru's-Sultanîye we'l-Mehasinu'l-Yûsifiye)**, Metbe'etu'l-Adab we'l-Mûeyyed, Misir 1317h.

IBIN ŞEDDAD, Izzeddîn Muhemmed bin Elî bin Ibrahim, **el-E'laqu'l-Xetîra fi Zikrî Umera'i's-Şamî we'l-Cezîre**, c. 3, teh. Yehya 'Ebbara Menşûrat wezaretu's-Seqafe, Dîmeşiq 1978.

IBIN WASIL, Cemaluddîn Muhammed Bin Salim, **Muferrîcu'l-Kurûb Fî Exbar Benî Eyûb**, teh. Cemaluddîn eş-Şiyal, el-Qahîre 1953.

IBIN XELDÛN, Ebdurrehman, **Kîtabu'l-Îberî we Dîwanu'l-Mubteda we'l-Xweber fi Eyyami'l-'Erebî we'l-'Ecemî we'l-Berberî**, c. 1, c. 3, c. 6, c. 8. Daru'l-Kîtab'l-Mesrî/ Daru'l-Kîtab'l-Libnanî, el- Qahira/Beyrût 1999.

IBIN XELLIKAN, Ebu'l-'Ebbas Şemsiddîn Ehmed bin Muhemmed bin ebî Bekir, **Wefiyatu'l-E'eyan we Enbau Ebnau'z-Zeman**, teh. Îhsan 'Ebbas, c.7, Daru's-Sadir, Beyrût 1978.

IBN'ESÎR, Ebu'l-Hesen Elî bin Muhemmed el-Cezerî, el-Kamil Fi't-Tarîx, Murace'e û Teshîh: Muhemmed Yûsif ed'-Deqaq, c. 6, c. 7, c. 10 daru'l-Kutûbu'l-'Ilmîye, Beyrût 2003.

ISMAÎL, Farûq, **Resailû'l-Emarîneti'd-Diwelîyetî**, Dîmeşiq 2010

ÎSA, Hamid Mehmûd, **el-Muşkiletu'l-Kurdîyetî fi'ş-Şerqi'l-Ewset Minzû bidayetîha we Hetta Senete 1991**, mektebetu Medbûlî, Bor-Se'îd 1992.

KARTIYÊ, Rîmon, **el-Herbu'l-Alemiyeti's-Saniye**, ter. Suhêl Semahe, Enton Mes'ûd, c. 1-2, mûessesetu Nofel ŞMM, Beyrût 1983

KAYNAK, Yusuf, **Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî**, Weş. Do, İstanbul, 2010.

KILÎNGIL, Horst, **Tarîx Sûriya es-Siyasî (3000-300q.m)**, ter. Seyfu'd-Dîn Diyab, daru'l-Mûtenebbî, Dîmeşiq 1998.

KIŞNAK, Zülküf, **Batman Bajarê ku Dîroka Xwe Hembêz Dike**, Gun Matbaacilik, Stenbol 2013.

KOHIN, Can, **Bunyetu'l-Luxetiş-Şi'rîyetî**, ter. Muhammed el-Welî we Muhemmd el-Umerî, daru Topqal li'n- Neşrî, ed-Daru'l-Beyda'-el-Mexreb 1986.

KORAN, Arciment, **es-Siyasetu'l-Osmanîyetî Ticae'l-Ihtîlal'l-Firensî li'l-Ceza'r**, ter. 'Ebdî'l-Celîli et-Temîmî, menşûratu'l-Cami'eti'Tûnisîye, 1970.

KURDO, Qenatê, **Tarîxa Edebyeta Kurdî**, ç. 2., Seçln Ofset Matbaacilik, Ankara 1992.

LEŞKERÎ, Heyder, **el-Kurd fi'l-Merîfeti'l-Islamîye**, metbe'etu wezaretu't-Terbiye, daru Spêrêz, Erbil 2004.

LÎVIN, Bongard , **el-Cedîdu Hewle'ş-Şerqi'l-Qedîm**, ter. Cabir Ebî Cabir we Xeyrî ed-Damin, daru't-Teqddumî, Mosko 1988, r. 6.

MEKDUL, Dêvîd, **Tarîxu'l-Ekradi'l-Hedîs**, ter. Rajal Muhammed, Daru'l-Farabî, Beyrût 2004.

el-MENSÛRÎ, Cirêdî, **en-Naru fi'ş-Şi'rî we Tiqûsi's-Seqafetî**, el-Merkez es-Seqafiyî'l-Erebî es-Seqafî, Beyrût 2002.

el-MEQDISÎ, Şemsu Ed-din Ebu Ebdullah el-Bişarî: **Ehsenu't-Tekasîm fî me'rîfet el-EKalîm**, Laydin 1906.

MER'Î, Ferset, **el-Fetihu'l- Islamî lî Kurdistan**, Daru'z-Zeman, Dîmeşiq 2011.

MER'Î, Ferset, **Kurdistan fi'l-Qerni's-Sabi'î li'l-Mîlad**, menşûrat merkez Kurdistan l'd-Dîrasat el-Istiratîciye, es-Suleymanîye 2006.

MER'Î, Îd, Muhammed Herb FEREZAT, **Diwelon we Hedaraton fi'ş-Şerqi'l-Erebîyî'l-Qedîm**, daruTelas, Dîmeşiq 1994.

MER'Î, Îd, **Tarîxû Bîladi'r-Refîdeyn Munzû Eqdemi'l-Usûrî Hetta Am 539 q.m**, el-Ebcedîye lin-Neşir, Dîmeşiq 1990.

MESKEWÊH, Ebû Elî Ehmed bin Muhammed, **Kîtabu Tecaribu'l-Umemî**, c. 2, daru'l-Kîtabi'l-Islamî, el-Qahîra (b.m.).

MES'ÛD, Cemal Ebdilhadî Muhammed, Wefa Muhammed RIF'ET CUM'A, Elî Ehmed LEBEN, **Exta'on Yecib En Tusehheh fi't-Tarîx- ed-Dewletu'l-Osmanîye**, c. 2, el-Wefa', li't-Tiba'etî we'n-Neşir, el-Mensûra- Misir 1995.

el-MES'ÛDÎ, Ebû'l-Hesen Elî bin el-Huseyn bin Elî, **Mirûcu'z-Zehab we Me'adinu'l-Cewher**, c. 2, eş-Şerîke'l-'Alemîye li'l-Kîtab ŞML, Beyrût 1990.

MEZHER, Kemal Ehmed, **Intîfadetu 1925 fî Kurdistan Turkîya**, menşûrat rabîtetu Kawa li's-Seqafeti'l-Kurdîyetî, Beyrût 2001.

MEZHER, Kemal Ehmed, **Kurdistan fî Senewati'l-Herbi'l-Alemîyeti'l-Ûla**, ter. Muhammed el-Melle Ebdulkerîm Kerîm , daru'l-Farabî/daru Aras, Beyrût/Erbîl 2013.

MIHEL, Salim Ehmed, **el-'Elaqatu's-Sasanîyeti'l-'Erebîytî Xilale el-Qerneyn el-Xamisî we's-Sadisî li'l-Mîlad**, daru Xeyda, Emman/el-Urdin 2012.

MINÊMENÊ, Hesên, **Tarîxu'd-Dewleti'l-Biweyhîye es-Siyasî we'l-Iqtîsadî we'l-Ictîma'î we's-Seqafî – Muqate'etu Faris 334-447h /945-1055m**, ed-Daru'l-Cami'îye, Beyrût 1987.

MÎRANÎ, Elî Salîh, **el-Hereketu'l- Qewmîyeti'l- Kurdîye fî Kurdistan Sûriya (1946-1970)**, Metbe'etu Wezaratu't-Terbîye, Erbil 2004.

MÎRZA, Ehmed Mîrza, **"Eşher Qadeteî Fethî Kurdistan fî'l-'Esri'l-Islamîyi'l-Ewwel"**, Meeceletu Kulliytu'l-Îlûmi'l-Islamîye, c. 8, el-Eded (2/15), 2014, r. 725-755.

MORTGAT, Anton, **el-Fen fî'l-Îraq'l-Qedîm**, ter. Îsa Selman we Selîm Taha et-Tekrîtî, c.1, metbe'etû Edîbû'l-Bexdadîyetî, Bexdad. (b.m).

MORTGAT, Anton, **Tarîxû'ş-Şerqî'l-Edna'l-Qedîm**, terc: Tewfik Silêman we Elî Ebû Esaf we Qasim Tuwêr, Dîmeşiq 1967.

MUHEMMED, Nebîla Hesên, **Tarîxu'd-Dewleti'l-'Ebbasiye**, daru'l-Me'rifeti'l-Cami'îye, el-Iskenderîye 1993.

MUHEMMED, Semî Fedlen Ebdulhemîd, **Ekradu'l-Îraq Tehte Hukmî Ebdilkerîm Qasim (1958-1963)**, risaletu macistêr, Camî'etu'z-Zeqazîa, Misir (b.m.).

MUHEMMED, Xalid Cemîl, **Min Qedaye'l-Mu'cemîyeti'l-Kurdîyeti**, daru Rewafid, Dîmeşq 2008..

MUKIRYANÎ, Hisên Hisnî, **Mûcezu Tarîxî Ūmera'î Soran**, ter. Mihemed el-Melle 'Ebdulkerî, Bexdad (b.m.).

el-MUTENEBBÎ, Ebû Teyyib, **Dîwanu'l-Mutenebî**, daru Beyrût, Beyrût 1983.

NAMÎ, M. Ehmedê, **Agirê sînema Amûdê**, ç.1, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1987.

NÎKÎTÎN, Basîlî, el-Kurd- Diraseton sosyolojîyeton we Tarîxîyeton, ter. Nûrî Talbanî, Mûessestu Hemdî l't-Tiba'etu we'n-Neşir, es-Suleymaniye 2007.

OSÊ, M., **el-Ihsai'l-Istisna'î fî Muhafezeti'l-Heseke 5/10/1962**, menşûratu't-Tehalufi'd-Dîmuqratîyi'l-Kurdî fî Sûriya 2010.

OSMAN, Ebdulezîz, **Me'alîmu Tarîxi'ş-Şerqî'l-Qedîm**, daru'l-Fîki'l-Hedîs, Libnan 1966.

OSMAN, Faris, **el-Kurd we'l-Ermen – el-'Elaqatu't-Tarîxîye**, mûessesetu Margirêt, Kurdistan el-Îraq 2013.

OSMAN, Faris, **Zeradeşt we'd-Diyanetu'z-Zeradeştiye**, daru'l-Mehebbe Dîmeşiq/ daru'r-Raye Beyrût 2003.

OSMAN, Hesên, **Menhecu'l-Behsi't-Tarîxî**, daru'l-Mearifî, el-Qahîre (b.m).

OSMAN, Se'dî, **Îmartu Baban fi'n-Nisfî'l-Ewwelî mine'l-Qern 18- Dîrasetun fi 'Elaqatihe's-Siyasîye me'es-Sultati'l-Osmanîye**, (b. m.), (b. c.).

OTS, Dêvîd, Con OTS, **Till Birak, et-Te'awin es-Sûrî'l-Birîtanî fi Mecali'l-Asar**, mektebetu'l-Esed, Dîmeşiq 1998.

OZTÛNA, Yelmaz, **Tarîxu'd-Dewleti'l-Osmanîye**, ter. Ednan Mehmûd Sulêman, c. 1, mûessesetu Feysel li't-Temwîl/tebi' şerîketu'l-Hîlal el-Musahîme, Istanbul 1990.

POLADIYAN, Erşak, **el-Ekrad fi Hiqbeti'l-Xilafeti'l-'Ebbasîye fi'l-Qerneyn 10-11**, ter. Eliksender Kişşyan, daru'l-Farabî /dar Aras, Beyrût/Erbîl 2013.

POLADIYAN, Erşak, **el-Ekrad mine'l-Qerni's-Sabi'î ile'l-Qerni'l-'Aşiri'l-Mîladî**, ter. Mecmû'etun mine'l-Mutercimîn, daru'l-Farabî /dar Aras, Beyrût/Erbîl 2013, r. 7.

PROTON, Cêrî, **'Asrû'n-Nehdetî-Muqeddîmeton Qesîreton Cidden**, ter. Ibrahîm el-Bîlî Mehrûs, Muessesetû Hendawî, el-Qahîre 2014.

QADIR, Mûsenna Emîr, **Qedaye'l-Qewmîyat we Eseruhe 'ele'l-'Elaqati'd-Diwelîye (el-Qedîyetu'l-Kurdîye Nemûzecen)**, merkez Kurdistan li'd-Dîrasati'l-Istiratîciyetî, es-Sulêman îye 2003.

QASIM, 'Ebde Qasim,'Elî es-Seyid 'ELÎ, **el-Eyûbîyîn We'l-Memalîk - et-Tarixu's-Siyasî We'l-'Eskerî**, Neşere 'Eyn li'd-Dîrasat we'l-Bihûs el-Îctîma'îye, el-Qahîre, (b.m.).

QASIMLO, Abdurrehman, **Kurdistan we'l-Kurd – Dîrasetun Siyasîyetun we'Iqtisadîye**, ter. Sabit Mensûr "Xanim Hemdûn", metbe'etu Şivan, es-Sulêmanîye 2008.

er-RAFI'Î, Abdurrehman, **'Esiru Muhammed 'Elî, daru'l-Me'arif**, el-Qahîra 1989.

RE'ÛF, Îmad 'Ebdusselam, **Dîrasatun Wesa'iqîyetun fi Tarîxi'l-Kurdi'l-Hedîsi we Hedaretîhihim**, daru'z-Zeman/et-Tefsîr, Dîmeşiq/Erbîl 2012.

SAGŊIÇ, Feqî Huseyn, **Dîroka wêjeya Kurdî**, weş. Enstîtuyan Kurdî ya Stenbolê, Istanbul 2002.

SALIH, Ebdulezîz, **eş-Şerqu'l-Edna'l-Qedîm (Misir we'l-Îraq)**, mektebetu'l-Angilo'l-Misriya, el-Qahîra 2012.

SALIH, Haşim, **Medxeonl île't-Tenwîr'il-Ewrûpî**, darû't-Telî'etî, Beyrût 2005.

es-SAMIR, Fêsel, **Sewretu'z-Zinc**, daru'l-Meda, Beyrût 2004. Ehmed el-'Eelî, **Sewretu'z-Zinc we Qaidehe 'Elî bin Muhammed**, daru'l-Farabî, Beyrût 2007.

SE'ADE, Sefîya ûgarît, mûessesetu Fikir li'l-Ebhas we'n-Neşir, Beyrût 1982.

es-SEBKÎ, Amal, **Tarîx Îrani's-Siyasî Beyne Sewreteyn (1906-1979)**, silsiletu 'Alemi'l-Me'rîfe, el-'Eded 250, el-Kiweyt 1999.

SEBRÎ, Osman, **Şerên Sasûnê (1925-1937)**, amd. Dilawerê Zengî, weş. Pêrî, Istanbul 2005.

SELÎM, Ehmed Emî, **Dirasaton fî Tarîxi'ş-Şerqi'l-Edna'l-Qedîm (Misir- el-Îraq-Îran)**, daru'n-Nehdeti'l-'Erebiye, Beyrût 1989.

SEWWAF, Sibhî, **Tarîxu Heleb-Heleb Qeble'l-Islam**, Heleb 1972.

SINO, Ebdirre'ûf, **en-Nîza'atu'l-Keyanîyeti'l-Islamîyetî fi'd-Dewleti'l-Osmanîye (1877-1881)- Bilad'ş-Şam- el-Hicaz- Kurdistan, Elbaniya, Bîsan - Beyrût 1998.**

SOLÎT, Cêrmî, **Teffîtu'ş-Şerqu'l-Ewset – Te'sîru'l-Itirabatu'l-Letî Yusîrûha el-Xerb fî'l-'Alemi'l-'Erebî**, ter. Nebîl Sibhî et-Tewîl, daru'n-Nefa'is, Dîmeşiq 2011.

ŞAKIR, Mehmûd, **et-Tarîxu'l-Islamî-et-Tarîxu'Mû'asir- Turkiya 1924-1989**, c. 17, el-Mektebu'l-Islamî (Beyrût, Dîmeşiq, 'Emman) 1996.

eş-ŞAZILÎ, Mehmûd Sab't, **el-Mes'eletu'ş-Şerqîye, Dîrasetun Wesa'iqîyetun 'eni'l-Xilafeti'l-Osmanîye (1299-1923m.)**, mektebetu Wehbe, el-Qahîra 1989.

ŞE'BAN, Muhammed Ebdulhey Muhammed, **Sediru'l-Islam we'd-Dewletu'l-Emewîye (600-750m/132H)**, el-Ehlîye li'n-Neşir we'tüTewzî', Beyrût 1987.

ŞÊRGOH Belec, **el-Qedîyetu'l-Kurdîye – Madî el-Kurd we Hadirehum**, menşûrat rabîtetu Kawa li's-Seqafeti'l-Kurdîyetî, Beyrût 1986.

TACUDDÎN, Ehmed, **Tarîxu Şe'bin we Qedîyetin we Weten**, ed-Daru's-Seqaffiyetî li'n-Neşir, el-Qahîra 2001.

el-TEBERÎ, Ebû Ce'fer bin Muhammed bin Cerîr, **Tarîxu'l-Umemî we'l-Milûk**, c. 5, Daru'l-Kutubu'l-Îlmîye, Beyrût (b.m.).

TEQQÛŞ, Muhammed Suhêl, **Tarîxu'd-Dewleti's-Sefewîyetî fî Îran (907-1148h./1501-1736m.)**, daru'n-Nefa'is, Beyrût 2009.

TEQQÛŞ, Muhammed Suhêl, **Tarîxu'l-Xulefa'r-Raşidîn - el-Fitûhat we'l-Incazati's-Siyasîye**, daru'n-Nefa's, Beyrût 2011.

TEWFÎQ, Elî Teter, **el-Heyatu's-Siyasîye fî Kurdistan (1908-1927)**, ter. Tehsîn İbrahîm ed-Doskî, metbe'etu Xanî, Dihok 2007.

TEWFÎQ, Hogir Tahir, **el-Kurd we'l-Meseletu'l-Ermenîye (1877-1920)**, daru'l-Farabî/daru Aras, Beyrût/ Erbil 2014.

TEWFÎQ, Zerar Seddîq, **el-Qebail we'z-Ze'amatu'l-Qebelîyeti'l-Kurdîye fî'l-Esir'l-Wesît**, metbe'etu muessesetu Aras, menşûrat muessesetu Mokiryani li'l-Bihûs we'n-Neşir, Erbil 2007.

VILHILM, Cîrnot, **el-Hûrîyûn Tarîxehum we Hedaretehum**, ter. Farûq İsmâil, daru'l-Cedel, Beyrût 2000.

el-WEŞMÎ, Salih Suleyman, **Ebû Muslim el-Xeresanî**, menşûrat nadî el-Qesîm el-Edebî, Burîde 1400h.

WILLÎ, Liyonard, **Alalax Memleketon Mensîyeton**, ter. Fehmî ed-Dalatî, menşûratu wezartu's-Seqafe, Dîmeşiq 1992.

XANÎ, Ehmedê, **Mem û Zîn**, amd. Kadri Yeldırım, ç. 2, weş. Avesta, Istanbul 2013.

XEFACE, Muhammed Ebdil Mun'im, **Medarisu'n-Neqdi'l-Edebîyi'l-Hedîsî**, ed-Darû'l-Misrîyeti'l-Lubnanîyetî, el-Qahîre 1995.

XELÎL, Ehmed Mehmûd, **Memleketu Mîdiya**, Metbe'etu Rojhilat-Müessesetu Mûkiryani, Erbil 2011.

YAKIBSON, Roman, **Qedaye's-Şi'rîye**, ter. Muhammed el-Welî we Mûbarek Henuz, daru Topqal li'n- Neşrî, ed-Daru'l-Beyda'- el-Mexrib 1988.

YAXÎ, Isma'îl, **ed-Dewletu'l-Osmanîyetî fi't-Tarîxi'l-Islamîyi'l-Hedîs**, mektebetu'l-'Ikîban, er-Riyad 1996.

YEHYA ûsama Ednan, **Tarîxu's-Şerqi'l-Edna'l-Qedîm**- Dirasat we Ebhas, teb'etu Aşûr Banîbal li'l-Kîtab, Bexdad 2015.

YÛSÎF, Ebdurreqîb, **ed-Dewletu'd-Dostikiye fi Kurdistani'l-Wista**, c.1, metbe'etu'l-Liwa', Bexdad 1972 /c. 2, daru Aras, Erbîl 2001.

YUSUF, Cemşîd, **ez-Zeradeştîye - ed-Diyanetu we't-Tiqûsu we't-Tehewilatu'l-Lahîqetî Bina'en 'ela Nisûsî Avêsta**, Mektebetu Zeyn el-Hiqûqiyeti'l-Edebiyetî, Beyrût 2012.

ZAZA, Nûreddîn, **Heyafî'l-Kurdîye ew Serxetu's-Şe'bi'l-Kurdîyî**, ter. Ronî Muhammed Dumillî, daru Arass li't-Tîba'etî we'n-Neşrî, Metbetu Erbîl, Erbîl 2001.

ez-ZEHEBÎ, Muhammed bin Ehmed bin Usman, **Siyeru E'elamu'-Nubela**, c. 6, Muessesetu'r-Rîsale, 2001.

ZEKÎ, Muhemmed Emîn, **Meşahîru'l-Kurdî we Kurdistan fi'l-'Ehdi'l-Islamî**, c. 1-2, ter. Sanha Zekî Bêk, daru'z-Zeman, Dîmeşiq 2006.

ZEKÎ, Muhammed Emîn, **Tarîxu's-Suleymanîye**, ter. el-Mela Ehmed er-Rozibiyânî, şerîketu'n-Neşirî wet-Tîba'eti'l-Îraqiyeti'l-Mehdûde, Bexdad 1951.

ZEKÎ, Muhemmed Emîn, **Tarîxu'd-Diwelî we'l-Îmarati'l-Kurdîyetî fi'l-'Ehdi'l-Islamî**, ter. Muhemmed Elî Ewnî, Metbe'etu's-Se'ade, Misir 1948

ZEKÎ, Muhemmed Emîn, **Xulasetû Tarîxû'l-Kurdî we Kurdistan Min Eqdemi'l-Usûr Hette'l-An**, ter. Muhammed Elî Ewnî, c.1, daru's-Şuûni's-Seqafîyetî, Bexdad 2005.

ZEKKAR, Suhêl, **el-Camî'u fi Exbaru'l-Qeramîta**, daru Hesana, Dîmeşiq 1987.

ZODIN, Fon, **Medxelon île Hedarati's-Şerqi'l-Qedîm**, ter. Farûq Isma'îl, daru'l-Meda, Dîmeşiq 2003.



## GOTAR Û KOVAR

ADAK, Abdurrahman, *"Di edebiyata kurdî ya klasik de biyografîyên menzûm ên helbestvanan- Hacî û Cegerxwîn"*, kov. Nûbihar, j. 130, sal: 2015, r. 72-77.

ARÎ, Arjen, *"Seydayê Cegerxwîn: Xanî"*, Kov. W, weş. Enstîtuya Kurdî ya Amedê, j. 15, sal: 2007, r. 3-4.

CEGERXWÎN, Keyo, *"Cegerxwin"*, kov. Nûbûn, j. 74, sal: 2006.

el-HEMDANÎ, Hamid, *"Min Zakîreti't-Tarîx Seb'ûne 'Amen 'Ela Inqîlab el-Ferîq Bekir Sidqî"*, el-Qismi'l-Ewwel, el-Hîwari'l-Mûtemeddin, el-'Eded 1704 – 15. 10.

ERGÜN, Zülküf, *"Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyeên Romantîzman Hacî û Cegerxwîn"*, kov. Nûbihar Akademî, j. I/1, sal: 2014, r. 17-33.

ISMAÎL, Farûq, *"el-Hûrîyûn fî Bîlad Apûn Xîlale'l-Esre'l-Babiliyî'l-Qedîm"*, Meceretû'n-Nuqûşî we'r-Risûmî's-Sexriyyetî, Hey'etû'l-Asari'l-'Amme, el-Ededu'l-ewwel ûman 2007, r. 83.

ISMAÎL, Zubeyir Bîlal, *"Tarîxu'l-Kurd we Kurdistan'l-Qedîm"*, kov. Gulanu'l-Erebî, el-eded:13, Erbîl 1997.

KEWSERANÎ, Wecîh, *"et-Tenzîmatu'l-Osmanîyefî we'd-Destûr- Bewakîru'l-Fikri'd-Destûrî Nessen we Tetbîqen we Mefhûmen"*, meceletu Tebîn, el-'eded 3, el-Merkezu'l-'Erebî li'l-Ebhasî we'd-Dirasetu's-Siyasat, ed-Dewhe-Qeter -Şita' 2003, r. 7-22.

kov. Berbang, j. 5, sal: 1984,

kov. Hawar, Çapxana Tereqî, Şam, sal: 1932 (j. 4, r. 6), (j. 5, r. 7), (j. 6, r. 4), (j. 9, r. 6), (j.10, r. 3, 5-6), (j. 11, r. 8), (j. 13, r. 3, 5), (j. 14, r. 2), sal: 1933 (j. 16, r. 3-4), (j. 18, r. 5), (j. 19, r. 4-5), (j. 20, r. 12), (j. 21, r. 8), (j. 22, r. 1-3, 8), (j.23, r. 6), sal: 1934 (j.24, r.7), (j. 25, r. 4), sal: 1941 (j. 27, r. 6), (j. 28, r. 7-8), (j. 29, r. 9), (j. 30, r. 6), (j. 31, r. 6), sal: 1942 (j. 39, r. 9), (j. 51, r.4), sal: 1943 (j. 52, r. 4, 8, 11), (j. 54, r. 2), (j. 57, r. 4, 6).

kov. Vesta, weş. Berdan Matbaacılık, Istanbul (b.m), r. 28-40.

kov. W, sal. 6, j. 28, sal: 2009, r. 36-66.

kov.Pênûsa nû, j. 30, sal 2014. Beşê kurdî: R. 1-10., Beşê Erebî: r. 1-20.

LÎR, Van, *"Ûrkîş el-Merkezû'd-Dînîyyî'l-Hûrî el-lezî 'Ûsîre 'eleyhî fî 'l-Cezîretî's-Sûriyetî'l-Ûlya"*, ter. Ednan el-Bûnnî, el-Hewlîyatû'l-Eserîyetû's-Sûriye, mucelled 27, c.1-2., 1957, r. 237

MEZÛRÎ, Abdurrahman, *"Firîneke serneşîv di Hozaneke Cegerxwîn de"*, kov. Dengê Me, j. 3, sal: 1987, r. 8-14.

OMERÎ, Heyveron, *"Di helbestên Cegerxwîn de Vebêj û Hêmanên De-kolonyal"*, Kov. Nûbihar, j. 129, sal: 2014, r. 46-49.

SINO, Ebdirre'ûf, *"el'Elaqati'r-Rûsîyeti'l-Osmanîye (1687-1878)- Mes'eletu'l-Behri'l-Eswedî we'l-Ezmetu'l-Belqanîye"*, meceletu Tarîxul-'Erebî we'l-'Alem, el'Eded 79-80, Beyrût 1985, r. 17-18.

SINO, Ebdirre'ûf, *"el'Elaqati'r-Rûsîyeti'l-Osmanîye (1687-1878) – Herbu'l-Qerem Mumehîdatehe we Tetewiratehe we neteaiche (1853-1856)"*, meceletu Tarîxul-'Erebî we'l-'Alem, el'Eded 77-78, Beyrût 1985, r. 25-44.

ŞINAYDER, Cewaşim Britz, *"Nabada Medîneton Defîneton fî Şemalî Sûriya"*, ter. Xesan Helbûnî we Ednan el-Hemwî, Mecelletu'l-'Ulûm (el-Kiwetîye), mucelled 17, c. 1-2, 2001, r. 5,12.

Û b.f. li ser helbê bnr. Fûad Cemîl, *"Zinîfon fî'l-Îraq we Hemletu'l-'Eşretî Alaflî Ixrîqî"*, Meceletû Somer, Mûceled 20, c. 1-2, Îsdatar Mudîriyetu'l-Asari'l-'ametî fî'l-Îraq, Bexdad 1964, r. 227-285.

## GOTAR Û JÊDERÊN JI ENTERNÊETÊ

el-BERCAWÎ, Mewlayî'l-el-Mustafa, *"Tetewuru'l-Kîtabetî't-Tarîxîyetî Beyne Menzûreyn es-Seqafetu'l-Îslamiyyetû fî Muqabîl's-Sefaqetî'l-Erbîyyetî"*, Mewqî'l-Elûketî's-Seqafîyetî, (m.w.31/12/2012), <http://www.alukah.net/culture/0/48498%20/>, (m.j. 10-01-2016).

D. P. News, *"Erdogan ye'tezîr 'en'l-Mecazîr didde'l-Ekrad fî Dêrsim fî selasînati'l-Qerni'l-Madî"*, (m. w. 23. 11. 2011) <http://www.dp-news.com/pages/detail.aspx?articleid=104111>, (m. j. 20. 02. 2016)

DERWÎŞ, Ebdulhemîd, "*el-Qediyetu'l-Kurdîyê fi Sûriya*", Mûhaderetun Ulqiyet fi Merkez ed-Dîrasati'l-Hedariye fi Dîmeşiq, 14.10.2000.

<http://www.marefa.org/index.php/%D9%83%D8%B1%D8%AF%D8%B3%D8%AA%D8%A7%D9%86#.D8.A7.D9.84.D8.A3.D9.86.D9.87.D8.A7.D8.B1> (M.J.10.02.2016)

EBDULETÎF, Muhemmed, "*Hereketu eş-Şêx Mehmûd Hefîd el-Berzençî*", el-Cezîra net, (m. w. 24. 05. 2006)

<http://www.aljazeera.net/specialfiles/pages/45eb7969-58d3-4a3f-bd7b-29b8300b0a0e> , (m. j. 11. 12. 2015).

EBDULFETTAH, Deham, "*Redden Ela Muhemed Efîf Huseynî Lil-Cebelî Delalaton Xeyru'r-Rîfiye we Stokholm Leyset Hewde Te'mîd*", Mecelletu'n-Nezwa, el-Edd 18, (Mesqet-Ûman) Nîsan 1999, (m.w. 01.04.1999)

<http://www.nizwa.com/%D8%B1%D8%AF%D8%A7-%D8%B9%D9%84%D9%89-%D9%85%D8%AD%D9%85%D8%AF-%D8%B9%D9%81%D9%8A%D9%81-%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%B3%D9%8A%D9%86%D9%8A-%D9%84%D9%84%D8%AC%D8%A8%D9%84-%D8%AF%D9%84%D8%A7%D9%84%D8%A7%D8%AA/> , (m.j. 05.09.2015).

EBU'SSÛF, Behnam, "*el-Asûriyûn el-Haliyûn- el-Aramîyun'n-Nesafîra we 'Elaqetihim bi'l-Aşûriyûn sukane'l-Îraq'el-Qedîm*", (m.w. 27.04.2012)

<http://www.abualsoof.com/inp/view.asp?ID=105> (m.j. 08.11.2015).

el-EHMED, Samî Se'îd, "*Fetretu'l-'Esri'l-Kaşî*", Meeletû Somer, r. 135, Mewqî'u Abualsoof, (m.w. 17.02.2013) <http://www.abualsoof.com/INP/Upload/Books/Alkashi.pdf>, (m.j. 10.08.2015).

el-EHMED, Samî Se'îd, "*el-Îraq fi Kîtabat'l-Yonan we'r-Roman*", Meeletû Somer, r. 122, Mewqî'u Abualsoof, (m.w. 09.12.2012)

<http://www.abualsoof.com/INP/Upload/pdf/al%20Iraq%20fi%20kitab%20al%20Yonan%20Owal%20roman.pdf>, (m.j. 10.08.2015).

ENHÛRÎ, Semîr, "*Sûriya we'l-Intîdabi'l-Ferensî 1920-1946*", (m.w. 15.03.2003), [http://www.maaber.org/issue\\_august03/lookout2a.htm](http://www.maaber.org/issue_august03/lookout2a.htm) , (m.j. 03.02.2016.)

el-EWENDÎ, Mehmûd "*Leyletu'l-Qebqî Ele Leyla Qasim*" el-Hiwaru'l-Mutemedin, el-Edd 2277, 05.10.2008. <http://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=134118>, (m.j.03.01.2016).

ÎGILTON wilyam, el-Qeba'ilu'l-Kurdîye, ter. Ehmed Xelîl, r. 8-9,  
[https://ahmedalkhalil.files.wordpress.com/2012/08/d8a7d984d982d8a8d8a7d8a6d984\\_d8a7d984d983d988d8b1d8afd98ad8a9-d984d988d984d98ad985-d8a7d98ad983d984d8aad988d9861.pdf](https://ahmedalkhalil.files.wordpress.com/2012/08/d8a7d984d982d8a8d8a7d8a6d984_d8a7d984d983d988d8b1d8afd98ad8a9-d984d988d984d98ad985-d8a7d98ad983d984d8aad988d9861.pdf) , (m.j. 20.01.2016).

ISMAÎL, Farûq, "*el-Kurd*", *el-Mewsû'eti'l-Erebîyetî*, c.16, darû'l-fikr, Dîmeşq, r. 151,  
<http://www.arab-ency.com/details.php?full=1&nid=1289> , (m.j. 10.10.2015).

ÎSA, Xalid, "*el-Ekrad Tehte'l-Infûdabi'l-Ferensî - 1*", (Kurdistana binxetê), el-Ciz'il-Ewwel, (m.w. 28.11.2004),  
[http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix\\_Kurdistan/TarixaSuri\\_Tevlihev/Nerinekji\\_KurTur\\_alidIsa.htm](http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix_Kurdistan/TarixaSuri_Tevlihev/Nerinekji_KurTur_alidIsa.htm) , (m.j. 03.02.2016.)

ÎSA, Xalid, "*el-Ekrad Tehte'l-Infûdabi'l-Ferensî -2*", Mewqî' (Kurdistana binxetê), el-Cizi's-Sanî, (m.w. 18.11.2004),  
[http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix\\_Kurdistan/TarixaSuri\\_Tevlihev/XwendinekDiroki\\_kurdilisuri.htm](http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix_Kurdistan/TarixaSuri_Tevlihev/XwendinekDiroki_kurdilisuri.htm) , (m.j. 05-02-2016).

ÎSA, Xalid, "*el-Ekrad Tehte'l-Infûdabi'l-Ferensî -3*", Mewqî' (Kurdistana binxetê), (m.w. 01.01.2005),  
[http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix\\_Kurdistan/TarixaSuri\\_Tevlihev/SeidaxaDeqori.htm](http://www.kurdistanabinxete.com/Tarix_Kurdistan/TarixaSuri_Tevlihev/SeidaxaDeqori.htm) , (m.j. 03.03.2016).

KOBANÎ, Salih, "*Ji Hesarê ta Siwêdê*", Belgefîlmek li ser jiyana Cegerxwîn, Kurdistan TV, (m.w. 05.12.2014) <https://www.youtube.com/watch?v=d-12MyxjxW0> (m.j. 07.11.2015).

KURD1 "*hevpeyvînek bi Sînem Bedirxan re*" , Mîr Celadet Bedirxan 1893 - 1951 , (m.w. 01.12.2012), beşê 1. <https://www.youtube.com/watch?v=xrDaJfTZlpw> , beşê 2. <https://www.youtube.com/watch?v=0F-xDuR4PB4> . (m.j. 05.01.2016)

MERÎ, Ferset, "*Ekradu Sûrîya we Sîra'u'l-Muhafezetî 'Ele'l-Hewîye*", mecelletu'l-Beyan, (m.w. 13.04.2014), <http://www.albayan.co.uk/rsc/print.aspx?id=3271>, (m.j. 16.10.2016)

NEZAN, Kendal, "*hevpeyvînek bi Cegerxîn re*", Sala 1983an li Inistîtûta Kurdî li Paris û li ser kenala KURD1 weşand, (m.w. 24.10.2012)

<https://www.youtube.com/watch?v=GZ4N6e2Socc>, (m.j. 07.11.2015).

SEYDA, Ebdulbasit, "*Amûda..Medînetul-unfeî wel-Ma'rîfetî*", el-Hîwaru'l-Mutemeddin, el-Eded: 2906, (m.w. 03.02.2010),

<http://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=202122> , (m.j. 02.10.2015).

TACAL, Cûdî, "*Ekradu Sûrîya...et-Tarîxu we's-Siyasetî we'l-Mucteme*", ter: Misellem 'Ebid Talas, Medarat Kurd, (m.w. 02.01.2014), <http://www.medaratkurd.com/?p=675> (m.j. 05.02.2016)

el-YÛSIF, Ibrahîm, "*Hîwar me'e Keyo Cegerxwîn re*", Malpera welatême, (m.w. 02.11.2014),

<http://www.welateme.co/cand/modules.php?name=News&file=article&sid=5188#.Vpd0Pvk rLIU> (m.j. 14.10.2015).

ez-ZÊN, Muhammed, "*el-Arîyyîn*", *el-Mewsû'eti'l-Erebîyetî*, c.1., darû'l-Fîkr, Dîmeşq. <http://www.arab-ency.com/ /details.php?full=1&nid=15293> (m.j. 20.09.2015).

## JÊDERÊN NEXŞEYAN:

Nexşa 1. Google Earth

Nexşa2.<https://sumer2sargon.wordpress.com/akkadian-army-2/> (m.j. 20.03.2016)

Nexşa3..<https://sumer2sargon.wordpress.com/akkadian-army-2/> (m.j. 20.03.2016)

Nexşa4.<http://www.enciclopedia.cat/EC-GEC-0042156.xml> (m.j. 20.03.2016)

Nexşa5.[http://www.crystalinks.com/Achaemenid\\_Empire.html](http://www.crystalinks.com/Achaemenid_Empire.html) (m.j. 25.03.2016)

Nexşa6.<http://www.eba.gov.tr/dochplayer?id=688857386d8db40d84a8c987aff0878b7ae8887f22001> (m.j. 15.03.2016)

Nexşa7:<http://www.arabgeographers.net/vb/threads/arab20408/> (m.j. 1.04.2016)

Nexşa8.<http://www.arabgeographers.net/vb/threads/arab20408/> (m.j. 1.04.2016)

Nexşa9.[http://www.revolvy.com/main/index.php?s=Kurdish+principality&item\\_type=topic&overlay=1](http://www.revolvy.com/main/index.php?s=Kurdish+principality&item_type=topic&overlay=1) (m.j. 30.03.2016)

Nexşal0.[https://sullydish.files.wordpress.com/2014/10/sykes\\_picot\\_by\\_ft.png](https://sullydish.files.wordpress.com/2014/10/sykes_picot_by_ft.png)(m.j.25.03.2016)

Nexşal1.<https://panathinaeos.files.wordpress.com/2012/09/2000px-tratadodesevres1920-svg.png> (m.j. 1.04.2016)

Nexşal2.[http://www.institutkurde.org/images/cartes\\_and\\_maps/kurdis.jpg](http://www.institutkurde.org/images/cartes_and_maps/kurdis.jpg) (m.j. 2.04.2016)

### **JÊDERÊN WÊNEYAN:**

Wêne 1.[http://www.dimoqrati.info/wp-content/uploads/2015/10/11987213\\_1065403380197959\\_1154941036520390894\\_n.jpg](http://www.dimoqrati.info/wp-content/uploads/2015/10/11987213_1065403380197959_1154941036520390894_n.jpg)  
(m.j.10.03.2016)

Wêne 2.<http://www.saradistribution.com/bedirkhans.htm> (m.j.28.03.2016)

Wêne 3. , Wêne 4. (Ji kêşandina amadakar sala 2013an)

## PÊVEK




1. Hesarê, Beyder Memo, Dêrik, Qamişlo, Amûdê.



2. Rojhilata kevin




3. Rojhilata kevin di 2300b.z. de.



4. Rojhilata kevin di hezara duyem û yekem de b.z.






5. Şahneşına Mîdiya di sed sala şeşem de b.z.



6. Dewleta İslamî di serdema Xelîfeyên Raşidî de.



fras.tayyib@hukam.net

## الإمارت والممالك الإسلامية في أواخر القرن العاشر للميلاد

# دولة آل بويه

المروانيون (1085-983 م)	آل شداد (1174-951 م)	آل عinar (1110-991 م)	رقعة الدولة البويهية
العقيليون (1169-990 م)	آل روادى (1116-950 م)	آل كاكويه (1051-1008 م)	حدود الدولة البويهية
التميميون (1081-990 م)	آل مسافر (1090-916 م)	بنو مزيد (1150-961 م)	آل حسنيه (1015-961 م)
الجمدانيون (1004-944 م)	حدود دولة آل مسافر قبل 983 م	بنو هاشم (1075-869 م)	السامانيون ثم الغزنويون (999-997 م)
ثم المرادسيون (1080-1024 م)	شروانشاهات (1607-799 م)	آل باوند (1349-665 م)	حدود الغزنويين بعد توسعهم
رقعة الدولة الفاطمية			
دولة القرامطة في البحرين			


7. Şahneşîn û Mîrneşînên Islîmî di dawiya sedsala dehê z. de



## 8. Dewleta Osmanî û Sefewî




## 9. Mîrneşînen Kurdî di serdema nûjen de




10. Peymana Saykis Piko 1916.



11. Peymana Sîver 1920.



12. Tevger û Serhildanên Kurdî 1880-1939.



Wêne 1. Cegerxwîn



Rêza pêşî ji aliyê çep ve: (Hacî Ebdilkerîmê Sadiq, Mîr Celadet Bedrxan, Hesenê Haco)

Rêza paşî ji aliyê çep ve: (Mecîdê Haco, Cegerxwîn, Cemîlê haco, Haco yê Haco)

Wêne 2.

Rêza pêşî ji aliyê çep ve: (Hacî Ebdilkerîmê Sadiq, Mîr Celadet Bedrxan, Hesenê Haco)

Rêza paşî ji aliyê çep ve: (Mecîdê Haco, Cegerxwîn, Cemîlê haco, Haco yê Haco)



Wêne 3. Mala Cegerxwîn li Qamişlo



Wêne 4. Gora Cegerxwîn li Qamişlo

T.C.  
Mardin Artuklu Üniversitesi  
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü  
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**CEGERXWIN'İN ŞİİRLERİNDE  
KÜRT TARİHİNDEN YANSIMALAR**

Ibrahim İBRAHİM  
14711009

Tez Danışmanı  
Prof. Dr. Farouk İSMAIL

Mardin 2016





T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi  
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü  
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**CEGERXWIN'İN ŞİİRLERİNDE  
KÜRT TARİHİNDEN YANSIMALAR**

Ibrahim İBRAHİM

14711009

Mardin 2016